**ABDULAH OCALAN**

# DÎROK Dİ ROJA ME DE VEŞARTİYE Û

# EM Dİ DESTPÊKA DÎROKÊ DE VEŞARTÎNE

***Weşanên Komîteya Rêbertî***

**Cihê Çapê: Çapxana AZADÎ**
**Dîroka Çapê Nîsan 2019**

**Werger: Hacer Hilal**
**Redekte: Ayten Amed, Hacer Hilal**

## Naverok

PÊŞGOTİN
Şer û Huner
Yê Hov û Medenî
Kurdîstanî û Gerdûnî
HUNER, WÊJE Û GİYAN
Erka Huner Ya Şoreşgerî
Çawa Bijîn?
Romana Kurdistanê
MÎNA ZİMANÊ RASTİYÊ WÊJE
Tîpê Kurd

**Li Kurdistan û Her Cihî Kuştina Mirinê**

**Karê Pêxemberan**

**Bêsînorbûn Yan Jî Ji Mezopotamyayê Bûyîn**

**Penaberî, Penaberî**

**Tenêbûn û Rastiya Dîktatortiyê**

**Evin?**

**Zeynep Kinaci**

**Wêjeya Berhevkirinê (Devşirme)**

**DU MİLÎTAN: APÊ OSMAN Û MUSA**

**Avakerên Xweşikbûnê**

**Heta Ku Evîn Neyê Bidestxistin, Nabe Wêjevan**

**RAMAN, PÊNÛS Û ŞÛR**

**SÊSED SAL:**

**Ji Şerê Wêjeyê Ber Bi Wêjeya Şer Ve**

**DÎROK Dİ ROJA ME DE VEŞARTİYE**

**Û EM Dİ DESTPÊKA DÎROKÊ DE VEŞARTÎNE**

**RAMANÊN Jİ AGİR**

**Kok û Şerê Gihiştinê KURDİSTAN, WELATÊ MİROVAHİYÊ YE**

**PÊŞGOTİN**

**"*Me, kesayeta xwe wisa li gorî rêzikên şaristaniyê negirtiye dest, li gorî qaydeyên xwezayî girtiye dest. Ango ne li gorî pêşketinên esasên civaka çînî, li gorî esasên xwezayî. Çine evesasên xwezayî? Carna esasên zarokatiyê, carna jî esasên jiyana mirovên destpêkê. Me vê paşçav nekir. Ev di şêwaza Tevgera min de heye. "***

**Demên şoreşê, her tim bûne demên awarte. Di vê wateyê de hemû şoreşên sereke li gel nêzîkatiyên xwe yên taybet, dîsa taybetmendiyên wan**

**yên hevpar hene. Şoreşa Kurdistanê jî awarteye, li gel xisletên xwe yên taybet û dîsa di heman demê de li gel hemû şoreşên din jî xwedî taybetmendiyên hevpare.**

**Tişta ku li vir me eleqeder dike taybetmendiyên taybet ên şoreşa Kurdistanê bi xwe ne. Ev jî, çi di warê îdeolojîk de, çi jî di warê pêkanîna polîtîk de, bi awayeke herî bandor bi şêwaza Rêbertiya xwe têrkirî ve bûye xisletek.**

**Bandora Rêbertiya PKK'ê, li ser şêwaza pêkanîna partî yan jî, şêwaza sepandina pêvajoya 20 salên dawî ku wê bi rê ve biriye di wê astê de ye ku nîqaş li ser nabe. Ev şêwaz çiye û pêvajoya ku bandor kiriye li gorî kîjan zagonan pêkaniye, bêguman wê bibe mijara çavdêriyek kûr.**

**Di PKK'ê de mîna '*şêwaza Rêbertiyê*' têgeha ku hatiye sînordarkirin, beriya her tiştî rêbaza dahûrandinek civakî vedibêje; piştre**

**bi vê ve girêdayî pêkanîna rêbaz û teknîk, ango çalekiya wê tê. Lê şêwaza heyî yan jî rêbaz, ji nêzîkatiyên kevneşopî zêdetir xwedî raveyên cewaz û balkêş e.**

**Di şoreşê de rêbaz, şêwaza bikaranîna çekekê bibîr tîne. Bikaranîna mantiqê çekekê çiye?**

**Hûn ê nakokiya tund ya di navbera du heyberan de destnîşan bikin. Piştre hûn ê wan bînin gel hev. Beriya ku nakokiyê derbixin holê, enerjiya ku jê derbikeve, hûn ê li gorî armanca xwe aresteyî hedefeke guncav bikin. Ji bo vê hûn ê rêyên pêwîst ava bikin, mekanîzmayên pêwîst amade bikin. Enerjiya ku ji vebûna nakokiyê derbikeve holê bi awayeke herî berhemdar û piştî ku li gorî armanca xwe vesazbûnek çêkir şûnde, hûn ê teqînê pêk bînin. Bi vî rengî dema nakokiya di navbera agir û barûdê de bi teqînekê safî bû, wê enerjiya ku ji vê dubendiyê derkeve**

**holê, ji ber amadekariyên we yên berê, xizmeta armanca we bike. Hûn ê li hedefê bixin yan jî bigihin hedefê. Bi kurtasî bikaranîna mantiqê çekek kevnar bi vî rengî ye.**

**PKK, ji bo enerjiya civakî ya li Kurdistan û her ku diçe li Rojhilata Navîn belav dibe, bi kurtasî li ser esasê armancên manifestoya PKK'ê bê nirxandin, çekek hatî sazkirine. Dîsa PKK, bi meyzandineke xwe ya ji rêzê ve; nakokiyên ku li hember tişta aîdê mirove û dîsa li dij mirove biyanî dike, ji bona li ser bingeha afirandina welatê Kurdistan û gelê Kurd ji nû ve bi şêwazeke herî berhemdar bê nirxandin vesazbûnên rêze zincîrek îdeolojîk-polîtîke.**

**Lê, nakokî bi vî şêwazî nirxandin, ji destpêkirina çêbûna mirovahî heta mîna hebûnek siyasî-civakî weke rêbazekê bikar aniye. Bi rastî jî, tevî ku di navbera roket û tîrek de ferqek pir cuda heye, ji ya herî hêsan heta ya**

**herî tevlîhev hemû çek li gorî heman zagonên bingehîn kar dikin. Lê, hunerên ku yên çekan bikar tînin û bi riya van çekan armanca ku dixwazin bigihinê, heman çek di destên cuda de bi awayeke pir cuda, heta rê li ber armancên dijberî hev jî vedike.**

**Îdeolojî û polîtîka, bi taybet jî di demên şoreşan de, çeka civakan ya herî bingehîne.**

**Şêwaza nirxandina îdeolojiyê, ango polîtîka, weke şêweya sepandina wê cuda dike. Ev, tê vê wateyê: Heman îdeolojî, bi şêwaza polîtîkayên cuda dikare bikeve meriyetê. Heman îdeolojî, dikare bibe hedefên pir cuda, taybetmendiyên ku wê têxe meriyetê, di rewşên cuda de dikare encamên dijberî hev derbixîne. Wê demê, her kîjan îdeolojî, pêwîst bike jî, tenê bi serê xwe diyarker nabe; ya diyarker wateya wê ya çalekiyê ye. Di vê rewşê de, tişta ku diyar dibe çawaniya îdeolojiyê ya îzafî**

**derdikeve holê ye. Tenê ne ya îdeolojiyê, çawaniya îzafiya çalekiyê jî heye. Îzafiya çalekiyê jî, girêdayî hêza wê disepînê ye.**

**Di encam de her tiştê girêdayî mirov îzafiye.**

**Ji vê re, civata gelan, çîn, netewên ku rojeva şoreşane; her ku biçe neçare partî, artêş û enî jî bikevin navê. Ev ne çarçoveyek di derbarê nirxandina şêweya cuda ya diyardeyên ku ji dervî nêrînên xwe cuda dinirxînê de ye. Lê dîsa jî di heman demê de di derbarê binesaziya wan a cewherî de ye û ya esasî jî eve. Çawa? Di dîroka me ya nêz de weke ku tim tê dîtin, pêkhatineke siyasî bi awayeke herî tirsnak û hêsan dikare dijberî xwe bikeve, dikare bikeve nava karîgeriyek ku dijminahiya xwe bike û li ser navê xwe pêk bîne û xwe îmha bike. Dewleta sosyalîzma pêkhatî, bi partiyan re, dîsa di serdemeke nêz de rêxistinên siyasî**

**yên cûr bi cûr re qonaxa gihiştinê ev bi awayeke dijwar piştrast kiriye. Başe, her kîjan avaniyek siyasî, tevî ku mercên wê yên pêkanînê destdayî ne, ya ku wê ji pêkanîn û hedefê digire çiye? Bêguman astengên ku wê ji hedafa wê digire, her çendî çavkaniya xwe ji derveyî wê bigire jî, di esas de girêdayî çawaniya wê ya tê dîtine. Ango di nava civatek siyasî de, him hêzeke ku wê bigihîne armanca wê ya bingehîn, him jî hêzeke ku wê encamek berevajî bike heye. Ji xwe ev zagona diyalektîkê ya bingehîn bû: Tiştek, ji bilî dijminê li kêleka xwe, di heman demê de him bi xwe ye, him jî nexwe ye. Him dostê xwe ye, him jî dijmine.**

**Çiqas raste yên ku me bibîr xistine ne tiştên nû ne jî, tam fêmkirina heta yên PKK'ê, an jî bi temamî ji hêla hêzên şoreşger ên derçax ve jî baş fêmkirina wê ewqasî şaşe. Heta niha tiştên ku di**

**çarçoveya xwe de hatine nîqaşkirin diyare pirsgirêk nîne. Lê çarçoveyek di derbarê rêbaza dahûrandina civakî de, pêkanîna vê agahiyê nêzîkatiyên kevneşopî ser û bin dike. Ne tenê kes yan jî diyardeyên tekane, di heman demê de çîn jî bibin dijminê xwe, netew ji bo xwe ber bi qonaxa tinekirinê ve bibin tevkariya herî mezin dikin, partî di bin navê xwe parastinê de xwe tasfiye dikin, artêş di bin navê bidestxistina serfiraziyê de rastiya binkeftinên herî mezin derdixînin holê, lewra ne gengaze ku yên weke şoreşê berpisyartiya dîrokî ji wan tê xwestin van berçav negirin.**

**Rêbertiya PKK'ê ya di gotin de qet bal nade teoriya çînatî, ji ber di şêwazek giran de girîngiyê dide şerê çînî yê di nav partî,-gelemperî-sedemek wê heye ku bi qasî li hember dijmin şer dike di radeyek tund de vî şerî dimeşîne. Ji ber ku îro teoriya kevneşopiya civaka çînî, ji**

**rêbaza xizmeteke ku pêşkêşî şoreşê bike dûre. Dahûrandina kevneşop, çînan him di warê avanî de him jî di warê karmendî de heta bêjî di xetên asasî de ji hev cihe dike; şêwaza dahûrandina PKK'ê hema hema di hemû aliyan de civak, weke yekbûna hemû çînên têkilhevbûne nirxandiye. Di vê rêbaza dahûrandinê de, xet û bendek ku çînan ji hev cuda bike nîne. Di nava çînên herî jêr de, giraniya nirxên nakokiya di navbera du hêmanên zêde nêzî hev, dîsa di nava çîna herî bilind de giraniya nirxên nakokiyên di navbera du hêmanên herî nêzî hev, hevûdu rave dikin. Her wiha, di heman radeyî de ne. Bi heman şêweyî, nakokiyên parçeyî yên di nava çînek ji rêzê de jî, girêdana xwe bi nakokiyên di navbera gerdûnî û du çînan de heye. Şêweya vê girêdanê, çavkaniya xwe ji ber çînên civakî weke tayf –li nav hev ketin- xwe birêxistin kirine digire. Di**

**binesaziyên civakî yên nav hev ketine de, çîn têkil hev dibin, hêmanek çînî ya li her qadek civakî, di heman demê de ji yekî zêdetir xisletên çînî destnîşan dikin. Her wiha binesaziya civakî ya têkilhev bûye ne tenê ji bo çînan derbasdare; di heman demê de ji bo qewman jî derbas dibe. Di rewşa heyî de sedema ku mirov nikare xetekê dane navbera netewên Tirk û Kurd jî ji vê tê. Binesaziyên civakî yên di çarçoveya quralên mantiqî ku bi rastiyên gelemperî hatine destnîşankirin de Kurd û Tirk danasîn xwedî mezinbûnek wisa ye ku hewldanên di vê mijarê de dibin sedem ku yên têkil vê qadê dibin neçar dimînin ku xisletên herdu netewan bi hev re destnîşan bikin. Ji vê jî wêdetir, têkilhevbûn ne tenê çawaniya herêmên di navberê de ne; di herêmên netewî yên herî pak de jî têkilhevbûn berdewam dike.**

**Rewşa heyî ya bi vî şêweyî esasgirtinê ve rêbaza çareseriya civakî ya bê bidestxistin, tenê nade diyarkirin ku binesaziyên civakî têkilhev bûne; di heman demê de wê bê pejirandin ku qonaxên dîrokî û serdem jî têkilhev bûne. Wê wan jî li ser vî bingehî ji hev cihe bike. Wateya vê jî eve: Ev rêbaz, wê dîrokê; ne weke xelekek bûyerên paşerojê yên qewimîne destnîşan bike, dê weke yekbûna rastiyên çalak ên îro jî dijîn û jiyînê berdewam dike bipejirîne. Ti tiştek ku di dîrokê de qewimiye winda nebûye, an jî xilas nebûye; her tişta ku hatiye jiyîn, naveroka roja îro ye jî û her wiha bandora xwe jî didomîne. Mirov ne tenê kombûna tiştên ku wî bi xwe jiyan kirine, di heman demê de dikare weke kombûna dîroka ku encama wê ye jî bê destgirtin; di vê çarçovê de tê nirxandin û weke mijarek şoreşê tê darezandin. Her çendî destpêkê weke ku li vir bê**

**edaletiyek heye bê dîtin jî, ev; dîmenekî ku çanda emperyalist di roja me de di nava şaneyên civakî yên parçe kirine de dide ferzkirine. Ji ber ya herî zêde nêzî rastiyê, pêwîste mirov ne weke diyardeyek ji dem û derdora xwe razber bê destgirtin, berevajî vê pêwîste weke pêvajoyek bi derdor û dema xwe re di nava yekbûnê de bê destgirtin.**

***"Di felsefeya min de pêşî û paş, destpêk û piştre tineye. Her kes mirovê di hebûna xwe de veşartî bi min re dibîne. Dibêje ku;'Parçeyek min jî tu temsîl dikî.' Tişta ku di fîzîka wî de diyar dibe û di dîtinê de kesayeta ku dijî cuda ye. Di quncikek dilê wî de maye. Mirovek ku jiyan nekirî heye, ew jî ez im. Ev pir nêze, lê nixumandiye. Li cihek biçûk yê di dilê wan de ye. Hûn dikarin min weke kombûna wan bifikirin. Tiştek ecêbe. Lê ez ji bona xwe vê esas digirim."***

**Mirovê ku A. Ocalan 'temsîl'dike, di heman demê de mirovê di warê îdeolojîk de diparêze ye. Lê divê mirov baş bal bidiyê ev ne nûnertiyek polîtîk û leşkeri ya ji rêzê ye. Ji bilî xwe ji ber sedem an jî radeyekê kesên ku pêwendiyê pê re datîne digire nava xwe û dipejirîne. Ev jî dikare weke nûnertiya dîrokî bê destgirtin. Ji aliyê din ve jî, nûnertiyek ku darizandinê dike û nûnertiya şer jî, li ser binesaziyek wisa saz dike. Kesayeta Rêbertî, bi kesayeta civakî re têkilhev bûye ku di vê rewşê de baş diyar dibe; di heman demê de asta bingehîn a meşandina şer jî rave dike. Mantiqê meşandina şer jî, li gorî vê bicihbûnê pêş dikeve. Çawa? Rêbertiyek polîtîk û leşkeri ku di vê radeyê de bi civakê re girêdanek 'tayf' ( tayf: di zimanê Erebî de wateya peyvê, 'xeyalete'. Îng: phantom) saz kiriye û di vê çarçoveyê de li ser mantiqê şer û jiyanê bilind**

**bûye, zehmete ku bi ramanek rastiya kevneşop bê fêmkirin. Ji xwe, ew bi xwe jî li ser fikra redkirina rastiya kevneşop û nexasim rastbîniya kevnare a ku li ser tinekirina gelê wî pêş ketiye. Lê belê ev redkirin, bi rastî jî ne reve, encama hîn zêdetir xwe nêzkirin û nêzîkbûnek bi kûranî raberkirine.**

**Mijara redkirina rasteqîniya kevneşop, dîsa bi mînakek fîzîkê vekirin wê baştir be. Di çarçoveya mantiqê kevneşop ê mirovê bê amûr de, şewqa spî dîtinek gelemperî ye. Lê şêweya hemû rengên şewqê yên bi prîzekê ji hev hatiye cudakirin, ji bo me pêlên cûr bi cûr dide diyarkirin. Ango astên cûr bi cûr ku yek astî ava dikin dide diyarkirin; di ser van astên ji hev dûr, mîna bi çawaniya cewaziya di navbera asta sor û mor de û çawaniya, cewaziya du serên sor ên li kêleka hev dimînin jî heman tişte. Ti serê xeleka giştî bi ya din re neyeke.**

**Her serî her ku diçe weke asta pêlek bilind dibe, an jî pêlek nizm dibe nirxê xwe diyar dike. Wateya vê jî eve; ji bilî tevgerê û hevsengiya ku ji tevgerê ava dibe, ne tiştek dine. Dema di civakê de weke pêkhateya çînan tê destgirtin, bi prîza rêbaza çareseriyê re tê derbaskirin û wisa ji hev tê cudakirin. Lê belê ti deman, ti çîn taybetmendiyek statîk diyar nakin. Statîk nebûn jî, ji dervî zanabûnê wî pêş dikeve.**

**Hevsengiya bi tevger, dikare weke şêwaza herî girîng a di pratika PKK'ê ya civakî, polîtîk û şer de bê pejirandin. Li vir hêmana hevsengiyê tenê tevger tê esasgirtin. An jî ji bo rewşa nehevsengî bikeve rewşa hevsengiyek dayîm, xisleta tevgerê tê bikaranîn. Li nav PKK'ê tevger, dikare bê gotin ku bingeha hemû pêşketin û her tiştî ye. Ji bo ev têgeh bi şêweyek herî hêsan bê fêmkirin, mînaka bisikletê têrê dike. Ev amûra hêsan,**

**bi şêwazek wisa hatiye amadekirin dema bê tevger dimîne hevsengiya xwe winda dike. Ya bandor lê dike ji bo hêza bixe hevsengiyê wê di xetekê de bigre, divê tim di tevgerê de be. Dema tevger disekine, hevsengî xirab dibe û ji bilî vê jî tenê dema binyat xirab dibe hevsengî tê girtin. Ya ku civakan ji ketinê rizgar dike jî, tevgera wan a siyasî û civakî ye. Ya ku gelekî ji tinebûnê rizgar dike û ji nû ve jîndar dike; hebûna wê ava dike, hevsengiyek ku mirina wê jî berçav digire, ango tevgerek bi şer re yek tê nirxandin hevsengiyek tê xwestin PKK'ê serxistiye. Di vê wateyê de divê PKK di serdema me de weke bûyerek tevgera civakî û siyasî ya herî girîng baş bê lêkolînkirin.**

**Hevsengiyek bi tevger, ne tenê şêweyek nêzîkbûnan a di wateya civakbûn û siyasî de ye. Di heman demê de cewherek nêzîkbûnên**

**gerdûnî ye jî. Gerdûn bi xwe jî, di dahûrîna dawî de yekbûna tevgeran, rewşa hevsengiya tevgeran, an jî lêgerîna hevsengiya zêdetir nêzî teqezbûnê ye. Asta çawanî û zanebûna civakan çi dibe bila be, bingeha nêzîkbûnên siyasî û civakî ji destpêkê ve ava nakin; wan ji gerdûnê û xwezayê fêr dibin û pêk tînin.**

***"Arazî bi kûranî û berfirehî bikaranîn, asta yekîneyan gihandina şêwazek pir kêrhatî, veşartî, bi tevger û bi ferasetek çalakiyên şerê eniyan nameşînin sazûmankirin girînge. Şêwazek gerîla ku nediyare wê kengî û li kî derê li dijmin bixe, li her cihiye, lê ne li ti cihiye sepan girînge..."***

**Ma dikare şewqa spî di heman demê de weke şêweyek korbûnê bê nirxandin? Ji bo yên ne xwediyê rêbazên ku wan ji hev cihe bike, ma mirov dikare bêje ku, di heman demê de ji rengekê şewqekê, weke asta**

**herî jêr a şewqa spiye nabînin korin? Elbet mirov dikare bêje. Ji ber her çavê ku ji amûrên kûrbûnê dûrin û nabînin, di radeya vê rastiyê de kor in. Dikare bê gotin mirovê ku ne xwediyê amûrên bîrdozî, nêrîna cîhanî, nêzîkbûna jiyanê, rêbaz, dîsîplîn û hwd. dûrin korin. Ev neşaşe.**

**Em bêyî ku problemê zêde têkilhev bikin, dikarin bigihijin nêrînekê. Bi rêbaza kevneşop a ku civakê di warê çînî de dahûrînê re, pêwendiya di navbera rêbaza PKK'ê ya wê di astan de dahûrînê heman tişte. Pêwendiya di navbera gerdûna ku fîzîka Newton vedibêje û fîzîka Einstein vedibêje jî heman tişte. Ya duyemîn ancex dikare ya yekemin di çarçoveyekê de bipejirîne. Ji bilî wê di çarçoveyek berfireh de red dike.**

**Di nava PKK'ê de civak di şêweya astên siyasî de dahûrandin, ne tenê ji bo têkoşîna Rizgariya Netewî ya Kurdistanê xwedî**

**çawaniyek Netewî ye. Di heman demê de bi bandora pêşketinên zanistî yê gelemperî ve çêbûye.**

**Rêbertiya PKK weke partiya PKK'ê pêşketinên di nava 20 salên dawî de yên weke çalekiyên pêşxistiye, ne tenê ji bo rizgariya welatê Kurdistan û gelê Kurde, di heman demê de ji bo hemû mirovahî, şêwaza nêzîkbûna jiyana civakî ya nû rave dike. Ev jî nêzîkbûnek şoreşgerî ye. Qada pêkanînê çiqas sînordar dibe bila be, her çendî hedefên wan ên xweser welat û gelê wî eleqeder dibin bila bin; darizandinek di asta gerdûnî de digire nava xwe. Di encama vê darezandinê de li ser avahiya ku xirab kiriye, modela avahiyek nû pêşkêş dike. Li gel darezandina şêwazên jiyanê yên gelemperî, şêwaza jiyanek nû rave dike. Ya ku kombûna giştî ya dîrokê ye mirov darizîne û hedef dike ku**

**mirovekî nû ava bike. Van tevan jî di çarçoveya rêbazekî de pêk tîne.**

**Nêzîkbûna PKK'ê, Kurdistan kirina navenda li ser rûyê erdê û mirovê Kurd jî weke mirovê serdema me ya bûye krîstal, weke tîpê mirovê pênaseya herî rastî û gelemperî dest digire. Ev teza PKK'ê ku ji aliyê encamên dîrokî yên têkûz ve jî tê pejirandin, ji aliyekê ve jî rastiyên ku li ser zemînek têkûz xwe dide avakirin, ji aliyê din ve jî xwe li ser bingeha redkirina vê rastiya bi esil dibîne ava dike. Ev redkirin, asta şaristaniya roja me ji bingeh ve rexne dike.**

**Ev pirtûka di destê we de, ji axaftin, hevpeyvîn û dahûrînên ku Rêberê Giştî yê PKK'ê Abdulah Ocalan di demên cuda de kirine hatiye berhevkirin. Di mijara nêzîkbûnên felsefî yên derbarê mirov, dîrok û rojane de perspektîfên girîng dide. Weke gelek pirtûkên hatine**

**weşandin ev pirtûk jî, nikare nêzîkbûna Rêber Ocalan di nava yekbûnê de hemûyan bide. Lewma ya ku herî zêde felsefeya wî diyar dike çalakiyên wî fêmkirin, kêm jî be xwe nêzî kirin ji bo niha em di wê baweriyê de ne ku esera herî girîng û berhemdar eve.**

## DESTPÊK

### Şer û Huner

**Di derketina Rêbertiyê de peyama herî bingehîn, ferasetek bû; cihek ku xiyanet li jiyanê hatiye kirin û bi vê rewşa heyî ve jiyana ku neyê jiyankirin bû.**

**Beriya pêvajoya biryardariya weke partî xwe bi navê PKK'ê**

**birêxistin bike -ya herî rast bi civakek rast re, heta berî malbatê nas bike- di derketina kesayetî de dizanî ku jiyana daxwaz dike wê jiyan neke. Dîsa ketibû ferqa ku ev di bin tehdîtek civakî de ye, gelek dijminên wan hene û heta bêjî hatine kirêtkirin. Her wiha dê paşê bi awayek zanistî bihata peyitandin ku, bi qasî wêranbûna welat, bênasnamebûna gel û di koletiya kevnar de ketiye rewşek herî xirab, berhema vê jiyana nêzîkbûnek bi bertek li dijî tê raberkirin, dibe ku rastiyek cidî yek ji ya di salên 70'yî de hatibû bidestxistin derketina Rêbertiyê bû. Heke nêzîkatiya jiyana wê demê ya heyî bi vî rengî be, jiyana Rêbertî jî weke şerek li dijî vê wê pêş bikeve, mîna di her şerî de bûyî, ev jî bi awayê hunereke zirav ku neçare xwe bidomîne derket holê.**

**Îro li ser navê Kurdistanê gelek tişt tên gotin, qala wêje, çand û felsefê tê kirin. Bêguman, bi vî rengî**

**hatina ser ziman bingeha xwe ji taybetmendiya jiyana wê ya hunerî digire.**

**Pêkhatina Rêbertiyê çalekiyeke hunerî ye.**

**Heke îro li Kurdistanê gelek tişt li ser jiyanê tê gotin, tê nivîsandin, ji leşkertiya wê bigire heta dansên wê yên gel, gelek tiştan bidin qezenckirin jî; ev, tişta di kesayeta wê de tê jiyankirin beriya her tiştî bingeha xwe ji rastiya ku li ser dayî fikirandin digire. Bêguman heke dijminê jiyana wê evqas zêde be û jiyan bi her awayî kuştîbe, bixwaze di nava rastiya jiyaneke civakî ku ber nekeve tê de bê jiyankirin, di nav wê jiyanê de wate bigire jî; bi hunereke dahiyane dana jiyankirin, bîne asta jiyankirinê û ya herî girîng jî li hember dijminê xwe vê biparêze, pêşde bibe û bi qasî şerê vê dayîn, parastin jî mecbûriyeteke. Wiha ev jî girêdayî şêwazê serkeftina**

**jiyana mine. Serkeftin bixwe jî, nêzîkatiya xwe ya hunerî şert dike.**

**Weke her carê hatiye gotin, şer dayîka hemû bûyerên mezin yên hunerîne. Ya herî zehmet, heke di mercên herî bêteraz de xwe ji bo şerekê amadekiribe û ger ev şer wê ji bo gelekî binkeftin encam bibe, em dikarin bêjin ku ev jî serkeftineke. Qet nebê wê dawîbûna jiyanek kirêt be; lê ger îhtîmalek li ber serkeftinê şansek girtibe û derfetê wê çêkiribe, ev jî bûyerek awarte ku dil û mejî derbas dike û wê weke di dîrokê de gelek caran di rastiya pêxembertiyê de hatiye bilêvkirin, ev jî weke derketinek mucîze bê nirxandin. Mucîze ji xwe, bersiva têgehek dil û mejiyê rojane nebîhîstî, dê nebihîse jî pêşketinek pir pêşveçûyî û pir cewaz derdixe holê ye.**

**Li gorî pîvanên rojane fikirîn û jiyankirin, bi ya mûcîzevî re bi nakoke. Ya mûcîzevî, berevajî**

**fikirandin û gelek di ser bihîstinê rojane re, heta tê wateya xwe gihandina rewşek berevajiya wê.**

**Îro heta bêjî hatiye fêmkirin. Heta girêdana mirovek herî ji rêzê ya bi nirx be jî, ne gengaze ji şêwaza vê jiyanê razî be. Tangavî, qehir û êşa wê ya herî bingehîn di nava wê de ye. Ev neya heyî ye, ya pêkhatiye û ji mejiyê xwe derxistiye. Heta êdî yên li hember pêkhatina Rêbertiyê disekinin jî parve dikin.**

**Li vir tişta herî girîng bêguman wê yek ferd çawa bikare derketinek wisa pêk bînê ye. Heke li vir pênaseya hunerê ya zirav bê bidestxistin, dibe ku ji bo xwe encamên girîng derbixe. Ev; biqasî lêkolînê, bihîstinê jî pêwîst dike. Heta kesê ku vê rastiyê jiyan dike, ji tişta gotî û bihîstî zêdetir dibe ku herî zêde fêmkirin û bihîstin pêwîst bike. Kesayeta ku vê temsil dike ne raman û hesteke teqez a raste. Dibe ku kêm**

**jî bimîne; lê ji ber kesayeta herî mijûle, mîna bûyereke hunerê ya mezin lêkolînkirin heta bêjî di cî de ye. Pêhesîna wê heta bêjî bi xiroşe. Dîsa heke em rojane li rastiyê temaşe bikin, xiroşa herî mezin li dora kesayeta Rêbertî tê jiyankirin. Bi qasî hêrsa herî mezin ku li hember wî tê raberkirin, ew çend jî hezkirin tê raberkirin. Bi qasî qezenckirina dilê bêhempa, cûcetî jî li dora wî pêkhatiye. Bi qasî çêbûna kesayetên leheng, kesayetên herî beredayî jî di nava vî şerê Rêbertiyê yê bi nakok de derketine holê. Naverok û şiklê vê her çendî berfireh be, Elbet ên li dora wî êdî bi vegotinek hestiyarî ve nikarin raman îzah bikin, ango wê ji bo nêzîkatiyên hunerî jî her ku biçe derfet ava bibin.**

**Yên bi îdîane çi ji bo xwe çi jî ji bo her çi xebateke civakî, siyasî û leşkerî bimeşîne, pêwîst dike bi her awayî ve vê pêkhatinê binirxîne, him**

**jî weke hunereke herî zirav. Ji bo nagihin qonaxê, yan di çep, yan jî di rastê de bere derbas bûne, şansê wan yê serbikevin nîne. Nakokiyeke bi vî rengî jî tê jiyankirin. Ya ku mijara gotinê ye, Rêbertiyek xwe herî berfireh û herî zêde vedibêje ye. Daxuyaniyên herî kur ku bibe mijara hezaran pirtûkan, ji her kesî re vê dibêje: "*Heke min fêm nekiribe, sûçdarê herî mezin ez im.* " Çima? Ji ber di nava aliyên wê yên înkarkirina rojane de xwe ferz dike û heta di nava rastiya dijmin de fetisiye. Mejiyê wî hilweşiya ye, dilê wî hilweşiya ye û wê fêm neke. Gotin, çav, guh her tim bi şêwazê derewan fonksiyon digire. Her wiha, ger kesayeta Rêbertî û huner, di kesayeta Rêbertî de hunera leşkeri, hunera siyasî, bi nêzîkatiyên cûr bi cûr yên hunermendên di qada civakî de bixwazin pêwendî bidin çêkirin; ji roja derketina Rêbertî heta roja me ya îro her ku diçe kûr dibe,**

**berfireh dibe û hemû taybetmendiyên wî yên ku teşe digire, bi qasî rexnekere ewqas jî bi hestî nêz dibe. Di îzahkirina rastiyan de him fêmkirin him jî di wî de şûnek çalak girtin ji bo yên ku îdaya wan heye, hêzeke mezin wê bide avakirin.**

**Îdîaya ku mezinbûna Rêbertiyê çavkaniya xwe ji hestên wî digire, îdîayek gelemperî ye.**

**Bêguman bi her rêberekî re hest roleke mezin dileyîze, lê di rastiya me de heta bêjî pêwîstî bi lêkolîna asta hest heye. Ne zehmete ku pîvanên heyî bi asta hestan ve bê ravekirin.**

**Gelo nêrîna dibêje mezinbûna Rêbertî çavkaniya xwe ji hest digire tê çi wateyê?**

**Mezinbûn, herî zêde aliyê ramanî rave dike. Ezîm, xiroş, rik, hêrs, hezkirin, dildarî, welhasil tiştên bi navê îrade giştî tên qalkirin, têgiha hest eleqeder dike. Di vir de bi qasî fêmkirina çavkaniya ramanê mezin,**

**ewqas jî hewce dike çavkaniya hest û ev hevdu çawa xwedî dikin bê fêmkirin.**

**Çavkaniya hest çiqas ber bi çavkaniya raman ve bir, fikirandin çiqas rê li ber pêşvebirina hestan vekir?**

**Ji bo şaşî neyê kirin, pêwîste çavkanî û girêdana di navbera wan de rast bê nirxandin. Ev gelek vekiriye, heta ku kesayeteke aliyê wê ya hestî ne li pêş be, hema hema dil ziwa dibe, her çendî rastiya çav bi qasî bûnewerekî herî hov jî watedar nabîne, şaş dibîne, mîna daxwaza dijmin dibîne, di heman demê de guh jî tiştên ku dijmin dixwaze dibihîse, hemû jêhatiyên hestewar bi vî rengî dirizin, di rewşeke ku ji pêkanîna fonksiyona xwe ya asayî dûr de; cîh dana hest şertê sereke ye. Ger di hestan de xet, di hestan de kûrbûn, di hestan de dijwarbûn û di hestan de**

**sihêm nebe; wisa di nav nivîneke miriyan de, rê li ber vejînekê venake.**

**Zemîna civakî ya gelê me li ser jiyan dike, nivîna miriyane.**

**Ma ne em carna komên hestiyên di wargehên Hîtler yên lê komkujî çêkirî dibînin. Li gorî min ew dîmen jî, ji rastiya em jiyan dikin zêdetir xirabtir nîne. Xweziya aliyeke me ya ku koma hestiyên me mayînê hebûya! Ev rewş li gel me zêdetir xedare. Weke ku jiyan dike, lê çala ku melevanî tê de dike dilopek tenê jî ava pak nîne. Heta qirikê noqî bûye, lê dibê "*ax*" û "*min çend qurt ava zelal vexwar!*" Dengên tên guhan wî jî wisa ne, dîmenên ku çavên wî lê dikevin jî wisa ne. Êdî fêrî vê hatiye kirin. Ji ber wê bûna xwediyê şêwaza livîna mirinek wisa heta bêjî tirsnake. Lewra gengaze ku di Rêbertî de qala hestek wisa bê kirin. Yanî li hember rastiya civakî di nava nêzîkbûna hestek wisa de bûyîn; ku ya bi çav**

**xuya dike û ji guh re xweş tê zêde neyê tehemûlkirin; lê ger ji şiyarbûna mirovî ya ji dîtin, bihîstin, sehkirin naxwaze bi ti awayî devjê berde, loma ji derveyî hêza hest bidestxistinê zêdetir çareyeke din nîne. Bi nêzîkatiya *"Kesayeta Rêbertî gelek baş dibîne, ji dengên weke dahî û hestan wate derdixe"* gotin, li gorî min pesindayînek zêde ye. Lê bûyereke li vir diqewime heye. Yên di nava deryaya mirinê de û avgîr de jiyan dikin, di rastiya jiyana wan de ferqek daniye holê. *"Ez ê di vê deryayê de melevanî nekim û di vê avgîrê de negerim. "* Wiha ev cudahî dikare rewşa mezinbûna hest rave bike. Wê, bi ti awayî weke we neyê jiyîn. Heke rêgezeke mezin hebe, ew jî dibe ku ev be. Elbet her kes vê dibêje, lê di jiyan û hestên xwe de bicîh nayîne. Bi kinahî bin dikeve.**

**Heta di vê mijarê de yê ku dibêje ez bi îdame jî dikarim bêjim ku bin**

**ketiye. Heke hinek hestên baş hebe jî lewaze, şansê serkeftinê nîne û piranî jî têkiliya qirêjiyê ye. Em nikarin bêjin ku zêde jê cuda kiriye û di vê wateyê de jî cudahiya Rêbertî mezine.**

**Ez bawerim welatek yan jî gelê di rastiya welatek de jiyan dike û vê rêbertiyê bînin beramberî hev, hestên heyî di avgîrên qirêj de melvanî dikin, lê nefesa xwe ya dawî dide, dişibe rewşa masiyên ku ha miriye, dê bimire. Lê dîsa em bêjin ku qevastineke mucizevî ye, ev masî êdî dipeke û li gorî xwe kaniyeke paqij dibîne. Li vir îdaya xwe ya jiyanê didomîne. Hêjî gelek tiştên ku bên gotin hene. Hêjî gelek rexneyên ku di derbarê hestan de bên kirin hene.**

**Heta hinek dibêjin em gelek hez dikin, evîndarek pir çavkorin, lewma gelek rondik dibarin. Înad û hesûdiya di nava rastiya me ya civakî de gelek zêde ye. Di vê mijarê de yek bi ser me re nîne; lê hemû tiştên ku van rave**

**kirine, perpitîna ji nava ava gemar ku tê de nayê jiyankirine.**

**Mixabin ez nikarim ji van re bêjim hest, ez ê jê re rêz jî negirim û bawerim ez vê yek ji aliyê xwe yê herî xurt dibînim.**

**Ez ê weke we jiyan nekim.**

**Her tişt dikeve nava vê. Heta bêjî ez ê dijber bim. Heke min eltarnatîfa wê dît, bi qasî min dîtî jiyan bikim. Heke nebînim jî, qet nebe weke keseke bibim xwedî bawermend û bîranîn. Ez weke xwedî kesayetek zikirkirî şêwazeke razber ku ti kes nikare di ber re derbas bibe hilbijêrim û tenê razber jiyan bikim. Ez ê tevlî qirêjiya vê şênberê nebim. Hîn zêdetirîn tiştên ku bên gotin, bêjin em ji kesayetên ku *"êş, rondik, qaşo li gel dilin û her tim hestên me pelqik dide" bilêv bikin jî*; weke ku destnîşan kirine xiyaneta herî mezin li hestên pîroz dikin. Ez bûm nebûm di gelek gotinan de min ji xwepêşandana**

**hestan nefret kir. Ez vê hêjayî jiyankirinê nabînim, dîsa di min de rastiyek duwemin a bingehîne. Wisa jiyan nekirin, lê bersiva pirsa wê çawa bê jiyankirin jî li gorî xwe bikaribe bi hesteke afirînêr bersiv bide. Em dikarin qala bisînorbûna wê ya afirîner bikin. Ev hinek min têrdike. Lê netewbûna vê û bûna serdestê hemû welat jî şereke mezin dixwaze. Ji xwe ev şerê tê meşandin jî ji bo vê ye.**

**Şer, di heman demê de çalekiya afirandina hestane û ya hestên rast û mezine. Her wiha şerê agir, çalekiya paqişkirina avên qirêj ku tê de melavanî tê kirine. Di vê çanda ku tê de jiyan dikin pak, bikaribin di nav de melevanî bê kirin û bînin rewşa bê vexwarin. Yanî ev çalekiya civaka xwe anîna vê rewşê ye. Mezinbûna wê jî ji ber vê sedemê ye. Qehremaniya mezin ku ji bo wan bê pêşkêşkirin jî divê wisa bê fêmkirin.**

**Bi taybet şehîdên me yên jin-xort ku bûne malê dîrokê hene. Ji Zîlan, Mazlum, Kemal, Xeyriyan bigirin heta Egîd'an bi hezaran qehremanên şer wateyeke wiha temsîl dikin.**

**Ya Hov û Hemdem**

**Di felsefeya me ya şer û jiyanê de, bêguman dikare meyzandineke kevnare û roja îro digihîne hev bêhîskirin. Ez her dem pêşveçûna şaristaniyê bi heyranî pêşwazî nakim. Di nava vê de gelek qirêjî, li hember mirovahiyê pêşxistine dibînim. Ji bo nekevim nava vê xefkê hov mayîn, herî kêm bi gelek aliyên xwe ve paşketî mayînê dihilbijêrim. Difikirim ku dev ji hovbûnê berdan xeteriyek mezine. Bi awayeke giştî rojaneyîbûyîn, li gorî min di asteke girîng de devji mirovbûnê berdane. Bêguman ev nêzîkatiyek pir girîng a birêgeze.**

**Xwe tenê di roja îro de dîtin, tê wateya ji koka mirovahiyê qutbûnê. Heta serdeman û ev qonaxa her serdemekî, wisa dîrok beş kirin, weke ku serdema destpêkê pir hovbû ku hema em jê rizgar dibin nêzîkatiyek wisa felsefîk heta bêjî xeternak e. Heta dema ku em li nebatekê temaşe dikin, şitilek taze, herhal ji dareke rizî bi qîmetire û hêviya jiyanê dide. Ne diyare ku şaristaniya niha bi temamî weke darek riziyayî, ji hêz ketî û berhemdariya xwe ya fêkî dayînê jî ji dest nede?**

**Ji hêla zanist-felsefê ve îdakirina zeman her tim di nava pêşveçûnekî de ye zêde neraste.**

**Destpêk û dawî, bi gotineke din heke di navbera destpêk û dawî de hilbijartinek bê kirin; ne gengaze bê gotin ku kîjan pir başe, kîjan pir xirabe.**

**Dibe ku destpêk jî û encam jî pir bêhempa bin.**

**Wiha nêzîkatiya li beramberî dîroka hov, dîrok her tim xirab girtina dest, "*mîna serdema wehşî, serdema paşketî*" destgirtin, îro jî bilindkirin, nêzîkatiyeke felsefîk a xeter e.**

**Wiha, îro bi awayeke post-modernîst derdikeve pêşberî me. Di kesayeta Rêbertî de bi misogerî li beramberî vê hov mayîn parastin hîn binirxtire. Bi kinahî mirov çiqas di seretayî de be, divê ew çend jî encam hebe. Destpêk, îro, heta duh bi watekirin û anîna gel hev; weke nêzîkatiyek felsefîk hîn binirxtire.**

**Di vê wateyê de rexneyên me yên tund li hember nirxandinên şaristanî û medenîbûnê hene. Ji ber di hemûyan de li beramberî destpêka derketina mirovahiyê nêzîkatiyên bêrêzî hene, heta aliyê wê yê înkar dike pir zêde derdikeve pêş. Her şaristanî xwe bêhempa dihesibîne, her encama destpêkê ji nedîtî ve tê, heke em hinek din şênber bilêv bikin,**

**heta ku mirov weke cureyek ji holê rabe, bi awayeke giştî dê weke destpêkê lê bê. Wê pêvajoya pêkhatinê, hemû pêşeroja wê diyar bike. Bi awayeke giştî taybetmendiyên destpêkê çawa be, wê wisa bidawî bibe. Heke ji cureyeke din yê mirov derketibe ew êdî nabe mirov.**

**Ger mirovê îro, ji mirovê hov pir cuda be li gorî min ji mirov zêdetir mirove. Tişta ku ji mirov jî derdikeve mirovê niha ye. Her wiha tişta bê rexnekirin jî; herî zêde bi awayeke xeter mirovê ku koka xwe înkar dike, qaşo yê ku xwe bi pêşveçûyî û teknîka bihêz diwerimîne û tîne rewşa cinawirê xerckirinê ye. Ev cinawirê xerckirinê çawa ku dîrok tine kiriye; dîsa xweza, ser erd û bin erd çawa aniye rewşeke lê nayê jiyankirin û ger ku tedbîrên vê neyên girtin wê bi temamî mirov daqurtîne. Ev rastiyeke zanistiye.**

**Her wiha vegera li mirovê hov, vegera li şêwaza jiyana wê; ne paşketineke, ne libîrhatina serdema pêşiye, nêzîkatiyek bingehîn ya rizgariya mirove.**

**Nexwe wê mirovê îro; tişta ku afirandî û mirovahî bi hemû aliyên wê ve; bi dîrok û pêşeroja wê ve gef lê dixwe xwedî teknîka herî mezin û şêwaza wê ya civakiye, ev di rewşa amûreke tinekirinê de ye. Ji ber vê sedemê rexneyên me tundin û pêwîst dike ku baş li ser bê rawestandin.**

**Em bi têkoşîna xwe li dora nasnameya xwe hatine sitirandin. Di vê wateyê de weke hêmaneke vejînê bêguman em ê civakbûnê bixwazin. Her wiha wê mirovê Kurd yan jî mirovên ku bandor dibin cewaz bin. Madem ewqas rêxneyên me yên tund yên civakî hene, madem heta rexneya şaristaniyê jî ewqas bi rêgez tê kirin û ji bo vê şereke mezin yê veguherinê tê dayîn, wê demê kesayeta ku ava**

**bibe wê azadiyeke diyar di nava xwe de vehewîne. Dibe ku bi temamî ji taybetmendiyên mirovbûnê qut bûye. Tenê di warê fizîkî de ku dişibin mirovan di wateya rastîn de dikare bibe mirov. Serkeftina vî şerê min; ji şerê Rêbertî yê nasnamê bigirin heta xususên herî zirav, meyzandina ji mirov û kes re, di rastiya ku wê çawa biparêze û pêşbixe de radixe ber çavan.**

**Mirovê berê, ji bersiva pirsa "*Armanca bingehîn ya civakî çiye?*" gelek dûre. Em bêjin ku her kesek li gorî xwe armanceke xwe ya bê binî heye, ji bo bigihe şêwaz û tempoyek xwe heye. Lê di encam de sifir ser sifrê re ye. Bi temamî mîna cûreyê bergirê, li dora paşverûtiyên civakî dizivire. Navber sifir. Bi qasî ku şêwaz û tempo; tişteke xilas neke belengaz û girane. Her wiha mirovê nû; girêdana wî ya bi armancê re û ev girêdan divê xwedî taybetmendiya**

**civakî, siyasî, netewî û gerdûnî be, ya herî girîng jî sedema vê ya bi şer re afirandî, ji rêxistinkirina pêvajoya şer, em ji xususên stratejiya şer bigirin heta taxtîkên şer divê têbigehe, bi qasî afirîner be divê bizanibe xwe biparêze, bi qasî hestên gelek bihêz, divê hêza fikir bikare rewşê xilas bike bide diyarkirin, bi qasî dewlemendiya hest lewra divê xwedî hêza fikir jî be.**

**Ji ber ku tişta pê re şer dike hew ne dagirkerî, paşverûtiyek gerdûnî ye. Mirovê li hemberî paşverûtiya gerdûnî û nûnerên wê yên xedar ku di xaleke mirî de bi ser xwe ve radibe û xwe diafirîne; ji ber vê sedemê li hember paşverûtiya gerdûnî ya pêşveçûyî, ango taybetmendiyên azadiyê ku em dikarin bêjin li gorî xwezaya mirovin wê têbigihije.**

**Ev; dibe di nava malbata mirov de paşverûtiya herî kûr, li hember nûnerên wan yên herî xeternak jî hemû pêdiviyên şerê di kesayetên**

**xwe de afirandine û di vê maneyê de tê wateya çêbûna afirandina kesayeteke nû û xweser. Yê ku vê negire şansê wan yê jiyankirinê nîne. Weke ku wê şansê jiyanê çênebe, şansê ku weke mirovek bê qebûlkirin jî wê nebe. Di vê xalê de bi temamî kesayeteke him netewe, him jî gerdunî di nava şer de afirandin, wê li gorî serkeftina quralên wê yên bê eman pêkbê. Yên ku negihin vê û yên ku wate nedin vê jî, qet nebe ji dêla jiyaneke beredayî, wê li benda mirineke bi şeref bin. Di vê wateyê de di çûyîna mirinê de jî, di rizgarkirina jiyanê de jî tiştên ji bo mirovên me rû didin, di şênberiya me de ji bo mirovahiyê gelek girînge û herhal pêkhatina herî mezine.**

## Kurdistanî û Gerdûnî

**Bêguman dahûrandinên di derbarê mirovên Kurd de tên kirin bi**

**qasî li rojaneya kapîtalîzmê ne, di heman demê de li hemberî mirovên ji dîrok û axa xwe biyanî bûne jî. Di vê hêlê de bi qasî dahûrandin radîqalin, bi qasî ku mirovên xwe diafirîne, bi giştî hinek taybetmendiyên mirov ên gerdûnî jî şênber dike. Weke çawa ku di felsefe û hemû olan de heye, li vir jî em rûbirûyê hinek rastiyanin. Her çawa ku rastiya Kurdistanê ji aliyê hemû dinyayê ve hatibe jibîrkirin û bi awayekî xweser ti peywendiya wê bi rastiya gerdûnî ve neyê dîtin jî; ger hinekê jî bi cewheriya wê bê mêzekirin wê bê dîtin ku tişta pêkhatiye gerdûnbûne. Ger ev xak dergûşa mirovahiyê be, mirovê ji vê dergûşê ewqasî qut bûye, nirxên wê teqdîr nake dûrî rastiya gerdûnbûnê ye û dîsa wê bê fêmkirin ku mirovên ji nû ve di vê dergûşê de mezin dibe bêtir nêzî rastiya gûrdûnbûnê ne. Her çiqasî li gorî pîvanên rojaneyî weke hoveber bê dîtin jî, tişta tê hişînkirin**

**biqasî mirovên gerdûnê yê berbanga dîroka mirovahî ger veguheze têgihiştina gerdûnî, ewqasî hemû rêgezên jiyanî xwediyê nirxa moralê ye jî. Tişta tê hedefkirin ev tişte, ger di şerê Kurdistanê de ev kesayet serkeftinê dest bixe, bêguman wê bi xwe re bi qasî vê rastiyê bandoreke gerdûnî jî ava bike. Vê xakê di dîrokê de gelek rê li pêşiya van tiştan vekiriye, ji bona careke din jî rê veke ti sedemek dijber nîne.**

**Weke encam di pêkanîna Rêbertiyê de têgihiştina bingeh a bê zanîn eve; teqez wê tu yê mîna berê jiyan nekî!**

**Lê tişta weke nûjen tê gotin ango mirovî ye, tişta xweser û ger tu li gorî ya azad bixwazî jiyan bikî, bi zanebûna ku ev bi şer tê tayînkirin tê wate bidî xwe.**

**Tu dixwazî bihizirî, divê tu di nav şerê pêkanîna Rêbertiyê de bî.**

**Tu dixwazî bibihîzî, tu dixwazî hez bikî, tu dixwazî evîndar bî, tu dixwazî fermandarek mezin bî?**

**Bersiva tu bidî van hemû pirsan, dîsa bersiva tu bibînî û bigrî, esas girtina pêkanîneke wisa ye. Tişta em li vir dibêjin afirandina mirov a xwe ye, di kesayeta mirovekî de tişta bi rastî bê jiyankirin derdikeve holê. Ji ber vê jî divê tu hemû jiyana xwe ya kevin deynî ser mêzeya emeliyatê, ger bi jan jî be tê nexweşiyên xwe bibînî û dema pêwist bike tê hinek cihên xwe bavêjî, tê xwê bikî, derman bikî, gengaz e ku bi awayekî tendurist ew alî jîndar derbikevin. Tişta pêwist jiyan bike. Dîsa bi vegotinek cuda em ji kes, malbat, têkiliyên jin û zilam ku bi tevahî li ser nirx û moralên nûjen înşakirinê bigirin, heta dewletbûneke mezin, ji hemû polîtîkayên hundur û derve, ji nirxên civakî ên moralê, heta aliyên wê yên aborî, di mijara Rêbertiyê de şerekî gelek mezin pêk**

**tê. Ti wateya seranser û teng mêzekirinê nîne. Ev bi qasî vîneke şahane û hêstan barkiriye, di heman demê de bi têrbûnek ramanê pêktê. Di heman demê de bi qasî bi deheya leşkerî pêktê, bi watedayîna hemû ziraviyên siyasî û rêxistinî jî pêktê. Dibe ku di asteke bi qasî di ti şerî û kesayetên Rêbertiyê de neyê beramberî hev, bi armancên şer ên mezin, şêwaz û tempoyê pêktê. Meydaneke wisa ya Egîdî ye. Kesên bixwazin li vê meydanê encam bigirin, divê wate bidin şer û şêwaza wê jî. Ger ne wisa be wê xwe bişewitînin.**

**Ev xusûsên bi pêkanînek bi sînor ve me derxistin holê, bi pêşketina şerê me, dîsa kêm-zêde bi bersivên em bidin pirsa çawa bê jiyankirin, di dorfirehiya pêşketina civakî de em ê nîşanî dijmin, gel û hemû mirovahiyê bikin. Di vê mijarê de ti carî bawerî û moral kêm nebû. Metirsiya me li ser şêwazê serkeftin, rê û rêbazê bû, di**

**vê de jî pisporî pêşdikeve. Her wiha êdî hebûn û nebûna fîzîkî pir negirîng e. Li ser pêşketinên derketine holê bi nirxandinek ji rêzê jî, ji bona nemezinbûn û neserkeftinê jî ti sedem nemaye.**

**Hemû tişt ji hemû deman bêtir şansê serkeftin û jiyanê dide.**

**Gulan 1997**

## HUNER, WÊJE Û GİYAN

**Pêşketina civakî, li ser bingeha rexneya rastiya civakî ya ku kesayeta**

**divê dev jê bê berdan pir dide axaftin derdikeve holê. Bi vî rengî di şêweya jiyana ku encama kombûna têkîliyên civakî ye û kesayeta hatî pejirandin dide axaftin, rastiyek zêde dahûrîner û veguherîner rave dike.**

**Di teşegirtina netewî de kêliyên veguherîner ên çawanî, kêliyên şoreşî ne.**

**Ji bo pêkhatina her çêbûna civakî, şoreşa ku tê wateya serûbinbûnek bingehîn, destpêkê li qada zanistî pêş dikeve. Pêşketina zanistî jî hîn şênbertir, bi rêxistinî û çalekgeriyê re; tasfiyekirina têkîliyên jorsaziyan ên teng û li pêş jiyanê astengin, weke erkek girîng ji xwe re esas digire.**

**Bêguman hewldanên fikrî yên Tevgera şoreşgerî, heta ku li dijî fikrên kevin û bîrdoziyan têkoşîna xwe ji kûranî ve bimeşîne, wê naveroka bîrdozî û xeta xwe derbixe holê. Her wiha wê dîsa vê têkoşîna**

**xwe, dema li dijî saziyên jorsaziyan ên heyî di hewldana pratîkî de nîşan da, êdî nikare di nav qalibên zagonan de bê girtin. Bi rêbazên zagonî û aştiyane têr nabe. Wê hewl bide bi rêbazên tundî xeta xwe ya siyasî veke. Pêşketina siyasî hewce dibîne. Bi vî rengî destpêkê li qada bîrdozî û paşê jî qada siyasî pêşketina şoreşgeran derdikeve holê. Ger tundiya şoreşê, birêxistinkirî û hûrûkûr hat sepandin, wê têkoşîn ber bi qada leşkerî ve biherike. Lewma pêşketina şoreşî ya bîrdozî û polîtîk jî berdewam dike. Ger bigihe serkeftinê, wê jêrzemîna xwe jî veguherîne. Şêweya hilberîna kevin biruxwîne. Têkîliyên astengiyê çêdikin berteraf dike. Di serî de têkîliya sermiyana nû, ji bo pêşketina hêzên hilberînê çarçoveyek guncav ava dike û hewl dide pêşketina wê temam bike.**

**Şoreşa di jorsaziyê de dest pê dike, her wiha jêrsaziya xwe jî têkûz vediguherîne. Di vê derê de pirsa herî girîng ku bê bersivandin eve: Erka wêjeyê çi ye? Ango pêwîste bi giştî huner, bi taybet jî wêje û dîsa ew romana ku beşek girîng a vê yekê ye bi pirsa erka şoreşî çiye, ku em bibersivînin. Ger huner nebe em nikarin qala civakan bikin. Lewma huner, ji bo civakbûyîn û pêşketina civakî amrazekî jênegere. Bi taybetî, ji ber ku mirov nêzîkatiya xwe ya li hember xwezayê bi zanistî û bi polîtîkayê tam nikare dahûrîne û nikare giyana xwe bi têrbûyîneke daringî têr bike, wî ber bi teşeyek têrbûneke cewaz, yanî ber bi hunerê ve dibe. Di vê wateyê de huner, derbaskirina pêdiviya giyanê esas digire. Bêguman pêwendiya vê bi raman ve heye. Bi hêsanî mirov dikare diyar bike ku huner, warekî pir girêdayî xwe vedibêje.**

**Gelek teşeyên cûr bi cûr ku xwestekên giyanî di nava xwe de peyda dikin, weke berhemên hunerî derdikevin pêş me û her wiha têrbûna arişî pêk tînin. Berhemên pergalê jî dem bi dem hunerê bandor dikin. Dîsa pêşketina polîtîk jî pir ji nêzîk ve pêwendiya xwe bi huner re dide avakirin. Lê ji van tevan re em nikarin bêjin huner. Di aliyê din de, di polîtîka û aboriyê de mirov dikare qala hunerê bike. Gelek bîrdoziyên curbecur nêzî huner dibin. Di vir de ya bê têgihiştin eve ku; huner ji faktorên civakî yên din zêde bandor dibe, lê naşibe wan ango dibe siyeke wan a pasîf. Lê belê weke pêdiviyeke çalek û jêveneger jiyîn û hîskirina wê mijara gotinê ye.**

**Dikare bê gotin ku jiyan, li gor pêdiviyên mirovahiyê bi teşekirin, di vir de tevahî amraz û rêbazênku tên dîtin, dikevin berfirehiya hunerê. Bûyera ku em dibêjin dengekî xweşik, dîmenê bi çav xweş tê, helbest ango**

**destana baş a ku xîtabê giyan dike weke cureyekî hunerê tên nirxandin. Dibe ku ev tinebin jî jiyan bidome, lê ev yek razberkirineke. Di her nihêrtinê de heman veqetandina xweşikbûn û kirêtiyê heye. Dîsa di her nêzîkatiya giyana mirov de tiştên ku li xweşê diçin û naçin hene. Libat û tevgerîna baş heye, libat û tevgerîna şaş heye. Lewma civakek yan jî takekes her çendî bilind dibe (bi taybetî dema ku çalakiyên hunerê dibe mijara gotinê) ku pêşketin hatibe pêkanîn yek jî di vî alî de dibe derbirîna pêşveçûnê. Yekî ku di nava teşeya hunera pir paş de maye ango di nava teşeya libata pir paşdemayî de seyr dike û diçe, qala hovebertiya wî tê kirin. Kesayeta ku kûrbûna giyan û dewlemendiyê bi xwe re peyda nake, ji mûzîk, dîmen û bi her awayî teşeyên lebata huneriyên curbecur bandor nabe û nakeve ferqa vê yekê, rehên jiyana wî ziwa bûne.**

**Lewma, kêrhatina civakî ya huner bê nîqaşe. Bêyî wê jiyan tenê dikare nêzîkê jiyaneke ajalî seyr bike. Sînorê ku ajal, bi mirovatiyê re dibe yek, dikare biderbirîne. Ev, ne jiyaneke ku were pejirandine.**

**Bi vê wateyê di her qonaxa pêşketina civakî û pêngavên çawaniyê de rastiya pêşketinê ya hatiye pêkanîn, di heman demê de rastiya pêşketina hunerê jî dide diyarkirin. Ji xwe qonaxên civakî yên serûbinbûnên girîng, di heman demê de bi hewldanên hunerê ve darîçav dibin. Her serûbinbûn di destpêkê de li warê hunerê pêş dikeve; him hunerê bandor dike, him jî jê bandor dibe. Bi taybetî qonaxên şoreşî, weke ku bi hunerê tên amadekirin, di gihandina teşeyên çawanî û xurt de bandorek girîng çêdikin. Huner bi vê wateyê li hember zoriyên jiyanê henase wergirtineke firehe. Yanî ew giyana mirov a ku teng bûye, bi hemû**

**behremendiya pêhesîna xwe ve fireh kirine. Bi tiştên heyî û kevin qîma xwe pê ne anîne. Qîma xwe pê ne anîna wê jî, hêz qezenckirine. Dikare pênasa şoreşa hunerî wisa bê çêkirin.**

**Civak û welatê Kurdistan dema ku dibe mijara gotinê, di pênaseya giştî ya guncîn a hunerê de tişta ku dikare bê gotin, tevahiya civakê di mercên feodal û mêtingeriyê de hatiye rewşeke ku nikare henase wergire, xwe bide pêşxistin û ev yek jî, li ser hunerê bandorek pir neyênî çêkiriye. Lê belê di vir de ya herî girîng eve: Gel, di gelek dezgehbûnên jorsaziyê, têkilî û hêzan de tevî ku pir zorayî kişandiye ango hatiye qedandin, lê sînordar be jî, xwe tenê bi huner dikare bide jiyîn, dîsa derbirîna nasnameya xwe dikare tenê bi hunerê bidomîne. Em vê yekê dibînin. Ev yek jî hêza huner nîşan dide. Huner dibe taybetmendiyeke**

**civakî ya dibe ku dawî bin bikeve û bê windakirin.**

**Erka Huner a Şoreşgerî**

**Metingerî, di heman demê de ji bo pekanîna qirkirina hunerê pîvankariyek mezin nîşan dide. Qirkirinên di her astê de ku li Kurdistanê hatine pêkanîn, di rêjeyeke girîng de qirkirina hunerê jî pêk aniye. Lê huner, ji ber ku hindek bi giyanê ve girêdayi ye pir û bêtir zindiye, di nava kategoriya yên dijîn de cî digire û di aliyê xwe yê arişî de giraniyê dide çêkirin, ew qirkirinên ku di şertên daringî de pêk tên, biqasî wan qirkirinê napejirîne, ango vala derdixe. Huner, xwedî taybetmendiyekê wisa ye jî.**

**Lewma civaka Kurd, di rastiya gel de nasname, kêm zêde berdewamkirina bi huner tê fêmkirin.**

**Bi taybetî folklor û mûzîk bûne sebeb ku nasnama netew di rewşeke diyarî de xwe li ser piya bihêle. Lê gelek alî û çalakgeriyahunerê hatiye tewişandin, parçe kirin û rastî pişaftinê hatiye. Her wiha ji bo hunera netewa serdest bûye amrazekî bikaranînê. Serdestiya metingerî, di heman demê de serdestiya li ser hunerê ye. Ev yek jî derbirîna xwe, destpêkê di nejiyandina rastiya hunera gel, tewişandin, kirina malê xwe û anîna halê nenasînê û piştre jî hunera xwe wek hunera ku ya gelê bindeste, di nêzîkbûnên xwe de diyar dike. Dîsa metingerî di hemû dezgehên fermî de, bi taybetî, li ser piştevaniya hêza dewletê, di cîhana giyan û hestên gelê bindest de daye bawerkirin ku "*Di bingeh de tu ji netewa serdestî, wek wî yî, nasnameyek te ya cuda nîne*" bide çêkirin, serdestiyeke mezintirîn pêş dixe. Her wiha netewa serdest di**

**rêjeya ku xwe dide pejirandin de, tinekirina netewekê temam dibe. Bi vî rengî nasnama netew winda dibe û nasnama netewa serdest dibe desthilat. Bi rastî jî ev, di rastiya Kurd de rewşeke herî pêşketî ye. Ji ber vê sedemê, li hember rastiya netewa serdest berxwedaneke pir kêm heye. Bes ev yek nîşan dide ku metingerî ka çiqas pêş ketiye.**

**Nexwe, têkoşîna li hember mêtingeriyê di warê hunerî de piçûk nayê dîtin. Dîsa di warê huner de pir bi sînor be jî, hebûna nasnama netewî di hinek aliyan de domandin ji bo derketineke girîng di têkoşina rizgariya netewî de dikare bingehekê çêbike. Di qonaxên destpêkê de bi taybetî, xebata çand û hunerî piştgiriyekê ji netewbûn û têkoşîna netew re çêdike. Heya qonaxeke diyar roleke girîng dilêyîze. Lê heke ku şîdeta siyasî û leşkerî nebe, têkoşîna çandî û hunerî zêde**

**wateyekê naderbirîne û zelal tê dîtin ku erka xwe nikare bide temamkirin.**

**Mirov dikare qala nêzîkatiya rewşenbîr û miliyetperestiya hoveber ku di vê wateyê de huner rast nanirxînin bike. Em baş dizanin ku huner, çand û xebata wêjeyê ya ketûber bi rizgariya netewî, bi taybetî jî bi peywirên siyasî û leşkerî têkil hev dibin, ango bi vî rengî naxwazin peywirên xwe bibînin, mafê hunerê jî nadin û rê tevlîhevkirinê re vedikin.**

**Bi pêşketina têkoşîna me ya şoreşgerî ve him erkdariya hunerê ya di nava şoreşê de hatiye zelalkirin, him jî ew ferasetên çewt ên di nava şoreşê de neyêniya wan hatine teşîrkirin. Çawa ku giraniya pêwîst dike ji rola hunerê re hatibe dayîn, li hember bikaranîna vê ya oportonîstî jî, rexneyên pêwîst hatine pêşxistin. Ka çiqas ev yek rast e, di nava têkoşîna şoreşa bilindbûyî de pêşketina hunerî weke aşutekê mezin**

**bûye, li ba vê yekê qasî bandora warê hunerî li warê siyasî û leşkerî jî, van waran jî li ser warê hunerî bandoreke giran çêkirine. Di vê wateyê de çalakgeriya hunerê li ser bingehên rast ên erkdariya şoreşgerî hatiye gihandin. Ji destpêka sedsalê vir ve heta pêşiya wê jî, nasnameya netew a ku dihate xwestin xwe bigihîne asta hunerê, pêngavek weke dêwekî pêk aniye û ev tenê bi têkoşîna siyasî û leşkerî derketiye holê. Lê, li ba vê yekê erkdariya hunerê kêm nebûye, tam berevajî zêde bûye. Her wisa ku şoreşa Kurdistanê serûbinbûneke girîng dijî, şer ji hemû girseyan re bûye mal, xwe kûr dike, her çîn û tebeqe digire nava berfirehiya xwe, vê yekê didomîne, li ba vê yekê kêmbûna erkdariya hunerê bila li vir bimîne, em dibînin ku bêtir zêde bûye û hatiye halê pêdiviyeke şênber. Girseyên gel, bi mûzîk, folklor û wêneyên şoreşgerî bêtir hatiye**

**rewşeke zindî û ji bo teşeyê jiyaneke baş hewl dide ku zêdetir xwe lêhatî bike. Ango di vê wateyê de bi kiryarî şoreşeke hunerî tê jiyîn. Lê li rexmî vê diyare ku, ev yek nayê terkeserkirina ji xweberiyê, berevajî pir eşkereye ku pêdiviya xeteke huner a pir rehdar û xebata wê ya pratîk heye. Her wiha ji bo derbaskirina kêmasiyên heyî mîna afirandina eniya hunerê û berê xwe dayîna xebateke wisa him pêdivî ye, him jî qadek ku ji pêşketina şoreşî re tevkariyekê çêdike.**

**Çawa Bijîn**

**Ya ku em dixwazin di vê qadê de bidin pêşxistin, di bingeh de pêşnûmeya romaneke şoreşgerî ye.**

**Em dikarin bêjin ji pêvajoya hilveçirîna girêka kor ku di civaka Kurd de hatiye çêkirin û pêvajoya ber**

**bi rizgariya nû ve bi romanê hunandin ango bi romanê anîna zimane.**

**Bersiva em ji "*Çawa Bijîn*" re bidin di wateyekê de dibe roman.**

**Em raveya şoreşê ya bîrdozî, polîtîk û leşkeri, dîsa stratejî û taktîkê pêş dixin. Her wiha pêşketin çêdibin û diçin. Lê di heman demê de ger ku em pirsa "*Jiyana şoreşger wê çawa be*" nebersivînin, em ê şoreşa xwe ji pêşketineke giyanî ya girîng û ji teşeya libatê mehrûm bihêlin û eşkereye ku ev ê ne saxlem be. Lewma ji bo milîtanek şoreşger pirsa "*Çawa Bijîn*" sotînere. Ji xwe têkoşîna rizgariya netewîya ku di bin Rêbertiya partiya me de pêş dikeve, hemû civak hewandiye, tenê ne ji bo milîtan, ji bona hemû takekesan şêwazeke jiyana şoreşger ka çawa pêwîste bê peşxistin, bi qasî nan û avê bi misogerî aniye halê pêdiviyekê. Di nava civaka me de paşverûtiyên ruhî û reftarên xirab hene. Dema**

**têkiliya vê bi metingerî, Kemalîzm û dîsa bermahiyên serdema navîn ve bê lêkolan û dahûrandin, wê bê dîtin ku; çiqas têkilî û şêweyên jiyana bê hilweşandin û li hemberê bertek bê raberkirin hebe, ewqas jî pêdivî bi têkîlî û şêweya jiyana ku bikeve dewsa hemûyan heye.**

**Vaye roman, hinekê jî hewldana di navbera vê dualîteyê de rave dike. Têkilî û teşeya jiyana ku pêwîste bê derbaskirin, têkilî û teşeya jiyana pêwîste bê parastin lêkolîn û lêpirsîn dike, dahûrîn dike û ji nû ve ava dike. Ev yek ger ku teknîka hunerê baş bê bikaranîn, di wê rêjeyê de, wê ji şoreşê re tevkariya herî baş bike. Bes dema ku têkoşîna me ya şoreşgerî dibe mijara gotinê, ger rastiyên dîrokî yên vê şoreşê, bi teşegirtina civaka ku xwe li ser radigire, bi taybetî li gel pêvajoya dîrokî ya nêzîk ve rastiya ku îro dijî, bi astek nêzî zanistê ve aliyên pêşketinên dibêtî ve bên nirxandin û**

**ji romanê re zemînekî wisa bê berpêşkirin, em dikarin destnîşan bikin ku pêdiviya vê romanê pala xwe dide an jî divê pala xwe bide ser binyada rastiya sosyalîst.**

**Ev yek di heman demê de, di bingehê daneyên zanîstî de derdikeve holê, ew aliyên ku kevneperestî bi her awayî pê re çêdikin, şûnde dikişînin, vesazî dikin û helwesta ku dixwaze nûjenî bike, ji her cure temsîla vê re bi rexneyekê bersivê dide. Li ba vê yekê, xwedî li rasteriya pêşkeftî derdikeve, ji bona pêşengtiya vê bêrî, azwerî û bilindbûnê esas werdigire. Ev roman, rastiya tê jiyîn tam jî bi vê teşeyê digire dest, di bingeh de jiyana takekes a ku bi hilweşandinê re rû bi rû maye û piştgiriyê ji jêr û jorsaziya civakê werdigire çavdêriya hilweşandina wê dike û bi şêweyek herî radîkal rexne dike. Lê di heman demê de hewl dide derbixe holê ku ya li şûnê bê bicîkirin ka wê çawa be û**

**hewl dide girêdana wê bi kevirên bingehîn ên jêr û jorsaziya tevahî jiyana nû ya ku divê bê pejirandin ve ava bike. Ev, dikare di kesayeta kesekî an jî çend kesan de ji avakirina nû ya hemû civakê re rê veke. Li vir sê-çar kesayetên ku werin destgirtin, wê di heman demê de ji dahûrandina rasteqîna dîrokî û civakî re, rê veke. Çend tîpên ka kîjan dîroka paşdemayî têkiliyên civakî yên vê dîrokê temsîl dikin baş dahûrîn dike, baş çavdêrî dike, baş rexne dike û ji nû ve ava dike. Ger ku vê yekê çiqas bi kûranî, çiqas bi xweşikî û çiqas bi hunerî bigire dest, wê ewqas jî bikare berhemek saxlem derkeve holê. Êdî ev, bi hêza hunermend ve girêdayî ye. Hindek xeyalên xwe dide axaftin. Yanî di vir de ji zanistiyê zêdetir xeyal dana axaftin, xwestek, bêrî û azwerî anîna ziman mijara gotinê ye. Li hember çi me, çi dixwazim, divê çi hilweşînim, çi ava bikim; çi kirête, çi**

**xweşike; çi nayê jiyîn, çi tê jiyîn; çi tê pejirandin, çi tê redkirin; çi tercîha min e, çi ne tercîha min e, van pirsan eşkere dipirse û bersîvên tûj dide. Bersîvên ku bide, wê giştî civakê eleqeder bike.**

**Vaye, ew pêşnûmeya romana ku em dixwazin pêş bixin, pêwîste kêm-zêde li derdora van pirsan bê derxistin. Rastiya tê jiyîn jî di wateyekê de eve. Li ba pêwendiya vê rastiyê bi mezintirîn kevneperest û muhafazakar, yanî bi mêtingeriyê û bi bermayên feodal ve, di heman demê dehewl hatiye dayîn ku ew civaka ka çawa bi nûjeniyeke sexte ve tê cîlakirin derxîne holê. Heta dema welatparêziya sexte, di bin navê çepgirên sexte de, kesayet an jî kesayetên heyî çi ne tên ravekirin, li gel vêgirêdana rizgariya civakî ya nû bi nasnameya netewî re an jî di asta kesî de temsîlkirin çawa dibe; kesayetên wisa çawa derdikevin holê**

**û çawa têdikoşin, ev yek jî hatiye destnîşankirin.**

**Weke din jî, qala kesayetên xeta navîn hatiye kirin. Ew kesayetên ku lingekî xwe li bermaya serdema navîne û lingekî xwe teşegirtina civaka nû de ye, her tim şopa herdu aliyan temsîl dikin û xwe li dijî her qonaxa girîng ferzkirina wan hatiye rexnekirin. Bi taybetî dahûrînên Serokatî (em dikarin bêjin dahûrînên bingehînin) yên di vê mijarê de pêşketinên ku derxistiye holê, bi girîngî lêkolînkirin û ji bo romanek şoreşgerî weke amûrekî nirxandin dibe ku tevkariyekê bike. Ev xet kêm-zêde di dahûrînan de hatine derxistin. Dahûrînên kesayeta bingehîn; di jiyanê de, di nav şerê germ de hatine bi ceribandinan derketine holê. Ango ev ne xeyalî ne, rastiyên ku şoreşê derxistîholê ne.**

**Lewma dane û kelûmelên ku romaneke rasteqînî pala xwe bidê**

**mijara gotinê ye. Yanî ewqas kelûmelên ku di wêjeya çi welatî de nehatiye peydakirin hatine bidestgirtin. Qehremantî, xiyanet û xeta navîn ên ku têkoşîna rizgariya netewî di bin Rêbertiya PKK'ê de derxistiye holê, daneyên bêhempa ne û heta dikare li ser her qonax an jî li ser her kesayetekê, pirtûk jî bê nivîsandin. Em tenê hewl didin derbirîna vê ya giştî, girêdayî pêvajoyên rizgariya netewî û partiyê bidin. Pêşnûmeya romanê hewl dide ji aliyekê ve rastiya metingerî û Kemalîzma Tirk a faşîzan, ji hêlekê ve rastiya Kurdistanê ya eşirî û feodaliya serdema navîn, ji aliye din ve jî rewşa kedkar, karker û gundiyên xizan, ew kes û têkiliyên ku ji pêwendiyên eşîrî û feodalî hatine qutkirin û teşegirtinebîne ziman. Û PKK di wateyekê de eve. Roman, hewl dide pêşketinek di vê wateyê de di asta hunerî de pêş bixe. Him berhemek**

**pêşketina şoreşî ye, him jî ji bo pêşketina şoreşgerî teşeyekê dide. Her çendî şoreş bi helbest, mûzîk û wêneyan nayê pêkanîn, ji bo pêşxistina wê ya cewherî bêguman wê roman tevkariyekê jê re bike. Pêşnûme kêm-zêde ji xwe re kiriye armanc ku vê naverokê bide.**

**Ya rastî kesayetên bingehîn mijara gotinê ne, lê ger em gelek kesayetên wekhev pênase bikin wê kelûmel bêtir dewlemend bibin. Lewma bi neqandin, yekirina gelek qismên baş, yanî gihandina sentezekê ve roman dikare pêk were. Di vê pêşnûmeya romana ku em dixwazin bidin de, bi komên curbecur anket tên çêkirin. Em li hember kîjan jiyanê bertek raber dikin û em bêriya kîjan jiyanê dikin tê lêpirsîn. Dîsa pirsên weke çi başe, çi xweşike; çi raste, çi çewte; çi kirête, çi xirabe pir vekirî tên pirsîn. Ji ber ku roman jî hindekê di nava van têgînên bingehîn de pêş**

**dikeve. Dîsa pirsen weke hûn ji ku derê tên, jiyana kevin çi ye, jê qutbûna we çawa ye; dîsa pêwendiyên we bi jiyana nû re çi ne, hûn çawa pê ve hatin girêdan, hûn dixwazin çawa pêş bixin, gelek caran tên pirsin. Di aliyê din de bilez pêşnekeftin û nebûna milîtanek şoreşger ka çi diderbirîne; xuyangên vê yên curbecur çi ne; di kesayetê de ji çi re rê vedike? Ev tên lêpirsîn û hewl tê dayîn bi rêbazek rast ve, pêşxistina şoreşê ji vê hêlê ve bigihîne tevkariyekê.**

## Romana Kurdistanê

**Bêguman gava ku li Kurdistanê pêşnûmeya romana şoreşgerî tê pêşxistin, ji ezmûnên netewên din jî sûdwergirtin girînge. Bi taybetî di rastiya romana Fransa ya ku şoreşên bingehîn çêkirine Vîctor Hûgo, Balzac hwd romanvanên mezin, dîsa rastiya**

**romana Rus û heta di qonaxa zayîna şoreşa İslamê de hinek pêngav hene. Pêwendiyên şoreşa Fransa bi romana Fransa ve tê sazkirin. Dîsa şoreşa Rus têkiliyên xwe bi Tolstoy, Dostoyevskî, Çernîşevskî, Gorkî û hwd. re çi ne; van di kîjan qonaxên şoreşê de û bi çi cure berheman tevkariya şoreşê kirine? Hindek taybetmendiyên bingehîn ên şoreşa Îslamiyetê çi ne; bi taybetî çima piştre bûye paşverû, vegeriyaye kevneperestiyê û hindek taybetmendiyên bingehîn ên kesayetê çawa derxistine holê? Malbateke çawa, kesayetiya jin-zilamê çawa derxistiye holê?**

**Di rastiya civaka Rojhilata Navîn de ev dikarin bên berçavgirtin. Bes divê romana Kurdistanê jî rastiya xwe ya şênber berçav bigire ku naşibe ya ti deveran. Taybetmendiyên civaka Kurd, ji ber dîroka jiyaye pir kêm dişibe civakên din. Lewma pêwîste reseniya xwe pir baş bîne pêş çavên**

**xwe. Yanî romana Kurdistanê, pêwîste bêtir bibe romaneke xweser, nikare zêde teqlît pêş bikeve. Teqlîtkirina romanivîsiya Tirk jî zêde pêş naxe.**

**Vê yekê têkoşîna şoraşa me bi rengek balkêş daniye holê. Xebateke hunerê ya bi baldar dikare bibîne ku şoreşa me ya pêşketî henaseyeke mezin bi hunerê daye wergirtin û bi hunerê jî şoreş pir tê pêşxistin. Dikare hêz raberî xebateke wisa bike û berhemên xurt derxe holê. Di vê qonaxa ku têkoşîna me bi dijwarî dijî, ji pirsa "*Çawa Bijîn*" re bi romaneke wisa ve bersiv dayîn jî, tevkariyek biçûk neyê dîtine. Ger derfetên me dest daban li gel peywirên bîrdozî, siyasî, leşkerî, dê me karîba tevkariyeke wisa ji peywirên wêjeyî re jî berpêş kiriba. Ji xwe her ku em firsendê dibînin, em hewl didin ku vê çêbikin. Bi rastî jî ev hewldanên me tevkariyê diderbirînin.**

**Milîtanên ku di vê mijarê de bixwe bawerin; pêwîste berçav bigirin ku di nava me de huner, bi taybet jî wêje û roman çawa tên pêşwazîkirin û di vê navberê de divê jibîr nekin ku bi bersivdayînek rast a ji pirsa "*Çawa Bijîn*" re dikarin tevkariyekê bikin.**

**Di Dîroka her gelî de pêngavên mîna vê hene. Di qonaxa began a bi navûdeng de, di wêjeya Kurd de hinek pêşketin çêbûne. Mirov dikare di hinek destanan de qonaxên dîroka Kurd a xwedî jêderka çiya yên tên zanîn bibîne. Vegotinên wêjeyî ya hinek kesayetên weke Kawayê Hesinkar ku serî hildane û Memê Alan hene. Van ji serdema girîng a pêşketina civakî hêz girtine û hatine pêşxistin. Bi vegotineke zaravayê Rojhilat an jî bi rêbazan heta roja me ya îro bibandor bûne. Mem û Zîna Ehmedê Xanî jî di vê wateyê de, bi taybetî di qonaxa ku otorîteya keyayan ji bo gelan çarçova netew û**

**civakan xêz dikir de, derbirîna wê pêdiviyê ye. Hewl dide şêwaza mîran a parve dikir- perçe dikir û tim bi hev re di pevçûnê de bûn, yekîtiya netew pêk nedanîn heya bergeha nav sûlaleya feodal vedibêje. Vegotina di vir de pêk tê, di bingeh de rastiya begê feodal ê hişk ku yekîtiya gel napejirîne û wê yekîtiyê venaguhere asta netewî ye. Pir û pir fitne-fesad hene, xulamtî hene; hewl dide ku vê bilêv bike. Lê, ji ber ku pêvajoyeke şoreşî ya bingehîn nejiyaye, nikare bi vegotineke xurtir temam bike û pêş bixîne.**

**Ji ber ku Kurdistanê şoreşeke cidî ne jiyaye, em di dîrokê de ne di sedsala 18'an, ne di sedsala 19'an, ne jî di sedsala 20'an de rastî mînakên romanên xurt nayên. Ên hatine nivîsandin jî, romanên Tirk ên li ser bingeha siyaseta Kemalîzmê ya tinekirinê ku derketine. Di vê mijarê de Yaşar Kemal bi xwe jî, ji rastiya**

**Kurdê ku bûye Tirk derketiye holê û navê rastiya ku vê jî bi wêjeyê didomînê ye. Xwedî romankarek wisa ye. Mîna vî gelek romanivîs hene. Evew romanivîsin ku di dirêjahiya tevahî dîroka komarê de ew rastiya ku serhildanan perçiqandiye û piştre jî bi Tirkiyê re kiriye yek di teşeyek pêşverû de pênase kirine. Di ciyekî de xwestine sinc, wêrankarî û tinekirina Kemalîzmê bi rêya wêjeyê rewa kirine. Di vê bingehê de pergala ku hatiye avakirin; mîna xweşikbûnek pêşveçûyî, pêwîste bê jiyîn ferz kirine. Bes ev tiştên ku bi wêjeyê dane pejirandin û divê bên redkirinin. Perspektîfa van romanan, dilê ku bi rastiya Kurdistanê na êşe û nefêmkirina vê ye. Her tişt înkarkirine, him jî bi lezgînî! Cardin nevekirina wan neyêniyên kevinin. Kurd weke paşverû û hov nîşandayîne.**

**Vaye, dixwaze bila Kurd be, dixwaze bila Tirk be, heya niha di derbarê Kurdistanê de romanivîsî, hunermendî û wêjevanî di vê bingehê de xwediyê karbidestiyê ye. Bes ev romanivîsî di radeyeke dawî de wêrankarî afirandiye. Bi taybetî di teşegirtina kesayetê de çelexwarî pêş xistiye. Ramana azad û rasteqînî asteng kiriye. Tirkbûn, koçkirina metropolan, welat û gelê xwe piçûk dîtin û bi rengek hêsanî dest jê berdan pêş xistiye. Ev ji pêvajoya ber bi metropol û Ewrûpa yê ve herikandineke mezintirîn û pêvajoya ji xwe revê ye. Di heman demê de pêvajoya reva ji giyan û mejiyê xwe ye. Heta ev pêvajo, bi qasî lanetkirinê jî pêş ketiye. Pir kêm kes karine xwedî li rastiya xwe derkevin. Her tişt bi erzanî ji dest hatiye derxistin. Yên ku nav girtine ser zimanê xwe jî, ya hatine sîxurkirin, yan jî hevkarmendên bi misyona ku di**

**bingehê hin berjewendiyan de bi dest girtine derketine holê. Li vir wêje, veguherandine têgehek ku di keleka welatparêzî û azadiya civakî re jî derbas nabe.**

**Bes em vê yekê heya derketina tevgera şoreşgerî, bi rengek bêtir trajedî û kûrbûyî dibînin. Bi taybetî binketina her serhildanê, di çûyîna encameke wiha de rol lîstiye. Piştî serhildanan, yanî qonaxa terora spî, di bingeh de rastiya gelê Kurd, ji qonaxa serhildanan bêtir xistiye nava xeternakiyê û em dikarin bêjin ku aniye heya wê xala ber qedandinê.**

***"Ne wêje dijberî leşkertî, ne jî leşkertî dijberî wêjeyê ye"***

**23 Tîrmeh 1993**

**MÎNA ZİMANÊ RASTİYÊ WÊJE**

**Jiyan veguhertina bûyerek mezin, jiyan kirina malê netew û mirovahiyê di destê mirov bi xwe de ye. Tişta bi temamî em dixwazin bikin û bi ser bixin jî eve. Jiyan bi netewkirin, civakîkirin û gihandina çandekê rakêşwerî û jîndarkirine. Weke zarokan xwe xapandin, giriyandin, nalandin, xwe reben kirinê ve mirov nikare bigihîje ti derê, piştî ku mirov çareser nebe, di erkan de ti pêşketinê çêneke ev kar pêşnakeve. Bi hişyarî û nêzîkbûnek pêşverû ya mezin ve me feraseta xwe ya berpirsyariyê nîşanda. Hewldana em qala wê dikin wisa tê diyarkirin. Yên ku me herî dersên jiyanî dan wan jî çawa xwe û me xerc dikin li ber çavane. Hew dikarin bi awayekî hêsan xwe têxin nav destên dijmin. Ji wêrektiya em didin wan vî tiştî fêm dikin. Bi awayekî erzan darazan dikin,**

**ya rastî ti carî ji nêzîkbûnên me encamek wisa nayê derxistin.**

**Êdî ev meseleyek terbiyê ye. Hevalekî got: "*Min ji dayîka xwe re nameyek nivîsand. Min got; we çima ez mîna bêterbiyekî mezinkirime.* " Raste. Bi me êşa gihandina bêterbiyetiya mezin didin jiyankirin. Hewldanên me tenê encamên sînordar digire. Em ji van re dibêjin zarokên pîremêr.**

**Bûyera ku em jêre dibijên hacûcî (Cuceleşme) ne teşeyeke jiyana raste. Di şoreşê de hacûcî nexweşî ye.**

**Di têkoşîna siyasî de nexweşiya hacûcî, bi taybet navê rewşa ne zeftkirina mezinbûna şoreşgerî ye û tişta herî zêde tê jiyankirin jî eve. Kes çi dike bila bike pêwiste bizanibe xwe mezin bike. Bê ku mezinbûna leşkerî, ya siyasî û şoreşgerî hebe jiyan gelekî zore. Hêza kî/ê hebe bila xwe mezin bike. Berovajîkirin û bi mebestên**

**sûbjektîf ên ne hewce ve pêwîst nake ev bê valederxistin. Bi vê ti tişt nayê bidestxistin.**

**Li hemberî nirxên partiyê neşayanbûn; çiqasî bêhaweye, ji cîdiyetê bêparî û kesayeta lingên li hewa û ji rastiyan dûr rave dike. Ev jî ti carî nikarin di hunera têkoşînê de gav bavêjin.**

**Zimanê rastiyan rê nade berovajîkirinê. Zimanê rastiyan her cidî ye.**

**Me bi giranî xwest kesayeta Kurd ji zimanê derewker rizgar bikin. Me xwest ji zimanê çewt, zimanê kesayeta ji rastiyan qut bûye dûr bixin. Berovajî vê me xwest bi nirxên bingehîn girêbidin, bi jiyanê û bi taybet jî bi milên wê yên siyasî, civakî û leşkerî ve pêwendîdar bikin. Bûyera ku zimanê rastiyê îfadeya xwe têde dibîne jî xîtabe.**

**Xîtab hunereke.**

**Li gorî ku şoreş jî hunereke herî cidî ye, divê xîtaba şoreşê jî ewqasî xurt û pêşketî be. Pêvajoyên şoreşê di heman demê de pêvajoyên xîtaba xurtin jî. Tê gotin ku "*Pirsgirêka şoreşê ya bingehîn siyasî ye.* " Siyaset jî nîv bi nîv xîtabete. Dema ku pêkhateyên siyasî û dewletên xurt derdikevin holê, pêre katîbên xurt jî derdikevin. Heta di pêvajoyên wisa de pêşbirka xîtabetê destpêdike. Serdema Romayê bi tevahî xîtabe, dîsa serdema Yûnan a klasîk bi giranî serdema xîtabê ye. Di derketina Îslamê de jî xîtab û xweş axaftinek gelekî mezin a Ereban heye. Hûn ji kî derê ve lê temaşe bikin, hemû pêvajoyên serûbinî bi xîtabek xurt destpêdikin. Mînak zimanê Kur'anê bi xwe jî, mînakek xweş axaftin û xîtaba mezine. Xwendina suret û bangê giş xîtabin. Dîsa dema parlamentoya Tirk saz dibe, Mistefa Kemal çawa xîtab dike! Bi kurtasî îddîaya siyasî ya**

**bingehîn ku jiyanê ji nêz ve eleqeder dike, bi xîtabek xurt tê meşandin.**

**Mirovên Kurd di mijara xîtabê de lal û ehraze. Nikare baxife ango şêwazekî derewan û bêzar bikartîne. Nikare baxive. Ne bi Kurdî, ne bi Tirkî ne jî bi Erebî. Em dev ji axaftina bi xîtab berdin, ne xwediyê zimanê axaftinek ji rêzê ye jî. Mînak, zimanê kadroyan di rêxistin ango ferman û perwerdê de gelekî kême. Pir zêde zerarê dide. Şêwazê xîtaba wî parçe, derewan û ji derxistina cewher gelekî dûre. Xîtab, uslûp û teşeya teyisandina derve ye. Ger cewher nîn be, zanebûn nînbe bixwazin zimanê çûkan jî bikarbînin, bilbil bin dîsa jî hûn nikarin bi bandor bin.**

**Ji bona axaftinek xurt jî naverok, bawerî û ezîm pêwiste.**

**Dema ku ev nînbin hûn ê çawa baxivin? Hûn ê çawa bibin xwediyê xîtabek bi bandor? Mirovên belav, bê pergal û bêdanehev nikarin baxivin û**

**şêwazek saxlem raber bikin. Ev wêne li mirovên me sepandin, nîv bi nîv zimanê wî girtin û kişandina derve; dîsa bi werandina pêşî, çep û rastê wî ve pêkane. Dibe ku bi vî şêwazî bizivire şêwaz û helwestekê.**

**Rexmî ku xîtabet çeka herî bi bandore jî, ev çek di nav refên me de hew ji bona kûrkirina feraset, kêmanî û tevliheviya xwe bikartînin. Di hinekan de zimanê ezop, di hinekan de jî pisportiya hevoka di nîvî de hiştin heye. Di hineke din de jî dixwazin kîjan ramanê vebêjin nediyare. Tişta dixwaze bêje ji sedî deh jî nikare têke nav hevokê. Şêwaza derkirina tiştên hundur a derve bi rastî jî dil li ser dêşê. Ez heta niha di civînek partiyê de nebûme şahidê xîtabek xurt. Yanî em ji devên hevalan peyvan hema hema bi kelbeten derdixin. Diyare ku ev lewaztiyek gelek mezine.**

**Di zimanê leşkertiyê de ferman û fermandarî bi xîtabek serwer dimeşe. Ev bi xîtab dide guhdarkirin, rêzdarî dide avakirin, heta otorîteyê dide hîskirin, ger pêwist be di tirsîne û bi wêrekî dimeşîne.**

**Lê li yên bibin fermandar temaşe bikin; zelûle, nizane fermanê bide, berevajî ye, ji dêvla wêrek bike ditirsîne, ji dêvla bitirsîne xemgîn dike. Mîna hemû xalên din di vê mijarê de jî kêmaniyek mezin didome.**

**Ev çima wisa ye? Piştî kesayeta Kurd ewqasî deforme bû, girêdana xwe ya bi rastiyan re winda kir, bêteşeyî û nebûna cewher ewqasî guherî, bêguman nagihije xîtabek xurt û fermana wê ya bingehîn. Bi rastî jî dema em lê mêze dikin; ger asta siyasîbûn û leşkerbûnê paşketî be, teşeya wê ya xwe li derve dide jî paşketî ye. Em li wêneyên şervanên xwe temaşe dikin, tertûbelave. . . Li milekî şal gerêdana wî, li milên din**

**parkeyê wî, li milek din bestika wî ya xwar, pişkokên wî yên jêketî; bi kurtasî seknek wî ya têkûz nîne. Heta vê seknek dihesibînin, çiqasî belav û aware bisekinin xwe ewqasî qewîm dihesibînin. Dîsa rapor tên nivîsandin, zimanê raporan azarê dide mirov. Di raporan de ji dêvla ramanek xweş çiqasî tevlihevî û dilêşî hebe wan rêz dikin. Çima? Ji ber di kesayetê de serwerî û berpirsyarî nîne. Di hemû raporan de hal û tevger hatine rêzkirin. Hovitiya gundîtiyê derbas nakin û tevgerên wê serwerin. Yanî kesayet û nasnameya şervanê artêşa rizgariya gel pir zêde tê de nîne. Em bi hêsanî dikarin bêjin ku şêwazek gundîtî ya erzan tê jiyîn. Ev kesayetên di heman demê de rewşenbîrên pozbilindin jî; her çiqasî devên wan baxivin jî ji naverokê dûrin û ziman dirêjin. Yanî hema hema bêteşebûneke ewqasî giran serwere.**

**Hemû siyasetmedarên girîng, erkdarên dewletê, kesayetên leşker; bi salan xîtabet û teşeyê fêr dibin û bandorbûnê teqez di kesayeta xwe de pêktînin. Teşe û katîbên pir girîng ên dewlet û şoreşên pir girîng hene. Em vê, di civakên bi giştî bûne qurbanê dagirkerî ango herî kûr ketîbûnê dijîn de jî pir zêde nabînin. Yek ji wan jî baş û rast nikarin baxivin.**

**Rastiya wî nîne ji ber ku rastiya xwe winda kiriye.**

**Rûyê wî nagire baxive. Niha gelên me çima ewqasî şermoke, çima rûyên hemûyan ewqasî sor dibe? Ji ber rastî ji dest hatiye girtin.**

**Yên rastiyên wan nebin wê pişta xwe bidin çi û baxivin?**

**Bêhêze.**

**Ji bona xîtabê divê guftûgo hebe, ji bona vê jî divê mirov bihêz be. Yanî divê mirov nûnerê rastiyek qewîm be. Ger girêdana wî bi rastiyan re, bi siyasetê re, bi rastiya civakî û çandî**

**re, heta bi zanistê re qut be, wê gavê tê mîna belengazekî di holê de bimînî.**

**Ya rastî zimanê leşkertî û siyasetê zimanê bi hêzbûnê ye. Kesayet, şêwaz û heweya wê; otorîter û serweriyê esas digire. Hemû avaniya navend û fermandariyê jî bêçaretî û şaqiziyê daxivin. Hînbûna kesayeta siyasî û leşkertiyê bi destnexistine. Ger di vê mijarê de kesayetek xurt a leşkerî, siyasî û rêxistinî hebe teqez wê serwer, desthilatî û di vê mijarê de ti astengî nas nake pêşbikeve. Lê ev kesayet mezûnbûna heyî û derfetên rêkûpêkkirinê di nav nebesiya xwe de difetisîne. Aha zimanê ji rastiyê qut, erzan û demagojîk eve. Zimanekî ezop girtiye, çi daxive ew jî nizane û fêmnake. Hewa, şêwaz, tempoya wî nabe desthilat, berevajî wê dibêje: "*Ez nikarim bikim, ez têk çûme, bêçare me, derdên min hene, di her kêliyê de dibe ku ez bimirim, pir zêde***

***şansê min ê jiyanê nîne.*** **" Divê teqez ev tişt bên derbaskirin.**

**Çawa ku li hemberî dagirkerî û hemû cûre paşverûtiyê em qala şer dikin; divê li hemberî vê teşe, ziman, şêwaz û tempoyê jî em bêjin bes û tekoşîna wê bikin. Yên ku xwe di van hêlan de têr nekirine nikarin jiyanê jî pêş bixin.**

**Divê bê gotin ku: "*****Ez bi qasî bes bim, divê di cihê xwe de rasteqîn tevgerbigerim. Divê ez baxivim, divê ez baş bêm fêmkirin.*** **" Weke din jî xîtabî mîlyonan dikin. Yên ku hunerek wisa pejirandine şaşitiya peyvan jî nakin, hele hele di helwes de ti carî kêmaniyê nakin. Nabe bê gotin ku "*****Ez nehatim fêmkirin, min tiştên hundurê xwe dernexist derve.*** **" Ger mîlîtanek milên xwe yên wisa jî rast neke li ku ma şoreşgerî?**

**Têkiliyên ehpabçawîş di hemûyan de serwere. Ehpapçawiştî, zimanê fesadiyê, axaftinên dervî**

**siyasetê û bê eleqe di jiyanê de ji sedî notin. Ev ne zimanê milîtane. Jiyana mîlîtan wisa nameşe. Ez li hemberî yek anjî hezar kesî jî bim, ez zimanê xwe ji dervî rastiyên siyasetê bikarnayînim. Ezê teqez mijara siyasî û leşkertiyê serwer bikim û ezê li derdora wê bizivirim, hemû kesî jî bidim zivirandin. Zilamên erkê, zilamên mîlîtan û mîlîtanê pispor wisanin.**

**Bi salane mirovên Kurd xwe negihandine zimanekî qewîm. Zarok jî piştî heft û heşt salî ya xwe xweş daxivin. Diyare ku tembeltî û hevnegirî heye. Kesê ku kadrobûnek siyasî ji xwe re kiriye karekî bingehîn, divê pêdiviyên vê jî di xwe de bicîh bîne. Li şûna vê rojane hemû cûre kêmanî tên ferzkirin. Tişta ji polîtîkayê tê fêmkirin xwe mîna zarokan ferzkirine. Zimanê xwe yên mehelî jî hîn neguhertine.**

**Li hemberî rastiyan mezinbûna siyasî ya partî û artêşê winda dibe.**

**Teşe û cewher wisa tê destgirtin. Salên dirêj jî bikişîne divê mirov bizanibe xwe pêşbixe. Di dibistanên Tirkan de jî li pir başiyê digerin, nexasim li dibistanên leşkerî teşegirtin bê qusûre. Bes sedî salane bi wê jî bawerkirine. Serbazek Tirk hemû tiştê xwe denydarê xîtab û ûslube. Gotinek ne di cih de, hevokek bê qudret û otorîte nabêje. Axaftin, tempo û şêwazê wî ji serî heta dawî otorîte ye. Yên Kurd jî mîna zimanê Keloxlanê reben û ezope. Yanî ûslub, şêwaz û tempoya mirovên têkçûyî û hukum nakê ye. Madem hûn dixwazin bibin desthilat û siyasî, vaye rastiya wê eve. Lê hemû tevgerên we ji rastiya rêxistinê dûrin. Têkîliyên kûrbûna siyasî û rêxistinî esas nagirin. Hest û azwerî ji naveroka siyasî dûrin. Dernaxe zanebûnê ji bo çi jiyan jî dike. Lewra belavbûna**

**îradeyê heye. Piştî rewşa pergal û sazûmanî çênebe nêzîkbûnên întîharî derdikevin. Ji ber îhmalkariya salan, dema erkek bingehîn tê dayîn li hemberî wê dibe hacûc û bi windakirin û negihiştina pêdiviyan bersiv dide. Ji ber vê perwerdeya siyasî girînge.**

**Peyva “*siyasî*” terbiye di nav xwe de dihewîne; “*seyîs*” hunermendê terbiyê ye. Terbiya gel, paşê ziviriye terbiya mirovê siyasî. Lê di rastiya Kurd de tevlihevî li lûtkeyê ye; hemû teşeyên kirêt û uslûbên nebes hene.**

**Divê ev uslûp bê derbaskirin.**

**Ger hûnê siyasî bijîn, siyasî baxivin, siyasî temaşe bikin, divê hûn li hemû aliyan siyasî biteyisîn, leşkerî baxivin, leşkerî jiyan bikin. Hûnê ti carî girêdana xwe ya bi rastiyên leşkerî û zagonan winda nekin. Teşeyek fîzîkî ya qewîm, teşeyek giyanî û vegotina wê, ger gengaz be şahanekirina wê erkek jiyanî ye. Bi**

**erkan nayê lîstin, yekser nayê derbaskirin, li gorî hêzê pêdiviyên wê tên kirin. Ziman û beden jî heye; lê bikar neanîye, ne hatiye teşekirin. Her kes dikare teşeyê bê qusûr bike. Di şaşiyan de israr, gotina "*Ez wisa çêbûme, ez wisa mezin bûme, ez nabim zilam*" tişta ku dagirkerî dixwazê ye. Zimanê ezop ku wan bi me vekiriye, zimanê bindest û têkçûnê ye. Ev jî tê wateya neyekser jiyankirina dagirkeriyê. Lê ti mafê milîtanekî bandorên dagirkeriyê di beden û zimanê xwe de jiyan bike nîne.**

**Ger hemû tiştên me gotî milîtanên me girtibin; ew bilêvkirin, bi şêwazekê vê dayîn, mîna quralek şoreşê rewa bike; mîna tarîfa hunera şoreşgerî ya herî xweşik, dê bikarin weke destpêka herî cewherî ya bi bandor û encamgirtinê binirxînin.**

**Kesayeta rakêşwer û herikbar divê bi rastiyên bingehîn û zimanê wê**

**ve girêdayî be. Yên ji rastiyan benê xwe qut kirine demogokin, çiqasî bi ziravî jî baxive ew ziman dirêjeke. Ziman çiqasî rastiyan bilêv bike, ewqasî dikare risteke xwe mezin bilîze. Lê heta gengaz be wê karibe di nav xwe de xweşikbûna şêweyê bibîne. Ger bandor tê xwestin ev neçare. Em ji tevgerên lep û milan bigirin, heta hewaya meşê, em ji şêweya mêzekirinê bigirin heta hemû cûre şêweyên têkiliyan, wê her li xweşikbûnan bigere. Mafê ti şoreşgerî nîne ku yekî din bi helwest û zimanê xwe xemgîn bike, tengav bike, kirêt bike, hêrs bike û rakişîne. Her şoreşger bi zimanê xwe jiyanê hêsan dike, têkiliyên xwe bilind dike, xweşik dike, jiyanê bi wate dike. Kesê ku bi helwestên xwe her tim heval û gele xwe tengav dike; misoger ew di şêwe û cewherê xwe de jî lewaztiyê jiyan dike. Wî ev, hew di teşe de aniye ziman. Her wiha di**

**cewher de tiştek negirtibe û vê dernaxe derve tê wateya ku nikare xwe bi çalek bike. Ger li gel netiyisîne (Ev jî tê wateya di erken xwe de binkeftî mayîn an jî xwe di meşa serkeftinê de weke bê pêlav û tazî hiştin û meşine), teqez ew nikare ti bandorê li derdorê jî bike. Şoreş her wextê şêweyek xweşik, zimanekî xurt û hewayekî bihêz dixwaze. Hewa, tempo û şoxûşenga şoreşgeran heye. Ji bona ev wateyekê îfade bikin divê girêdana wan a bi rastiyên mezin ve bê çêkirin.**

**Bi van ve girêdayî em dikarin li ser rista huner û wêjeya şoreşê jî bisekinin. Em dikarin di çarçoveya pîvanên girêdana bi şoreşê ve li ser van çalekiyên civakî jî çend gotinên bingehîn bêjin.**

**Wêje; ji helbest heya romanê, ji bîranînê heya hevpeyvînê gelek cûreyan di nava xwe de dihewîne. Wêje bixwe, hunerekî nivîs**

**nivîsandinê ye. Huner jî qadên berfirehtir di nava xwe de radigire. Lê di çalekiya mirov de, di rastiya civaka mirov de cihê hunerê girînge.**

**Di esasê xwe de eger huner hîn zêdetir bi gelemperî be; ew jî çalekiya afirandina mirove.**

**Weke pênaseyek giştî, şêwazê afirandina mirove, an jî teşegirtina civakî ya ku mirov ji serdema destpêkê heya roja me ya îro domandiye; avakirina fikrê ye. Her tiştê ku ji bo vê hatiye kirin, dikeve nava têgîna hunerê. Teknîka hilberandinê jî hunereke. Teknîka fikirandinê jî hunereke. Huner, bi dayîkbûna mirov re evqas girêdayî ye.**

**Zanista mirov a yekemîn, sêhr û dîn’e.**

**Di esasê xwe de ev jî hunerin. Teknîka mirov a yekem pir hêsane. Dibe ku jêkirina şivekê be jî. Teknîkekî nêçîrvantiyê ye. Ew jî hunereke, lê belê her ku civak pêş**

**dikeve, weke şaxên zanista aborî, polîtîka û civaknasî jihev cihe dibin û qada hunere jî her ku diçe teng dibe. Wêne kişandin, nivîs nivîsîn, peyker çêkirin, deng, mûzîk û hwd. weke qadên hunerê tên hiştin.**

**Dîroka hunerê, li ser civakan radiweste. Hûn dikarin di pirtûkekî wisa de her tiştî peyda bikin. Tişta ku ji bo şoreşê pêwîste, aliyê wê yê pêşveçûyî û baldarê şoreşê ye. Ango ka çiqas li pêşiya pêşketinê dibe asteng an jî çiqas li pêşiya pêşketinê vedike? Bi demê re strana Kurdî ya ku min baş guhdar kirî, ez ber bi pirsgirêka netewî ve birim, têra xwe bandor li min kiriye. Ev jî tê wê wateyê ku, straneke baş an jî keseke ku ev stran bi awayekî baş vegotiye, ez kişandim şoreşê. Evqas hêzeke wê ya bandorkirinê heye. Piştre dema em daneyên hûnere yên biheybet dibînin; ango dema me peyker, abîdeyên hunerê, mizgeft, xanî, kerwansaray û**

**hwd. bi awayekî pir kûr bandor li me kirin û em ber bi lêkolînkirinê ve, ber bi afirandina hestên xweşik ve birin û kir ku em di pey armancekê de biçin.**

**Gelekî eşkere ye, yê ku hestên wî pêşneketine, feraseta wî/wê jî pir zêde pêşnakeve.**

**Ji şivaneke ku jiyanê di nava sînorên teng ên aboriyê de dizane, ji keseke ku hemû karê wê dotina çend bizinane, mirov nikare hunerkarbûnê jê hêvî bike, ji xwe nikare bibe jî. An jî karkereke sextimanê (inşaat) ku bi şev û roj di nava xwêdanê de kar dike, nikare bibe xwedî hestek bihêz. Ji kesên ku xwe mehkûmî hilberandinekê kiriye hunermend çênabe.**

**Em weke gel, rewşa xwe şîrove bikin; geleke ku evqas hewl dide jiyana xwe hêsan rizgar bike, nikare bibe xwedî ezmûnekî bihêz. Dema ku wisa jî nebe, nikare çalakiyên şoreşgerane û siyasî pêkbîne. Çima?**

**Ji ber ku ji bo wê ya girîng, bidestxistina şorbeyek û pariyek nane. Ev ji bo jiyankirinê girîngin, lê belê hûnê paşve bimînin. Hûn çi dikin bikin, divê hûn di rewşekî wiha de jî hunermendekê ava bikin. Hûnê zimanê hunera vê jiyana zehmet peyda bikin. Bila ew jiyana Kurd a bi êş bîne ziman, mûzîk û nîgara jiyanê ya biêş çêbike. Heta ku ev saz nebin, civak ji bilî vê riyê nikare xwe ji wê rewşa çors, madî û têra xwe biêş û di asta jêrde mayî rizgar bike. Huner, di mercên jiyaneke ku nayê pejirandin de an jî di tengezariyên wê de weke ezmûneke xilasbûnê an jî rizgarbûnê destpê dike.**

**Huner; li hemberî belaviyê û fetisandinê peydakirina çareserî û henaseyê ye.**

**Em pir baş dizanin ku di rastiya me ya civakî de li kêleka asteke paşketî ya aboriya civaka me, asteke pir paşketî ya hunerî jî heye û bi hev**

**re dimeşin. Her wiha xirabkariya mêtingeriyê ewqas berfirehe ku, ewqas avahiya jêrîn a jiyanê tengkiriye ku, hunera ku avahiya jorîne hema hema tine bûye.**

**Di me de dengekî pir lewaz heye. Kurdîtî hinekê di stranan de dijî. Hinekê di lorîn û awazên mirovên paşvemayî de dijî. Di hemû qadên din de hatiye tinekirin. Ev jî tê wê wateyê ku asta hunerê, di heman demê de asta civakî dide nîşandan. Lê dîsa jî bangawaziyek, nasnameyek û nîşaneyekî jiyankirinê ye. Tu dikarî weke giyayekê bijî, lê belê ev nayê wê wateyê ku nîşaneyekî jiyanek başe. Tu dikarî bêjî li Ewrûpa yê di warê ekonomîk de rewşa min başe yan jî li ser navê hinekan dikarî bibî hunermendek jî. Ev nayên wê wateyê ku mirovê Kurd ji bo rastiya xwe ya netewî dijî. Ma ya girîng raveya dîroka bingehîn a xwe û rastiya civaka xwezayî ye yan na, û peywendiya wê**

**pêre heye yan na? Eger wisa be dikare îdîa bike ku dijî. Mûçeyek heye, lê belê tu vî mûçeyê ji kî digirî? Dibêje, baş rehetbûm, "*sinetkarek başim*" lê belê ji bo kî? Bi kîjan dîrokê re, bi kîjan rastiya civakî ya bingehîn re peywendiya wê heye? Weke giya dijî, lê belê dibêje "*Ez Kurd'im*" an jî "*Ez jî Tirk'im*. " Ti wateya vê yekê nîne. Weke keran kar dike ewqas. Nabe ku nasname bi vî rengî bê nîşandan. Bi hemû awayî demagojî û şovenîzma vê nikare bibe peyta nasnameyê. Binasname bûyîn, tê wateya mirov bi nirxên bingehîn ên rastiyê ve girêdayî ye. Ancex rastiya îdeolojîk, siyasî û şoreşî dikare bibe nasnameyek.**

**Ji bo van hemûyan jî huner; bangawaziya "*Nasnameya xwe peyda bike û bi rastiyê re peywendiya xwe ava bike*" ye.**

**Berovajîvê; ne hunere, demagojî ye, her wiha xwepêxweşkirin, li ser**

**navê hunerê paşverûtî û jirêderxistine. Huner di civakê de, xwedî wê taybetmendiyê ye ku dikare jiyana ferd zindî bike û rih bidiyê.**

**Tu dikarî bê aborî kêm jî be bijî, lê belê tu nikarî bê rih û ax bijî.**

**Heta eger em di warê îdeolojîk de jî rola hunerê destnîşan bikin; mirovek çiqas bikeve nava hunerê, ewqas dikare temenê xwe dirêj bike û xwe hinekê têr bike. Kesekî sêhrkar, efsûnkar, zanyar, oldar û hwd. çiqas bikeve nav hunerê, ewqas dikare serbikeve û xwe têr bike. Siyaset, heta zanist jî peywendiya xwe bi hunerê re heye. Ji bo wan jî ev mijar bi vî rengî ye. Tu çiqas xwe bixî nav hunerê, tu ewqas dikarî serkeftî û bibandor bî.**

**Huner, tê wateya rihekî afirîner.**

**Espiriyeke!**

**Dema ku te civak ji hunerê qut kir, tê wateya ku te ji nasname û rih jî**

**qut kiriye. Ya li paş dimîne jî koma tilxeya (moloz) ye.**

**Niha, mijareke din a divê em zêdetir li ser rawestin wêje ye ku, beşekî hunerê ye û em dixwazin peywendiya wê bi hunerê re danin. Di esasê xwe de leşkertî jî hunereke. Bêguman, bi zanistê re jî girêdanên xwe gelekin, siyaset jî bi vî rengî ye, lê belê aliyên xwe yên bi hunerê ve girêdayî zêdetirin.**

**Tê zanîn ku metingerî di qada wêjeyê de jî komkujiyek mezin pêk aniye. Ango li qada wêjeyê bandora mêtingeriyê gelek zêde ye. Li qada wêjeyî jî nirx têne mêtin. Heta bi her awayî amûrên ku li Kurdistanê dikarin ji bo wêjeyê bên bikaranîn, di mûxila mêtingeriyê re hatiye derbaskirin û weke çekeke dijber têne bikaranîn. Her wiha eger wêjeya Tirkî were lêkolînkirin; di avakirina wê de jî rewşa me weke amûrekê hatiye bikaranîn. Ev rewş, di mijara mûzîkê**

**de jî wisa ye. Bi taybetî jî, yek ji qadên herî bingehîn ên wêjeyê; di helbest û romanan de jî hemû tiştên ku hatine bikaranîn misoger melzemeyên Kurdan'in. Lê bi şêweyê Tirkî ne û mohra Tirkan lê hatiye xistin.**

**Di esasê xwe de rastiya Kurdan, rastiyek ji bo wêjeya şoreşê destbikare.**

**Eger wêjeya şoreşê bê avakirin, evê li hemberî mêtingeriyê bibe hêzekî pir mezin. Mêtingerî, ji bo ku pêşiya vê yekê bigire, nirxên Kurdan – evew rastiyên civakî ne ku bi awayekî misoger pêdiviya wan bi şoreşê heye- digire nava xwe û dihelîne. Ji ber vê yekê hinekan teşwîq dike, hinekan ditirsîne û dixe zindanan, derfetan dide hinekan û di encamê de bi xwe ve gire dide. Ev jî dibe sedem ku bi çavekî xirab li nirxên Kurdan binêrin. Bi teşwîqkirinê re zêdetir genî dike.**

**Encam; girseyekî mezin a wêjeyê ya ku hatiye helandin, weke artêşeke mêtinger li hemberî nirxên netewî didin şerkirin. Niha ev mijar gelekî eşkere ye; hema hema hemû stran xwe dispêrin rastiya Kurdan, lê belê li hemberî Kurdan bi temamî weke kontrayan dixin nava şer. Eger em hinek stranbêjan, artîstan bînin ber çavên xwe, wê ev rewş baştir bê fêmkirin. Ev, li Emerîkayê jî wiha ye. Li gelek welatan ên ku hatine helandin û têne mêtin, kêm netewe ne. Yên hatine bişaftin; li şûna ku bi pey derd û pirsgirêkên gelê xwe bikevin, li hemberî gelê xwe di nava êrîşan de ne. Ev mijar di rastiya Kurdistanê de bi awayekî şênber hatiye afirandin. Dijmin, ji aliyekê ve bi artêşa xwe ya leşkerî, polîs û cendirmên xwe ve di nava şer de ye, ji aliyê din ve jî bi kontrayên wêjeyê ve vê qadê bombebaran dike.**

**Ev, bi rastî jî gelek bi êşe.**

**Bi êşe. Tevî ji nava gelê xwe derketine û heta xwe gelparêz didin nîşandan jî, rê li ber xirabûnekî nasnameyê vedikin; bi rastî jî ev ji cinayetê xeternaktire. Birîndarkirina gelê me û kuştina wan a ji hêla manevî ve divê weke xeteriyek biçûk neyê dîtin.**

**Li vir tişta mewzûbehse, bi Kurdî neaxaftin û wêjeya Kurdî pêşnexistinê wêdetir, di cewher de ji dest dayîneke. Qutbûna ji rastiya Kurd di asta agahiyê de nîne; zêdetirîn jiyankirina înkarêye an jî bikaranîna hinek peyvên cuda, esasgirtina tinebûn, bişaftin û ji bo vê jî helandin asayî dîtin û xirabûna bêdawî, dîsa di kesayeta xwe de zîhniyetekî wiha avakirin, tişta herî xeternake. Êşa wijdanê nekişandin an jî neheqî nedîtin, heke bibîne jî ti tişt nekirin, tişta herî xetere. Heta ji polîs, cendirme û kontrayan zêdetir rê li ber encamên xeter vedike. Ji ber dema**

**ku te rihê mirovan kir kole, dema ku te nasnameya wî/wê qermiçand, di esas de tê wê wateyê ku te darbeya herî xedar lêxistiye. Li cem me jî ev rewş heye û xwestin ku bi rêka helbest, sînema, nîgar, roman, mûzîk û hwd. bê derbaskirin. Lê ev jî bi zora şoreşa me tê kirin. Nexwe em dizanin, yên esas didin windakirin, yên ku li qada netewî û nasnameyê didin windakirinin.**

**Vegotina neyîniyan ji hêlekê ve karê wêje û hunerê ye.**

**Rastiya dîrok, welat û gelekî ku bi çeka hunerê hatine kuştin û her wiha tevkujiyên di bin navê hunerê de hatine kirin eşkerekirin, pir girînge. Encamên qutkirina ziman û rihê civakekê bi vî awayî pir baş nîşandayîn, erkekî herî girîng ê wêjeyê ye. Ji bo ku ev bê diyarkirin, pêwîstî bi bûna şoreşgerekê jî nîne. Ji wan kesên ku dibêjin; "*Bêyî ku ez ser bi rêxistinekê ve jî bim, dixwazim***

***bibim wêjewan*" dibêjim; ger di vê wateyê de rastî jî dixwazin bibin wêjewanek bê partî û bê rêxistin, divê ew di serî de tevkujiya rihî, tevkujiya hestî, tevkujiya nasnameyê û tevkujiya dîrokê derbixin holê. Bi vî awayî xwe spartina yek-du peyvan û sergirtin nabe, ji hemû aliyan ve derxistina holê, ancex dikare wî kesî bike wêjewanekî durist.**

**Mixabin di vê mijarê de wêjevanên cewherî nînin. Ne wêjewanekî Kurdistanî û ne jî yeke Tirkiyeyî heye ku tevkujiya rastî û xirabiya ku li ser gelan hatî pêkanîn, lêkolîn bike û nîşan bide. Ji xwe mirov kesêk ku bêje,"*Ez wêjewanekî Kurdistanî me*" peyda nabe.**

**Hejmarek mezin a wêjevanên Tirk jî ji vir û wir berhevkirî ne. Hemû kar û barên wan jî ewe ku bîrdoziya fermî bi şêwazê hunerê bi civakê bidin bawerkirin. Bi helbestan hewldidin dewletê an jî jiyana**

**Kemalîstî bilind bikin. Bi temamî şêwazê jiyana fermî ya komarê ye ku li ser romanên wan jî serwere. Elbet ev jî li ser tevkujiyên gelan, li ser mêtina keda gelan hatiye avakirin. Her wiha huner û wêjeyeke ku nikare ji van sînorên fermî bibore, di esasê xwe de darbeya herî xedar li gelan dixe. Li Tirkiyê ev pir zêde tê jiyankirin.**

**Ne gengaze ku mirov behsa wêjewanekî Kurdistanî bike. Di rewşa heyî de wêjevanên bi vî rengî tine ne. Dibe ku hinek kes peywendiya xwe hebin û dixwazin fêmbikin. Em devjê berdin ku ji van re bêgotin hunermend û wêjevan, ji bo qezenckirina wan jî pêdivî bi fedakarî û dilê mezin heye. Ev, bê edebên mezin ên wêje û hunerê ne. Ji bo ku bibin wêjevanên baş, divê mirov destpêkê wan bi edeb bike.**

**Tu dê rastiya dîrokê pir baş bi wan bidî fêmkirin, rastiya jiyana gel,**

**rastiya nasnameya gelekê û her ku çû tu dê rastiya vî şerî pê bidî qebûlkirin da ku hinekê bibe xwedî terbiye. Terbiye tenê wisa dibe. Eger bi vî awayî mejiyê bi van nirxan ve biponije û rihê zindî bibe, dikare bi terbiye be. Piştî wê dikare berê xwe bide hinek rastiyan. Piştî wê mirov dikare behsa hinek taybetmendiyên wêjewaniyê bike. Nezanekî mezin, misoger nikare bibe wêjevan. Keseke ku rastiyên xwe yên bingehîn winda kirine, çi dibêje bila bêje kes cidî nagire; nikare bibe wêjewanekî netewî yê baş, wêjewanekî çînî yê baş û wêjewanekî civakî yê baş.**

**Huner, nasnameya netewî û civakî û siparteka dîrokî ferz dike û her wiha teşegirtinekî netewî li mirov ferz dike. Dema ku ev qet nebin, wê demê divê mirov pirsek weke kanê hunermendê netewî, kanê hunermendê civakî? Bike. Dema ku rewşa heyî ya Kurdistanê dibe mijara**

**gotinê, tinebûn zêdetir kûr dibe. Ji bo derbaskirina vê jî me got; "*Zimanê wê yê çareseriyê şoreşe.* "Heta ku şoreşgerek rê li ber pêşketinek baş veneke, bênasnamebûnê, bêrihbûnê û dawerivandinê bi şoreşê neşkîne, ne gengaze avakirina mirovek bi edep û ji bê edeban mirovek wêjevan derbikeve. Her wiha weke çareseriyeke bingehîn a pêşketina wêjeyê, rast bû ku me bi temamî rêbaza şoreşgerî ji xwe re esas girt. Hinekan digot;"*Em bi wêje û hunerê re şoreşê pêkbînin.* " Dibû ku pir kêm bandora xwe hebûya, lê belê di rastiya qetilkirî ya Kurdistanê de wêje ewqas xilas bibû û bêbandor bû ku, ne gengaz bû pirsgirêka netewî bi wêje û hunerê bihata zindîkirin û têkûzkirin. Heta dibû ku encamên berovajî jî derxistiba holê. Ya rastî li Sowyetan hinek derdor û zîhniyetek bi vî rengî hatin avakirin. Qaşo hinek rêxistin, partî û kom hebûn û**

**digotin;"*Pirsgirêka Kurd pirsgirêkekî çandiye*", lê belê wan jî nekarî xwe ji kombûnekî çandî û jirêderketîbûna wê rizgar bikin. Qaşo xwestin bi rêka bikaranîna zimanê wêje û hunerê vê pirsgirêkê çareser bikin. Lê me pir baş dît ku ev ne gengaze. Pratîka me jî ev mijar bi awayekî balkêş raxiste ber çavan. Lê dikare bibe bangawaziyek. Ji bilî vê wêje nikare bi tena serê xwe zêde bibandor be. Heta pêdiviya wêjeyê bi pêşketin û rizgarbûnê heye. Ev jî şoreş dikare bike. Şoreş; destpêkê qezenckirina mirovê ku hatiye fetisandin, nasnameya wî/wê ji destê wî hatiye standin, zimanê wî ji destê wî hatiye standin, mirovê canê wî derketiye ji xwe re dike armanc.**

**Mirovê şer dike, mirovê hatî bidestxistine.**

**Bi mirovê şer dike re hewldan heye. Dibêje; "*Dixwazim bijîm.*"**

**Wê demê çawatiya jiyanê, jiyana bi wate û ya tê pejirandin tê hişê mirov. Ew jî mirov ber bi wêjeyê ve dibe. Nexwe, kesê ku ji cihê xwe nalebite û devê xwe bikar nayîne, wê çawa bibe wêjevan? Elbet, ez di vê mijarê de behsa wan wêjevanên ku dijmin bi teşwîqan xelat dike, nakim. Ew, bilbilên dijminin. Ew parezvanên bîrdoziya wî ya fermî ne. Ew dikarin bibin wêjevanên dijber, heta nikarin bibin wêjevan jî. Ji ber ku wêjevan nikare rastiyan paşguh bike an jî di esasê xwe de civakî ne. Eger bibin jî dikarin bibin demogog, ew kontra ne, êrîşkarin, faşîstin û şovenin. Em nikarin ji yên wiha re bêjin wêjevan. Her wiha ya rast ew e ku divê bi şoreşê mirov bêne qezenckirin, bêne zindîkirin, da ku zemîna wêjeyekî bihêztir were afirandin.**

**Di vê mijarê de şoreşa me bi rastî jî şûngehekî wêjeyê ya mezin daye avakirin û ev jî bê nîqaşe.**

**Mirovên ku dibînin, mirovên ku erkdarin û mirovên ku dijîn, li cem me ne. Ya ku evqas girtîgehan dijî, evqas çiyayan dijî misoger zemînê wêjeyê ye. Yê ku evqas bi teoriyê ve mijûl dibe, evqas bi diyardeya hêzê re mijûl dibe, derfetekî mezin ê wêjeyê afirandiye. Wêje, bedewkirina jiyanê ye, espriya jiyanê ye, rihê wê ye û dewlemendiya wê ye. Em gelekî baş dibînin ku ev jî bi şoreşê re tê bidestxistin. Ev mijar di asta pênaseyê de wiha ye, bêguman pirsên wê yên gelekî giran jî hene. Dikare bi hinek şêweyên wêjeyê ve, çi bê kirin? Heta hemû şêweyên hunerê niha ji bo şoreşa me dikarin çi rolê bilîzin?**

**Me hinekê mûzîk zindî kir. Heta me dîwarê înkarkirina fermî hilweşand. Mûzîka Kurdî ji xwe re qadek dît. Ev gava destpêkê ye. Her wiha qedexeya nivîsên Kurdî hatin şikandin. Qadên mûzîk, nîgar û peyker hatin afirandin, ji van re zemînek hate**

**pêşkêşkirin. Lê ev qad, ewqas ji terbiyên xwe bêparin û di vê mijarê de ewqas înkargerî heye ku, yên ku pê re peywendîdarin pir kêmin, an jî qet tine ne. Eger peywendiya xwe hebe jî bisernaxe. Çima? Ji ber ku terbiya xwe tine ye. Ev kar zanebûnekî dîrokî dixwaze, dil dixwaze, ji bo ku dil jî hebe divê teşegirtina civakî bibîne. Divê êşa civak, qira civakê, tinebûna civakê û vejîna civakê bibîne. Di vê mijarê de kêm eqilbûn heye. Eger bê amadekarî û bêterbiye bê axaftin, bi zimanê fermî bê axaftin û gotinên fermî bê axaftin, wê wisa binivîse û xêz bike. Ji ber ku di dibistanên Tirkan de vê fêrbûye. Pir zêde haya xwe ji rastiya gelan tineye. Rastî, di wê rastiya şoreşa ku tê ferzkirin de ye. Lê kesayeta wî ji vê re ne amadeye. Yên bingehîn, yên pêşeng û şoreşger eger evqas bê amadekarî ne, wê wêjevan çawa amadekarî bikin? Ji bo ku**

**bikare amadekariyan bike, divê bi qasî şoreşgerekê wêrek be û mejiyê wî jî kar bike. Ev, hinek ji wan pirsgirêkanin ku li qada wêjeyê têne jiyankirin. Lê em dikarin bi wêjeyê tevkariyekê ji şoreşê re bikin.**

## Kesayeta Kurd

**Di vê navberê de em li ser kesayeta Kurd ponijîn.**

**Lêhûrbûna me bingeha xwe ji sedemên siyasî girt, a rastî kesayetiya Kurd dibe girêkek kor; wexta em ber bi erkên leşkertiyê ve diçin û hewl didin bi siyasî û rêxistinî bin derdikeve holê. Me dît ku kesayetên di destê me de, belane... Me pirsa ev mirov çima wisane kir û got em hinek dahûrandinan pêşbixin. Bi derbaskirina sînorên siyasî ve em ketin qada civaknasiyê, qada derûnî û qada wêjeyê. Ji ber pirsgirêka heyî, girêkek kore! Ji ber mirovên bêçare,**

**bê ziman, newêrek û bê hest hene. Ji bo cixarekê, ji bo şorbeyekê yên kêleka xwe dide kuştin û dibêje; "*Min fermandartî kir*". Ji bo têkiliya ehpabî xwe dide tinekirin, dibêje; "*Min xwe peyitand.* "Diçewsîne, hemû nirxên partiyê binpê dike, dibêje; "*Min kesayeta xwe peyitand*" an jî "*Min tola xwe stand*". Tam li hedefê naxe. Çep û rast belav dike, dibêje; "*Min çalakiya herî mezin pêk anî*. "**

**Ev hemû jirêderketina kesayetî ne. Em bi xirabûnekî pir mezin a kesayetî re rû bi rû ne. Derdikeve holê ku ev girêkek kor û giloka tawana ye. Ev çawa bi vî rengî bûne giloka tewanbariyê? Di dahûrandinan de em gelek li ser vê mijarê sekinîn. Ez jî neketibûm ferqa wê ku ka çawa evqas tiştên tawan hatine kirin. Lê belê piştre me raxiste ber çavan ku, bi rastî jî civakekî şête. Di nava partiyê de jî beşekî girîng giloka tewananin. Ji xwe tewanên wan**

**derketin holê. Tawanên herî giran; tawanên rêxistinî, tawanên leşkerî û tawanên siyasî hatin dîtin.**

**Min ev bi sehim dîtin.**

**Ev rewş dikare bi çi were derbaskirin? Eger em van kesan derbas bikin, ji xwe dijmin hezaran carî parçe kiriye, beş kiriye û vê carê jî dixwaze bi destê me beş bike û parçe bike. Ev jî dibe dubarebûna çîroka kevin. Ger em vê rewşa tawanê bipejirînin, wê demê emê şoreşê tine û tasfiye bikin. Ger em rêya rast bibînin, ev jî hêz, jêhatîbûn, sebir û hêza çareseriyê dixwaze. Wêje jî di vir de rola xwe pêktîne. Eger bala xwe bidin ser, dahûrandinên ku em dikin, ji tehlîlkirinek siyasî wêdetir, di astekî girîng de nêzîkî romananin. Aliyê van nirxandinan yên romanî zêdetirin. Hema hema şêweya kesayeta netewî hat dahûrandin. Dahûrandin, kêm-zêde kesayetên bingehîn derxistin**

**holê. Rola herî bingehîn ya romanê jî; afirandina kesayetan û derxistina holê ye. Hewldide kesayetên civakî bafirîne an jî kesayetên heyî yên civakî analîz dike û jihev cuda dike. Tişta ku em jî dikin bi giranî eve. Lê belê, me ev yek ne ji bo wêjeyê, ji bo derbaskirina xetimandinên şoreşgerî, bûhrana kesayetî û nexweşiyan me ji xwe re weke erkekê zanî.**

**Dahûrînên heyî yan jî kêrhatina wêjeyê wisa derket holê.**

**Eger wê xebatekî pir bihêz ê wêjeyê were pêşxistin, wê bi van dahûrandinan ve girêdayî pêşbikeve. Me hîmê wê li wir danî. Bi rastî jî girêdana wê ya bi dîrokê re, bi rastiya civakî ya bingehîn re, her wiha bi armancê rasteqîn, bilindbûn û rizgariyê re bi temamî hatiye diyarkirin.**

**Kêm-zêde kesayeta têkûz, yê rizî, yê kirêt, yê xweşik, yê xayîn, yê rizgarîxwaz, yê nexweş û di nava**

**bûhranê de ye û yê çareserker hemû jî hatin destnîşankirin.**

**Ango hinek taybetmendiyên van kesan ên bingehîn ku; weke taybetmendiyên welatparêziyê, yên siyasîbûnê, bûna rêxistin û bihêzbûnê hatin destnîşankirin. Taybetmendiyên ku di xizmeta dijmin de ne, hatin diyarkirin. Ji ber ku bingeha xwe ji gelek rastiyên bingehîn qut kiriye, me nîşan da ku çawa bûye eware û berdoş. Ango me kesayata berdoş, yên reviyayî û yên şêt rave kirin. Heta me got ku '*ev civak dîn bûye*'; me behsa civata dîn û har, civata ketiyan, civata nexweşan kir. Lê mixabin, her çend zora me jî biçe, her yek ji van rastiyeke.**

**Ev tev didin nîşandan ku wêje tê kirin. Ev tê wê wateyê ku wêjeya Kurdî hinekê bi vî rengî tê pêşxistin. Ango ya beriya niha dihat kirin gelo wêje bû? Hinek romanên ku behsa tevkujiya Dersimê û tevkujiya Agiriyê**

**dikin li gorî bîrdoziya komara Tirkiyê hatine nivîsandin. Ev rewş, di cewher de pesnê tevkujiyê ye. Her roj di televîzyon û sînemayan de Kurdan bi awayekî herî ketî didin nîşandan û henekê xwe pê dikin. Ev, harbûna mêtingeriyê ye.**

**Dema ku te got Kurd, kesê ku zimanê wî yê Tirkî xirabe, bêçare, keseke ku henek pê têne kirin û tê bikaranîn, tê hişê mirov.**

**Ev yek di wêjeyê de jî û sînemayê de jî bi vî rengî ye. Bi taybetî bi vî awayî di televîzyonan de hatiye bicîhkirin.**

**Di qada wêjeyê de ji xweşermkirinekî pir mezin û dev ji rastiya xwe ya civakî berdan, weke rolekê hatiye destnîşankirin. Kesê ku wêjeya şoreşgerî dike, singê xwe dide ber van hemûyan. Ya rastî, şerê eşkerekirina vê yekê dimeşîne.**

**Em hîmê van hemûyan datînîn. Hîm danîn çiye? Ji mirovê Kurd re**

**nasname û rastiya wî nîşan dayîn; ev tu yî bes eger tu vê bi awayekî rasteqînî nekî, tu nexweşî, cûceyî, ketiyî, qeşmerî, xayînî, hevkarî, teslîmkarî û bê rihî! Na eger tu bi awayekî rasteqînî bikî wê çaxê em ê peyvên weke tu milîtanî, zaneyî, başî û xweşikî! Rêz bikin. Wêjeyekî netewî, bi van têgînan kar dike, bi van têgînan zindî dibe, bi van têgînan rih digire û rola xwe jî di nava civakê de bi awayekî herî bihêz pêk tîne. Yek jî, em aliyê vî karî radixin ber çavan.**

**Erê, em dikarin behsa pirsgirêka wêjeya şoreşgerî bikin. Dibe ku pêdivî bi pêkanîna vê rêbazê hebe. Mirov him dikare li ser vî bingehî li dîrokê binêre û him jî li pêşerojê binêre. Dikare li ser vî bingehî romanên dîrokî bên nivîsandin. Dikare di derbarê pêşerojê de jî romanên hêviyê, çîrok û helbest jî bêne pêşxistin. Dikare nîgar û mûzîk were pêşxistin. Dikare ji nû ve qalibên kevin û qalibên netewî**

**bêne bilêvkirin. Dikare zêde li ser rojane bê rawestîn. Ji ber ku serûbinbûnekî pir mezin tê jiyankirin.**

**Di esas de wêjeya herî girîng ewe ku bikare vê serûbinbûnê bîne ziman. Divê giyanên mirî û giyanên zindî an jî rasterast giyanwer zindîkirin û li ser bê rawestîn. Ji ber, beşekî mezin a ku li cem me ye û li ser piyên xwe digerin, dikare bê gotin ku miriyên zindî ne. Di vê mijarê de tişta ku herî zêde em dibînin, ev mirîbûna ku em dixwazin di jiyana xwe de mehkûm bikine. Em dixwazin civakê an jî beşekî mezin ê vê mirîbûnê ji rewşa miriyên ku digerin, derbixin. Gelek taybetmendî nûnertiya mirinê dikin. Taybetmendiyên we yên bê eleqe, sar, cirnexweş û dirizîne aliyên we yên mirî ne û gelek jî tê jiyîn. Aliyên we yên ku zindî dibin, bisînorin. Ji xwe weke heyranbûn û xwesteka jiyanê û vejîn dibin jî hene. Niha di vê**

**rewşa serûbinbûnê de tiştên ku bi jiyankirinê re xwe nîşan didin, evin.**

**Gelek caran di rewşên weke; şehadetan de zindîbûn, di işkenceyên giran de liberxwedayîn dîtin, di kêliyên dihese ku jiyan dike de dibîne ku çiqas miriye; bi kurtasî mirov dikare gelek cewaziyên di jiyanê de tên jiyîn bibîne. Me diyar kiribû ku, kesekî piştî van dahûrînan li civakê temaşe kiriye, ji civak û jiyana kevin şerim kiriye. Raste, niha nêrînek weke "*me çawa wisa jiyankiriye*" bi şermekî pir mezin civak dorpêç kiriye. Ev pêşveçûnek başe. Ango ketine wê ferqê ku mirovê mirî çiqas riziya ye. Di wan de kelecana jiyanê pêşdikeve. Mirov dikare bi wêjeyê, van yekan pir baş bîne ziman. Wêjeya herî balkêş ewe ku bikare di van demên serûbinbûnê de nîşan bide, ka divê çi bimire û çi jî bijî? Erka wêjeyê ya sereke eve. Hemû beşên din ên hunerê jî, ji yên ku divê bimirin re**

**nivîsandina fermanê û bi heman awayî ji yên ku divê bijîn re jî pesna jiyanê didin û bi vî rengî rola xwe tînin cîh.**

**Elbet em tenê didin destpêkirin. Em di van mijaran de zemînan pêşkêş dikin. Ji bo kesên ku wextê wan heye, di nava kar û barên giran de nînin û dixwazin bi rêka wêjeyê hinek karan bikin, zemînekî mezin hatiye pêşkêşkirin. Dikare him mînakên dîrokî, him mînakên di derbarê siberojê de û him jî mînakên ku gorankariyekî rojane pêş bixin. Ev jî wê rasterast biguherînin. Rastiya me ya rewşenbîriyê ya ku tevkujiyên mêtingeriyê li ser hatiye pêkanîn û hatiye bişavtin, bihêlin bibin wêjewanekî bi vî rengî, rola astengbûna xwe didomîne. Lê belê êdî ev qad ji wêjevanên bi vî rengî re firsendan nade.**

**Zemîna me heta dawî şoreşgerî ye.**

**Zemîna, tehlîlên şoreşgerî, zemîna bangawaziya şoreşgerî û zemîna rihê şoreşgerî ye.**

**Êdî ew nêzîkatiyên mêtinger ên kevin xilas bûn. Heta êdî nikarin henase jî bidin û bistînin. Ew helbestvanê dema bihûrî jî, mûzîk û romankarê dema bihûrî jî li hemberî rastiya Kurdan, dikarin bi awayekî jidil li xwe mikûr bên. Bibêjin; "*Ez xayînekî çawa bûm, ez çawa hatim lîstokê û ez çawa hatim bikaranîn*?" dikarin behsa vê yekê bikin û li xwe mikûr bên û ber bi rêka rast ve bimeşin. Ez bawerim ku wê lixwemikûrhatinên wiha yên weke; "*ez xayînekî çawa bûm, teslîmkarekî çawa bûm, ez amûrekî erzan ê çawa bûm û ez çawa li hemberî gelê xwe hatim bikaranîn*?" bêne pêşxistin. Piştre jî eger hêza te hebe derbixe holê, baxive, zindî baxive, behsa bihûştê û dojehê bike, behsa berxwedanê bike, behsa işkenceyê**

**bike, behsa bilindbûnê bike; kirêtiyê bîne ziman, li xweşikbûnê bigere, dijminatiyê, hezkirinê û dostaniyê binivîse.**

**Hezkirin, di vê mijarê de melzemeyekî gelek bihêze. Şoreş, bi qasî ku ji bo serkeftinê ji her kesê re derfetan pêşkêş dike, ji wêjevan re, ji yên xwestina di warê wêjeyê de gavan bavêjin re jî derfetên girîng pêşkêş kirine. Lê bele, eger di vê mijarê de wêjevan tembel be, tişta amade dixwaze û bi awayekî rêkûpêk nikare xwe jî bimeşîne, ji wî kesî ti tişt dernakeve. Dema min jî derbas dike, eger nikare gelek mijarên ku bi salan li ser sekinîme tespît bike, nikare bibe wêjevanekî xurt. Eger ew bixwe kesekî bê rih be, berovajîker be, ew nikare gelekê bi şoreş û wêjeyê ve terbiye bike. Nikare vê hunera wêje û wêjevaniyê bi hêjayî pêk bîne. Wê teng nêzî pirsgirêkan bibe. Bila ew bi xwe jî pirsgirêkan**

**bibîne û jê re bibe hêza çareseriyê! Ger bixwe jî pirsgirêkan rast nebîne, nikare bi xwe jî şîrove bike û piştre jî bêje; "*Ez wêjevanek başim*" ev xwe xapandine.**

**Her çendî zemînê wêjeyê wiha ye, divê mirov bêhêvî nebe. Ji xwe hê ji niha ve hinek hewldan hene. Şoreş wê van hewldanan bileztir bike. Wer tê fêmkirin ku, şoreşa ku bi erênî pêşdikeve, pirsgirêkên xwe dixe rojevê û xwe nêzî çareseriyan dike, derfetên pir mezin ên wêjeyê jî derxistine holê. Di vê rewşa tevlîhev de ku em jî evqas derfetan ji bo wêjeyê pêşkêş dikin, tê wateya her ku biçe wê bikeve meriyetê. Ev ê rola xwe ya baskbûn-şaxek ji hunerê bilîze. Ji ber di dîrokên gelek netewan de, bi taybetî jî di pêvajoyên şoreşan de nifşekî pir xurt ê wêjevanan derketiye holê. Di Şoreşa Fransayê de jî wêjevanên mezin derketin holê. Her wiha yên ku serdema civaka feodal**

**reşdikirin, xirab didan nîşandan an jî jê hezdikirin -ku ev kes bûn ku nûnerên pêşverûxwaz bûn- em ji felsefeyê bigirin heya exlaq ên ku ev cudahî pêşdixistin gelek bûn. Fîlozofên wan, mûzîsyenên wan û wêjevanên wan ên mezin hene. Hêjî ew berhemên klasîk têne xwendin.**

**Her wiha beriya Şoreşa Sowyet'an û piştî şoreşa Sowyet'an nifşekî wêjevan hebû. Ji ber ku em hîn baştir dibînin ew jî bi van pirsgirêkên ku em îro pê re mijûl dibin ve mijûl dibûn. Em ji '*Çawa Bikin*' û '*Çi Bikin*' bigirin, heya 'Şer û Aştî' klasîkên bê hempa yên ku hewldanên pir mezin ên di salên şoreşê dehatine jiyîn vegotîn hene. Hema hema di hemû pêvajoyên şoreşên gelan ên serûbûnbûnê de em dizanin ku berhemên wêjeyî yên mezin hatine pêşxistin. Niha eger ji bo me jî ketina pêvajoyekî wer cidî ya şoreşê mijara gotinê, wê demê bi awayekî bivê-nevê**

**wê nifşekî wêjevanan derbikeve holê û rêz bibin. Lê belê çima li cem me beriya şoreşê nifşekî bihêz ê wêjevanan derneket holê?**

**Em vê mijarê bi mezinabûna tevkujiyên mêtinger û bişavtinê ve gire didin. Bi awayekî misoger ji ber mêtingeriyekî pir tund, mejiyên mirovan hêj di lendikê de bi bişavtinê têne fetisandin, dil û rih jî têne qerisandin. Tu nikarî li rastiya xwe binêrî, tu nikarî bi du peyvan bêjî; "*Ez Kurd im*"; wexta demekî dirêj jî bi vî rengî bû, ma mirov dikare behsa kîjan dîrok, kîjan rastiya netewî, civakî û kîjan wêjevanan bike? Sedemjî eve.**

**Her ku şoreş pêş dikeve, bi taybet jî şîdet her çend dîwarên mêtingeriyê dihilweşîne, wê wêje jî pêş bikeve. Ev nirxandinekî raste. Dikare di demekî wiha de bûyerekî bi vî rengî pêşbikeve. Ji xwe tevgera me, di heman demê de weke tevgerekî mezin ê wêjeyê ye.**

**Dahûrandinên me hemû mijarên siyasî, leşkerî, rêxistinî û civakî digire nava xwe. Carna mirov dibîne aliyê wê yê civakî li pêşe, carna aliyê wê yê derûnî ketiye pêş, lê belê di heman demê de leşkerî ye jî. Di bingeh de ev bûyer li hev aliya ye. Kesayeta Kurdan, him ji aliyê leşkerî, siyasî, civakî, netewî û çandî ve hatiye serkutkirin û him jî ji aliyê wêjeyî ve hatiye serkutkirin ku; bi vê ve girêdayî derbaskirina vê kesayetê, li ser vê kesayetê sekinîn an jî serûbinkirin, divê pêşketinên leşkerî, dahûrandinên siyasî, wêjeyî û civakî bêne kirin. Bi vî awayî çiqas aliyên riziyayî hebin, hemû dimirin. Ji aliyê fizîkî ve eger hinek xalên zindî hebin, ev jî pêşdikevin. Piştî wê jî di warê derûnî de, civakî, rihî û leşkerî rê li ber pêşketinan jî vedikin. Ji ber xisleta zextkar a mêtingeriyê ev rewş li Kurdistanê ev wisa ye.**

**Eger li ser çandê zext nebin, wêje dikariya bi awayekî hîn cudatir pêşbikeve. Eger ji pêşketinên civakî re jî vekirî bê hiştin, weke mînak; - eger em mêtingeriya Emerîkayê buna-, wê aliyên civakî û çandî serbest bihatana hiştin, heta wê pêşiya pêşketina van bihata vekirin û dibe ku di warê çandî û wêjeyî de pêşketinên cuda jî bihatana jiyankirin. Ne gengaze ku mêtingeriya komara Tirkiyê pêşketinên civakî serbest bihêle. Heta tevkujiyên çand û ziman mijara gotinê ne, her wiha rê nadin ku kevneşopiya civakî rêka huner vebe û mûzîk li ser lingan bimîne. Îro li Îsraîlê jî, li nijadperestiya Efrîqaya Başûr jî zextekî wiha tineye. Li wan deran Ereb û yên Reşik xwedî mûzîk û wêjeyekî bihêzin. Ji ber ku nayên qedexekirin, ew jî rastiyên xwe yên civakî dijîn. Ji ber li ser wan sînorê zextê nehatiye danîn, xwe têkil pêşketinên wan ên li qadên cur bi cur**

**nakin; berovajî vê yekê derfetan pêşkêş dikin. Li cem me, yek ji van jî tineye. Her wiha, pêşketina me, wê bi awayekî giştî pêk bê. Ango her kesê li cem me wê hinekê siyasî be, hinekê leşkerî be, hinekê bibe wêjevan, hinekê hiqûqnas; ango wê van hemû mijaran di xwe de ava bike. Tişta ku bi giştî hatiye windakirin, wê bi giştî jî bê qezenckirin. Ev qezenckirin, neçare ku giştî be. Rastiya mêtingeriyê vê tiştê ferzdike. Ji ber vê jî eger kesek rabe bêje; "*Ez leşkerim, ji siyasetê fêm nakim*" an jî bêje; "*Ez siyasî me, ji jiyana civakî fêm nakim*" xwe xapandine, nedîtina rastiya mêtingeriyê ye.**

**Bi giştî hatiye windakirin, wê bi giştî jî bê qezenckirin. Elbet, ev nayê wê wateyê ku dê ji hev neyên cudakirin. Qada leşkerî, beşa eniyê û xebatên civakî wê cuda cuda bêne pêşxistin. Lê belê xelek bi awayekî pir tund bi hev ve girêdayî ne. Wê hev**

**bandor bikin û hevdu mezin jî bikin. Tu nikarî ji bo her qadekê partiyekî cuda ava bikî, lê em behsa li ser bingehê xweseriya hevdu bihêzkirinê dikin.**

**Wêje li dijî leşkertiyê, leşkertî jî li dijî wêjeyê nîne.**

**Berevajiyê vê yekê, pêşiya hevdu vedikin. Şoreş, li pêşiya bûyîna wêjevanekî xurt ne astenge, berevajî rêka bûyîna wêjevanekî xurt vedike. Wisa ne li ser bingehê dijbertiyê, divê li ser bingehê hevdu pêşxistinekî pir mezin, were dîtin.**

**Elbet, ev pêşketin, li dijî bandorên mêtingeriyê ne. Ev, li hemberî tevkujiyên mezin ên ku mêtingerî di qada wêjeyê de pêşxistine, bersivekî mezine. Eger hûn ji vê yekê nerehet dibin, wê çaxê hûndi bin bandora mêtingeriyê de ne. Weke keseke ku nikare bibe rêxistinekî baş, nikare bibe siyasmedarek baş û bibe leşkerekî**

**baş, bi kesayeta xwe ya kole re weke têkiliya xwe ya li gel axa... Ev xal ji bo wêjevanan jî bi vî rengî ye.**

**Hûn dibînin, di giştî de huner, bi taybetî jî di derbarê wêjeyê de dikarin gelek pirs bên kirin. Mirov dikare li ser rêkên wan ên çareseriyê jî têra xwe raweste. Me jî li ser bingehê ku bibe mînak, ceribandinek wêjeyê kir. Ev dahûrandinên dawî jî, hinekê ceribandina wêjeyê ye. Eger derfet heba, min dikarî van kesayetan hîn zêdetir zelal bikim. Min hinekê zelal jî kir, lê min pêdivî pê dît ku hîn zêdetir derbixim holê. Mirovê Kurd dana axaftin, heman weke dana verişandine. Tê wateya kirêtî, ketîbûn, bêçaretî û tinebûn dana axaftine. Ev jî bihêzbûnê, rê û rêbaza rast û jiyana rast dana nîşandane. Min hinekê jî pêk anî û kes nema ku bandor nebû. Em ji mijara çiqas tewanbarin bigirin, heta pirsa "*Çawa Bijîn*" ji xwe nekin nemaye. Di vê**

**wateyê de nêrîna pirsgirêk tine ne, rastiyê rave nake. Hê jî tevger, rih û giyan li holê ne.**

**Divê tu rê bidî jiyanê. Ji bo jiyankirinê şerkirin, ji bo şerkirinê jî jiyankirin, tê çi wateyê?**

**Em her roj şerê vê yekê dikin. Kesayetên Kurd xwe avêtiye naverastê. Ma ji bilî mirinê, ji bilî tevlîhevkirin û kirêtkirinê çi ji dest tê? Ji xwe wêje jî pêşnûmeyên genî bûyî û bîn pê ketî yên mirovan, nizanin bimeşin, nizanin silavekê bidin, hezkirin û hûrmeta xwe nînin, nizanin rêkekê destnîşan bikin, serkutkerin, didin windakirin, reş dikin û yên ku ser guhê xwe re davêjin dîtin û peywendiya wan bi mêtingeriyê re çêkirin û xebata rêka rast peydakirinê ye.**

**Wê demê tişta rast çiye? Tişta ku divê bê jiyankirin çiye? Çima evqas nexweşî heye, çima evqas rev hene û diçin kî derê? Gelo li ser rûyê**

**erdê kesek heye ku vî Kurdî bipejirîne? Gelo kesek heye di hemêza netewên din de jê hez bike? Gelo hene yên ku bêjin '*vaye zarokên me hatin*' û we hemêz bikin?**

**Na!**

**Hemû jî Kurd xirab dibînin û jê nefret dikin. Heta dixwazin bikujin. Wê ji mirovê dibêje; "*Ez nezan bûm, ez naxwazim bifikirim, ez nikarim baxivim, ez hişkim*" re bê gotin ku;"*Xwe tevlê bike!*"Ma rewşekî me ya wisa maye ku kes henekê xwe pê neke, em çima rastiyê nebinin? Di heman demê de ev hemû jî rastiyên wêjeyê ne. Me dikarîbû zêdetir jî li ser vê mijarê bisekinin. Mixabin, mirovê Kurd ewqas lewaze ku, mirov fedî dike tevlî xebatên şoreşgerî bike. Ji ber naxwazin bersiva pirsa '*Jiyanekî çawa*' bidin, ji rê derdixin. Êdî dijmin di vir de çewisandiye û kesayeta ku dijmin şêwedaye xwe veşartiye; xwe vedişêre, weke giloka tawanbariyê ye**

**û bi temamî xwe ji jiyanê re digire û xisletên kesayetên bi vî rengî giranî derdikeve holê hene. Rewşa wî bi giryane. Ji ber, bi awayekî herî hêsan windakirina mirovan, pirsgirêkên rizgariyê birêxistin nekirin, wate nedayîna erkekî leşkerî, nerêxistinkirina taximekê, perwerdenekirin û bi çend komên gel re guftûgo pêşnexistin pratîka kesayetekî xilasbûyî ye! Eger em bi wateya wêjeyî jî bêjin, yên ku henekê xwe bi şêwazê jiyana rast dikin, yên ku ji çareserkirina pirsgirêkên wê direvin, bi hemû kêm û kurtî û kirêtiyên xwe ve nikarin di nav refên me de bimînin. Ya rastî ev kes bela ye, qonaxa binketinê ye û ji bûna giyan û hêvî dûre. Nikare bêje; "*Min jî wisa bipejirînin.*" Tu dibêjî; "*Ez bela me, ez dînim, ez ê bigirîm, ez ê bizirim, ez ê xwe bixim bûhranê, ez ê zirarê bidim, eger pêkneyê ez ê ji rê derbixim, ez ê bibim komploger, hinek***

***daxwaziyên min ên nizanim çi hene. Eger tu ya di hundurê min de nexwînî û nedin, ez ê xirabkariyê bikim*"** **û hwd têne jiyankirin. Ev hemû nexweşiyên kesayetî ne û berfireh tên jiyîn. Di encamê de divê şoreşgerek bibe derûnînasekî baş û bi çavekî wêjeyî yê baş bibîne.**

**Ji ber ku ev kes tam bela ye!**

**Xistina nav artêşê bila li aliyekê bimîne, ew xistina nava jiyana civakî bixwe jî wê hilweşandinê bi xwe re bîne. Ji ber ku her tim belav û xirab dike. Ji xwe civaka me li hemberî cewherê xwe tê bikaranîn û ji dijmin zêdetir cewherê xwe dikirkirîne.**

**Me ji mêj ve ev yek tespît kiribû: Zimanê wî daxive, lê ew bi xwe cewhera xwe dikuje. Qaşo leşkere, lê li partiyê dixe. Di encamê de mînakên van hemûyan jî hene. Li hevalê xwe dixe, rêxistinê belav dike û dijminê xwe mezin dike. Em pir baş dizanin ku gelek ji fermandar û rêberên me bi vî**

**rengî ne. Di astekî girîng de li serê gel bûne bela. Ev xal didin nîşandan ku pêdivî bi sererastkirineke mezin heye. Hemû jî di bin navê hezkirin û hûrmetê de bi tinekirin û kirandinê ve mijûl dibin.**

**Me li xwestek û ajoyan jî temaşe kir, me dît ku ew jî dibin xiyanetê. Elbet, eger em nekarin van mijaran bibînin û binirxînin, em ê çawa sererast bikin? Em ê ji van pirsgirêkên xwe yên dijwar re çawa çareseriyê peyda bikin? Eger hûn van hemû pirsgirêkan nebînin, hûn ê nekarin behsa milîtaniyê bikin.**

**Ger mesele danasîna hunera leşkerî, siyasî û rêxistinî nîşankirin û bûyîna hêza çareseriye be, em wê jî didin.**

**Dîsa ger mesele jiyana civakek çawa, giyan û aboriyek çawa be; jiyanek moral û ehlaq, xwediyê felsefeyek çawa be, em wê jî nîşan didin.**

**Mesele zimanê teşe, şêwazê lêdanê û zimanê xîtabet-uslûb be, em wê jî didin. Gelo pirsa "*Di vî milên min de kêmanî heye, di vî milên min de çewtiyên min hene, di vê mijarê de pêdiviya min bi nûbûnê heye*" kî ji xwe dike û bersivên cidî dide? Em pirsgirêkan raberdikin û derdixin holê. Bi şêwazê gelemperî çi ji kê re tê gotin, çi tê danesîn diyarkirina wê ye. Tişta dimîne mirov li gor pêdivî û erka xwe tişta pêwiste rewa bike û ji xwe re bigirê ye. Ger ev jî neyê kirin pêşketin çênabin. Her wiha em weke gel jî zêde pêş neketine. Çend peyvan fêr dibe, li gorî vê çend helwestan diyar dike, bi vê jî xwe mîna fermandarekî mezin dibîne. Bi mehan û salan perwerde tê îhmalkirin. Dibê; "*Bila her kes li gorî min be.* " Ev paşverûtiyek di axayên Kurd de jî nîne. Divê bê zanîn ku ev şêwaz û tempoya me çiqas hewce ye û veguhertinê ava dike. Bi cûrekî din**

**em ticarî bawernakin ku şoreşgertî pêş bikeve û serkeftî xwedî li erkên xwe yên mîlîtantî derbikevin. Piştî ku em van rastiyan ewqasî sihêm radigihînin, ti kes nikare nefêmkirî nêz bibe. Şoreşgerek ti carî nikare xwe ewqasî bixapîne.**

**Rizgarkirina jiyanê, watekirina jiyanê, xweşkirina jiyanê; nûkirin bi qasî avê pêwiste. Kesên ku sedema ewqasî pirsgirêke, ewqasî xirab kiriye, ewqasî winda kiriye, qala hurmet, heskirin û jiyanê bike jî nade yeqînkirin. Divê mirov hinekî bikare xwe pênase bike. Rastiyan bibîne. Ger hûn heqaretê hêsan qebûl nakin, tişta bêmafe qebûl nekin, piçekî heskirin û hurmetê dixwazin, wê gavê divê hûn werin ser rêya rast! Divê duristbûn hebe! Divê em dev ji qurnaztiya gundîtî, sextekartî û xapandinê berdin! Divê ev demagojî bê derbaskirin! Divê xwe gihandina rastiyê pêk were! Divê em rêya**

**pêşketinan diyar bikin. Divê sînor û lêgerînên li ser vî bingehî tên pejirandin hebin. Divê mirov di rewşa lêgerînê de be. Divê di rewşa heskirinê de be. Divê bala hinek din bê kişandin. Divê bibin hevalê çare û xurtbûna hinekên din. Her biçe divê em bibin civaka nû û wê di kesayeta xwe de temsîl bikin. Pêwîste di van tevan de dizî neyê kirin, qurnaztî neyê kirin, divê ev li hemberî dijmin bên kirin.**

**PKK tevgerek terbiyê ye.**

**PKK tevgerek terbiya herî mezin, berpirsyariya herî li jor, pîvanên bilind û ji nû ve rêkûpêk kirinê ye. Tevgerek bê eman û hênase bi hênase, weke di dîroka mirovahiyê de qet ne hatiye dîtin di mercên herî zehmet de şer dike.**

**Rastî eve!**

**Ev tevger bi janên tirsnak, bi îşkenceyê, bi xwîna şehîdan hatiye hunandin. Giyan, ruh û roja her kesî**

**ye. Ger pênaseya vê tevgerê neyê fêmkirin; divê bi cangorî û hurmetek mezin, hemû jêhatî di nav de bên zindîkirin. Mirov hew li ser vî bingehî dikare xwe bibîne, bibe xwediyê hêz û quwetê.**

**21 Hezîran 1994**

***“Her kes, mirovê di xwe de veşartî bi min re dibîne.***

***Dibêje; ‘Tu jî nûnertiya parçeyekî di min de dikî. ’***

***Kesayeta wî ya fîzîkî xwiya dike û dijî cuda ye.***

***Mirovekî di quncika dil de mayî û jiyan nake heye,***

***ew jî ez im.***

***Ev pir nêze, lê veşartî ye.***

***Di dil de di cihekî biçûk de ye.***

***Hûn dikarin min weke yekbûna wan bihizirin. ”***

## Lİ KURDİSTAN Û HER DEVERÊ KUŞTİNA MİRİNÊ

**Fîzîka me li vire, lê heta şaneyên xwe em di nav pirsgirêkên welat de ne, dahurandinên civakî û şer. . . Ez niha li ser heyvê bim jî qet ferq nake. Bêguman dema ez ji zêdebûna kar dûr dikevim, ez gelekî zîver dibim. Ez ewqasî fêr bûme, nikarim xweragirim, nikarim jiyan bikim. Rewşek balkêşe. Ne dişibe mişextiyê, ne jî hîcretek klasîk.**

**Lê dikare berhevdana wê bi xebatên Hz. Muhammed ên Medîne bê kirin. Di encama vê jiyana me de, têgînên mekan wateya xwe winda kirine. Dîsa wext wateya xwe winda kiriye. Her tişt di kêliyê û di yek xalê de lêhûr dibe.**

**Tekoşîn, rastiya şer, tûjbûnek vînê û lêhûrbûna ramanê ye. Dema te lêhûrbûn û tûjahî pêş xist, navber wateya xwe winda dikin. Dikare pêvajo û meh di nava yek salê de bê bicîhkirin. Me hinekî jî ev kir. Me bi lêhûrbûneke şahane mesafe ji holê**

**rakirin. Her wiha me ewqasî kêlî esas girt, ji bona me meh mîna rojekê ye. Ev hinekî jî bi lêhûrbûna rastiya Rêbertiyê ve girêdayî ye. Kesên din jî tevî heman rastiyan dibêjin ji ber vê lêhûrbûnê jiyan nakin, pêvajoyan baş pêşwazî nakin, ji bona wan roj mîna mehan dirêj dibin. Me ev hinekî berevajî kir. Ew mekanan mîna navbera gerstêrkan dirêj dikin.**

**Min li gorî xwe cîhanek pir cuda çêkiriye. Ravekirina wê bi rastî jî gelekî zore. Wisa jan û xemgînî nîne, lê şêwazê serkeftinê serwere, li hemberî hemû helwest û hewldanên bibin asteng hêrs serwere. Lê di heman demê de bi awayekî awarte girêdana jiyan û bilindkirina wê serwere. Bi qasî xirakirinê azweriya çêkirinê serwere. Ez ji vê re dibêjim jiyana awarte û gelekî bijare û ez bawernakim ku ez ê vê jiyanê bi ti tiştî veguherim.**

**Ger cîhanê li ser tepsiyê pêşkêşî min bikin ez tenezil nakim.**

**Qinyata min ew e ku ev rastî bi rastiya jiyana gel ve girêdayî ye. Mercên derjiyana ku gelê Kurd, gelê Kurdistanê û gelên cuda di navê de dijîn, rewşa wan a di asta sînorên komkujiyê de mayî, hema bêje bi min re asta eleqeyek awarte ava dike û ev pêwendî bi balkêşiyek şahane ve min neçar dihêle ku hemû hêz û enerjiya xwe derbixînim holê.**

**Ez texmîn dikim ku mirovek çiqasî bi armanca xwe ve girêdayî be, dê ewqas jî bikare enerjiya ku jê re pêwiste derxîne holê. Jixwe min di vê xalê de dirûşmeyek daye pêş: "*Ger pêwist bike mirovek dikare xwe bîne asta bombeya atomê.* " Min ev têgîn vala negot. Û niha bi enerjiya bi xwe re min bi qasî hêza atomê encamek derxistiye holê. Ev wisa ne dirûşmeyek nepoxî û erzane.**

**Ez dubare dikim: Ger mirovek xwe bi armancek teqez bê qezenckirin ve gire bide, ew bombeya atomê ye. Ne gengaze ku kes pê bikarê. Ya din jî hêza kirinê ya awarte heye. Ev têgîn ji bona min gelekî girîngin. Min xwe da vî karî û niha ti pirsgirêka min a enerjiyê jî nîne. Dikare bê gotin ku ger ev asta girêdana min a armanc nînbûna, ez niha ji zû ve ketibûm rewşa extiyarekî belengaz.**

**Çend roj berê min di televîzyonê de li lîsteya wezîrên Tirkiyê yên nû avadibû temaşe kir. Hemû, yek bi yek di ber çavên min re derbas bûn. Dîroka çêbûna gelek ji wan a ji dayikbûnê 1950-1955 bû. Çêbûna min a ji dayikê 1948'e. Min hemû bi awayekî pir temen mezin û jihevketî dît. Min li xwe temaşe kir û got; "*Ev çi hale, ev çi ciwantiye!*" Min dîsa li ser cîhanê hinek muqayese kir. Ew hemû pişta xwe didin dewletê û wisa jiyan**

**dikin, lê dîsa jî ewqasî herifîne. Hemû dewletên mezin û biçûk ên cîhanê rojane dixwazin pêşiya me bigirin û ez jî bi enerjiyek ciwantî û awarte liber xwe didim.**

**Bi gotina nivîskarekî Elman, ez xwe mîna siyasetmedarê sedsala 21'an amade dikim. Ez vê pêvajoya heta sala duhezarî, weke qonaxek polîtîk a bihûrdar, îdarekirin û derbaskirina kar dinirxînim. Lê ger wê ya eslî bê serxistin, ger dê were serxistin –piştî ku qirêja di karen paqijiyê de, di kare rûxandinê de, di serî de yên di nava rastiya gelê me de heyî hat paqijkirin- em ê karê avakirinê ya awarte di destpêka sed sala 21. –ger em bijîn- de pêk bînin. Bi soza min daye xwe ve, yeqîn dikim ez ê vê di asta herî rakêşwer de pêk bînim.**

**Pêşnûme û proje ji bona min qet nepirsgirêkin. Hew ne tenê li hemberî zexta çînî û netewî, yeqîn dikim em ji**

**pirsgirêka derdor bigirin, heta qategoriyên di navbera temen û zayendî de ku gelek caran behsa civaka nû tê kirin, lê ne di sosyalîzmê û ne jî di kapîtalîzmê dedikare bê başkirin, newekheviyên ku pêwîste pir li ser bê rawestîn û di mijarên çavkaniya xwe ji van kirêtiyan digirin de, em ê bikarin ji gelek mijarên di asta têgînan de tê nîqaşkirin re çareseriyê bibînin. Amadekariyên vê û dîsa asta vêya min weke armanc gire dide gelekî li pêşe.**

**Em rastiya şerê, ku naşibe şerên xelkê dijîn. Zoriyên wê jî bi qasî ti şerê gelêrî ve neye muqayesekirin xwedî pîvane. Rastiya Kurd a bi şertên objektîf hatiye çêkirin û tişta me bi îradeya xwe daye avakirin naşibe rastiya gelên din. Lê mîna di her bûyer û diyardeyê de heyî li vir jî hinek avantaj hene. Polîtîkaya dijmin a herî dijwar, ji ber têkçûna dijmin me xwe gihandiya hostatiya ku li dijî wî**

**bikar bînin. Di xala digotin;“*Me ew xilas kir*” de, dibebê ku fîşekek hatibe teqandin gelek şer hatine serxistin.**

**Serfermandarê Çînî yê di dîrokê de herî navdar Sun Tzu wisa dibêje; “*Şerên herî bi nirx, şerên bê ku qet windahî bide ser dikevê ye.* ” Me gelek caran şer wisa qezenc kir. Em bi hostatiyek pir mezin ketin nava vî şerî û vê têkoşîna ku gelek tevgerên Kurd ne gengaze nêzîk jî bibin û me ser xist. Li gel vê gelek şerên ku hêsan bên bidestxistin jî di rastiya Kurd de, li gorî min ji ber bê watebûnek mezin û zirdînîtiyê me winda kir. Em rastiya şerê gelêrî ya wisa pir bi nakok dijîn. Ez jî xwe di vê mijarê de pir bi pispor û lêhûrbûyî hîs dikim.**

**Di rastiyê de şer bi şêweya ku di PKK’ê de tê vegotin nameşe. Ez dixwazim vê mîna rexneyê li rewşenbîran bikim. Li gorî min ew hêjî xwezaya şerê di PKK’ê de fêm nakin.**

**Hinek rewşenbîr weke Îsmaîl Beşîkçî bê ku pêşdarizayan bike, dixwaze serê xwe li ser vî tiştî bêşîne. Li gorî min hinek din nifş ji nêz ve nas kiriba dikariya hêza nivîsandina rastiyan baştir raber kiriba. Ji dervî wê di nav me de yên şer herî germ jiyan jî dikin pir zêde nikarin ferq bikin. Sedemên vî şerî yên serkeftin û windakirinê, şêwaz û tempoya wê, heta taybetmendiyên wê yên xîtab û uslûbê jî fêm bikin tine ye. Ev ji bona milîtanên nav me jî derbasdare, lê rewşenbîr hîn zêde ji paş ve lê temaşe dikin. Belkî ji îro û pê ve asta wan a fêmkirinê hîn bilind bibe. Lê di nav avaniya me de asta fermandariyê, asta mîlîtantî di vê mijarê de tengbûnekê jiyan dike. Bizanibe jî nikare bîne ziman, nikare bi xîtab bike û veguherîne şêwaz. Lê rexmî vê bi şêwazê xwe mirov dana şerkirin – yên li dijî me jî di nava vê de- ji bona min qet ne pirsgirêke. Heta ji bona**

**min bikaranîna hêzên eniya dijber jî qet nepirsgirêke. Bi tena serê xwe fermandariya giştî ya Tirk xistina nava şaşiyan û pêşxistina şer ji bona min qet nepirsgirêke.**

**Ji bona min hew pêdiviya pêwist sitandina hênasê ye, dervî wê her tişt serkeftine. Di vê mijarê de ez gihiştime şêwazek şahane, ti kes nikare başve bixe.**

**Ji bona min mirin ji zû ve miriye.**

**Mirin ji zû ve miriye. Pirsgirêkek min a bi navê "*mirinê*" nîne. Dibe ku ji bo we, ji bo gel, ji bo PKK'ê û welatparêzan wateyek mirinê hebe. Min mirin di kesayet û di rastiya jiyana xwe de sedhezar carî kuştiye.**

**Lê rewşek wisa heye: Min di peyamên gel de dît. Ji bona min bidin jiyankirin çi ji destê wan dihat dikirin û digotin; "*Em ê wisa bidin jiyankirin, em ê wisa bibin baskên wî, em wisa rê nadin ti tiştî. . .*"**

**Ez di vir de lewaziya gel dibînim.**

**Di rastiyê de gel dixwaze xwe diparêze, xwe dide jiyankirin. Vê jî dixwaze bimin dana jiyînê ve îfade bike. Bêgûman ez vê alîkariyê biçûk nabînim, bi hêstên xwe yên minetdarî pê ve girêdayî me. Lê bi dayîna vê hêstê ve piçekê jî li hêza xwe ya cewherî xwedî derketiban, xwedî hêza meşa xwe ya cewherî buna, pêwîstî bi ewqas gotinan nedikir. Wê gavê pir dijwar pêdiviya her kesî bi me heye. Bêguman vê dibêjin jî. Ji ber vê sedemê divê mirov berdêlan bide, ji bona gel jiyan bike.**

**Tevî ku ev bêrîkirina milyonane, helwestên me yên hêjî cidî nagirin û ber bi mirinên erzan ve baz didin ji bona me nayê bexşandin. Ji bona gel, ji bona jiyankirinê, em ê her tiştê xwe deynên holê, em ê mezin bihizirin, mezin bikin. Em ê ji ya berê zêdetir bikin, heta tiştên ku bere di mehekê de dikir, em ê niha di rojekê de bikin. Tiştên me di duwazdeh salan de**

**kiriye, em ê hemûyan di sala sêzdehmîn de pêkbînin. Ev sonda girêdanê ya ku min dayî xwe û gele, ez ê bikim jî. Tiştên heta niha me kirine ispata vê ne. Divê em ji van encaman derxînin. "*Hêza cewherî*" çiye, "*mezinbûn*" çiye, "*pêşketina şer çiye*", "*rêxistinbûn, sazîbûnû rêveberî*" çiye, "*rêxistinparêzên têrkar, kesayetên têrkar ji hêla xwe ve derxistin*" çiye? Divê hûn li ser van pirsan bisekinin. Ger ev pêk bê, wê ez jî bêm parastin, her wiha wê gel jî xwe biparêze.**

**Dema ez digihiştim xalên herî dijwar, min di gelek hevalên xwe de ev tişt ditibû: Ger hebe giyanek wan wê hema bidin û xilas bibin. Di demên wisa yên teng de fedekartiya milîtanên me yên herî mezin jî bi feraseta; "*Hema em bimrin, em fedekariyê bikin, em namûsê xilas bikin*" de ye. Yên nikaribûn liberxwe bidin jî bûn nepenî. Rewşa min pir**

**cuda ye. Di kêliyên herî zor de min mîna hêza hilberîna awarte kar kir.**

**Bereketa min a herî mezin, dema ez nêzî sêdarê me.**

**Belê ew pêvajo ne. Zivronekên qonaxên herî zîkzakin û derbendan tînin halê fetisandinê ne. Di cihên wisa de qabîliyeta min a manevra pir zêde dibe. Hilberîna min a kar, hizirandina afirîner û hûnandina hinek girêkên bingehîn bi lezek mezin û hostatî pêktê. Her wiha ez di van pêvajoyan de hîn zêde biser dikevim. Şêwazêmin ê qezenckirinê, di xalên ku gelek kesan ferq nekî û nehizî de pêkhatiye. Hîn jî nayê zanîn ku dîroka PKK'ê çawa hatiye qezenckirin. Gel şer kir, gerîla şer kir. . . Ez ji hewldana gelê me û şerê gerîlayên wê re jî hûrmetê raber dikim. . . Lê li gorî min van bi giranî pîlanên min ên şer vala derxistin.**

**Ez bi serê xwe mîna him artêşa şer dike him jî serfermandarim. Û ez**

**hêvî dikim ku rojekê gelê me wê baş fêmbike; ger gerîla jî vê fêm bike teqez wê serkeftin çêbe. Ez ji bona ev bê fêmkirin, di demê xwe yê dawî hûrûkûrbikar tînim. Ger bala we bikişîne ez pir zêde wateyê nadim karên din. Ez dixwazim kesayeta mîlîtanên serkeftî û nêzîkatiya wî ya gel derxînim holê.**

**Di derbarên gel de pir zêde giliyên min ninin. Tevlîbûn û pêşketina gel başe. Ez di vê de pir zêde astengiyan nabînim. Lê ez ji bona mîlîtanan nikarim heman tiştî bêjim. Rastiya kesayeta mîlîtanan pir bi xetere, gelekî kelkote. Bi kurtasî ev jî bi ezmûnê ve girêdayî ye. Saziyên netewî, heta kongreya netewî, pêşketinên heyî yên girseyî, wê li gorî vê pêşbikevin, ev ne pirsgirêken pêşî ne. Lê ji bona mîlîtan, fermandar, kadro em nikarin heman tiştî bêjin. Niha herî derbenda teng eve. Xebatên min ên van salên**

**dawiyê ev anîn asteke ku xirab nebe û hinekî rê li pêşiya pêşketina veke. Dihizirim ku xebatên min ên dema dawî, kêm jî be ev anî astek ku ne hilweşe yan jî zemînek pêşketinan ava bike. Yeqîn dikim wê ji vir û şûnde jî xebatên me yên bi vî rengî serkeftinê destnîşan bikin. Di pêşketina gel û mîlîtanan de qonaxek pêşveçûyî heye. Dema ku ez dibêjim wê "*şer pêşbikeve*" herî zêde bi van xebatan bawerim. Wê berhemên van derbikevin holê.**

## Karên Pêxemberan

**Pêxembertî, di rastiya gelên Rojhilata Navîn de rêbertî ye. Dema hûn li dîroka pêxemberan temaşe bikin hûn ê li wir dîroka rêberan bibînin. Dîsa jî bi sedemên li gorî xwe di demên kin de li ser hemûyan destpotperestên xirab hatine sazkirin,**

**cardin pêxemberên nû derketine û li dijî wan despotkaran şer kirine.**

**Lewra divê baş bê tesbîtkirin ku tevgera pêxemberan derketinek li dijî destpotîzmê ye.**

**Li Rojhilata Navîn yek destpot hene, yek jî pêxember hene. Fîravûn heye, Mûsa heye, Roma heye, Îsa û Muhammed heye, Zerdeşt heye û împaratoriya Aşûr, Babîl û Pers heye. Bal bidinê, pêxember her demê îfade dikin ku alîgirê heq-edalet û ronahiyê ne. Ger niha ev rast bin, dema em ber bi roja me ve tên zalim hene, împarator hene, walî û generalên wan hene. Lewra ger em ê qala li rex gelbûnê û li hemberî vê derketinê bikin, divê teqez ev hinekê jî bi rastiya pexemberên Rojhilata Navîn ve girêdayî bê destgirtin.**

**Tişta ji bo min girîng pêvajoyên pêxembertiyê yên destpêkê ne. Bê ku mirov li hemberî zilmê xwe têxe nav ti kirasî, bê ku mirov têkeve nav**

**dogmeyan (ez van tiştên ku bi dogmayan anîne serê pêxemberan nakim malên wan) şopdar û minafiqên wan ên peyre (li gorî gotinên sosyalîzma di roja me de oportonîst û jirêderketî) şalêk gelek xirap li serê wan pêçan, mînakek destpotîzmê ya pir xirab pêşxistin. Ev jêderên destpêkê di vê wateyê de ji bo min gelekî girîngin. Yên bixwazin girêdayî gel bin, li hemberî zalîman li gel mazlûman bin, li hemberî bêmafdariyê li rex gel bin, li hemberî newekheviyê li gel adaletê bin, dîsa li hemberî koletiyê li gel azadiyê bin, neçarin di derbarê rastiya pêxemberan û olan de wisa şîrove pêşbixin. Yên vê şîroveyê pêş nexin û di kesayeta xwe de nûnertiya vê nekin, li nav gelên Rojhilata Navîn nayên pejirandin.**

**Em jibîr nekin; ev çend sedsalên dawiyê ye şêweya serdestiya li ser gelên Rojihilata Navîn bi rengê împaratoriyên biyanî û waliyên wan**

**ên herêmî, an jî bi şêweya rejîmên generalane. Ji rêveberiyê pir kêm têkildarî gele. Ji ber vê jî ger dijbertiya li hember wan bi awayek radîqal tê xwestin, divê şêwaz hinekî pêxemberî be. Ev jî rêbertiyek siyasî ye, rêbertiya gel a siyasî, şêwazê rêbertiya gel a îdeolojîke. Her wiha wê bi vê şêwazê hîn zêdetir serkeftî be û em bi hêsanî dikarin bêjin ku wê li ser koka xwe pêşbikeve. Ez vê gotinê wisa ne bi xwendinek zêde, dîsa ne bi zanebûna dîroka îslamê û olan ve pêşdixim; rastiyan ez neçar kirim, rastiya çand û dîroka gelên Rojhilata Navîn, heta şer ez gav bi gav ber bi pêxemberbûnê ve dehf dam.**

**Dipirsin: "*Tu xwe herî zêde nêzî Lenîn dibînî an jî Hz. Muhammed*?"**

**Weke şêwaz nêzîkbûna min pir zêde dişibe Hz. Muhammed. Derketin, hîcret, veger, weke îradebûn û ezamet, tempo pir zêde dişibê.**

**Pêşxistina nirxandinên dihêla civaknasî de, dîsa jî li ser bingeha bandora Marksîzm-Lenînîzmê pêş dixim. Her wiha ne gengaze ku mirov di navbera wan de çiyayan bihune, ji ber ku em dizanin wan jî li gorî dema xwe nûnertiya berjewendiyên gelan kirine. Girêdana wan bi hev ve çêkirin hinek jî bi bûna pêxemberê serdema me ve gengaze. Ango bi yekkirina wan ve, dibe ku ji bo mirovahiyê jî rê ji pêngavek pêşveçûyî re veke.**

**Ji bona mirovahiya îro, ji ber feydeya kesên keda wan tê xwarin û bindestin, li hemberî yên felaket aniye serê cîhana me şêwazê rêbertiya bingehîn eve. Ev tişt wê bi min bibe an nebe pir negirînge. Ger pirsgirêkên mirovahiyê giran bûne, cîhan rûbirûyê xeteriyên mezinin, pêşketina rêbertiyên wisa jênereve.**

**Em jêre bêjin pêxemberên nû, tarîqatên nû, ekol û felsefeyên nû, em çi navî lê bikin bila bikin, divê teqez**

**di ketina sedsala bîstûyekan de rêbertiyên wisa derkevin holê. Nexwe dê ev cîhan veguheze dojehê. Bila ti kes li vê cîhanê li bihuştê negere. Na ger neyê xwestin li dojehê bê jiyankirin, wê rizgarvan û mizgînvanên wê derkevin holê.**

**Ez di vê mijarê de naxwazim xwe pir bi îdîa û mînaka yekem bibînim; lê azwerî û milîtaniya min wisaye. Ez xwe mîna şahidekî dibînim. Înşelah wê pêxemberê roja serkeftinê jî derbikeve.**

**Ez lêgervanekî şahane me.**

**Ez lêkolînvanê saziya rêbertî ya nû derkevê me. Ez azweriya rizgarvanê mirovahiyê yên nû derbikeve holê me.**

**Ez lêkolîn dikim, nîqaş dikim, propaxanda wê şahane dikim, xwe rêxistin dikim û şerên wê yên pêş didim.**

**Di cihekî de jî ez şervanek şerên pêşînim. Ez vê çiqasî bigihînim**

**mirovahiyê ewqasî girînge. Ji xwe yek sedema ku Emerîka ewqasî bi ser min de ev tişte. Emerîka li gorî xwe modelek Kurd çêdike. Ji ber kurdîtiyê pir zêde bi ser min de nayê. Ji ber dizane ez dixwazim hinek karên ku gefan li pergalê bixwe pêş bixim bi ser min de tê. Min di derheqê vê de ji rojnamevanekî Emerîkî re wisa gotibû: "*Împaratora Roma jî li Qûdisê li pey Îsa bû. Ez jî niha hîs dikim ku împaratorê li Washîngton jî li pey Îsayê nû ye*" û ez vê li hember hev muqayese dikim.**

**Di navbera me de şibandinekî wisa heye. Hêza împaratoriya demê me mîna xeteriya herî mezin îlan kiriye. Û ji bona me bibîne jî hemû cîhan rakiriye ser piyan.**

**Generalên Romayê bi qasî van nedixebitîn. Împaratorê Roma Neron, ne bi qasî vê şopdarbû. Ew belkî jî li gorî yên roja me bi heft avan hatibûn şûştin. Yên niha hîn xeterin. Her wisa**

**divê rizgarvanên niha jî hîn xurtir bin. Ez xwe mîna lêkolînvanekî pêşber, mîna şervanekî pêşber dibînim, lê tiştekî ji bona encamê gotin gelekî zore. Ez xwe jî hew bi vê sînordar nakim.**

**Ez dixwazim van tiştan hîn pêşdetir bibim. Ji bona em hîn tiştên mezintir derxînin holê çarçoveyan çêdikin, dahurandinan dikin. Amadekariyên pêş, xebatên yekîtiyên pêşîn pêşdikeve. Ger îxanet lê neyê kirin, ger nebe sîxur, ger pergal nekşîne gel xwe, mîna ku anîne serê hemû dîn û jiyanên siyasî û felsefî ger berevajî nebe, wê şansê serkeftinê bi awayekî zû û bilind pêşbikeve.**

**Hemû hewldan di vê derbarê de ne û divê bi baldarî bên lêkolînkirin. Ev weke tevgerek rizgariya netewî ya ji rêzê destgirtin nêzîkbûnek tenge. Rojane tene rizgarkirin, weke şervantiyek ji rêzê nirxandin dîsa nêzîkbûnek tenge. Hewldanên me**

**gelekî berfireh in, dahurandinên me di astekê de ku bikaribe hemû mirovahiyê bandor bikine.**

**Dibe ku bêjin: "*Ma gelo wê mirovahiya nû bizê, ne xeyale*?"**

**Hemû doz di despêka xwe de mîna xeyalên ku mirov zor pê bawer bike destpêkirine. Lê şopdarên bi israr Romaya ku digotin ti carî hilnaweşe jî ji hundir ve xira kirin. Her şoreşên mezin bi hewldana çend kesên pêşeng destpêkiriye, dibe ku pêş jî bikeve.**

**Em li ser pira siratê polîtîka dikin. Ev rastiyekê îfade dike ne xeyalekê. Polîtîkvanê herî pispor li gel min xeyalperesteke. Heta di nav refên me de gelek kesên ne hevseng, di her gava xwe de xwedî şaşî û meşên xelet hene. Lê ez tiştan bi awayekî şahane dipîvim û diceribînim. Him aso dibînim him jî her gava davêjim hezar carî dihizirim. Ez gavên xwe wisa davêjim.**

**Lê tevî vê xeyalên me jî hene.**

**Ez vê şopdariyê bi xeyalan re pir cuda dimeşînim. Xeyal hinekî cuda pêş dikevin, mantiqê wan cuda ye. Di pratîkê de hinekê cûda ye. Gelek kes nikare vê cudahiyê bikin û tevilhev dikin. Dibêjin ku; "*Xwe çi dihesibîne*" lê di milê din de jî qet li pratîkê temaşe nakin.**

**Ez bangewazî dikim: "*Hûn çima naxwazin şêwaza min a pratîkî bi qasî xeyalan fêmbikin?*"**

**Ez miroveki jiyan dikim û di nav hewldanek mezin de me, di nav hewldana kedê de me. Rojane ti mirov bi qasî min nikare karê rêxistinê bike, propanda bike û bi qasî min nikare çalekiyan bi rêkûpêk bike. Çima ev nayê dîtin? Dibêjin; "*xeyalên mezin ava dike*" nizanim, "*gotinên mezin dike, ma ev ne xetere?*" Dibe, lê pratîkek pêktê heye. Hafiza gelek kesan jî nagire, nikarin rojekî jî tehemul bikin (kî hew ne ew,**

**avaniya me jî wisa ye). Di vê hêlê de asta pêkanîna pratîka me û asta çêkirina xeyalên me diviya ji aliyê rewşenbîr, nivîskaran ve lêkolîn li ser hatiba kirin, nirxandinên nêzî rastiyê hatibûna kirin. Hinek mirovên zanyar vê diceribînin. Jiyana me mîna rêze belgeyane. Ger li ser bê sekinandin herkes ji bona xwe dikare bigihije encamên girîng.**

**Em dizanin ku di hundirê dîrokê de li hemberî şerên taybet ên Tirk bi awayekî yeksan û serkeftî ti kesî şerek wisa nedaye meşandin. Dîrokê bi awayekî kurt binirxînin: Serhildanên bi deh hezar, sed hazarî destpêkiribûn, di sê mehan de hemû bi sêdarê encam bûne.**

**Dema min destpêkir xala min sifir bû.**

**Ne yek kes ne jî yek çek hebû. Wê demê me ev yeksanî, ev meşa mezin çawa pêkanî? Ez ji nivîskarên birêz re vê dipirsim: Ma gelo ev ji**

**xweber çêbû? Li Kurdistanê pelek jî nikare ji xweber biheje. Dema ku hewldanek mezin nînbe, hûn baş dizanin ku tu nikarî zikê xwe jî têr bikî.**

**Ev welat welatê xizana ye.**

**Herî kesê qerase jî bi zorê dikare mala xwe bi rê ve bibe. Ger ji dewletê re çil teqle neavêje nikare mûçeyê jî bigire, yên digirin jî nikarin malekê jî xwedî bikin. Hûn asta karmendên herî bijareya birçîbûnê dibînin.**

**Başe, ez van pêncî hezar kesî çawa xwedî dikim? Ma ev ji xweber xwe xwedî dikin? Anjî hûn ê bibêjin; "*Ya her kes dike kede.* " Lê temaşe bikin, sedhezar keda xwe difroşin, herkes çima birçiye? Û hemû jî rezîl bûne. Wê gavê li vir ked û pratîkek ku herkes bibîne û nirxê bidê heye. Li gorî min bê ku tu rûmeta xwe bifroşî, ji bona tu hebûna xwe ya fîzîkî li ser linga bigirî dîtina nirxên madî bûyerek şahane ye. Nexasim bûna xwediyê wê**

**giyana pîroz –ji xwe ev jî serfirazî yebûyerek pir û pir mezine û min ev jî pêkaniye. Ev tişt jî xwedê wisa ji xweber ji min re neşandine. Hemû bi kedê hatine û çêbûne.**

**Vaye sosyalîzm eve!**

**Bejindayîna şêwazê keda sosyalîst û encam girtina wê eve. Ez dixwazim ev bê lêkolînkirin. Lê mixabin yê bala xwe bide vî milî pir zêde nîne. Vaye "*navê wî derketiye!*" Weke ku ez bi navê xwe kar dikim. . . Li vê cîhanê herkes dikare bi navê xwe kar bike, lê ez bi keda xwe kar dikim û ez tenezilî keda ti kesî jî nakim. Her kes tê ji qada min hêz digire. Hêza manewî û madî digire.**

**Keda pîroz, keda azad, keda ku rêzdariya mirov û fîzîka mirov pêşdixe.**

**Rakirina kedxwariyê ya li ser kedê bi vî şewazî dibe. Û ez di vê wateyê de nabêjim; "*Ji bona mirovahiyê azadî ne bêderfete.*" Li**

**gorî min piştî demek kin, hemû gelê Kurdistanê ji bêkariya zede rizgarkirin wê pirsgirêk be. Ev ne pirsgirêke. Him jî hilberkar, jiyana madî û manevî bi şertên hilberînê ve girêdan qet ne pirsgirêke. Pergalan ew evqasî anîne rewşek bêkar, bê berhem, gêj û nexweş. Lê ez di pergala xwe de kesekî ewqasî jî nadim karkirin. Ne siyasî, ne jî leşkerî. Ez wan pir kêm didim xebitandin. Herkes maddî û manevî jiyan dike û dihelbirîne. Ger ez li welêt piçekî jî xwedî derfet bim, avakirina bihuştê ji bona min ne zehmete.**

## Bêdawîbûn Yan jî Mezopotamyayî Bûn

**A rastî her tiştê me bersiveke. Em xwe weke yekî ku kes nikare bigihijê û nêz bibe nabînin. Berevajî me ev rastî bi awayekî daxistiye heta**

**jêrê û me anî asta şarezatiya xizmetkirinê.**

**Hûn ecêbmayî dimînin. Fîlozof ji mêjve ketirine nava siyasetê, siyaset jî ji zû ve ketine nava fîlozofan. Qiral û fîlozof ji zû ve bûne yek. Lê mixabin yên ku vê fêm dikin gelek kêmin.**

**Bi taxtîkbûna fîlozofan!**

**Tişta pêk tê ew e fîlozofê taxtîk an jî siyasetmedarbûna fîlozofe, daketina fîlozof li qada jiyanê û hêza veguhertinê bidestxistina filozofe.**

**Marks, tenê gotina xwe dibêje. Rewşa min gelek cuda ye, ji bo min gotin kirin aliyê meselê yê herî hêsane. Lenîn esasên wê yên rêxistinî dibêje, ji bo min esasên rêxistinê gotin jî karek gelek hêsane. Ew dibêjin têkoşîna çînî. Ji bo min ger bêjim têkoşîna çînî jî kareke gelek ji rêzê û hêsane. Ez van hemû ji zû ve mîna "abc" fêr bûme û min daye kêlekê. Tiştên hîn zêdetir min kirine hene.**

**Belê, ya min şervantiyeke bi bagere. Şervantiyek heta şane û mejîyek sihême.**

**Niha me, kesayetên xwe wisa li gorî esasên şaristaniyê negirtiye dest, me li gorî esasên xwezayî girtiye dest. Yanî me ne li gorî quralên pêşketina civaka çînî, li gorî esasên xwezayî girtine dest. Çine evesasên xwezayî? Carna esasên zarokatiyê, carnan jî jiyana mirovên destpêkê. Me ev paşçav nekir. Di şêwazê tevgera min de ev heye.**

**Li zarokatiyê xiyanet nekirin, nizanim tevgera mirovê destpêkê esas girtin û li gorî vê li şaristanî, yanî li civakên çînî meyzandin, xususeke ku divê bi baldarî çavdêrî bêkirine. Ji xwe him nêzîkatiya hêsan esas girtin, him jî sedema nêzîkatiya pir zehmet jî eve. Mirovê yekem yan jî di safbûna zarok de bûyîn gelek zehmete. Lê gelek hêsane jî. Ji bo yên li gorî esasên şaristaniyê mezin**

**bûne gelek zehmete, lê ji bo yên li hember xwezayîbûna mirov eleqedarin jî gelek balkêş û xweşe. Di vê wateyê de nêzîkatiyek me ya felsefî û bandoreke me heye.**

**Ez xwe weke we tine nakim. Awantaja min a herî mezin, min xwe ji bo karê kirina qurban hêj nerazandiye. Ez gelek hûrbijêrim. Û vê jî, ji bo ku rihê xwe nefiroşim, bi awayê xwezayîbûna xwe winda nekim rave dikim.**

**Awartebûyîna min jî di vir de ye: Min ji zarokatiyê ve xwe bi hûrûkûr parast. Çîrokeke vê ya balkêş heye: Keçeke ciwan dibêje; "*Em her roj dişibin civaka dibe mîna fahîşeyan, lê ji min re wisa tê ku Rêbertî weke kesek bakîre ye.*" Bi rastî jî dikarim ji xwe re bêjim bakîrê mirovim. Lê hûn yên xwedî mal-mulk yan jî li gorî makanîzmayên hilberînê yên civaka çinî jiyan dikin. Lê ez ê xwe '*bakîre*' bidim jiyîn, an jî xwe têkilî qirêjiyê**

**nekim. Tesbîtek başe. Ya herî baş xwe têkilî ti qirêjî û gemariya mirovahiyê nekirine... Ez hêza xwe ji vir digirim. We jî darbe xwariye. Ev şêwazê hizrîna dagirkeriyê ye, çalekiyeke, mûlkiyeteke, fêrbûnekjiyanê û keyfiyeteke. Ger ku em van hemûyan weke ji rê derxistin binirxînin, wisa bi hezaran rewşên ku we jiyan kirîn hene. Cudahiya me di vir de ye.**

**Tevgera Safbûnê!**

**Tevgera min dibe tevgera paqijkirina mirov. Her wiha kêm zêde herkes vê di PKK'ê de dibîne. Balkêşbûn û xweserbûna PKK'ê di vir de ye. Elbet tarîfa min ya herî diyar wisa dikare bê kirin.**

**Herkes wisa dizane ku min bixapîne. Ji xwe Îblîsbûn bi xwe jî xapandineke, hareketek dizane. Niha rewşa min bi temamî berevajî vê ye. Her wiha di nava rêxistinê de heya bêjî xapandin heye. Ez rewşa van**

**hevalan fêm dikim. Şêwazê wan yê jiyanê Îblîstiye û xapandinekê esas digire. Lê di me de berxwedanek heye. Yanî tevgera li hember Îblîs gelek bikoke.**

**Ez ne firîşteyê ku xew dikime.**

**Weke pêxemberê serdemê di nava şerek mezin de me. Yanî yê me ji fîlozofbûnê wêdetir dikare mîna çalekiyeke pêxembertî bê ravekirin. Niha hîn baştir fêm dikim. Vaye ev, "*Ketina sê hezar salî*!" Ger ev rast be, bersiva bê dayîn jî divê hinek pêxembertî be. Ez xwe wisa mîna pêxemberek ku gel fêm kiriye nanirxînim. Lê bi hinek taybetmendiyên xwe re dişibe mîna derketina pêxemberan.**

**Belê, tenê mîna filozofan nirxandin kême. Ez ne bawermendekim jî. Hewl didim li gel hinek taybetmendiyên serdemê yên pêxemberan re bim. Divê hûn di vê mijarê de nîqaşê kûr bikin. Me hêviya**

**xwe ji mirovahî û ji jiyanên xweşik qut nekiriye. Ya herî rasteqîn dinyayê deynin pêşiya min jî, wê bala min li hember vê şêwaza jiyanê nebe. Kêfa min jê re nayê. Berde pere-mal, nizanim rehetî... Gelek ji van ji min re mîna îşkenceyê ne. Yek jî şêweya jiyaneke ku dikare hemû hevalên me bixe bin bandora xwe, ji bo min jiyaneke li hember bertek bê raberkirine. Ez yên li ezmanan diğerim, ez li yên hîn zêde min bikişîne yan jî dewlemendiyê digerim, li yên ser dikeve digerim. Yên we ewqasî hejarokî ye, mirov xemgîn dibe. Ez difikirim dibêjim ku; "*Ev hejar çawa tenezil dikin?*" Bûna mirovek ku bi heyran bim gelek girînge.**

**Hevalên me wisa difikirin ku milîtantiyê dikin. Li gorî min di nava şaşwaziyek mezin de ne. Ji milîtantiyê wêdetir, pir ditengaviyê de ne. Ne di ferqê de ne çiqas û çawa meşîne.**

**Belê, Mezopotamyayî bûn… An jî bandora xaka ku em lê çêbûne çiye? Beriya her tiştî taybetmendiyeke min heye ku wisa hêsan ji xakê qut nabim. Ger ku cihê lê hatime dinê Mezopotamya be, divê fêm bikin ku wisa hêsan ji Mezopotamyayê qut nabim. Bêguman nizanim qutbûn û derketina bahoza ku pirsgirêkan derxistî çiqas bi rastiya Mezopotamya ve girêdayî ye. Ez bawerim li ser min zêde bandora dîrokî nîne. Ji ber di rastiya me ya civakî de dîrok xilas bûye. Belkî ji bo her yek ji we tiştek hebû, lê ji bo min nînbû. Dema ku dor hat min, dîrok, felsefe, civak, huner û terbiye xilas bibû. Ez piştî wê hebûm. Gelek ecêbe dema ku hat xwe li min girt belkî ji bo her yek ji we tiştek hebû, lê ji bo min nînbû.**

**Ez yekî wisanim ku li kêleka sînoreke xilas bûye de bejn didim. Divê ev çawa bê fêmkirin? Ew gundiyên ji rêzê jî, bi dilêşî li rewşa**

**min temaşe dikirin. Ez yekî wisa bûm ku herkesi digot; "*Zarokê ti hêviya wî nîne. Xwedê zarokê kesî neşibîne wî.*" Ev darazeke gundiyên herî ji rêzê bû. Ji ber vê yekê, divê em nebêjin şaristaniya Mezopotamya, wisa bi dahiyane derketiye û xwe bi xwe ne xapînin. Ya min gelek ji rêzê û hêsane. Lê li gorî şêwaza mantiqekî, ev min ber bi azadbûnek bêdizgîn ve dibe (ji vê re dibêjin şêwaza diyalektîkî), kesê ku evqas ji nirxên şaristanî, civakî, ramyarî, dîrokî û malbatê dûr ketî kesek pir serbeste. Di wateyekê de jî pir azade. Ez bawerim ev dibe şansê min yê herî mezin. A rastî bavê minê belengaz û dayîka min ya gelek ecêp dibin şansê min. Dema ku zarokbûm ya ku min jê re digot bêşansî, dibe şansê min yê herî mezin.**

**Hîn tê bîra min, min ji xwe re wiha digot; "*Xwudayê min te çima dayîka min, bavê min wisa afirand, te***

***çima min weke zarokê belengazan anî dine*?" Wiha ez li wir, ber bi hêzê ve gav davêjim. Bi misogerî ger ku ne zarokekî wisa bûma, qetiyen ev pêvajo di min de pêş nediket û minê ev serbestbûna mezin bidest nexistiba. Dayîk û bavê min ewqas belengaz dihatin dîtin ku, min digot; "*Ez bi destê wan bigirim.* " Di temeneke biçûk de, wiha îdeolojiya baviksalarî hîn di wê wextê de -ku ji bo zarokekî îdeolojiya herî bi bandore- ji bo min rewşeke ku wateya xwe nînbû û têkçûyîbû.**

**Bavê min yekî hejare, ji destê wî tiştek ne dihat. Diya min jî tam karesetek bû. Kesek qîre wîr dikir û xwedî her nêzîkbûnên bê mantiq bû. Rastiya malbateke li ber xirabûnê bû. Di malbata me de jî malbat ji hev ketiye, a rastî sekiniye. Ew rewşa bavê min û dayîka min, min di demeke kin de ji bin bandora îdeolojiya malbatê rizgar kir. Ev bi**

min pêngavê dide çêkirin. Wisa hevalên min yên yekem, gerên min yên yekem û tevgerên min yên yekem gelek girîngin. Şansê ti zarokî ya bi vî rengî nîne. Ne gengaze jî, wê ya ti kesî jî çênebe.

Ya rastî ne malbatek rûxiyayî ye. Heya bêjî malbatek paqij û duriste. Him gelek şikestiye, him pir paqije yan jî qirêj nebûye. Vaye malbateke bêmafî li kesî nekiriye û zêde neyêniyên wan nîne. Ango dema hewl tê dayîn azadî bê bidestxistin, -li gorî min ev gelek girînge- bêçaretî, feqîrî, belengazî, xirabûn, safbûn û paqijî hemû heye.

Ez yekî pir bijareme. Tam weke xwudayekî, quralê têqezim. Min yekbûna vê dualîteyê pir baş bi xwe re pêk anî.

Hema nebêjin ajo û biçûk nebînin. Ajo diyardeyek jiyanî ye û jiyan jî di bin bandorek giran a ajoyan de ye. Dema ku rêgez nebe, hat

**dewisandin, dîsa wê tu bibî yekî mûcîzevî û xwe bi ji jiyanê vekişînî. Ez bawerim di me de herdu jî hene.**

**Kesayeta mirovekî ketî û qet nayê nasîn, sist, pir paşketî, biçûkmayîna rêgezan, rêgez ji rêgezbûnê derxistin û di vê wateyê de ajoya ku ji xerîzebûnê jî derketî derxistî holê ye. Ez hîn hewl didim wê çareser bikim. Yanî ne rêgeza wê heye, ne jî ajo wê heye. Herdu jî ewqas hatine berevajîkirin ku, tişteke ku dişibe nîne. Bersiva min ya ji vê re, di rêgez de mezinbûn, di xerîzeyan de jî lebateke sihêm. Bila xerîzeya wan a birsîbûnê, cinseltîbe, belê cuda kîjan ajo hebû belê ya tirsê bû. Belê, ez di terbiyekirina ajoya birçîtî, tirsê û hwd de hostame. Dema ku her kes ji ajiyên xwe gelek tiştan winda dike, ez ajo di veguhertina hêzê de hosta me. Dîsa dema her kes di rêgez de asê dimîne dogmatîk dibe, dîsa ez di rêgezan**

**weke dergehek hêza saxlem vesazkirinê de bi hêzim. Hesabên min yên bi vî rengî hene. Ez xerîzeyan gelekî tehrîk dikim, lê ez bê rêgez nahêlim. Ev di min de tirsnake û lebata min jî ev diyar dikin. Kesayeteke ku vê hostatiyê bide raberkirin nîne.**

**Yek jî rêgezên wan, xerîzeyên wan mirî û xeterin.**

**Hûn çima wisanin? Bi sedê salane li ser we tiştên wisa hatine ceribandin, gelo em dikarin bi teoriya fahîşetiyê rave bikin?**

**Bi hezar salan, -çend hezar sal-belê, yê hatî perçiqandiye, yê hatî lê xistiye, dijûn jê re kiriye. Ne rih tê de maye ne jî raman. Vaye ev cudahiya min e. Tişta min kirî bi hostatiyeke mezin min xwe ji van lêdanan parastiye. Lebateke min mezin ya parastinê heye. Gelek bi hostatî, tevgerek parastinê me. Ji bo rihê xwe nefiroşe, xwe ji hemû xirabiyan**

biparêze, ji bo raman bin nekeve û bi hesasbûneke mezin ve meşandina min ya vê heye. Weke mû ji nava rûn derxîne, weke şekir-şêrînê. Ger ku niha li ser we biceribînin, wê di çîrokê de derbikeve, hûn ji zû ve mîna miriyanin.

Li xwezaya mirov vegerîn, xwezayîbûyîn evqas girîng be, çima hûn wisa pir çewt, heta ji wê hîn xirabtir disekinin. Guhertin-veguherîna di Marks de û teoriya biyanîbûnê di me de berevajî tê bikaranîn. Ew teoriya biyanîbûnê dibêje, min ji zû ve biyanîbûn bi erdê re kiriye yek. Ew guherîn-veguherîn dibêje, beriya ku ez bêjim min pir bêhempa veguherandiye. Teoriya wî heye nîne, heta nediyare jî, bixwe heye.

Esasen şerê min, rastiya dijminê min, neçartiya serxistina min, firsend nedana windakirinê, xwe bi serkeftinek teqez ve girêdan, weke

**kes ez ber bi kesayetek pratîkvanek berz ve, pirsgirêkek herî kûr ya felsefîk, dibe ku sedî salane ya filozof dibêjin lê nexistine meriyete, min ji zû ve ber bi pêkanînê ve biriye.**

**Tiştên ku Platon sê hezar sal berê gotî pêk tînim. Bûyerek bêhempa ye.**

**Ger ku bixwazî bi qiriga serdemê bigirî, bi biyanîbûneke mezin re bi hev bikevî neçarî van bikî. Yek jî dijminekî te yê şênber heye -em ji KT'yê re bêjin dijminê taxtîk-her wiha ger bixwazî li hember dijmineke taxtîk re bi hev bikevî tu yê wisa bibî. KT'yê dijmineke taxtîk yê wisa mezine. Li hember wî jî ez birêxistinkirîme. Ya rastî şerê me bi KT re sînordar nîne. Û heta diçe beriya serdeman. Niha ez xwe bi sed salê re sînordar nakim, bi hezar sal re jî sînordar nakim. Hêzeke jiyanê yê bê tixup û bê deme. Di felsefeya min de pêşîkî-dûvretî, destpêk û dawî nîne. Yan jî ya ku**

**destpêk û dawî diyar nîne. Hinek jî dibe girtina gerdûnbûnê. Li gorî gerdûnê me. Ger negihim vê xalê, ji xwe ez ê nikaribim vê hêz û felsefeyê bimeşînim.**

**Belê, em dikarin ji vê re bêjîn gerdûnbûyîn, ez li gorî gerdûnê me. Gerdûn çawa ye, ez jî wisa me. Rêgeza gerdûnbûnê heye.**

**Min mirovê bê dawî di xwe de gihandiye çareseriyê. Ez wisa bê felsefe nabim.**

**Ger ku ez xwe di warê felsefîk de têr nekim, ez ê nikarim bibim zilamê tevgerê. Heta di felsefeyê de jî yekbûnek berfireh a bigire nava xwe, bûyer û felsefeyek nîfço nîne. Ekolek -felsefeya yekpare- dixwazim bêjim ev jî heye.**

**Ev jî xweşike. Ev hemû, çalekiya me diyar dike, min têr dike yan jî min li ser lingan digire. Moral nebe mîlîtan nikarin li ser lingan bimînin. Moral jî pirsgirêkeke felsefîke. PKK'ê**

**îdarekirin bi misogerî karekî morale. Moral, şaxê felsefê yê herî girînge. Her wiha di vê de jî mîsorgerbûnek heye.**

**Ji ber vê, zarok gelek ji min fêm dikin. Yên ku qet xwendin-nivîsandina wan nîne û heta fîlozofên ku pir li ser mirovahiyê disekinin, ez hevalên wan yê herî baş im. Heta em taybetmendiyeke wisa pir baş ferq dikin: Her kes, mirovê di xwe de defin kiriye di min de dibîne. Ji min re dibêje; "*Parçeyeke min tu temsil dikî.*" Lê ew binaxkirî ye. Kesayeta ji fîzîk xuya dike, kesayeta li ber çav cudaye. Di koşeyekî dilê wî de maye, miroveke ku jiyan nekirî heye ew jî ez im. Ev gelek nêze, lê binaxkirî ye. Di ciheke biçûk yê dilan de ye. Hûn dikarin min weke kombûna wan bifikirin. Tiştek balkêşe, lê ez vê bingehê ji bo xwe esas digirim.**

**Dema her kes ji bo xwe modeleke jiyanê dihilbijêre, rewşa**

**min ya jiyanê ya ku min hinek ji bo xwe pêk aniye jî eve. Bêguman ev di heman demê de jiyaneke bi qutrede. Li gorî min mirovê xwezayî, mirovê herî mezine.**

**Penaberî... Penaberî. . .**

**Belê, rastiyeke ku berbelavbûnek û diasporayek mezin tê jiyîn. Gelê kurd jî, di roja me ya îro de gelek ku pir berbelav bûye. Tevgera me bi xwe jî tevî hemû zehmetiyan, koça wê ya piştî demeke pir kin, sedema me ya ku me ev veguherand tevgerek mezin jî eve.**

**Em di ferqa vê de bûn: Faşizma 12'ê Îlonê, hatibû pîlankirin ku gelê Kurd bi tevkujiyek duwem ya Ermeniyan re, ji Kurdistanê bidin valekirin. Pir sûdmende ku em û hemû gelê me vê bizane. 12'ê Îlonê, darbeyeke faşist bû hatibû pîlankirin ku gelê Kurd, Kurdistanê vale bike. Û**

**bi awayeke gelek xedar, di sala hevdeyan de jî wê ev hatiba domandin. Li hemberî vê, min tevgerek koçê ya ku zêde dûr neçe pîlan kir. Û ji roja destpêkê ve, heta beriya derbikeve vegereke welat pir balkêş çêbû, tenê ne di warê fîzîkî de, di warê hest û fikir de jî da çêkirin. Vaye li vir im; ger li Kudistanê bûma, bawer nakim min evqas pêşketin û ev tevgera mezin ya guhertinê pêk baniya.**

**Di raman de guhertinek mezin, di hestan de guhertinek mezin, di pêşketina hestên welatparêzî û hişmendî de guhertineke mezine... Bi taybet jî girêdana wê ya bi şer re, "*guhertina bi şer*", ji bo min heta bêjî girîng û balkêş bû. Biqasî ku kesî nebihîstiye, nefikiriye û xwe nedayê min xwe da vê xebatê.**

**Di van salan de her tiştî dida revandin. Di van salan de, ji koça Ermeniyan zehmetir, salên dana**

**koçkirin û penaberiyê bû. Piştî komelkujiya Dersimê şûnde terora sipî û koça dihat jiyîn, sed carî li ser qanûnên îskan re qanuneke îskana neçarî pêk dihat û ev sal salên dayîna koçkirinê bûn. Gelek milet, Rum hwd. dan koçkirin, ya ji van hîn xetertir jî tevgerek dayîna koçkirinê bû. Bi hêzeke mezin ya artêşê ve, ji bo ku di mejî û rih de biyanîbûn bidin çêkirin pîlan kiribûn. Bi xistina hemû qenalên radyo, TV a dewrê re, koçbertiyek di warê fizîkî, ruhî, fikrî, polîtîk, çandî û aborî de hat ferzkirin. Divê ev baş bê zanîn û ez hêvî dikim bifikirin, hinek jî ev mijar wê niha hîn baştir binivîsînin. Bi taybet jî wê fêm bikin çalekiya me ya li hember koçkirin û bêbingeh kirine, berxwedanek çawa balkêşe.**

**Ez berbelavbûna fizîkî zêde girîng nabînim, heta ji hinek aliyan ve dibe ku feyda xwe jî hebe. Lê ev ziwabûna di giyanan de, li gorî meyzandina min we hemûyan tîne rewşeke wisa dilê**

**mirov pê bişewite, dîsa ev bê sazûmaniya fikrî, belawela, ji koçên fizîkî pir xetertire. Di mijara welatê xwe de evqas bêhest, li hember rastiya mirovên xwe evqas belawela, bêpergalbûn, ji bo min bingeha hêrsek mezine. Di vê xalê de li cîhana lawiran temaşe dikim: Ew jî wisa hêsan hêlînên xwe naterikînin. Ne gur, ne çeqal, ne mar, ne jî zîvzîve (çiyan); gelek zehmete ku hêlînên xwe biterikînin, tenê dema te kuşt dikarî wan ji hêlîna wan der bikî. Û gelê me jî bi salan li van xakan bû, xakên pêşiyên wan, xakên ku mîna goşt û neynûk girêdayî hev... Çawa çêbû ku ev kareseta mezin bidil pêşwazî kirin? Bêguman ev hîleyek şerê taybet bû. Bi hostatiyek mezin pîlanek ji bo pêşxistina koçkirinê bû.**

**Ne ku nabînim. Mînak girêdana danakoçkirina Dêrsim û qetlîama Dêrsim, têkiliya koçkirina Pazarcix-Mereş qetlîama wê û ya herî girîng jî**

**"*terora sipî*", derketina holê ya saziyên şerê taybet, ji bo min zelal bûne. Û dizanim ku ev li her bajar, li ser her herêmeke Kurdistanê çawa bi pergal, pir bi usta, bi hezar û yek hîleyan û bi polîtîkayên çewsîner lê ferz kirine. Tişta ku dixwazim bêjim, ne ku gel erzan suçdar dikim, lê tevî vê jî ev lîstik çawa hat daqurtandin, ev lîstika şerê taybet çawa wisa di xwe de, heta weke ku ji xwe bireve çawa hate vê rewşê?**

**Dîqat bikin, gel ji xakên ku lê çêbûye wisa hêsan jênareve. Lê di me de mîna jê bireve ketine nav pêvajoyek derûnî û ramanî. Ji xwe direve, her tişt jê re weke mar tê, direve, weke sitîrî tê, direve... Ya rastî şerê pîskolojîk ev rewş afirandiye.**

**Diçe metrepolan, metrepol têr nake diçe Ewrûpa, Ewrûpa têr nake diçe Moskova, Moskova têr nake diçe Emerîka, London û ez bawerim ger**

**bêjin qudba Bakur jî, em ê li wir di rêza yekem de cîh bigirin. Em hatine rewşa mileteke wisa dane revandin. Divê li ser vê baş bê sekinandin. Nirxandinên di derbarê vê pêvajoya dana penaberkirinê de gel tenge, zêde ne di warê zanistî de ye û wêje jî di vê astê de karê xwe nekiriye. Dîsa di vê mijarê de huner ne baldare.**

**Ez ê ne di zanebûna van tevan de bim. Weke min beriya niha jî gotî, min şerên tena bi serê xwe meşandî hene. Wisa, di van şeran de ya herî girîng, şerê "*vegera ruhî*", "*welat heskirin*", şerê "*peyitandina mirovên me hêja ne.* " Gelek hewldanên awerte yên dişibin vê hene û ev ji şerên herî berketî girîngtirin. Ji ber ger ku em li nêzîkbûna dijmin ya gel penaberkirinê bifikirin li hemberî wê hêza me ya fikir û kesayeta min ya niha ku hêyecan dide li holê ye.**

**Hebûna min her roj ji bo welat bangawaziye û qêrîneke mezin ya netewî ye.**

**Sedhezar bixwe vê dikin, ev şerên mezinin.**

**Ger ku min di eniyê de deh şer dabûna (di gelek îsyanan de jî hatiye dîtin û encam binketin, ezamet şikestin, careke din ji dayîkbûn û çêbûna xwe poşman bûyîn, ji doza xwe çûyîna paş çêbûye), ez ê negihiştibama van encaman. Lê niha wisa ye? Niha bi tedbîrên ku min girtine re, bi hemû hewldana min re hêvî hatiye dayîn ku "*ev welat jî dibe xweş bibe, em dikarin gelek xweş jiyan bikin...*" Yekîtî û kelecana vê di lutkeya jorîn de ye.**

**Vaye, ev şer in. Wisa ji ber xwe çênebûne.**

**Ez ji hinek hejarên xwedî aqil û hestan re dibêjim, rastiyên di vê mijarê de ne li gorî tiştên hûn dizanine. Li hemû îsyanan binêrin,**

**çima piştî demeke kin şûnde moralê hemûyan ewqas xira bûye, çima her kes hatiye ber rewşa qutbûnê? Jiyana Ewrûpa baş bû û di vê mijarê de emperyalîzîm gelek mercên jiyanê yên têrkar dabû, başe çima niha herkes dixwaze dev ji vê berde, dibêjin; "*Ax welat!*" Çima li pey hestên hîn bilindtirin? Ji ber ev şerên rasteqînin ji ber wê ye. Me jî mesafeyeke mezin girtiye.**

**Û ya herî girîng jî gerîla li hember sermaya çiyan ya herî qerisokî, di germahiya wê ya bi şewat de, belkî jî di berîka wî/ê de pariyek nanê hişt-pîvazek nîne tevî wê li hember artêşeke sedhezarî li ber xwe dide. Ev rih, ev cesaret ji kî derê hatiye dayîn?**

**Vaye, bûyera herî mezin ya şer ku min qal kirî eve. Ma çima yên tirsonek bi ti awayî naxwazin fêm bikin?**

**Ez ji yên pir baş dinivîsin-xêz dikin re dibêjim, ji yên qaşo**

**dihesibînin ku wêje dikin helbest dinivîsînin re dibêjim: "*Tu helbestvan û nivîskareke çawa yî, tu ji bo Afrîqayê dinivisînî, ji bo berxwedanên cîhanê yên herî ji rêzê dinivisînî, lê tu naxwazî yên ku pariyeke nanê wanê hişk nîne, bêhempa li ber xwe didin fêm bikî*? Divê êdî ev bê fêmkirin! Yên ku vê fêm nekin nikarin Kurdîtî û welatparêziya Kurdîtiyê bikin. Ev tirsonekin û yên tirsonek jî teslîmê zaliman dibin. Tene dikarin li ber deriyê hêzên ku ev gel anînê vê rewşê de rol lîstine li pey karmendiyê bigerin.**

**Û karmend û tirsonek ti carî nabin şervanên gel yên wêrek, rewşenbîrên gel û sinetkarên gel. Dema ez vê dibêjim, cudahiya kesan nakim, naxwazim vê yan jî yê din teşîr bikim. Dixwazim rastiya rizgariya neteweki rast bê fêmkirin. Ger hebe hinek behremendiyên wan, bila wan ji bo welatê xwe û ji bo berjewendiyên**

**gelê xwe, çi bila bi destê PKK'ê be, çi bila bê PKK'ê bikin, lê divê rast pêşkêş bikin. Ji bo vê yekê dibêjim pêwîste destpêkê rast fêm bikin, bibin xwedî dil û morelek rast. Wê ev, rih û hişmendiya wan pêş bixe. Û wê ev jî bi misogerî vegera li welat pêkbîne, bêkokî veguherîne kokên esasî.**

**Hêvîdarim ku, niha nivîskarên me du romanan yek bi navê "*bêkokî*",yek jî bi navê "*kokberdanê*" binivîsin. Bêkokî zede û weke ku her tişt jê dikin davêjin. Bila pêvajoya vê baş binivîsin, mijareke pir cidî ye. Him jî bila lêkolîna wê ya teorik baş bikin.**

**Şewitandina gundan bêkok-kirine, di her astê de mirov dayîna revandin bêkokirine.**

**Lê yek jî bikokbûn heye. Ger ku gengaze bila wêje û hunera vê jî bikin. Carekedin bikokbûn kelecanê dide min. Azweriyên min ên mezin**

**hene. Ger ku bi van re welatparêzî heye, çima vê nabihîzin?**

**Ma li çiyayên Kurdistan û newalên wê ji çandinî zêdetir tiştek hîn binirxtir dibe?**

**Mezopotamya, newalên Zagrosan, çandiniya destpêkê, kedikirina destpêkê, hêlîna destpêkê, ma ne qadên pêşvebirina hemû îskanên mirovan û şaristaniya mirov bû? Û ma ev hemû hêcanê nadin hemû mirovan? Başe çima ev dîrok nayê dîtin, çima li gorî vê dîrokê ji nû ve, xwe tevlî vê çîroka vejînê ya mezin ku li Mezopotamya ye, newalên Zaxrosane nakin? Çima romana wê, hunera wê, hêcana wê nabînin? Çima xwe di Ewrûpa ya tinebûyî û waroşên metrapolan de xilas dikin? Heta çima xwe li Kurdistanê jî ziwa dikin? Dipirsim ku, çima dînê jiyanê, çima nexweşê welatê xwe û girtîgeha vekirî jiyan dikin! Û dibêjim ev lê nayê.**

**Wiha, di vir de şerên ku min qezenc kirîn hene. Ez gelek rihetim, gelek bi hêcanim û ev min pir dixirikîne, her tiştî bi min dide fikirandin û her tiştî bi min dide serxistin. Ger ku dixwazin serbikevin, vaye mîna vî “*karê bêkokbûnê*” bibin proleteryayê zanistê, hêcanek mezin bigirin. Ya din wê mîna verişîna gorê bê, wê enerjiya wê bê, wê hostatiya şervantiya wê bê û hûn ê her roj daneyek nû çêkin. Û wê binkeftin jî nebe.**

**Mezinbûna min di vir de ye: Min li hember berbelavbûna mezin li ber xwe da; min di rih de li ber xwe da, wisa tundî bi çêk li ber xwe neda. Min di raman de li ber xwe da, di kesayet de li ber xwe da. Ev gelek girînge, em pêvajoyên dişibin van bibîr bînin: Her çendî berxwedanî di rih, moral, raman û bi taybet jî (her çendî di çaçoveyeke teng de be jî) di rêxistinkirinê de bi tundî biparêzî; wê**

**rê li ber tevgereke li hember disekine, xwe ji nû de saz dike û ji civakek nû re rê veke. Em bi temamî di vê pêvajoyê de ne. Ya rastî divê pêşveçûna vê baş bê lêkolînkirin. Ji ber vê sedemê ez ê ji rewşenbîr, nivîskar û zanyaran re bêjim; bi misogerî pêwîste vê diasporayê, serûbinbûna mezin û berbelavbûnê baş lêkolîn bikin. Mesele wisa weke ku di rojnameyan de tê nivîsandin nîne, wisa weke hûn dizanin jî nîne, gelek kûr, gelek bi xeter û gelek dijwar tê kirin. Yê ku teslîm nebûyî, îhtîmalek her gundiyeke ku welatparêz be tê qetilkirin, bûyeke tirsinake! Ji van re bûyerên kiryarên wan ne diyar tê gotin... Mirovan digirin, bi gelek vehşiyane qetil dikin. Niha wê kî çîroka van binivîse? Hezaran mirov bi vî rengî qetil kirin. Rêxistinek yek ji van jî nîne û bi PKK'ê re jî ne di nava pêwendiyekî de ne. Şervanên şerê taybet, kontra**

**dibêjin ku; "*Dê ev di nêz de biçin aliyê wan.* " Ji yên teslîm nebûne, yên ku teslîm negirtîn re dibêjin; "*Ev potansiyel xetere*" û koka wan ziwa dike. Kesî ev pêvajo lêkolîn nekir.**

**Wiha tenê bi gotina;"*Evqas cinayet hene, xwediyê kiryaran li kî derê ne. . ?*"re dimînin. Ev ne tişteke! Kiryarên ne diyar di gorê de jî bin, bidin te jî, ev tiştek îfade nakin. Ev çawa girtin, kî bi kîjan armancê girtin û çawa îşkenceyên wehşî meşandin? Ev gelek girînge, divê devji vê neyê berdan.**

**Ez, hewla hînek mirovan, mafê mirovan û kesên navbertiya aşitiyê dikin kêm dibînim. Û gelek tiştan jî vedişêrin. Heta di derbarê hinekan de bi gumanim. Suçdarê esasî, niyetên wan yên esasî, têkiliyên wan yên li gel dewletê, rûyên wan yên wehşî û riya li ber êşên ji derveyî mirovahiyê vekirine nayînin ziman. Xistine ber çavê xwe çavokê hespan yan jî**

**dûrbûna ku rastiyê nade nîşan; dûrbûnê hîn dûrtir dide nîşan, nêzbûnê jî bi awayê ku fêm nabê nêz dike û dîmena rastî jê dibe. Vekolînerên bi vî rengî hene. Ev tiştên dibin dîtina wan wisa ne zehmete. Gundên ku xira bûne, pêwîstî bi durbûneke zêde û lêkolînkirinê nake. Ev êşên van mirovan, hema li rûyê wan temaşe bikî di heman kêliyê de fêm bikî. Bi lênûsê, nizanim bi çî vedikolin ku qaşo rastiyan bibînin, ev bêfihêtiye. Yên ku vê dehşetê heta şaneyên xwe hîs nekin, nikarin bibin parazvanên mafê mirovan û navbervanên aşitiyê. Di vê mijarê de li Tirkiyê rewşeke pir teng heye, divê bê derbaskirin. Ev jî têrê nake, yek jî divê eleqedarî ji bo vegera van mirovan hebe.**

**Ez xwe wisa ahim-şahim nagirim dest, lê min li hember van salan baş li ber xwe da, min rihê xwe nefirot. Mezinbûna min di vir de ye. Dema bi**

**qasî serê derziyê derfet ketin destê min, ji bo berxwedanî, min di hizir û pratîkê de nirxand. Hinek tiştên baş derketin holê. Bila ev bê fêmkirin yan jî herkes jê feyde bigire, ev jî bese. Divê ev bê kirin. Hinek nirxên xweşik yên ev gelê ji bo careke din neyê dîtin binax kirine. Dijmin wisa ji xwe re negotiye; "*Ev pêncî sale me xistine gorê, ser wan jî beton kiriye.* " Ev, nirxandineke raste.**

**Min ew gor kunkir. Çawa?**

**Ew jî karê nivîskar, wêjevana ye, bila lêkolîn bikin. Ez niha jiyan dikim. Li ser navê Kurdan jiyan dikim, li ser navê azadiya Kurdan, li ser navê azadiya gelê Kurdistanê jiyan dikim. Dixwazim Ermeniyan, Asuriyan jî ji gorê derxînim, çiqas çand heye dixwazim hemûyan ji gorê derxînim. Ez ji vê hêcan û şanaziyek mezin digirim. Vaye, divê ev bê lêkolînkirin. Ma ev kêm şerên girîngin? Kîjan**

**zaliman ev gorbûn û ev beton çêkirin? Hûnê çima vê nenivisînin?**

**Û ya herî girîng, ev çawa hat qelişandin? Bifikirin, ev gotina wane dibêjin ev pêncî sale hûn, "*di goreke betonkirî de ne.* " Bi lêdanê wê betonê diqelişînî û weke tovekê bejin davêjî. Ji bo gelan, ji bo çandên wan ji vê zêdetir tiştek ku hêcan bide ma mirov dikare bifikire? Li dilê nivîskareke me yê realist temaşe bike, li hişmendiya wê temaşe bike, heta nikare danasîna wê bike. Ev belangaziyek mezine. Ya pêk tê girînge. Her çendî êşên gelekî hebin jî ji nû ve dengê xwe derxistina holê û bêje "*ez heme*" hêcan dide. Her wiha hinek dibêji "Ermenî û Asuriyan jî şiyar dike. "**

**Bila her gelek rabe, ev tiştek xweşike.**

**Bila her çand pêş bikeve, ev jî tiştek xweşike.**

**Ew neteweperestên teng pirsgirêk û belayek cuda ne. Dikarin ji heqê wan bên der, mirovahiya ku pêş dikeve, çanda pêş dikeve, jiyan bi xwe ye. Vê dîtin û hêcan negirtin gengaze? Şer, cewherê şerê gel jî wisa be rakêşwer û afirînere, her wiha dibe ku ber bi encamên serkeftî be jî bibe.**

**Yanî di wateyekî de weke cewherê pirtûkan jiyan dikim de me. Min berê pir pêwîstî didît, çi ber çavê min ketiba min dixwend. Niha eleqeya min lewaz bûye. Lewazbûn, ne ku ji ber pêwîstî bi hizir nedîtine. Tenê difikirim. Êdî pirtûk ji min re teng tên. Hizrê xwe di nava risteyên pirtûkan de çewsandin min teng dike. Berevajî di serê min de teqînek heye. Ez dikarim di derbarê felsefe, moral, mijarên ku hemû civakê û xwezayê eleqedar dikin de bifikirim û ev min îdare dike. Ji ber vê yekî zêde pêwîstî bi pirtûkan nabînim. Di cihekê de tişta**

**ku jiyan kirî di pirtûkan de fêrbûn zêde girîng nîne. Herî zêde, pirtûkan lêkolîn dikim ka tiştên hatine jiyîn çawa rast derdixin. Lê dîsa bi dilnimzî dixwînim. Lê bi taybet ji rewşenbîrên Kurd re pêşniyara min, bi dîtana tiştên hatine jiyîn re pirtûkan bixwînin, wê hîn zêdetir encamên bandorker bidest bixin û bigihin rondarbûneke dijwar. Di pirtûkan de tenê dîtin zede rastiyê rave nakin. Di ya tê jiyîn de jî li rastiyê gerîn di nava derfetan de ye. Ger berhevdanên xwe yên teorik bi tiştên tên jiyankirin re bike yek, wê rê li pêşiya ramaneke rewşenbîrî ya rasteqînî veke.**

## Tenêbûn û Rastiya Dîktatorî yê

**Nabe pirsgirêka tenêbûnê yên ku evqasî milyonan xistiye mejiyê xwe yan jî berjewendiyên wan yên herî jiyanî di dilê xwe de bicîh kiribe hebe.**

**Tenêtî tê vê maneyê:**

**Ger ku dil û mejî ji rastiya gel û mirovan dûr be û ferdperest be, her tim xwe bifikire, ev dibe tenêbûneke tirsnak. Tenêbûnek nayê îdarekirin û heta nexweşiye. Di min de berevajiyê vê derbasdare. Ji vê re dibêjin rastiya dîktatoriyê, berxwedêrbûna îradeya gel a qewîm û ez vê qebûl dikim.**

**Ez dîktatorê rastiyê me!**

**Ez qet ji vê teng nabim, ger ku pêwîst bike ez ê bi tena serê xwe îradeya gel bê eman bi salan biparêzim. Lê bi rastî jî, di wateyên din de ez xwe weke demokratê herî bi pîvan dinirxînim. Herkes dikare vê tesbît bike. Kî rê li ber vejîna gelê ku zimanê wê nebû, nasnameya wê nebû, di gorê de bû vekir? Kî ye yê ku zimanê gelê Kurd, rastiya wê bi cîhanê daye naskirin? Ma ev ne demokratbûna herî mezine? Kesê ku daxwazên wan yên netewî gihandiye asta nav-netewî kî ye? Ma ev dibe dîktatoriyek? Ev demokratbûn û**

**welatparêziya herî mezine. Ma kî îradeya milyonan bi welatê wan ve gire daye? Yê ku di radeya yekem de berpirsyartiya vê di asta jor de radike kî ye? Ma dibe ev bi dîktatortiyê bê ravekirin? Ev tene bi welatparêziyekê, him jî bi welatparêziyek şahane, bi demokratbûnek ku gelê me mîna pêxemberiyê lê temaşe dike ve gengaze. Yên ku berevajî dikin hene. Ya rastî ew bi xwe destpotîkin. Ji sedî yek derfetên di deste min de bidin van kesan (di nava partî de jî hene, ez tenê ji bo yên derveyî me nabêjim), karê ku yekem bikin, weke paşeyê qereçiyan wê destpêkê bavê xwe daleqîne. Ev dîktatorên bê rehmin. Ger ku dixwazin dîktatoriya van hîn baştir fêm bikin; li malbat, jin, zarokên wan temaşe bikin, hûn ê bibînin hatine çi halî, hûn ê bibînin wê civakê jî bînin çi rewşê. Lê hemû hevalên li gel min-jin yan jî zilam- dil û**

**mejiyê wan pir zêde vebûye, tişta ku dixwazin dibêjin, nîqaş dikin, dibin îrade û cesaret digirin. Ev hemû demokrasiyek mezine.**

**Min di rih û fikir de kurdistanîbûna herî mezin jiyan kir. Dikarim bi awayê fizîkî jî jiyan bikim. Ew pêvajo jî destpê kir. Ev, dibe vegereke fîzîkî ya bêhempa. Ez amademe û dikarim vegereke bê qusur jî pêk bînim. Êdî dikarin min bi awayeke pratîkî ku li Kurdistanê me bihesibînin.**

**Evîn?**

**Bi rastî jî ez bi cidiyeteke mezin li ser "*Evîna Kurd*" disekinim. Û ev jî bi welatparêziyê re heman cewhere. Bi misogerî ji bo min şiyarbûna jinê welatparêzî ye.**

**Pêşveçûna jinê parçeyek demokrasiyê ku nayê cudakirine. Şêwaza vê ji bo min gelek balkêşe. Ji**

**ber vê û li ser vê bingehê bi jinê re eleqedar dibim. Ji filmên herî baş zêdetir balkêş û veguherîner eleqedar dibim. Encamên girîng derdikevin holê. Di warê qilasîk de ti ferasetek min ya evînê nîne. Heta bi nêzîkbûnên kevnare yên rojane derbasdarin ve têkiliyên min yên bi jinê re pir ne bi wate ne. Lê bi jinê re eleqedar dibim. Ji bo jina xweşik derxînim holê, min jêhatiyeke mezin bidest xistiye. Ji ber jin, di demên dawî de gelek nêz dibin, awarte tên, eleqedar dibin.**

**Bi giştî jina Kurd gelek muhafezekar hatiye mezinkirin û wexta destê zilamek lê dikeve jî hema dibêjin; "*Namus çû.* " Ev, hatiye berevajîkirin. Ji tevlîbûna rihî û fîzîkî re eleqedariyek pir zêde didin nîşan.**

**Li gorî min ev, pêşveçûna qanûna evîna Kurd'e.**

**Û êdî ev qanûn kar dike. Divê nirxê ku jina Kurd dide xwe biçûk neyê dîtin.**

**Her ku hinek qeşmer dibêjin; "*Apo bi jinan re çawa jiyan dike?*" Jin hîn zêdetir pêşve çû û evîn pêkhat. Xwestin xirabiyê bikin, lê başî kirin. Bêguman hinek jinan xwestin me bidin sekinandin. Mînaka Fatma heye. Hûn dizanin, ev keça yekî noker yanî Kesîre bû. Me bi wê re şereke mezin jiyan kir. Li hemberî ew saziyên KT'yê yên ku evîn malbatê dikuje, şereke me yê mezin bû û serket. Piştre tevgera jin weke şapeyekê pêşket. Lewra em vê naqedînin. Hewldana jinê bi xwe ya xweşikbûnê hîn zêdetir bala min dikişîne. Ez cesaret nakim ku xwe bi jinekî re xilas bikim. Wisa bûyîn jî hineke berevajî armancên xwe yên netewî dibînim. Ji ber divê giştî bimîne. Ji bo hemû jina mayîn, ji bo min gelek girînge. Bêguman ti Kurdek vê nafikire. Ew her tim xwedî ziriyetê, hema dixwaze malbatek xwe ava bike. Ez, niha gelek ji vê fikir û azwariyê dûrim.**

**Baldar bin, xilasbûna cînseltî, li cem me cihê xilasbûna her tiştî ye. Hemû enerjiyê didin jinekê, didin zilamekî û li wir hemû têgihên pîroz, hestên pîroz tên kuştin. Ji bo pêşiya vê bigirim, min tedbîrek girtiye. Li gel Freud analîzeke cînseltî hebû. Ez di vê mijarê de zanistî me. Ji bo ez tinebûna Kurd, rewşa tinebûna di nava malbata Kurd de bidim sekinandin bi qasî xebata mina zanistî, ewqas jî tedbîrên min ên polîtîk hene. Ji van re dibêjim tedbîrên psikolojîk û polîtîk. Evencamên awarte dide. Encamên vê çine? Enerjiya cinsî veguherandina polîtîkayê ye. Ne ku jinê weke navbenykara cinsî bidî bikaranîn, ji bo bê rewşa "*hêza bangawaziya neteweyî*" weke gelê Kurd vejandin (diriltme) û anîna rewşa hêzeke balkêşe. Ji ber vê sedemê evîn ji nû ve afirandine. Ji bo wê ger ku pêwîst bike çawa ku çilsal derwêşên kevin**

**êş kişandine, em ê jî ji bo "*evîna bilind*" bidest bixin ji nexweşbûnan dûr bisekinin. Ti tişteke ku neyê fêmkirin nîne.**

**Ji bîr nekin, raste rast axiftineke jin bi zilam re yan jî zilam bi jinê re nîne. Zilam dibîne êrîş dike, jin cinseltiya xwe difiroşe. Ev, rewşeke herî xetere. Ji bo pêşîgirtina vê jî bi tedbîrên min girtine re sifata rahîp yan jî rahibe lêanîn wê bibe yek ji nêzîkatiyên herî tund.**

**Min riya evîna mezin ragihaniye.**

**Li hember evîna mezin zedê rêzdarim. Ji bo xwe û ji bo gelê me. Ji we re bêjim ku heta niha feraseta evîna Ehmedê Xanî jî hîn nehatiye fêmkirin. Ew, nepêkhatina yêkitiya Kurde. Pêknehatina vejîna gelê Kurd û bisotîn ketina gorê ye. Piştî sêsed sal şûnde herhal hîn zêdetir serberjêr çûye. Her wiha divê ev xebatên me yên bi vî rengî bên fêmkirin. Erzan, çawa wisa xwe jiyan dike, nizanim**

**rahîbene û rahîbin? Ev, tiştek nefêmkirine. Li hember evîna Kurd, hestên Kurd, hesasiyeta Kurd bêrêzî ye. Ji ber vê gelek tişt ji wêjevanan re dikeve. Qaşo ji yên ku dibêjin "*ez evîndarim*" re gelek kar dikeve.**

**Dubare dibêjim her evînek ji şer zehmetire.**

**Bi misogerî divê zayenda jin bê azadkirin û xweşikbûna wê jî gelek dijwar, him jî bi şereke pir alî ve gengaze. Heta ku jinek û zilamek li gorî vê guncav dernekeve holê, her tişta li ser navê evînê, li ser navê heskirinê, li ser navê malbatê herame û her tişt ketiye.**

**Ew jî çîroka tinebûna Kurd'e.**

**Di vejînbûna Kurd de cihê vê şîroveya evînê pirgirînge. Pêwîstedi vê mijarê de hinek din nêzîkbûnek kûrtir esas bê girtin. Pêwîste bi qasî zanistiye, ewqas jî nêzîkbûnek psîkolojîk û polîtîk bê raberkirin. Wê**

**bê dîtin ku karê tên kirin çendî girîngin û wê bê pîrozkirin.**

**Zeynep Kinaci**

**Çima keç tên? Jin çima tên? Ji bo min ev zilamtî hinekî derbas kiriye tên. Ev gelek vekiriye. Zilamê qilasîk bin dikeve. Ev jî girêdaneke mezin, weke di rastiya Zeynep Kinaci de jî diyar dibe rê li ber qehremaniyeke mezin vedike. Mesala, nameyên ku ji bo min nivîsandî hene. Ez dizanim, wê çawa bi bîranîna min ve girêdayî be. Wiha, wê çawa min temsîl bike? Ez çawa hewl didim xwe bi vî rengî formûle bikim. Yanî di bingeh de tişta wê anî vê bûyerê, zilamtiya me ya ku me kuştiye.**

**Ev keç, di nameyên xwe de jî nirxandinan dike. Dibêje; "*Dixwazim mezin jiyan bikim. Dixwazim bibim xwedî çalekiyek mezin, jiyaneke***

***mezin û heskirinên mezin. "*** **Gelek tiştên mîna van dibêje.**

**Li gorî min ji bo vê ev çalekî pêk anî: Weke jin careke din xwe tine dike. Jina kole misoger tine dike. Û tişteke din a ecêb heye: Ya rastî bawer nake ku dimire jî. Dema diçe çalekiyê xwedî şanaziya jiyanê ya herî mezine, tiştek rewşek bêhempa ye! 30 kîlo dînamîtan bi her cihê wê ve girêdayî, ewqas bi hêcan, ewqas bi coşe ku nayê ziman! Dibêje; "*Ez li wir jiyaneke mezin dibînim.* " Ji xwe çalekî min gelek bicoş dike. Bûyerek ecêp jî eve. Xwe balkêş tine dike. Ji hêla din ve jî ewqas jiyandar dike. Ya rastî hêjî nakokiyek girînge. Divê bê fêmkirin. Ger ku rêza we heye, ev bûyer, ev kesayet li gorî min bi wate ye. Elbet nirxandinên pir girîng hene. Bi xwe li holê ye. Encama ku min girt, çima pêwendiya wê ya bi min re evqas pêşket. Bi sedan keçên bi vî rengî hene.**

**Ev rasterast dibe evîn.**

**Dibe zimanê wê.**

**Jina ku dixwaze mezin jiyan bike, jina ku dixwaze mezin hez bike, jina ku hemû nexweşbûnan mehkûm dike... Ev zelalin. Nayê nîqaşkirin! Wê çawa pêkbê?**

**Ma vê keçê qet jiyan kir? Yan jî ev keç ji jiyankirinê tirsiya? Nexêr!**

**Gelo bi wê bombê çi kir xwelî, çi tine kir? Metingerî, axatî, newekheviya jin-zilam hemû tine kir ne wisa? Ew çalekî bixwe eve. Çû nîvê, serbazên mêtingeriyê tine kir. Û ji xwe dibêje min; "*Min feodalîteya di navbera jin-zilam de tine kir. Aliyê zilam yê nexweşik dike tine kir.* " Ev hemû nivîsandine. Yek jî dixwaze mezin jiyan bike. Di wateya gelek azad de ye. Dixwaze gelek mezin hez bike. Ew jî di wateya gelek xweşikbûnê de ye. Çalekî ji bo wê ye û pêktê.**

**Dibêje; "Belê heval!", "tu Tişta ku dixwazim bikim dizanî" û "wê tu tiştên pêwîst bicî bînî. "**

**Ez vê weke fermaneke xwudê dinirxînim.**

**Û em ê jî weke evd tişta pêwîst dike bikin. Yanî weteya ku ji vê re bê dayîn eve. Wê sepandineke ji vê mezintir nabe. Çawa dibe ku çalekiyek mezin cidî neyê girtin? Kes fêm nake, zilam fêm nakin. Ez di bin fermana xwudê de me. Ya rastî ev nêzîkbûna min jî heye. Min got;"ev fermana xwudê ye, ez ê çi bikim?" Ez ê bicî bênim. Gotinek bi qasî ya xwudê bi bandore. Madem ku wê ev çalekiya mezin raber kir; evdekî weke min, çima xwedî li pêwîstiya sondê dernekeve? Ez ê niha vê vebêjim, neçarim. Ev çalekiyek mezine; ji ber wê pêwîstiyên wê bicî bên. Min pêwîstiyên wê ji we re rêz kirin. Di gotinên wê de rê ji hêsanbûnê re nîne. Di qiseyên wê de rê ji dirûtiyê re**

**nîne. Ev çalekî bixwe înkara van hemûyane. Cîh nade sivikbûna jinê jî. Niha wê halê me çibe? Gelek zehmete. Lê di heman demê de bûyerek bi semyane.**

**Vaye, evîn! Evîna mezin! Bi Mem û Zîn re jî heye.**

**Hin şibandinên wisa ecêb dikare bê danîn. Di me de hinek hêz heye. Hêza nêzî evînê bûyîn heye.**

**Ez şervanên me yên li Botanê dişibînim Mem. Keçan jî dişibînim Zîn'ê.**

**Ancak wisa wate didinê. Em dixwazin wan jî derbas bikin. Em dibêjin pêkanîna evînê. Ev îradeya te heye. Lê çawa? Bi mirinê nabe. 300 sal berê Mem û Zînê ew kir. Divê tu wê derbasî jiyanê bikî. Di me de bi Zeynep re hat kirin. Ger ku hêza te heye wê derbasî jiyanê bike. Çawa ku Zeynep bi çalekiya xwe ya ku 50 serbaz û leşkerê dijmin, di ciheke mîna Dêrsimê de, li cihê ku herî zêde**

**qetlîam lê çêbûne, lêdixe û pêktîne? Û di warê leşkeri de jî teknîka bikar anî, gelek baş, bê qusure. Wateya wê ya siyasî mezine. Hecma wê ya serkeftinê sedî sede. Başe ma tu? Tu milîtaneke wisayî ku artêşa amade belav dikî. Em ê çawa vê milîtaniyê ji bo evînê qebûl bikin? Nayê qebûlkirin. Ger ku Zeynep pîvaneke; zilamê wisa her roj deh qusurê wî heyî, heskirina wî ya ji jiyana mezin re nîne, çalekiya wî ya mezin nîne, artêşa amade belav dike, ew zilam nabe ku aşiq be. Nikare nêzî Zeynep bibe. Heta wê cihê wî nebe. Ev zelale, divê êdî ev bê fêmkirin.**

**Zîlan xwedavenda min e.**

**Yanî yên wisa wê bên heskirin. Nikarî bêjî ku nêrîneke pir zalimtî ye... Min ji vê re rê vekir, lê ya ku pêk anî Zeynep bi xwe ye. Dil ya wê ye, cesaret ya wê ye. Wê rêza te hebe! Dibêjim; "*Bre jin, bre keç!*" Elbet wê teorik be.**

**Ji ber risteyên xwe bêqusur got û nivîsand jî. Çalekiya xwe jî bêqusur kir. Ger ku wesiyeta wê ji min re be, ez ê cidî bigirim.**

**Wiha, ger ku gengaze divê rewşenbîrên me, romanvanên me van rastiyan bibînin.**

**Jiyana Kurd zaferê qezenc dike.**

**Bi baweriyeke mezin, daneyek pir mezin a azadiyê çêbû.**

**Ez li welatê xwe digerim.**

**Ez li dîroka xwe digerim.**

**Ez li hezkirinên xwe yên min winda kirî digerim.**

**Ez li xwe digerim.**

**Ez êdî dixwazim jiyan bikim.**

**Her tişt bêhn bi bêhn rizgar dibe. Her tişt hinek jî kêlî bi kêlî hildiweşe û ji nû ve tê afirandin. Em qala demên berfireh, demên kin, henaseyên berfireh nakin, em qala henaseyên kurt dikin.**

**Em qala darişţina salên ku ketiye nava demeke pir kin dikin.**

**Ev ji hêlekê ve jî jiyana ku di sed salan de hatiye windakirin, ji bo di gerdûnê de berfireh bibe û veguhere kakilek nirxan, bi lezek mezin dişibe lêhûrbûnê.**

**Kombûn, ewirbûn baranbûn û germî bi germî hatina xwarê.**

**Ev di Kurdistanê de dibe qanûna jiyanê.**

**Êdî dixwazim misoger bim, êdî dixwazim bibim barana di welatê min de kom bûyî hemû xaka geliyên welatê min têr bike, dixwazim bibim gol, bibim lêhî. Bêguman ev pêşketinên pir bi coşin.**

**Bi ti awayî çîrok fêm nabe.**

**Divê bê fêmkirin. Ji ber di tehlîla dawî de PKK çîrokeke, yanî çîrokek hatiye jiyankirine. Divê ev şaş neyê fêmkirin.**

**Romaneke!**

**Romaneke nêzî bist sale ku hemû tirkiyê jiyan dike û heta bala cîhanê jî kişandiye û her ku diçe tê**

**xwendine. Him jî romaneke zindiye. Her şev bi milyonan Tirkiyeyî, Kurdistanî, Başûrî, Bakurî vê romanê dixwînin. Hinek bi hêcan, hinek bi hêrs, hinek harbûyî, hinek qêrînên kêfxweşiyê ve beşik û rûpelek ji romanê dixwîne. Ya rastî jî niha tişta em bi tirkiyê didin jiyankirin romaneke. Ancax tenê romanek dikare evqas bi hêcan bike, bi hêrs bike, kêfxweş bike, kîn bigire, dide kêfxweşkirin û qêrînên tolgirtinê bide avêtin.**

**Rewşa Tirkiyê ya aborî di astek pir mezinde û bi milyonan mirov hatine ber sînorê birsîbûnê sekinîne. Ecêp! Ti aborî dema wisa dibe bêyî teqîna civakî derbas nabe, dibêjin; "*Ev gelê tirkiyê çima nateqe.*" Roman heye, ji ber romanê nikarin nefes bigirin û bistînin. Ketine bin bandora sihra romanê. Çiye ev? Bandora şerê taybet, pêla şovenîzmê, tirs, îşkence ye. Ev hemû parçeyên romanê ne.**

**Cihê her kesi di romanê de heye.**

**Divê ev baş bê fêmkirin. Ev şerekî mezine. Yê ku hêza wî/ê hebe bila fêm bike!**

**Ma çi û çi di vê romanê de hene? Hêjayî têgihiştinê ye. Yek jî di nav de gelek kesayet heye. Tîpên ku dilê mirovan vepirtikînin (hoplatan) dike. Di heman demê de romanek rasteqîne. Tenê bi xeyalan re nameşe. Romaneke bi rastiyên bêeman yên siyasal û leşkerî ve dimeşe. Em çi bikin? Şêweyeke din nayê meşandin. Roman di welatên din de 50 sal berê tên nivîsin. Piştre şerê wan çêdibe yan jî piştî şerê dayîn 50 sal şûnde tê nivîsandin û bi hêcaneke mezin tê xwendin. Niha di nava me de ne bi vî rengî ye. Di nava me de weke ku beriya şer roman nîne, piştî wê jî wê çênebe. Wê hemû di nava hev de bê jiyîn. Roman wê di nava şer de bê nivîsandin.**

**Romana şer.**

**Wê roman jî şer bide jiyîn. Yan jî şer bixwe romaneke. Em dixwazin wisa li jiyanê bê meyzandin, bêgûman ger ku hêz hebe. Ji ber wê yekê divê bibe sinetkar, artîst. Xwezaya vî karî bi vî rengî ye.**

**Yên ku dixwazin beşdarî romanê bibin hene. Wê demê bila cihê xwe diyar bikin. Ma tu dixwazî di romanê de nûnertiya qehremantiyê bikî? Divê cihê vê jî baş bê diyarkirin. Ma tu dixwazî di romanê de tipa her tim diçe binkeftinê bidî jiyîn? Divê ew jî bê fêmkirin. Ma tu dixwazî di romanê de nûnertiya azweriya mezin bikî? Divê hewl bê dayîn ev jî bê fêmkirin, jiyankirin.**

**Dibêjî na?**

**Ma tu dixwazî nûnertiya xirabûn, fitne-fesadiyê bikî? Divê hewl bê dayîn ev jî fêm bibe. 20-30 kesên bi vî rengî yê romana me hene. Kêm-zêde serbendê hemûyan derketiye holê. Em çi bikin? Ev kar wisa dibe, bi**

**awayeke din jî di vî welatî de, ji bo vî gelî xeyal pêk nayên. Bijî ji me re ku, me herkes kir xwedî hêcana romanekê. Elbet, rewşa min hînek din cewaztire. Ma ez nivîskar im? Lîstikvanim? Di serî de zêde nayê cudakirin. Ma tîpek di nava romanê de me, yan jî her tim diafirînim? Ez bawerim ev jî weke mijareke ku zehmete bê fêmkirine. Lê ez neçarim him binivîsim, him jî kesan bidim lîstin. Çareyeke min dîtir nîne.**

**Pêwîstî bi romaneke vejînê heye.**

**Dubare destnîşan dikim. Ji niha ve heta bêjî roman beşekê bi hêcan jiyan dike. Em vê jî bêjîn, a rastî hemû beşên wê bi hêcanin. Weke kes romana min beriya 40 sal berê destpê dike. Di romanê de cihê Kemalîzmê heye. Hûn çima fêm nakin? Çawa êrîş dikin? Çawa lê dide? Çawa dişewitîne? Çawa di zinaran de digindire? Çawa bi hijmet dipijiqe? Çawa îmha kir? Di her cihê welat, gel,**

**mirov lê ye hijmet barand û dibarîne. Hûn çawa ji warê we derkirin paqijkirin? Hûn çawa bê kesayet hiştin? Hûn belavî hemû cîhanê kirin. Hûn ji koka we qut kirine, zer û cilmisîne.**

**Ev romanvanê we yê herî mezin, çima nikare rastiya xwe ji we re binivîsîne? Ji ber hêza wî nîne. Çima leşkerekî me, qehremanekî me nikare mezin bilîze? Hêza wî jî nîne. Hemû ji min re maye. Karekî zehmete lê, ger ku wê bi awayeke din cuda çêbibe, elbet wê başiya herî mezin ji min re hatiba kirin ev bûya.**

**Wêjeya Ji Cewher Dûrxistinê:**

**Yalçin Kuçuk: Hûn dibêjin ger ku wêje, huner, roman nebe, em ê di afirandina mirovê nû de gelek zehmetiyan bikişînin û nagihin çareseriyeke mayînde. Ev gelek girînge. Ez dixwazim bi romanê**

**bikevim mijarê. Dema ku em li dîroka romanê temaşe dikin, lewra dema bilindbûyîn hebe, em dibinîn ku roman jî heye. Piştî mirovê Fransiz ji nû ve çêbû şûnde romana wê derdikeve. Romana Rus di nivê duwemîn ê sedsala nozdemîn de ye. Mirovê nû derdikeve, pergala kevin diqelişe, lênûsên nû, Dostoyevskî'yên nû, Turgenyev'ên nû didomin. Lê dema em tên Sovyetan; romana rizgariyê heye, romana Bolşevizmê heye, lê ji min re wisa tê ku, romana herî xweş ya di Sovyetê de bi romana şerê cîhanê yê 2. re xilas bû. Piştî wê weke romanvanek herî baş Pasternak derxistin. Pasternak, bi Doktor Jivago re bi taybet Şoreşa Cotmehê bi awayeke veşartî mehkûm dikir. Soljenistina li pey wan dihat mîna kişfa cihana rojava bi awayeke vekirî, êrîşî şoreşa Sovyetê dikir.**

**Ger ku em li dîroka romanê temaşe bikin, em dibînin ku ji salên**

**1950'î ve herî dawî ji salên 1960'î ve pergala Sovyetê sekiniye. Dema em li Tirkiyê temaşe dikin, îro tenê ne ya Kurdan, romanvanê Tirkan jî nîne. Yaşar Kemal lûtkeyek bû, sekiniye. Domdariya wê nehat. Li helbestên Tirkan meyze dikî, baş nebaş tenê helbestên şerê rizgariya Tirkiyê ne. Helbestên Nazim Hikmet yên herî girîng helbestên evînê ne, ji derveyî helbestên mirovan, helbestên şerê rizgariya Tirkiyê ne. Nazim Hikmet jî helbesta Tirk dibe lûtkeyê, lê xilas dibe. We baş tesbît kir bi rastî jî Ahmet Arif di kî dera helbesta Tirk de ye. Helbestvanê Tirke, helbestvanê Kurde; helbestvanek mayîndeye, yan na? Ev zelal nîne. Lê henaseyek pir xweş bû. Tenê henaseyek bû. Helbesta Tirk jî, bi mirina Cemal Sureya re xilas dibe.**

**Niha dema em wisa lê temaşe dikin, di vê kêliyê de romaneke Kurd nîne, lê romana Tirk jî xilas dibe û yê**

**nû jî nîne. Eylûlparêzên şoreşê mehkûm dikin, ne ku yên weke me rexne dikin, jana wan jiyan dikin wisa tehlîl dikin, xwestin roman û romanvanan bi awayeke giştî mehkûm bikin derxînin. Me van weke "*romana dijûnan*" girt dest û da sekinandin.**

**Dema ku em li roman û hunerê temaşe dikin, dibînîn ku sistema Sovyetê, di salên 1950'î, di salên 1960'î de xilas bûye. Dema em li hunerê temaşe dikin, dev ji pêşveçûna hunera Kurd berdin, êdî hunera Tirk jî xilas bûye.**

**Li vir îfade dikim ku tevlî tesbîteke din ya we dibim. Ez destgirtina we ya bernameyên "*mafê mirovan*"gelek bi tendûristî dibînim. Tenê şoreşgerên di girtîgehên Tirkiyê de, bi mantiqê nêzîkbûna baş û nebaş, waye bi navê "*mafê mirovan*" ne tene xwestin bi riya televizyon û hewrîkên din xilas bikin, ev bername**

**di esas de, ji bona belavkirina pergala Sovyetê hat bikaranîn. Bernameya "*mafê mirovan*" di Wezareta Karê Derve yê Emerîkayê de, li hember Sovyetan weke çekeke îdeolojîk hat keşifkirin. Him tevlî vê tesbîta we ya li vir dibim him jî lê zêde dikim.**

**Dij-şoreşger çekek bû. Hewldan ev bû ku vê rastiyê berevajî bikin. Xwestin bernameya mafê mirovan bi şoreşgerî bikin. Çiqas ser ket? Niha li vir dihêlim û bi Sovyetan ve didomînim. Romana mirovên Sovyetê yên di şerê Cîhanê yê Duwemîn de li hember emperyalîzmê û faşizmê li ber xwe dan, Sîmonov nivîsand. Li vir romana Sovyetê sekini û şuna wê roman û romanvanan cihê xwe dikemirîne girt. Bi Pasternak ve destpê kir, Soljenîtsîn, Rîbakov û bêguman Cengiz Aytmatov yê bi eslê xwe Kirgize û li Tirkiyê ku demeke xwudayê wan bû, mişkên pergala Sovyetê bûn.**

**Niha em dikarin him romanê û him jî polîtîkayê di cihekê de bigihînin hev? We girêdana romanê bi çalekiya şoreşgerî û bilindbûnê ve danî. Ma niha, hûn jihevketina sîstema Sovyetê, di afirandina mirovê nû û sosyalist de dibînin? Peyvek we ya ku hûn jê hez dikin û hûrûkûr ji bo mirovan bikar tînin, ez jî bikar tînim, ma di pişt serdeçûyînê de ev heye?**

**Abdulah Ocalan: Têkiliya di navbera kesayeta sosyatlîst a sovyetê de hêj ne afirandî û kesayeta bi romanan afirandî, hewl dide biafirîne zelal kirin û têgihiştin dê sûdwer be. Bi taybet serûbinên mezin ku me di bûyera Kurdan de jî jiyan kirine, dihêle ku em hîn baştir romanê fêm bikin. Berê romanên hatine nivîsandin, di kîjan hêzê de ne bi rastî jî min nedizanî. Heta romanek çawaye, nivîsandina wê dê çawa bê destgirtin, çawa bê pêşxistin? Min di**

**dîtina wateya wê de zehmetî dikişand. Lê çalekiya şoreşgeriyê bixwe, me bi romanê re rû bi rû anî. Ez romanê weke tarif bi nirxandineke giştî ve digirim dest, weke daneya qonaxek dema pergalek bi hemû palpiştiyên xwe yên civakî, aborî û çandî re dest bi hilweşandinê dike, pêwîstiya derketina yeke nû derdikeve holê û çalekiya vê jî xwe bi awayeke balkêş ferz dike dinirxînim. Û di vê wateyê de neku bûyereke xweser ya aîdê rêxistinê ye, ez di wê baweriyê de me ku di mijara Îslamê de jî gelek pirtûkên dişibin romanan bên dîtin hebin.**

**Bi navê "*Di Îslam'ê de roman*" ceribandinek kirin, dibe ku sûdmend be. Ji ber dema roman tê gotin em her tim li Rojava temaşe dikin, romanvanên Rojava tên hişê me. Lê nirxandinên weke, "*di nava rastiya dîroka me bi xwe de gelo nivîs û pirtûkên mînak yên nêzî romanê yên***

***kî ne, çi demê derketine holê?*' gelek girînge. Ger em dixwazin di tîpê netewî yan jî tipê herêmî de cureyeke romanê bidest bixin, ji cureyê Rojava zêdetir divê li gorî cureya xwe ya Rojhilat, him jî li gorî cureya dîrokê ya destpêkê bigirin dest. Di vê navberê de divê em li destan û çîrokan temaşe bikin. Dîsa menqîbe û rêzefilmên dîrokî hene. Bi awayeke diyar dişibe romanê, ji min re wisa tê.**

**Gelek kronolojîk û dîroknasên Îslam û Osmaniyan, hinekê jî romanvanin. Mînak weke hûn jî baş dizanin "*Seyahatnameya*" Evliya Çelebî weke rêze romaneke. Û gelek romanvanên Tirk, weke ku ti têkiliya wan nîne her tim van paşçavkirin û xwezî li nivîskarên roman û çîrokên Rojava anîn gelek ecêp dimînim. Li ser vê bingehê mirov dikare gelek mînakên din bide. Mînak; berhemên mîna "*Çîrokên Hezar û Yek Şevî*", "Kerem û Asli", "Leyla û Mecnun" her**

**yek berhemên romanên şaheserin. Lê heya niha kesî ev li ser vî bingehî negirtine dest. Gelek menqibeyên Îslamê yên şer hene. Vegotina romaneke tîpîke...**

**- Ma we ev di zarokatiya xwe de gelek xwendine?**

**---. : Belê, ji we re bêjim... Wiha dema ku em çavkaniyên xwe yên romanan digirin dest, bi misogerî divê em van nirxên dîrokî berçav bigirin. Û romana nû jî ancax bi mînaka rexneyên dîrokî ve dikare pêş bikeve. Elbet, ji ber rewşenbîrên Tirk biyanîbûneke mezin jiyan dike, ji jêhatiya huner û baweriya ku van bibine dûre.**

**Dubare têm ser mijara Kurdan. Her wiha niha, romanên cewherî bi semyana hilweşînekî re, bi trajediyê re -yan jî navê wê çi dibe bila bibe- bi rastî jî hunîna coşa bilinbûnê ye. Pevçûna wê ya esasî, di navbera giyana wê ya hildiweşe giyana wê ya**

**hiltê û di navbera têkiliyên hildiweşe tîpolojiyên hiltê de ye. Dîsa bi hilweşina cîhana hestan re, ya pêş dikeve cîhana hestane; şêwaza vê ya têkiliyê, rewşa wê ya xîtabê ye. Başe ku, bi awayeke giştî şêwaza jiyana wê ye. Bi awayeke giştî roman vê qadê dadigire. Û baskek baş ya wêjeyê ye. Mînakên hûn behs dikin, bêguman vegotina xwe bi sipartina demên eleqedar re pêşkêş dike.**

**Pêwendiya romana Fransayê gelekî ji nêz ve bi pêşî û piştî Şoreşa Fransa'yê ve heye. Pêwîstî qet bi vekirina van nîne; ji ber girêdana wan zelale. Ev, ji bo hemû welatên din yên Ewrûpa ku pêvajoyên şoreşa burjuwa jiyan kirine derbazdare. Berê û domahiya Şoreşa Bolşevik jî girêdana xwe bi rastiya romana Rus re heye.**

**- Berhema "Bab û Kurên Wan" a Turgenyev tam li gorî pênaseya we ye. Giyaneke windabûyî bav temsîl dikin, kur jî pêşerojê temsîl dikin.**

**Roman hemû (romana cihanê ya herî bi nav û denge) li ser pevçûna van herdu psîkolojiyan ava bûye. Lênîn jî ji "Bav û Kurên Wan" pir hesdikir.**

**---. : Belê, min nexwend... Mezinbûna wêjeya Sovyetê ji hevketina mercên civakî yên feodal berê şoreşê û bûhranên di encama şoreşê de derketine holê, gelek nakokiyên berfireh, têkilî û bi mezinbûna pergala nû ve girêdayî ye. Niha dema ku em tên ser romana Tirkan, hûn qala rewşek pir melûl dikin.**

**- Zîrveya xwe dibîne û xilas dibe. Romanvaniya Yaşar Kemal zîrve ye, piştî wê, xilas dibe.**

**---. : Mînaka herî baş a romanvaniya Yaşar Kemal, "Înce Memed" dide. Ew, bûyerek cewaz lêkolîn dike. Li gorî min eşqiya lêkolînkirin, di mijara analizkirina civakê de zêde serbendekê nade. Li gorî min dibe ku çîrokek be, lê nabe**

**romaneke cidî ya civakî. Romaneke civakî; di esasê xwe de, dema şaneya civakekê hat parçekirin û rûxandin, li şûna wê jî şaneyek civakî hat birêxistinkirin û derket holê hingê dikare bibe çavkanî.**

**Lewra dema çavkanî wisa be, em dikarin jê re bêjîn roman. Berevajî vê vegotina ew bûyerên cewaz, wiha bûyerên ku hemû civakê nagire nava xwe çîrokin.**

**- Tişta bi gotinên we ve girêdayî, dibe ku bibe xaleke piştgiriya gotinên we jî; Yaşar Kemal di İnce Memed de jî her tim bi pesindayîna têkiliyên paşketî û feodal re hatiye rexnekirin. Tê gotin ku gelek pesnên begên Edanê daye û hatiye rexnekirin.**

**---. : Bêguman raste. Lê bi qasî min fêm kiriye, pêvajoya li bejahiyê xwecihbûna Tirkmenên ku li çiya ne dinirxîne. Jixwe gundê ew bixwe lê bicî bûyî jî gundeke wisa ye. Yê li çiya dimîne dibe eşqiya, yê diçe deştê jî**

**dibe beg. Neçare ku pesnê herduyan jî bide, lê nikare bi temamî pêşveçûna wê pêvajoyê bide, jê dûre. Ev bilindkirina beg, bilindkirina eşqiya, ji min re zêde weke bûyereke xwedî naverokek civakî nayê. Vegotineke wê ya nêzî cureya çîrok, cureya destanên berê heye.**

**- Ji xwe zimanê wê destanwarî ye. Û zimaneke wê ya pirolekirinê heye.**

**---. : Dişibe curê destanên berê. Li ser vê bingehê, vê bêjim ji rastiya dîroka Osmaniyan û rastiya dîroka Tirkiyê hinek qute. Ya rastî Yaşar Kemal nakeve nava wê, ji wê direve. Tişta ku dixwazim bêjim, hinek jî eve. Di bûyera Kurdan de jî ev wisa ye. Ya rastî bi xwe hinek resentiya Kurd'e; ji ber sedemek tevî ku koçî Çukurovayê bûye jî, çima nakeve binê rastiya vê?**

**Çima ditirse?**

**Li ser vê bingehê dikare wêjevanên din jî bên rexnekirin. Ew di**

**cihekê de rewşenbîrên Kemalîzmê tasfiye kiriye yan jî di nava xwe de xesandî ye. Wê ev, ti carî nikaribin nêzîkatiyeke radîqal ji rastiya civakî re bikin. Li gorî min dibe ku rexneya herî bingehîn a Yaşar Kemal jî ev be. Ew bi şaxan re mijûl dibe; ne bi kok re.**

**- Şaneyek wê digire. Mesela bilindbûyîna Kurd...**

**---. : Qet nedîtiye, nabîne. Ji vê zêdetir qet naxwaze qetlîama Kurd, jenosidiya wê bibîne. Tişta girtiye dest yekî ku ji eşîreta xwe qut bûye, bê ku milên wê yên dîrokî, siyasî û civakî berçav bigire, bê ku girêdana wê bi rastiya civakî re çêbike, heta dawî mijar takekesî kiriye û wisa vedibêje. Ev, nêzîkatiyek heya bêjî bifikare. Divê jê bê pirsîn ku ev bi çi wêrekiyê kiriye.**

**Romanek dikare bibe kîjan şoreşa civakî?**

**Ez dixwazim vê bipirsim. Ne gengaze ku ev romanvan xizmeta ti şoreşa civakî bike, heta dikare bê gotin ku qet nîne. Dibe ku Orhan Kemal bikaribe hinekî bibe. Hewl dide proleterbûnê vebêje.**

**- Evîneke mezin ya gel dinexişîne.**

**---. : Di pîvanekî de. Çareseriya wê nîne, tenê çavdêrî ye. Ya wî ne dahûrandine, çavdêrî ye. Min romana wî ya bi navê "*Xaka Berhemdar*" xwend. A rastî bandor bûm. Li wir, Zeynelê Çukurovayî yê Kurd çawa di nava xwîn-xwêdanê de xebitiye li bîra mine. Çavdêriya bûyeran kiriye.**

**- Di nava nivîskarên Tirk de ji mirov re yê herî ji dil tê Orhan Kemal'e.**

**---. : Min ji wî aliyê wî re heya bêjî rêz girt, nirx dayê. Lê ne dahûrandine, çavdêrî ye. Ev çavdêriyeke gelek lihevkirî û rasteqînî ye. Yaşar Kemal wisa nake. Qaşo tehlîl, dahûrandin**

**dike, lê ew jî gelek cewaz dimîne. Bi şaxan ve mijûl dibe, ne bi reseniya wê ve! Yek jî pêngav nîne. Eşkere nake ka dixwaze bibe kîjan rastiya civakî. Di nûxumandina gelek rastiyan de jî dibe ku romana wî xeter be.**

**- Wê demê Ahmed Arif jî dibe helbestvanê Yaşar Kemal.**

**---. :Elbet, heman mînake! Ew jî ji Amed'ê qut bûye, li Çankayayê bicî bûye. Qutbûnek heya bêjî bi xeter û bicîhbûne. Yaşar Kemal jî ji Wanê qut bûye çûye Çukurovayê; ji wir qut bûye, li Ataköyê bicî bûye. Û êdî ji wir qut nabe. Bi wan deran ve zeliqîne yan jî zeliqandine. Beriya ku Ahmed Arif bimire, gotiye ku; "*Ev çi ji min dixwaze?*" Rexneyeke min pir biçûk lê hebû, ji ber wê gotiye. Navê Filînta li kurê xwe kiriye. Piştre derket holê ku filînta bi qasi filîntayên naylon yên di dikanan de difiroşine. Û ez gelek pê êşam. Kurê helwestvanê îsyanan,**

**ancax filîntayê naylone. Û ev li Çankayê wisa bû.**

**- Mixabin wisa ye.**

**---. :Belê, we Cemal Sureya jî vekir. Ez bawerim ew jî zarokek Dêrsimê ye. Dibêjin helbestvanek başe. Niha pêwîste helbestvaniya Cemal Sureya jî hinekê baş bê fêmkirin. Min di Dêrsimiyan de hinek helbestvanî dît; helbestvaniyek biyanî bûne. Ya rastî dibe ku li cihekê giyanek Dêrsimiyan hebe. Lê ev giyan, di qetlîama Kemalîzmê re derbas bûye, ji cewherê xwe biyanî bûye, everê kiriye; bûye Tirk ev jî erê kiriye. Dibe ku keser û kederek ji dîrokê tê, damareke dişibe heye. Ev dibin helbestek û ji dev derdikeve. Lê helbestek biyanî bûye. Girêdana helbestê ya girêdana dîrokî rasteqînî, pêvajoya avabûna wê, hedefa wê û dixwaze bigihe çi nediyare. Ez dîsa ne di rewşa zêde analiz û rexnekirina helbestê de me, lê di dîtina destpêkê**

**de ne zehmete ku mirov van bêje. Aliyê helbestê yê welatparêziyê nîne. Temaşekin ev gelek girînge. Hedefa ku helbestên wî xwestiye diyar bike nediyare. Dîsa cihê ku helbest dixwaze bigihiyê zêde nediyare. Ev rastî bi berevajikirina rastiya Dêrsimê û teşegirtina nirxên Tirkbûnê ve girêdaye.**

**Û Cemal Sureya jî hinekê ew e.**

**- Belê, temenê wî kin bû.**

**---. : Niha jî em bi yek-du gotinan qala Nazim bikin. Ji ber hema herkesî li ser wî gelek tişt gotine, min tiştek li ser vî hozanî negotiye, lê neçarim bêjim ku bi rastî jî kesayeteke heta bêjî bi destê Kemalîzmê hatiye xesandin.**

**Di Tirkan de pergaleke bi vî rengî heye; di pirtûka we ya "*Fatîh Sultan Mehmet*" de, em çavdêriya xesandina mîrê Sirp û anîna rewşa qundetiyê dibînin. Mirov xesandin kevneşopiyeke Osmaniyane. Min ji**

**Mustafa Kemal jî bûyereke wisa bihîst: Ev herhal li çihekî îçkî vedixwe, Nazim jî, li ciheke dine. Mustafa Kemal gotiğe; "*Bangî Nazim bikin bila ew jî bê ser mêzeya me.* " Nazim jî bersiv daye;"*Biçin jê re bêjin, ez ne periya avê Eftelya me.* " Ev gotin dide diyarkirin ku, dixwazin veguherînin periya avê Eftelya, ne wisa? Ev gelek şênbere û li gorî min hinekê jî hatiye veguherandin. Ger ku wisa ye, wê demê girêdana Nazim a bi Kemalîzmê re tê fêmkirin. Dibe ku revî be û xilas bû ye, lê rewşa wî dişibe dijberî, binketin û îsyana mîrê Sirp a li dijî Fatîh. Dijberiya Nazim jî ya li hemberî Kemalîzmê (ji xwe di zîndanê de ye ne wisa?), di zindana komarê de weke perpitandinek bê hêvî û mirî ye. Û ger bala we bikişîne "*Destana Kuvva-î Milliye*" û piştre jî di helbestan de pesindana wî dike.**

**- Belê, weke bazarekê tê dîtin.**

**---. :Belê, Nazim pir baş fêm bikin; him di destê Kemalîzmê de esîre, him jî pesindarê Kemalîzmê ye.**

**Û ev drameke.**

**Her wiha di dawiya vê dramê de reva wî heye.**

**Li vir rev girînge. Li gorî min bi çûyîna Sovyetê re doz winda kiriye. Hinek dibêjin; "*Bûye helbestvanek mezin*", lê ez qet cidî nagirim. Di wan salan de nêzîkbûnek kevnar a Sovyetê hebûku, wan bikin propagandevanên Sovyêtê. Ya rastî rewşa ku ew bi xwe jî dijî hinekê eve. Elbet, ez aliyên wî yên din paşçav nakim.**

**Yanî helbestên balkêş nivîsandiye, lê ji bo min ya girîng têkiliya wî ya bi xaka Tirkiyê re ye. Qutbûn-nequtbûna wî ya bi xaka Tirkiyê re ye.**

**Ji ber di her koçbûyînekê de qutbûnek heye.**

**Ger ku li hember vê qutbûnê dijbertiyek mezin çênebe wê ji çi re be? Mesela tê Baku'yê, Batum'ê dibêje; "Ax welat, ax eva min ewa min. " Lê ti çalekiyekî wî nîne û yek kes tenê jî xwedî lê dernakeve.**

**Ya bi êş jî eve. Çima kes xwedî lê dernakeve? Diyare, birastî jî ji xakê qut bûye.**

**Divê tenê li ser aliyekî yê mijarê neyê sekinandin. Tenê li ser xemgînî û hesreta Nazim rawestîn nagihe ciyekî. Yek jî aliyê meselê yê min dayî diyarkirin heye. Ev çarde salin ez jî li virim. Nemaze we him min li Bekaa dît, him jî li vir. Di qadeke mîna kefa destek biçûk de me. Ji ber vê yekê ji welat qutbûn, ji mirov qutbûn tê çi wateyê pir baş dizanim. Temaşekin niha, ma kes dikare ji min re bêje; X*ayînê welate*?" Ma dijminên min jî dikarin bêjin? Ji ber kes bi qasî min welatperwer nebû, welatperwerî pêş nexist. Û ti kes jî bi qasî min girêdana**

**bi gel, girêdana bi welat ve dernexist holê.**

**Dîsa xayîntiya welat eleqeyeke xwe wisa bi xak danaguhertin ve nîne. Meyze bikin ez ji her yekî ku diçe derve re nabêjim; "*Bûye penaber*" an jî "*Genî bûye.* " Ji ber ku ez dizanim yên di welat de mane yên xayînê welatin û yên genî bûyî hene. Dizanim kesên ku li welat mayî lê sîxûrbûyî jî hene.**

**Van tiştên ez dibêjim yên ku ji Nazim Hikmet re dibêjin; "*Lûtkeyeke*" divê baş hesap bikin. Ji ber vê van vedibêjim.**

**Ji hêla din ve nivîskarên ku xwe di lûtkeyê de dibînin an jî di quntarê de hene. Yekî ji wan jî naxwînim. Ji ber min hewl da bixwînim, dema dixwînim serê min tevlîhev dibe. Di mejî de min ber bi zelaliyeke rast û azweriyeke ku pêşve bibe ve nîne.**

**- Ez hewl didim bixwînim, lê nikarim bixwînim. Ti tam û hêcan nade min.**

**---. : Çima nade?**

**- Hemû têkçûn û mirinê tînin ziman.**

**---. : Tenê ne ew. A rastî qala hinek tinebûn, ji zemînê piştा xwe dayê bêxeber, rev û ji rastiyan qutbûn tê jiyîn. Bi taybet heta bêjî ji rastiyên siyasî direvin. Heta neyekser bikar tînin. Elbet tu nikarî van bixwînî. Ji Atilla İlhan bigirin heta gelek nivîskarên din wisa ne. We, gelek baş xwendiye. Dahûrînên we yên rewşenbîran hene. Ya rastî min dixwest jê sûd werbigirim, encama herî baş ku we bidest xistî çibû?**

**- Bêtaqetbûn. Baweriya wan bixwe nîne. Ji ber vê weke ku ji dewletê qut bibin li wan tê û hema dubare diçin bin sêwana dewletê. Red çiye, qet nizanin. Di pirtûkan de red**

**nîne, xeyal qet nîne. Temaşekin di we de kurguyek dirêj heye. . .**

**---. : Hûn dibêjin asoyên dewletê derbas nakin. Ma heya asoyên dewletê neyên derbaskirin, wê çawa bikaribin radîqal bin? Ez, her tim qut bûm. Min her tim red kir ku hatim vê astê. Ez ji berê ve ji otorîteyê qut bûme. Yan na ez ê xilas bûma.**

**- Belê, di nivîskar-xêzkerên Tirk de tinebûnek heye.**

**---. :Elbet, dikarim bêjim mirovê Tirk jêhatiye. Ya rastî gelek ked didin, lê rêbaz û sipartekên wan ewqas ji derveyî rastiyê ne, di encamê de xwe ji rizîbûnê rizgar nakin. Û li gorî min divê hinek li tişta ku dibêjin; "*Tirkîtî*" çiye meyze bikin. Dîsa ger ku diyardeyên jê re dibêjin Kemalîzm, Osmanîtî baş nebînin, wê di xaka Anatolyê de mirovê hêja dernekeve. Û di salên dawî de, heta di sed salên dawî de derneketin. Lê berê hebû. Di serdema destpêkê û navîn de gelek**

**pêş nirxên mezin pêş diketin, ne wisa? Her ku netewperestî Anatolya teng kir, Kemalîzm mezin bû, mirovê Tirk biçûk dibe. Her ku sultan mezin dibe, girse biçûk dibe, nivîskarên resen jî dernakevin.**

**- Derneketin! Nazim bû, Yaşar bû, Ahmed Arif bû; tevî her tiştî ev cureyek bûn. Lê tişta balkêş niha li Tirkiyê yên bi qasî van jî dernakevin.**

**---. : Hûn qala piştî 12'ê Îlonê dikin....**

**- Em dikarin bêjin salên 1970, 1980'î jî.**

**---. : Girêdana vê pir zêde bi rastiya tê jiyîn re heye. Elbet ji we re vê jî bêjim çima wê demê hinek mezinbûn hebû. Dewlet û civak evqas ne riziyabû yan jî girêdana dewlet bi civakê re, civak bi dewletê re evqas genî nebibû. Niha dewlet civakê ewqas xirab bikar tîne ku û civak ewqas xirab ji dewletê bandor dibe,**

**ne gengaze ku miroveke baş derbikeve holê.**

**- Rastiyek yekdestdarî heye. . .**

**---. : Tabî, yekdestî di navenda vî karî de ye.**

**- Ji salên 1980'î û 12'ê Îlonê pê ve, pêvajoyek ku mirovê Tirk di rewşa zirkêtkê de dana jiyankirin tê jiyîn. Dikin zirkêtk, lê helbest û romana zirkêtkê nayê nivîsandin.**

**---. : Ev çespandin gelek zedê ye. Her tim tê gotin ku di rewşa heyî de ciwan û rewşenbîrên heyî, ji xwendin, îdalîzmê û coşê qut bûne. Dixwazin bejin zirkêtk, yan jî şêwaza kêzikek din, bi misogerî derdikeve holê ku jiyaneke kêzikan heye.**

**- Pornografî, di asteke bilind de ye. Erotîzm tînin rewşa neqşa civakê ya herî bingehîn. Heskî kêzik, heskî nekêzik, jiyana mirov disekine. Jiyana ajalan destpê dike.**

**---. : Ev çûyîneke ber bi ajalbûnê ve ye. Û ev ne daneyeke. Heskî bila jê**

**re bêjin pornografî, heskî bila jê re bêjin erotizm, çi bê gotin bila bê gotin, tişta di bin vê de radize, heya bêjî hoveberbûne. Niha çapemenî vê dikişkişînin. Bi taybet, mîna ku nûvedanên nû ne û weke berhemên pêşveriyên dawî yên emperyalizm yan jî Rojava tên peyitandin. Na! Ger ku em hinek hay ji xwe nebin, hema maye em jî ji nûvedana dawî bawer bikin. Ya rastîn kîjan nûvedan? Bûyereke zayîna hov a erzan anîna vê rewşê vediguherîne hovîtiyê û tevlîbûna jiyana hov.**

**- Mirov diqedîne.**

**---. :Belê, di rewşa heyî de ya li ser bazarê serwer eve. Ger ku di vê mijarê de roman bê nivîsandin, ji min re wisa tê ku navê wê ancax bibe rizandin, hilweşîn û romana hîn zêdetir cûce dibe. Di vê mijarê de dikarin hinek nirxandinan pêş bixin. Niha pirsa me ne eve. Hûn jî dibin yek ji ewên tesbît kirine ku di Kurdistanê**

**de rewş berevajiye. Ez hewl didim hinekê vê vekim. Raste...**

**- Bilindbûnek heye. . . Başe birayê Apo, ez pirsek wiha bikim; di axaftinên we de weke ku hûn meseleyê fêm dikin û mîna kurguya romanê vedibêjin.**

**Hûn dubare dixwazin dîsa biçin ser wêjeyê? Hûn dixwazin serbendan bigirin, raste. Ger ku bal bidinê wê weke çîroka romanekî bibe. Me ji zarokatiyê destpê kir, em heta bûyerên mezin yên polîtîkayê çûn û gelek pêşketinên ku dewletê jî bihejînin derxist holê. Heta herî dawî em li ser pêwîstiya wê psikolojî û rewşa Apo çawa bê fêmkirin sekinîn. Ev ancax bi çavê yêkî wêjevan dikare bê nirxandin.**

**---. : Kurguya romaneke pir qaneker derdikeve holê.**

**- Belê, wê ji romana herî berkeftî berkeftîtir be.**

**---. : Raste, ji ber wê min her tim pêwîst dît ku pirsgirêkên cuda bigirim dest.**

**- Ez bi vê mebestê bangî wêjevanan dikim: Em romana Kurd yan jî destpêkirinek şoreşgerî li ser rastiya Kurd bikin, pirsa ku "*Divê wêjeya şoreşgerî ya kurd çawa be?*" em ji xwe bikin. "Yan jî divê em rastiya girêdana kurd a hûndirîn, hemû dîroka wê û aliyên wê yên hemdemî çawa bê fêmkirin?" li ser lêhûr bibîn.**

**Li Rusya, romana Çernişevskî ya "Çawa Bikin" ku Lenîn jî ecibandî heye. Min hîn nexwendiye, lê hevalan xwendiye. Bi yên we çêkirîn re didin ber hev, dibêjin "*gelek xalên hêja ku dişibin hev hene.* " Ez bawerim ew roman di salên 1860'î de hatiye nivîsandin. Dema civaka Rus nû ji xulamtiyê xilas dibe û ez texmîn dikim kesayeta Rus a rewşenbîr û demokrat, dema serî radike, rastî**

**pêvajoya romantîzma Sovyetê tê. Û dibêjin “*Hûn hinek dişibin van.* ” Belê ji ber min nexwendiye nikarim di vê mijarê de zelal baxivim.**

**---. : Wê hîn zêdetir ji we re biyanî neyê, ji ber her ku diçe hûn romantîk dibin.**

**- Tevî ku ez gelek rastîbînim jî, ez bawerim wisa mayînê esas digirim.**

**Her wiha romantîk dibim, nizanim, lê di min de, di demên dawî de difikirim ku dibêjim; “*Gelo dibim romanvanek*. ” Li ser hev peyva “*artîstî*” bikar tînim.**

**---. : Hûn bi mirovan re gelek eleqedar dibin.**

**- Belê, keç û kur derdikevin pêşberî me, bi qasî ku artîstê herî berketî pê re eleqedar nabe ez bi wan re eleqedar dibim. Carna meyze dikim ku min yeşîlçamê jî derbas kiriye. Di wateyekî de dibin aktorê sereke.**

**---. : Derhêner, yan jî aktor?**

**Him derhêner him jî aktor! Temaşe dikim ku heta Yilmaz Guney li gel nêzîkatiya min weke zarok dimîne. Yaşar Kemal tê bîra min û dibêjim; "*Romanvaniya wî ji min re hêsan tê.*"**

**- Başe birayê Apo, ger ku em ji hêleke din ve bigirin dest; niha zilamê romana Tirk yê herî mezin Yaşar Kemal e, Yaşar Kemal romanvanê Tirk e, lê Kurde. Zilamê helbestvanê Tirk yê herî mezin, beriya demekê mir. Ew Cemal Sureya bû, ew jî Kurd bû. Piştî wî di sînamayê de jî Yilmaz Guney hebû, ew jî Kurd bû. Ev hemû jî Kurd'in!**

**---. : Belê, em li van di stranan de İbrahim Tatlises û sînemayan de jî Hulya Avşar lê zêde bikin.**

**- Ma ew jî Kurd'in? Ev tişta gelê te bi Tirkan daye kişandin çî ye!**

**---. :Belê, ev niha dibe bûyerek balkêş. Di vê mijarê de hinek daxuyaniyan kin bidim.**

**- Ma em Ziya Gökalp jî hesab bikin?**

**---. : Belê, netewperestê Tirk yê esasî jî Ziya Gökalp e. Niha ez pêwîst dibînim ku di Kurdan de pêvajoya wêjeyeke şoreşgerî destpêbike. Heta biwêja "*ronesansa Kurd*" li holê digere, dibe ku ev biwêjeke rast be. Ronahîbûna Kurd pêşketineke rasteqîne. Hûn dizanin ronahîbûna siyasî, civakî û felsefî jî dikeve nava ronahîbûna Kurd de. Lê qadeke wê ya herî girîng jî dibe ku bibe qada wêjeyê. Niha dixwazim hinek vebêjim ku ka çima pêwîstî bi wêje yan jî hunerê heye:**

**Siyaset, xebatek ku hinekê bi îdeolojî û hinekê jî bi zanebûna siyasî ve tê pêşxistine. Şer jî domandina wê ya bi agir û zorê ye. Lê min temaşe kir ku ev di cihekê de têra min nake. Mirov tenê bi vê re serkeftî nabe. Weke ku hûn îskelet ava dikin, rewşeke mîna goştê wê nîne yan jî**

**goştê wê heye rihê wê nîne derdikeve holê. Wiha, tam di vê mijarê de huner pêwîstiya xwe dide hîskirin.**

**Min dît ku hêza polîtîka û şer, têra veguherandina mirov nake. Yek jî di vê navberê de min tesbît kir ku awazên Kurd, nivîskar û xêzkerên Kurd pêşve diçin. Min herdu kirin yek: Ev, girêdana xwe pir bi pêşveçûna çalekiya me ya şoreşgerî ve heye. Bi hunerkomê re destpêkir. Nivîskar û xêzker derketin. Weşan zêde bûn. Mîna lêhiyêne. Ya hîn girîngtirîn, pêşdikeve, lê ev têrê nake. Li gorî min yên heyî gelek amator û ecemî ne. Heta li gorî min, bi şêwazeke pir erzan tên kirin.**

**- Rehetiyê hildibijêrin.**

**---. :- Belê, ez ê wêjeya direve rehetiyê jî xeter dibînim. Her wiha min got; "*Berpirsyartiya îfadeya çalekiya xwe ya hunerî rast şîrovekirin û şîroveya wêjeyî ya çalekiya xwe ya şoreşgerî rast kirin***

***heye.*** **” Ya rastî ev demek dirêje ez di vê mijarê de lêhûr dibim. Di cihekê de hat xwestin ku dahûrîn weke roman pêş bikeve. Dem bi dem sînorê romanê derbas dike. Ger we xwendibe, Hûn ê fêm bikin ku nêzî romanê bûne. Yanî nirxandinên siyasî derbas kirine. Û heta hûn bal bidinê, hemû nirxandinên min xwe gihandine şêwaza wêjeyê. Weke ku we tim di îfadeyên xwe de jî anî ziman, weke hûn dibêjin; “*bedew, xweş*” ev peyvên hunerî ne. Hûn bikaranîna hunerê ve hewl didin me binirxînin. Niha ez di ferqa van de me; pêşketinên di mirovê Kurd de tenê bi peyvên siyasî û îdeolojîk nayê îzahkirin. Baş dibînim ku aliyê şoreşê yê wêjeyî û hunerî jî xwe dide hîskirin.**

**-Ez ji bihîstina vê gelek kêfxweş bûm.**

**----. : Belê, niha zehmetî zêde dibin. Ez di cihekê de hizirîm ku, “*Belê, em serokatiya îdeolojîk, siyasî***

***û leşkerî bikin, başe wê serokatiya hunerî û wêjeyî çawa çêbibe, gelo wê hinek vê bikin?"* Li bendê mam wiha Kurdên me gotin yên serokatiya wêjeya Tirk û hunera wê dikin, gelo wê hîs bikin û gavek bavêjin?" Lê min dît ku wê ji hêla van ve gavek neyê avêtin.**

**Ya rastî Yaşar Kemal koçberê Wanê ye. Çûye Çukurovayê û bermayê qetlîamê ye. Mixabin ji lêkolînkirina dîroka xwe û wê anîna platformeke siyasî heta ji wêjeya wê kirinê jî direve. Li gel vê wêjeya ku kirî, heta ne wêjeya Tirke jî. Wêjeyeke bi meyzandina Kemalîzmê pêş têxê ye. Yan na Yaşar Kemal ne zilameke hovîtiya mêtingeriya Tirk û qetlîama li ser Ermeniyan kirî nebine ye. Lê qet bi ser wan mijaran de naçe. Ji ber di çarçoveya Misak-i Millî de û li ser bingeha girêdana pê ve wêjeyê dike.**

**Helbestvan Ahmed Arif, Cemal Sureya ez bawerim yek zarokê**

**Amed'ê ye, yek jî yê Dêrsim'ê ye. Yê ku zarokê Amed'ê ye li Çankayê bicî dibe, bîst salan li wir dimîne û gavek tenê jî navêje Amed'ê. Cemal Sureya, zarokê qetlîama Dêrsim'ê ye. Li ser navê Dêrsim'ê helbestek tenê jî nanivîse. Helbestên xwe yên herî bijare Tirkî dinivîse. Li ser bingeha rastiya Tirk dinivîse.**

**-Yek ji helbestvanên Tirk yê li lûtkê ye. Beriya mirina wî demeke kin em li cihek bûn. Rojekê hat gel min ez maçî kirim. Û hêdî di guhê min de ji min re got; "*Yalçin, ez jî Kurd'im.* "**

**---. :- Dizîve got, ne wisa?**

**-Deka em bêjin bi helbestî got.**

**- Min bihîst di derbarê min de jî nirxandinek kiriye. Gotiye; "*Ez ji hevpeyvîna Apo ya di Kovara Îkibine Dogru de hatiye weşandin pir bandor bûme.* " Ez bawerim jiyan kiriba wê li ser wêjeya Kurd rawestiya. Divê em li vir Sureya birêzdarî bibîr bînin. Tabî, sînemavaniya Yilmaz Guney heye.**

**Înkarkirin nabe mijara gotinê jî. Lê divê ev bên vekirin. Ma di hunera wan de li ser rastiya Kurd rawestîn heye? Min ev nedît. Her tim li ser mêtingeriyê tê nixumandin. Tênegihiştin heye, ger têbigihin jî, nakin hunera şoreşgerî. Çi bi sedemên zagonî çi jî kêmbûna jêhatiyan dibe, ew vê di hunera şoreşgerî de pêk nayînin.**

**Têkoşîn heye û divê germbûna têkoşînê, di hunerê de bidin bihîstin. Di vir de bêhêzin, ez vê dibêjim. Lê belê ev hebûna pirsgirêkeke wisa ji holê ranake, ango pêdiviya dayîna bersiva şoreşgerî her diçe xwe li ser me ferz dike. Ji ber van pêwîstiyan di demên dawî de li ser pirsa wêjeya şoreşgeriya Kurd yan jî di derbarê fonksiyona hunera li Kurdistanê de nêzîkbûn çawa be disekinim û di demên dawî de bersivên hatine dayîn hene. Pirsên ku we jî kirine pirsên li**

**ser vê bingehê bûn. Pêwendiya Kurd çiye ez ê ji we re bêjim.**

**Ez gelek caran difikirim dibêjim ku"*ger romana Kurd bê nivîsandin dê navê wê çibe?*" Him romanê difikirim, him jî carna xwe têxim navenda romanê. Ji ber ez di navenda bilindbûn û safîbûna mezin ya li Kurdistanê de me, lewra ez xwe di navenda romanê de dibînim. Ev, tevneke têkiliyane, bûyerên di vê tevnê de dahûrandinek mezine, ji jevketina zincîrek meşeke mezin ya azadiyê derdikeve; difikirim ka ji vê re çi bêjim. Li navê romanê digerim. Naveke guncav ji bo tevna Kurdan, dahûrandin û gavên azadiyê dikare çi bibe?**

**Azadiya wê digirim pîlana pêş û ji vê re dibêjim; "*Li pey azadiyê*" yan jî "*têkiliyên azad.* " Jevketina Kurd tênim ber çav, ji vê re dibêjim; "*Girêka Kurd.* " Bermahiyên vê jevketinê li bîra minin, navê**

**"*bênamusuya Kurd*" lê dikim. Navên dişibin vê difikirim.**

**Lê di bin de rastiyek her lê digerim heye: Ez nabêjim nasnameyeke Kurd jî, dibêjim nasnameyek xilas bûye. Tu yê bijî "*Kurd*" lê li holê li ser navê kurdbûnê çi heye? Heya niha li ser navê Kurdbûnê ji derveyî bênamusî û xayîntiyê çi heye? Ma romana xayîntiyê, romana bênamûsiyê dibe romana baş? Heta ber nivîsandinê jî nakeve.**

**-Belê, nayê nivîsandin, pêwîste di nav de hêvî hebe.**

**---. :Belê wê demê jî dikarim bêjim wê li hember bênamûsî, xiyanetê romana şerê min gelek bi semyan be. Lewma li vir pêwendiya PKK'ê bi wêjeyê re û hêmanên hestyarî ku têkoşîna rizgariya netewî bi Rêbertiya PKK'ê di kesayeta Kurd de ava kiriye hat bîra min. Ji xwe di**

**nava PKK'ê de hêmana hestiyarî tê û xwe dide hîskirin.**

**Li vir xaleke girîng di nava gundiyan de derketiye. Bi awayeke tund berxwedanî dişkînin û zehmetî derdikevin. Di her warî de mirovek ku nû teşe digire heye, yek jî kesayeta kevin heye. Kesayetek ku bi pêvajoya pir tund a redkirina kesayeta kevin re pêş dikeve heye. Malbat û feraseta namûsa kevin redkirin, bi qasî redkirina KT'yê balkêşe. Bi awayek bêhempa serê xwe radike. Lê tenê ewqas! Tenê serîrakirinek bêhempa ye!**

**Bi sedan keçên gundî tên gel me, ti xwendin û nivîsandineke wan nîne, lê serê xwe wisa rakiriye ku, hema hema wê li asîman bixwe! Jê dipirsin dibêjin; "*Başe, ma tu tiştek dizanî?*" Dibêje; "*Na*. " Tenê redkirinek girsehêz dike!**

**-Lê min ev dît û ji vê jî kêfxweşiyek mezin girt.**

**----. : Niha şivan jî lawirên xwe belav dike dibeze nava refên PKK’ê. Û niha li vir, azadiya PKK’ ê ji jinê, şivan, gundî û wiha artêşa wan, hezar hestên ku afirandine, fikir, hemû fêrbûnên jiyana nû him trajedîk, him komik, him biêş, him kêfxweş rê li pêşiya derketina gelek dîmenên din vedike.**

**-Girseyeke mezin ku heya niha kurdî û Kurdîtiya xwe veşartiye, niha 24 demjimêrên rojê stranên kurdî dibêjin!**

**---. :Vê didin derve jî, ji min zêdetir kesk, sor, zer li xwe dikin, slogan û bi tîlîliyan qîr dikin, cenaze çêdibin, dibêjin; “ *me keç û kurên xwe bûk dan axê, ew bûkên Kurdistanê ne*”, kêfxweşiyeke ku qet nehatiye dîtin jiyan dikin.**

**-PKK dest bi modeyeke sor, zer û kesk kiriye.**

**---. : Belê, di çapemeniyê de jî hatibû peyitandin. Ya herî girîng jî**

**mirovên ku berê ji bo mirîşkekê li hev dixwistin, yên ku berê seatek tenê jî zarokeke xwe nedidan me niha dibêjin me çend zarokên xwe "*daye Kurdistanê*", "*min bûk daye Kurdistanê*", "*min fedayî Kurdistanê kiriye*" û dide ber tilîliyan. Niha ev hemû diyar dikin ku ber bi jiyan û rêyek nû ve diçin.**

**Elbet ev ji bo me pêşketinên ji rêzê ne. Ya ku hîn zêdetir ji kur ve bê fêmkirin, di bûyera Kurd de, cara yek roman, helbest û strana wê ji nû ve bê nivîsandine. Pêwîste ev qonax bê girtin. Divê wêjevan û rewşenbîrên şoreşger vê qonaxê bi hemû aliyan ve binirxînin. Niha, me di vê qonaxê de dîrok ji nû ve zindî kir, dîroka xiyanetê bi erdê re dibe yek, dîroka azadiyê derdikeve holê.**

**- Ma dîroka Kurd a şoreşger, ji bo şerê dîroka xiyanet û dîroka azadiyê derdikeve?**

**---. : Li beramberî pîvana tiştên me di têkoşînê de kirine, bi şêweya îxanetê derdikeve holê. Em lêbinêrin xayînên çawa li pêşberî me ne. Em li mezinbûna van şehadetên di nava me û ji derveyî me çêdibin temaşekin. Yek jî em li mezinbûna vê berxwedaniyê temaşekin. Û têkiliyên wan yên şaxberdayî ancax bi romanek, bi helbestek û bi stranek ve dikare bê ser ziman; ancax bi filîmek û bi bûyereke sînamayê ve dikare bê ravekirin. Di vê mijarê de tenê nirxandinên siyasî kirin, rêxistin avakirin û artêş avakirina min têrê nake. Di vir de bi misogerî divê wêje yan jî huner bikeve meriyetê. Lê tu li zilamê me yê hunerkar temaşe dikî, tu nizanî ew hunerkareke, xayîne nediyare. Bi awayê objektif di asteke mezin de rola xayîntiya mirovê xwe û rastiya xwe dileyîze.**

**-Hêjmareke yên xayîn jî erzan nêz dibin! Dema teqlîda we dike, wisa dizane ku wêjeyê dike.**

**---. :Wêjevaniya min bi qasî ji dehî yek di wan de nîne û ne wêjevanin jî xwe weke wêjevanên sereke îlan dikin. Bi vî rengî wêjevanî nayê kirin. Weke ku min gotî ka bila li pirtûka Çernişevski ya bi navê "*Çawa Bikin*" temaşe bikin, da ku demokratbûna şoreşgerî û welatparêziyê bibihîsin. Ka bila Dostoyevskî baş binasin û wê bi Kurdistanê re bidin berhev! A rastî min pirtûka bi navê di Kurdistanê de "*Suç û Ceza*" nivîsand. Elbet min di warê siyasî de nivîsand. Ger ku wêjevaneke baş hebûya, dikarî wê bi awayeke wêjeyî binivîse. Suç û cezayên li Kurdistanê dikare bibe mijara çend romanan. Îxanetên li Kurdistanê û yek jî berxwedanên pir girîng hene. Bi sedan welatparêz û rêhevalên di nava refên me de ji bo teslîm nebin bombeya dawî di xwe de**

**teqandine! Vê salê 50 keçên şoreşger ji bo teslîm nebin fîşeka xwe ya dawî di xwe de teqandine! Her yek ji van mijara romanekê ye! Çend keçên me di Newrozê de xwe şewitandin! Niha ev hemû bi misogerî wê di romanê de bên nivîsandin. Dîsa berxwedaniya bîrîmeke ji pênc kesan ava dibe bi mehan di nava dorpêçkirina artêşeke hezar kesî de mayî heye. Di çiyan de bi sedan heval qerisîn. Yên ku bi çekên kîmyewî hatine şewitandin hene. Gund hatin valekirin.**

**Hûn li ser navê rojnameya Özgur Gundemê tên vir, pirsan dipirsin. Niha ez ê bipirsim: Başe, dibêjim; "*hûn*", "*Gundemparêzên birêz*, ev qas bûyerên siyasî, evqas mijarên wêjeyê hene hûn çiqas di rojnameya xwe de didin peytandin? Dema ez vê pirsê dipirsim bi rastî jî hêrs dibim.**

**Û ji Tirkên dibêjin;"*Ez demokratim*, *ez rewşenbîrim*" dipirsim: We Vîetnam nivîsand. We**

**Salvador û Nîkaragua nivîsand. We hemû qehremaniyên li ser du bost axa cîhanê nivîsandin. Başe ev Kurdistana ku hezar sale ji we re bûye sipartek hûn çima nanivîsin? Gelo hûn çima nikarin hinek bi nav, hinek jî bi şêwe xêzkirinê ve yek-du rastiyan binivîsin? Demokratbûn û rewşenbîriya we li kuderê ye? Hûn helbestvan û romanvanên çawanin? Ma hûn qet aliyek vê têkoşînê bibe roman yan jî helbest nabînin?**

**Ez dibêjim, dema ku rastiya Kurd bi awayeke wêjeyî hat nivîsandin, divê tenê Kurd nenivîse. Pêwîste Tirk jî binivîse. Ger ku qedera Kurd û Tirk yek be, çima nanivîsin? Siyasetmedarên Tirk bêyî ku şerm bikin dibêjin; "*Hezar salin me weke bira jiyan kir*. " Ger weke bira hatibe jiyankirin, ma wê pirsên mîna birayê din birsiye, zimanê wê çawaye, rihete, hizûra wî heye, çanda wî, jiyana wî di çi rewşê de ye ji xwe**

**nekin? Ger bira ye, mal, milk nede lê; hal û rewşa wê bipirse. Ma huner, hal pirsîn nîne?**

**Wiha, durûtiya li holê eve. Û rewşenbîrê Tirk di rewşeke gelek mezin ya suç de ye. Dengê xwe nake. Heta bi qasî siyasetmedarên Tirk qala Kurdan dikin, rewşênbîrên Tirk, hunermend û wêjevanên wê qala rastiya Kurdan nakin. Hunermend, ji siyasetmedaran zêdetir di nava helwesteke paşketî de ye.**

**- Niha jî wisa ye.**

**---. : Bêguman niha jî wisa ye. Di serî de ew profesorên zanîngehan paşverûtiyeke tirsehêz jiyan dikin. Ji hunermend û siyasetmedaran hîn zêdetir paşketîtirin. Tevî her tiştî jî ev weke nûnerên zanistê tên zanîn, ev çawa dibe? Profesorên birêz vê rewşê çawa qebûl dikin? Ma dibe evqas îxanet li zanistê bê kirin? Dile we çawa vê radike? Yanî ez weke miroveke girêdayî zanistê, "*A*", "*A*" lê**

**ez ê jî bêjim; "*A*". Niha hûn çawa dikarin "*A*" tine bihesibînin? Lê ev tine dihesibînin! Niha Hûn ê çi nav li van mirovên zanyar bikin? Heta papazên kiliseyan jî evqas ji doxmayên xwe bawer nekirîbûn.**

**Êdî pergala wan têkiliyên Kurd ên em behsê dikin, divê bê destpêkirin. Mesela, we di pirsên beriya niha de xwest mijara heskirinê bi min bidin vegotin. Li gorî min rêya diçe heskirinê dikare bibe mijara romaneke baş. Ji bo ez di nava refên PKK'ê de bigihim feraseta heskirineke rast şer didim. Şev û roj di nava vê de me û lê nikarim zêde xwe vebêjim. Ger ez nikarim vebêjim jî, ev bi xêra zehmetiyan dibe. Di vê mijarê de bi awayeke rojane bûyerên ku min jiyan kirî hene. Riya diçe heskirinê divê çawa bê diyarkirin, teoriya vê, pratika vê çiqas dikim, roja duwem temaşe dikim hewl didin li beramberî min bi encam bikin.**

**-Rastiya PKK û Apo, di Kurdan de rê li ber guhertina kesayetê vekiriye.**

**---. : Belê. Bi rastî jî, PKK û zilamê dibêjin Apo nebûna, wê rojê bi dehan kujar çêbibûna. Kurd, ya wê kuştin kiriba yan jî wê xwe tine kiriba. Guhertinek destpê kir.**

**Ger hûn bixwazin em vê bi mînaka Yilmaz Guney re bêjîn: Têkîliyên pergalê yên ku Yilmaz jiyan kirî ew xilas kir. Ez vê ji bo Fatoş Guney xirap bidim nîşan nabêjim. Ji bo jiyana wî ya ji niha û şûnde kêfxweşiyê dixwazim. Lê di nîqaşên me yên sibehê de, beriya mirina Yilmaz, we ragihand ku Yilmaz bi hevjîn û kurê xwe re qazaya otomobîlê kiriye li Parîsê, ev weke hewleke întîharê nirxandiye. Dibe. Ez ecêp namînim. Ger ew nebe jî, penceşêr jî şêwazekî întîharê ye. Yilmaz, ji bo hevjîna xwe, li dadwerekî xist. Ket zîndanê û revî. Çû Parîsê, lê ti carî nekarî ji bêçaretiya**

**xwe bireve. Wiha penceşêr nexweşiya rewşên bi vî rengî ye.**

**Bawerim di encama girtîgehê de pêşket û weke em dizanin bi awayeke pir trajik xilas bû.**

**- Ma di rewşeke wisa de zilamê Kurd întihar dike?**

**---. :Li gorî min em bi rewşeke balkêş ya zilamê Kurd re rû bi rû ne. Yilmaz artîstek bû. Yilmaz bi gelek jinan re raza û rabû. Herî dawî bi keça karsazekî re zewicî. Encam, ev jin bi misogerî ew tengav kiriye. Lê mesele çareser nekir. Yanî dibe Yilmaz mêrxas be, dibe gelek nêzî şoreşgeriyê jî be, lê xwe tehlîl nekiribû û ji vê jî gelek dûre. Dahûrîna xwe nekir, dahûrîna bûyera Kurd nekir û dahûrandina hunerê nekir. Bi vî rengî Yilmaz jineke pir amade ji pergalê girt û di oxira wê jinê de jiyana xwe feda kir, li ber xwe neda û çû. A rastî bû qurban.**

**- Ma hûn vê wisa dinirxînin?**

**---. : Tabî. Yilmaz roman nivîsandibû, gelek film çêkiribû, lê li gorî min divê filmeke biêş li ser wî bê çêkirin. Yanî filmê Yilmaz divê hinek Yilmaz tehlîl bike.**

**Cewherê dahûrandina Yilmaz eve: Li hemberî bêçaretiya Yilmaz, mînaka zilamê Kurd'e. Ya dikuje, yan jî întîhar dike!**

**- Başe birayê Apo, ez vî aliyê meseleyê bi vî rengî nefikirîbûm. Ma tipolijiyek derdikeve? Yaşar Kemal jî jêhatiye, derfetên wî berfireh hene, bi xanimeke eslê xwe Yahudî û ziman dizane re zewiciye. . .**

**---. :Yahudî, bi awayeke giştî, mirovên jêhatî, bi riya zewacê digirin bin kontrola xwe.**

**- Di nava tevna têkiliyên nav netewî de her tim qala rola hevjîna Yaşar Kemal tê kirin.**

**---. :Niha bi misogerî her Kurdek xwedî alîgirek bi vî rengî ye. Her Kurdek hinekê nêzî vê ye. Min**

**tecrûbeyên xwe gotin, ji bo ez bêmafî li hevalê xwe nekim jî min mesele gelek bi baldar nirxand. Ji bo Kurd wateya jinê heye, ji xwe yek ji erka huner û wêjeya şoreşgerî a Kurd jî, jina Kurd a şoreşger û têkiliyên malbatê derxistina holê ye. Û min di çalekiya xwe ya şoreşgerî de ev bi awayeke vekirî dît: Ger ku min dahûrandina malbat û jinê baş nekiriba, wê serkeftina şerê Apo yê niha bi vî rengî derneketiba holê. Yan jî hezar carî tasfiye bibûm.**

**- Ev xaleke gelek girînge.**

**---. :Teqez li bîra mine û şiyar dikim. Divê dahûrandina malbata Kurd, di warê dîrokî, siyasî, civakî, çandî û hemû aliyên wê yên zayendî ve baş bê kirin. Dahûrandineke min ya zayendî heye, ez pêwîst nabînim li vir zêde vekim. Weke min gotî di pirtûkeke wêjeyê de dikare bibe mijara sereke. Çareseriya cînseltî pêkanîn jî bi serê xwe bûyereke**

**mezine. Û heta dahûrandina pirsgirêkên zayendî neyê kirin, naskirina zilamê Kurd û jina Kurd gelek zehmete. Malbata Kurd rast ravekirin zehmete. Kuştinên li Kurdistanê, xulamtiya li Kurdistanê, îxanet û sîxurtiya wê fêmkirin zehmete. Her wiha nokertî û mêtingeriya li Kurdistanê fêmkirin jî gelek zehmete.**

**- Niha em dikarin vegerin ser helbestê?**

**---. : Niha, hemû xebatên min yên di têkoşîna şoreşgerî de ji bo temamkirina rola wêje û hunerê ye. Dema min destpêkir weke min gotî yên bi vê şêwaza xebatê re mijûl dibin divê destpêkê vê mijarê baş destnîşan bikin û rast bikevin nava mijarê. Ji ber mijareke girînge, ez hêsan nagirim dest. Lê wisa kirin jî ez naxwazim qebûl bikim. Pêwîstiya min û pêwîstiya şorêşê bi van wêjevanên erzan nîne û zerarê didin. Wêje**

**mijûlbûnek cidî ye. Û heke li ser bê sekinandin ez ji we re bêjim ku, him ji bo wêjevan û hunermendên Kurd, him jî ji bo wêjevan û hunermendên Tirk wê alîkariyeke mezin ji bo wan di vê qadê de derbikeve holê. Di wê baweriyê de me ku hema hema wê rola hemû şahiyên hunerê hebe. Roman, helbest, mizûk, sînema, wêne û hemû dikarin rola xwe bilîzin.**

**- Gumana min nîne lê dîsa dipirsim, dema em dibêjin wêjeya Kurd û helbesta Kurd wê ji hêla Kurdan ve bê nivîsandin, qala nivîsandina hunera ku bi Kurdî bê nivîsandin dike, ne wisa?**

**---. :Bêguman bi Tirkî jî dikare bê nivîsandin. Bila di hemû zimanan de bê wergerandin. Em dizanin berhemeke baş bi hemû zimanên cîhanê tê wergerandin. Lê raste, pêşketina zimanê Kurd girêdayî wêjeyeke xurt a Kurd yan jî nivîsandina romana Kurd'e.**

**Romaneke mezin ya Kurd wê derfeteke mezin ji bo pêşveçûna zimanê Kurd bide. Ji xwe pêşketina ziman jî, girêdayî pêşketina wêjeyê ye. Û ev jî ancax dikare bi îfadeya wêjeya şoreşgerî çêbe. Her wiha yên ku dixwazin zimanê kurdî pêş bixin, divê dest bi wêjeya şoreşgerî bikin. Ew li benda xwediyên xwe ye. Me bingehê wê derxist holê, rêbaz û kategoriya wê ya bingehîn pêk anî.**

**- Hûn dibêjin mijar amadene.**

**---. :Belê mijar amade ye, yên ku xwe di vî karî de hinek hosta dibînin dibêjim ji kerema xwe, rast û bi awayeke baş nêz bibin. Hinek navên ku we dane hene; ez bawerim di derbarê wan de hûn dixwazin hinek nirxandinan bigirin.**

**-Bêgûman.**

**---. :Yek jî bêjim ku, min bûyara PKK'ê û têkiliya bi wêjeyê re zêde nedaniye holê. Dîsa min pir zêde têkiliya rewşa şoreşa rizgariya**

**Kurdistan û wêjeyê venekir. Lê nêzîkatî çawa bibe min hewl da bi rêya hinek mînakan bidim. Niha ger ku em bên ser hunermendên niha di bazarê de ne, em bi kinahî li ser Yaşar Kemal sekinîn. Ger Yaşar Kemal, afirîneriya xwe di têkiliya Kurd a wêjeyê de herikandiba wêjeyê, li gorî min wê rola wî a nav netewî hîn zêde bûna. Lê destpê nekir.**

**- Çukurova nivîsand!**

**---. :Lê Kurdan pir xirap danî holê. Tişta daniye holê Kurd çiqas ji rastiya netewbûnê hatine dûrxistine, lê têkiliya wê ya bi mêtingeriya Tirk û paşverûtiya Kurd re nedaniye holê. Kesayeta Kurd ya ku li vir daniye holê gelek razbere. Di hinek romanên wî de hene, lê gelek lewaze û bi misogerî nakokiyên Kurdan nedaniye holê. Ev guneheke gelek mezine! Ger ku hûn bibînin yan jî pê re nîqaş bikin hûn ê jê re ragihînin bêjin Apo gotiye**

**pêwîst bû ev gunehê mezin nekiriba û ji bo ev guneh kiriye ez pê diêşim.**

**-Dema ev gotinên we hatin weşandin, ez ê ji Yaşar Kemal bixwazim ku bersiva we binivîse.**

**---. :Temaşekin mirovê Kurd gelek binakoke. Tinekirina mirovên kurd a netewî, qutkirina wî a ji dîrokê, bêzimankirina wî, rewşa wî ya lal-kor û gelek êşên wî dişibin van hene. Bêyî ku tu vê pir baş danî holê tu çawa dikarî qala Kurd bikî? Tu çawa dikarî bêjî tu "*Yaşar Kemalê minê Kurdî*"? Rexneyeke min heye; ez bi zimanê Tirkî nivîsandina romanê xirap nabînim. Lê dikarim bêjim kêmbûneke mezin jî jiyan dike û ev jî wî qed rûmetdar nekiriye û bihêz nekiriye. Nabêjim bila îlahî bi Kurdî binivîse. Lê dikarî hêza xwe ya wêjeyî ji bo derxistina têkiliya Kurd bikar banîya. Rexneyeke min wisa li wî heye.**

**Min niha hinek qala Yilmaz jî kir. Yilmaz xwe hîn zêdetir nêzî asta Kurd**

**kir. Lê bêçandiya yeşîlçamê yan jî paşverûtiya wê zêde neşikand. Têkoşîn kir û bi wêjeya şoreşgerî re jî mijûl bû. . .**

**- Yilmaz jî bi nasnameya polîtîk nêzî nasnameya Kurd bû. Lê di sinemaya xwe de nêzî vê nebû.**

**---. :Belê, di sinemaya xwe de nêz nebû. Di demên dawî de bi awayeke pratîkî xwest nêz bibe, ew jî têr nekir, kêm ma; bi kinahî dawiya wî dilsotîner bû.**

**- Lê hûn dibêjin divê "*Yilmaz bibe filim, jiyana wî bigirin fîlmê*" ez cara yek tesbîteke we wisa dibihîsim.**

**---. :Belê, ez difikirim dahûrandina Yilmaz di dema pêş de hîn berfirehtir bigirim dest. Heke fersenda min çêbibe ez dikarim dahûrandina Yilmaz çêkim. Bi taybet jin-malbat û rewşa wî a sinema û siyasetê ez li ser bingeha rastiya nakokiya Kurd dinirxînim. Lê berxwedêr bû, bi asanî teslîm nebû.**

**- Miroveke mert bû.**

**---. :Raste mert bû. Bi kinahî li gorî hunermendên din qonaxeke pêş bû.**

**- Yek jî aliyekî wî yê qehremanî hebû.**

**---. : Qehreman bû, mêrxas bû, berxwedanvan bû, lê tam nikarî bibe encamê. Min qala hilbestvaniya Cemal Sureya kir, di demên dawî de şiyar bû, lê temenê wî têr nekir. . .**

**- Lê ev hişyarbûn hemû jî, bi mezinbûna piştî 1984'an ve girêdayî ye. Bi rastî jî dema em li hemû cîhanê temaşe dikin, romanên herî baş ancax di bilindbûna civakekî de hene.**

**---. : Belê, bi kinahî dixwazim behsa bûyera İbrahim Tatlises bikim: Sala ku PKK hat îlankirin ew jî di warê deng de hat xelatkirin. Û her ku çû navdêriya wî bilind kirin. Hûn dizanin Özal jî ew vexwandiye gelek şahiyên şevê, ew bi xwe jî gelek**

**caran çûye gelek şevên wî, heta bangî Çankayayê kirine û dîsa wî birine Komarên Tirkî, rêkirine Ewrûpa û li beramberî şevên me şevên elternatîf pê dane kirin. Li gorî mîn Îbrahîm, piştî 12'ê Îlonê şûnde şexsê ku herî zêde xwestine bikar bînine. Rewşa wî divê hinek bi şerê taybet re bê nirxandin. Bi mizûka arabeskê re pêşkêşî piyasê kirin û bi taybet tîpike herî zêde ji bo tevizandina ciwan û gel xwestine bidin bikaranîn. Mirov dikare zextên siyasî jî lê zêde bike. Lê zanîn wî û lewaziyên wî jî di asteke jor de bidin bikaranin. Û ev wî bixwe jî bikar anî. Bi vê rewşa xwe ve hinek neyênî heta bêjî pir da axaftin. Me dem bi dem ji bo rast nêzî pirsgirêka Kurd, mizûka Kurd bibe şiyar kir. Hinek eleqedarî dide nîşan. Lê ez bawerim ji ber zextên polîtîk nikare zêde vebûn bide çêkirin yan jî eleqedariya xwe berdewam bike. Hîn ew jî di rewşa yek ji ewên bi pirsgirek**

**de ye. Bi taybet pozisyona wî ya li hemberî mizûka Kurd gelek bêrûmete. Dîsa tîpê Kurd ji Yilmaz hîn paşkeftîtir temsîl dike.**

**- Tabî, Yilmaz çiqas bê rexnekirin bila bê rexnekirin nav li sere qirale, qehremane.**

**---. :Burjuvazî bi awayeke sexte xwestin li ser Yilmaz jî ferz bikin. Yanî xwestin pêşiya Yilmaz û navdariya wî bi vî re bigirin. Pergalê jî bi awayeke vekirî piştgirî dayê, bi xwe jî ji vê re bû amûr. Me şiyar kir, heta me tund şiyar kir, lê em tam negihiştin encamê.**

**Hulya Avşar heye. Ya rastî ew jî kurde.**

**- Yanî ya navûdeng?**

**---. :Belê, bi skandalên cûr bi cûr yên evînê re wê jî popîler dikin. Herî dawî got; "*Ez jî kurd im*. "**

**- Çawan be Kurdbûn bûye moda. Ti eleqeyeke wê bi Kurdbûnê re nîne, bûna Kurd mode ye.**

**---. : Lê weke tîpeke bal dikişîne dixwazin bikar bînin. Ez di wê baweriyê de me ev yeşîlçam ji hêla şerê taybet ve tê bikaranîn.**

**- Ev her tim wisa ye.**

**---. :Di mijara tevizandina civakê de û ji dêla tîpên nû, tîpên nebaş serwer dikin û di vir de pêwîste li ser pozisyona Yeşîlçamê baş bê sekinandin. Temaşe bikin ez ê di vê mijarê de rexneyeke xwe bikim; mînak di Rojnameya Özgur Gundemê de rûpela hunerê heye. Çi dikin? Her roj dibêjin; "*ev film, ew film*" reklama wan dikin. Ma ev bese? Ne mûmkûne ku rojnemegeriya şoreşger bivê qayîl bibe. Divê çapemeniya me, bizanibe sînamayên Emerîkî, bi taybet jî sînameyên yeşîlçamê ji bo gelan çi îfade dikin bizanin û baş binivîsînin. Dîrokeke vê sînamayê heye. Şêwazeke têkilî û avakirina tîpekî heye.**

**Û van gelê Anadolê helandiye û daqurtandiye. Keça Kurd, kurê Kurd, keça Tirk, kurê Tirk û malbat, welhasil hemû jiyana wê ya sosyal serûbin kiriye. Her yek ji wan filman, bûyereke mezin ya tahribata civakî ye. Dibe ku pêşveçûyî jî be.**

**Pêwîst dikir ku di derbarê hemû aliyên Yilmaz de rexne hatiba kirin. Û ev rexne, wê ber bi çêkirina hunera rast û sînamayeke rast ve bibûya. Tenê ne sînama, gelek roman hene, helbest hene; we dikarî rexneya hemûyan di rûpela xwe de bikin. Bi vî rengî li şûna vê wê hunera elternatîf derketiba holê. Ti kes nikare îda bike ku pêdivî bi "*hunera elternatîf a şoreşger û wêjeyê nîne*. " Na, pir dijwarî pêdivî pê heye. Lê rûpel vala tê bikaranîn. Gelek nirxandinên we hene, divê ev jî bê peytandin; kêm dimîne. Di vê mijarê de gelek nivîskarên sînamayê û wêjeyê hene. Ew neçarin di vê mijarê de rola**

**dikeve ser milê wan bicî bînin. Lê nakin.**

**Niha xaleke din jî bînim ziman: Tê dîtin ku di huner û wêjeya Tirkan de Kurd li pîlana pêş in. Lê ew Kurdên ku di hunera Kurd de li pêşin, di rewşa ji cewher derxistinê de de ne. Di rewşa yenîçeriyên di Osmaniyan de ne. Ev ne Kurdbûnê, xizmeta pêşxistina Tirkbûnê dikin.**

**- Ji bo Tirkî zimanê wan yê duwemîne baştir bikar tînin.**

**---. :Na, pirsgirêk ne eve. Evqas hêsan nîne. Ez vê ji we re bêjim: Tirkperestiya herî baş ji nav Kurdan derdikeve. Ev quraleke. Yek jî quraleke ku vê temam dike heye: Ev, ji nêzîk ve girêdana xwe bi qetilkirina Kurd re heye. Dema di darekê de şaxek pir mezin pêş dikeve, ya din jî bê roj, bê hênase dihêlin û qetil dikin.**

**- Birayê Apo, niha Kurdayetî careke din xwe keşif dike. Di vir de gelek rewşên paradoksî jî derdikevin**

**holê. Bi taybet di nava Kurdan de, ew kesên girîng ku Tirk tên zanîn, wexta tên fêmkirin ku ew Kurd in, ev car bilindbûn destpê dike. Abdulah Cevdet yek ji van e. Damezrînerê Îttihat û Terakkî ye, Kurde û demek bi Kurdîtiyê re mijûl bibû. Lewra tê zanîn jî ketiye her qilifê jî. Bûye Tirk û bûye Îngilîz jî. Niha bi dahûrandinên hûn dikin re gelo em digihijin vê zagonê? Kurdek di nava civakek cuda de û ji koka xwe hatibe qutkirin wisa bilind dibe wê ti carî nikaribe bêhempa be û gelo em dikarin qala qanûneke wisa bikin?**

**---. :Tirkîtî di asteke mezin de ji cewher dûrxistine. Bi dîroka Tirkîtiyê ya lezgîn lêkolîn bikin, ji netewên dinin. Hemû ji deverên cuda hatine. Dikarim gelek mînakên vê bidim. Neteweperestên Tirk yên herî bilez, ji koçberên ku Balkanan qut bûne hatîn derketine. Em ji Mustafa Kemal bigirin heta Kenan Evren. . .**

**- Yek jî di teoriyê de jî wisa ye. Akçora Yusuf, Agayef Ahmet. . .**

**---. : Tê fêmkirin, yanî di polîtîkayê de jî wisa ye. Pirsgirêk eve, sûdweriya wan zêde ji gelê Anadolê re çênebûye. Ev xalên serikin, dixwazin li gel xwe bigirin. Dibin penceşêr û penceşêr jî her tim zerarê didin reseniya gelan. Ev di Kurd de jî di Tirk de jî heye. Yên ku ji Tirkan qut dibe bi Kurd re tê hêmandin, yên ji Kurdan jî qut dibe bi Tirk re tê hêmandin. Tirk çavlê dike û ji yeke din re dibe pîne. Sedema nexweşî û tengezariyeke nû ye. Divê ev bi rexneyên şoreşgerî re baş derbikevin holê. Min hinek mijar zelal kirin.**

***"Çavên mezin ên li ser welat."***

## DU MİLÎTAN: APÊ OSMAN Û MUSA

### Çavên Mezin

**Ji bo şehîdême yê mezin Apê Osman xemgîn nebin. Em cihê wî dadigirin. Ger ku me cihê wî nedagirtiba em ê xemgîn bûna. Me xwe gelek bihêz kiriye. Em her roj agahî digirin, kar baş dimeşe.**

**Ez çend caran çûbûm serdana wî. Em naskirin. Me Apê Osman naskir û em dizanin çi temsîl dike. Bi sedan şehîdên me, beriya ku biçin**

**welat, çûn gel wî. Di warê ruhî de hevdu temam kirin, moral û hêz girtin. Diçû kî derê digot, gelek tişt digot. Dibe ku hûn hinek dûr ketibin, lê ew welatparêzeke mezin bû.**

**Ji hêla din ve ew li Kurdistanê nêzî 50 salan welatparêz maye, qirêj nebûye, heya dawiyê girêdayî serxwebûn û azadiya xwe maye û qet tawîz nedaye. Kesên di Kurdistanê de wisa pak mane hêsan nayên dîtin, hûn vê baş dizanin. Wesiyeta wî ji me hemûyan re hebû. Wesiyeta xwe heya dawî ji we re got, divê ev wesiyeta wî bê pêkanîn.**

**Hevalan qal dikir digotin, wî mirin qebûl nekiriye û çavên wî mirin red kiriye. Belê xewna wî Kurdistan bû. Di hevdîtina me ya herî dawî de bêriyên wî tazebûn. Min jê re got heke tu bixwazî em dikarin te bibin Kurdistanê. Dîgot min Kurdistan dîtiye.**

**Qala 1925'an dikir: Gotibû, "*Ji bo çûyînê me mufrezeyek amade kiribû.*"**

**Ramanek mezine. Gotina xwe bi awayê; "*Heya Suruçê çûm, lê li pişt min kes nemabû*" temam kiribû. Dizanim: Zilma Tirkan serdema Kemale. Cesareta gavek avêtinê jî bûyerek mezin bû. Raperîna Şeyh Saît jî di nava du rojan de bi erdê re kirin yek, ti tiştek nehiştin. Carekedin wêrekiya li hember rejîma Kemal derketin, xaleke girînge. Demek dirêj li ber xwe dide. bêgûman dixwest karê xwe li Başûr bimeşîne û firsendek bidest bixwe. Dibine ku li ser navê weletparêziyê çiqas girtin û kuştin çêbûne. Lê ev hemû, ev mirovê xwedî van nirxên bingehîn bandor nake. Li vir ev dikare bê gotin: Li Kurdistanê, di nava gelê me de, karê yekî xwedî riheke wisa baş nayê meşandin. Bi giştî jî piştî komarê û 1925'an di her serhildanekî de**

**lêxistin. Yê ku xwest bikuje kuşt, yêku karî bi xwe ve bide girêdan da girêdan û yê tirsa jî revî. Ji Kurdayetiyê her rojek derbas bû miriyek ket. Her roja ku derbas bû Kurdîtî hinek din paş ket. Divê ev neyê jibîrkirin. Ji niha şûnde mirina Kurdan zêde bûye. Beriya Komara Tirkan Kurd wisa neketibûn. Ziman, urf û edetên wan bihêz bû. Ji Tirkan bihêztir bûn. Heya vê demê bandor zêde li ser nînbû, piştî hingê çêbûye. Berxwedaniyeke wisa piştî wê serdemê şûndeye.**

**We Mele Abdulah jî dît. Ew jî 50-60 sal li hember zilma Ataturk sekiniye û riha xwe nebiriye. Tevî ku 97 salî bû dema hat gel me weke ciwanek 18 salî bû. Li gorî nizama gerîla tevdigeriya. Digot; "*Du sal temenê min maye, xweziya min Kurdistan dîtiba*. " Min digot, belkî di sala 1995'an an jî nêzî sala 2000'î Kurdistan ava bibe. Wî digot; "*Na, wê***

***di sala 1995'an de rizgar bibe*. " Ger ku baweriya mirov temam be tê hesibandin ku serketiye. Rihê wan bihêze, moralê wan bilinde. Heya dawî welat jiyan dikir.**

**Çav û henaseya wî li welat bû; nevemirîbû, vekirîbû.**

**Ev çavên mezin yên li ser welatin.**

**50-60 sal çawa dane vî welatî, rihê xwe nefirotine û xwe neanîne rewşeke girêdayî? Yek meleyek bi temen, yê din jî welatparêzek 90 salî.**

**Herduyan jî em dîtin û bûn hewrê.**

**Têkiliyên me yên dostanî û hewrêtî mezin û bihêz bû. Bi van mirovên me yên mezin re axiftinên me çêbûn û li ser bisekinin! Li ser bîranîna şehîdan sekinandin çawa çêdibe? Tiştên wan gotî li ser bê sekinandinê ve dibe... Divê tiştên gotine weke helbestek nemine û neyê jiberkirin.**

**Em çawa li ser bîranîna şehîdan disekinin? Di dîroka me ya PKK'ê de şehîdekî me hebû. Dijmin bi şehîdkirina wî re xwest çavê me bitirsîne û em devji doza xwe berdin. Bi rastî jî me wisa zanî ku cîhana me hilweşiya. Me got em çend rojan li pey şehîdê xwe biçin. Ne çekeke me û ne jî hevaleke me mirinê bide berçav hebû. Tu yê ji bo bîranîna hevalê xwe çawa bimeşî, xebat nîne. Me xwest ser dijmin de biçin û tola xwe rakin. Piştre jî wê me partî îlan kiriba, pêwîst bû xwîna wî vala nehatiba rijandin. Beriya salek ser şehadeta hevalê me Haqî re derbas bibe, me ji bo bîranîna wî partî îlan kir û piştî 6 mehan jî me tola xwe rakir. Piştî wê şerê me yê Hîlvan-Sêwerekê dest pê kir.**

**Di Kurdistanê de ew şer bû gaveke nû. Heta roja me ya îro û tiştên niha li Kurdistanê tên jiyîn dişopînin. Dikarim bêjim ku ev hemû ji**

**bo bîranîna şehîdekê pêkhat. Ger ku dijmin hevalê me şehit nexistiba, belkî jî PKK ava nebûba û min jî xwe evqas nedabûna kar û barê PKK'ê. Ji bo bîranîna şehîdek me soz da ku partî ava bikin. Me dê tola wî rakiriba. Ji bo çekê em hîn ne amade bûn. Me derfetên di dest xwe de kom kir û biryara silehek girtinê girt û destpêkir. Bi vî rengî me dest bi avakirina partiyê kir. Him dijmin hat ser me him jî em çûn ser dijmin. Niha ji sedî 90 welatê me di bin serweriya me de ye.**

**Ez çima van vedibêjim? Ger ku nêzîkatiyeke rast ji bîranîna wan re çêbibe, wê mirin çênebe. Dê bibe sedema pêkhatina welatekî. Divê ji bo mirina şehîdê mezin çi bikin difikirim: Wiha; divê neyê gotin yekî bi temen bû û 70-80'î saliya xwe temam kiribû. Ez dibêjim şehîdên bi vî rengî wekî yên 18 salî ne. Çima? Ji ber jiyana wan di ber armancekî de çûye û ji**

**armanc dûr neketîne. Armanc gelek pak girtine. Her yekî hatiye bi pirsgirêka netewa Kurd leyîstiye û firotiye; xwe rêber dîtine û ji ber bêbawariyên xwe welatparêzî ziyan kirine. Gel û welat ziyan kirine. Ev lîderên çî ne? Ger lîder wisa be wê gel çawa be? Serî çibe ling jî ew e. Ling li gorî serî tevdigere. Ew wisa ketîbûn, gel ket lê dîsa hinek mirovên me li ber xwe dan. Her ku wan li ber xwe da dijmin jî ew kuştin.**

**Li berxwe dan û rihê xwe nefirotin.**

**Xwe avêtin vî milî wî milî û li çiyan girtin. Hinek jî bi salan li ser serê çiyan mehkûm û bi tenê man. Hatin van herêman û bi salan bi tenê man. Devji şeref û giyanên xwe neberdan. Hinekan tenezil kirin xwe bi dewletê ve girêdan. Hemû tiştên dewletê qebûl kirin. Kurdîtî ji mirinê zêdetir bi destê wan ket. Van şehîdê mezin ev qebûl nekirin.**

**Bi destê yek-du kesan bêguman ya rast nayê qezenckirin. Lê qayîm mayîn jî bûyereke gelek mezine. Wê li ser bîranîna pêkhatina keseke wisa mezin û durist bê sekinandin, heke hewrêtiya wî baş bê fêmkirin û yekî bi aqil nêz bibe dikare tiştên gelek mezin bike. Hevalên me ne demeke dirêj, karî yek-du salan bi me re bimeşin. Girêdana me bi hevaltî bû û me domand. Li vir jî wisa ye, hatina min ya vir ket sala 15'an.**

**Başe welatparêziya rast çawa çêbû? Çima li vir welatparêziyeke mezin ava bûye? Heke mirov hinek li dîrokê temaşe bike wê bê fêmkirin. Li dijî Osmanî'yan û KT. Hinek çûn vir hinek çûn wir û beşek jî heta vir hatin. Hûn jî heya van deran hatin. Li paşeroja xwe temaşekin, barbartiya Tirk gelek gelan şikand. Ermenî û Rûman nehiştin, gelek mirov tine kirin. Wisa hatin ser me jî û ez jî hatim vir. Fikirîm ku heke yek-du meh**

**din bimînim wê her tişt ji destê me biçe û hatim vir. Min dizanî siyaseteke nû, fikreke nû heye û min xeteriya ku ji destê me biçe didît, ji ber vê hatim vir.**

**Weke Apê Osman bi tenê hatim.**

**Ne yekî nas, ne dostek, keseke min nînbû. Kesî nedizanî ez kîme. Hinek din jî hatibûn. Gavek paşde avêtin ji bo wê bûba mirina netewekê me cesaret nekir. Bi pele şûnde çûyîn jî wê bûba mirina me. Me herdu jî qebûl nekir. Em ê ne ji welatê xwe dûr ketiban û ne jî em ê wisa careke din bibeziyan mirinê. Em ê li vir biman. Di vê qadê de em li ser dost kiye dijmin kiye sekinîn. Li ser kîjan bingehî bîr û bawerî bê avakirin û bi kîjan metotan xebat bên meşandin? Me wê demê hemû partiyên Kurd yên kevin ji nêz ve dît. Ti dost nebû û me hevdu zû nas kir. Me serdana vî şehîdê xwe jî kir. Bi rastî jî me ew barê giran yê ku dixwazin rakin dît. Di**

**salên 1925'an de çima nikarîne serokatî bikin ji me re got. Piştî 1945'an çima serokatî nekiriye û sedema di 1960'î de çima pêk neanîne vegot. Gelek sedem hebûn. Li welat mayîn jî ne gengaz bû. Gotineke Kurdî tenê dibû sedem bê girtin û kuştin.**

**Me, di sala 1970'î de mirin da ber çav bi çend gotinên weke,"*em Kurdin*" got. Me got; "*Dijmin çi dike bila bike*. " Wê demê karê herî mezin ew bû mirov bêje; "*Ez Kurdim*. "Min bi xwe di sala 1970'î de got; "*Em Kurdin*. " Ji derveyî herdu gotinan ne zanebûna me û ne jî wêrekiya me hebû. Lê ev gotin çi li bîra mirov tîne, bi serê mirov çi tîne û ji mirov çi dixwaze? Çi ji Kurd hatiye, Kurdistan li ku ye, çawa hatiye mêtingehkirin, çawa hatiye parçekirin û ya herî girîng jî wê çawa bê rizgarkirin? Bi çi rizgar bikî? Li dora te kes nîne. Nêzî kê/î dibî ji te direve. Digotin; "*Te xwe***

***şewitand, zarokên me neşewitîne*. " Bi salan karê me wisa bû.**

**Hevaleke ku bêje; "*Ez heya dawiyê heme*" nînbû. Bi salan gotin; "*Te xwe şewitan qet nebe nêzî me nebe*. " Direvîn. Doza netewa Kurd evqas ketîbû. bêgûman hûn li vir hinek welatparêz bûn, we kurdîtiya xwe înkar nedikir, lê li bakur ne wisa ye.**

**Dema ez wan rojan tênim bîra xwe û bi van rojan re tênim ber hev, ev roj biheştin. Ew roj rojên tarî bûn. Welat çûbû, nav çûbû û navê gel nînbû. Di ser de jî xwe bi xwe înkar dikir. Kes nebû. "*Dema digot ez Kurdim*" şerm dikir, digotin;"*ji yên bi dûvik re dibêjin Kurd*. " Kesî nedigot; "*Ez Kurdim*. "Ecêbe yekî gelê xwe nasneke. Yêkî ku li ser gelê wî/ê heqaret hebe û vê nayîne ber çav, ji wî/ê ti xêrek nîne. Şerefa wî mirovî nîne. Ez hinek li ser şeref û namûsê difikirim û dibînim ku ev wisa ye.**

**Tiştên tu li ser navê gelekê bikî şeref û namuse. Ji derveyî vê ti nirxeke me ya din nîne. Ger li ser te naveke durist ya Kurd hebe başe, ya din hemû derewe. Heke me navek li xwe anîbe, em ê temaşekin ka hevalê me heye, yan na em ê şerm kin. Em dikarin çend rojan li hember dijmin li ber xwe bidin? Li dora te hewrêyeke te jidil bi te re bimîne, nemine heye? Wê kî bi xwestek nan bide te? Tu bi serê xwe axayek û bi serê xwe çiyayekî. Ji ber wê ji min re digotin; "*dîne, ehmeqe û dibistan nexwendiye*." Xwendiye ma bûye çî? Di wan rojan de hinek welatparêzî û Kurdîtiya me hebû, bihêz bûn û me dibihîst. Dîsa ez biçûk nabînim. Ez ji ber meseleya vî şehîdî qal dikim. Ger bimabam, dumehê din derbas bibûya wê biçûba û wê tiştek nemaba. Çend peyv gotibû, di warê welatparêziyê de du gav avêt, wê ew jî biçûba û di encam de wê tiştek nemaba. Di 12'ê**

**Îlonê de li gorî pîlana dijmin diviyabû Kurd nemaba. Wê li ser rûyê erdê Kurd nemaba. Weke nirxên me yên li van deran heder bûyî, wê ev şehîdê me jî çûba û hatiba jibîrkirin.**

**Min gotibû hewrêyeke me tenê jî nînbû. Em çûn gel Filistîniyan. Em salek man, başe em ê çawa tevbigeriyan? Heta hevalên me jî bi me dikeniyan digotin; "*Tu qala wegera welat dikî û çûyîna welat dikî. Em ji te bawer dikin lê ev ne mûmkûne, em ji bo mirinê jî hene lê çûyîna welat mir*. " Berde hevalan, kesî piştî 1980'î bawerî bi vegera welat nedanî ango bawer nedikirin. Hevalên heta mirinê girêdayî hebûn, lê bawerî nemabû û tu nikarî serde jî biçî. Ya rastî her Kurdek hatibû vir li vir mabû, nevegerabû.**

**Apê Osman jî ji vir dûr neketibû. Ji bo vegera welat hewl dabû, heta dawî jî çavên wî li vegerê bû, lê veger çênebû. Divê mezin bê fikirandin, ti**

**ferq di navbera mayîna mirov ya li welat û yêkî ji derveyî welat dimîne, lê dilê xwe ji welatê xwe qutnekiribe de nîne. Yên nevegeryane divê di warê rih û hişmendî de li ser bisekinin. Heya henaseya xwe ya dawî vê serxistin ne kême. Yên din jî ji çûyînê zêdetir cuda tiştek nexwestine.**

**Ev rewş hat serê me jî, sala destpêkê min digot; "*Ez ê çi bikim*. " Derketinek bihêz, xwe li ser lingan girtin, cesaret dana hevalên xwe û ji hinek hevalan re rê vekirin. Hevalên heya mirinê amade hene, lê dibêjin; "*ne mûmkûne*. " Piştî 1980'î û 82'an şûnde me hinek heval şandin. Ev gavên mezin bûn. Her yekî diçû diket.**

**Hinek xayînan hîn ew di rê de şehît kiribûn. Hûn dizanin bi dijmin re li Kurdbûnê dixin. Yekîtî jî xwest bişîne, çûn di rê de hatin kuştin. Yên me jî çûn, hatin kuştin. Dijmin ji berê ve rê qut kiribû. Riyên Botan,**

**Behdînan, Mêrdîn, Semsûrê qut kiribûn. Me di 1982'ande dişand. Dijmin digirt, parçe dikir. Me hinek heval şandin Semsûrê cîwarê Apê Osman jê hatî, dijmin wan girt avêtin çem. Hevalê Adnan hebû, me di sala 1982'an de di vê mehê de rêkiribû. 10 hevalên me li ser ava Hêzil bi destê xayînan hatin qetilkirin. Dîsa me devji fikrê çûyîna welat neberda. Em her tim serde çûn. Ji 10 salan bêtire me tiştek îsbat kir: Dijmin lê dixe ji bo carekedin nevegere. Dema mirov diçe derveyî welat lêwaz dikeve. Heke dozeke mezin nebe mirov dikeve rewşek ji rêzê û biçûk dibe. Ji bo mirov nekeve, biçûk nebe divê doza mezin bifikire û bibe xwedî riheke mezin. Ji bo xwe nekuje, li ser lingan bimîne raman û siyateke mezin pêwîst dike.**

**Me pêwîstiya gav avêtinê di vir de dît. Me di xwe de gelek çare avakir.**

**Wiha me di demek wisa de serdana Apê Osman kir. Me dît ku bi wî re welatparêzî maye. Wêrekî da me. Di vê qadê de piştî sala 1985'an şûnde hewrêyên min yên weke wî çêbûn. Dostên me roj be roj zêde dibûn. Di 1985'an de encax 3-4 dostên me hebûn. Piştî pêngava 15'ê Tebaxê şûnde êdî gel guh dida me. Û her roja ku derbas bû welatparêzî pêşket û herkes nêzî me bû, nêzî PKK'ê bû. Berê kes nediçû welat, piştî 1988'an, 1989'ê şûnde gel pir zêde hat.**

**Apê Osman digot; "*Me 7 kes li dora xwe kom kiribû, me dixwest em piştgirî bidin şoreşa Şeyh Saît lê nebû*. "**

**Ya me jî wisa bû. Mirin li ser mirinê, pêngav li ser pêngavê û em di bin zilmê de bûn, tevî vê jî me pêngava xwe neda sekinandin. Alem hatibû guhertin, Rojhilata Navîn hatibû guhertin. Me dît ku wê ev qeder bê guhertin û me hinek da**

**guhertin û bextê xirab hinek şikand. Yê diçe venagere, yê dikeve ranabe. Di dîroka Kurdan de ev tê çi wateyê? Pêngava 15'ê Tebaxê tiştên mîna vê islah kir. Çibû ev? Tu çendî ketîbî, di tengasiyê de bî, bi tenê mabî jî, ger ku tu xwedî siyasetek rast û riheke welatparêziyê bî, te devji xwe neberdabe, tu dikarî karên gelek mezin ser bixî. Em dikarin bêjîn divê mijarê de rihê Kurd rabûye ser xwe. Ew rihê hezar sale ketî û henaseya wî qut bûye, tenê di yek-du kesan de maye. Ji bo çi? Ji bo bêje nemirîme ji bo berxwedanê heme. Em baş dizanin Apê Osman jî bi vê gavê re ye. Mirovek gelek zanyar bû. Li ser pêngava 15'ê Tebaxê pir zêde disekinî. Nûçeyên rojane dişopand. Rojane tiştên di welat de dibûn dizaniya. Kesî jê re nedigot, wî ji xwe dizanî. Gava ku hatiye avêtin çiye, wateya wê ya dîrokî û cihê wê dizaniya.**

**Di hevdîtina me ya dawî de rewşek wisa çêbû: Min texmîn nedikir ku nûçeyan guhdar bike. BBC guhdar kiribû. Ji me re got. Nexweş bû, nedikarî ser linga bisekine, lê nûçeyan guhdar dike û weke me dişopand. Ji tiştên li welat dibe agahdar bû.**

**Rihê Kurd yê ku digot;"*ez mirinê qebûl nakim*" di wî de hebû. Belê, berê jî bi sedan şehît çûbûn gel wî, cesaret girtibûn û cesaret dabûnê. Di encamê de, piştî 15'ê Tebaxê şûnde li vir welatparêzî bihêz bû. Zarokên xwe li ser rihê 15'ê Tebaxê dan. Tenê ne alîkarî, bi sedan şehîd dan. Di warê madî de jî birastî jî destek kirin. Bi malên xwe û alikariyên madî ve bûn sedem ku gelek nirxên mayînde ava bibe.**

**Li vir tişta heyî çiye? Li vir ya heyî mayîndebûna rihê welatparêziyeke mezine. Dibe ku hûn wisa dizanin hema ji ber xwe ve bûne**

**welatparêz, lê ne wisa ye. Heke niha li vir welatparêziyeke mezin mabe, ji ber sedema riheke mezin yê rê dide nîşan bingeha xwe digire. Çima li cihên din welatparêziyeke bihêz nîne? Ji ber koka wê hişk bûye. Li vir kok hişknebûye. Bi tenê bû lê hişk nebibû. Di encam de yên li dora wan mabûn hebû, piştre em gihiştinê.**

**Piştî pêngava 1984'an şûnde hemû giyan digihin hev. Ev giyan bûn meteryal, bûn çek, bûn hewrê, bûn artêşa gel û niha dikare bê gotin ku "*mirin nemaye*. "**

**Nirxê pêwîst bû ku ji nêzîkatiya kesayeteke wisa welatparêz re bê dayîn nedihat dayîn. Weke vê berdêla jiyanek û şiyarbûna gelekî ye. Di jiyana gelekî de ketin-neketin, mirin-nemirin girînge.**

**Li van rojan temaşe dikim, me êdî xeteriya mirinê li pişt hiştiye. Mesele ne gihiştina armanca Kurdbûnê ye. Bi serê xwe, her ku em**

**temaşe dikin em dibînin ku dijmin me çiqas teng kiriye. Ji bo me ji welatê me dûr bixe serî li her riyê dide û em jî dibêjin em ê bigihinê. Em niha vê difikirin. Mesele hebûna Kurde, azadiya Kurd-Kurdistanê û serxwebûna wê ye. Ev tenê neya şehîdên PKK'ê ye, ji bo bîranîna hemû şehîdane. Ev dostê me mezinbûna 50-60 salî parastiye. Ji bo hemû şehîdên Kurdistanê ya rast çiye? Li gorî rastiyê pêwîste bimeşe. Tiştên din hemû derewin. Apê Osman jî van dizaniya. Çima ji nirxê wî re nirx nehat dayîn? Li vir tişta binirxe divê qîmetê wê bê zanîn, tinaz pêneyê kirin.**

**Daxwaza min ji yên dibêjin em girêdayî bîranîna Apê Osmanin re eve, jiyaneke wî hebû, fikreke wî, giyaneke wî hebû û ew li ser tiştek bû û girêdayî tiştekê bû. We dît çavên wî vekirî bû, li ser bû. Ger ku em dostin, em hewrêne divê em jibîr nekin. Yê**

**ku dibêje; "*mir çû*" wê demê di Kurdbûna me de kêmbûnek heye. Ez mirinê qebûl nakim. Heke di warê fizîkî de li holê nebim jî, ger di te de parçeyek giyan hebe tu yê ji min re nebêjî "*tumirî*. "**

**Di jiyana netew û gelan de mirin tiştek cuda ye. Heke lîderekî te ketî, tenezil dike, serê gel ditewîne hebe, wê demê dikarî bêjî mirin heye. Heke tenezil bike milê gelek kesan bitewîne û erzan xilas bibe, wê demê mirin dibe. Ger ku marîfeta lîdertiya Kurdbûnê te nêzî dijmin kiribe, tê wateya bêyî ku bide te ji te digire. Niha dibêjin em nizanin, neçarbû, rêyeke din nînbû û ma dikariya çi kiriba. Ev ramanek neraste.**

**Di vê mijarê de jî min helwesteke Apê Osman bihîst. Ev tiştên bi vî rengî qebûl nedikir. Dema ku mirov ev giyan naskir û rakir nêzîkatiyên weke bibêje; "*ez tenê mam, ez jî devjê berdim, ji giyana azadî û serxwebûnê***

**_dûr bikevim_” û hwd raber nake. Di Kurdewariyê de sekna dijber wisa ye. Her roj nêzî 5-10 şehîdên me çêdibin, ma em dikarin ji vê re bêjîn mirin? Roj bi roj welat xwe bi xwe vejîn dike.**

**Ji bo azadî û serxwebûnê berê di salê de posteyek, di roja me de rojê deh posta bilind dibe. Divê neye gotin jiyanek kesî ye, jiyana mine. Di Kurdewariyê de tiştên bi vî rengî berê bihêz bû. Berê herkesi destpêkê jiyana xwe û malbata xwe difikirî. Nêzîkatî ango mantiqê "_ger hebe jiyan ji bo min û malbata min, yan na ji kesî re nîne_" serwer bû. Netew, gel û welat nînbû.**

**Apê Osman bi welat re bû.**

**Belkî malbata wî ne fireh bû, belkî kesekî wî jî nînbû, lê bi ramanên xwe ve mezin bû. Fikrê mezin gel û welat fikirîne. Welatparêzî heya dawî bi hevrebûne. Ev çawa dibe? Wiha wisa heya dawî bi azadî û serxwebûnê re çêdibe. Tenezil bi ti**

**kesî, ti dewletî û ti dijminî nekir. Mileteke mezin wisa ava dibe. Ji bo wê dibêjim? Ji ber di Kurdan de mirovên bi vî rengî gelek kêmin. Kurd ji ramanên mezin hema direvin, ji giyana bilind zû dûr dikevin. Ji ber vê jî ti tiştek nehiştine.**

**Mirov çawa dikare ji giyaneke wisa mezin dûr bikeve, birastî jî ji bo vê gelek xemgîn dibim. Çima tenê bê hiştin? Lê lewazbûn, hêza wan evqas bû û ketîbûn. Di vî alî de ketine û me ferq nekiriye. Mirin eve. Em nabêjin ev jiyana gelê Kurd e, ev jiyaneke kesî ye. Netewa Kurd xwe çawa winda kir? Bi vê meyzandinê xwe winda kir. Çawa bê giyan hişt? Bi vê koledariyê re ked binî.**

**Hat serê min jî, him jî bi salan. Dijmin dibêje, "*ger tu jiyaneke şexsî bixwazî bila her tişt yê te be; lê na ger tu jiyana Kurdeyatî, serxwebûnî û azadiyê bixwazî tu yê bimirî*. " Bi salan fikirîm ku kîjan jiyan ya min e.**

**Min beriya niha gotibû, ji bo netewek kêm jî be me hewl daye binamûs bimînin. Min got; "*çi dibe bila bibe jiyana ku dijmin ji bo me hilbijartî qebûl neke*. " Pere hebû, rehetî hebû, min qebûl nekir. Min xwe jibîr kiribû. Hevalên me hemûyan xwendin bûn xwedî mûçe, min tengav kirin, bi tenê mam lê min tenezil nekir. Ez deyndarê dewletim, hîn jî deynê min heye, ji 1960-66'an heya roja me ya îro. Dewletek bêmafe. Tevî ku bi tenê mam jî min cesaret kir, mîna Apê Osman. Min li ber xwe da, niha jî wê ew dewlet bê îmanê, ji derveyî vê jî ti careyekî wî nîne.**

**Di vê mijarê de bi tenê bûn, yên din xwe biaqil dihesibînin, me jî mirî hesab dikin. Hevalên li dora min digotin,"*îro sibe tu yê bikevî*. " Piştî min tenê çend kes man. Niha dibêjim; "*mirin ji bo min heye yan jî nîne, ti wateyekê îfade nake*. "**

**Yê ku miriye kî ye? Yên min û yên mîna min mirî dihesibînin kîne? Niha li kîderê ne? Derket holê ku em nemirîne. Min û Apê Osman derxist ku mirin nîne û hebûna nirxê miriyan derxist holê.**

**Yên ku xwe ji ramanên mezin, serxwebûn û rihê azadiyê dûr dixin mirîne. Yên tenezil dikin, yên xwe biçûk dixin, ji bo berjewendiyên biçûk bi dijmin re dibin yek mirîne. Ji ber wê Apê Osman nûnerê jiyaneke mezine. Dibe ku hûn niha min tam fêm nakin, min tenê dihesibînin, ya min wisa ye. Ez Apê Osman heya dawî hewrê dihesibînim û şehîd qebûl dikim. Bi pevçûn, devliken û kêfxweş çû, ji ber vê xemgîn nabim. Hûnê xwe çawa pêş bixin, giyaneke çawa mezin bidin me û hûnê bikaribin barê wî li ser me rakin? Ji bo şehîdê mezin xemgîn nebin, ji bo xwe xemgîn bibin. Hûn ê jî hinek mezin bibin, yan jî**

**mezin nebin? Gelo hûn ê jî bigihin dawiyek bi şeref yan jî negihinê?**

**Heke hinek rêza we ji Apê Osman re hebe, hinek mezin bimînin. Ew çawa 50-60 salî bi tena serê xwe heya henaseya xwe ya dawî mezin ma? Ji wî re nirx dayîn ji bo mirov nirxê xwe jî mezin bikê ye. Yên dibêjin em Kurdin, girêdayî bîranîna şehîdan û Apê Osmanin, bila li jiyana wî ya 50-60 sal ya çawa li ser lingan maye temaşe bikin. Çima hûn wî guhdar nakin û nabihîsin? Yên wisa bi tenê her tiştin. Yên xwe tiştek dihesibînin ne tiştekin. Çima? Ji ber tiştek temsîl nakin. Di jiyana wan de ti nirxek nîne. Bila serê me hemûyan saxbe.**

**Apê Musa:**

**Ronakbîriya Kurd heye. Bi taybet ji hêla têkildarên wan ve çiqas kêm fêm bikin jî, ronakbiriyeke cuda heye.**

**Ji vê re dibêjin ronesans. Ez dikarim ji vê re vê zelaliyê jî bênim: Niha neçare hinek taybetmendiyên ronesansa Kurd hebe. Hûn dizanin ronakbiriya Fransa beriya niha bingehê xwe, di salên şeşsedî de destpêkiriye. Beriya wê hinek akimên felsefê derketin. Piştre jî hinek akimên wêjeyê, dîsa hinek ekolên fikir derdikevin. Daneyên zanistî destpê dike, raperînên şoreşgerî her ku diçe lez qezanc dike û bi Şoreşa Firansa re diteqin. Herî kêm em dikarin qala dîrokîke 200 salî bikin.**

**Şoreşa Rusya di 1825'an de destpê dike û di 1850'î de jî serdema wêjeyê û bizavê destpê dike. Di 1870'î de tevgera mezin ya narondnîk pêş dikeve. Dîsa di 1890'î de tevgera marksîst pêşdikeve. Di1900'î de çêbûnên mezin yên şoreşgerî destpê dike. Ew jî herî kêm 100-150 sal diçe.**

**Eniya Kurd wisa nîne. Tehemûla ronakbîriya Kurd ya rawestandinê**

**nîne. Heke wê di aniya Kurd de her vekirîbûn serbikeve, xilas bike, neçare di wexteke hîn kêmtir de çêbe. Ji ber tundiya tê sepandin, ji zimanê Kurdan bigirin heta jiyana wan ya aborî, ji her hêlê ve kontrol û di bin serdestiyê de tê girtin. Zanyarê me yê birûmet Îsmail Hoca jî qal dike. Dibêje, jiyaneke Kurdan ji mêtingeriyê hîn wêdetir heye. Qetlîamker û cureyê şêwazeke jenoside. Di vê rêveberiyê de Kurd di rewşeke wisa de ne ku nikarin henase bigirin.**

**Ji ber vê sedemê ronakbîriya Kurd û ronakbîriya me divê demkurt bidome.**

**Wê kêm bidome... Yek jî em dikarin bêjîn ku tenê ne nifşên nû, wê yên kevin jî ronî bike? Ez qala mînaka Musa Anter dikim...**

**Belê. Musa Anter mînaka herî bi hêcan ya vê cureyê tê zanîne. Musa Anter, salên dirêj helbest, roman û tiyatro nivîsandiye. Lê her tim hat**

**qedexekirin, bi ti awayî nekarî derxe derve. Herî dawî bi me re ronakbûnek dît, tiştên di xeyalên xwe de çawa ji girse û pêşeng re ragihîne dît û weke xortek zindî bû.**

**Mîna zarokekî, bi dilxweşî bi ser mirinê de çû.**

**Wê misogerî tola wî bê girtin.**

**Min ji İsmail Beşikçi xwend. Nirxandinekî wî heye. Dibêje beriya PKK'ê jî têkoşîneke Kurd hebû.**

**Pêşketin heye. Lê heya PKK'ê qet pêşneketibû.**

**Dibêje; "*tekoşîneke ji bin sifrê yanî ji rewşa negatif me anî heya sifrê*. " Diyareke ku paşeroj fêm kiriye. Xwe rave dike û dixwaze bêje,"*min heya sifrê aniye.* " Rastiye û îsbatkirina tiştên min gotine çêdibe.**

**Niha tişta derdikeve holê eve; hinek netew di nava çend sed salan de û bi gelek bizav û mêlan ve, li dû hev hemû behremendiyên pêşxistine me dem bi dem hemûyan di nava hev**

**de, di carekê de û bi awayeke dengvedanê de neçar bûn ku pêk bînin. Sedema van zextên heyî û daneheva dîrokek nebaş ya sedhezarî me neçarî vê kiriye. Di cihekê de kesayeta min îfadeya vê ya şênbere.**

**Wiha, Musa Anter jî, yek ji welatparêzên herî kevne. Piştî salên 1950'î aliyê wî yê wêjeyî pêş dikeve. Tabî, piştre li hember serdehatinên tund tê bêdengkirin û li cihê wî didin rûnişkandin. Ser xeteke polîtîk, xebatekî naçe, lê hişmendiya xwe ya Kurdîtiyê jî diparêze. Îxaneta ku gelek kesên din ketine nav ew bi temamî narûne nav, her ku fersend dît zindî dibe.**

**Min di 1970'î de wî dîtibû. Em çar-pênc heval bûn, em ji DDKO'yê (Ocaxên Çanda Şoreşgerên Rojhilat) derdiketin. Çalekiyên Dev-Genç'ê hebûn. Digot; "*Zarokno! Ew lihev ketin, em xwe ji vê bahozê baş biparêzin.*" Nirxandinekî wî bi vî rengî**

**hebû. Dixwest zindî bibe, lê DDKO û tevgerên Kurd yên piştre ne xwedî şanseke pêşketinê bûn. Dîsa ya tê zanîn jê re tê gotin li cihê xwe rûne, (ji xwe dem bi dem MÎT wî dibir lêpirsînê û jê re digotin li cihê xwe rû ne). Ew jî her çendî bêqaîl nebe jî, li hemberî rastiyan hinek paşde diçe û li cihê xwe rûdine. Lê di dilê wî de her tim Kurdbûn hebû. Her ku fersend didît bi her şêweyî gav davêt.**

**Pêngava hemleya berxwedana PKK'ê dît û bê esil nêz nebû. Wî anî rewşa xorteke 77 salî û zindî bû. Heta nameyeke wî ji min re hebû; li ser biraziyê wî.**

**Digot; "*Kurê min, tu nikarî li beramberî min bibî leşkerek jî, ez genarelek di xizmeta gelê xwe de me.* "**

**Belê, nirxandineke wî bi vî rengî hebû. Bêguman nêzîkatiyek radîkal dixwestin. Dema ku wî jî ev neda raberkirin, hinek jî serdeçûyîn çêbû,**

**nirxandinekî wî wisa çêbû. Tabî me got; "*Divê em li gorî pîvanên rêzdariyê nêz bibin.* " Piştî hingê bû dostekî baş. Nivîsên rastîbîn weşand.**

**Bû nivîskar û nûçegiyanê herî baş yê Yeni Ulke, Welat û Özgur Gundemê.**

**Beşdarî kongreya HEP'ê jî bibû. Tişta di çapemeniyê de hat peytandin, bi dayîka me re xwepêşandineke wan jî çêbibû. Yekî wisa dilawer yan jî xwedî nirx helwestên wisa girt.**

**Nirxeke pir mezin dida gerîla. Bi misogerî bê esil nêz nebû. Li ser dîn nirxandinên rastîbîn dikir û helwestên wêrek pêş dixist. Li ser Kemalîzmê û polîtîkvanan helwestên pir radîqal pêş dixist.**

**Bi kinahî; di dawiya temenê xwe de, hat rewşa ku jê re milîtan bê gotin. Bêyî ku metirsiyekê jiyan bike, bi şêwaza şoreşgerî nêz bû. Û ez bawerim hatina wî ya herî dawî ya**

**Amedê jî domandina şêwaza wî ya milîtantiyê bû.**

**Hatineke weke bêje; "*Di welatê xwe de bêtirs bimirim...*" Û ez bawerim encameke herî hêja ye. Madem ev çil sale ji bo welat dinivîsî û xêz dikî, elbet wê dijminên wî hebin û tu yê berxwedaniya li hemberî wan jî her tim berçav bigirî. Tu yê wisa binivîsî, ger pêwîst bike wisa li hember mirinê li ber xwe bidî.**

**Hizbulkontra kuştiye, polisan kuştiye ev zêde negirîngin, hemû di çarçoveya heman dewletê de ne. Li Amedê nîvê dewletê Hizbullahe, nêvî polise û nêvî jî leşkere. Yanî nêvî veşartiye, nêvî vekiriye; di nava hev de ne. Ji ber vê divê dewlet ji derveyî vê neyê dîtin.**

**Îro bûyera dibêjin "*hizbullah*" jî bi temamî dewleta ku êrîş dike ye. Her çibe jî, hizbillah bi xwe jî be ew, dijmineke Kurdistanê ye. Ew hewldana wî ya herî dawiyê ku beriya**

**sedsalan li ser navê dîn welat anîne vê rewşê. Hatina wan hêzên reş ya li ser yên Kurdistanê bilêv dikin, li ser Kurdistanê diaxivin û ji bo rizgariya wê xwe feda kirine, dide nîşan ku hêzeke tarî di wir de heye. Herî kêm bi qasî Kemalîzmê, malwêraniyeke wan jî li ser Kurdistan û rastiya Kurd –ku serê wan digihije kûraniya serdeman- heye. Di dahûrîna dawî de divê ligelhevbûna emperyalîzim, metingerî û paşverûtiya xwecihî weke êrîşekê bê nirxandin. Di vê mijarê de pêwîste neyên xapandin. Û tu welatparêzeke herî ji rêzê jî bî, dijminê xwe baş binase, li gorî wê bijî. Yê ku dijminê xwe neyîne ber çavê xwe nikarin welatparêzî û hevgirtinê pêş bixin yan jî wê gafîl bên girtin.**

**Em, ji bo vî nivîskarê xwe yê binirx nikarîn bêjîn"*gafîl hat girtin.* " Berevajî em dibêjin şehîdê li gorî pêwistiya nirxên welatparêziyê ye.**

**Şehadet heq kiriye.**

**Di şêwazê Apê Musa de, girêdana wî ya bi partiyê re teqez bû.**

**Bersiva herî baş ya em ji şehîdên xwe yên di eniya şer de ne bidin, rastîbûn nêzî derdor bûyîne û bi şêwaza şoreşgerî bersiv dayîne. Bi teqezî him bîranînên wî bi pêşveçûna şoreşgeriyê re anîna cî, him jî ger hebe lewaziyek, windahiyên wan yên zû, bi nêzîkatiyeke şoreşgerane re bersiv dayîn û serkeftin ancex dikare bi vî rengî misoger bibe.**

**Li ser vê bingehê li ser navê Özgur Gundemê ji bo bîranîna şehîdên wê xebatê jî dibêjin em soz didin em ê hîn zêde girêdayî bimînin û pêwîstiyên wê bi awayeke bihêz bicî bînin.**

**Avakerên xweşikbûnê**

**Di derbarê ronakbîriya Kurd, ronesansa wê yan jî vejîna wê de, kesên weke Osman Sebrî, Musa Anter jî bêguman hêjayî bibîranînê ne. Danahevên girîng yên ku pêwîste em wateya wan baş derxin zanebûnê û hewl dane di kesayetên xwe de kêm zêde Kurdeyatiyê pêş bixine. Bêguman mînakên dişibin wan hene. Em dikarin van li hemberî belaya Kemalîzmê û komarê, ya ji bo Kurdan mîna nirxên berxwedaniya vê pêvajoyê ye bibînin.**

**Çima ev serdem ji bo Tirkitiyê bû serdema ronakbiriyê, lê ji bo Kurdan kirin serdemeke tarîtiyê?**

**Yek jî ji vê hêlê ve, ev serdem danîna holê mûmkûne. Bi rastî jî her çiqas neteweya Tirk di şêwaza çîna serdest de be, gelek şoven û di şêwazek destbixwîn de be jî, em dikarin bi hêsanî bêjin ku ronakbiriyeke pir alî jiyan kiriye.**

**Û di wateyek de ronakbiriya Tirk, ji bo Kurdan dibe pêşketina tarîtiyê, dema em dibêjîn "hareketa betonkirinê" tê wateya Kurd xistina gorê û hiştine bêhn bidin û bistînin. Gelek îzahên vê hatine kirin. Bi taybet yên ku îda dikin rewşenbîrin, pêwîste baş têbigihin ku yên ji derveyî rastiya PKK'ê jî dimînin û yên derveyî bandora wê jî dimînin rewşeke gelek çewtî jiyan dikin û ji derveyî rastiyê tevdigerin.**

**Bêguman PKK, dîrokê ji xwe destpê nake. Lê îro ne gengaze ku bê PKK, qala neteweke Kurd û ronesanseke Kurd bê kirin. Gengaze ku di dîroka me de bi awayê teorik qala Kurdeyatiyê bê kirin. Dîsa di warê kes de kesayetên li ber xwe dane hene. Lê xwe anîna rewşa tevgerek û radeya netewek, wexta ku ji eşîretbûna teng û feodal xilasbûn dibe mijara gotinê û tu bi findê jî lêbigerî nabînî. Divê mirov rasteqîn**

**be. Heke tê xestin ku nirxê ronesansa Kurd bê zanîn û paşeroja pir zêde tê xwestin lê pêknehatiye yan jî divê ji pirsa ya sernekeftiye çiye re, bersiv bê dayîn. Em hîn fêm nakin ku di nava neteweyatiya Tirk de me anîne çi rewşî. Îro qurbanên qetlîamê di nava netewa serdest de amûrên herî baş tên bikaranîn. Nirxên netewa Kurd, herî zêde veguherandine nirxên netewa Tirk û xizmet pê dane kirin. Bêguman ev, feraseteke netewa Tirk'e.**

**Divê em vê bêjin ku, di netewparêziya Tirk de kêmnetewên din ên ji cewhera wan hatine dûrxistin para wan çiqas mezin be, para Kurdên ji cewhera wan hatî dûrxistin jî ewqas girînge. Biqasî berdêla hemûyane. Bi taybet di dema cumhuriyetê de çi tişta li ser navê nirxên netewa Kurd hebe, li ser wan talan û qetlîam esas hatiye girtin, bi awayeke xayînane şikestina nirx re rû**

**bi rû hiştine. Ev di wateya hunerî û ramanî de şikestineke bihêze. Huner bi taybet jî kesên bijare yên di qada wêjeyê de bi koka xwe Kurdin. A rastî di vê mijarê de pêwîstî bi nirxandineke berfireh heye. Mînak, ne tesadûfeke gelek wêjevanên Tirk bi eslê xwe Kurdin. Ji bo bibe wêjevaneke xurt yê Tirk divê hinek jî koka xwe Kurd be. Ev, hinekê jî bi mantiqê pêkhatina KT'yê ve girêdayî ye. Di pêkhatina mantiq de ji Tirkekî re şansê bûna wêjevanek baş daye. Ya ji wî re hatiye dayîn; mîsyona dîroka fermî bi awayeke pir şoven dayîne dubarekirin.**

**Yê ku dîroka fermî, çanda fermî evqas dubare dike, nikare bibe hunermendeke baş û dengê bi bandor yê ti demê. Ji Ermeniyan, Ruman û Kurdan berhev dike. Sedemên vê eve: Ev gelên bindestin. Di hest û ramanên kesên gelên bindest de, serûbinbûnên zêde, êş, azar û qutbûn heye. Ev**

**bingeha hunerê ye. Û her wiha derketina huner û pêşketina wê jî bi van kesan re çêdibe. Di Tirkan de bi navê hunerê tişta digihînê jiberkirina komarê ye. Nemaze vê bi hemû nirxên xwe yên şoven ve bi her kesî dana jiberkirine. Ji ber vê jî huner naxive. Ya rastî huner, divê hinek muxalifê dewletê be û rexneker be. Di vir de pêwîste bi temamî rêxistinî be. Li vir bi temamî nexweşkirin û bi bişaftinê re her tim şibandina xwe: Erka nivîskar û îdeologên komarê eve. Hinek muhalîf û rexnekerbûyîn jî ji kesên bi koka xwe kêmnetewin re dimîne. Keseyetên çandî yên ji netewa bindest, ji ber ku hêza wan têra têkoşîna siyasî nake qada siyasetê diterikînin. Rexneya siyasî, rêxistin û çalekî, cihê xwe ji rexneya wêjeyî, çalekiya wêjeyê û rêxistinkirina wêjeyê re dihêle.**

**Bi rastî jî di muxalîfbûna Kurd û rexneya Kurd de peytandinek bi vî**

**rengî heye. Di cihekê de reseniya wê înkar dike yan jî kokena kêmnetewan vediguherînin şêwaya wêjeya Tirk û bi navê parastinê şêwazeke bertekê pêşdikeve. Em bêjîn nifşeke Kurd yê renşenbîr? A rastî rewşenbiriya wê jî di nîqaşê de ye. Ji ber wan weke rewşenbîrê Tirk dizanin. Dibe bi eslê xwe Ermenî, Rum, Kurd, Erep yan jî Çerkez be. Ya rastî hêjmareke kêm Tirk'e. Bawerim hinek jî dewlet ji vê re destûr dide. Yanî dibêjin; "*li ser bingeha înkarkirina rastiya xwe dikarin wêjeyê bikin, ji vê re destûr heye, tenê siyasetê nekin*" ew jî bi vî rengî vê qadê bikar tînin. Em, dikarin ji ronakbiriyeke bi vî rengî re rexneyan bikin.**

**Dema em tên ser rewşenbîrên Tirkan, îro tê dîtin ku erkên wê yên bingehîn ne anîne cî. Ev heya bêjî çawaniyek nebaşe. Di warê çandî de alîkariya wan ji netewa Tirk re heye. Lê alîkariya wan ji bo rastiya Kurd,**

**Rum, Ermeniyan sînordare. Belkî di asta çend tîplemeyan de navê wan derbas bibe, ewqas. Mînak, ji Kemal Tahir bigirin heya Yaşar Kemal. Ji Ruhi Su'dan bigirin heya Yilmaz Gûney em dikarin di vê çarçoveyê de gelek mînakên mîna van binirxînin. Lê qetlîama mezin û di pişt wê re di serdema asîmîlasyonê de Kurd çi îfade dikin? Ger ku berxwedaniyek hebe, ronakbîriyek hebe, ev tê çi wateyê? Divê hinek jî li ser van pirsan bê fikirandin. Komar bi rastî jî bi qasî ku dîrok nas dike tevgereke herî barbar, qirker ku Hîtler jî li pey xwe dihêle ye. Ermenî û Rum'an ji vê tevgerê para xwe girtine. Kurd jî bi jenosideke hîn bijan re rû bir û hiştine.**

**Berdin ronakbiriyekê jiyan bikin, jenosîdekê jiyan dikin. Yanî ji zext û mêtingehkirinê wêdetir, hûn dikarin ji vê re bêjin qetlîama rejîma netew jî. Belê, dikarin ji vê re bêjin qetlîama**

**rejîmê. Qetlîam tenê di warê fizîkî de nayê meşandin. Hişmendiya wê tinekirin û bi vî rengî anîna rewşa termek wisa hiştin yan jî anîna rewşa amûrek erzane. Em bi tahrîbateke bi vî rengî re rû bi rû ne. Her wiha yên ku dixwazin rastiya Kurd a vê demê lêkolîn bikin, neçarin bi baldarî binirxînin. Bêyî ku hişmendiya rastiyê hebe, nemûmkûne qala raperînek bê kirin. Û ya heyî jî wê bibe sextekarî û çelexwarî. Ji xwe ya heyî jî hinekê eve. Divê destpêkê navê rastiyan baş bê dayîn.**

**Di derbarê neteweya Kurd de vegotinek bi vî rengî heye dibêjin; "*me wisa îsyan kir, me wisa bi qehremanî li ber xwe da*. " Ger ku ev wisa bûya pêwîst bû tiştek di pişt de bima. Yên mane gelek sînordarin û ji çûyîneke serberjêrkî re xizmet dike.**

**Ya rastî berxwedanî heye. Lê gelek lewaze û ji ber gelek bê parastine, kuştinên gelek çewsîner**

**dikin. Kuştinên çewsîner jî ber bi xulamên gelek xirab, teslimiyet û ecibandinê ve dibe. Di Dêrsim û îsyanên din de tişta hat jiyîn eve. Berxwedaniyek lewaz, aliyê dijber bihêz dike û wê tîne rewşa amûra herî xirab. Taybetmendiyeke bi vî rengî ya îsyanên me heye. Pirtûkeke bihêz ku wan biparêze nehiştine. Bi taybet divê rewşenbîrên me li ser vê baş lêhûr bibin.**

**Kesayetên mîna Osman Sebrî, Musa Anter û Cigerxwîn, di vê pêvajoyê de hinek şerevanî, bi şêwazeke mîna şovalyayên serdema navîn berxwedaniyeke kesî kirin û ew mînaka li ser lingan mayînê ye. Lê wan vê pêvajoyê çiqas anîn ser ziman ew jî mijara nîqaşê ye. Kêm-zêde min jî van kesayetan hinek naskir. Osman Sebrî, di 1925'an de ji îsyanê bandor dibe li hember Kemalîzmê derdikeve. Heta li van deran weke me, dixwaze wisa bi mûfrezeyek ve biçe, alîkarî bi**

**îsyanê re bike, heta ku îsyan didome. Lê dibêje; "*Min hezar kesî da pey xwe çûm Pirsusê, min li wir temaşe kir ku li pişt min kesek tenê jî nemaye.*"**

**Cigerxwîn ji Gercûşê, Musa Anter ji Nisêbînê hatine; lê tenê karîne bi lênûs û helbestên xwe ve li ser lingan bimînin. A rastî siyasî bûn. Heta çalekvan bûn. Lê rêxistin avakirin, berxwedanî bihêzkirin -ji bo biçûk xistina van nabêjim- tevî mêrxasiya wan ya mezin jî hêza wan têrê nake. Herî dawî qadeke wêjeya Kurd dimîne, qada ronakbûnê dimîne û li wir Cigerxwîn ser helbestê de diçe. Di vê wateyê de hewl dide bêhneke Kurd bigire, dîsa Musa Anter jî wisa ye. Ew jî ser wêjeyê de diçe, ew jî dixwaze behnek bigire di nava van serdemên tarî ya bê eman de. Osman Sebrî hîn bi rêgeze, hewl dide girîngî bi lênûsa welatparêzî, helbesta wê, zimanê wê û çanda wê bike. Xwe hinek bi hawirdora xwe dide hîskirin. Bi**

**misogerî ev ji kesayetên noker cuda ne. Bi taybet ji kevneşopiyên PDK'ê pir cuda ne.**

**Beriya PKK'ê, PDK'bûn hebû. Di çar parçeyan de hewl tê dayîn PDK'bûnê ava bikin. Lê bi temamî li beramberî Kurdeyatiyê çêdikin. Dixwaze xwe weke rêxistineke welatparêz bide nîşan. Lê piştî demeke pir kin ev rêxistin dibe xefika welatparêziyê. Û ev kesayet bi awayeke lez ji van rêxistinbûyînan qut dibe.**

**Osman Sebrî gelek zû qut dibe dibêje: "*Ger ku Barzanî min girtiba wê min kûştiba*. " Dîsa Cigerxwîn jî zû qut dibe. PDK'bûnek Musa Anter zêde nîne. Çi derdikeve holê? Xwestine bixwe li ber xwe bidin, lê serneketine, zehmetî kişandine. Wê demê PDK rêxistina herî bi bandore, lê pêwîstî dibînin ku jê qut bibin. Ji ber nokerin, di bin bandora dewletê de ne û bi vî**

**rengî bi derfetên pir teng û kêm ve hewl didin bibin"*Dengê Kurd*. "**

**Belê, "*Dengê Kurd*!"**

**Mirov dikare pirsek wiha bike, ma van çi xilas kirin? Dane hîskirin ku ziman û çanda Kurd nemiriye. Û ya herî girîng jî li hember êrîşên komarê yên herî mezin, teslîm nebûne, weke welatparêzeke li ser lingan mayîn serxistine. Lê ev hemû, nabe aksiyoneke siyasî ya bihêz. Nabe çalekiyeke siyasî û rêxistinbûnek. Rê li ber bitenêbûna wan vedike. Ya rastî divê tenêbûna van baş bê nirxandin. Tevî hemû daxwazên wan yên xizmetkirina netewekê jî, di nava tenêbûnê de mayîn pêwîste bi baldarî bê nirxandin. Ev rewş pêdivîtiya asta netew dide nîşan.**

**Ya rastî ev weke wêjevanên bihêz tiştên ku pêwîste bikin nakin. Ji ber dema bingeha netew û berxwedaniya şoreşgerî lewaz bibe, wê wêjevaneke bihêz jî dernekeve.**

**Wisa dixwazin. Ew jî çewt û kêm dimîne. Bi vî rengî bêjin bextreş, yan jî nifşeke lez, yanî weke dengê wê demê dimînin. Ronakbîriya Kurd di wateya bêhnberdanekî de dibe ku bixwazin hînekî jiyan bikin. Lê bêşansiyeke bi vî rengî heye. Ji ber tevgereke bihêz ya netew-demokratîk nebû û dema wan demeke tarîtî, qetlîam û pişaftinê bû; berxwedaniya wan ya mezin rê tenê li ber bandoreke sînordar vekiriye. Heke merc dest dabûya dibe ku wêjevanên mezin derçûbûna. Dibûya berxwedanvanên mezin jî bûna. Heta hinek serokên siyasî, leşkeri jî dibû ku di nava vê nifşê de derketiban. Her wiha gelek endamên bi vî rengî jî hene. Vaye İhsan Nuri, di çiyayê Agirî de zêde pêşveçûn neda nîşan. Ber bi Îranê ve terikî. Elîşêr, tevî hemû welatparêziya xwe, ji qetilkirinê rizgar nebû. Nuri Dêrsim hebû; "*tevî***

***ah-vahên*" wî jî bi tena serê xwe li warên dûr mir.**

**Ez bawerim ji vî nifşî gelek mirov hene. Ev serdem tenê hêvîkirin û di pratîkê de pêşveçûnek bidest nexistin.**

**Niha em di zanebûna van de ne. Me van mînakan hemû, bi taybet di vê qadê de yên ku ked dane biqasî ku nebînin ne înkarkerin, lê zêde ji qalikê wê derxistin jî hewce nake. Me nirxandinên xwe herî zêde li ser PDK'yiyan pêş xist. Ji ber yên li pêşiya pêşveçûna netew-demokratîkbûnê digirin, rêya wê ya noker, feraset û zemîna wê ya çîni bû.**

**Qaşo netewparêziyê dikin, lê tiştên bi netewebûnê re eleqeya xwe nîne, di rizgariya netew de şêwazê nokertiya Kurd ya sexte didin meşandin. Rastiya welatparêziya Kurd bi hêzên îstixbaretê yên mêtîngeh re dibin yek û şêwazê Kurdîtiya ku difetisîne derdikeve holê.**

**Gelek tîpên wê yên bi deq navend tijî kirine. Kurdeyetî, demek dirêj di destê van de maye. Şêvazeke Kurdeweriyê ya gelek xetere. Ew mînakên ku me hêjmartine, li beramberî van sekinîne û ev gelek girînge. Li beramberî van îsyan kirine, têkiliyên xwe qut kirine û cudabûnên xwe danîne holê. Lê ji ber saziyên dewletê yên veşartî dane pişt xwe, ev kesayeta KDK'ê yê noker heya bêjî bi bandor bûne. Yên li hemberî me jî nêzîkatiyên herî zêde xeter û ziyanê didin ev hêzên xwedî vê bingehê ne. Lê ger ku wê qala ronakbîriyeke Kurd, ronesanseke Kurd û berxwedaneke Kurd bê kirin, ev di dema PKK derketî de dîtin wê ya herî rast be.**

**Di komên din yên çep de, yên ku îda dikin siyaset kirine, partî avakirine hene. Rêza min heye, bila bidomînin, bi izna xwedê wê pêş bikevin. Lê wisa polîtîka kirin, partiya wê avakirin kareke wisa hêsan nîne,**

**di vê mijarê de heta bêjî divê realist bin.**

**Ez teknîka polîtîkayê jî ewqas girîng nabînim. Polîtîkbûna Kurd çiye, siyaseta Kurd çiye û siyaseta partî çiye? Ez li ser vê pir zêde disekinim. Lê ji aliyekî ve tu ji ber deriyê Anqarê ji parsektî kirinê wêdetir naçî û ji aliyê din ve jî ji min re bêjî "*ev polîtîkaya Kurd e.* " Ev ne helwesteke raste. Di parlamentoya Anqarê de jî polîtîka kirinê fêm dikin û dîsa ez dizanim ku li wir pêwîste li ser navê miletekî çibê gotin. Lê bingeh û cewherê vê jibîr bike li pey berjewendiyên xwe bibeze, yanî ji vê re jî bêje; "*polîtîka Kurde*" şermeke mezine û ez neçarim ji vê re bêjim xwefiroş ango noker û xulamtî. Di cihekê de polîtîka kirin, mirina xwe dana ber çavê xwe ye. Bi vê zanebûnê ve, ger em ne xwedî vê wêrekiyê bin, ez ê bêjim em nakevin xefleta ku bejim;"*bibim***

***siyasetmedarê Kurd*. ” Gelek siyasetmedarên bi vî rengî hene, lê di van de yê herî noker û kesimên herî dûr ava dikin. Niha jî ev, yek ji hedefên me yê herî girîng û sereke ye.**

**PKK ji îdeolojiyê, siyaset û leşkeriyê zêdetir li vir tişta bê diyarkirin; ji bo rihê netew, hişmendî û kesayeta wê ya çandî çi pêwîst dike û di vê mijarê de baş nayê fêmkirin. Bi misogerî teqandineke Kurd û ger wê serdem û kesayet bê gotin niha ji bo pêşketineke bi vî rengî govaniya me mijara gotinê ye. Yê dixwaze dikare binirxîne.**

**Tişta em dikin eve:**

**Em bejin Kurdek an jî kesîmek mirovahiyê, bi navê miletekî li van çiyan an jî li quntarên van çiyan hewl didin bijîn, tevgerek lêgerîna nasnameyekê, kesayetekê ye. Di welatê Mezopotamya de, di quntarên Toros û Zaxrosan de berxwedaniya**

**hinek mirovan heye û wê encama çanda van bi awayeke balkêş derbikeve holê. Wê berxwedaniya wan ya li hemberî îşgal û îstîlaya li vir tê meşandin, bi misogerî wê ji hêla mirovahiyê ve wateya wê bê dîtin. Bi qasî aliyê wê yê netewî, wê ev aliyê wê yê din jî xwe bide hîskirin.**

**Pêşveçûna ku me daye nîşan; wê Tirk, Ereb û Fars bide ber lêpirsînê. Anti-demokratîzma wan, şovenîzma wan ya netewe, heskî bila di warê olî de be, heskî di warê netewî de be; wê ew bêmafiyên herî mezin ku ferz dikin û sepandinên ji derveyî mirovahiyê didin meşandin lêpirsîna wan bê kirin. Ev pêkan hemû ji alîyekî ve jî dihat wateya ji nû ve zindîkirina hûmanîzma di Rojhilata Navîn de mezin dibe. Hûmanizma, pêşketina mirovî ye. Di vê wateyê de wê berxwedaniya Kurd û Kurdistanê bi hûmanîzmayê re têkiliyeke xwe pir xurt çêbike. Mînak, tê gotin ku Şoreşa Fransa tevgereke**

**mezin ya hûmanîzmê ye. Raste. Hemû netew û mirovahî bandor kiriye. Şoreşa Fransa, herî zêde di çarçoveya têkiliyên hilberînê yên kaptalîzmê de, bi pêşverûtiya navend Ewrûpa esas girtinê re wekhevî, biratî, azadî û gelek nirxên mirovahiyê yên dişibin vê belav kiriye. Şoreşa Cotmehê ev hîn zêdetir kûrtir kiriye. Di mijara azadiya netewe, wekhevî û mafê kedê dayînê de pêşveçûnê temsîl dike.**

**Rastiya berxwedaniya Kurd jî ji vê asta temsîla fermî re bersiveke û li hember derketineke mezine. Her wiha rakirina van, tê wateya derketina hûmanîzma gelên Rojhilata Navîn. Û ev jî, tenê ne ronakbîriya Kurd de, di asteke girîng de ronakbîriya hemû gelên Rojhilata Navîne jî. Di nava vê ronakbîriyê de Rojhilata Navîn ji vê re malavanî kirinê re rû bi rû ye. Ji ber hemû normê mirovan di vê erdnîgariyê de teşe girtiye. Beriya vê, nivîs, leşkertî û hinek jî siyaset ji vir**

**derketiye û gavên xwe yên yekem avêtine. Di rastiya Kurd de, carekedin bi şoreşekê re xwe dirêjî rabûrdû û vê rastiya ku bi qasî dîroka mirovahiyê kevnare dike. Em dibêjin ku polîtîkayeke pir hov dikin. Lê ev di heman demê de, polîtîkaya herî bi rêgeze jî. Em bi tarzeke pir paşketî şer dikin, lê ev di dema destpêkê ya bi leşkerbûnê destpêkirî ve tê îfadekirin. Yanî bi qasî dîrokê kevne, lê ji bo bibe ya herî baş jî berxwedanî û şervantiyeke baş dihewîne. Her wiha wisa tê dîtin ku wê humanîzm û ronakbîriya wê gelek berfireh be. Ger ku berxwedanî serkeftinê qezenc bike, berevajî cewherê xwe nekeve, aliyên xwe yên girêdayî mirovahiyê bi azwariyeke mezin biparêze pêş bixe, yê ser bikeve wê bibe kevneşopiya Kurdistan, Ereb, Fars, Tirk û wê li hember şovenîzmê serkeftinek çêbibe. Demokrasî, derxistina hêza gelan a holê, yekbûyîn û piştevaniya**

**wane. Di cihekê de şaristaniya Mezopotamya, şaristaniya Stenbol, şaristaniya Misrê, şaristaniya Fars, heta şaristaniya Anatolya yê wê li ser bingeheke hîn bihêztir qezenc bike. Em dizanin ku, ev ji hêla ronakbîriya nû ve jî gaveke girînge.**

**Dema em tên ser Kemalîstan, her çendî di îdayên wan de bêjin ku "*em jî tevgereke ronakbîriya Anatolyêne*" li gorî min berevajî vê gotinê hîn rastire. Rewşeke wan weke kabûseke ser şaristaniya Anatolyê de hatin heye. Bi şovenîzmeke Tirk ya balkêş ve şaristaniyên Anatolyê gelek berevajî kirine û rastî ji cewherê wê derxistine. Her wiha em nikarin etîketeke ronakbîriya mezin bi Kemalîzmê ve bikin. Heta neteweperestiya Ereb jî di roja me de şaristaniya xwe çendî temsîl kirine hêjayî destgirtinê ye. Şaristaniya mezin ya Îranê jî bi rejîmên xwe yên**

niha ve çendî temsîl kirine jî hêjayî lêpirsînê ye.

Şoreşa Kurdistanê jî di vê lêpirsînê de gelek bi îdaye. Dikare li ser navê gelan îrade û dîsa li ser navê gelan elternatîf derxe holê. Em mûbelexe nakin, lê ger îsrar bê kirin, berevajî rêgezan nekeve, şoreşa xwe bi awayeke pir baş belav bike, bi misogerî wisa mezin fikirandin jî divê bê zanîn. Tabî ev jî mijareke çandê ye. Serokatî mijareke pêşketina siyasî, leşkeri û rêbertiyê ye. Mesele, meseleya hestên mezin û fikirandina mezine. Mesele xwe dîrêjî dîrokê kirine û pêşerojê bi asoyên teng negirtina deste. Ger ku pêşketin li ser vê bingehê çêbe bêguman wê ronakbîrî jî muhteşem bibe.

Weke ronakbîriya Fransa yan jî weke ronakbîriya Rus, ma em çima ronakbîriyeke jiyan nekin?

Bingeha wê ya dîrokî heye û bi awayeke rojaneyî jî belavbûna şoreşê

**ji bo bêriyên civakan guncave. Polîtîkaya wê, leşkertiya wê û ger rihê wê yê xebatê jî wisa bitendûrist bimeşînin, bêguman wê pêşketin jî wisa mezin bin. Divê ji van cuceyan û xalên tarî xilasbûn çêbe. Divê xwe ji zincîrên lewaz yên weke malbatî-qebîle, bermayî-tortiyan rizgar bikin.**

**Di vê mijarê de PKK di nava têkoşîn û milîtantiyeke mezin de ye û Rojhilata Navîn dide fikirandin. Dihizire û siyasetmedaran jî dide hizirandin. Hinek di nava nêzîkatiyên dostanî, hinek jî di nava nêzîkatiyên dijminatî de ne,- em Ewrûpa û heta ABD jî daxîl dikin-bi girîngî xwe ditewînin. Dide diyarkirin ku me kar pêşde biriye. Hîn ji niha ve eleqedarbûna evqas derûdor, dide diyarkirin ku wê tevgera li ser zemîneke baş rê li ber encamên cidî veke. Her wiha pêwîste ev berxwedaniya ku giraniya xwe Kurd û Kurdistane divê baş bê nirxandin. Bi**

**qasî taybetmendiyên netewe, aliyên wê yên mirovî, dîsa biqasî di derbarê kes de, di derbarê aliyên wê yên veçêbûna civakî de jî bi baldarî û di nava hev de bê amadekirin, dê ev hêza wê ya îdayê jî îfade bike. Em baldar nêzî vê dibin. Lênûsên ku dixwazin binivîsin, yên ku dixwazin vê serdemê binirxînin divê hinek bi rastiyê ve û bi rastiya şoreşê re pêwendîdar bin.**

**Yên ku dixwazin hestewar bin divê hinekê dilê li vir bizanin bibihîsin û pêwîste bi misogerî ne sexte û xapînok bin.**

**Misoger giyana di PKK'ê de mezin dibe. Giyana di PKK'ê de bilinde û biwêreke. Di mijara serkeftinê de îdaya xwe heye. Em vî bi kesî nadin binpêkirin û berevajîkirin. Dibe ku, şehîd tam nehatibin vegotin; dibe ku çalekî û jiyanên wan tam negihabin îfadeyek wêjeyî, lê ev nayê wê wateyê ku dê**

**her tim wisa jî bidome. Her wiha bi ti awayî ne zemîneke ku kesên bê bingeh, bê binyat û çewt li gorî keyfa xwe bikar bînin, bigirin li ser zimanê xwe yan jî pênûsê bigirin destê xwe û reş bikine. Yanî bingeheke wê ya bihêz heye. Ez di wê baweriyê de me ku wê roj bê dê ya herî xweşik bê nivîsandin û li ser wê mirovahiya herî xweşik bê avakirin. Wê siyaseta wê jî bê kirin, leşkertiya wê jî bê kirin, wêjeya wê jî bê kirin û mizûka wê jî bê kirin. Zemîna wê heye, li benda xwedîlêderketinê ye. Ji niha ve derdikevin. Ji xwe weke min gotî, ji ber em her tim hewl didin zemîna wê bihêz bikin wê hîn zêdetir jî di dema pêşiya me de derbikevin.**

**Ya rastî wêje û huner beriya şoreşê tên kirin. Lê mixabin di me de ev derfet nehatiye hiştin. Hinek dengên pir lewaz, qels û qêrîn çêbûne, lê derfet ji vê re nehiştine. Me hewlda em şoreşê bi rêbazên**

**gelek balkêş û curbecur ve pêş bixin. Her wiha wêje, piştî vê demek şûnde dikare bi awayeke bihêz pêş bikeve.**

**Diyare wê mantiqê wêje û diyalektîka wê di me de wisa pêş bikeve. Hemû aliyên din yên hunerê, bi taybet aliyên wê yên bixe nava netewên din jî, wê bi demê re derkeve holê. Em ê vê ji şoreşên gelên cîran re (di rojên pêş de hîn zêdetir bandor bibe) bihêlîn. Û bawerin wê pêşketinên hîn baş û dewlemend derbikevin holê. Tenê ne hareketeke îdeolojîk, siyasî, leşkeri, tevgereke mezin ya dil, ya çand, ya kesayet û ya hest nirxandin bi vî rengî wê wateya xwe bidest bixe. Li ser wê bingehê, her roja ku derbas dibe wê dewlemendiya wê bê fêmkirin û nirxandin. Bi taybet artêşa wêjeyê, artêşa çandê û artêşa giyanek bihêz jî wê li dû hev bê. Wê hemû xulamtî, kirêtiya encamên wê û ketîbûna kes derbas bibe. Li şûna wê dê mirovê**

**herî xweşik û hestewar bikaribe derkeve holê. Bi kinahî wê fonksiyona huner çêbe û rola xwe bilîze.**

**Herî kêm biqasî çalekiyeke gerîla ronakbûna milîtan jî pêwîst dike. Niha îdayeke ku pirole bibe nîne. Berdin rewşenbîr û wêjevanên Kurd pêvajoyeke bi vî rengî binirxînin, hinek berhemên edebî derxin holê, heta nikarin nêzî pêvajoyê jî bibin. Ez zêde texmîn nakim ji kesayet û rihê wan berhemek zêde derkeve holê. Lê huner navê çalekiya mezine. Bi misogerî ez ji hêza wê bawerim. Divê derkeve.**

**Avakerên hest û xweşikbûnê jî herî kêm bi qasî avakerên şer binirxin.**

**Û ji xwe girêdana wan gelek zêde bi hev re heye. Yê ku hemû xweşikbûnan di kesayeta xwe de kom neke, nikare bibe fermandar û têkoşerek bihêz. Dîsa yê ku hemû aliyên qehremantiya têkoşerî di dilê**

**xwe de raneke nikare bibe wêjevanek bihêz û hunermendek bihêz. Divê diyar bikim ku di navbera wan de girêdaneke pir xurt heye. Ya ji me re dikeve girêdana di navbera wan de her tim weke merceke pêş lê zêdekirine. Ya em dikin, ev zemîn paqij girtine. Ya rastî weke min her carê gotî ez ne li fermandar-serokeke baş, ne jî wêjevan-hunermendeke baş temaşe dikim. Lê di mijara zemînê wê paqijkirinê de bi îdame.**

**Lenîn ji vê re digot, paqijkirina govê. Belê, ez her tim govan paqij dikim, hewl didim dilan paqij bikim. Em dixwazin dilan tûjkin û bidin tûjkirin. Ji bo hinek bikar bînin.**

**Ji ber xizmetên mezin hene. Bûyerên wisa hene ku mirov dibehetînin, lê nayên bihîstin. Ji ber dilê bûne qîr. Ez pirsgirêkên şer wisa fêmbar dikim ku, dibe fermandarên yeman derbikevin. Lê heta pêwîstiya eleqedariyê jî nabînin. Hinek rewşên**

**ku bibe mijara çend destanan derketiye holê, lê heta nêzî wê jî nabin.**

**Vaye, dildariya me ya yekbûnê.**

**Em çendî li ser yêkitiya rêxistinî disekinin?**

**Li ser kesayeta bihêz, tipê serokatî çawa û çiqas disekinin?**

**Û ez xwe weke ku pratika Ehmedê Xanî dikim dibînim.**

**Me çi dît, me çi îspat kir?**

**Belê, piştî tepisandina wê îsyanê şûnde dijmin li ser çiyayê Agirî digot; "*Kurdistan li vir veşartiye.*"**

**Û em jî carekedin ji wê gorê serê xwe radikin.**

**Em dibêjîn; "*li cihê te kuştiye wê vejîn bibe*", "*li cihê te binax kiriye derxînin*. " Ji vê re jî kedeke mezin didin raberkirin û çi derdikeve holê? Derdikeve holê ku dibişkivin. Hatiye şewitandin, çîmen hatine ziwakirin û wêran kirine.**

**Vaye, ya dibe bişkivînek nû ye. Wêje wê wisa pêş bikeve. Di mijarên teslîmkarî û hevkariyê de mezinbûna wêjeyê dernakeve. Dileke ku çûye teslîmyet û hevkariyê wê ti carî nikaribe hesteke xweş û hevoka wê bicî bîne. Hemû kirêtî û ketîbûne. Ti carî nikare evînê bijî.**

**Hûn bawer dikin ku gelek evîndar dibin, dibêjin em xwedî kesayetên tijî hest-heskirinê ne. Ez biçûk dibînim. Hemû bi qusur û hov dibînim. Li gorî min kesayeteke ku evqas ji dîroka xwe, çanda xwe, lûtkeyên çiyayên xwe û mêrxaziya wê tirsabe wê hestên wan nebe. Berdin evînê, em dinirxînin ku ev rezalete û nexasim têkiliyên wan her tim ketîbûne û xirabûne.**

**Di mercên teslîmyet û sertewandinê de hest û evîn nîne.**

**Dema hest û evîn nebe wêjevantî û hunerkarî jî nabe. Ji rewşenbîrên Kurd re vê dibêjim. Hemû ketiyê**

**pîrejina ne. Ji dêla ketîbin ger hinekê hewl bidin rihê xwe bibînin, rih çiqas hatiye xilaskirin. Ger ku tu dilê xwe biqasî çiyayê Agirî rast nekî û (tabî ev bi mêrxasî û şervantiyê re gengaze) vê nedî raberkirin, gelo wê tu wêjeya çi bikî? Ez niha dîsa naxwazim bêm ser rewşenbîrên Kurd. Ji ber a rastî jî gelek nazik û qediyayî ye. Lê dîsa bila bi wêrek bin. Qet nebe bila me bibihîsin bi wêrek bibin.**

## Heta Ku Evîn Neyê Bidestxistin Mirov Nabe Wêjevan

**Bi giştî wêje û di roja me ya îro de pirsgirêka romanê ya balê wê yê esasiye tê rojevê, bi taybet ji bo roja me ya îro hinek nirxandinên girîng pêwîst dike. Her ku diçe em di**

**dahûrandinên xwe de li ser vê mijarê baş lêhûr dibim.**

**Di wê baweriyê de me ku hewce dike dahûrandin weke qilasîkên wêjeya Kurd ya bingehîn bên nirxandin. Rêbaza dahûrandinê tenê ne di warê siyasî û leşkeri de, di heman demê de di warê civakî de jî girînge. Ez neçarim ji bo romanê weke çavkaniya herî girîng van bidim nîşan.**

**Weke ku dijmin Kurdistan bê siyaset, bê aborî û bê dîrok hiştiye, xwestiye bê wêje jî bihêle. Ji bo irfan û estetîka wêjeyê nîne, bûyereke pir bi pergal ya rûxandinê sepandiye. Ji ber vê di roja me ya îro de wêjeya mêtinger di asteke pir pêş de ye.**

**Texrîbata mêtinger ya li ser rastiya wêjeya Kurd çiye?**

**Û yek jî cureyeke balkêş derketiye holê: Em ê yên ku bi eslê xwe Kurdin û rewşa kesayeta Kurd yên di qada wêje û huner de roleke**

**xwe pir girîng dileyîzin çawa bigirin dest? Bi rastî jî ev dikevin nav wêjeya Tirk yan jî wêjeyên din yên metingeriyê?**

**Em ê van di kategoriyeke çawa de bixin nava wêjeya Kurd? Mînak, helbestvanê herî mezin yê wêjeya Ereban Ahmet Şevkî bixwe Kurd e. Di wêjeya Tirk de Ahmed Arif, di sînemaya wê de Yilmaz Guney, di romanê de Yaşar Kemal û hîn gelek navên nayên bîra min hene û gelek navên ku pêwîst nabînim... Tevî ku bi eslê xwe Kurdin jî wêjevanên netewên serdest yên herî li ber çavin. Vê dide nîşan: Metingerî li ser wêjeyê xwedî gotine. Asîmîle dike û heta dawî çewtkare. Pêwîstî bi ronîkirinê heye.**

**Ya hîn girîngtirîn jî, gelo li Kurdistanek evqas hatiye şewitandin-wêrankirin wê rola wêjeyê çi bibe?**

**Yek ji hêmanên bingehîn ku şoreşa Fransa û şoreşa Rusya**

**afirandî wêje ye. Dîsa amadebûna şoreşa Fransa, amadebûna wêjeyê ye. Ji felsefeya wê re tê gotin ku felsefeya ronîbûnê. Ew pêvajoya baş a romanî kevirên şoreşê yên bingehînin. Ji bo şoreşa Rus jî heman tişt derbasdare. Yek Tolstoy, Dostoyevski, Gorki, heta Puşkîn nebin ne gengaze behsa şoreşa Rus bê kirin. Dikare di Rojhîlata Navîn de jî pêşketinên mîna van bên dîtin.**

**Îro di şoreşa Îslamê de xitabet gelek bihêze. Helbestên Ereban yên kevin, heta Quran wêjeyeke û zimanê helbestê ye. Gelo em nîqaşeke weke Quran û wêjeyê vekin, em ê ji bo nirxê wêjeya Quranê bikaribin çi bêjîn? Ez zêde li ser vê nesekinîm, lê tişta pêşîn bêgotin; Quran berhemeke wêjeyî ya bêhempa ye. Weke roman û helbestê ye. Belegate, yanî zimanê axiftina vekirî ya herî bihêze.**

**Quran bi serê xwe bûyereke wêjeyê ye.**

**Heta hemû qilasîkên Îslamê mirov dikare weke wêjeya sereke bifikire. Di navbera Îslamiyetê û wêjeyê de têkiliyeke bêhempa heye.**

**Li seranserî derdema navîn berhemên ji aliyê wêjeya Îslamî û kesên xwedî îrfan ve hatiye pêşxistin, bi çav û pîvanên dema me nêzbûn gelek girînge. Ji çîrokên hezar şevî, heta Siyasetnameyê, ji Şahnemeya Firdewsî, heta Mesnewiya Mewlana, hemû niv romanin û berhemên pir bi semyanin.**

**Bi giştî rewşenbîrên derveyî Ewrûpa ji ber kompleksên xwe yên beredayî ji vê hêlê ve rastiyên dîroka xwe lêkolîn nekirine. Ji bo rewşenbîrên Rojhîlata Navîn jî ev wisa ye. Halbûkî mîtolojiyeke wan pir dewlemend, efsane û qilasîkên wan hene. Heta di wêjeya Kurd de; helbestên Feqî Teyran, romana Ehmedê Xanî ya bi navê Mem Zîn ku bi zimanê ristî hatî nivîsîn heye.**

**Yek jî cepheya wan ya li pişt heye: Divê têkilî bi avaniya civakî ya demê û pêşketinên wê yên siyasî re bê danîn. Hewceye cihê teşegirtina netewa Kurd bê danîn. Ev nîqaşên tiştên di dema pêş de li ser wêje û dîrokê bên kirinin. Tişta ku min xwest li vir bal bikişînim ser; ev gel ne bê kok û wêje ye.**

**Kurd yek ji gelên Rojhilata Navîn yê herî kevnare û di heman demê de xwedî kevneşopiyeke wêjeyî ya pir bihêze.**

**Dixwazim vê bêjim: Ne ku ji bo gelê Tirk biçûk bixin, ger ku di warê teşegirtina dîrokî de îlehî em ê qala geleke bêterbiye bikin û mileteke ji gelê Kurd zêdetir bêterbiye hebe ew jî gelê Tirk'e. Kurd di warê teşegirtina dîrokî û wêjeyî de geleke hîn baştir teşe girtiye. Lêkolînkirina vê ji wêjevanan re dimîne.**

**Teşegirtina wêjeya gelê Kurd kengê dest pê dike û heya roja îro**

**çawa hatiye? Ev mijara lêkolîneke cuda ye. Lê li gorî tesbîtên ku min kirine di teşegirtina civakê de wêjeya Kurd bi serê xwe roleke girîng dileyîze. Dibe ku bi devkî be, dibe ku folklorik be, lê gelek girînge. Ji gelê Tirk, heta ji gelê Ereb jî hîn zêdetir hatiye terbiyekirin û dibêjim hinek aliyên wê yên girîng hene. Di warê siyasî de hatiye mehfkirin. Hişmendiya wê ya dîrokî tine kirine. Lê dema em li hinek taybetmendiyên rastiya Kurd temaşe dikin, em dikarin bibînin ku xwedî wêjeyeke pir bihêzin.**

**Rastiya wêjeya gelê Kurd çiye, ewqas serdem çawa teşe girtiye, ger hebe bêedebiyek kî ji vê re rê vekiriye? Ger hebe hinek rewşenbîrên Kurd, yên xebatên wan li ser mijarên dîrok û wêjeyê; di nava rastiya civakî-siyasî de, dikarin di warê zanistî de lêkolîn bikin xwe bigihînin tesbît û nirxandinên girîng.**

**Di vir de mijara ku min xwest bigirim dest, hinek jî dikeve qada min; dikeve pêvajoya şoreşê, di Kurdistanê de edep-wêje û mirov dikare li ser romana ku dibe mijara îfadeya wê ya herî nûjen çi bêje? Ez bawerim di nava rewşenbîran de ev mijar tên nîqaşkirin.**

**Wêjeyeke Kurd mûmkûne?**

**Divê romana Kurd çawa bê nivîsandin?**

**Mixabin, rewşenbîrên Kurd ji bo pêvajoya şoreşa li Kurdistanê ne amade bûn. Ji bo pêşketinek li gorî wan nebû, hinek jî xeydok û bihêrsin.**

**Ya rastî rewşenbîrên heyî li gorî pêvajoya neteweperestiya paşketî teşe girtine. Ji bo şoreşeke wisa mezin asta wan têrê nake ango jê re ne amadene. Bi qasî serê derziyê hêviya wan nebû ku Kurdistan li ber xwe bide, bikeve nava şerê herî mezin yê rizgariyê û serbikeve.**

**Divê êdî ew bixwe jî li xwe mukir bên. Ji derveyî vê wê nikaribin ti hilpekînek mejî û dil çêbikin. Bi awayeke vekirî li xwe mukur têm ku, me jî zêde texmîn nedikir. Dema ku me cara pêşîn ev tevger derxist holê, me jê re digot tevgera nûjen a neteweya rizgariya Kurdistan, lê em tenê komeke biçûk bûn. Ji rehîma dayîka xwe çêbû, lewra em bi guman bûn mezin bibe an na. Lê me her digot, toveke, wê şîn bibe.**

**Her wiha, divê kes nebêje çima me rexne dike. Di serî de ez pêwîstiya em xwe rexnekirinê dibînin. Lê piştre him fersend û him jî ev pêvajoya dîrokî ku me daye ber singa xwe dibe rastî. Her çendî em niha nexwazin Kurdistan qebûl bikin, nexwazin bibînin jî em ketine nava pêvajoyeke mezin. Em di nava pêvajoyeke Başûr, Bakur, Rojava û bi Rojhilata wê ve xwe dirêjî dîroka wê dikin û pêşeroja**

**wê jî heya bêjî baş bi pîlan û bername dikin.**

**Êdî divê rewşenbîr mikurbûnek jidil bikin. Bila heskî kêfxweş bin, heskî zem bikin. Êdî bûyer û diyardeyek heye. Mînak, Pinter; çû girtîgeha Amed'ê hema di qada nev-netewî de şanoyekî girîng çêkir. Di encama serlêdaneke du-sê rojan de derxist holê. Diyare ku serûbinbûneke pir girîng heye. Çavkanî cidî ye. Bila ti rewşenbîrên me min tewambar nekin, nebêjin min pirole kiriye. Yek min cidî nagirin, lê ez bawerim wê Pinter cidî bigirin. Ew serlêdaneke sê rojan dike û ji wê zêdetir me nasnake. Lê ji ber hunermendeke hesteware di demeke kin de bi çavdêriyên xwe berhemeke wisa derxist holê.**

**Em dixwazin nirxandinek li ser Kurdistana di pêvajoya şoreşê û wêjeya wê pêş bixin. Ez bawerim dema Tolstoy pirtûka bi navê "*Şer û Aşitî*" nivîsand rêbazeke wî hebû:**

**Bûyer di serdema 1800'an ya Rusyayê re derbas dibe. Min roman nexwendiye, ji bo yên xwendine heman rêbazî ji bo welatê xwe jî bikar bîne weke bibîr tînim. Tolstoy bixwe, cihê ku şer lê çêbûye ji dil hîs dike û dijî. Li kîjan gir û geliyan pevçûnên rûbirû çêbûne tevê digere. Xwe di pirtûkxanan de hepis dike, girêdayî vê çi heye lêkolîn dike. Bi gelek kesayetên wê demê re nîqaş dike. Û weke em dizanin wê klasîka di asta cîhanê de derdixe holê. Yanî şereke yê çend rojan bi vî rengî klasik dike. Ya rastî di dîroka Rusya de şer pirin. Ev şerê niha li Kurdistana roja me ya îro de heyî, di vê berfirehiyê de şerê yekem û dawî ye.**

**Şerê mirin-mayînê ye.**

**Ya ku qedera her tiştî diyar bike şere.**

**Em li hemû pîlan û bernameyên 12'ê Îlonê temaşe bikin û piştre jî sepanên şerê taybet yên ku**

**meşandine: Em ji tehcîrên Ermeniyan pir zêdetir bi tehcîrên Kurdan re rû bi rû ne. Xwe dispêre plansaziya serfermandarê giştî, bi pergale û sepanên wî gelek bêrehmin. Armanc li vir Ermenî hinek tirsandin, pirştre tên mişextkirin (li gorî min çend meh dirêj nekiribû). Di nava me de pêvajoya pêngava 15'ê Tebaxê ya bi şemal destpê kirî, dikeve sala xwe ya pazdemîn. Du sal bi amadekarî derbas dibe, salên 1982-83'ê êdî me fêm dike, dizane em ê dest bi pêvajoyeke nû bikin û ew jî li gorî vê pîlansaziya xwe çêdike û ji xwe em di sala 13. a şer de ne.**

**Bûyereke ecêp ya koçberiya Kurd tê jiyîn.**

**Ev, ji hemû koçkirinên di dîrokê de bêrehmtire. Gelek bi pîlane û armancek polîtîke. Hêvîdarim nivîskar bi misogerî vê pêvajoyê lêkolîn bikin. Tenê ne di warê wêjeyî de, ji nirxandinên dîrok û siyasî ve jî**

**bikevin rê wê bi tabloyên ecêp re rû bi rû bimînin.**

**Tenê nebêjin; "*koçkirinên Kurd*"û derbas nebin.**

**Wê qetlîamên Ermenî û Yahudiyan qad bi qad li pey xwe bihêle. Mixabin rewşenbîrên ku pêwîste bi pirsgirên gelê xwe re, him jî hewce dike di pêş de cî bigirin û tevbigerin, ez ê ji wan re nebêjim çavhewlin, ne gengaze ku mirov raveya nêzîkbûnên wan ên korane bike. Ez pirole nakim; ka dîroka şerê taybet vekin, di nava van pazdeh salan de ji bo gelê me çi hat kirin û hizirîn! Texrîbata sêhezar gund û valekirina wan heye. Hinek tenê dibêjin karê kontragerîla ye.**

**Na, "*şereke topyekûn*" heye.**

**Hemû partiyên siyasî çep-rast, heta leşkerên wan yên siyasî û leşkeriya sivîl dest dane hev. Gelek bi pîlanin û armanca wan bi temamî Kurd ji xaka wan avêtine. Û li şûna**

**wan jî Tirkên goçmen li van xakan bicîh kirine. Ji Tirkên Ahiska bigirin heta koçberên Bulgar û hewldan vê gav bi gav bidin sepandin. Û ev pêvajo bi hemû leza xwe ve didome.**

**Li hemberî vê berxwedaniyek me ya mezin heye: Asta girtîgehê, çiya, serhildanan û derveyî welat. Berxwedaniyek bêhempa heye!**

**Pêwîste her astek wê bê lêkolînkirin. Ez tewsiye dikim ku di destpêkê de di warê siyasî de lêkolîn bikin. Bêyî ku ev bê kirin Kurd, Kurdistan û xaka wê fêmkirin nemûmkûne. Berdin bûna rewşenbîr, bûna welatparêzeke ji rêzê jî nemûmkûne.**

**Ger ku rewşenbîr dixwazin li gorî karê xwe di nava nêzîkatiyekê de bin, herî kêm neçare tiştên rû didin bibîne. Mesela Tolstoy lêkolîna herî baş ya dîroka şer dike. Analîzeke baş a civaka Rusyaya wê demê dike û kesayeta wan derdixe holê.**

**Kesayetên nû, kesayetên kevin di asteke pir baş de lêkolîn kiriye.**

**Kesayeta Gorkî ya bi navê “Ana" û ew kesayetên balkêş ên Dostoyevskî pir zêde bal dikişîne. Lê li gel me ev sal û Kurdistan bi temamî welatê jibîrkirinan bû. Welatê bê nav bû. Welatê bi erdê re bibû yek. . .**

**Ji xirbeyan xirabtir bû.**

**Welatê ku her kes ji bo revê ketî rêzê. Ji aliyek ve mirin, ji aliyê din ve jî qaşo xweşiyên jiyana kaptalîzmê ya ji rêzê tê pêşkêşkirin. Destpêkê malbatek dişîne dibêje; "*li vir jiyan pir xweşe*. " Pirştre riya pasaportê heta bêjî vedike. Şebekeyên pasaportê yên taybet yên bi polîsan ve girêdayî ava dike. Û dayîkên heftê salî, heta kalan hemû dişînin û di wî gundî de kesî nahêlin. Yek jî gundên bi dilê xwe vale kirin hene. Ger ku sê hezar bi zorê hatibe valekirin, çend hezar jî bi dilê xwe gundê xwe berdane. Û hemû jî encama şerê taybete.**

**Niha rewşenbîreke ku van hemûyan nede berçav berdin ji wî/ê re gotina rewşenbîr, ez ji wê/î re nabêjim miroveke ji rêzê yê têkildarî welat û xaka xwe ye.**

**Divê em rêzdar Îsmaîl Beşikçî yê ku temenê xwe di girtîgihan de derbaz kirî bibîr bînin.**

**Bixwe bi rastiya me ve zêde xweşûbêş nebû. Bi namusa zanyarekî eleqedar bû, her ku pêwîstiya nivîsandinê jî dît nivîsand û girtîgeh jî da berçavan. Û hêjî gotina xwe ya bi wêrek jî didomîne. Rewşenbîrên Kurd ku gelek tiştên girîng yên ji vî fêr bibin hene.**

**Mixabin, weke ku rewşenbîrên me tiştek ji pêvajoya roxîn-şewata welatê xwe nedîtine şiroveyên gelek balkêş yên mîna, "*qusura PKK'ê çiye?*" dikin. Heta naxwazin dijmin jî bibînin. Hemû tiştên wan bûye gelo "*terora PKK'ê çendî xeter û bi***

***zirare*?" Naxwazin dijminê ku ev hezar sale welatê wan talan dike bibînin.**

**Ev rewş dikare çawa bê ravekirin?**

**Nexwe, hişmendî ji hêla mêtingeriyê ve hatiye dagirkirin. Dilên wan ji destê wan hatiye girtin. Pirsgirêka bingehîn di vir de ye. Dagirkirina dil û mejiyê ku rewşenbîr tên nasîn di astek pir bilind de pêk hatiye.**

**Belê, dagirkirina dil û mejî.**

**Rih û beden bi şêwazek pir balkêş û xweser ji hêla mêtingeriya Tirk ve hatiye girtin. Yên din jî li gorî min texlîtkariyeke vê ya ji rêzê ye. Dagirkirina mêtingeriya Tirk ji ya Ereban û Eceman hîn xeternaktire. Bêrehmî û dagirkirina herî mezin, mêtingeriya Tirk di dil û mejî de pêk aniye. Ji ber vê nêzî rastiya xwe nabin. Ji bo nêz bibin dil û mejî pêwîste. Dikare ji bo rewşenbîran ev tespit bê kirin.**

**Tu neçarî ku bêrehmiya di vî welatî de tê meşandin binirxînî. Ji derveyî vê tu nikarî bibî rewşenbîrê vê xakê, welat û gelî. Tu yê dîroka xwe bizanibî!**

**Ger ku di dilê te de qêrînek hebe; hewl bide di rengê helbestê bîne ziman! Ger ku tu zanyarî lêkolîn bike! Ger ku hîn zêde dixwazî kûr bibî romana wê binivîse! Lê niha ev nîne. Wêjevaneke herî zêde taswirê dijminê xwe dike ye. Dibêjin ev dijmin di vî welatî de gund wisa texrîb kirine û ew mirov wisa kuştin. Nakevin nav nirxandineke vê ya baş.**

**Dilê wan ji bo gelê wan naxebite.**

**Ez têkoşîna reşikên Afrikayê biçûk nakim. Ji bo wan hestiyar dibin, lê nizanin ji bo gelê xwe hestewar bin. Bifikirin, gelek "*xweşikbûnên*" Ewrûpa wan ji hiş dibe, lê nafikirin ku di welatê wan de jî xweşikbûnek heye.**

**Bi vî rengî nabe rewşenbîr yan jî estetîkvan. Serê kêliyê dibêjin; "*Apo diktatore, êrîşî me dike*" pêwîstî qet bistebûnek bi vî rengî nake. Li hemberî wan rêzdarim û ez wan vedixwînim karê ku hemû rewşenbîr û wêjevanên netewên hemdem dimeşînin. Çima hêrs dibin. Pirsên min gelek zelalin û pêwîstî qet bi fikarê nîne.**

**Em dixwazin dest bi pêvajoyeke wêjevanan bikin û di warê madî-manevî de alîkariya xwe bê berdêl bidin. Bila êdî PKK'ê lêkolîn bikin.**

**Niha ji hêla gelek nivîskarên cîhanê yên girîng ve tên lêkolînkirin. Gelek nivîskar û rewşenbîr ji welatên weke Emerîka, Fransa, Îngiltere, Almanya tên gel me. Heta min rojev neda wan, min got dema min nîne. Dibêjin; "*Em dixwazin hinek pirtûk binivîsin*. " Rewşeke evqas eleqedar derketiye holê. Û ew bi temamî bi nêzîkbûnek bi şêwaza sefsete raber**

**dikin û dibêjin; "*PKK gunehe, divê em dest nedinê.* "**

**Heta di demên dawî de Ereb jî bi baldar nêz dibin. Gelek bi bandor dibînin, lê yên me hîn şiyar nebûne. Mesela çiqas kêmanî û xetayên wan hebe jî, yên ku yekemîn di derbarê me de pirtûk nivîsandine Tirk'in. Hîn jî rewşenbîrên me dibêjin; "*tabûyeke, nêz nebin*. " Ew bixwe lewazin û ev nêzîkatî wê wan hîn zêdetir lewaztir bike.**

**Di bûyera PKK'ê de û ev pêşketinên mezin ku rê li ber vekiriye, li ser navê wêjeyê ger ku bêjim xezîneyeke, pêwîste weke pirolekirin neyê şirovekirin.**

**Mesela rastiya Zeynep Kinaci'yan di roja me ya îro de diyardeyek romana herî mezine ku li ser bê nivîsandin. Ferhat Kurtay'an, dîsa Kemal û Xeyrî yên di rojiya mirinê de mijarên wêjeyeke pir berfirehin. Di heman demê**

**berxwedaniyên yekîneyên gerîla yên pir balkêş hene. Hema hema di her çiyayî de berxwedaniyên pir mezin hatine raberkirin. Ev hemû hêcan dide. Ewqas bûyerên bi mirinê re rû bi rû hene ku, çiqas dixwazî çîrok binivîse, tu nikarî xilas bikî. Ger ku hebe jêhatbûn, çiqas dixwazî dikarî bikî roman.**

**Civaka Kurd pir mezin hatiye guhertin. Heta asta me ya dahûrandinê di nava PKK'ê de dikare weke wêjeyeke pir bihêz bê nirxandin. Dahûrandin cureyê romanê yê seretayî yan jî dikare weke pêşnûmeya romanê bê dîtin. Dahûrandinên dema dawî heta bêjî min ber bi wêjeyê ve dibe.**

**Digihim kesayeta Kurd.**

**Û ez wisa ji xweber nehatim vê astê, ez di nava şereke pir bêrehm de cihê xwe digirim. Demên wisa çêbûn ku, min ji xwe re digot vî mirovî çawa**

**dahûrînim, ji mirinê zêdetir tiştek ji destê wî nayê.**

**Ne jiyankirin, tenê tişta dikare bike mirina erzane.**

**Bêguman gelek bandor dike. Ev rastî bi azweriyên min yên jiyanê re nakokiyek pir sihême. Û li vir ev kesayeta mirî çawa derket holê?**

**Ez ji vê re tenê nabêjim kesayetiya mirî; dibêjim kesên binkeftî, kesê bê hêvî û kesê bê bawer! Wiha, ev fikirandin min ber bi lêkolînkirina kesê Kurd ve bir. Yek jî pir kirêt dibînim, bi kesê li beramberî xwe re bi temamî şereke bihêrs didim meşandin. Ne li gorî hunera şere, ne li gorî hunera siyasî ye û ne jî li gorî hunera diplomasiyê ye. Yek ji şêweya têkiliyan ya herî bingehîn; têkiliya malbat, jin-zilame. Di wê de jî êdî xilas û tine bûye. Vê xofê ez weke psîkolokekî bi temamî ber bi lêkolînê ve birim.**

**Di vê wateyê de wê dîsa bejin; "*dîsa pesnê xwe dide*. " Na! Weke beriya wêjeyê neçar mam bibînim. A rastî keda min her ku diçe dibe weke rola pêşengtiya wêjeya şoreşgerî bilîze. Zimanê min him ber bi romanê ve diçe, him jî dibe helbestî. Şoreş bixwe vê dixwaze. Yê ku vê dixwaze ne ez im. Hunereke min wisa jî nîne. Lê her ku bûyer û diyarde çêdibin xwe nagirim.**

**Dixwazim jiyan bikim!**

**Belê, ji bo jiyankirinê divê bibim çare. Û ev mîna guloka berfê her ku diçe mezin dibe. Ger ku di warê wêje û romanê de em vê rewşê binirxînin, wê pir pêşde biçe. Şanseke mezine, ger hebe hinek jêhatiyên Kurd dikarin vê bi temamî derxînin holê. Ji rewşenbîr û wêjevanan re çavkaniyeke pir girîng hatiye pêşkêşkirin. Ji bo helbest, çîrok, hevpeyvîn, sînema, tiyatro, heta ji bo klasîkan jî çavkaniyeke pir baş û**

**mijarek tevgerînê heye. Nîgarek dansên gel, stran û mizûkê ya pir xweş heye.**

**Sedemeke ku hêjî yên me newêrin vê bikin heye: Girêdayî dagirkirina dil û mejî ye. Mîna bombayê ji ezmanan ser serê wan ketiye, hîn jî şoqa wê jiyan dikin. Û çavên wan pir zêde tarî kiriye.**

**Ronakbiriyê nizanin.**

**Rewşenbîr,-ronakbirî ye.**

**Mixabin, ez neçarim ji vê re bêjim korbûyîn. Dibe ku, piştî bandora vê şoqê şûnde çav vebin. Û ev serdema nû ya wêjeyê pêşketin bidest bixe. Dikare ji bo romanê jî hinek gav bên avêtin.**

**Bi misogerî divê wêjevan û rewşenbîrên me vê pêvajoyê bi awayeke zanistî binirxînin. Ji derveyî vê ne dikarin wêjeya Kurd bikin û ne jî zanista Kurd. Dema roman dibe mijara gotinê jî, wiha heya niha kesayetên me qal kirine nivîsandine.**

**Ew di pîvaneke qilasîk de ne. Ji ber ji bendewariyên civakê re nebûne bersiv, heskî Tirkî binivîse, heskî Kurdî, heskî Soranî û heskî Zazakî wê zêde kes nekire. Sedema nedîtina wan jî; ji ber ji pirsgirêkên demê re nebûna bersive. Bi misogerî bi vê ve girêdayî ye. Yan na ti wateyeke gel sûçdarkirinê nîne.**

**Yên ku me fêm nakin- ev dişibin gazindên peyvên hinek deman- pêwîst nake me wisa şaş binirxînin. Tiştên min bilêv kirine him gelek bi watene, him jî zanistî ne. Her kes dikare bixwîne. Dikarin di weşana rojane de bixwînin. Di TV' yê de her kes dikare guhdar bike. Tevî ku Kurdî zêde pêş neketiye jî bi milyonan mirov guhdar dikin. Diyare ger ku tu ser cewhera pirsgirêkê de biçî wê guhdarvan û temeşevanên wê jî pir bin. Bi vê mebestê di wateya rast de pêwîste ronakbîrî jî bi vî rengî çêbe.**

**Dilê şoreşê!**

**Bêguman dema em dibêjin dilê şoreşê û şêwazê wê yê îfadeyê, naxwazim vê wisa fêm bikim gelo Tirkiye an Kurdiye? Em hîn berfirehtir nêz dibin. Dema tê gotin ku pirsgirêka wêjeya Kurd çiye, ez ê bi kinahî vê binirxînim. Lê li vir tişta min xwest ji ziman û şêwazê îfadeyê fêm bikim; nabin dilê şoreşê. Niha bi misogerî divê tarzeke dilê şoreşê hebe.**

**Di şer de nagihin avanî û kûraniya dil. Dil dême!**

**Dil hinek bi çand, wêje, helbest, sitran û kevneşopî re tên xwedîkirin. Ciwanên demê ji van hemûyan qutin. Qetlîama mêtingeriyê pir mezin jiyan dikin. Ez vê ji bo xwe suçdar bikin nabêjim. Qetlîameke mezin ya dil hatiye jiyîn. Helbesta ku di zimanê xwe de kirine pelesan, helbesta derewane. Romanên dixwînin jî ji tevlîhevkirina serî pêşdetir nikare tişteke din bike. Hestiyarbûna wan tam wekî xayîna ye. Em dikarin**

**pirsgirêkê hinek din kurtir bigirin dest.**

**Em ê mirovê Kurd bigihînin dilekî çawa?**

**Wê kûranîya dil û hesasiyeta dil çawa derkeve holê?**

**Ev bi serê xwe mijareke. Bêguman mirov dikare çav, qabîliyeta temaşekirinê û bihîstinê jî lê zêde bike. Ev mijarên wêje û hunerê ne. Lê beriya her tiştî dilê ku hestên me fêm bike pêwîste.**

**Ez ê li ser hev bipirsim: Dema hûn li ser van çiyayên bi semyan diğerin, heta hemû hebûnên ku li ser digerin dibînin çima hûn hêcan nagirin? Bircên Amed'ê, dikare ji dîtina Amed'iyan cudatir jî bê dîtin. Li ser wan zinaran kî hat û çû?**

**Dibêjim;"misogerî pêwîste em rê vekin. " Yek jî erdnîgariyeke pir bi semyane! Bi serê xwe hewayeke romanî dide ser giyana min. Van nabihîzin! Gelek ecêbe! Yêkî ku bêje;**

**"*ez ji welatê xwe gelek bandor dibim*" nîne.**

**Û heta hewl didin birevin. Piskolojiya dijmin ya revê gelek serwere. Mînak, min li zincîran jî bidin ez nikarim li Ewrûpa rehet bim. Li vir bi sedemekê rehetim: Ji bo min derfeteke mezin ya xebatê li gorî armanca xwe dîtiye lewra dikarim lê bimînim. Ji derveyî vê ez ê şêt bim. Rewşenbîrên me çawa dikarin evqas rihet li Ewrûpa bimînin? Ya mijara gotinê ye ne bi awayeke fizîkî li wir mayîne. Ji dêla qetlîamê re derbas bibin, dikarin weke rewşenbîrê mişextî jî bimînin û dikarin gelek xebatên hêjayî jî bikin, lê tişta dixwazim bêjim cudatire.**

**Dil û gotinên we çawa dikare bê welat bimîne!**

**Dileke wisa çawa dikarin jiyan bikin! Ez vê ji gelê me jî dipirsim. Fêm dikim, zehmetiyên aborî û koçkirina ji ber tehdîtên qetlîamê, ez ê birêzdarî**

**nêz bibim. Lê her ku biçe ev dilê xwe firotin, li bazaran pêşkêşkirin, xwe ji dilê xwe qut kirin li gorî min gelek xetere. Ger rewşeke we hûn hesap ji qetlîamkarê ku we biriye wir bipirsin nebe, we ji mêjve jibîr kiribe welatê we hêlîna jiyanek çawaye, ez ê ji mirovbûna we şikber bim. Dixwazî zanyarek be, dixwazî li Ewrûpa yekî super be, ji bo min bi qasî quruşekê ne bi nirxe. Yek jî di vî alî de jî dinirxînim.**

**Berdin wijdanê azad, aqlê azad; ev ji çend cihan ve hatine zincîrkirin. Û ev jî heya bêjî xwe bê berhem dike. Dema dil û wijdan azad nebe, ti berhemdarî pêş nakeve. Her tim ji xwe dipirsim ku vê çawa derbas bikim. Wiha şoreş bersiva vê ya herî balkêşe û tabloyên her roj tên jiyîn hene.**

**Gelek tiştên hîn ecêptir ku dixwazim pêş bixim hene. Di serî de ez, hîn zêdetir dikarim çawa**

**bandorker bim? Gelek difikirim dibêjim ji bo hîn zêdetir dil û mejiyê vî gelî bihejînim dikarim kîjan kombinasyonan pêk bînim.**

**Di demên dawî de di tevgera min de aliyên artîstîk derdikeve pêş.**

**Û weke ku gel tiyatroyek, sînamayek dişopînin, min jî bişopînin û dikare ev bi taybet bê îzahkirin. Dixwazim li hember bêziraviyan bibim bersiv. Min xwe wisa bi pîlan kiriye ku, dijmin jî di nav de herkes şev-roj dipirsin dibêjin; "*ev kî ye, çawa jiyan dike?*" Ez jî, wisa ecêb û her roj pirsan balkêştir dikim û dixwazim vî karî bidomînim. Ji derveyî vê tişteke ku ev dizanin nîne.**

**Him armancên min, him hêvî û him jî hêrsên min hene.**

**Ez neçarim riya derketina van bibînim. Ji ber ev pêşketinên dawî di wateya wêjeyî de ne. Lê ne di zimanê nivîsê de, di helbestê de, di zimanê jiyanê de û zimanê tevgerê de vê**

**gelek baştir dikim. Şoreşên din bi salan bi wêjeyê xwedî dibin. Mînak, şoreşa Fransa pêncî sal berê hatiye amadekirin. Dîsa şoreşa Rus beriya sîh salan hatiye amadekirin. Niha di Kurdan de wisa nabe. Neçare ku him wêjeya xwe, him fîşeka xwe, him teoriya xwe û him jî pratika xwe bi hev re bimeşîne. Tu yê him bibî dilê wê him jî agirê wê. Wê hemû bi hev re çêbe. Ev taybetmendiyeke şoreşa Kurd'e.**

**Yên ku fêm nakin bila lêkolîn bikin, wê hîn baştir bizanibin ka dixwazim çi bibêjim. Nêzîkatiya ku bila destpêkê wêjeya Kurdî bikin, piştre şoreşa Kurd çêbibe şaşe. Ji ber metingerî bi şêwazê gotineke tenê jî ji bi te nede gotin, xwe rêkûpêk kiriye. Li beramberî du gotinên Kurdî kirin îdame. Ha te gule teqandiye, ha te gotineke kurdî kiriye, heman ceza tê dayîn. Ti aliyeke vê neyê fêmkirin nîne.**

**Fikirîm ku di salvegera sêset saliya Mem Zîna Ehmedê Xanê de çi bikin û min di dahûrînan de hinek giranî da vê. Tesbîtên ku min kirin ev bi min da gotin: Ger ku bi awayeke realist û zanistî bê nirxandinan, di wê serdemê de li gelemperiya cîhanê liv û tevgerek netewbûnê destpê kiriye û dîsa serdema hêrsa li hemberî nirxên feodalî pêşdikevê ye.**

**Serdemeke nivîsandina ristên netewî û cureya şêwaza destanwarî ku hêdî hêdî derketî holê ye. Ji ber ku Ehmedê Xanê jî rewşenbîreke di teşegirtina netewa Kurd de negengaze ku ev nebihîstibe. Yek jî, qiraltî û sultantiya di Ereban, Eceman û Tirkan de dibin yek gelek bihêze. Di Kurdan de ev nîne.**

**Qral di netewbûnê de xwedî ciheke pir girînge. Qral li hember prensan dibe hêmaneke yek-kirina gel-netewan. Di van salan de li Ewrûpa dema qraltiyê ye. Osmanî**

**hene, dîsa qralên Îranê hene. Li Kurdan temaşe dikî, ev nîne. Her wiha, qral di nava raveya feraseteke digihîne hev de ye.**

**Dema ku Ehmedê Xanê dest bi berhema xwe dike vê dibêje. Destpêkirineke girînge. Piştre tê ser parçebûna ji ber vê çêbûyî û texrîbatên begîtiya feodal ku di avaniya civaka me de dayî çêkirin. Çawa nake yek û dilê wan parçe dibe? Pêwîste hûn dile li wir weke dilê netewî bigirin dest, tenê ew e. Her çendî di şexsê Mem Zîn de hatibe ser ziman jî, dibe hêmaneke berhevkar û dil. Lê dilê feodalê gemar vê pêkan nake. Di nava êşên pir giran de dimîne. Pêşnekeftina vê evînê weke pêşnekeftina yêkitiya Kurd û dilê Kurd binirxînin. Û pêşnekeftin, xwe bi şêwazeke helandinê îfade nake. Yek-du serdest destpê dikin. Feodal jî di girtîgehê de hildiweşe û dimîne. Bê ziman dimîne û dişewite.**

**Encam: Dilê Kurd heta 300 sal berê jî çênabe. Dîqat bikin, wê demê metingerî evqas bêrehm nîne. Kurdî jî dinivîse û mirtiya Botan tam mîrtiyeke Kurd'e. Lê tevî vê jî li pêşiya yekîtiya netew û dilê netew astenge. Di Mem û Zîn de pir balkêş hatiye ziman. Li wir wêje heye. Pêşveçûna demê pir baş tê vegotin.**

**Êş û azarên gel bi awayeke pir balkêş bilêv dike. Lê mixabin lêkolînkirin û nirxandina vê rast nayê kirin.**

**Rewşa piştî 300 sal çiye?**

**Tesbîta min ya yekem: Ti cudahiyeke yên me jî ji Mem Zîn nîne.**

**Ehmedê Xanê jî nînin.**

**Li çiyan pir erzan dimirin. Ya rastî xebata min ji beriya sêsedsalan hîn mezintire. Ji ber bihîstina dilê wan li gorî min hîn bi semyantire. Şerê jiyanê didin. Balkêşe! Her çendî berxwedaniya wan li ser bingeha pîvanên feodalbin jî gelek girînge.**

**Yên me ji bo tişteke tine bi ser mirinê de dibezin. Dil dême û kes napirse ka çima wisa ye. Heta dengên di erdnîgariyê de qet nayên ser ziman. Bêguman piştî 300 sal derbasbû şûnde hewla balkêş ya li ser dil belkî jî hatibe sifrê, encam nagire.**

**Difikirim ku min çima wijdana xwe azad kiriye. Ev ji bo min gelek girînge. Û min gelek bi hêcan dike. Ez ji bîna xakê, ewrên ji baranê avis, birûsk-tav, dengê çûkan...Hêcan ji van digirim. Zêde dema min nîne bi rengê ronahiyê re eleqedar bim, lê mest dibim. Bi çûkan re eleqedar dibim, bi xirbeyan û herîkîna avê re. . . Ya rastî ev hemû çavkaniyên îlhamê ne.**

**Lê yêkî ku encam ji vê derxistî nîne. Tenê di derbarê têgeha welat de vê dibêjim. Yek jî taybetmendiyên me yên mirovî hîn balkêştirin. Tiştên di rûyê dayîk-bavên bi temen de tê xwendin ji romaneke cudatir nîne.**

**Xemgînî, belengazî û bêçaretiya di wî de...Daxin asta zarokan,mînak zarokeke Kurd lêkolîn bike! Ger di te de hinek dil hebe tu yê bi zehmet li ser lingan bisekinî.**

**Ez her tim ji dayîk û bavan re vê dibêjim; hinde pêşeroja zarokan tariye, hûn ne di wê rewşê de ne ku tiştekê bidin wan, ji bilî heskirinek erzan, her serê kêliyekê ku danin ser ranê xwe û weke putekêpêve girêdayî bin zêdetir tiştek din ji destê we nayê. Ewrûpî wisa nakin. Heskirineke wan wisa nîne. Çima? Wan ji bo zarokên xwe tiştên cudatir kirine. Û heskirina wan jî rasyonele. Ji bo li ser bingeha madî hinek tişt ji bo wan amade kirine lewra nêzîkatiya heskirinek erzan nadin raberkirin. Pêwîst jî nabînin.**

**Di me de pir sihême. Yanî ji hemêza xwe nadanin. Bihêle bila di nava daristanê de bikaribe bi serê xwe jiyan bike! Vaye, dema dayîka**

**min xwest li ser min vê bide sepandin, ez pê re ketim nava pevçûneke tund. Min wisa jê re got; "*Tu çima li ser min heqê xwe ferz dikî? Ji ber ku cîhana ez nikarim lê jiyan bikim te ez anîmê, te sucekî gelek mezin kir.*"**

**Nêzîkatiyeke min cuda ji zarokan re heye. Gelek heval vê nizanin. Difikirin ku em hinek tiştan di tarzeke qilasîk de hez bikin. Nabe! Ez li şêwazê mezinkirina wan zarokan temaşe dikim. Bêheskirin û bêrêziyeke mezin dibînim. Wê pêşeroja zaroka te çi be? Bi xwe di nava belayê de yî, tu yê ji wî/ê re cî bibînî? Ger bi rastî jî hûn ji dil jê hes dikin, dil û wijdaneke dayîk-bav hebe, wê rewşa van zarokan çibe? Ti temînateke wan yê madî nîne. Yek jî wê bi vê rewşa xwe ve ji kîjan netewî re xizmetê bikin? Ji ber hemû netew pêş ketine, wê zêde karekê nedin wan. Ev, tinekirineke pir balkêşe. Wê**

**ti rewşenbîrekî me nexwazibe vê bifikire. Lê ez difikirim û bi awayeke vekirî jî şer dikim. Dikarim gelek tiştên bi vî rengî bidim vehesandin lê ez niha bi avaniya me re mijûlim. Bi mirovên şer dikin re mijûl dibim.**

**Ango dibêjim; "*şer bizdonekî nabe*. "**

**Dibêjim; "*yê ku dilê wî/ê ne mezin be wê çalekiya wî/ê jî mezin nebe!*"**

**Ez neçarim heman tiştî ji bo rewşenbîrên me jî bêjim: Yê ku dil û mejiyê wî/ê nemezin be, bi misogerî wê ronakbîriya wî/ê jî çênebe. Temaşe bikin ziman, dil û hestên klasîkên cîhanê yên mezin hene. Her çendî gelek aliyên bên rexnekirin hebin jî, mînak Zekî Muren yêkî gelek hestiyare. Bi zimanê hest, pir kûranî li jiyanê temaşe dike! Ji ber vê bi şêweya deng bilêv dike, divê rêzeke mezin jê re bê dayîn. Li gorî nerîna min tişta Zekî bir mirinê jî hîleya şerê**

**taybet bû. Heta bêjî hestiyare û hestên xwe bi hunerê berhevkirinê de hostayek mezine.**

**Niha li yên me temaşeke: Hestên wan di çi astê de ye? Bi misogerî pêwîste hest weke pirsgirêkeke cidî bê destgirtin. Ango bûna zimanê xaka welatê xwe. . .**

**Min çîroka xwe ya bi dayîka xwe re vegot.**

**Min peywendiya bi mirovê Kurd re vegot. Dikarim hîn jî bêjim. Mirovê danûstandinê xwe herî zede bi xwezayê re xurt ez im. Ger ku awarte bi mirovê Kurd re eleqedar nebûma, me nedikarî vê rêxistin û şerî derbixin holê. Ma gengaz bû ku mermiyek jî bê teqandin? Ewqas keçên ciwan û mêrxas hene. Di vê wateyê de rewşa herî xeternak jiyan dikin. Ji derveyî vê hiştin bi serê xwe behremendiyek dixwaze. Hûn mêrxasan dinasin, wê hema xwe pê ve berdin biçin. Wan terbiye kirin û kirina xwedî edep**

**girînge. Ji bo wêje wateya xwe bibîne, divê ev jî weke kedeke mezin bê nirxandin.**

**Li ser têgeheke evînê jî dixebitim.**

**Divê ev jî yek ji têgihên wêjeyê yê herî girîng bê fikirandin. Pêwîste têgiha evinê û Mem û Zîn bên ronîkirin.**

**Mixabin li ber xwe didin. Ez bûm nebûm min ji hestiyariyên li holê ne nefret kir.**

**Riyên heskirina xweşik avakirin mûmkûne. Te qet ev ne anîn berçav, başe çima xiyanet tê bîra te? Tu yê biçî kî derê? Ji xwe ciheke biçiyê jî nîne. Wê biçin çend rojan wê cînseltiya xwe ya çors jiyan bikin; piştre wê lê bê xistin û bê avêtin. Mijara ku jê hêrs dibim eve. Behremendiya heskirinê nîne. Bila we bikariya hes bikin, da ku ez jî heta dawî xizmetê bikim... Rastiya Kurd hinekê jî wisa ye. Evîn nîne, dil nîne,**

**tenê tişta ji destê wê tê ji xiyanetê xiraptire.**

**Ev jî pirsgirêka wêjeyê ya bingehîne. Rastiya netewa me ji sedî not bi vî rengî ye. Li vir jinên xwedî ziman tên pêşxistin. Jinên di her mijarê de li ser lingê xwe bimeşin tên pêşxistin. Bi kolêyekê re navpêketin nabe.**

**Belê, dil û zimanê kolê nabe.**

**Yêkî ku heya bêjî bi pergalê ve hatibe girêdan wê zimanê wî/ê nebe. Heke em wî/ê bigirin cihekê wê çend quruş bike? Wê bigire xurfeyekê, başe tu yê çilê bikî? Mîna termekê ye. Ma wê ji cinseltiya çors a mîna lawirekî çi derkeve? Ez evqas vekirî dibêjim. Hîn jî nêzî fêmkirinê nabin, di bûyera Kurdan de dema dibêjî têkilî (li gor nêrîna min ev di wateyeke nebaş de ye) di wateya qilasîk de ye.**

**Pêwîstî dibinim hinek serbendan bidim: Dema ku wêjeyê pêş dixin, divê em tenê ne di pêvajoya şoreşê**

**ya serûbinbûyî, beriya wê tipê tarî, tîpê bêçare, tîpê di dil de hatî zincîrkirin û tîpê ku dilê wan hatiye tinekirin derxînin holê. Ev dikare bi giranî di çalekiyên din yên huner û romanê de bên bikaranîn. Em ê Kurdê qediyayî çawa destnîşan bikin? Kurd çawa hat tinekirin? Kurdê xilas bûyî, Kurdê ketî, Kurdê binketî, Kurdê hatiye asteke beredayî, Kurdê revî, Kurdê xakê bi erzanî diberde û Kurdê têkiliyan nexweşik dike kî ye?**

**Kurd çawa hat vê rewşê?**

**Başe, berxwedanî mûmkûne?**

**Anîna şer û heskirinê mûmkûne?**

**Gelo derfeta ji binkeftinê birina serkeftinê, ji bêziraviyê bi ziravkirin, ji nexweşikiyê xweşikkirin heye?**

**Tu yê çawa rakî? Tu yê li dijminê wî aniye vê rewşê temaşe bikî. Niha tu yê ev şerê xwe yê xirap li hember dijmin bidî bikaranîn. Gelê Kurd dijmin bibîne! Tê destpêkê ji nerîneké re bangawazî û bangawaziya xwedayî**

**bikî. Ger piştre derfeta te ya berxwedanê hebe li ber xwe bide!**

**Bi dest û ziman li berxwe bide! Li ber xwe bide! Li ber xwe bide!. .**

**Ev dûrişmeya girtîgehê ye: "*Li berxwe dayîn jiyankirine!*"**

**Ev şerte!**

**Belê, jiyankirin berxwedaniye, berxwedanî jiyankirine. Lê berxwedanî tenê têr nake!**

**Yek jî êrîşa diçe serkeftinê jî girînge. Ez di hemû eniyan de dikevim êrîşê. Dema min van pêşxist, lewra tenê ji partiyekê re û weke gotina partiyekê nabêjim, vegotineke Kurd'e. Heke ev neçe serkeftinê, xwarina ev dixwe jî herame. Tu yê çi bidî vê? Bêguman, di wateya klasik de nabêjim, tişta dixwazim bêjim hinek cuda ye. Tu bi nan û av nekî, nerazênî, tu yê her tim li ser stiriyan bigirî.**

**Dema Kurdê nû diafirênî, ji bo heq qezenc bikî tu yê bêjî pêwîstiya**

**min bi gelek serkeftinan heye - rêbazên min li ser vê bingehê ne- ji ber rêyeke din yê vê nîne. Herî zêde li ser xwe disepînim. Bi rêxistin, çalekiyê re amade bike, dem dirêj bide jiyîn û rê li ber hinek serkeftinên girîng veke! Wiha, dibêjim wê demê dikarî hinek aram bî.**

**Bêyî ku Kurdê nû bê afirandin, her tişt nemerdane ye.**

**Vaye, heskerineke Kurd, şêwazê jiyaneke Kurd, erka bingehîn ya wêjeya Kurd'e. Hunera mezinkirina jiyan û têkiliyên du kesî ne. Jiyanê balkêş, estetîk, dilawer û wesifdarkirin, erka wêne, helbest û mizûkê ye.**

**Wiha, lûtkeya vê ya herî jor jî evîne.**

**Ez ne li hember evînê me, berevajî ez xwe hêza herî mezin ya afîrandina evînê dinirxînim.**

**Çawa?**

**Bi şer!**

**Ez naxwazim vê xakê û gel wisa erzan berdim. Ji ber vê şerek pêwîste. Li hember dijmin şereke pir bi sihêm!**

**Gelek daxwazên min jî hene. Min li kî derî xistiye dijmin asteng kiriye û min şerê xwe li ser vê pêşxist. Dibêjim çima daxwazên min yên gelek maqûl hene? Çima min wisa şûnde hişt? Dixwazim hûn min weke zarokeke Kurd lêkolîn bikin.**

**Li hember daxwazên min yên herî ji rêzê, di serî de ji dayîk-bavê xwe bigirim, li civaka gund û pirştre li asta fermî û dewletê temaşe kir, hemû astengin. Qaşo dema mirovê Kurd mezin dibe, yan jî beriya mezin bibe xilas dibe... Beriya bigihe heştê saliya xwe bi nexweşiya raşitizmê tê girtin, bi felce û weke zarokeke mezin nebûyî ye. Min li vir li ber xwe da û şer eve.**

**Hêza min têra tiştekê nake. Yek jî bi salan fikirîm; min got wê rewşa vî**

**zarok çi bibe? Diçim dibistanê, lê gelek zehmet fêr dibim. Dixwazim nan bikirim, gelek zehmet bi destê min dikeve. Heta dixwazim têr û sertêr avê vexwim, derfata min ji wê re jî nîne. Ev ji bo min her tim pirsgirêk bûn û min wisa destpêkir û min got ez ê jiyan bikim.**

**Ew dema dibistanê romaneke mûthîşe. Ji ber her diçûm gundê cîran û di demjimêrekê de vedigeriyam. Di her rabûneke min ya sibê û hatina min ya êvarê de dibû bûyerek.**

**Hesabxwestina bi xwe re.**

**Min xwe li ser wan keviran dihilavêt. Çend evrazî hebûn, tê de diçûm dihatim. Her yek ji wan ji bo min mîna çiyayê Agirî bû. Dîsa daketin, dîsa hilkişîn... Ma xwarin xwarin çibû? Herî zêde hêgek, em bi nanê garis razîbûn û yek jî me li nav paç dipêca dixist berîka xwe. Me şerm dikir. Em diçûn gundê cîran nav zeytûnan, me di nava zeytûnan de**

**çawa dixwar? Di hemûyan de zehmetiyek hebû... Her refa ku min derbas dikir, li gorî min, min cîhanek qezenc dikir. Yek jî dema rojên dawîbûnê dihat ji bo min serkeftineke mezin bû.**

**Yanî ez vî şêwaza mezinkirinê, bi temamî dikarim weke salên zarokeke di riya azadiyê de jiyan bike binirxînim. Xweska derfetên min hebûya, min bikarîba bîranînên xwe zindî bikim. Destgirtina mamoste ya destpêkê, bi serê xwe girîng bû. Jiberkirina kesên destpêkê û yêkemînbûn bidest xistina min gelek girîng bû. Mamosteyê min, min bir mala xwe, li ser mêzeya xwe destpêkê xwarin da min. Ew gundê cîran gelek ji min hes dikir û heft şehîd dan. Mîna Ermeniyên kevin yên Tirkî diaxivîn û hêjmareke zêde aligirê me bûn. Sempatîzanên dema zarokatiya min in. Pêşî li ber bandorên bi vî rengî vedike.**

**Îşaretên hemû pêkhatinan didim. Niha ez van ji bo vê dibêjim; hatina vê rojê û gihiştina dilawerbûnê gelek girînge. Çûyîna Kurdekî fêmkirin gelek girînge. Çiqas dikare bê nîqaşkirin?**

**Hinek xebatên min hene:**

**Min xwe aniye rewşa bûyereke mezin. Ez li hember hinek tiştên cîhanê serî radikim. Dawiya wê dê çawa bê, ez jî bi hêcaneke mezin li bendê me. Ez ê nesekinim, yanî wisa erzan çûna mirinê, bi awayeke erzan dawî lixwe anîn nemûmkûne. Ez rêxistinbûneke wisa mûthîş derdixim holê ku...Ji xwe tirsên min yên mezin hebûn. Ez xwe li hember wan birêxistin dikim.**

**Hûn ê bêjin ku, ma mirov netewek ji ber vê dike qurban?**

**Erê, ez dikim qurban.**

**Divê ev bi vî rengî bê fêmkirin: Hûn ê fêm bikin ku min jî ji bo netewek xwe çawa kiriye qurban. Ji**

**xwe ger zanistî nebe, siyasî nebe ez ê nikaribim vê bikim. Her kes dixwaze bibim axayek. Di nava me de her kes dibe xulamek pir baş. Hûn dizanin yê herî bihêz jî di çi rewşê de ye. Wiha, ez wijdana xwe nafiroşim. Ji bo nebin yekî wisa gelekî ponijîm.**

**Dikarim niha bêjim hinek azadim.**

**Kes bi qasî min rastiya gelê xwe nasnake. Di nava rêxistin û ji derveyî rêxistinê yê ku bi qasî min ji bo armancên netewî qîr dike nîne. Kesî biqasî min şer nemeşandiye. Kesî bi qasî min zerar nedaya dijminê xwe. Di mijara rastiya netewa xwe de kes biqasî min bi îdaî nîne.**

**Yanî dema dibêjim; "*ez*" li wir êdî ew zarokê belengaz yê gundî nîne. Li vir miletek pêk tê. Ez dixwazim vê bêjim. Gel dibêje tu ji me re gelek pêwîstî. Ma tu kuve diçî, dibêjim ka hinek jî "*ez*" bibim yê xwe, lê nemûmkûne. Li vir bi temamî "*ez*" dibe gelê Kurd yê kesayet bidest**

**xistî. Dixwazim rizgar bibim, lê nemûmkûne. Niha ev şêvazeke pêkhatinê ye, hîn kêmaniyên min pirin, lê şêwazeke pêkhatinê ye.**

**Dibêjim xweziya yek hebûya ev temam bikira yan jî ji destê min bigire bibe. Ji ber têkoşîn û westandinek zêde nebêjim jî, yek derketiba bi rastî jî wê gelek baş bûba. Lê ez nabînim. Û ji ber wê careke din di xwe de dest bi pêşbirga ciwantiyê dikim.**

**Niha li vir cih ji têgihên dîktatortiyê re qet nîne. Pir bi temene, lê weke zarokeke şeş salî mezin nebûyî bi rastiya miletek re rû bi rû ye.**

**Divê ev gel bê mezinkirin.**

**Gelê cîhanê yê herî kevnare, lê bejna wê bosteke û mîna zarokekî şeş salî ye. Ez neçarim vê binirxînim. Ew sînordarbûna temen divê veguherînim jiyaneke xwezayî. Pêkanîna vê jî birastî hunereke baş dixwaze. Ya rastî navê vî gelî nîne.**

**Cîhan jî xwedî maf nehesibandiye; nabêjin; "*wê mafên vî gelî yên netewî hebe, mafên jiyanê hebe û heta mafê mirovan hebe.* " Ger rewşenbîr van nebînin bi misogerî nikarin bi gelê xwe re pêwendî dênin. Û wê nekarin ti berheman bidin û wêjeyê bikin.**

**Ev zarok mezin dibe. Ger hûn min cidî negirin jî ev gel dikare hinek tiştan bike. Ji rewşenbîran re jî vê dibêjim; temaşeke bi vî zarokî re derfeta mezinbûn û pêşketinê heye. Daxwazên wî yên jiyanê dikare ber bi çêbûnê ve biçe. Mîna min zarok dikare mezin bibe, dibe pir paşketî be, pir dagirtînebe, her kes ne ecibîne jî, lê dîsa jî şêwazeke pêkhatinê ye.**

**Em xwe li ser kesî ferz nakin. Heya niha min bi tika kes neaniya gel xwe û li virim. Li hemberî hêza ti dewletê jî nêzîkatiyeke min ya ricakirinê çênebûye. Min ti carî ji Emerîkiyek, Ewrûpa yîyekî re negot; "*werin ez rica ji we dikim, vî karî***

***bikin*. ” Ev quraleke min e. Ji ciwanên tên re jî ricayeke min tenê jî çênebûye. Tarzeke min jiyanê li gorî xwe heye. Û niha dikarim bidim guhdarkirin. Wiha, heya ev neyê fêmkirin, hûn nikarin Kurdê vejîn dibe fêm bikin.**

**Di vir de mijar ne ez im. Tişteke bi navê ez nîne. Ev, bûyereke pêk tê ye. Ev di wateya Kurdê vejîn dibe, Kurdê şiyar dibe şer dike û pênaseya Kurdê hewl dide tiştan bike de ye. Rewşeke bi vî rengî mijara gotinê ye.**

**Bêguman ez jî heme, lê di vê wateyê de heme: Weke yêkî di xizmeta vê de heme. Weke xizmetkarê vê yê mezin û xwedî kedeke vê yê bê eman heme. Weke siyasetvaneke baş û arastevanê leşkerî yê baş li ser karim. Lê weke zarokeke ku mezin jî dibe hewl didim jiyanê fêm bikim. Evînê jî...**

**Evîn hedefeke wêjeyê ye.**

**Heta ku evîn neyê girtin mirov nabe wêjevan.**

**Wiha, ev nehatine fêmkirin. Evîna Kurd bi serê xwe têgehek wêjeyê ye. Evevîn wê çawa çêbe? Ger ku dil girêdayî armanca evîna xwe be dikare pêş bikeve.**

**Em ê evînê çawa destnîşan bikin?**

**Zilamê me yê herî berkeftî dema derfet dibîne ketîbûna herî mezin dike. Wiha Kurd wisa xetere, divê em vê tehlîl bikin. Kurd ji sedî not bi vî rengî ye. Ger wan azad berdî hema hema hemû wê vê biceribînin. Eş û trajediyek mezine. Trajî-komedî ye! Wêje van şêwazan jî zêde bikar tîne. Pêwîst bû rêbazeke din jî hatiba dîtin.**

**Heta çûk jî dema ciheke bi ewle nebinin, hêlîna xwe çênakin.**

**Em qadeke ku hûn lê kêfxweş û bi wêrek bin biafirînin. Bila hinek pereyê me hebe, em birçî nemînin. Em herêmên wisa biafirînin ku hûn**

**bikarin bi tendurîst lê bifikirin. Lê herî zêde xerîze pêş dikevin. Ajoyê birsîbûnê, ajoyê zayendî, ajoyê hûndirîn û hwd... Wiha ji bo birsîbûnê çil taqla bavêje, ji bo ajoyê, ji bo ajoyê cînseltî beriya bigihî pazde-bist salî xwe tine bike. Niha ev handîkap û leystîkek mezine.**

**Tu yê li vir dil biafirînî! Hinekê estetîk bêxî dewrê. Ji bo birsîtiyê têr bikî bikevî nava hewldaneke mezin, ji ber yê birsîbe dikare her tiştê xwe bifiroşe. Ajoyê cînseltî ajoyek tunde. Ger wê ne rawestînî, wê neveguherînî, bi misogerî kesayetê tine dike. Freud lêkolîn bikin, gelek zanyaran lêkolîn bikin. Ez bangî yên me dikim ku van lêkolîn bikin. Ger dixwazin wêjeyê bikin, di me de mînakên wê yên gelek balkêş hene. Bi misogerî divê lêkolîn bikin, bila pêvajoyeke wêjeyê bê destpêkirin. Ez ê tenê wêjeya wê nekim; dixwazim çalekî, siyaset û hinek jî jiyanê pêk**

bînim. Tedbir distînim. Ji ber ez negirim wê artêşa me ji dest biçe. Wê xiyanet li min bikeve, li pişt, li kêlekê û li pêş. Divê bidim sekinandin, divê xwedî rik bim. Êdî nîvîskarên mîna Ehmedê Xanê jî têr nake.

Weke wî daxwaz kiriye dixwazin bibin qral, carna dibêjim ew jî têr nake. Ji aliyekî de Mem, ji aliyê din ve jî Zîn afirandin. Wiha, bûyara Kurd, evîna Kurd, wêjeya Kurd afirandin, bi misogerî girêdana xwe bi dayîna bersiva van pirsan re heye. Wiha bi hêsanî wêjevan çênabe, çawa şervantiyeke hêsan çênabe, nikare bibe xwedî edebeke hêsan jî. Edep bûyereke cidî ye. Ji bo edeb hebe, pêwîste têkiliya Kurd çareser bikim. Pêwîste jina Kurd, zilamê Kurd û mêrxasên Kurd çareser bikim.

Û ya herî girîng jî, tu yê çi ji vê kesayetê bikî? Ger bêxî nava xakê, xak qebûl nake. Ez ji hemû hevalan re dibêjim; yeke bi we re, li gel we kar

**kiriye, we çawa nedîtiye? Gelo ev xayîn, ev mikrop ne di nava we de bû? Hûn çima nabînin? Ma wê rêzdariya we qet ji hêvî û şerê vî gelî re çênebe? Kêliya fersendeke biçûk bi destê we dikeve hûn hema revê pîlan dikin... Bal bidinê di qada min de kes nareve. Xayînê tê jî girê didim, yê kêrî pênc quraşan jî nake wêrek dikim. Rêxistinvaneke mezinim û wêrekiya nîne didim. Ez bi mekanîzmayên xwe re hewl didim biafirînim. Ji hêla xwe ve kes nikare ji min re bêje; "*te çima ev derfetên heyî nenirxandiye?*" Bi neynokan derdixim û pêşkêşî berjewendiyên we dikim. Lê ez hîn jî di vê mijarê de xwe belengaz dibînim. Di bûyera Kurd de, weke yêkî xwedî mafê gotinê û mafê wêrekbûnê dinirxînim. Lê di holê de evînek mezin nîne, ev gelek zehmete.**

**Zeynep Kinaci:**

**Belê, ew bangawaziyeke evînê ye, lê bêyî ku xweliya wê li erdê bimîne...**

**Hîn jî hewl didim şirove bikim. Ew xwedavendeke.**

**Niha, wê ev çawa derbasî jiyanê bibe? Bifikirin, tu yê bibî çalekvanek wisa, wisa wêrek bî û pîlaneke te wisa hebe. Biçe nava ew civaka mêtîngeh, mîna çekê her derê wê hatiye dorpêçkirin, bikeve nav û xwe biteqîne! Ew jî têr nake, jiyan jî afirandin... Belkî jî jihevderxistina atomê li gel wê ne tiştek be. Bi ti awayî nabe ev bûyer ji rêzê bê destgirtin.**

**Ew keç ev derxist holê. Ger wêjevanê mezin, li ser navê netew vê nebîne wê bibe wêjevanê çi? Ez vê ji wan dipirsim; heke tu vê bûyerê nebînî, keça ku hinek dilê wê çêbûyî nebînî, ma di te de dil heye, di te de şeref heye, di te de onura netew heye, bi misogerî ev pirs bersivê**

**dixwazin. Berevajî vê hûn nikarin peyva wêjeyê bilêv bikin. Bi sedan yên mîna vê hene. Ne ev jî, em van jî zêde nedin pêş. Başe em ê heskirina mezin çawa pêk bînin?**

**Niha, heskirin bi serê xwe kareke mezin yê şere û mijûlahiyek ji şer zehmetire. Di vê mijarê de pêwîstî dibînim ku qala dayîka xwe jî bikim, digot: "*Ax, wê ev kurê me keç ji xwe re nebîne, wê kes keça xwe nediyê.* " Min hinek bêhîvî didît. Wateyeke vê gotinê jî heye.**

**Ne kes dikare min wisa bidest bixe, ne niyeteke min wisa heye û ne jî ez ê ku pêş dikevim vê qebûl bikim.**

**Hîn jî wisame. Bila kes min bi şêwayeke din şirove neke. Min hîn jî ev behremendî bidest nexistiye. Ez yekî xwedî heyraniyên mezinim û ji bo biçûk xistana kesî jî vê nabêjim.**

**Hemû hêjane!**

**Ji bo keçan jî xwedî nirxên gelek mezinim. Lê ditirsim, di mijara**

**ecibandinê de zehmetiyan dikişînim, di mijara têkiliyan de zehmetiyan dikişînim. Wexta dibêjim ez, pêwîste di warê netewî de ev organize bê fikirandin. Divê hemû ciwan bên fikirandin. Asta netewî. Ev rêgezin. Divê wisa bê fêmkirin. Ez bi xeter dibînim û hûn ê xemgîn bibin, ez ê çawa bêjim; "*tu gihiştiyî 18 saliya xwe*" naxwazim xeta bikim.**

**Kes bi qasî min xeter nîne, yêkî bi qasî min bi keçan re jî mijûl dibe nîne. Belkî jî hevserên we yên wisa bi we ve girêdayî hebin. Lê keçên me; yanî ji mirinê bigire, ji bo hemû bangawaziyên jiyanê, bi rihetiyeke mezin hemû dikarin bên. Lê ez hîn jî karê wan hêsan nabînim. Gelek karên bên kirin û bi baldar bin hene. Û ya herî girîng jî divê ez xwe baş terbiye bikim. Xwe terbiyekirin divê ji rêzê negirin dest. Dubare dibêjim; bûyereke bêjim ez nîne, tîpeke Kurd**

**tê afirandin. Û evqas gel ji min re li çepkan dixe.**

**Wiha, ez nikarim xiyanet li vê bikim.**

**Ewqas jin radibin ser lingan, ez nikarim xiyanet li wan jî bikim. Ji bona azweriyekî û ji bo hesteke kor... Divê li hember gelekî wisa rabûye ser xwe rêzdar bim. Ji hemûyan re bibim bersiva dil. Û ev hemû rayên sereke yên wêjeya Kurd in.**

**Yek jî em li wêjeya Tirk a hatiye afirandin temaşe bikin: Pirsgirêkek ji rêzê çêbe jî ez bawerim dibe mijara nîqaşê. Ji ber bal dikişîne; dixwazim dahûrandina Yaşar Kemal, Yilmaz Guney, heta helbestvan Ahmed Arif bikim.**

**Ya ku Yaşar kir Yaşar qutbûna wî ya ji Wanê ye. Û yek jî bicîbûna wî ya li Çukurovayê heye. Li wir jî kombûneke keda Kurd heye, naveroka wê ya civakî diyar dike. Qutbûna ji Wanê û safibûna eşîretê jî**

**wî dike evîndarê "*İnce Memed*. " Li gorî min esil evqas balkêşe û bêyî bikeve pênaseyê tê tarîfkirin. Lê Yaşar Kemal xwe weke wêjevaneke Tirk hesiband. Niha jî dibêje eslê min Kurd'e. Berhemeke wêjeyê ya di qetlîama mêtingeriyê de ye, lê bi temamî ne eve. Ew azarê dibîne, her çendî bandora qetlîamê bi temamî nebêje jî dide peytandin.**

**Em dikarin qala wêjeyeke melez bikin. Yek car ji derveyî Kurd dîtin çendî bi aloz jî be, bi temamî weke karê Tirk dîtin jî ewqasî bi aloze. Wêjeyeke divê bê cudakirine. Em dikarin vê di kesayeta Yilmaz Guney de bi mînakeke baş rave bikin. Demek dirêj xwe di sînamaya Kurd de dît. Dema nêzî mirina xwe dibe dibêje,"*ez sînamavanek Kurd im*. " A rastî ev jêkvebûnek bû. Ger ku Yilmaz jiyan kiriba, me dê ev cudabûn pir zelal dîtiba. Wê bûba sînamavaneke Kurd**

**yê semyan. Her wiha hemû îşaretên wê pêşkêş kiribû.**

**Ahmed Arif:**

**Ya rastî di dilê xwe de Kurd hîs dikir. Amed'ê dibihîse. Lê di warê teşe de bi temamî Tirkek pêşketiye. Tevlîheve; melezbûyîn, di rewşeke bê cudakirin de dide nîşan. Ev romanvan, helbestvan û sînemagerên yên serdema qetlîamên mêtingeriyê yên herî dehşet bûn. Hewceye weke kes neyên sûçdarkirin. Lê tevlîheviyekê jiyan dikin. Rewşek bihurdar, dema navberê û dudiliyeke jihevcudakirinê jiyan dikin; ger em ê rewşa van nîqaş bikin, lewra divê ev rastî bê tesbîtkirin.**

**Heta yên bi vî rengî di wêjeyê de pirin. Di vê wateyê de, di mizûk, sînema û wêjeyê de yên herî çalak Kurd in. Weke zenciyên li Emerîkayê, di çandû werzîşa Emerîkayê de dijîne. Di wêjeya Tirk de karekterên melez gelek diyarkerin, di mizûka wê de jî bi**

**vî rengî ye. Bi giranî roman hinek wisa dibe. Pêwîste bê ku ev ji dervî Kurd bên hesibandin nêzîkbûnek bi şêweya divê bên cudakirin hewce dike û divê berhemên ku wan bi zimanê Tirkî dane bidestxistin neyên reşkirin. Lê resenbûna xwe ya netew înkarkirin jî nebaşe.**

**Divê xwe hêdî hêdî tevlî cudabûna resentiya netewî bikin. Ji vî alî ve erkek wan heye, cihebûnek wan heye. Di pêvajoya şoreşê de tevî ku derfet derketin holê jî, ji bo ji resentiya netewa xwe re nebûn bersiv pêwîste êdî em ji wan re nebêjîn wêjevan.**

**Dîsa mijara ziman jî mijareke herî zêde bê nîqaşkirine.**

**Hinek dibêjin pêwîste wêje bi temamî bila bi zimanê Kurdî be, yek jî qet negirînge, yên di her zimanî de nêzîkatî didin raberkirin hene. Ya min hinekê riya navîn esas digire. Li gorî min dê demeke dirêj wêjeya Kurdî jî**

**giranî bi zimanên netewa serdest bê meşandin. Her ku karê rizgariyê çêbû, pêşve çû, wê zimanê kurdî hêdî hêdî bikeve meriyetê. Êdî em nexwazin jî objektîvîteyeke ku avaniya mêtingeriyê dayî avakirine. Realîteyek objektife, ger bixwazin jî nikarin bi awayeke din bikin. Him jî di nava nêzîkatiyeke îla "*Kurdî binivîse*" de bûyîn nemûmkûne. Ji ber ne di asta nivîsandinê de ne. Yek jî zimanê Kurdî hîn nebûye zimanê wêjeyeke xurt. Ez vekirî bêjim ku; nivîskareke herî zimannasê Kurd ê herî serwext û berkeftî, çiqa binivîse bila binivîse, xwe çendî tengav bike bila bike, wê zêde xwendevan bidest nexwe.**

**Ji ber zimanê kurdî bi xwe qetlîamekê jiyan dike.**

**Zimanê Kurdî bi xwe neanîne rewşa zimaneke wêjeyî, zemîneke wê ya netewî pêş nexistine, nehatiye ecibandin. Ji sedî pêncî bi zimanê biyanî û netewa serdest diaxivin.**

**Kurdî bixwe hîn nebûye zimanê netewî, ev realîteyeke. Ger em Kurmancî binivîsin wê Zaza û Soran fêm nekin; ger Soranî binivîsin wê Kurmanc fêm nekin. Bi kinahî divê li ser zimanê netewî lêhûrbûn bê kirin.**

**Zimanê netewî karê pêvajoyekî ye.**

**Mînak, zimanê Tirkî ji dema dîroka komarê heya niha nû dibe zimanê wêjeyê. Û yekî Anatolyê wî zimanê Tirkî fêm neke, yêkî Tirkmen û Ozbek wê qet fêm neke. Dibe ku em di Zazakî û Soranî de nêzbûnekê bibînin, heye jî. Lê ew jî nînin. Wiha diyare di nava netewên din de jî ev pirsgirêk heye. Ev pirsgirêk di Farsan de jî heye. Dîsa Erebên Surî, Erebên Fars bi qasî ji hevdu fêm nekin cuda diaxivin û divê ev jî ecêp neyê destgirtin. Metingerî ev kar di me de wêrankartir pêk aniye.**

**Yek jî mîtolojiya Kurd, destana Kurd, çîroka Kurd mijarên wêjeyê yên**

**herî bingehînin û zindîbûna xwe hîn jî diparêze. Di roja me ya îro de tevî qetlîamên mêtingeriyê jî, destan û çîrokên Kurd hebûna xwe domandin gelek girînge. Bi taybet stranbêj, dengbêj û yên ku çîrokan dibêjin bi temamî dikevin naveroka wêje yê. Pirsgirêka wan ya nûjenkirinê heye.**

**Yek jî bi derfetên teknîkê re, dîsa pirsgirêkên wan yên teşedana televizyon û rojnameyê heye. Mesela televizyon niha pir girînge. Divê em giranî bidin yên çîrok dibêjin, destan dibêjin, helbest dixwînin û yek jî stran dibêjin. Di Kurdan de ev pir bihêze. Divê em ji bo van saziyên lêkolînê ava bikin. Ev di berfirehiya xebata wêjeyek baş de ye. Pêwîste nirx ji şêweyên kevnare re bê dayîn.**

**Hewceye em girêdana van bi serûbinbûna avabûna şoreşa Kurd re bidin çêkirin. Bêguman tenê bi şêwaza modela kevin mizûk û çîrokên qlasîk gotin nabe. Divê îfadeya van ya**

**rojane bi îfadeya wê ya qlasîk re bibe yek. Her netewekê ev pêk aniye. Divê êdî em jî cesareta kirina vê bikin.**

**Bi misogerî divê em şêwazên qlasîk bernedin, lê hewceye em naveroka wê ya nû jî paşçav nekin. Ger naveroka wê ya nû dil be, şêwaza kevin jî zimanê vegotinê ye. Heya ku herdu nebin yek temamkirina wan nemûmkûne. Ger em bilêvkirinê wisa bi muhtevayê re bikin yek, ez bawerim wê ev bibe ronasansa wêjeyê. Ya rastî ev vegotinên me hemû tê wateya derengketina ronesanseke Kurd e. Vejîn ji nû ve çêdibe. Hemû Ewrûpa yiyan ev jiyan kir. Mînak, li Tirkiyê Kemalîst jî dibêjin ronesansa Anatolyayê. Di me de her çendî dereng jî be, me ji salên heftî ve ev ronesans û vejîna Kurd daye destpêkirin. Li gorî nerîna min ev bi awayeke semyan didome.**

**Di nava vê ronesansê de karekî mezin dikeve ser milê rewşenbîran.**

**Çawa ku di rewşenbîrên Ewrûpa , heta Rusan û Çînê de ev bi semyanekê gihiştiye îfadeya xwe, îro di Kurdan de jî gihiştiye vê rewşê. Him divê ev weke şansekê bibînin, him jî erka kareke pir girîng û divê bê serxistin bibînin.**

**Bangawaziya min eve!**

**Pêwîst dike ku rewşenbîrên me tiştên dibin bi feraseteke baş binirxînin. Ez ê bixwe di xizmeta wan de bim. Yê ku xebera ji me re dike jî di nav de, ez ê bi hemûyan re zimaneke şarmend esas bigirim. Bangawazî! Bila bên dîtbariyê bikar bînin, rojnameyan bikar bînin. Qadên gerîlayên me yên şehane ku rizgar kirine hene, ger bixwazin dikarin bên wan deran jî. Li şûna berdêlê diçin Anatolyayê leşkertiyê dikin. Qet pêwîst nake wan berdêlan bidin. Bila bê berdêl bên gel me tenê ji bo xweşikbûnan bibînin bila bên.**

**Qadên rizgarbûyî gelek bi semyanin. Bila hêdî hêdî hewl bidin vê têbigihin, dîsa jî şer bixwe gelek hêcan dide. Divê herî kêm bi qasî rewşenbîrên netewên din binirxînin. Êdî hûn wate nadin pêşdaraziyên li hemberî me, pêwîst nake em zêde vê bikin pirsgirêk jî.**

**Ez ê ji rewşenbîran re jî bêjim bila cesaret bikin; ji bo tomarkirina qonaxên pir girîng bila me weke pirekê bibînin. Bi misogerî em ê di van derbazbûnan de di warê madî û manevî de bibin alîkar. Bila biqasî bawerkirinê, ji bo serkeftinê jî baweriya wan her tim hebe.**

**"*Ya lênûsê wi weke çekê, yan çeka wi weke lênûsê ye.* . . "Anton Çehov**

## RAMAN, PÊNÛS Û ŞÛR

Gelê Kurd bilez hewl dide xwe nû bike. Xwe di warê netew, azadî, jiyan û fîzîkî de nû dike. Xwe hêdî hêdî ji mirinên hezar salî, ji derew, xew û rezaletên hezar salî rizgar dike.

Rewşenbîr çiye? Ronakbîrî çiye?

Rastiya mirovahiyê ye.

Rewşenbîrî, ewe yê derdixe holê û deşîfre dike. Me van hemû bi şer derxist holê. Yên ku bi şer re derketİn holê, di şer de hatine afirandin pîroz û hêjane. Yên ji derveyî vê çêbûne jî nirxê xwe heye, lê ne bi qasî yên bi şer re derketine holê. Me bi şer û jiyana xwe re hinek tiştan îsbat kir û me bi van re miletek ji nû ve da afirand. Bi ev tiştên hatine afirandin re dikare dijminê herî mezin jî ji holê bê rakirin. Lê ez hemû dost û rêhevalan gelek bêçare dibînim. Li hember dijmin gavekê navêjin, yek-du

**gotin nakin û nabin xwedî helwdanekê. Ev lewaziyek pir mezine.**

**Yê ku dixwaze bibe Kurdek durist, pêwîste destpêkê xwe binase. Ji vê zêdetir jî divê dost û dijminê xwe bizanibe. Ev jî têr nake. Dikare li hember dijminê xwe çi bike? Başiyan dikare çawa bidest bixe? Ger van bidest naxe hewceye dijminê xwe bigire ber çav. Heke li hember dijminê xwe tiştek nake, ew kes kêrî pênc quruşan nake. Ji destpêka şerê me heya niha em bi giranî li ser van rawestiyan. Pêwîste hîn bihêztir bisekinin.**

**Nebe nabê ye!**

**Ger çênebe jiyankirin herame û wê nirxê jiyanê yê pênc quruşan nebe.**

**Divê em li ser jiyanê rawestin. We hundûr-derveyî welat dît, niha jî tiştên cuda dibînin.**

**Hûn li ser navê Kurdbûnê rabûn û we li ser navê Kurdbûnê gelek tişt jî**

**kir. Lê hûn niha dibînin, ev Kurdeyatiyek çawa ye? Rastiya wê çawa ava bûye?**

**Ya niha pêk tê weke xiyaleke.**

**Ev hezar sale hinek dixwazin vê bikin. Weke ku rabûn serê hemûyan hat jêkirin û kuştin. Nedizanîn, nedikarîn. Lê di me de zehmetî hebe jî, di nav de serkeftin heye, mirin nîne.**

**Di dîroka Kurd de cara yek ji tişteke wisa nû re şahidî tê kirin. Hinek bi pere, hinek bi mal-milk, hinek bi jinê re keyfê dikin. Lê li gorî min ev hemû giraniyên gelek mezinin. Ger ku gihiştina armancê çêbe, wê jiyan mîna hewa û pembo sivik bibe. Ji derveyî vê jiyan gelek girane, nayê rakirin.**

**Ger biryarbûn hebe, jiyan çiqas giran jî be, tê rakirin û dikare bigihe hedefê.**

**Ev ji bo rewşenbîr, nivîskarên Kurd û hemû hevalên şoreşger ne**

**tiştek zehmete. Yêkî ji bo gel tiştek neke, xwe nemeşîne, yekî nikare nefesê bigire wê her tim bi tirs û ketinê re rû bi rû be.**

**Şer heye!**

**Pirsa ku serkeftin çawa ji nav şer derdikeve beriya her tiştî tê. Li hemû hevalan temaşe dikim; çawa dibe ku roj bi roj jiyaneke wisa ji rêzê jiyan dikin, binketinê çawa tehemûl dikin? Bi hinek tiştên biçûk re dikarin xwe di nava jiyanê de bihesibînin. Tevî ez evqas xebitîme jî, rojek tenê jî aram nabim. Lê hevalên me dikarin bêjin, "*ev xêreke biçûke, ne gavên mezinin.* "**

**Em ê niha li ser cewherê rastiya Kurd bisekinin.**

**Tevî ku tiştek nekirine jî weke padîşahekê ji xwe razîne.**

**Tiştekê nakin, lê xwe qehreman dihesibînin.**

**Hinek nivîskarên ku dixwazin Kurdbûnê nasbikin û bidin naskirin**

**hene. Gelo çima vê rastiyê di kêliyê de fêm nekirin? Li ser navê Kurdbûnê evqas ketîbûn, evqas çewtî û sextekarî tê kirin, başe ev tişt çima nehatin îsbatkirin? Çima serdeçûyîn çênebû?**

**Rewşek xeternake.**

**Û ev rexneyek ji bo me hemûyane. Gava tê avêtin jî dijmin te difetisîne, di gava din de jî dikuje. Gava davêjî çima ne aîdê te ye? Rewşa di nav de yî, rewşeke hundûrê wê hatiye valakirine. Tu çima hundûrê wê nadagirî? Ev xususên bingehîne. Tu çawa dikarî evqas ji çewtî û ketîbûna xwe razî bî? Çima tu li hemberî wê aciz nabî? Heke mirov ser rastiyan nesekine, salên jiyan kirî ji demên vale derbasbûyî wêdetir ne tiştek dine. Tevî van hemûyan jî, hewl tê dayîn hinek tişt ji bo Kurdewariyê bê kirin û ji xwe tê kirin.**

**Pêwîste ji bo Kurdewarî û şerefa mirovan hinek tişt bên bidestxistin.**

**Di vê mijarê de xizmeta herî mezin ku bikim, ragihandina ezmûnên xwe ye. Divê hûn jî baş guhdar bikin.**

**Yên ku xwe neafirînin em nikarin bi wan re bibin dost.**

**Dibe ku silav û kelam bidin hev lê (ji xwe di Kurdan de dema jê re tê gotin tu çawayî tevî nebaş jî be dibe ez başim, tevî nebîne jî dibêje dibînin û ji ya nerast re baş gotin bûye edet) pêwîst dike ku ev li ser esasên nû tên avakirin çêbe. Divê silav li ser vê esasê bê dayîn û naskirin li ser vê bingehê bibe. Heya niha ev zêde bi bandor nebû. Heta li hember dijmin gavên pir xurt nedihat avêtin.**

**Li hember dijmin zêdetir li hember xwe kîndare.**

**Çima wisa tê kirin? Nizane ji derfetên di dest xwe de encaman derxîne û bi van tê lîstin. Çima evqas bi nirxan tê lîstin? Çima evqas bi erk û çekê tê lîstin?**

**Wiha, mirina Kurd her tim wisa çêbûye. Ya rastî hinek tişt mirov dibe serkeftinê. Hinek pirs, xebat û usul hene; ger bi van neyê lîstin dibe ku bigihe serkeftinê.**

**Ez xwe mezin dikim, bi gel re jiyanî dikim. Dikarim bi gel re bibim û bi gel re dimeşim. Nêzîkatiya ku dibê ez bê gel "*dibim*" nemûmkûne. Li vir jî mirovên me ne bi gel re, bi xwe re ne; herî zêde bi derewên xwe re û ketîbûnên xwe re ne. Lê bi xak û çiyayên xwe re zêde ne eleqedarin.**

**Wê ev gel çawa rabe ser xwe?**

**Bi rabûna gel re, ber bi serkeftinê çûyînê re divê rewşenbîrên Kurd jî rabin bi wan re bibin yek. Pêwîst dike ku ew kendalên di navbera me de ne bi pele bên bigirin. Pêwîste em dûrbûnan nêz bikin. Xebata Kurdistanê bi zimanê gel, bi rihê gel, bi xakê re bûna yeke û afirandina giyana Kurdê nû ye.**

**Xak û giyan yekitiye, hatina ba heve û wekheviye.**

**Divê ne tenê ji bo xwe û malbata xwe, ji bo gelekî, yekbûna giyanîbûn, li ser taybetmendiyên xwe baş sekinandin û wan anîna rewşa hekhewîbûnê.**

**Ez di wê baweriyê de me ku rewşenbîrên Kurd nirx bidin ev tiştên hatine ser ziman, ji xwe nirx jî didinê. Dibe ku ev jî bêçare bin. Ji ber her yekî ji derveyî welat li quncikekê jiyana xwe birêxistin kirine, di vê mijarê de gelek teng mane, temenê wan heba çû. Em dîsa alîkariya di derbarê Kurdbûnê de didin dixwazin bidin rewşenbîran jî.**

**Em ji bo zimanê Kurd, dîroka Kurd, foklora Kurd, wêje û hunera Kurd hîmên bihêz tavêjin. Vê bibînin, giyan û dilê xwe tevlî bikin.**

**Xwe pêwîst nake xwe mezin bibînin. Tevî min evqas ket daye jî, ez hîn jî xwe weke zarokekî dibînim. Tu**

**carî nabêjim;“*min evqas kir, evqas mezinim*” û ev şaşe. Nû destpê dikim. Divê mirov; mezinbûna xwe di nav hêza rêxistinê de bibîne, di gel de bibîne, di şer de bibîne, lê bi ti awayî di xwe de nebîne. Divê her tim nebêje; “*ez û ez.* ”**

**Hewceye di jiyanê de gaveke baş bê avêtin. Karê me ne karê we rewşenbîr yan jî wêjevan dikine, ya em dikin kareke şere û kareke milîtaniyê ye. Ti cudahiyeke di navbera teqandina çekê û bikaranîna pênûsê de nîne. Di hinek cihan de pênûs, zimanê fikir, ji çekê hezar qat zêdetir şerkirine.**

**Ez jî bi zimanê xwe şer dikim.**

**Ji derveyî vê, ti tişteke din bikar nayînim. Ez serkeftinê bi nêrîn, ziman, hedef û usulê bidest dixim. Wisa bikin, lewra hûn ê serbikevin. Divê hûn gelek tiştan lêkolîn bikin. Pêwîste bi ti awayî neyê gotin ku "*jiyana min bi vî rengiye û ji derveyî***

***vê ti tişteke din nadanim pêşiya xwe*.**
**"**

**Kurdê nû û kesayetê jî nû dike. Divê hûn ji vê bawer bikin. Carna hinek tiştên ku di hezar salan de nehatine pêkanin, bi şoreşê re di nava çend rojan de pêktê. Şoreş, di demeke kin de çêdike, temenê mirovan dirêj dike, bihêz dike. Hêz û quweta şoreşê eve.**

**Hinek 15 salî bejdarî tevgerê dibin, lê dişibin kalên 70 salî. Ez ji rewşên bi vî rengî nefretê dikim. Mafê me nîne ku em weke kalan, weke ketiyan, weke bêzimanan û weke koran nêzî hev bibin.**

**Nabe weke ker û lalan bibe, mafê kesî yê bi vî rengî nîne.**

**Ev mirineke. Mafê kesî nabe ku ji koletiyê re azadî bixwaze. Nirxê azadî û şeref ji bêedebî, ketîbûn û xirabûnê re nayê dayîn. Nirxê kirêtiyê jî nabe. Tu kî dibî bibe, çi dibî bibe, ger ku**

**nebaş bî ji te re silav jî nîne. Heskî 70'î salî be, heskî 15 salî be.**

**Bêguman ger 70'î salî jî be dikare weke ciwanekê be û ji nû ve dest bi jiyanê bike. Di pêvajoya deh salên derbasbûyî de şehîdên hatine dayîn, xwîna hatiye rijandin û xebata hatiye kirin vê dide gotin. Bêguman wê kêmanî derbikevin. Lê ger li ser ev xalên me dane diyarkirin bê sekinandin, wê kêmanî, nebesî bên derbaskirin û veguherînin rastiyên mezin.**

**Îsmet Şerîf Vanli: Riya PKK'ê rêyeke nû ye û esas e. Naşibe hedefên rêxistinên din. Rêyeke nû û vekiriye. Di hedefa wê de pêşveçûna Kurd û serxwebûna Kurdistanê heye.**

**Abdulah Ocalan: Ev 45 sale hûn bi Kurdeyatiyê re eleqedar dibin.**

**- Belê rast e, ev 45 sale eleqedar dibim.**

**---.:Ji 1949'an ve.**

**- Belê, bi eslê xwe ji Rojava me, min li Ewrûpa xwend.**

**---.:Hûn li ser Kurdeyatiyê disekinin, hûn nûnerê Kurdanbûn ne wisa?**

**- Em bi hêzên şoreşger yên li Başûr re xebitîn. Min hemû tiştê xwe nezîrê wan kiribû.**

**---.:Hûn çend sal bi şoreşa Başûr re man?**

**- Ji demeke dirêj ve. Hemû kar û derdê min Kurdistane.**

**---.:Hûn dibêjin "*Kurdistan di qelbê min de heye, heya bêjî bihêze*. " Hûn me nas dikin yan jî we karî hinekê nas bikin? Hûn bingeha PKK'ê û cewhera wê çawa dibînin? Li gorî texmînên min hûn hinekê me dinasin.**

**-Beriya her tiştî hedefeke mezin ya PKK'ê heye. Hedefên partiyên din ji siloxanan wêdetir naçe. Hedefa Kurdistana Başûr otonomî ye. Hedefa PKK'ê jî serxwebûna Kurdistanê ye.**

**---.:Di dîroka me de yên li ser navê Kurdbûnê dikevin rê hûn ê nas bikin. Wan jî digotin "*azadî, serxwebûn.* " Lê hemû di gotin de man. Tevlîbûneke wan bi dil û can çênebû. Ew girêdan nedan raberkirin. Barzanî bi xwe jî vê zêde nedizanî. Di Barzanî de welatparêzî lewaze, malbata wî beriya her tiştî tê, ji her tiştî girîngtire û mezintire. We vê qet ferq kir?**

**- Li gorî min Melle Mustafa Barzanî, ji kurê xwe Mesut Barzanî hîn baştire.**

**---.:Bêgûman baştire û dikarim bêjim mezintire jî. Ya girîng rihê berê fêmkirine. Çiqas mezin, çiqas baş bibe jî dîsa her tişt Barzaniye û ji bo eşîreta Barzanî ye. Netewîbûn pirştre tê. Heta netewbûn ji bo mezinbûna eşîretê amûreke. Mezinbûn, netewîbûn cuda, eşîret tişteke cudatire. Yên ku vê nezanin nikarin**

**xebateke netewbûnê û xebateke gel bikin.**

**Divê mirov xwe nas bike. Gelek rewşenbîrên me xwe dixapînin. Pêwîste pirsa neteweyî di çi astê de ye bê pirsîn. Serokatiya Barzanî serokatiyeke her tişt ji bo eşîreta xwe dike ye. Ger serokatiyek ne demokratîk be, azadî nebe wê xizmetê ji çi re bike? Di giştî Kurdan de eşîretbûn heye. Lê ger bê gotin "*eşîra min, malbata min û heta kesayeta min beriya her tiştî tê*" li wir netewbûn xilas dibe. Heta netewbûn çênebe, serxwebûna welat çênabe. Wiha di vir de hewceye mirov rastiya xwe bibîne.**

**Min Osman Sabri dît. Gelek başbû, miroveke temen mezin bû û gelek aqilmend bû. Min bi wî re hinek civîn lidarxistin û digot; "*tişta Barzanî dike eşîrtiye, ne netewbûne. Netewbûn çênebûye, her tişt di bin xizmeta eşîr û malbata wî de ye.* " Ev**

**tişteke tenê ji bo Barzanî derbazdar nîne, di hemû Kurdan de, heta di nava me de jî malbatî, eşîrtî, qebîletî û takekesîtî heye. Min beriya niha 30 salan jana we bihîstibû.**

**- Ew dem ez bi tenê bûm. Lê niha, ji ber bi hezaran Kurd heye gelek kêfxweşim.**

**---.:We ji bo Kurdeyatiyê hinek tişt kir. We dixwest Kurd qezenc bike. Bêguman eşîr û qabîleya we jî nîne.**

**- Eşîreta min gelê Kurde.**

**---.:Belê hûn gelparêzin. Lê li Ewrûpa hûn zêde nedibûn hêza çareseriyê. We dixwest tiştina bikin lê li hawirdora we kesên girêdayî berjewendiyên xwe pir bûn. Heta we xwest hinek rêxistinan ava bikin.**

**- Em girêdayî armanca xwe ne. PKK'ê hedef hîn zelaltir kir.**

**---.:Ger cîhan bi me re bûya, em evqas texrîp nedibûn. Dewletan digotin; "*ha ji te re evqas alîkarî, lê ezê li beramberî wê hinek tiştan***

***bixwazim.*** **" Wê ev ji bo me zerar bûya. We hinek tiştan afirandiye, xwe pêş xistiye û hûn dikarin biwêrin biçin gel dijmin jî. Di destê hinek din de ancex dikarin bibin dareke riziyayî. Nikarin li dijminê xwe bidin û di destê hinek din de bibin leyîstok. Ger xwe bi xwe pêş bixî, bi hêz û bi pola bikî tu yê bibî şûr, lê bidî. Ya rastî di destpêkê de pir ketîbûn, nedikarîn henase bigirin. Dîsa ez çima ewqas li ser wan disekinim? Ez dikarim bi hesanî dostaniya dewletekê bidest bixim. Zilamên mezin yên hinek dewletên din hene. Heta ez ji wan re nabêjim; "*hûn çawane?*" Heta teng dibim ku bi wan re yek demjimêrê tenê jî biaxivim; lê şev û roj li ser mirovên xeniqî û riziyayî disekinim. Çima? Ji ber dixwazim bi van mirovan re hinek tiştan bikim.**

**- Beriya salekê çûm Başûrê Kurdistanê. Gel pir bê însiyatîfe. Hemû tiştên wan di destê yên din de**

**bû. Bi qasî ku dibînim li Başûrê Kurdistanê însiyatîfa PKK'ê jî heye. Partî weke miroveke nû û geleke nû ye.**

**---.:Di nava me de ger li ser doşeka mirinê jî be, mirovê herî baş ji kesê nexweş derdixin. Tiştên ji hêla yeke din ve bi destê yeke din tên kirin, wê te nede jiyîn. Ev rastiyên bingehîne. Kurd bi serî rakirineke bi vî rengî re encax dikare bihêz li hember dijmin bisekine. Ji Kurdeyatiya ku bi destê hinekedin pêk tê re, ji xwe re hinekedin par derxistine. Ger rojekê ev xwe paşde bidin tu yê bikevî. Ya herî girîng dîtina we ya kurdê nû ye, him jî piştî demek dirêj şûnde. We ev dît û we giyana xwe ciwan kir ne wisa?**

**- Min giyaneke nû, hêviyeke nû û baweriyeke mezin girt.**

**---.:PKK di zanebûn û zanistê de pir bihêze. Rastiya Kurd pir baş vekir. Cewher û taybetmendiyên Kurd pir**

**baş danî holê. Îro êdî dibêjin; "*meseleya Kurd gihaye asta qada nav-netewî û mijara Kurd girînge.* " Beriya niha tevî ku hûn pir zêde li Ewrûpa mabûn jî zêde nirx ji we re nedihat dayîn, lê hûn niha vê nirxê dibînin. Kerameta Kurd li ser vê rastiyê ye, ev xaleke pir girînge. Dibêjin; "*Li her deverê heme, ez Kurd im*" û kerameta meselê jî eve. Ez xwe jî li ser vê bingehê dinirxînim. Ji derveyî vê bi ti awayî ez hebûna xwe li ser "*filan dewlet ji min re vê got*" îfade nakim.**

**Mesela, encama min ji Almaneke ku nas dikir (hûn jî dizanin Alman xwe gelek mezin dibînin) derxist holê ev bû; di wan de hebûna kesayetekê him di mejî him dil de hatiye destgirtin. Ev ji bo siyasetê esase. Alman nirx dayînê dizanin, nas dikin. Pîvana nêzîkatiya ji serokekî re dizanin û dibêjin; "*diyare Kurd jî dizanin hinek tiştan ji bo xwe biser***

***bêxin.* ”** **Ya girîng eve; tiştên di salên dawî de bûne her tim ji bo we bûn, ne ji bo min. Temenê we derbas bûye, lê hûn dîsa xwe ciwan dibînin.**

**- Qîmeta min heye.**

**---.:Belê qîmet jî heye, hûn ciwan jî tên dîtin. Hûn bi qasî xorteke 15 salî xwe ciwan dibînin.**

**- Û dîsîplîn heye.**

**---.:Piştî evqas sal şûnde hatina we ya vir baş bû. Piştî 15 sal şûnde Gelê Kurd dîtin wê ji bo we bibe mîna şahiyekê. We evqas êş kişandiye, evqas xeterî dîtiye, tişta herî baş jî em li we bikin eve.**

**- Dixwazim Kurdistanê bibînim.**

**---.:Belê dilê mirov dixwaze gelek tiştan bibîne, lê ev jî biqasî Kurdistanê mezine, nîvê şoreşê ye. Encamên wê gelek mezinin. Dîtina van rojan wisa hindek nîne. Osman Sabrî jî 90 salî bû û digot; “*me van rojan jî dît bese.* ”**

**- Hemû Kurdên ku min dîtine ji min re gotine ev şoreş namire.**

**---.:Ger em bimirin jî xeman naxwin, bi hezaran Kurd hene. Lê dîsa jî em dixwazin tam serkeftinê bibînin. Yên ku karîne van rojan bibînin, dikare rojên piştre jî bibîne. Yên ku ev serkeftin dîtine, dikarin di tevahiya Kurdistanê de jî serkeftinê bibînin. Heke hûn wisa bihêz li ser lingan mane herî kêm hûn ê bikaribin Kurdistaneke serbixwe bibînin. Dîsa weke yêkîtiya rewşenbîran, dikarin di Enstitûsûya Kurd de gavên pir baş bavêjin. Cabbar Qadir, hûn dikarin li ser rastiya Başûrê Mezin gelek baş bisekinin û gelek tiştan bibînin. Em Başûrê Mezin naberdin.**

**Cabar Qadir: Em nikarin qut bibin, welatê me ye.**

**Abdulah Ocalan: Lê li vir ketîbûneke mezin û qutbûna ji şoreşê heye. Pir zêde bûne xwedî rihê bazirganiyê.**

- Şoreş nemaye.

---.: Weke ku şoreş nemaye, xwe firotina qurûşan heye. Ev tiştek pir xirabe. Di vir de berpirsyariya we jî heye, hûn çi ji xwe dikin bikin, lê ji şoreşê qut nebin. Û nekin ku Kurdbûn bi quruşan bê firotin. Ger ku armanca we mezin be, ji xwe di Başûr de welatparêzî heye. Bila xwîna evqas şehîd vale neçe. Heke hûn li ser vê nesekinin, wê ji bo we tiştek qet nebaş be. Çi dibe bila bibe pêwîste xwedî li xwîna şehîdan bê derketin. Bêguman xwedî li gelê Başûr jî derbikevin, ji gel dûr nekevin, wêrek bin, alîkariya PKK'ê jî nehindike. Em destê xwe ji Başûr nakişînin. Wê şoreş li wir jî bidome. Gelek bi rihê şoreşê tê lîstin û gelek hesap li ser tê kirin. Nemaze em ê bi israr serde biçin.

- Ya rastî li Başûr şoreşek heye. Rewşenbîrên li wir rastî her tim esas girtine, bi gelê xwe re hevgirtin

**çêkirine. Lê serokatî, berjewendiyên gel esas negirtiye. Ev sê sale ez ji Başûrê Mezin qut bûme. Di dema îsyanan de li wir bûm. Niha li wir gel tenê hêviyên xwe bi PKK'ê ve girê daye. Min li ser Bakurê Kurdistanê lêkolîn kir. Ji ber wê rewşa Bakurê Kurdistanê baş dizanim; ne weke Kurdek, weke lêkolînvanekî.**

**---.:Cudahiya îsyanên li Başûr-Bakur û cudahiya PKK'ê çî ye? Ferqa kesayeta di nava PKK'ê de pêş dikeve, ferqa Kurdeyatiya pêş dikeve û li ser navê Kurdbûnê tiştên li Başûr pêş dikeve çî ye? Ev pirsên pir girîngin. Nivîskariya we jî heye, divê li ser van baş bê sekinandin û hewce dike hûn bênin rewşa pirtûkê.**

**- Belê di derbarê van de nivîsên min hene. Lê ji ber min Soranî nivîsandine gelê Bakur fêm nake. Pirsgirêka me eve.**

**---.:Başe, Soranî binivîsin. A rastî gelê Bakur dixwaze pêş bikeve, lê**

**fersend nadinê. Mehrûmiyeta ji bîrdozî û siyasetê gelê Kurd tînî kiriye. Dixwazin nêzî PKK'ê bibin, lê di sabir û înatê de lewazin. Jiyana nû nizanin, nagihin sebra me. Di taybetmendiyên PKK'ê de sabir, tehemûl, usûl û tempo çî ye? Divê hûn van hinekê vekin. Heke derfetên we hebe vekin, bikin pirtûk. Beriya hemûyan pêwîste ev ji gelê me yê Soran re bê ragihandin. Soranî-Behdînî ferq nake, lê bi misogerî ji Kurdan re ragihînin.**

**Ji niha şûnde dikare ji PKK'ê encamên mezin bên girtin. Tişteke ku min di Kurdan de dîtî heye; di Kurdan de çavdêrî û nêrîna li berfirehiya wê nayê zanîn. Nêrîneke dîrokî, pêwîste bibe nêrîneke ku esasên bingehîn pîvan bigire. Divê nirx ji tiştên vale, bê encam, bê nirx û nebingehîn re neyê dayîn. Divê li gorî guncaviya usûla wê mirov xwe ji nû ve ava bike.**

**Gelek kes van dinivîsin, lê kêmaniyan dikin.**

**Mesela, pirsekê dipirsin dibêjin; "*Hêştir çî ye*" lê hewl didin bi mûyeke hêştirê ve, hêştirê bidin nasîn. Ji bo naskirina hêştirê divê tu li pişta wê, lingên wê temaşe bikî û tu dikarî wisa nasbikî. Evesasên hêştirê ne. Lê nivîskarên me hêştirê bi muyên wê ve didin nasîn. Wisa nayê naskirin. Usûl gelek girînge. Ger li ser navê Kurdbûnê tê xwestin ku xalên esas bên girtin, divê li vir xalên esasî bên dîtin. Ji bo we jî ev xizmeteke, dikare encamên baş bê girtin.**

**- Em gelek cuda li dîrokê temaşe dikin. Çima Gelê Kurd nexweşe? Çima heya niha serkeftî nebûne, çima hemû îsyan neserkeftîne? Çima di hemûyan de sîxûrek, xayînek heye? Dema Seyîd Riza hebû Rayber jî hebû, dema Şêx Seîdê Pîranî heyî Qasim jî hebû.**

**---.:Mifteya Kurdan di destê me de ye. Kurdeyatî digihe serkeftinê.**

**Em bûne yek, vê bibînin. Piştî ev hat dîtin şûnde, Kurdeyatiya ku 20-30 sale di rêya wê de dimeşin nû û bihêz bûye. Pêwîste gelê me ji bazirganan re neyê hiştin. Divê kes bi erzanî nekeve neçe. Ewqas xwîn hatiye rijandin, pirsgirêkên wan hene, derdê wan hene, belayên wan hene. Divê em bikaribin bibin çare.**

**- Rêberê min, di hemû parçeyên Kurdistanê de, heta gundek tenê jî bê rizgarkirin em ê erê bikin. Çi kurdek, li kî derê serkeftî bibe em ê kêfxweş bibin. Rewşenbîrî eve. Rewşenbîriya rast bi gelê xwe re bûyîne.**

**---.:Belê netewbûn bi vî rengî dibe. Yê rewşenbîr be wê bi wêrekî û serkeftî li gel miletê xwe be. Bixwe bawer bin, hûn dikarin tiştên baş bikin. Lê divê mirov, di cihê xwe de veguherînê bide çêkirin. Mirov nikare bi fikir û jiyaneke paşketî ve mezin bibe, van bibînin û dûrî xwe bikin.**

**Xwe ava bikin. Pêwîstiya Kurdeyatiyê bi avabûnê heye.**

**Kurdayatiya heyî, Kurdeyatiya dijmin afirandiye. Ez jî hîn ji xwe nerazîme. Ez her tim pirsa "*kî min çawa afirandiye*" dipirsim. Beriya lêdana dijmin, ez her tim li xwe didim. Her tim guman dikim ku hinekan min ji bo xwe afirandibe. Dibêjim belkî hinek bikaribin bibin xwediyê min.**

**Na ez nikarim vê qebûl bikim.**

**Hedefeke min û sozeke min ji xwe re dayî heye.**

**Tu bixwe çendî ji bo xwe bikî, ewqas jî ji bo miletekê dikî. Fikirandina mirov li ser xwe tiştek xirap nîne. Kurd ji xwe raziye, lê di nava şermbûnên mezin de ye. Nikare kulmek tenê jî li dijminê xwe bide. Wê demê ev kesayet çawa dikare ji xwe razî be?**

**Kurdistan Mukriyanî, hûn taybetmendiyên keça Kurd li vir jî dibînin?**

**Kurdistan Mukriyani: Keça kurd nîvê civakê ye. Ger jin neyê xilaskirin, civak nikare xilas bibe.**

**Abdulah Ocalan: Bêguman, ma me keçên Kurd çima anîne van çiyan. Her kes dibêje; "*Karê van jinan li vir çiye, çi kareke me bi jinan re heye, ma li vir wê pirsgirêka jinan çawa bê çareserkirin.* " Ma berê guncav bû keçek bi serê xwe biçe çiya û bikeve nava civakê? Belkî hûn jî di jiyana xwe de ne azad bûn. Heta dibû ku we dabûna hinan û we dengê xwe dernexistiba. Me jî bi temamî berevajî vê weke hedef danî pêşiya xwe. Me sedî sed keç serbixwe kirin. Ev hedefeke min e.**

**Yên ku ne yên kesî, tenê aîdê xwe ne, dikarin azad û serbixwe bimeşin.**

**Me jineke di fikrê xwe de serbixwe, di dil de serbixwe, bi kesî ve negirêdayî, ne jin û destgirtiya kesî, jina gel, partî û şer afirand. Lê**

**heya niha fikrê zilamê Kurd di jin û keçan de bû. Digotin; "*Yan ya min e, yan ya min e, ne ya keseke dine.* " Min ev guhert. Ev şoreşeke mezine.**

**- Ev bi serê xwe şoreşeke. Tevlîbûna jina Kurd a ji xebatan re şoreşeke. Lê ez şoreşeke cuda, yanî di ziman de jî şoreşê dixwazim.**

**---.: Kurdî nebe nabe, lê hinek rewş ji mirov lezgînî dixwaze. Tê xwestin ku fêrbûna hinek tiştan zû çêbe. Heke hûn bi Kurdî bikin tiştên hûn di mehekê de fêr nebûyîn, dikarin di mehekê de bi Tirkî fêr bibin. Yek ji sedemên vê eve. Berê tenê digotin ziman, hinekan ji bo vê rêxistinbûn çêdikir. Digotin; "*heta ziman azad nebe, Kurdeyatî nabe.* "**

**Bê ziman Kurdeyatî nabe, lê bi ziman jî nikarin kurdeyatiyê azad bikin. Divê hinek tiştên bingehîn bên azadkirin ku, wê demê dikarin hinek tiştên din jî azad bikin. Em bêjin ku ziman azad bû, lê ev car kurdeyatî ne**

**azade. Hûn tenê bi ziman nikarin xizmetê ji kurdeyatiyê re bikin. Hinekan digotin; "*hûn azadiya ziman, yan jî otonomiya çandî dixwazin.* " Ez beriya azadiya ziman û çanda Kurd, azadiya Kurdeyatiyê dixwazim. Ji ber vê ev gav tên avêtin. Dema Kurd azad bûn, çi dibe bila bibe wê ziman azad bibe.**

**Heke kes azad nebe, çiqas jî bêje; "*min ziman azad kir*" wê rast nebe. Çima? Ji ber ziman, girêdayî Kurdeyatiyê ye. Bêyî Kurdeyatî hebe wê ziman û çand aîdê hineke din be.**

**Dema ku Kurdeyatî azad bû, wê ziman jî azad bibe.**

**Em şoreşa xwe bi zimanê Tirkî dikin. Zimanê Tirkî, ji bo me bûye çekeke mezin. Em jî bi vê çekê li dijmin didin.**

**Kurdeyatî hat afirandin.**

**Beriya ziman rih pêwîste, yanî beriya gotin hewandin, çawanî girînge.**

**Di welat de Kurdeyatî roj be roj bihêz dibe. Em dikarin di rojekê de tirkî rakin, qedexe bikin, lê wê ev biryarek ne di cî de be! Bila erebî jî bixwînin, bila bi zaravayên kurdî jî, Soranî, Dimilkî bixwînin, nepirsgirêke. Lê ji bo gel hinek tişt hene ku beriya her tiştê tên.**

**Ev şerê min yê ji bo welat û xakê ye, ji bo yekbûna hemû kurdane. Çi ziman dibe bila bibe, ji bo xwe şerkirin girînge. Ev axaftin ji bo me hemûyane. Nabe bê gotin ku "*her tişt bi Soranî bikin*" yan jî "*Kurmancî baxivin çareser bikin.* " Heke welat serbixwe bibe, wê Soran jî, Kurmanc jî û Zaza jî nesîbê xwe bigirin. Wê Soranî jî, Kurmancî jî, Zazakî jî nirx bidest bixe. Û piştre ji hêla xwe ve dikarin pêş bixin. Dikarin Kurdbûnê jî pêk bînin. Di kîjanê de aliyên baş hebe dikarin bikin yek. Di kîjanê de aliyê kurdeyatî bihêz dike hebe, dikare di pîlana pêş de cî bigire. Bi**

**demê re wê zimanê Kurdî hîn pêş bikeve. Lê ger Kurdistan azad nebe, wê ne nirxeke Kurmancî, ne Zazakî û ne jî Soranî hebe.**

**Destpêkê ne Kurmancî, Soranî, Zazakî, divê di destpêkê de Kurdeyatiyeke bingehê wê xurt bê pêşxistin hebe.**

**Kurdbûn, xak û welat!**

**Ne herêm yan jî mintiqa, bi temamî dibêjin welat. Em riheke nû ava dikin û niha vê di pîlana pêş de digirin.**

**Me jî dikarî her tişt bi kurdî bikin, nirxê wan jî heye, nabêjim bila bi temamî bê înkarkirin. Lê niha pirsgirêkên me yên mîna agir hene; pirsa ku tê kirin azadiya welat, yekparetiya gel, yekparetiya gel çiye. Em napirsin kîjan eşîret, kîjan qabîle çiyevê jî girîng nabînin.**

**- Heke em bigihin desthilatiyê, em mafê xwe bigirin, wê hemû**

**pirsgirêkên me çareser bibin û em ê bigihin hedefa xwe?**

**---.:Hûn dikarin di derbarê Kurdeyetî û zanista ziman de erkeke mezin bigirin. Lê Kurdeyetî niha xeniqiye, di vê rewşê de hûn nikarin xizmetekê ji bo Kurdeyetiyê bidin. Her ku şer pêşket, pêşveçûna ziman û serweriya wê dê ji hêla yên weke we ve bê pêşxistin. Hûn amadekariyên xwe bikin, bi şerê ji bo serxwebûna welat tê meşandin ve werin girêdan, piştre bi serxwebûna ziman ve werin girêdan.**

**Niha ziman ji bo min astengiyeke. Ez bi destan, lingan û çavan daxivim. Ev nayê wateya ku nirx nadim ziman. Berevajî ji bo ziman bingeh amade dikim. Xizmeta ji ziman re jî bikim eve. Ger bêjîn gramêra Kurdî çiye û nivîsa wê çawa baş bibe, ez nikarim van bikim. Ger serê min jêbikin jî nikarim baş kurdî binivîsim.**

**Ev nayê wateya ku nirx nadimê. Nirx didimê lê niha ne dema wê ye.**

**Bi kurdî baş diaxivim. Lê em şerê xwe bi zimanê Tirkî baştir didim meşadin. Dibêjin;"*ev kurdek çawa yeher tiştî bi tirkî dibêje, ev kurdek çawa ye ku her tiştî bi zimanê me dike.* " Ez jî dibêjim, "*ger te zimanê xwe bi zorî fêrî min kiribe, ez ê jî vê mîna çekekê li hember te bidim bikaranîn.* "**

**Hûn ê bi sîleha dijmin lê bixin.**

**Ziman sîleheke.**

**Mêrxasiya herî mezin, çeka dijmin jê girtin, li hember wî dane bikaranîne. Me wisa kir. Ya girîng tenê ne ziman, tiştên din jî girtine. Ez bawerim di derbarê çand û wêjeya Kurd de xebatên me hene.**

**Hûn kîjan aliyên Kurdeyatiyê mereq dikin, dixwazin kîjan aliyên wê fêr bibin? Hûn kîjan aliyê Kurd bi mêzandineke hemdem dibînin? Ya ku îlham dide we çiye?**

**- Ev şoreş ji bo gelê Bakur pir pêwîste. Ev şoreş, hemû gelê Bakur rakir ser lingan. Heta zimanê wan jî nedizanîn.**

**---.:Belê şiyarbûnek, wêrekî, fedekartî heye û ev tiştên girîngin.**

**- Şoreş ewqas mezine ku, wê êdî mirovê Kurd xwe nas bike û hatiye asta beşdarî şoreşê bibe.**

**---.:Cuda çi heye, hûn dikarin ji bo wêjeyê çi bêjin? Wêjeya cîhanê bi çi re eleqedar dibe? Li ser kîjan taybetmendiyê mirov disekine? Li gorî we rola wêjeyê çiye?**

**- Pêwîste wêje di bin xizmeta şoreşê de be.**

**---.:Wêje rihê mirov diafirîne. Mirovan rihet û baş dike. Ji dirûv bigirin, heta cewher teşe dide. Berê hinek pirtûk dihatin nivîsandin. Wêjeya Rus, wêjeya Fransa, Îngiliz, Alman hwd. li ser navê gel wêneyên xwe, nivîs û wêjeya xwe afirandin. Tiştên wisa afirandin ku; bersiva**

**pirsên wan yên weke “Fransiyek baş çawa dibe, Rusiyek serkeftî çawa dibe?" didin. Wiha wisa girtine dest. Di me de bi ti awayî wisa çênebûye. Hunermendên me nekarine bikin, firsend nedîtine yan jî xeniqîne çûne. Ancax niha nû nû tê xuliqîn.**

**- Pêwîste bi şoreşê re bê afirandin.**

**---.: Bê şoreş nabe, şoreş esase. Lê ji şoreşê re jî huner pêwîste, şoreşeke bê huner nabe. Şoreş bingeha hunere, bingehê wê ye. Divê huner ji sedî sed li cihê xwe rûne. Huner li vir wateyeke çi radike? Dibe şeklê Kurd, zimanê Kurd, mêrxwasiya wê, uslûbê wê, dîtina wê, taybetmendiya Kurd û karekterê wê. Ji bo gelekî ji derveyî vê ti armanceke din yê hunerê nabe. Ev jî di nava derfetên şoreşêde ji xweber pêktê. Tiştên niha derdikevin holê alavin. Alav, nirxên hatine afirandine. Ev nirxên hatine afirandin ger bizanibî**

**bikar bînî, ancex wê demê dikarî bêjî serkeftîme.**

**Berê tiştên bi vî rengî nînbûn. Madiyet-maneviyat nînbû, lê niha madiyet jî maneviyat jî heye. Berê wêrekî, bawerî nînbû; niha hemû heye. Berê giyan nînbû, bê henase mabûn, xeniqîbûn. Em nû nû giyan didinê, lê nebese. Divê hûn weke bijîşkek, sinetkarekî bigirin dest.**

**Em dibêjin; Ey Kurd! Bi ziman bibe, zindî bibe, bibe xwedî nêrîn-karekter, bibe xwedî edep, exlaq, ji qirêjî û zengara berê paqij bibe. Hûn dikarin gelek tiştan bi riya wêje, bi şûrê wêjeyê çareser bikin.**

**Di wê baweriyê de me ku ji niha şûnde bi me re di qada wêjeyê de pêşketin çêbikin. Rê li ber yên ku dibêjin, "*dixwazin ji bo Kurdeyatiyê tiştek bikin*" vedibe. Ev ji bo we jî dibe gaveke baş. Jinên Kurd jî ji nû ve tên afirandin. Em gelek bihêz li ser wan disekinin. Li ser dayîk, bav,**

**zilamên wan sekinîne, lê ji ber afirandina wan nezanîne me helandine. Lê ya me cuda ye; bi rêbazeke nû re wan diafirînin.**

**Divê keç û jinên Kurd careke din bên afirandin. Ger em pir hêldar nebin, wê di destê me de bibin bela, weke miriyanin.**

**- Bi qasî min dîtiye jinên Kurd pêşketine, guhertina wan dibînim. Zilamê Kurd paşde maye.**

**---.:Afirandina jinê, tê wateya afirandina jiyanê. Di kurdî de peyva jin ji jiyanê hatiye. Yanî jin bixwe jiyane. Jin û jiyan heman tişte. Lê niha jin ne jiyanê, mirinê temsîl dike. Divê jin û jiyan bi hev re bên destgirtin. Wexta ku ev bûn yek, wê demê zilam jî ji nû ve dikare bê afirandin. Ji xwe zilamê Kurd jî him ji jiyan, him jî ji jinê dûr ketiye. Him xwe, him jiyanê û him jî jinê mehf kiriye.**

**Zilam, jin ji xwe xirabtir kiriye. Em şereke mezin didin. Her kes dipirse dibêje; "*çawa van bi hev re û li hember hev di nava têkoşîneke de dide jiyîn.* " Ji wan re dibêjim; "*ji bo têkoşîneke mezine.* " Hesabê salan tê dayîn. Pirsgirêk ne meseleya keçek-xortek hevdu hez bike, bireviné ye. Ev, ji bo Kurdan mirine. Ez li ser vê pirsgirêkê him pir bihêz, him jî bi awayeke objektif disekinim. Bi hestiyarî tevnagerim û nirxê jinê jî dizanim. Ketîbûna Kurd jî nasdikim. Ev, herî zêde di mijara jinê de û di nav malbatê de çêdibe. Min van pir baş dît, dest avêtê û vê mezinbûnê li ser vî bingehî diafirînim.**

**Min pirsa Kurdek çawa bê afirandin kir. Çawa ketiye, çawa bênamusûyê dike, çima bêfehme? Serde çûm, min jin jî zilam jî rakir ser lingan.**

**Di Kurdistanê de civak herî zêde di pirsgirêka jinê de hatiye xistin.**

**Heta ku pirsgirêka jinê neyê çareserkirin, zilamê Kurd jî nayê dahûrandin. Bêguman, ger zilamê Kurd jî berdî wê bibe belayek mezin. Wê bi temamî bikeve bin xizmeta dijmin.**

**Pirsgirêkek mezine. Ya rastî di çend pirtûkan de pirsgirêk dikare bê vekirin. Lewra ev jî karê wêjevan û nivîskarane.**

**Zilamê Kurd kiye, di xizmeta kê/î de ye, zilamê Kurd çawa jiyan dike? Qehremantiya zilamê Kurd çawa ye? Ez li ser van disekinim.**

**Em heya jinekê bi ziman dikin, dikin xwedî meşeke mezin û zana bibe şereke mezin didin.**

**Berê jin kî bû, keç kî bû?**

**Kî birevandiba ya wî bû, malê wî dihat hesibandin. Nedikarî gotineke tenê jî ji devê xwe derxîne. Û zilam jî heya bêjî ji vê razî bû. Vekiriye ku, zilamê jinê wisa li gel xwe digire ketîbûna herî mezin jiyan dike. Jin**

**wisa girtin, weke milkê xwe nêzbûyîn û mîsyoneke wisa lêbarkirin kuştina jinê ye. Çima? Ji ber bê zimane, bêramane û nexwedî biryare. Ger ku zilamek bêje; "*min wê revand, bi pere kirî, min bi hêza xwe girt*" tê wateya rihê wê girtiye. Mirov dê ji vê jinê çi fêm bike? Wiha, jina Kurd jineke wisa kole ye. Bê zimane, bê kesayete û pir ketiye. Ji ber vê jinê ber bi azadiyê ve dibezînim. Beriya zilam xwe binase! Dilê te çiqas bi welat re ye, çiqas bi azadiyê re ye? Tu çiqas bi welatê xwe, partiya xwe re yî, çiqas di nava şer de yî? Heke wisa nebe ji jinê re zilam nîne.**

**Ji bo zilam jî, ger tu keçek dixwazî, jinek dixwazî; divê tu destpêkê bi xaka xwe re, azadiya gelê xwe û şer re bibî yek. Heke şer nekî, xwe nû nekî, tu nikarî li gel me xwe bikî qehreman û bibî hevalê me. Ger nikarî bi dijmin, nikarî şer bikî lewra nikarî bêjî "*ez zilam im*. " Heke**

**zilamtiya xwe qebûl nakî, tu jinekî! Dikarim îsbat bikim, tu jinekî. Yê ku nikare bi dijminê xwe, li ser jinê xwe zilam dihesibîne.**

**Li hemberî dijmin kole, li ser jinê jî zilamê mezin, axayê mezin, destpot û dîktatore! Dijmin her roj lê dixe, ew jî tê li jinê dixe. Hemû hêrsa xwe li jinê derdixe. Ev, heqareta herî mezin li jinê ye. Jin hîn deh-pazde salî hewl hatiye dayîn bê xistin. Ne giyana wê, ne jî ramanên wê maye. Zilam jî serê kêliyê lê dide. Niha zilameke wisa çawa dibe bê qebûlkirin?**

**Ez parazvanê rastiyanim.**

**Tişteke li hember bibim heya dawî şer dikim, heya negihim encamê devjê naberdim. Yan wê bên rastiyan, yan jî ez devji wan bernadim!**

**Heke li hember dijmin ne xwedî şereke rast bin, ez ê çeka wan qebûl nekim. Wê demê ew bi çekê şer nakin, bi çekê dileyîzin. Me çek da dest wan daku pê li dijmin bixin. Lê**

**ger hinek bêjin; "*ez ê li gorî bere bi rêbazên berê îsyan bikim*", em jî dibêjîn "*na, ev nayê qebûlkirin.* " Çeka min dayî nabe ji dijmin re bimîne. Jiyan, giyan û rihê ji te re hatî dayîn, tu yê li hember dijmin ji bo şereke mezin bikar bînî. Heke bi vî rengî li hember dijmin neyê şerkirin, wê demê em ê bi we re şer bikin.**

**Me baş binasin!**

**Heya dawî azadî heye, heya dawî serxwebûn heye. Lê hûn jî neçarin xwe ji nû ve biafirînin. Divê sebra we, berxwedaniya we çawa be? Pêwîste ev bi awayeke herî baş û rast bê bersivandin.**

**Mirovên mêrxas tên afirandin.**

**Her yek ji ew keçên ciwan yên xwe dişewitînin, bi hezaran keçên ciwan yên ji bo teslîm nebin bombayên xwe bi xwe de diteqînin qehremanin. Ev çalekiyên ji bo teslîmê dijmin nebin û nekevin**

**tarîtiyê gelek bi wate ne. Me ji bo jinê jî mezinbûn afirand.**

**Qehremantî û jiyaneke nû ya Kurd ku teslîm nabe hat afirandin.**

**Ev, qazanceke mezin û têkoşîneke mezine.**

**Ev, di heman demê de ji bo gel jî erkeke mezine.**

**Civakek tê afirandin. Jin hêzeke mezine û heya dawî jî bi me re ye. Ev girêdana wê ne bê sedeme. Me tiştên ji zêr binirxtir da wan.**

**Onura mirov, xwesertiya mirov, azadiya mirov ji her tiştî binirxtire.**

**Berê nirxê jinê bi pere û zêr dihat pîvandin. Lewra niha tiştên ji zêr binirxtir hene û êdî pîvan ev nirxên tên dayîne. Niha di nava refên me de ji keçeke me ya milîtan re kîseke zêr bidinê, bi misogerî wê qebûl neke. Lê çend tiştên rast bêjin, çend tiştên rast bidinê wê heya dawiyê bi riheke fedaî bi we re be. Ya girîng bawerî ye. Hûn dikarin di xebatên xwe de, bi**

**taybet jî di mijara ziman de hîn zêdetir bawerî bidin û hîmên bingehîn bavêjin. Divê hûn bi azadiya jinê, jiyanê bawer bikin, wê demê hûn dikarin tiştên mezin bikin.**

**Amed Tîgrîs, hûn ji Lîcêne û niha Lîce dişewitînin, gundên wan vale dikin. Lîce bi şoreşê re ye, pêşengiyê jî dike. Heta bêjî şer kir, gelek şehîd da, di girtîgehan de li hember îşkenceyên dijmin li ber xwe dan. Lê hûn li Ewrûpa man. Hûn jî bi Kurdeyatiyê re bûn. Di rihê we de hinek germbûn û di ramanên we de Kurdbûn hebû.**

**Amed Tîgrîs: Ya rastî ez bi pedagojiya mirov ve mijûl dibim.**

**Abdulah Ocalan: Yanî terbiye, edep. Ev tişteke xweşike. Hûn ê bikaribin terbiye û pedagojiya di nava PKK'ê nas bikin? Yek jî hûn mamostene û li ser mirovan dixebitin. Li Stockholmê mirov dikare gelek tiştan bike. Li wir li hemberî me jî**

**gelek tişt tên kirin. Dixwazin li wir Kurdeyatiya serserî, ji rêzê û sivik bidin meşandin. Hûn niha Kurdeyatiya mezin jî dibînin. Di vê derbarê de hûn dikarin çi bêjîn?**

**- Min dahûrandinên Rêbertî yên di derbarê mirov de xwendin. Bi rastî jî xwedî hêza mirovê nû derbixe holê ye. Ji xwe min li vir bi çavê xwe jî dît. Qezenckirina Kurdan ya giyaneke nû gaveke pir girînge.**

**---.: Heke derfeta me ya dahûrandin û psikolojiyê hebûya, we yê ji van sûd wergirtiba û we dikarî di berfirehkirina psikolojiya Kurd de weke dane binirxanda. Em di dahûrandinên xwe de ji Freud zêdetir li ser psikolojiyê sekinîn û disekinin jî. Em hewl didin vê psikolojiyêne tenê ji bo Kurdan, di derbarê cîhanê de jî hewl didin bidin. A rastî me psîkolojî, siyaset û çand gelek nêzî hev kir. Heta me bi psîkolojiya leşkerbûnê jî**

**nêz kir. Yanî me pirsgirêkên Kurd yên psikolojik dît, li gorî wê bûn çareserî.**

**Giyana Kurd heye, nîne? Kurdbûn çiye? Yê ji xwe re dibêje ez Kurdim çiqas Kurde?**

**Taybetmendiyên mirovê Kurd çine?**

**Me destpêkê hewlda bersiv ji van pirsan re bibînin. Di hemû gelan de ev pirsgirêk çêbûne. Ya rastî pirsgirêka wêjeyê ya bingehîn eve. Pêwîste hûn giranî bidin van, ji yên hatine kirin re jî nirx bidin.**

**- PKK, ji keser, daxwaz û hesreta Kurdan ya hezar salî re bû bersiv.**

**---.: Ev, taybetmendiyeke min e. Yek jî pêwîst dike min jî nas bikin. A rastî dixwazim xwe bi mirovên li dora xwe û dostan bidim naskirin. Dîsa dixwazim wan bi wan bidim naskirin. Mînak; di avaniya me de ewqas hevalên bê çare û lewaz hene ku, heta nizanin li dora xwe jî temaşe bikin.**

**Dixwazim xwe pir baş nasbikim.**

**Yek jî ez ji mirovê ketî, bê rih, belengaz û bêhêz nefret dikim. Yê ku rastiyên wê/î yên mezin nebe bênamûsê herî mezine. Bêçaretî felaketa herî mezine. Ji hundurê min wisa derbas dibe ku şûrek li stûyê wê/î bidim jêbikim, lê dîsa avaker nêz dibim.**

**Hûn dizanin Kurd çawa ye. Hûn li ser Kurdan, li ser pedagojî û terbiya Kurdan disekinin. Yek jî divê hûn li ser xwe jî lêhûrbûn çêbikin û hinek tiştan bikin. Pêwîste hûn bi xwe bawer bin, divê wêrekiya we jî hebe. Qet hewce nake hûn bêjin "*ez Kurdek li paş mame.* " Dibe ku Lîce weke tê xwestin we mezin nekiribe. Lê mirov bi xwe dikare xwe perwerde bike. Heke hûn xebata xwe li ser bingehên baş bidin meşandin, ji sedî sed hûn dikarin ji bo Kurdan bibin pedagogek baş û wêjevanek mezin. Bi israr bin û bi wêrekî ser bisekinin. Bi vî rengî**

**dikare hinek tiştên baş ji bo Kurdan bê kirin. Madem mijûlahiyeke we heye vê hîn zêdetir kûr bikin, mayînde bikin û hewl bidin vê bixin bin xizmeta Kurdeyatiyê.**

**Dijmin heya niha ji gelê me re gotiye; "*tu ne tiştekî, hûn nikarin tiştekê bikin.* " Heke xwe bifiroşe dijmin, keseyeteke ku ji derveyî jiyana xwe ya ferdî tiştek nefikire, bibe nebe dibe şaxeke dijmin yê herî baş. Polîtîkaya dijmin ya heya niha li ser civaka Kurdistanê hatiye sepandin bûye ev. Dijmin ji yê xwe xilas dike re dibêje, "*qehremanê herî mezine, mêrxase*. " Ev îdeolojiyeke dijmine, exlaqeke dijmine û pedagojiya dijmine. Dijmin wisa terbiye kiriye. Kes nikare bi vî rengî xwe azad bike û mêrxas bide nîşan.**

**Heke netewbûn û civakbûn nebe nikare bibe qehreman. Heta mêrxasî ji bo eşîrek jî, ya eşîretê dibe serkeftinê ye. Lê xwe gihandina**

**serkeftinê, bûna xwedî mal-milk, xwe xilaskirin û bi destxistina rehetiya xwe re mirov nabe mêrxas. A rastî ev ketîbûna herî mezine. Mêrxasî, ji armancên mezin re; welat, xak, karên mezin û bi şerên mezin ve hatina girêdane. Ji bo gel partî birina serkeftin û zaferê ye. Ger wisa neyê kirin bêguman nabe mêrxas.**

**Wiha, ev hemû pedagojiya Kurd û terbiyeya Kurde. Heke hûn dixwazin li ser bisekinin, ev xal heya bêjî girîngin. Hinek rewşenbîr xwe di van mijaran de dûr digirin, xwe ji gel, şer û şoreşê dûr dixin. Piştre jî dibêjin; "*em biaqilin, me xwe rizgar kir*. "**

**Derew!**

**Di Stockholm'de jî yên bi vî rengî hene. Ya rastî hewce dike fikrên bi vî rengî ji holê bên rakirin. Ez vê ji bo yên li Stockholmê tenê nabêjim, ji bo hemû Kurdistanê dibêjim.**

**Di nava têkoşînê de mirov di nava yekbûneke giyanî de ye.**

**Her tişt ji bo vejîna gelekî ye.**

**Kes nikare bêje "*ez*!"**

**Herkes di bin xizmeta armanca xwe de ye. Herkes bi hev re dixebite. Ti girîngiyeke ferdperestî û xweperestiyê jî nîne. Li Ewrûpa mirovên wisa bihêz dîtin jî nemûmkûne. Kesayetên wisa tenê dikarin di nava PKK'ê de bibînin. Di roja me ya îro de kesayetên fedekar û ser mirinê de diçin zû nayên dîtin. Kesayetên wisa dîtin ji xwendina hezar pirtûkan, lêkolînkirinê hîn zêdetir binirxtire. Hûn ji bo cesaret qezenckirina mirov û ji nû ve qezenckirina xakê hatine gel me û ev wateyeke pir mezin îfade dike. Ji bo pêkanîna hemleyên mezin jî fersendeke girînge. Di jiyana xwe ya ji niha şûnde jî hîn bihêztir û bi serkeftiyan ve bimeşin.**

**Di Kurdistanê de partî çareyeke mezine. Bê partî tiştek nabe. Bê partî huner jî nabe. Di welatên xelkê de**

**kesê Kurd wê bixeniqe, bêhenase dimîne. Partî ji bo we, ji xwarin-vexwarinê girîngtire. Giyaneke nû û morale. Berê derfet û firsendên we yek bû, niha hîn zêdetire. Yê ku xwe bi gelê xwe re bike yek mezin dibe. Heke ne dirû û sextekar be wê mezin bibe.**

**Hûn ê ji niha şûnde mezin bibin. Hûn neçarin mezin jî bibin, ser jî bikevin, ji derveyî vê careyeke we din nîne! Ya Hûn ê dirû, sextekar bin, yan jî hûn ê wisa mezin bibin. Rêyeke din nîne! Hemû rêyên kevin girtîne.**

**Cabar Qadir: Ez profesor kevin ê dîrokê me. Heft pirtûkên min hene. Pirtûkên min yên zanistî jî hatine weşandin û bîst û yek lêkolînên min yên zanistî jî hene. Ji bo şoreşa Kurd û tevgera Kurd jî lêkolînên min yên îdeolojîk hene. Min ji bo şoreşa Kurdistanê şerê çekdarî jî kir. Di heman demê de serbazbûm û siyasetmedar bûm. Li Ewrûpa min**

**heşt sal endamtiya PDK'ê kir û li Kurdistanê jî di polîtbûroyê de jî mûfetiştî kir. Çiqas kêmanî û şaşatî hebe hemûyan dizanim.**

**Min 1991 di şoreşa Başûr de cî girt, li Hewlêrê min jî şer kir. Di heman demê de min cihê xwe di rizgariya Kurkûkê de jî girt. Talabanî xwest min bişîne Baxdayê, lê min qebûl nekir. Dîsa di nava YNK'ê de jî xebatên min yên nivîsê hebûn. Gelek tiştan min dinivîsand, wan jî nîqaşa wê dikirin. Di sala 1975'an de li parçeyê Suriyê bûm. Ez, Fuat Mahsum û Cemal Reşîd bihevre bûn, yekem xebatên wê qadê me destpê kir.**

**Wê demê akademiyeke me ya bi navê "*Akademiya Kurdistana Azad*" hebû. Min li wir wane dida. Di destpêkê de tenê PDK hebû, piştre derbasî YNK'ê bûm.**

**Ez di wê baweriyê de bûm ku li Bakurê Kurdistanê têkiliyeke baş bidin avakirin. Min jî weke we komek**

**perwerde kir rêkir welat. Di heman demê de yekbûna gel jî diparast. Lê mixabin ji koma ku me ji Qamişlo rêkirî welat, li wêranşarê gelek şehîd bûn. Ev rewş min gelek xemgîn kir. Min biryar da ku ez careke din bi karên bi vî rengî re eleqedar nebim, ji ber ez gelek nirx didim mirov.**

**Ez çûm Hollanda, li wir di zanîngeha Laiben de xebitîm. Piştre bi pasaporta İraqê vegeriyam Kurdistanê. Di navbera salên 1980-90'î de li Kurdistanê mam. Di dema raperîna 1991'ê de difikirîm ku Komaleya Mafê Mirovan ava bikim. Ji sala 1989'an ve di nava xebateke bi vî rengî de bûm. Me ji bo wê çend civîn çêkiribûn, çarçoveya wê hinek ji bernama partiyê cuda bû. Bernameyeke mafê mirovan ya; di derbarê jin, zarok, xwendekar, maf-huquq û çandê hebû. Bîroya mafê mirovan ya ku me li Hewlêre vekirî, di**

**heman demê de dîroka Kurdan jî lîkolîn dikir.**

**Dubare çûm Hollanda yê. Niha li Hollandayê di derbarê dîroka Kurdan de xebatên min hene. Ez gelê Kurd û derketina netewa Kurd lêkolîn dikim.**

**Abdulah Ocalan: Mirovê Kurd çawa derket holê? Li ser kîjan civakê lêkolîn û agahiyên we hene? We kîjan ji wan baş lêkolîn kir, hûn herî zêde li ser kîjan serdema dîrokê serwerin? Dîsa herî zêde di derbarê kîjan civak û gel de xwedî agahîne?**

**- Ez Huriyan baş nasdikim.**

**---.: Hûn zimanê wan dizanin? Navenda Huriyan kîderê ye?**

**- Navenda wan, nêzî Wanê li Tuşvayê ye.**

**-Na ne li wir e, wir navenda Urartuyane.**

**- Navendên Huriyan gelekin. Muzî, Neylan dibêjin. Ev navendeke Huriyan ya girînge. Gelek dokumentên me yên li ser Huriyan**

**hatine nivîsandin hene. Li Kerkukê di derbarê nivîsê de 1200 tabletên me derxistine hene. Me ji Kerkukê anîne.**

**---.: We got tablet? We karî nivîsê derxînin? Mesela we kîjan peyv derxistin?**

**- Ne peyv, gramatîk, di derbarê gramer de bûn xwedî agahî.**

**---.:Di navbera peyveke Kurdî û zimanê Hurî de çiqas cudahî heye?**

**- Gelek tiştên ji wan ji me re mane hene.**

**---.: Mesela ji genim reçi dibêjin?**

**- Genim di zimanê Huriyan de jî genime.**

**---.: Mesela ji "*ga*"re çi dibêjin?**

**- Sûmerî ye.**

**---.: Sûmeriye ne wisa?**

**- Ne gaye Gamêşe.**

**---.: Bi Sûmerî "*zah*" dibêjin.**

**- Belê, "zah " tê wateya gamêş. Ev pevy jî ji Sûmeran hatiye.**

**---.: Başe, ma di Huriyan de "zah" nîne?**

**- Zah heye, "Sîzî" jî bikar tînin.**

**Abdulah Ocalan: Yanî dikare bê gotin ku di navbera zimanê Huriyan û Kurdan de nêzbûneke heye?**

**- Belê, piştî Huriyan Kakaşeyî tên. Ji xwe re dibêjin "*Kassî*. "**

**---.: Kassî kîne?**

**- Ji qada nêzî çemê Şîrvanê heta Guristanê jiyan dikin.**

**---.: Ji qewmên Zaxrosanin.**

**- Belê, ew Kaşûne. Zimanê wan çawa ma be, çawa zimanên Hint-Aryen, Hint-Îran têkil bûye, çawa pêwendî danîne, loma gelek peyvên wan jî mane û têkil bûne.**

**---.: Nêzî Soranî ye?**

**- Na, Soranî herî zêde nêzî Pehlevî ye.**

**---.: Nêzî Îraniyane?**

**- Ne Îran, zêdetirîn nêzî Pehlevî ye.**

**---.: Ma bingehê Kurdî Kurmanciye, yan jî Zazakî ye?**

**- "*Pehlî*" gotin tê wateya bajarî. Ji zimanê li bajar tê axaftin re "*Pehlevî*" tê gotin. Ji wê re Kurdê Fehlî tê gotin. Zimanê Kurdên Fehlî Pehlevî ye. Zimanê koçberan jî Kurdî ye. Beriya Îslamiyetê yên li bajêr nediman Kurdî, yên li bajêr rûdiniştin jî Pehlî bûn. Weke di Erebî de jî dibe, di wan de jî zimanên Bedevî û Kureyşî heye. Kureyşî zimanê koçberane û yê fermî ye.**

**---.: Yanî ji zimanê bajêr re Fehlî dibêjin?**

**- Belê, êdî ev hatiye rewşa diyalektîka Kurdan.**

**---.: Zimanê Soranî jî zimanê bajariyane?**

**- Belê, bi zaraveya Kurmancî ya Medan re gelek têkildare. Taybet bi Avesta re pêwendîdare. Taybet bi Deylemî re têkîldar. Deylemiyan jî di giştî Îraqê de hikûm meşandine.**

**---.:Yê Medan li kîderê ma? Ma ji dema Medan ve ev wisa ye?**

**- Dimiliyan demek li İraq û Kurdistanê hukum kirine.**

**---.:Li gorî nêrîna min kurdiya herî kevin Zazakî ye, lehçeya me ya yekeme. Kurdiya yên li çiya mane bikar anîne. Li gorî min ev xaleke girînge. Li ser zimanê Kurdên li çiya mane ti bandoreke biyaniyan nîne. Mesela kurdiya Botanê, Çewlikê, Dêrsimê ji kesî bandor nebûne. Kurdiya li vir beriya çarhezar sal çawabû, îro jî wisa ye. Ji ber vê dibêjim ku, kurdiya herî kevne, her çendî pêş neketibe jî pir kevne. Soran û Kurmanc kurdiya yên ji çiya çûne deştê bikar anîne. Kurdeyatiya li çiyê maye Dimilî ye, zimanê yên çûne deştê Kurmancî ye, yên li bajêr jî Soranî ye.**

**- Ev hemû zaravayên Kurdane.**

**---.:Ez wisa texmîn dikim ku, koka Huriyan û Kurdan gelek nêzî heve. Gelo pêwendiya Med û Huriyan diçi astê de ye?**

**- Mîtanî beriya mîladê sedsala 19. Beriya Azeriyan ji Bakur, Kafkasya hatine. Di bakurê Kazuriyan de ye. Gelek eşîr bi hev re ne. Hinek ji wan çûn Hindistanê, hinek çûn Anatolyê, hinek çûn Yûnanîstanê hinek jî hatin Kurdistanê. Zimanê wan Hînt-Arî yê kevne, ne Îranî ye. Mesela, di zimanê Mîtanî'yan de "*eyka*", tê wateya "*yek*", "*terra*", tê wateya "*Sisê*", "*çartuva*" tê wateya "*çar*", "*panse*",tê wateya "*pênc.* "**

**---.:Mittanî nêzî Hindistanê ne?**

**- Raste.**

**---.:Koka Hint-Arî ji kîderê tê?**

**- Li Turkmenîstanê jiyan dikin, hemû bi lehçeyên Îranê diaxivin. Niha mîna Azeriyan bûne Tirk. Mesela, beriya mîladê sedsala 10. Kurd li Azerbaycanê bûn. Wê demê Tebrîz paytexta Kurdan bû. Dewleta Revand, di dema begên Kurdan de kurê Veulan Memlan...**

**---.:Tirk weke Moxolan û Çînan ji qewmekê hatine. Beriya wan Hint-Aryen hebû, ne wisa?**

**- Belê, hemû Arî bûn, xwe ji nîjada Arî dihesibandin. Di derbarê vê de heya bêjî berhemên me hene.**

**---.:Kurd, Pakîstan û Afganîstan nêzî hevin, pêwendiya di navbera wan de bihêze.**

**- Belê, dînê wan jî heya bêjî nêzî heve. Navê xwedayê wan yê mezin Nifra ye. Di zimanê Îranê de ji vê re dibêjin Nîhra. Ev tiştên xweda anîne herî zêde di Elewiyan de belave. Di Hîndîstanê de jî heman tişte. İndra, Mesakya, Mahuna...**

**---.:Heya bêjî qewm hene. Medya Hammadî bû. Beriya vê kewmê Hurî, piştre Kassîdî û Mîtanî hene. Her yek ji van çend sedsal jiyan kirine. Çend sedsal bi vî rengî bû.**

**- Kurdistan jî navenda Çelçaçanê ye. Warê şaristaniya kevine.**

**---.:Warê medeniyete ye.**

**- Dema Hint-Arî hatin ew koçber bûn. Şaristaniyeke aîdê wan nebû. Ev bi şaristaniyên Kurd re eleqedar bûn û zimanê xwe serwer kirin. Ji gelek şaristaniyan pir tişt girtin. Xwedayê wan jî girtin. Asurî ji şaristaniya Huriyan pir bandor bûn. Mînak, di zimanê Asur de "*ga*" (bi Erebî "*hadeç*" tê gotin). Ji şaristaniya Huriyan hatiye girtin û xwedayê van yê asimane.**

**---.:Yanî Hurî beriya Asuriyan li vir in?**

**- Berî welatê Asuriyan yê Huriyan bû.**

**---.:Hurî di kîjan dîrokê de ji welatê xwe qut bûn?**

**-Ji destpêka dîrokê ve navê Huriyan heye. Beriya mîladê 2600 sal.**

**---.:Em dikarin bêjîn ku Kurdan; ji qewmên Huriyan, Medan, Hint-Ewrûpa pir tişt girtine. Xulîqîna çanda Kurd girînge û meseleyeke mezine. Di dîrokê de derketina Kurdan û**

**avabûna wan bûyereke mezine. Bawerim wê pêwendiya Kurdan bi deştê, bajar û koçberan re vebe. Koka Kurdan bi çend qewman ve girêdayiye? Ji ber vebûna Huriyan jî mûmkûne, bingeh Hurîne. Piştre Kassîdî, Mîttanî û Med tên. Başe ya Urartuyî?**

**- Zimanê Urartuyan, zimanê Huriyan yê hinek din pêşveçûyî ye.**

**---.:Yaa? Yanî hûn dibêjin ne Ermenî ne?**

**- Na ne Ermenî ne.**

**---.: Ermenî wisa dihesibînin. Lê hûn dibêjin ne Ermenî ne.**

**-Kiblegaha wan Rewandize. Hikumdarê wan her sal dihatin wir hecê bikin.**

**---.:Yanî hûn dibêjin Urartî, hinek li pêş Huriyanin. Eslê wan Huriye, lê gavek li pêşin.**

**- Belê, eşîreta wan ya herî mezin Deyafî ye. Li dorberê Tîflîsêye û hikûmdarê wan ji nav wan derketiye.**

**---.: Tişta girîng ya kevin lîkolînkirine û naskirina qewmên li Kurdistanê jiyan kirine. Hemû qewmên li Kurdistanê jiyan kirine li ser Kurdeyatiyê bandora wan çêbûye. Em nikarin bêjîn Kurd tenê ji yek qewmê hatine. Yê hinekan bihevkirineke hezar salî, yê hinekan jî ji bandorbûneke xwezayî çêbûye.**

**- Mesela di nava me de hinek seyid hene. Kurên Hûseyîn in, Kurdeyatiyê jî dikin. Wiha Şex Mahmut ji xwe re digot ez "*seyîd im*. "**

**---.:Ew bandora Erebane. Di Kurdan de bandora Ereban dîtin mûmkûne. Bandora Tirkan pir zêde ne girînge. Dîsa bandora Farsan jî dîtin mûmkûne, lê Fars û Kurd ji berê ve nêzî hevin. A rastî Kurd û Fars weke du baskane; yên li milê Îranê mane bûne Îranî, yên li vî milî mane jî Kurd in. Li vir yên beriya Ereban jî, Tirkan jî jiyan kirine Kurd in. Ev dîtineke berfirehe. Wiha, ne raste ku mirov**

**bêje Kurd evin. Çandeke pir qewman ya lihevkirina hezar salî heye.**

**- Kurdeyatî, di Kurdistanê de berhema jiyaneke hezar salî ye. Berhema jiyaneke siyasî, aborî û civakî ye.**

**---.:Belê, "*Kurd qewmek bi vî rengî ne, gotina ji vir hatine*" neraste.**

**- Kurd miletekin. Her miletek berhema serdemekî ye.**

**---.: Erep ji Erebîstanê tên, Tirk ji Tirkmenîstanê tên, lê cihê Kurd jê hatin derxistina holê girînge.**

**- Kurd ji berê ve li Kurdistanê ne. Ji cihekedin nehatine.**

**---.:Li ser dîrokê dikare hinek tişt bên gotin. Bi taybet Kurdeyatiya niha çiye? Kî ye, çi îfade dike? Kurdeyatiya di nava şer de, Kurdeyatiya li Başûr, Kurdeyatiya li hember dijmin, Kurdeyatiya ji bo dijmin û Kurdeyatiya veguheriye îxanetê çawa ye? Di Kurdan de îxanet, dîsa mirin û ketîbûn çima**

**evqas bihêze? Îdeolojiya Kurdan çiye? Giyana Kurdan, siyaseta Kurdan heye, yan nîne? Bi destgirtina dîrokê re pêwîste li ser van jî bigiranî bê sekinandin.**

**- Zerdeşt dibêje; "*baş bifikire, baş baxive, baş bike*. "**

**---.: Yê min jî nêzî ya Zerdeşte.**

**Fikir, pênûs û sîleh.**

**Ez weke misilmanekî nabêjim; "*ez evqas misilmanim, evqas mûminim.* " Lê min xwe azad kiriye. Bi taybet min di mijara taybetmendiyên mirov û taybetmendiyên Kurd de xwe azad kiriye. Ez xwe bi xwe ava dikim û piştre temaşe dikim ku, nêzî Zerdeşt bûme. Ez qala Zerdeştên niha nakim. Ew her tim ketine. Di dîrokê de nirx û ciheke Zerdeşt jî heye. Lê ne ol, felsefeyeke, şêwazê jiyanekê ye. Îslamiyetê ser Zerdeştiyê lîstiye û heta hinekê guhertiye jî. Pêwîste ev mijar jî bê vekirin. Li ser jiyana Kurd bandora wî jî heye. Lê heya niha**

**tiştên me ji bo Kurdan kirine ji bo kesî nekiriye û bi qasî bi wê re mijûl bûne bi dijmin re mijûl nebûn.**

**Heya ku em mirov nas nekin û bihêz nekin em wê/î naberdin. Ev jî rêbazeke me ya xebatê ye. Ez pir balkêş li ser mirov disekinim.**

**Min ji mirovê kêrî tiştekê nedihat, ji tiştek re hêz netanî miroveke wisa bihêz derxist.**

**Me mirovê ku baş diaxive, baş difikire, baş dike derxist holê.**

**Pêwîste her tişt ji bo serkeftinê bê fikirandin, ji bo serkeftinê bê gotin û ji bo serkeftinê bê kirin. Ne gengaze ji bilî vê tişteke din bê qebûlkirin.**

**- Ji bo çêbûna vê şoreşê, pêwîste her kes tişta para wî/ê dikeve bike.**

**---.:Hûn ê her kesi li gorî rewşa wê/î bidin karkirin. Çi dikeve ser milê kî divê bike. Heke di avahiyekê de kevirek kêm be, ne di cihê xwe de be, wê ew avahî hilweşe. Wexta avahiyek tê înşakirin, kevirên biçûk datînin bin**

**kevirên mezin lewra ew avahî dihilweşe. Pêwîste bingeh bikevirên mezin û bihêz bê avêtin. Yan na avahî bilind nabe. Mijara Kurdeyatiyê jî bi vî rengî ye. Hinek wisa dihesibînin ku bi kevirên biçûk qesran çêkin, lê şaşin.**

**Ji bo serkeftinê em neçarin gavên bihêz bavêjin. Yên sexte ji xwe nikarin li gel me bisekinin. Di vê xalê de jî cudahiya me heye. Li me binêrin, me nas bikin! Madem hûn evqas bi dîrokê re mijûl bûn, avabûna kesayeta kurd re eleqedar bûn, karê em dimeşînin jî bibînin.**

**Berdin xulîqîna Kurd ya di dîrokê de, Kurdê ketî yê ku dijmin niha afirandî çawa ye, em li vê temaşe bikin? Ya hîn girîngtirîn em ê niha Kurd çawa biafirînin? Ya niha ji bo me pêwîste Kurdê niha ye. Hûn dibêjin Kurdê kevin, yek jî Kurdê nû heye. Başe kiye ev Kurdê nû?**

**Niha Kurdeke ku bê gotin; "*Kurdê min*" heye?**

**Bela!**

**Ez ji Kurdê ketî direvim. Ez jiyana wî qebûl nakim. Jiyaneke wisaye ku, di nav de mirin, xirabî her tişt heye. Ev jiyan, kes tine dike. Lê ji aliyekê ve jî vî Kurdî dikişînim şoreşê.**

**Yêkî Emerîkî wiha digot:**

**"*Kurd ker, bê ziman û bê rêber mane.*"**

**Tenê ne bêziman û ker, dîn kirine, kolê kirine û xistine. Ne gengaze ku ji vî Kurdî re bêjim; "*tu başî*?" Heke min gotiba tu "başî," min nedikarî têkoşînê heya vir bînim. Heke bi her tiştî razî bûma, ji bo çêkirina şoreşê evqas mijûl nedibûm.**

**Min teşhîsek baş danî, niha jî wê kûr û mezin dikim. Li ser vê esasê tedawiya wê jî dikim. Eleqedariya we ya bi avabûna Kurd re girînge.**

**- Di nava rastiyê de bûyîn erka me ye.**

**---.: Ezmûnên we ne kême. We komek ava kiriye, ew kom şehîd**

**ketiye. Ji bo bîranîna wan jî divê hûn tiştekê bikin. Ez jî li vir bi 15 hezar kesî ve şer dikim.**

**Hinek dayîk û bav dibêjin me zarok mezin kirine. Me bi hezaran, him jî ji wan pir bihêztir mezin kirin. Yên ku me mezin kirîn ji ber sedemeke biçûk ketin. Çima xwe naparêzin? Ji bo min ev pirsgirêkeke mezine. Şerê min wisa ye.**

**Yan em ê yek bi yek bimirin, yan jî em ê bi temamî ser bikevin.**

**Koma ku we ava kiribû şehît ket, hûn bi tenê man û ji şer dûr ketin. Lê ya min ne wisa ye, ez serde çûm. Ji dijmin zêdetir bi van hevalan re mijûl dibim. Ya hûn dikin kareke başe, bi Kurdewariyê re mejûlbûn başe, girînge, di cî de ye.**

**- Ez jî ramanên we yên mezin û tiştên hûn dikin difikirim. Dema ku mirovê nû ava dikî, ne tenê rê nîşan dayîn û tiştên bike diyarkirin be, ez di wê baweriyê de me ku pêwîste di**

**zanebûna erkên xwe de bin jî. Li kî derê dibe bila bibe, yên di zanebûna erka xwe û erka xwe anîna cî de ji wê/î re mirovê nû tê gotin. Wê ne li benda tiştên amade be.**

**---.:Hûn ê giraniya xwe bidin hîskirin.**

**- Li Ewrûpa her tişt bi teknîk tê bikaranîn. Mînak; ji bo makanizmaya seyareyek kar bike, divê benzîn bê tejîkirin. Yanî her tişt amade ye. Li vir tevî ku tiştek amade nebû jî, mirov dikarin weke mekanîzmayekê kar bikin.**

**---.: Ger mirov bixwaze, dikare xwe bike atom. Atom çekeke mezine. Ya girîng divê mirov bizanibe xwe çawa biafirîne. Em diçûn kî derê digotin,"*çeka we heye?*" Min çek dixwest, nedidan. Min li hezar derî xist, min hinek tişt dixwest, nedidan. Piştre min bi xwe dît. Fikirîm, min ji xwe re got çawa dikarim bibim çekek hîn mezintir. Niha çeka herî mezin ez**

**im, yên min afirandine jî ji atomê bihêztirin.**

**Min destpêkê xwe afirand.**

**Hûn dikarin niha van binivîsin, li ser bisekinin. Destpêkê ji zarokekê lewaztir bûm, heta ji wî hîn zêdetir bê çarebûm. Bendewariya kesî nebû ku rabim tiştnan bikim. Li ser xwe sekinîm.**

**Ji bêçaretiyê ji bo bibim xwedî çareyeke mezin xebitim.**

**Û gihiştim vê encamê: Mirovek, çawa dikare miletek di xwe de bide afirandin?**

**Di min de niha ew hêz heye. Hêza min di xwe de afirandî him pir mezine, him jî balkêşe. Dibêjin; "*nemûmkûne kesek xwe wisa biafirîne. Ev ancex karê cîhana Ewrûpa ye.* " Na, ev neraste! Ewrûpa li pişt Tirkiyê ye. Ji sedî sed dijminê min e. Digotin; "*nemûmkûne Apo wisa bi serê xwe vî şerî bimeşîne û wisa şer bike.* " Encama ji vê bê derxistin eve; bersiva**

**pirsa mirovek çawa dikare xwe bike çekek mezine.**

**Niha hevalên di nava refên me de gelek belengazin. Nikarin xwe baş li çiya biparêzin. Nikarin xwe zêde bikin, heta nikarin xwe di warê çendanî de mezin bikin. Me xwe anî asta çekeke bihêz û ez çekeke pir mezinim. Şerê didim meşandin, bi misogerî wê serbikeve. Hûn dibêjin, "*em nirx û qîmet didin Rêbertî*. "**

**Rêbertî mezine, teqîneke, serkeftine û serfirazî ye.**

**Yekbûna rih û fikre. Wêrekiye û her serkeftine. Dê bi wî re bin! Rêbertî ne lewaziya we ye, Rêbertî ne lîstîk û sivikbûna we ye. Hinek dixwazin lewaziya xwe, siviktiya xwe, şaşîtiya xwe di bin navê Rêbertî de bidin jiyîn. Ev dirûtî ye, sextekarî ye. Divê ev Rêbertî bê berdan. Ez ne Rêberê yên bi vî rengîme.**

**Madem dibêjî,"*ez ji destpêka dîrokê ve li ser çêbûna mirovê Kurd***

***disekinim*"**, **wê demê em ê Kurd çawa ji nû ve çêkin, em çawa dikin, divê li ser wê jî bê sekinandin. Destpêkê ev Kurd çawa bû, çawa bû aîdê dijmin? Ji bo dijmin çawa xebitî? Emerîkiyek ji bo Kurdan dibêje; "*gelê ji bo yekî din dibe leşker.* " Kurdan wisa destnîşan dike. Gelê ji bo hinekan, leşkerê ji bo hinekan, karkerê ji bo hinekan û nivîskarê ji bo hinekan.**

**Di Tirkan, Ereban û Farsan de wêjeyeke çiqas bihêz hebe, herî kêm nîvê wê aîdê Kurdane. Çima ji bo xwe nenivîsand? Kurdek çiqas aîdê xwe ye? Çiqas aîdê gelê xwe, dîroka xwe, rihê xwe, yekitiya xwe, heskirina xwe û rabirdoya xwe ye? Ev pirsgirêkên mezinin. Ger hûn van çareser nekin hûn nikarin bêjin; "*ez welatparêzim, ez nivîskarim û mirovim.* " Hinek hîn van çareser nekirî dibêjin; "*ez Kurd im.* " Ez ji van re dibêjim; "*Kurdê ker, Kurdê dîn.* " Beriya vê ji min re digotin, niha jî ez van ji her kesi re**

**dibêjim. Kurdê bi aqil, divê weke min bikin. Bêguman min xwe ji bo yekîtiyê, li hember dijmin îspat kir. Heke bi te re hêz, quwet hebe tu jî bike. Ger tu nekî wê destê min di qirika te de be, ez ê te bernedim. Ez ê beriya dijmin dest bavêjim te, te ji holê rakim. Felsefeya min bi vî rengî ye.**

**Hîkmet Salih: Ez ji Başûrê Mezinim, navê min Hîkmet Salih, ji Behdînan-Zaxome.**

**Abdulah Ocalan: Zaxo, yek ji navêndên Kurdan yê bingehîne.**

**- Yek ji navendên girînge. Eslê Zaxo xwe dispêre Zilkubekê.**

**---.:Te got Zilkubek?**

**- Li hawirdora Zaxo, gundekî li quntarê çiya ye navê wê Zilkubekê ye.**

**---.:Di kîjan dîrokê de bûye?**

**-Ez dîroka wê nizanim, lê bûye navendeke girîng.**

**---.:Ji gundiyên ji çiya daketîn ava bûye. Lê Zaxoyî bazirganin. Kurdên li jora Zaxo, Kurdên çiyayî ne. Ji bazirganiyê fêm nakin. Lê Kurdên ketine Zaxo bazirganin. Bi bazirganiyê jî derew pêş dikevin. Tê gotin ku bazirganiyê Zaxo pir xistiye. Di Zaxo de bazirganî çawa ye? Di Zaxo de têkiliyên erzan yên di navbera danûstandinên mirovan de çawa ye? Li Zaxo her tişt bi pere ye.**

**- Yên Zaxoyî bixwe pir zêde li Zaxo nînin, yên ji derve hatîn hene.**

**---.:Ji gundên derûdor?**

**- Hemû 30-40 gundin.**

**---.:Zaxo herêmeke ku pir zêde ketiye nav guhertinan. Yanî di sînor de herêmeke bazirganiyê ye.**

**- Berê sînorê wê ya bi Tirkiyê re hebû.**

**---.: Berê jî eşîr direvîn diçûn wir û dihatin. Bazirgan diçûn dihatin.**

**- Ez ji Zaxo me. Lê apê min ji Cizîrê ne.**

**---.:Bêgûman gelê Cizîrê ji wir revîne hatine. Ji birsîyan revîne. Li Zaxo yekî bi navê "*Îsa Sûwar*" derketiye. Li Zaxo li ser bingeha îxaneta li dijî gelê xwe re bûye xwedî telîsên zêran. Ev girêdayî mantiqê bazirganiya Zaxo ye. Rev, xiyanetên mezin û hemû kêmaniyên mîna van, her tim li Zaxo şênber bûye. Niha jî li Zaxo kesên xirab hene. Bi kinahî navendeke Kurde.**

**- İsa Suwar ji Barzanê bû, ne Zaxoyî bû.**

**---.:Xwediyê Zaxo bû. We got ji cihek din hatiye Zaxo. Ew jî ji Barzanê hatiye, niha yek ji bazirganê Zaxo ye. Li ser xwîna pêşmergeyan bûye xwedî zêr. Rihê bazirganiyê weke penceşêrê, gelê Kurdên Başûr dikemirîne. Yek ji nexweşiyên Kurdistanê ya herî mezin Zaxo ye. Pêwîste rihê pere bê kuştin. Me di Şerê Başûr ya 1992'an de dixwest li ser Zaxo hemleyekê bikin. Lê weke**

**hemû hêza cîhanê ketibe wir, me nêzî Zaxo nekirin. Çima? Ji ber Zaxo cihê bazirganan yanî cihê dijminan bû. Em ê dubare serde biçin; heke di ya yekî de nebe wê di ya duduyan de çêbe, di ya diduyan de nebe wê di ya sisiyan de çêbe. Niha em li wir bihêzin, ji berê hîn baştire.**

**-Min PKK di sala 1983'an li Hollandayê naskir. Wê demê evqas derfetên partiyê nebûn. Lê hinek hevalên ku xebat didan meşandin hebûn. Dema min wan dît min cudahiya di navbera van partiyên nû û partiyên din yên kevin de fêm kir. Ev hema dihat ferqkirin. Wê demê tevî derfet kêm jî bûn, li Bakur xebat bihêz dimeşiya. Baweriya min heye PKK Başûrê Mezin bernede. Ya rastî dilê gelê Başûr ne li gel partiyên dine, li hember wane. Min heya niha disiplîna di nava PKK'ê de di nava pêşmergeyan de nedîtiye.**

**---.:Kurd, gelek ji dîsîplînê dûrin. Di pêşmergeyan de tişta kêm dîsîplîne û pergale. Ev nexweşiyeke mezine. Dema qala Başûr'iyan tê kirin, her tim mirovên bêdîsîplîn tê bîra min. Yek jî giraniya xwe nizanin û li cihê xwe nasekinin. Gelek bê sebrin, weke civayê ne. Yek seatekê nikarin li cihekê bisekinin; bê biryarin, sivikin, weke xwe winda kirine. Îradeyên xwe ji hineke din re hiştine. Heta bêjî bêpergalî, bêdîsîplînî heye. Wê sererast bibin, lê hemle dixwaze, dem û usul dixwaze. Ji bo me jî dibin asteng. Lê dîsa jî her ku em fersendê bibînin, em ê serde biçin. Em mirovên xwe wisa di halê wan de nahêlin. Yan em ê bêxin bin xakê, yan jî bi dîsîplîn bikin. Ti rêyeke din ya vê nîne.**

**Her yek xwe pir bi erzanî dide firotin. Ji pergalek mirovî dûrin. Ji bo sererastkirinê dem dixwaze. Talabanî min baş dinase, lê gelek dileyîze.**

**Dizane heya kî derê ye. Min dixe hesabê xwe.**

**Hûn jî ji Başûr derketine û hûn dikarin vê xebatê di xwe de destpêbikin. Mesela hûn dikarin Başûr, Zaxo vebêjin. Mirovên me li hember berjewendiyek biçûk hema xwe winda dikin. Napirsin nabêjin; "*ev kar ji bo kiye, wê min ber bi kîderê ve bibe*. " Wexta "*pere û jin çêdibe*" dibêjin temam. Divê ji vê re bê gotin ku "*raweste*. " Dibêjin di Şerê Başûr de "*şoreşê derbe xwar.* " Na! Xwîna wê hîn germe. Derfet heye, can heye, ger mirov nêz bibe, bibe yek dibe. Bi seden ciwan, keç jî di nav de, nêzî me dibin. Li Başûr beriya xortan keç hatin. Xort jî hebûn. Lê hinek xort hebûn revîn. Weke eşîrtî nêz dibûn. Jiyana taybet dixwestin. Jiyaneke pir teng didan berçav. Hinek baş derketin, di nava refên me de gelek şehîdên wan jî hene.**

**PKK dizane mirovan biafirîne.**

**Di nava me de yekî ji bo min gotibû, "*ji neyînê heyînê pêk tîne.* " Tam jî divê xalê de em ê dîsa bikin. Lê weke min gotî, dem textîkên cuda cuda dixwaze. Şêwazê xebata partiyê dixwaze. Divê her tişt bê hesapkirin. Lê hevalên Başûr ev nedikirin. Nizanin rast nêzî mirovan bibin.**

**We jiyana kevin winda kir, ev zêde negirînge. Wê Kurdeyatiya Başûr jî tiştnan bike. Lez nekin û nerevin! Ji bo Kurdeyatiyê hinek tişt kirin mûmkûne. Li ser bisekinin, bi israrbin. Divê neyê gotin teng bûm, zewqê min, eşîreta min, jin li kî derê ma.**

**Kurdeyatî çiye?**

**Kurdeyatiya serkeftî çiye?**

**Yekî biqasî min lez û bi lez dibeze nîne. Kes nikare min seatekê li cihek bigire. Lê ji bo şoreş dixwaze ev 16 sale li vir bi hezar carî dubare dubare li ser Kurdeyatiyê sekinîm. Berê ji bo min digotin,"*yek deqîqe tenê nikare li cihekê bisekine.* " Lê**

**niha ji bo Kurdeyatiyê disekinim. Heya ku tiştek neafirînim pêşiya wê bernadim. Ev şêwazê min e.**

**- Ez di nava koma karkerên Kurd de dixebitim.**

**---.:Tu dikarî di nav Kurdên Başûrê Kurdistanê de xebat bidî meşandin? Hûn dikarin taybetmendiyên wan bêjin? Dikarin bikevin nava wan? Weke dostê PKK'ê dikarin birêxistin bikin? Hûn dikarin vê li Hollanda bikin. Hûn Soranî baş dizanin. Bi temamî dikarin tevlî van xebatan bibin.**

**PKK ne PKK Bakure, PKK, PKK' ya Kurdistanê ye.**

**- Kurdên Başûr jî hêdî hêdî tên guhertin. Min di temenek biçûk de bi riya pirtûkan PKK nas kir. Ev du rojên min li vir derbas kirine, bedelê sed pirtûkan min xwendine.**

**---.:Jiyana li vir û axiftinên min dîqat bikin. Hûn jî ji şoreşa PKK'ê û di derbarê pêşmergeyan de encaman**

**derxin. Jiyana berê cuda ye, jiyana ji niha şûnde hîn cudatire. Yekî min bibîne, çend waneyên min guhdar bike nemûmkûne weke berê bijî. Bi misogerî wê bê guhertin, nikare weke berê bibe. Heta xwedî dewletê jî be wê bê guhertin.**

**- Yek jî ez, waneya kurdî didim zarokên Kurd.**

**---.:Karek başe, hûn dikarin bihêztir bikin. Ji bo zarokan waneya kurdî dayîn başe. Heta cihê we dikare bê ferehkirin; dibistanek dibe.**

**- Dibistan heye, lê gelek zarokên Kurdên Bakur li Ewrûpa zimanê kurdî bikar nayînin.**

**---.:Divê li Ewrûpa pir cidî li ser zimanê kurdî bê sekinandin.**

**-Kurdên Bakur, di hundur de kurdî diaxivin, ji derve jî Tirkî diaxivin.**

**- Tirkî axiftina wan nelazime.**

**---.:Mesela, ez nikarim ji Kurdeke ku ji Anqarê hatî re bêjim Kurdî baxive.**

**- Yên dizanin bila bi kurdî baxivin. Li Ewrûpa ew kêmanî heye.**

**- Zarok dixwazin kurdî fêr bibin, lê dayîk-bavê wan destûr nade.**

**---.:Pêwîste hemû zarokên li Ewrûpa kurdî bixwînin. Em ê li ser bisekinin. Ji xwe ji niha şûnde ne Kurdbûna wan nemûmkûne. Bila hemû zarok zimanê xwe fêr bibin. Dem heye, derfet û talimat heye. PKK otorîteyek mezin û hêzek mezine. Heta dikare hesin jî bihelîne.**

**Dibe ku li ser we kesayeta Başûr, yanî bandora exlaqê Başûr hebe. Van bandoriyan ji xwe dûr bigirin. Dema mirov xebateke mezin dide meşandin nêzîkatiya ku "*xebata min ev bû, ez endazeyar bûm*" bilêvkirin neraste. Hinek tişt hene ku bi pere nayê bidestxistin. Wisa karkirin baştire.**

**Dema pêwîstiya we bi pere çêbû em ê pere jî bidin. Pere mirov dibe dijmin.**

**Hinek gav hatine avêtin. Hûn derketin û bi sedên din jî derdikevin. Bi deh hezaran dostên me hene. Ev hêzeke mezine, ji sedî not dilê wan bi me re ye. Bi sedan di vê dozê de şervanin, hinek jî fermandarin. Ez wisa texmîn dikim ku, em di îsal de bigihînin hezarî. Piştre em ê wan di warê siyasî de bihêz bikin. Piştre wê bibin partî. Ji xwe partiya Başûr jî dimeşe.**

**Mîrhem Yîgît: Navê min Mîrhem ez ji Nisêbînê me. Min sosyoloji xwendiye.**

**Abdulah Ocalan: Ev çend sale hûn li qada Ewrûpa ne?**

**- 9 sal e.**

**---.:Hûn li Stockholm'ê bûn?**

**- Belê. Berê li Bakur li bajarekê bûm. Ev beriya pênc salan bû, piştre pênc salan li Frenkê mam.**

**---.:Di warê sosyolojik de jî dikarin ji axiftinên me gelek tiştan derxin. Xebatên me him sosyolojik, him jî pedagojike.**

**- Belê, siyasî-îdeolojîke. Mirov nikare bi çend peyvan bêje "*ev rastiya PKK'ê ye.*"**

**---.:Yanî ji bo nêzî sosyolojiye ye min ev da diyarkirin. Di vê mijarê de pisporiya min jî heye. Sosyolojî civakbûne. Bi rastî jî di PKK'ê de civakbûn serdikeve. Em tenê di warê siyasî de li ser mijara Kurd nasekinin, di warê civakî de jî disekinin. Civakbûna Kurd, di PKK'ê de hatiye dahûrandin. Ji siyaseta Kurd zêdetir, li ser civakbûna wê disekinin.**

**- Bi qasî min dîtiye her tişt dîrokî ye. Her gavek, her rojek bi tişteke dîrokî tijî ye.**

**---.:Ger ne wisa be em nikarin jiyan bikin. Her roj tijî ye, vebûne û gav bi gave. Yanî li vir "*dubare*" nemaye. Îro îroye û wê îro tijî bibe, îro**

**wê îro tiştên nûtir çêbe. Îro ji bo Kurdistanê gaveke. Ev raste û mirovê biaqil dibîne. Vir kilîda Kurdane.**

**- Mifteya her xebateke cidî li vire. Her Kurdeke ku bixwaze xebateke cidî bide meşandin ya divê di vir re derbas bibe, bipirse yan jî dilê wê bi vir re be û dûr nebe.**

**---.:Vir dilê Kurde, mejiyê Kurde, çavê Kurde, rihê Kurde, wijdanê Kurde û karekterê Kurde. Ev şazde sale em li vê dibistana mezinin. Destpêkê malek biçûk bû. Wê demê civînek lidarxistin jî bi serê xwe xebateke mezin bû. Dema min 1982'an li saha Rojhilata Navîn civînek ji 150 kesan re çêkiribû cîhan hemû bibû ya min. Heke tu di Rojhilata Navîn de 150 Kurd, li ser siyaseta PKK'ê kom dikî, dikarî wan bîne gel hevev bûyerek mezine. Hinek kes nirx nadin, ji civînan teng dibin. Ez tena serê xwe bibim jî teng nabim,**

**li vir deh demjimêran baxivim jî teng nabim. Jiyana min eve.**

**- Berevajî vê xisare, ji vê jiyanê tengbûn, bêtehemûlî, xwe dûr hiştin tinebûna gelê Kurde.**

**---.:Ya li vir afiriye tu yî, dîroka te ye û rihê te ye.**

**Tu ketî, nirxê te yê pênc qirûşan nîne û em te diafirînin. Ez tiştekê bêjim, nexweşeke di komayê de, nexweşiya wê çiye? Mîdeya wê wisaye, cigera wê wisa ye. Ya bi vî rengî bijîşk ser vî kesî disekine. Li vir jî tu nexweşekî, li ser mêzeya emelyatêyî û hemû derên te nebaşin. Li vir him teşhis, him jî tedawî tê kirin. Ji ber vê, em piranî hemû jî başin.**

**Hûn wisa dizanin ku hûn ji xweber wisa bûne.**

**Ne wisa ye!**

**Bi rastî jî em bijîşktiyek mezin dikin. Di vê qadê de yên mirî ji nû ve zindî dibin. Ev xebateke mezine. Yekî**

**xwe hinek bi aqil dihesibîne divê him li ser mirovan û him jî li ser xwe bisekine.**

**Hîn jî Kurd direvin.**

**Ez çima hîn jî pêwîstî bi çêkirina civînên giran dibînim?**

**Pir baş dizanim ku, mirovê Kurd kirina leşker gelek zehmete, ger bikujî jî nikare leşkertiyê bike. Beriya her tiştî wane; bi seatan bi awayeke dîsîplîn û sabir dana rûniştandine. Ev derseke mezine, dîsîplîneke mezine û riheke rêkûpêke. Kesek, divê herî kêm bizanibe çar seat çawa guhdar bike û xwe ragire. Piştî ku kes vê hêzê di xwe de avakir şûnde, tê wateya ku gavên mezin avêtiye. Tiştên li vir tên gotin, tiştên dîrokîne.**

**Tiştên avabûna neteweke dide afirandine. Yekî bi aqil be, ji du waneyan encam derdixe.**

**- Kes ji vê dûr namîne, bandora wê li ser her kesi heye. Li her derê mandora wê heye. Kêm yan jî zêde, lê**

**misoger, her ferdeke Kurd (Kurdên li cîhanê bilav bûne jî) bandor dike.**

**---.:Raste, ji bin bandora wê xilasbûn nemûmkûne. Ji bo Kurdan jî, ji bo mirovahiyê jî ev wisa ye.**

**Kurdeke ku ji derveyî tiştên li vir tên kirin û tên axiftin mayîn nemûmkûne. Bi aqil bin û piştre poşman nebin. Tiştên li vir tên axiftin gudar bikin. Hinek piştî çar salan, hinek piştî pênc salan, hinek jî piştî deh salan fêm dikin. Heke îro fêm bikin, ji xwe tiştên ez ji we dixwazim eve. Îro fêmkirin bese.**

**- Yek jî dixwazim qala Zerdeşt bikim: Di nava rewşenbîran de ev tê nîqaşkirin. Em di navbera felsefeya Rêbertiya Partî û Zerdeşt de muqayese dikin. Ez tenê vê nîqaşê nakim, hinek rewşenbîrên din yên Kurd jî dikin. Vir, weke akademiyên di demên xwe de avakirine, mîna akademiya Platone.**

**---.:Platon, Sokrates. Li vir wan bibîr tînim. Hûn li ser van sekinîn? We Platon û Sokrates lêkolîn kir?**

**- Ez li ser hemûyan sekinîm, di vê mijarê de min xebat meşand.**

**---.:Yê me gelek nêzî van e. Ne weke zanîngehên burjuva ne. Ev weke ekolên sê hezar sal berê ne. Hinek dibêjin;"*ma akademî wisa dibe, hinek şivan, hinek jî nezanin.* " Tabî akademî wisa dibe.**

**- Ger ji bo hinekan bi salan dixebitî, tu ancex dikarî li ciheke wisa bikî, ji derveyî vê tişteke din nemûmkûne. Ji derveyî vê di navbera me û netewên din de wê ti cudahiyek nemîne.**

**---.:Evekoleke Kurde. Bihêze, di cî de ye. Heke bê berfirehkirin, beşeke Ewrûpa jî pê re mijûl bibe wê bibe fersendeke mezin. Ez di ciheke biçûk de van dikim. Li Ewrûpa jî derfetên gelek mezin heye.**

**- Cî biçûke, lê bandora wê pir mezine. Dibe ku ev xurfe, weke mal biçûk be, lê giranbûna wê pir mezine.**

**---.:Bi îsbate. Cihê min li çiya çêkirî jî pir biçûk bû. Niha pir lûkse û konfore. Beriya niha me bi çend keviran çêkir û me got,"*ev akademî ye.* " Yên hatin gotin; "*ma akademî wisa dibe.* " Lê bivê çend Kurdistan çêdibe. Wiha, dijmin hejiya.**

**Dijmin tenê li jiyankirina min temaşe nake, li vir artêşê çawa didim meşandin temaşe dike. Dijmin wisa dizanî ku min vir weke biryargehên teknîkî çêkiriye. Lê ya me bi keviran hatiye çêkirin. Lê ev li gorî dijmin, artêşeke mezine û bi rastî jî wisa ye.**

**- Bersiv dide teknîka dewletê ya mezin, birokrasiya sedsalî, artêşa polîsan û teşkilata wan.**

**---.:Di ciheke biçûk de û di demeke kin de hat kirin. Li ser vê baş bisekinin û heke derfeta we hebe di derbarê vê de pirtûkekê binivîsin.**

**Derfetên me hene, li van deveran bigerin. Derfetên we jî hene; Doktor Cabbar heye, hûn hene, yên din hene. Hinek tişt bikin. A rastî bingehê salekê hat avêtin. Kes fêm nake. Dibêje; "*dijmin bixwe artêşekê dimeşîne*. " Artêşa li gel kevirekî! Teknîka min nîne, bîrokrasiya min jî nîne, bi serê xwe me. Ez xwe mezin dimeşînim. Çima? Ev hêz ji ku ava bû? Ev dîtinên me, çima bûn dîtinên mezin?**

**- Tenê ne Kurd, hemû mirovahî li bersiva van pirsan digere. Gelek kes dibêjin; "*ev çawa çêdibe.* "**

**---.:Sokrates dibêje; "*xwe binase.*" Waneya min ya yekem ev bû. Min beriya her kesî xwe nas kir. Divê beriya her tiştî hûn xwe bi gelekê bidin nasîn. Tu çiqas başî, çiqas xirabî; tu yê xwe bidî nasîn. Ev hizrê Sokrates hizreke di cih de ye. Ez jî weke Sokrates dikim.**

**- Di Ronesansê de û sosyalîzma nasyonal de ev heye. Heta mirov vê di felsefeya Rêbertî de jî dibîne.**

**---.: Ronesans pêkhatina Kurdeyatiya ya nû ye. Dema dostê me ProfesorYalçin Kuçuk hat gel me digot, "*hûn li vir ne dewletekê, miletekê diafirînin. Ne dewlet, dewlet siyasete. Ya li vir tê afirandin ne siyasete, ya tê kirin felsefeya mirovahî ye.* " Çû û neçû hema got,"*min zanîngehek ava kir*. " Li Ankarê Zanîngehek azad vekir. Li me temaşe kir û ev kir. Piştre komeleyek ava kir: Navê wê Mirovê Nû bû. Destpêkê Zanîngeha Azad, piştre jî Mirovê Azad. Navên bi vî rengî li xwe kir.**

**- Tenê ne aliyê wê yê felsefîk, him xwedî li felsefê derketin heye, him jî ev felsefe bûna felsefeyek jiyanê heye. Felsefe, di jiyana pratîkî de tê sepandin.**

**---.: Tenê ne jiyana leşkeri, jiyana siyasî, jiyana felsefî jî tê meşandin. Di bingeh de exlaq, moral heye û zanistî ye. Ji bo Kurdan leşkertî, siyaset çiye, çawa tê meşandin? Di derbarê van de jî divê hûn nivîs binivîsin. Hinek nîvîskar hebûn, tenezil nekirin.**

**- Dereng man.**

**---.:Dereng man.**

**- Di wê baweriyê de me ku, ji niha şûnde mirovên gelê xwe nas bikin, ji wan re bibin çare. Bi rih û can bigihînin cihekê. Bawer dikim lênûsên xwe hildin destê xwe û vê lêkolîn bikin.**

**---.:Yên dixwazin li ser dîrokê ji bo rastiya Kurd û Kurdeyatiyê tiştnan bike bila bên vir. Ya dixwaze û di hezar pirtûkan de nedîtî dikare di rihê li vir de bibîne. Heke evîn û dilê wan hebe, nemûmkûne bikevin bin ti bandoran. Bêguman ev tiştên mezinin. Ji bo we nivîskar û rewşenbîran jî mezine. Cihê we jî**

**mezine, em cihê we biçûk nabînin. Ev jî şereke, him jî ji şimşêr (şûr) zêdetir bandor dike. Ji xwe tê gotin ku; "*heke şîmşêr û pênûs nebe Kurd nikarin serkeftî bin*."**

**Yên bi pênûsê dileyîzin kîne?**

**Yên bi şîmşêr dileyîzin kîne?**

**Şûr jî, pênûs jî ji bo kê ye? Ya girîng ji van re bersiv dîtine. Heta nivîskarên Kurd yên mezin jî hene, lê her tim ji bo hineke dinin.**

**Mesela Selahattin Eyyubi şûrek mezin bû.**

**Lê ji bo kî?**

**- Heta ku ez li vir bim li derve jî hinek dişopînim. Tenê ne di warê Kurdeyatî de, di warê çandî de jî naskirin û hinek jî bi şêwaya Rêbertiya Partî fêmkirinê çêdibe. Ji bo vê pirtûkên heya niha min nexwendine yek-du caran dixwînim.**

**---.:Pirtûkên we nexwendine em bidin we, bixwînin. Ez li ser çareseriya kesayetiyan disekinim.**

**Piştî 1986 şûnde hersal çend axiftin derdiketin. Di vê demê de, di dawiya 1993 û ji destpêka 1994 ve bîst pirtûk derketin. Bi rastî jî rêze pirtûkek pir mezine û bingeha jiyaneke mezine. Di nav de her tişt heye. Pirtûkxaneyeke mezine. Heke li ser bê sekinandin, bi salan têra we dike. Ne ji bo min, ji bo we dibe xizmetek.**

**- Di wê baweriyê de me ku, ev mohra li dîroka Kurdistanê xistine heya bêjî kûre. Mohrek pir kûre. Dema dest lê dixî, mohra wê wisa ne weke boyaxên dine hema jê biçe. Ya li dîroka me xistine, mohreke watedare û kapasîteya mirovê Kurd, zanebûna wê û hewldana wê ya kedê wê çend car bipêçe. Bi vê bandorê re wê bindestiya sed salan û paşvemayîna wê ji holê rake. Ez di vê baweriyê de me.**

**---.: Rast e, tola hezar salan tê rakirin. Kurdeyatî hatiye xistin. Ez pir hesas li ser disekinim. Kurdeyatî**

**miriyeke. Ji dijmin zêdetir, ez dijminê vê kesayetiyê me. Ji ber vê dema ez dikevim waneyekê, dema ser pirsgirêkek de diçim, tola salan radikim. Ez ê jê re bêjim,"*tu nikarî bi netewbûn û Kurdeyatiyê bileyîzî.* "**

**Tê bîra min, dema min dest bi kar kir ji min re digotin; "*ji destê te tiştek nayê û ti mirovek valeyî*. " Ez li gel kî dirûniştim, hemûyan ji min re ev digot. Vaye tola mezin.**

**- Gelek pozîtîve û ji bo gelê Kurd toleke mezine.**

**---.: Bi rastî jî ez xwedî toleke mezinim. Kurd ser xwe nasekinin, rûyê xwe ji pirsgirêkê dizivirandin. Me rûyê wan wisa rast kir, Kurdeyatiyeke heya mirinê serkeftinê esas bigire afirand û êdî her kes dikare bi wê re rabe ser xwe. Me bi sebreke mezin ev kir. Beriya 30 salan çi dikirin, ka bila niha tiştekê bêjin. Niha çawa dimeşin, çawa şer dikin. Heke nekin dijminê xwe bi xwe ne. Neçarin vê**

**bikin, heke nekin dijmin wan sax nahêle. Berê digotin; "*ji min re nebêjin, ez guhdar nakim.* " Ev destpêkeke; em bi ser de çûn û me got, "*tu çawa guhdar nakî, heke guhdar nekî tu kerî.* "**

**- Divê ev mijar evîn be.**

**---.: Evîna mezin! Berê evîn çibû? Berê evîn tinebûn bû. Ma evîneke cidî mûmkûn bû? Gelek ketî bû. Niha hinek ji tiştên min afirandine re dibêjin "*dilê min naxwaze.* " Lê dîsa ez pir li ser disekinim. Divê dil, xwe li ber mezinahiyan bigire. Dilê te weke prîmîtîf (iptidialîler)e. Na! Yan tu yê bimirî, yan jî rabî!**

**Heke bêjî; "*fêr nabim, dilê xwe narakim, nêrînên xwe nabêjim*" tu yê li beramberî xwe min bibînî. Mêrxasî eve. Ez ê bi xwe bikim, dewrê hevalan jî nakim. Ma tu dikarî li beramberî min çi bikî? Çiqas hêza te heye? Serê kêliyê dibêjî "*Rêber, Rêber*" eve Rêber. Bibê jî PKK, ha PKK! Tiştên bi**

**teoriyê fêr dibî tu yê di pêkanînê de rabî. Rev nîne, ger birevî tu xayînî!**

**Wiha li vire, şev-roj, kêlî bi kêlî şerê xwe wisa dikim. Gelek bi azad!**

**- Hinek tiştên esasî û hêzên mezin hene: Pere, hêza leşkeri, hêza teknîk, hiş û zanebûn (bi taybet hêza zanebûnê pir mezine). Fîlozofeke Îngiliz dibêje; "*zanebûn û ked îqtîdare û pir mezine.*"**

**---.: Hêza min jî eve. Ez xwe dispêrim zanebûn û hesasiyeta xwe.**

**- We bi dil û daxwaza xwe kir.**

**---.: Di heman kêliyê de hiş, di heman kêliyê de derxistina zanebûnê û sepanên min ên mezinin. Heval min mezinê mezinan dibînin. "*li cihek rast rûnin, xwe mezin bibînin.*" Hûn mezinin, dikarin dijmin mehf bikin. Em vê qebûl dikin. Tiştên rastin, binirxin.**

**- Binirxe, mirovane ye.**

**---.: Tişta ku Kurd, ji nan-vexwarinê zêdetir pê hewcedare. Bi aqilbin, wê ev we mezin bike. Li ser**

**tiştên we bike mirov bisekinin. Lê hûn ne li ser van, herî zêde li ser cixare û dûxanê disekinin.**

**Berê di Îslamiyetê de ji van re digotin "*put*. " Îslamiyetê digot; "*putan bişkînin.* " Her hevaleke me çend putê xwe heye. Bişkînin van putên xwe, putin, dikarim îsbat bikim. Xistine vir û wira xwe, jê hez dikin.**

**Em putê Kurd bişkînin, bikin xwedayek tenê û yê mezin.**

**Xwe bikin xwedê, xwe bênin asta xwedê. Ji xwe Îslamiyet jî eve. Hz. Mehemed li hember putên Ereban, avaniya wan ya eşîrtî- ketî û putên wan gotiye,"*Xwedê heye.* "**

**Xweda çiye?**

**Xweda li ezmanane. Rihê dewletbûn û mezinbûna Ereban pêk aniye. Yekitî rihe, rihê sultan-saltanate. Hz. Muhammed eve. Li Kabeyê 360 put neşikandiba û negotiba li jor Xweda heye nedikarî dewletê ava bike. Bêguman**

**bawermend fêm nakin, nizanin ka Misilmantî çiye. Misilmantî eve. Heke putên di hundur de bişkin, wê di rih de yekîtî bê avakirin û ger rihê xwe ji mala xwe derbixî bi banê malê ve bikî, lewra dikarî bigihî Xweda. Riya we ya gihiştina Xweda di van gotinên me re derbas dibe.**

**- Put, ji fikrê partiyê û cihê ku Rêbertiya Partiyê lêye direvin.**

**---.: Yanî minafiqbûyîn, mêtingehbûyîn, têra xwe xapandinê dike. Bi tarz û fikreke rast, hêzeke rast ve xwe mezin bikin. Tu her tim nikarî bêjî; "*ez ê wisa bileyîzim, ez ê xwe wisa bifiroşim.* " Bisekine, ger nesekinî ji vir pê de mirine. Heke di riya rast de bimeşî, xwe efû bikî, tu yê xwe bigihînî Xweda.**

**Ez bawerim hûn baş dibînin. Di vê mijarê de jî dikarin binivîsin. Bibin otorite û bihêz bin. Pêwîste di derbarê dîrokê, sosyolojiyê, pedagojiyê, ziman**

**û dîroka nû de xebatên nivîsê bên pêşxistin.**

**Jiyanek mezin heye.**

**Hûn birsî namînin. Heke birsî bimînin ji min re bêjin. Ez ê we hemûyan hezar carî dewlemendtir bikim. Lê divê hûn wisa bikin. Ji her yek ji we re quncikek mezin heye. Hûn dikarin di xebatan de xwe wisa îsbat bikin. Ez ê kîsek pere bidim heryek ji we. Ji yên din re jî bêjin. Ji wan dewletan zêdetir, PKK dikare pere bide we.**

**Lê divê di qesra mezin de, Kurdeyatiya mezin bê kirin.**

**- Ji bo rewşenbîreke ku dixwaze ji gel re xizmet bike, ev ne tişteke wisa zehmete.**

**---.: Bêguman ne zehmete. Çend keviran, şkeftek bidin, ez ê wê bikim qesr. Ez ji tiştên bi vî rengî hez nakim. Bi çuwalan pere heye, lê tenê rojek jî lê temaşe nakim. Berê di berîka min de pere hebû. Lê ev 15 sale min pere**

**nexistiye berîka xwe. Dema di derdora min de pere zêde bû, min xwe ji pere dûr xist.**

**- We di hevpeyvînek xwe de qala Said-i Kurdi (Nursi) dikir. Ew dibêje; "*heke ji cihekê koçkirin pêwîst bike, divê hûn bikaribin hemû mal-milkê xwe bêxin nava bostanekî.*"**

**---.: Belê, tenê ewqas. Dibe ku yê min bostan jî nebe, ezê bêxim berîkê, ya girîng eve: Ev Kurdeyatî baş e. Divê baş li ser bê sekinandin. Xwe mezin bikin, Kurdeyatiyek baş bikin û bi wêrek bin. Ji xwe baweriya we bi we heye.**

**- Heke bawerî, wêrekî û hinek jî girêdan hebe dibe.**

**---.:Di wê baweriyê de me ji niha şûnde hûn ê xwe mezin bikin. Di xwe de hinek hêza xwe mezinkirinê bibînin. Bibin otorite, bibin xwedî ekoleke nû. Hûn dikarin demeke nû destpê bikin. Li ser kûraniya wê**

**rawestin, li hawirdora xwe kesî nehêlin. Roj bi roj ser bisekinin.**

**Heke hêza we têra kesî nake, bila têra we bike.**

**Di encamê de hûnê mezin bibin.**

**- Ev xebata ji me tê xwestin ji xwe jiyana me ye. Bi awayeke xwezayî tiştên ku pêwîstin em bikine.**

**---.:Dewletên mezin û gel çawa mezin bûne? Li Almanya temaşe bikin, baş li ser pirsgirêkên xwe sekinîne. Mînak, li ser leşkertiyê pir mezin sekinîne. Sinetkarek, li ser karê huner baş sekiniye. Li ser meseleyan mezin disekinin û ancex wê demê mezin dibin. Mînak li gel me ji zarokan re nirx tê dayîn. Lê çawa? Weke nirxê malbat-kesûkaran divê nirxê zarokan jî bê zanîn, lê divê ne di şuna her tiştîde bin. Dayîk-bavên me her roj zarokan maçî dikin. Bese!**

**Evqas jî zede ye, divê bên heskirin, lê ev şêwaza heskirinê ne şêwaza heskirinek raste.**

**-Belê, di qedera wî/ê zarokî de çi bibe nediyare.**

**---.:Dayîka min digot; "*ez wisa dayîka te me, welê dayîka te me.*" Ez dehsalî bûm. Min ji dayîka xwe re got;"*tu mirîşk û çêlikên wan dibînî? Ha ew, ha ez û tu.*" Hîn di bîra min de ye. Min got; "*li ser min hesaban neke. Dema te ez anîm dinyayê ev, ne di derbarê mirovahiyê de bû, ji cehaleta te dihat.*" Min bersiveke pir ecêp dabû û bêdeng bû. Yanî di Kurdan de heskirina zarokan rast nayê kirin, pêşeroja zarokan nîne, nirxê wan nîne.**

**- Di bingehê vê heskirinê de jehir heye.**

**---.:Zarokan jehr dikin. Ji ber wê ez ji heskirina wan nefret dikim. Wisa nabe. Hûn ê bên guhertin. Hûn ê nirxê ji zarok re bê dayîn çiye bizanin û divê hûn rast mezin bikin.**

**Ev xebat hemû ji bo zarokane.**

**Zarok xeniqandiye, kuştiye, tine kiriye, lê temaşe dikî yên vê kirine, zarokên xwe ecêp dibînin, dibêjin; "*paşa ye, wisa mezin dibin*. " Lê te xeniqandiye, biçî lê temaşe bikî, di govekê de ye. Zarokê Kurd miriye, tê de tiştek nehatiye hiştin. Yek jî pir zêde jê hez dikin. Heskirin wisa nabe!**

**Tiştên jê hez dikin divê weke mirovên pêşî, heskirina mirov ya di xeyalan de nebe. Ev ji bo we gelek pêwîste. Yekî ku bêje; "*ez wêjeya Kurd, hunera wê digirim dest*" divê wisa be, evesasên hunerê ne.**

**Ez nirx didim xebata we. Bi qasî şer, heta ji şer zêdetir nirxê xwe heye. Heke wisa bikin ez ê baş bibînim. Berevajî vê tişta dikin, weke karek mezin nabînim. Ji şer zêdetir ser bisekinin. Li gorî min di nav şer de mayîn û di van xebatan de mayîn di navbera wan de cudahiyek pir zêde nîne. Ji ber nezanîne ser de biçin, dibêjim "*Akademî, xebateke hunerî***

***ye.*** **" Me bi hunerê re ev şer ava kir. Heke ev huner nebûya, Kurdek tenê jî wê cesaret nekiriba ji bo silehê gavek bavêje.**

**- Heke ev nebe, zêde wateya nirxan jî namîne, wê weke darekê hişk bin û birizin.**

**---.:Xebatên hunerê artêşa gel ava dike, şer û Kurdeyatiyê diafirîne, siyasetê dike. Ez vê ji bo hunermendan dibêjim. Heke dixwazin xebateke mezin bimeşînin, li pêşiya we mînakeke mezin heye. Hûn ê nirx bidinê û li ser bisekinin, her yek ji we dibe ku bibe padîşayek. Heke di we de otorîteya padîşah hebe, her yek ji we dikare li ser Kurdistanê bandoreke mezin bide avakirin.**

**- Padîşahtiya mezin xizmeta mezin a ji welat re ye.**

**---.:Bawer dikim ku ji niha şûnde hûn ê baştir bixebitin. Yanî weke sinetkar û rewşenbîrên Kurd hewl bidin ji niha şûnde tiştên nû biafirînin.**

**Hatina we ya vir jî gaveke mezine. Ji bo we di jiyanê de destpêkirinek mezine.**

**- Di jiyana me de cihek pir mezin û bi wate digire. Em dikarin destpêkeke mezin bikin. Me li vir enerjiyeke mezin girt, zihnê me ronî bû, fikrê me safî bû.**

**Abdulah Ocalan: Em hinek li ser dîrokê rawestiyan, we li me gudar kir, Xemgîn hûn çi dibêjin?**

**Ethem Xemgîn: Di esas de pişeya min huquqe, ez ne dîroknasim. Ez parêzerim, piştre bûm dîroknas.**

**---.:Hûn dîroknaseke amatorin, ne xirabe. We li Ewrûpa dest bi diroknasiyê kir. Ev fikrê dîrokê çima ji we re balkêş hat?**

**- Beriya her tiştî min xwest xwe nas bikim.**

**---.: Ji vê pêwîstiyê bingeha xwe girt ne wisa? Ewrûpa, mirov tengav dike ku xwe nasbike. Tenê ne**

**Ewrûpa, jiyana li Tirkiyê jî mirov tengav dike ku xwe nas bike.**

**Lê herî zêde biyanîbûn û tenêbûna li Ewrûpa lez dide vê. Dema ji dûr ve li welat tê temaşekirin, ji Tirkbûnê hinek qutbûn çêdibe, bi misogerî pêwîstiya li xwe gerînê dibînî. Bandora vê geleke, hewceyî dîtinê ye. Xebata herî dawî ya di destê we de çiye?**

**-Niha li ser bandora îdeolojiya dînê di Kurdistanê de xebata pirtûkekê heye.**

**---.:Dîn, bawerî û bandora wan.**

**- Di vê mijarê de min du berg nivîsand. Berga yek hat weşandin, berga du maye. Piştre li ser koka Elewîtiyê xebateke min wê çêbe.**

**---.:Belê, di vê mijarê de texmîneke min jî heye. Min vê ji we re got: Li gorî min Elewîtî nêvî islamtî yan jî Kurdeyatiya herî kêm misilman bûye û libasê wê ye. Yanî şeklê misilmanê kevin yê libasê**

**Kurdeyatiyê li xwe kiriye. Tenê libasê wê li xwe kiriye; di nav de Zerduştî heye, Kurdê kevin heye.**

**- Bi baweriya Zerdûşt re çanda Kurdê kevin heye. Ji derveyî Zerduştî baweriyên cuda hene.**

**---.:Yanî ev giranîne, misilmantî gelek bisînore.**

**- Misilmantî tenê yên li jor cî digirin didin meşandin.**

**---.:Piştî Zerduştî Elewîtî tê. Piştî wê kîjan mezhep tê?**

**- Mesela Yêzîdîtî heye, Beyli-heq heye, Ehli-heq heye.**

**---.: Ev balên wê ne. Kurdê herî misilmanbûyî Naqşî ye?**

**- Ne Naqşî, Kadîrîne.**

**---.:Di heman demê de ev yên herî Ereb bûne, yanî di cihekê de dibin kesimên hevkarên misilmanan. Ez bawerim ev herî zêde him di dema Emewiyan, him jî Abbasiyan de yên xwedî berjewendine. Û ji Ereb-bûn û misilmantiyê, kesimên li ser bingeha**

**begtiya erd û begtiyê ve hatine girêdanin, li ser vê hûn çi dibêjin Cabar?**

**Cabar Qadir: Kabilî, Kamilî û bi Şêx Abdulqadirê Geylanî re dijminê hev bûn. Şêx Abdulqadirê Geylanî, ji Geylan hatiye. Ev îdeolojiya Kadirî Şêxîtî, hatiye Geylanê û li vir libasê misilmantiyê li xwe kiriye. Şîş lêdan, yanî eziyet li cesedê mirov ê madî kirin, kevneşopiyeke Hindiyan ya kev ne.**

**Abdulah Ocalan: Başe, ev bandor vekiriye. Ez tevlî tiştên we gotine dibim. Lê Nexşîtî û Kadirîtî ecêbe. Ji vê zêdetir eşîretên sîxûran yan jî terîqatên sîxûrane. Li dij Kurdan hîn zêdetir rol lîstine. Ya rastî bi temamî zehmete ku bêgotin Naqşîtî jî bi vî rengî ye. Bi taybet dibistan û medreseyên ku Feqî lê perwerde dîtîn hene. Li vir hinek pêwîstiya nêzî Kurdan bûyînê dibînin. Medrese di ekolên Kurdan de dixebitin. Yanî ji**

**van medreseyan re, dikarim bêjim şîroveya îslama Kurd. Saidî Nursî jî di nav de, dixwazin şîroveya îslama Kurd pêş bixin. Çawa ku li Îranê Şîa, li ser bingeha berjewendiyên Şia gelek dibistan pêşxistibin, çawa ku di Tirkan de Bektaşîtî li ser vê bingehêye, di Kurdan de jî şiroveyên bi vî rengî hene. Di Kurdan de bandora dînî bi vî rengî ye, lê binkeftiye. Ji hevkartiyê zêde rizgar nebûne. Ji bo Saidî Nursî jî wisa ye. Gelek medreseyên naqşî hene, lê dîsa di nav de medreseyên nêzî Kurdan derdikevin. Mezinên wan (medrese, mezinên şêxan) dibin hevkarên dewletê, lê rêveberiyên dibistanan di asteke girîng de ronakbîrîya Kurdan temsîl dikin. Esasê wê, hinek nêzî Kurdeyatiyê ye. Gelek kesên mîna Ehmedê Xanê, Melayê Cizirî hene. Hemû jî di çaxa navîn de kesîma rewşenbîran temsîl dikin.**

**Ji vê hêlê ve dikare li ser pergala medreseyên Kurd bê sekinandin. Şiroveya Nexşîtiyê, şiroveya Nurcîtiyê hinek cewaztir dikare bê pêşxistin. Divê li ser Elewîtiyê wisa bê sekinandin.**

**Lê heke em hîn bi gelemperî bêjin; gelê ku herî zêde kêm ji îslamyetê sûd wergirtiye Kurdin. Ereb bi îslamyetê re gelek mezin bûn.**

**Îranî bi Şîa re bandora Îslamiyetê ya ji bo xwe nebaş asteng kirin. Tirkan bi îslamyetê re gelekî qezenc kirin. Lê ne bi qedrê xwedê, bi hawara qedrê talanê û dewletê gotin; "Ya *Xweda, Xweda.* " Dibe ev pir bandorker bên vekirin. Di Kurdan de saziya Îslamiyet û şêxtiyê, bi misogerî heskî bila girêdayî Ebasiyan be, heskî girêdayî hukumdarên din be, berjewendî ji bo serkêşên wan feyda xwe kiriye. Kesîma Şêx, bi rolên xwe yên di Kurdistanê de temsîla kesima herî bi xeter ya noker dike. Axatî, ji**

**şêxtiyê ne xeternaktire. Xeteriya herî mezin di kesayeta şêxtiyê de ye. Pêwîste di Kurdistanê de saziya şêxtiyê pir baştir bê ravekirin.**

**Dikare li ser Sûnîtiya Osmaniyan jî bê sekinandin. Di Kurdistanê de nîjadkujiya Sultan Selim ya li hember Elewiyan û bi girîngî li ser pêşengiya Îdrîsî-Bitlisiyan bê sekinandin. Û yek jî bi zanyariya Kurdeyatî, divê têkiliyên Îslamiyetê baş bên lêkolînkirin. Yanî Îslamiyet li ser zanyariya Kurdeyatiyê çiqas başî û nebaşî bandoriya xwe kiriye. Bi rastîbin li ser vê sekinandin wê encameke baş bide. Di roja me ya îro de yek Erbakan û disa gelek tarîkatparêz hene. Îslam û Kurdistan, tevgera rizgariya netewe bi baldariyeke mezin yek ji xususên ku li ser bên sekinandine. Di van mijaran hemûyan de jî wê PKK him we ber bi navarok, him jî di warê rêbaz de ber**

**bi çareseriyek mezin û meyzandineke bi tendûrist ve bibe.**

**Ethem Xemgin: Di dema derbazbûyî de ji warê dîrokî ve di civakê de hinek avabûn tên dîtin. Bi awayeke giştî civak dixwazin ji dîn û xwedayên xwe re xizmet bikin. Ji ber wê dema hûn dîroka Kurdistanê dabeş dikin, dema Zerdûşt yan jî serdema hînkeriya û çanda Zerdûşt, wiha ev yek serdeme û em weke "*serdema Arî*" bi nav dikin. Ji ber dînê Zerdûşt, xwe dispêre baweriyê. Dema Îslamiyeta piştî hingê hinek din cudatire. Bêguman di Kurdistanê de serdema Îslamiyetê ji serdema sekinandinê zêdetir, dema şûndeçûyînê ye.**

**Abdulah Ocalan: Di Kurdeyatiyê de belavbûn destpê dike.**

**- Mesela, ji bo netewa Ereb Îslamiyet şoreşeke mezine.**

**---.:Bêguman, ev tesbîteke PKK'ê ya girînge. Îslamiyet ji bo Ereban**

**netewbûne (millileşme). Ji bo Îranê Şia netewbûne. Ji bo Tirkan Îslamiyet netewbûne. Li Anatolyê misilmanbûn, Tirkbûne. Lê ji bo Kurdan misilmantî hinek berevajî ye.**

**"Anglîkanîzma" di Xiristiyantiyê de Xiristantiyeke ku li ser bingeha berjewendiyên Îngilîzan hatiye veguherandin. Protestanî, qonaxa herî pêş ya neteweperestiya Alman e. Mixabin Kurdan, di Îslamiyetê de cewaziyek bi vî rengî pêş nexistin. Medreseyên Naqşî, pirên Elewiyan belkî xwestibin hinekê sererast bikin, lê diyare serkeftî nebûn. Û ji ber herî zêde yên di jor hatine kirîn bi kêmaniyan re mijûl bûne. Pêwîste bi awayeke zelal û berfirehî, pêşketinên cîhanî bên dîtin.**

**- Bi awayeke giştî di kêmanîbûnên dîroka Kurdistanê de rol lîstine. Di Kurdistanê de dîn û civaka sosyal kirine dijminê hev. Ev, ji**

**hûndir ve parçekirin û alîkariyeke mezin daye ku dijmin jê sûdwerbigire.**

**---.:Ya rastî divê ez ji vê re nebêjim dîn jî, şêwazeke mêtingeriyê ye. Mêtingeriya di bin rûpêşê îslamê de gotin wê hin rastir be. Ji vê re dibêjim mêtingeriya feodal. Ev tezên PKK'ê yên bingehîne. Mêtingeriyên serdema feodal bi libasên Îslamiyetê tên. Mêtingeriyeke pir wehşî heye. Her wiha divê nokerên wê bên dîtin. Ev mijar ji berhemên nû nivîsandinê re guncave. Me li vir cudahiyek pir diyarker ya rêbaz derxist, di derbarê navarok de jî tiştên me kirine nekêmin. Em Îslamiyetê bi şîroveyeke rast ve vedibêjin. Kurdên di dema Îslamiyetê de girtina dest girîngî îfade dike. Tabî, hûn dibêjin serdema Zerdûşt, serdema Arî, vekirîbûnek ji Kurdeyatiya wê serdemê re jî anîn girînge. Tiştên min di nivîsên we de dîtine eve; hûn yekalî şirove dikin û nagihin şiroveyên giştî.**

**Pêwîste hûn hêza xwe ya şîroveyê pêş bixin. Bûyer, diyarde, belgeyên bicî bikin û şîrove jî giştî bikin. Hûn dikarin herduyan jî bikin, dikare hîn zêdetir têrker be. Min nivîsên we xwendin, kedeke başe. Her çendî belav jî be, negihiştibe xetên giştî jî, berhevkirinek başe û ez bawerim di vê qonaxê de hûn hîn zêdetir kûr dibin.**

**Mereqa we didome, her ku diçe eleqeya we zêde dibe.**

**Derketina PKK'ê jî pir girînge û dîrok bi xwe ye. Dîrok, di deh salên dawî de gihandiye çareseriyê. Heke hûn çareseriya salên dawî negirin, hûn ê nikaribin bibin dîroknaseke bihêz. Bi misogerî divê hûn dahûrandina deh salên dawî bibînin. Piştî hingê, di mijara dîrokê de dibe ku şîroveyên we yên pir bihêz çêbin. Di destê we de meteryaleke bêhempa heye, hûn baştir dikarin wan di li ser xeta wan a rast bidin rêzkirin. We**

**gelek xal kom kirine; ji îro şûnde jî divê hûn rêbaz û riyên çareseriyê bigirin.**

**Mesela, dema dixwazim ser dîroka Kurd de biçim, hema fêm dikim. Ji ber min dahûrandina kesayetê kiriye. Filankes kiye, çiye? Filan begtî, di rastiya netewa Kurd de çi îfade dike? Bedirxan çi îfade dike? Şêx Seîd çi îfade dike? Saîd-î Nursî kiye? Ez dikarim di kêliyekê de derxînim ji ber çareseriya giştî heye. Çareseriya giştî kilîteke, bi vê kilidê hemû diyarde dikare bên vekirin. Ev pir girînge. Dahûrandin ji bo dîroknasan hêzeke mezine.**

**- Di wateya giştî de gelek feydeya van dahûrandinan çêbû. Yek jî meyzandina me hat guhertin. Meyzandina me ya li girseya gel, pirsgirêk û kesayetê re hat guhertin.**

**---.:Diyardeyan li cihê wan bicîkirin, piştî wê dê hêsan be. Wexta ku meyzandin seqet be, bihezaran**

**meteryal bicî bike jî, encam wê pir xeter û dibe şaş be. Wê encam berevajî, bê naverok, gelek belav bibe û hûn ê bê encam bihêlin. Wê ev jî bi xwe re tevlîheviyê bîne. Ez pir zêde li ser dîrokê sekinîm. Min pir kêm zanyarî bidest xistibû. Wê demê derfet gelek kêm bûn. Ez bi dîroka serdema yekem re mijûl bûm. Mesela, nirxandina dîroka destpêkê ya Şemsettîn Gunaltay heye. Li gel vê, nivîskarên Ewrûpa; nirxandinên dîroka mirovahiyê hebûn. Kêm-zêde bi wan re eleqedar bûm, min hinekê dîroka şaristaniyê xwend. Bi giştî jî hinek dîrokên xwe dispêre teoriya Marksîst xwend, min yên din jî xwendin. Lê di derbarê dîrokê de min herî zêde şîroveya xwe pêş xist. Ji xwe dîrok ne meseleyeke ku diyardeyan anîna gel hev dahûrandine. Ji xwe hûn di derbarê hemû pîlanên serdema jiyana kevin de dikarin gelek kêm belge bibînin. Li**

**vir tişta girîng rêbaze, nêrîne. Dema ku we nêrîn, rêbazên nêzîkatiyê saxlam girt, hûn ê gelek tiştan îzah bikin. Heta peyvek jî (mesela "*ga*") dikare we bibe encamê. Li gorî min heke we beramberî yek-du peyvên bingehîn yên Kurdî di Sûmer û Huriyan de dît, li gorî min Hurî Kurdin.**

**Me ev rêbazên nû pêşxistine, dikare karê we jî hêsan bike. Ez bawerim hûn ê jî ji niha şûnde dikarin hîn bihêztir û bi îda bibin. Bi taybet dikarin hîn baştir li ser Elewîtî, Elewîtî-Kurdeyatî, têkiliyên Elewî-Îslamê bisekinin. Heman tişt dikarin ji bo ekolên din jî bikin. Her dewleteke biyanî mêzeyek Kurdolojî ava kiriye. Hewl didin bi eleqeyeke mezin PKK'ê fêm bikin û gudar bikin. Dibêjin wê "*Kurdeyatî rewşên ecêp derxe holê.*" Di vê hûn jî bi temamî xwe amade bikin. Em ê Kurdeyatiya herî balkêş derxin holê. Min ji Almaneke ku di Enstitûya Rojhilata Navîn de erkdar re**

**got ku "*lêkolîn bikin.* " Wê ev bi baldarî bên lêkolînkirin. Ew hîn zêdetir serwerin û bihêz in.**

**Tişta hûn ji min fêr bibin eve; min hewlda him xwe di nava kûraniya dîrokê de, him pêşeroj û him jî di nava niha de pir vekirî deynim holê. Xwe weke xwe nîşandan pir girînge, ji ber ev xwedî nirxeke mezine. Lê hêjmareke zêde mirovên me xwe bi awayeke din didin nîşan. Bi dîn, felsefe, îdeolojî, tiştên ji vir-wir girtî re xwe dide axaftin yan jî Kurdeyatiya li beramberî me xwe pir mezin vedişêre. Tevgera nûximandineke mezine. Ne weke boxçeyeke bi çil rengî pînekirî zelal, vekirî û tazî ye. Rastî eve!**

**Ji vê hêlê ve jî dibe ku ji bo we fêrker be. Ger ku dixwazin têkiliyên Kurd fêm bikin, li destnîşankirinên me temaşe bikin, hûn ê hema fêm bikin. Xeta kêmaniyên wê li kîderê ye, zêdehiya wê çawa çêbû, helwesta wê**

**li kîderê ye û wê fêmkirina van hêsan be. Di demên dawî de xizmeteke wisa têgihiştî daxwaz kirin dibe. Hemû gel, xwe evqas beşdar dike. Em jî gelek bi pîvan, di cihê wê de bidin û hûn ê jî bigirin. Em ê him ji we bigirin, him jî di asteke jor de bidin û hîn zêdetir bixwazin. Hûn di nava makanîzmayeke bi vî rengî de ne. Rewşenbîr jî ketin nava vê makanîzmayê; ji çep, rast û yeke-yek kesayet bi pergalê ve hatin girêdan. Bi misogerî hûn nikarin ji bin bandora vê derbikevin. Zaroktî nekin, dewra ferdperestiya we derbas bûye. Bi rastî jî hûn ber bi bûna parçeyek pergalê ve diçin. Ji niha şûnde her ku biçe wê giranî û cihê we diyarker be. Heke hûn bi aqil bin, hewl bidin vê bixwe bidin meşandin.**

**Ji niha şûnde, nemûmkûne ku Kurdek ji me xilas bibe; başî jî, nebaşî jî, welatparêzê wê jî, xayînê wê jî, mezin û biçûkê wê jî... Kêm-zêde cihê**

**wan diyar dibe. Baş cîh bigirin. Ev ji bo we hîn bi watetire, girîngtire û wê bibe xizmetê. Ji me jî bixwazin. Yanî nebêjin, "*partî li pêşiya me dibe asteng û dibêje vê bikin.*" Na, tiştên ji bo we tên kirin hene û qîmeta wan bizanibin.**

**Dibe ku ji bo dewleteke din bixebitin yan jî gelek ket bidin; wê yan mûçeyekê bidin, yan jî nedin. Di xeta PKK'ê de baş bixebitin, pir baş dijwar bixebitin; em jî ji yên dewletek bide hezar qad zêdetir bidin. Ji her kesî re şerteke min heye; ji yê herî serkeftî re, em ji çaran yekî welat bidinê. Tenê bila giştî xilas bike. Wê qet xilas neke yan jî tiştek sernexe, lê wê xwe mezin bihesibîne. Ev tiştek îfade nake. Lê heke mezin xilas kiriye, wiha bila mezin be. Heke Barzanî xilas kiriba, bila bibe qralê Kurdistanê. Em nikarin vê xirab bikin. Lê parçe kir, yekîtî ava nekir, siyaset weke hunereke bi wate pêk ne anî.**

**Parçebûna eşîrtiyê kûrtir kir, ber bi xwînrijandineke bê wate ve bir. Rexneyên me ev bûn. Heka na Barzanî li ser bingeha qraltiyê mezin bûba jî, wê nerazîbûneke me çêneba. Bi misogerî tiştên wî jî dabûna Kurdistanê hebûn. Lê heke yek derbikeve kar-bar, li ser navê hevaltiyê, li ser navê sosyalîstiyê ji derveyî mezinbûnê hewl dide ji bo hemû ketîbûnan navend ava dike, ew çavê min jî be ez ê derxim bavêjim. Lê dema xizmet kir, nivîskare û binirxe. Tê gotin ku "*di PKK'ê de ji nivîskar û dîroknasan re qîmet nayê dayîn.* " Bi misogerî ne wisaye. Heke nivîskarî di cihê wê de bikar bîne, wê nirxê herî mezin PKK bidiyê. Şêwaza nêzîkatiya PKK'ê jî eve.**

**Ez ji hunermendekê re nabêjim "*bila bê bibe PKK'yiyek bê qusûr.* " Ji xwe yên bi vî rengî cidî nagirim. Ez ê nirx bidim xebata wê/î, lê zagonên wê jî yên giştî hene. Wê ji Kurdeyatiyê**

**qut be, ji otorîteya giştî qut be (dema dibêm otorîteya giştî, qala xwe nakim) ji nirxên bingehîn qut be, lê çibû Kurde, nivîskar-xêzkarê Kurde. Xwe bi xwe dixapînin. Otorîteyeke ku min jî, te jî girê dide heye; nirx û erdemtiya Kurd ku min jî te jî girê dide heye. Nirxeke mirov ya azad û bi şeref ku min girê dide heye, ya te jî girê dide eve.**

**Di oxira nirxan de hatina gel hev girînge.**

**Ferdperestiya rewşenbîrên me, hişt ku heya niha xwe ji vê mijarê dûr bixin. Nêzî rastiya mezin nebûn û winda kirin.**

**Dibêjim ji bo xwe bibin yek.**

**Bila nirxeke we hîn mezin çêbe, bila qedrê we çêbe, hîn zêdetir guhdarvanên we, ekolên we û dibistanên we bibin. Ev jî tişteke xweşike. Di hemû netewan de, dîroknasên bihêz ekolek, dibistanek diafirînin, şagirtên wan hene û didin**

**fêrkirin jî. Vê ji we xestin, bawerim ne fermaneke PKK'ê ye, rastî li bîra we anîne. Dîrok, rastî, kêm-zêde rewşa tiştên her gelek jiyan kirî li bîra we anîne. Dema ez tiştek wisa dibêjim gelek kes dibêjin; "*li dîktator temaşeke*. " Pirsgirêk ne wisa gotine. Heta ez tenezil jî nakim. Ez bi ferman kar nadim meşandin. Bandorkerim, ji ber wê pêwîstiya min pir bivê nîne! Veguherînerim, çima wisa bêjim! Ez ê rastiyê jî li bîra te bînim.**

**Min ji bo M. Emin Bozarslan hevokek bikar anî; ji bo Ehmedê Xanî (hûn dizanin wî Mem Zîn tercûme kir) "*em 1995'an weke salvegera çêbûna wî pîroz bikin.* " Heke yê Ehmedê Xanî rojaneyî dike nabîne, ew yekî kore, bi rastî jî wê sibe di nava şermeke mezin de derkeve beramberî me. Wê ew bi xwe bêje; "*Ez ji yekî li ser navê Ehmedê Xanî diaxive, wî tecrûme dike, te çima rastiya ku Ehmedê Xanî dibe serkeftinê nedît?*" Wê bi xwe**

**rezîl bibe. Qaşo rewşenbîre. Wisa dinivîse, xêz dike. Lê xafîle. Wisa bûyîn ji bo wî nebaşe. Wê sibe hemû Kurdistan rabe serxwe, wê sibe Kurdistan ava bibe, wê biçi rûyî bê welat? Hêza ku vê bike heye, partî heye, milîtanên ku bikin heye, ma wê nebêjin? Li beramberî van wê çi bêje? "*Ma wê bêje min nedît, nebihîst û nisanim?"* Îzahên wî zêde ne. Ji ber wê dibêjim, rewşenbîrên bi vî rengî divê hema şiyar bin.**

**Çend nivîskar û helbestvanên Kurd hebûn. Mesela Ehmet Arîf dibêje; "*ev ji min çi dixwaze?*" Ez tiştek ji wî naxwazim, dibêjim bila tenê hinek li welat vegere. Min got; "*bila teng nebe.* " Navê Fîlînta li kurê xwe kiriye. Min ji vê re got, "*Fîlînta'ya naylon.* " Li Çankayê rûdine min jê re got; "*li Çankayê sing ve girêdayî nemîne.* " Nabe ku helbestvanê mezin, helbestvanê azadiyê li wir bi awayeke xwe li zincîrê bide bisekine**

**û nabe kurê xwe jî weke Fîlînta'ya naylon mezin bike. Ev jê re pir giran hatiye. Rexneyeke mezine lê rastiyeke, neçarim ku bikim. Ez Yaşar Kemal, Yilmaz Guney rexne dikim. Tenê ji bo wan bihêz bikim dikim. Qaşo di Yilmaz Guney de Kurdeyatiyek bicî bû. Kureke wî hebû, bi temamî mîna Fransiyekê mezin bûye. Bal bidinê. Tiştek nedîtiye, di rewşeke mezin ya xafîl de ye. Ji xwe bi nexweşiya penceşêrê ket. Dibe ku jiyana ketî navê çareser nekir. Hûn dizanin, ji bo gotinek ji jinê re kir, çû li faşîstekî da. Ket girtîgehê, bi nexweşiya penceşêrê ket. Nêzîkatiyeke malbatê ya şaş heye. Heke feraseta malbateke bi vî rengî nebûya, heke ji bo jinek bi vî rengî li zilamek bide xwe winda nekiriba, dibû ku Yilmaz niha bihêz jiyan kiriba. Heke nehatiba lîstika Ewrûpî û Fransiyan; heke nebûya qurbana lîstîka ketiyê Kendal û neçûbana,**

**belkî jî Yilmaz jiyan kiriba û bûba Yilmazê mezin. Ji bo ez vê dixwazim dibêjin; "*tu çima evqas bi ser hunermendan de diçî*?" Heke serde neçim ez ê xirabiya herî mezim lê bikim.**

**Yaşar Kemal, nizane çawa bûye romanvan.**

**Yekî Fransî pirsiye, ya rastî dixwaze sedema romanvaniyê bizanibe, lê nikare îzah bike, dibêje nizanim li Çukurovayê wisa mezin bûm, li vir wisa mezin bûm.**

**Tezê min jî eve: Heke girêdaneke Kurdeyatiyê nebûya, bi ti awayî nedibû romanvan. Ji bo bibî romanvanek yan jî sinetkarek, bi giştî bindestiyek hewce dike. Di mercên Tirkiyê de ev, hîn derbazdartire. Bi taybet ji bo romanên mîna "*İnce Memed*" bên nivîsandin divê bûyerên mîna eşqiyatiyê bên jiyîn. Ji xwe jiyana eşîreta wî jî wisa pêşketiye. Rastiya Kurd çêbûye, lê wî biriye, li**

**Torosan weke begên Tirkmenan daye. Yanî hestên Kurd, awaza Kurd û bindestiya wê biriye li cihek din bikar aniye. Çawa daket Çukurovayê; li çiya bû, çawa daket? Bixwe li Wanê bû; çawa li çiya bû, eşqiyatî çawa kir? Çawa daket Çukurovayê? Çîroka wê vedibêje. Di wateyekê de çîroka xwe vedibêje, lê nediferqê de ye. Romanvanek mezine; bila xwe baş binase, bila romanê rast binivîse, wê demê ez ê bi wî re bim. Heke rojek hatiba, minê jê hesap xwestiba û hesap bida.**

**Bila eşqiyatiyê binivîse, lê bila milîtaniyê jî binivîse.**

**"*İnce Memed*" li çiya çend sal li beramberî leşkeran şer kiriye, reviye, li çend axayan daye. Me li vir li çend axayan da, bi hezaran leşker û faşîst da. Heke van nebîne ez ê jê re bêjim; "*wêjevanek kor, romanvanek kor û romanvanek bê ziman.* " Yan wê rastiyê bibîne, koka wê bibîne, yan jî**

**ger nebîne nikare ji destê me xilas bibe.**

**Dibêjin niha xwe di cihekê de girtî dihêle, belkî di derbarê Kurdan de tiştek dinivîse. Wê binivîse, yan na wê pir reş derbasî rûpelên dîrokê bibe. Wê heyfa wî be. Dibêje; "*ev rexneya bêrehme li hunerê.*" Ez çors rexne dikim, ji bo hinek balkêş be. Rexneyên di cî de ne, bi misogerî rexneya vegera rastiya cewherê ye. Ya rastî ev kar tevlîhev dike, koka wan nêzî tiştên xwezaya wan nebûnê îfade dike. Û di Tirkan de Kemalîzmê, di me de jî înkarê pêş dixe. Divê em bizanibin dawî li van bînin. Xetayên pir mezin tên jiyîn. Divê navê her tiştî rast lê bê kirin, ji her tiştî re biqasî giraniya wê cî bê dayîn, bi sedemên wê re her tişt danîna holê, ji bo huner ya devjê nayê berdane, yek jî ji bo dîrokê ev hîn zêdetir jênevegere. Belkî hûn li beramberî van hemûyan şaş bimînin; lê PKK divê mijarê de**

**heya bêjî tevgerek çareserkere. Bi misogerî divê hûn bizanibin lêkolîn bikin û divê hûn heqê wê jî bidinê. Ev, ji bo hûn xwe nas bikin, şîrove bikin, bibin xwedî çalekiyeke rast û xwedî rastiya ekol û feraseteke pêwîst dike. Ez bawerim bûyîna xwedî hunerek, zanistek, kesayetek bi îda, yê ku gotina wî bê gudarkirin û xwedî kesayeteke biqedir-qîmet û vê ji we xwestin, bawerim wê zora we neçe.**

**Ethem Xemgîn: Ev tişta em bikin û karê dixwazin bikine.**

**Abdulah Ocalan: Ji ber wê em bi we re ne. PKK ji bo we ye.**

**- Guhertina kesayeta li vir, piştî ku min guhertina civakî dît şûnde ramanên min hîn zêdetir zelal bûn. Guhertina li vir ji welat re ragihandin, di nava hemû Kurdan de belavkirin misogere. Wê pêşeroja Kurdistanê hîn zêdetir ronî bibe.**

**---.: Li ser vê bingehê, em jî ji hatina we kêfxweşin. Hêjmar,**

**nasname çi dibe bila bibe, ji nêzîkatiyeke wisa bi weta heta bêjî hêz digirim û weke yê ku hêz dide dinirxînim.**

**Divê em hinek bi sebir bin. Bi rastî jî huner vê pêwîst dike. Divê em dilnizm bin. Heke hûn di zehmetiyê de bin jî divê hûn li ber xwe bidin. Huner, berxwedanî, înad û hûrûkûrbûnê dixwaze. Di vê mijarê de divê em di ronakbîriya Kurd de, di pêşveçûna hunera Kurd de bizanibin wê sebir û zehmetiyan di cihê wê de bidin nîşan. Bi misogerî girîngî didînê, herî kêm ji wê bawerin ku bi qasî şervanên li çiya cihê wê heye. Lê di vê qadê de cidiyet pêwîst dike û dîsîplîn dixwaze. Mîna dîsîplîna artêşekê. Xwe ji vê re jî hinek amade bikin.**

**Karên netew karên mezinin.**

**Hemû karên digirin dest dirêdayî netewiyetê ne. Dîsa pir ji nêz ve girêdayî azadiya mirovê Kurd e. Di astên cûr bi cûr de pêşvebirina**

**netewbûnê armanc dike, dîsa guhertin û çareserkirin armanc dike. Partî di vê mijarê de qeraseyeke girînge û bi teqez wê alîkariya wê çêbibe. Bi teqez wê cihê we jî çêbibe. Me heya niha avaniya wê ya jêr amade kir, pêşiya wê vekir. Ji niha şûnde em ê zêdetir bikevin nav, hîn zêdetir xweş-bêş bin. Di vê wateyê de, hunera Kurd wê erka xwe ya di nav şoreşê de baş bileyîze. Bi taybet jî bi şoreşê re, mirovê ku piştî şoreşê înşa bike, hin ji niha ve alikariya pir saxlam, rast û xweşik raber bikin.**

**Em ê nirx bidin we, hûn jî qet nebe di mijarên ku hûn gelek hewce ne de, herî kêm bi qasî wan nîviskarên Kurd yên biyanî bûyîn divê hûn eleqeya xwe pêş bixin. Dema dibêjim hûn, ez qala kesîmên rewşenbîr yên pêş dikevin dikim. Li ser nirxên ku têkoşînê derxistî holê, bi qasî eleqeya dewletan divê eleqe bidin nîşan. Divê mijarê de bi rastî jî**

**di cihê pêwîst bike de rexnedan, di cihê pêwîst dike de xwe ji guhertinê nedin paş. Wisa kirin ne biçûkbûn û bêfirşî kirine. Berevajî vê, ji nirxên dijmin bêfirşî kirin, ji nirxên biçûk dûrketin destpêkirina mezinbûnêye û ji bo Kurdan jî ev li beriya nan û avê tê. Û hemû jiyanên pêşkeftî yên civakî, aborî; bi vê meşê û destpêkirinê re girêdayî ye. Bûna siyasetmedarek û leşkerek baş çiqas bi vê ve girêdayîbe, bûna xwedî hunereke baş û sinetkarek jî bi misogerî bi vê ve girêdayî ye.**

**13 Tebaxa 1994**

## SÊSED SAL:
## Jİ ŞERÊ WÊJEYÊ BER Bİ WÊJEYA ŞER VE

**Em di salvegera jidayîkbûna Ehmedê Xanî ya sêsed salî de ne.**

**Kesayeta ku Ehmedê Xanî bidest xistî di jiyana Kurdan de cî girtiye, lê serkeftî nebûye. Dixwaze rihê Kurd, heskirina Kurd bilind bike, lê biser naxe. Piştî ku Mem û Zîn nivîsand şûnde, em dibînin ku kesî piştî wî tiştek nekiriye. Beriya wê jî tiştek**

**wisa bihêz nehatibû kirin, piştre jî nehat kirin. Heya xebatên me yên PKK'ê ev wisa domand.**

**Min Ehmedê Xanî ne xwendiye.**

**Min wî di xebatê de naskir. Dema min tiştên li ser dihatin gotin guhdar dikir, min dît ku xebatên me daxwazên wî bicî tîne.**

**Me çikir?**

**Ev şer, evezab, ev berxwedanî ji bo kî bû? Evqas xwîna şehîdan, yên xwe şewitantin ji bo çibû? Divê em van jibîr nekin. Di dîroka Franse de keçeke bi navê Jeanne D'arc hebû. Li hember Îngilizan liberxwe daye, ji bo Franse di warê netewî de gelek xebitiye û hîn jî qala mezinbûna wê tê kirin.**

**Rihê Fransaye.**

**Rihê berxwedanî, serxwebûn û azadiyê ye. Û Franse li ser vê bingehê mezin dibe.**

**Li gel me ne yek, ne du, ne sê, tenê ne xweşewitandin, ji bo teslîm**

**nebin bi sedan bomba bi xwe de teqandine, bi sedan keç û xortên me yên xwe di zinaran de avêtin hene.**

**Yekî ku van nas neke û bêje; "*dixebitim, wêrekim, xwediyê Kurdeyatî û Kurdistanê me*" ew sextekareke mezine. Siyaset, wêje û dîrok li ser navê şer çi xebatê bide meşandin bila bike, ger li ser van nefikire vê jiyanê, siyasetê, şer û rih neke yek, tişta dike ji xiyanetê xirabtire.**

**Yên ji ber vî welatî xwe dişewitînin, ji bo teslîm nebin bombayên xwe bi xwe de diteqînin nayên jibîrkirin.**

**Hûn nikarin bejin; "*ez nikarim li ser van bifikirim û binivîsim*. " Ez nirx jî nadim van. Heke hûn wisa bikin; hûn ne ti tiştin, sextekarin, bêziravin, bê îmanin, nezanin û bê rihin. Heke hûn wisa bin nikarin bibin welatparêz jî. Nikarin bibin xwedî tiştên mezin. Nikarin bibin xwedî siyaset, xwedî**

**riheke mezin û xwedî kesayetek rêber.**

**Ev xwîn, ev şer ji bo kî bûn?**

**Tişta min di hinavê xwe de hişîn kirî çiye? Hatiye ispatkirin ku ez beramberî gel rawestiyame. Min ji bo xwe ev xebat kir destpêkek û malê hemû gel. Yekîtiyek avabûye, serhildan pêşketine, riheke mezin ava dibe û ez di xwe de vê çawa dibînim? Divê mirov durist be û bi hinek tiştan jî nelîze.**

**Yên ku me winda kirine çibû?**

**Yên pêwîste em bibînin û bigirin çine?**

**Niha pirsgirêka me ya mezin; pirsgirêka ku pêwîstiya vî gelî bi çi heye, wê çawa bibîne, çawa bigire û çawa biparêzê ye. Pêwîste xebat di vê derbarê de be; ji ber girêdayî heve.**

**Welatek tê xwestin!**

**Em nikarin bê welat baxivin, nikarin gavek bavêjin, nikarin serbixwe û azad bijîn. Ancex bi**

**gihiştina welatekê re wê nirxê zarok, malbat, jin û zilam çêbe.**

**Welat nîne, gel jibîr bûye, serxwebûn û azadî nayê bîra ti kesî û axiftin nîne. Her tişt di nava ferdiyetê de xeneqiye, tine bûye. Malbatek heye ku tiştek tê de nemaye; ji derveyî mirin, rezîltî û ketîbûnê. Ji bo înkara welat, înkara netew, gel û gelan çi pêwîste ev hemû di kesayeta Kurd û têkiliyên malbatî de heye. Ev girêkeke mezine. Yekî ku dibêje ji bo welat difikirim, heke wê girêkê bibîne li ser nesekine, nikare tiştekê bike û wê ti nerxeke tiştên dibêje jî nebe.**

**Ez li vir ketina hemû gel û kesayetan dibînim. Min bi xwe ev rewş qebûl nedikir. Ji bo rastiya vî gelî tiştên pêwîste rast bên gotin axaftin, ev welat bibîr anîn, fikirandin û anîna ziman ji bo we gaveke. Ya ji vê girîngtir, welatê hineke din di vê rewşê de be, başe tu ji bo welatê xwe çi bikî? Him dibêjî ez yekî**

**welatparêzim, him jî ji bo welatê xwe tiştekê nakî, wê demê tu yekî direwkerî.**

**Em kesayetên wisa bêkes û pir lewaz re rû bi rû ne. Lê min ev ji xwe pirsî û got; "*ji pirsa te ji xwe kirî û rewşa ku derxistî zanebûnê pêwîste tu bi ti awayî jênerevî*. " Tu nikarî bêjî; "*Çi ji vî welatî tê bila bê, dibe yê kî bila bê, kî pê dilîze bila bilîze, kî difiroşe bila bifiroşe, min eleqedar nake.* " Heke wisa bikî bêyî ku bikevî ferqê wê tu jiyanê winda bikî. Heke bêjî; "*înkar bikim birevim, pê bilîzim birevim, jibîr bikim birevim*" vaye Kurdê kor eve, Kurdê ketî eve û Kurdê girêdayî dijmin eve. Ger kesayetek durist bi welat ve hatî girêdan û pirsgirêk çareser bike hebûya, wê min rojê çil caran jê re xizmet kiriba û her tiştê xwe dabanê. Min dixwest ji bo welat bi salan ji kesekî re xizmetê bikim. Min kesek**

**ku xwe û xwîna xwe ji bo welat feda bike nedît.**

**Min dixwest ji mezinên me re, ji şervanên me re, ji Barzanî bigire, heta komûnist û dîndaran re xizmet kiraba. Piştre min dît ku hemû sextekarin. Hemû bûne kesayetên lewaz, bi mesele û fikrên mezin re dilîzin. Ev rewş nayê pejirandin. Bi vê kiryara dikin ve qîmeta ku zarokek dide ew nadin welatê xwe. Cewherê wê nîne, hikmeta wê nîne, nirxê wê nîne, ne xwedî gotinên xwe ne. Ma ji ber mezin wisanin û me wisa dîtiye ez ê birevim?**

**Na!**

**Ez ê ji hemûyan hesap bixwazim.**

**Di zarokatiya xwe de difikirîm ku min digot; "wê *bavê min dîsa tiştekê bike, xalên min hene, wê ev tiştekê bikin.* " Piştî çend salan min dît ku, bav miriye, kal miriye û ev kar bi bavan-xalan re nayê meşandin. Piştre ez ber bi dîndartiyê ve çûm. Min ji bo**

**meleye gund digot ku; "*ev, ji Xweda agahî tîne, ji ezmanan di derbarê bihuşt û dojehê de agahî dide, dibe ku ji derdê me re bibe çare.* " Piştre min temaşe kir ku, ev jî dawîbûneke cuda ye. Min got ji vî jî tiştek dernakeve. Ez çûm dibistanên KT'yê jî. Min digot; "*wê ev me mezin bike. Wê xwendin fêr bike, dewlete, di vê riyê de mezinbûn mûmkûne.* " Lê piştî çend salan min dît ku, di nav de ketina me heye, di nav de bêariya me heye, di nav de bêşermî û mirin heye.**

**Piştre bi çepê Tirkan re têkiliyên min çêbûn. Min got; "*çepê Tirkan şer dike, di şoreşê de, di sosyalîzmê de azadiya me heye.* " Piştî çend salan me dît ku, bi navê çepgiran, bi navê sosyalîzmê ji bo me dîsa ketîbûn heye. Ji derveyî vê jî lêkolînên min li ser felsefê, îdeolojiyan, fikran hebû. Min digot ku dibe ku di nav de tiştin hebe. Me xwest li ser Kurdeyatiyê jî rawestin. Me çend kesên li ser navê**

**Kurdeyatiyê diaxivîn dît ku, ew jî sedsal jî derbaz bibe nikarin xwe rakin ser lingan. Me ji van jî encamek negirt.**

**Piştre, salên heftê bû, min wêriya ku yek-du gavan bavêjim. Xebata min jî wisa destpê kir. Heke nirxê mirov di me de hebe; em jî dixwazin li ser navê rastiya mirov, li ser navê rastiya welatparêziyê, li ser navê rastiya wekheviyê, li ser navê edalet û şerefa mirov, li ser navê gel û welat gelek tiştan bêjin. Pêwîste hûn hinek tiştan serbixwe bibînin, mejiyê me heye, nêrînên me hene. Xwe biparêzin. Em ê hinek tiştan gav bi gav bibînin.**

**Min got ji bo welatek axaftin, Kurdeyatiyê fikirin, çêbûna civatekê mûmkûne. Hemûyan min dîn dizanîn. Digotin; "*Welatek wisa nîne, ev welat ji kîderê derket? Di vî welatî de, miletek wisa jî nîne, yên hene jî heliyane çûne.* " Ji xwe dijmin digot;**

**"*min gelek wisa xilas kiriye.* " Mirovên min, hevalên min û bavê min digot; "*Kurê min, lawê min di tiştek wisa de hêvî nîne. Her tişt xilas bûye ma tu dînî? Ji bo van Seyît Riza, Şeyh Seît, Barzanî gelek tişt kirin, lê tiştek bidest nexistin. Di ser de jî tu bi tenê yî. Çend quruşan bêxe berika xwe bi seyarê biçe bixwîne.* " Derfetên me yên wisa nebûn. Bi meşê diçûm her derê, heta zanîngehê jî bi meşê diçûm. Ji rewşeke wisa çawa hatim bûm hêzek? Bibe nebê wê bibe yekî bêçare. Rast-nerast min hinek tiştan digot, lê wan digot; "*na*. " Rih û fikrê wan ne li gel min bû. Du sal cuda mam û di riya xwe de meşiyam. Ya girîng avakirina min a fikreke nû bû.**

**Di çend salên derbazbûyî de me ev fikir di xwe de şênber kir. Piştre me bi hawirdora xwe re şer kir. Dijminê me dijmineke dîrokî ye. Dema tiştek ji bo xwe xeter dibîne pir tund lêdixe. Bi fitne-fesadê û di dawî de bi**

**şûrê xwe yê li beramberî xwe ji holê radike. Me xwe ji ber şûrê wî xilas kir. Piştre em çûn Rojhilata Navîn. Me sitûyê xwe dirêjî ber şûrê dijmin nekir. Me xwe di çiyayeke biçûk yê Libnanê de parast û me karên mezin kir. Di dîrok û Rojhilata Navîn de jî xebatên bi vî rengî kar kirin çêbûne. Musa, İsa, Muhammed hemû jî wisa xebitîne. Ji derveyî vê jî gelek şoreşger wisa çêbûne. Me jî cihek pir teng dît û dest bi xebata xwe kir.**

**Dijmin her tişt bi şûrê xwe digire. Ji ber vê kes nikare xwe bê şûr, bi sîlehê biparêze. Divê bi girîngî li ser şûr û silehê bê sekinandin. Şûr û sileh ji bo çiye, bi ser çireye, çawa tê bidestxistin, piştî hat bidestxistin şûnde tu wê bi şûr û sileh li kî derê, çawa bixebitî, rêbaza vê çawaye? Divê bi salan li ser van bê sekinandin. Çima? Ji ber rêyeke din ya jiyankirinê nîne, bê şûr û sîleh henasa nayê girtin. Bê sileh çi bê gotin, çi bê kirin**

**ji derveyî rastiyê ye. Dijmin bi şûr û sileha xwe re her tiştê te ji destê te girtiye û ji bo te rê nahêle. Yan tu yê biçî winda bibî, yan jî îsyaneke bê amadekarî bikî û piştre bikevî. Rêyeke din ya vê nîne. Heke tu mêrxasî liber xwe bide! Lê tu miriyî! Heke birevî jî riya te digire. Ev rastiyên mezin û bêemanin. Lê me bi evîneke mezin, bi fersend û derfetên mezin ve şûr girtiye.**

**Şûr wêrekî û dileke mezin dixwaze.**

**Lê ji ber bêçaretiya mezin, ji her cihî ve bê rê û bê henase mayî şûnde tişta yekem tu hildî destê xwe şûreke, sîleheke. Me jî van bidest xist. Heke her yek ji me li cihekê bimire, darbeyên me bihêz nebin jî, dîsa em ê her tiştî bi şûr bidest bixin.**

**Min li ser vê amadekarî kir. Pêngava 15'ê Tebaxê 10 saliya xwe temam kir. Di dîroka Kurdan de gaveke mezine. Di vî şerî de em çiqas**

**fikirîn, me xwe çawa amade kir, me sileh çawa girt, ji bo çi, me dixwest çi azad bikin? Pêwîste di warê siyasî û leşkerî de li ser van pirsan baş bê sekinandin. Ez her tim dixwazim xwe azad bigirim. Min vê rastiya xwe diyar kir û li ser vê jiyan dikim.**

**Rastiya min rastiya gel û welate.**

**Bila dilê we azad be. Bila kes bi xirabiyên xwe ve bi min nelîze. Bila kes fikrê xwe yê paşketî û zordariya xwe li ser min ferz neke. Ji bo welat, ji bo azadiyê hevaltiya xwe pêş bixin, dostaniya xwe pêş bixin. Û ev mafê me ye. Bê vê jiyan nayê meşandin. Heke ez karê xwe, armanc û hedefa xwe wisa nekim, wê nirxê jiyana min a pênc quruşan nebe.**

**Heke li ser siyasetê pir klasîk bê sekinandin şoreşek jî nikare bigihe armancê. Gelek şoreş jî wisa çêbûne û di encamê de binkeftin jiyan kirine. Li ser navê Kurdeyatiyê jî gelek tişt**

**bûne, lê encam nehatiye girtin. Ji berê zêdetir hatine xistin.**

**Belê em dikarin niha Ehmedê Xanî binirxînin û nîqaş bikin.**

**Bi çend gotinên ku min li ser Ehmedê Xanî bihîstine yekî pir wêreke. Li ser heskirin û evînê sekiniye.**

**Mem û Zîn evîneke.**

**Dema destpê dike dibe "*derdê me yê mezin çiye?*" Pirseke di cî de ye. Dîsa dibêje; "*Tirk, Ereb, Ecem çawa bûn dewlet, bûne saltanat û Kurd çawa parçe parçe bûne, rezîl bûne û heke saltaneteke me, hukmeke me hebûya em ê çiqas pêşve çûbûna. Û ez ê çiqas mezin û pêşve çûbam û minê çawa mezin nivîsandiba.* " Ez bawerim li ser van sekiniye. Di cî de ye. Piştre li ser xweşikbûna welat û şîrînbûna welat sekiniye.**

**Keskahiya Botanê çiye?**

**Li ser çiyayê Cudî û Cizîr-Botan sekiniye. Dîsa di welat de gel çawa jiyan dike, gelê Cizîr-Botan çiye, jiyana wan çawa ye? Li ser van sekiniye.**

**Piştre dest bi çîrokê dike.**

**Tişta ji çîrokê bê fêmkirin eve: Ehmedê Xanî dixwaze dilek rake, pêşerojeke mezin dixwaze. Heskirinek mezin heye. Dema hewl dide heskirinê serwer bihêle, li pêşiya xwe astengan dibîne; Mîr dibe asteng, Beko dibe asteng. Yekîtî dixwaze, lê eşîrtî astenge. Yêkitiyên bi vî rengî zehmete. Hevaltî dixwaze. Mem û çend hevalên wî hene. Ji ber heskirina wî ya li hember Zinê, Mem davêjin girtîgehê. Mem di girtîgehê de dihele. Zînek heye; dixwaze hez bike. Lê ne mûmkûne. Di nava civakekî bi vî rengî de gelek zehmete. Dîtina rojek tenê jî şer û karek mezin dixwaze. Dema hevdu dibînin dihelin diçin, dişevitin.**

**Mem dimire!**

**Zin dimire!**

**Girî û êşek mezin heye. Çîrok eve. Kin û naveroka dizanim eve. Bêguman divê ev çîrok bê tehlîlkirin. Heke neyê tehlîlkirin wê encamek zêde neyê derxistin. Wê negihe armanca Ehmedê Xanî û Mem Zînê.**

**Em ê li ser çîrokê bisekinin.**

**Di xebatên me de jî tiştên me dîtine eve: Hemû şervanên me di şer de dihelin. Îdayeke min heye; dijbertiyek min heye. Em li ser van; li ser welat, li ser xaka welat pir bihêz rawestiyan. Li bîra min e, di zarokatiya min de kevirên welat, heriya wê, darên wê, çûk, mar û her dareke wê weke hevaleke min bû. Her keskahiyeke wê, her avake wê û her çûkeke wê di bîra min de ye. Deynê me ji welat re heye. Divê li ser faşîzma di welat de tê meşandin jî bê sekinandin. Pir ji wan gundiyên me ne, cîranên me ne, hemû gund wisa**

**difikirin, wisa dibînin. Lê xwe ji wê rewşê dernaxin, ji destê wan dişemite diçe.**

**Li bîra mine, dema ji welat qut dibûn-diçûn jibîr dikirin. Diçûn bajarên Tirkiyê yên mezin, diçûn Edenê û Stenbolê. Careke din jî nevedigeriyan. Dema diçin Ewrûpa tu nikarî careke din wan vegerînî. Welat zêre, welat Dêrsime, deriyê zîve, lê tu bikujî jî nikarî vegerînî welat. Ev çiye? Te hezar sal li ser vî herî jiyan kiriye, piştre bê sebeb qut bûyî çûyî. Yên bi aqil vê qebûl nakin. Bê sebeb û bê şer welat tê terikandin.**

**Heke ji bo welat xebat nekî, şer nekî jiyan nayê qebûlkirin. Heke dil mezin nebe, roj bi roj hemleyên mezin neyên kirin wê bimire. Kurdan hemû wisa kirin, yanî bi xwestekên xwe ji welat revîn. Min bi çavên xwe dît. Tabûr bi tabûr direviyan, dema te welat li bîra wan tanî jî weke ku vereşin lê dihatin. Agire wê**

**bişewitîne, divê ji welat birevin. Dibêjin; "*di nav de tiştek nîne.* " Diçin Edenê, Stenbol û Almanya. Min pirsa çima revek wisa xirab ji welat çêbibe ji xwe kir. Temam Stenbol, Enqere başe, min jî dixwest li van deran jiyan bikim. Min welatên xerîb jî dîtin. Ji xwe re welatên weke bihuştê çêkirine. Lê piştre min got; "*bi misogerî rihê min vê naxwaze.* " Em çiqas li van welatan bimînin, me ewqas dixin.**

**Min ev tesbît kir.**

**Ev ji bo me bû siyasetek. Ji derveyî vê welat û jiyana hinekan pir pêşkeftiye, pir xweşe. Li gundê xwe, malbata xwe, keç û xortên gundê xwe temaşe dikî, hemû ketine. Kurdek reviye, ciwanên wan, rewşenbîrên wan hemû bi dûv revîne. Dijmin çi kiribe, wê dikin. Piştre Ewrûpa derket pêş. Çavê hemûyan veregerî ser vir. Ev nayên înkarkirin, yê înkar bike xayîneke mezine. Tu**

**dijminê xwe, welatê wî û jiyana wî hezdikî. Baş be, nebeş be, heqê te be neheqê te be tu jê hez dikî. Ewrûpî bi sedsalan şer kirin, ji bo xwe welat avakirin. Tu yê çima wî hez bikî û tu yê çima li wir ji xwe re cî bixwazî? Tirkan ji bo xwe welat avakirine, Stenbol bi dest xistine. Tu yê ji bo çi û çawa hez bikî?**

**Mafê te nîne tu di welatê yeke din de jiyan bikî.**

**Heke tenezil bikî, tu yê rihê xwe winda bikî.**

**Nivê welat li Stenbol, Tirkêyê û Ewrûpa ye. Ev pirsgirêkeke mezine. Gelek ji wan, ji dîrok û jiyana netewa xwe direvin. Dibêjin;"*Kurdeyatî eybe.* "**

**Tê bîra min, min jî di zarokatiya xwe de digot;"*xweska ne Kurdeke wisa bûma.* " Min jî lêkolîn dikir û digot; "*Ez ji malbateke gelek bêsiûd hatime, gelo eslê min digihe Kurdeyatiyê.* " Mesela berê digotin**

**"*eslê vî digihe Ereban, Farsan.* " Ez jî difikirîm dibe ku eslê min bigehe Tirkan. Piştre min temaşe kir ku yekî wisa bifikire wê bikeve. Bêguman pirsgirêk ne pirsgirêka esil yek be yan jî ne yek bê ye. Pirsgirêk, firotina rih, mejî û fikre. Li ber çavên min, ji hevalên min yên zarokatiyê bigirin heta hemû kes, her tim direvîn. Kesî nedigot rastiya welat, aşitiya wê û jiyana wê "*çawa ye*. " Dema dibihîst pişta xwe didayê.**

**Dema bi gundiyan re tê axaftin dibêjin; "*guhê me dirêje, em tiştên wisa fêm nakin*," hinek jî dibêjin "*em darê hişkin, şînbûna me nemûmkûne, tiştên wisa ji me re nebêje.* " Ev sedemên me reva ji welate.**

**Carekedin em vegerin ser evîna Ehmedê Xanî.**

**Heskirin çiye, divê çawa be?**

**Yekî bi wêrek be divê çend pirsên bi vî rengî ji xwe bike. Em ji çi hes dikin, çawa hes dikin, gelo em ji**

**heskirinê tiştekê fêm dikin? Ez vê ji hevalan re jî dibêjim. Ji xwe dema di vê mijarê de kûr bûm şûnde, bi amûra siyasetê û şer min dijmin naskir. Lê di mijara heskirinê de min xwe û dijmin baştir naskir. Dema ku dixwazim hevalek, Kurdek, şoreşgerek nas bikim, ez li ser dilê wî/ê disekinim. Bi rastî jî pirsgirêka heskirinê çareser kiriye, yan na! Min di vê mijarê de jî xwe mezin afirandiye. Heta tiştên nizanim jî, bi saya vê mezinbûnê dikim.**

**Kîlîda heskirina Kurd û Kurdistanê di destê min de ye.**

**Mirov bi siyaset, şûr ve dikare hinek tiştan bidest bixe, lê heke nebe leşker nikare bibe tiştek.**

**Heskirina Kurd çiye û ne çiye?**

**Ehmedê Xanî xwestiye bi heskirinê ji bo Kurdeyatiyê tiştên mezin bike. Lê serkeftî nabe. Mem wisa ket, Zîn wisa ket, gel wisa girî, Cizîr-Botan wisa girî û careke din**

**ranebû. Ez bawerim di rewşeke nîv mirî de bû, xwest rake, lê nekarî. Ji xwe dijmin mirina wî qebûl dike.**

**Belkî ji me re weke çîrokê ye, lê rastiye.**

**Keç û xort, Mem di gorê de ne, Zîn di gorê de ne, ne xwedî jiyanê ne.**

**Milîtanên me wisa dizanin ku xwedî jiyanê ne. Lê yê ku xwedî jiyanê ez im. Mifte di destê min de ye, hukûm di destê min de ye.**

**Jiyanê nas dikim.**

**Ez jiyana Kurd û heskirina wê nas dikim.**

**Ez naxwazim jiyanê li evqas mirovan qedexe bikim. Min van mirovan hemû rakir. Ji xwe pirsgirêka me eve ku em ê van mirovan çawa ji gorê derbixene. Em ê çawa bikaribin rihê Ehmedê Xanî bidin jiyîn?**

**Li Cîzîr-Botanê Kurdeyatî ketibû. Mirovên me dijminên hevin, ji xwe direvin û heskirina rast nîne. Nizanin ji bo welat evînekê biafirînin. Beriya**

**niha li ser navê şoreşê tiştên li Behdînan, Başûrê Mezin hatine kirin dijmin nekiriye. Tu diçî gel kî dibêjin “*pere, pere, pere, qedehek raqî, gelo menfaeta min tê de heye, yan nîne.* ” *Tu dibêjî; "şoreşek hebû, welatparêziyek hebû, dijmin hebû”, ew jî dibêje; “heke bibînî jê bireve, ji mermiyeke dijmin heya dawiyê bireve, kî qurûşek bide te heya dawiyê jê re xulamtî bike.* ”**

**Rewşeke biêşe.**

**Ketina mirovahiyê ya li vir pir mezin û kirête. Riheke ku mezin bibe nîne. Kurdeyatiya ava dibe bi dijmin re ye. Yên li kêleka sînor hîn tevlîhevtire. Bi dijmin re dibin yek tên ser me. Ma em ê çawa bixwazibin vê kurdeyatiyê binasîn? Em ê bikaribin çawa nirx bidin wan? Di nava vê kurdeyatiyê de malbatî pir zêde heye. Pêşmerge malbatê bernade. Hemû cîhana wî jineke. Bîst û çar seatan ji bo rizgariya welat diaxive dibêjî;**

**“*dibe ku tu welat bidest bixî*” lê ew hîn jî dibêje; “*pere, jin, zarok.* ”**

**Em nikarin wisa bin. Divê ji yên wisa re bê gotin ku jin jî, zarok jî û mal jî bi serê te de bên xwarê. Ev ketîbûna Kurd li ser şoreş û xwînа tê rijandin çêdibe. Kurdeke ku bêje;"*ez heme, li hember dijmin heya dawiyê di riya welat de me, heya dawiyê bidilim û welatparêzim*” nîne. Dema pere nebe li gel me namînin. Dema pere hebe ancak wê demê li gel me dimîne. Heke pere nebe ji bo welatê xwe naxebite. Dibêjin; “*nemûmkûne, divê tu pere belav bikî*. ” Em evqas sal ji bo welat xebitîn, pere nehat aqlê me, lê ev hemû dibêjin; “*pere.* ”**

**Eşqa Kurdistanê nîne.**

**Tu bikujî, serê wî jêkî malbatê bernade, dema bi zehmetiyan re rû bi rû tê jî heya dawiyê direve. Bi misogerî divê li ser Kurdeyatiya ketî bê sekinandin.**

**Heke hûn Kurdeyatiyê ranekin, dê malbat jî bibe dijmin, ketîbûnê, bênamûsiyê û bêşerefiyê. Heke her kes bi dijmin re be jî, em ê xebata xwe ya azadî û serxwebûnê bimeşînin. Dîsa ne weke nêzîkatiya "*Başûr wisaye, Rojhilat wisaye*" divê mirov destpêkê bizanibe li xwe binêre. Heval zirarê didin hev, dijmin nabînin. Evqas sal rihê hevaltiyê, têkiliyên hevaltiyê, yekîtiya wê, wekheviya wê, dîsa mezinbûna hevalan û hezkirina wan çawa dibe ku vê nabînin; dibêjin;"*di vê jiyanê de îlahî yan em ê bibin axa, yan cendirme, yan jî xulam.* " Ji derveyî axatî û xulamtiyê tiştek e din ji destê wî nayê. Başe li ser vê jiyaneke çawa dikare bê avakirin. Koletiya Kurd, axatiya Kurd, bênamusî-bêşerefiya herî mezine û di nava van de jî nirxên mirovbûnê nîne. Hûn hemû van derbas bikin û serbixin.**

**Bibin çare, siyasî bin û bibin hêz!**

**Di encam de yêkitiya ku Ehmedê Xanî dixwest wê ava bibe. Em ê çawa bikaribin ji vê parçebûna xwe û fitne fesadiya xwe rizgar bibin? Wê Beko yan jî axa çawa ji holê bên rakirin? Ez bawerim, me vê hinek serxistiye. Dema mîr bihêz dibû nedikarî heskirinê serwer bike. Dema Beko bihêz dibû nedikarî bike.**

**Ya rastî Beko pir bihêze, ger tu bikujî wê di heman deqê de mezin bike. Dibe sitiriyek. Di nava mirovên tijî heskirin û durist de ye. Di nava we de jî bihêze. Heya dawî minafiq, heya dawî cahilê. Bêyî ku van bibînin, li ser nesekinin hûn çawa dikarin bêjîn; "*ez Ehmedê Xanî nas dikim?*"**

**Beko kiye, pişîkên reş kine?**

**Kî sitirîne?**

**Yên bi yekîtiyê dileyîzin kîne? Bêyî ku van bibînin, hûn çawa dikarin bejin; "*min çîrok fêm kir û xwedî dilim?*"**

**Di rastiya Kurdistanê de Mem jî ketiye, Zîn jî ketiye.**

**Gelo hêza heskirina mezin heye?**

**Na!**

**Ji bo welat dixwazin xwe danin holê, lê nikarin bikin. Nikarin bigihin fikir û yekîtiyên mezin. Ji wê direvin, naxwazin yekîtî çêbe. Çima, ji ber nikarin bikin û ji fêrbûnên xwe yên kevin qut nabin. Heta nizanin hevdu jî hes bikin. Em hezkirinê çawa ava bikin? Hezkirineke ku ez qebûl bikim yan jî hezkirineke rast çawa ye? Li ser min bandora hezkirinê çawa çêbû? Tenê ne hezkirin, ji zarokatiya min heya niha ji gundê xwe, di bajarê hineke din de, di welatê hineke din de divê heskirineke çawa çêbe? Ez şev û roj ji xwe dipirsim. Ez xwe evîndar nahesibînim. Hêza min nîne, lê dîsa li ser disekinim û dixwazim evînê nas bikim.**

**Min got divê Kurdan jî nas bikim. Mesela gundiyek hebû, dergistî dibe,**

**dizewice. Piştre min temaşe kir ku xwe çawa difiroşe? Ji bo çend quruşan direve diçe Tirkiyê. Di xizmeta kî de ye? Ji dijmin mûçeyekê digire û jiyaneke wisa di dilê xwe de bicî dike. Kurdeyatî, welat hemû jibîr dike. Heta malbat hemû jî diçe. Kesî qebûl nake. Bi destê jinekê digire; keç zilam, zilam keçê digire diçin.**

**Min yek dît, du dît, sisê dît û yên li hawirdora xwe dît. Min got; "*wisa nabe, ez ê wisa nekim*" û min amadekariyek mezin kir. Gelek fikirîm ku tiştên van kirine çawa xira bikim. Ez behsa yên wisa bi hev dikenin, ji welat direvin, yekîtiyê, hevdu û welat înkar dikin, dibêjin;"*îlahî ez tişteke din nasnakim û qebûl nakin re*" dikim. Cihekê biçûk dibîne, li wir çil sal dimîne. Jinekê digire, zilamekê digire, çil sal pê ve tê girêdan. Çend quruşên wî yan jî xwarineke wî ya dibe yan jî nabe. Ev dijûneke mezine. Di warê îslamê de jî dijûneke mezine, di**

**felsefeyê de, di ti îdeolojiyan de, di ti xebatan de ne gengaze ji vê re cî bê dîtin. Jina wî heye, zarokên wî hene, milkê wî heye, ev hemû wê bibin agir û bişewitînin.**

**Bêguman, dilê min parçe dibe. Lê wisa jiyan bikim, ji xwe re jiyaneke wisa ava bikim, bi misogerî ez vê qebûl nakim. Min got; "*Apo li ser lingên xwe bisekine, xwe biparêze, bi ti awayî neye lîstokê*. " Sedema avabûna min a mezin eve, yanî min xwe parast. Ji zarokatiyê heya niha min xwe parast. Ez nehatim van lîstokên saf û ketî. Li ser ez çawa wisa bihêz bûme bisekinin. Heke hêza we, mejiyê we, dilê we hebe li ser bisekinin. Yê ku xwedî dile, xwedî zanebûne bila li ser bisekine, dikare sirê min derxîne holê.**

**Ya rastî tişta Ehmedê Xanî xwest pêk bîne welatparêziya mezine û desthilatiya gel e. Dixwaze gel bihêz**

**û bizanebûn bike. Evîn û girêdana Ehmedê Xanî ji bo vê ye.**

**Evînek bê welat nabe!**

**Bêyî ku desthilatiya gel hebe evîn nabe, heskirin nabe. Çîrok vê îsbat dike. Ehmedê Xanî, beriya sêsed salan xwestiye tiştekê bike. Salên hezar û hefsedî, dema şerên netewî û demokratîkbûnê bû. Di van salan de, rihê netewî nû nû ava dibe. Li Avrupa, heta li Rojhilata Navîn hinek ava bûye. Li Kurdistanê jî pêwîstî bi riheke wisa heye. Û Ehmedê Xanî vê tesbît dike dibêje; "*welateke me heba, saltanateke me heba, em nekevin bin lingê Tirkan, Ereban, Eceman.* " Wiha li ser vê jiyankirin, Newroz kirin, evînek kirin meyzandineke herî raste.**

**Ev xeyaleke pêşveçûyî û xewneke.**

**Li biser nexist.**

**Çima? Ji ber fikrên bi vî rengî yekîtî, gel û têkoşînê dixwaze. Li**

**hember eşîretgerî, şêx û paşayan şer û têkoşînê dixwaze. Ehmedê Xanî jî karmendeke. Yan çend dostên wî hene, yan jî nîne. Bi ser wan de naçe. Ji bo bi ser wan de neçû bû nivîskar, wêjeya xwe ji bo rê li ber xebatê veke bikar tîne. Dixwaze ji bo netewbûnê bike, lê piştî wî kes di wê riyê de naçe.**

**Dostê me yê binirx Îsmaîl Beşîkçî Xoce dibêje; "*ne destpêka Ehmedê Xanî heye ne jî dawiya wî*" yanî nivîskareke wisa ye. Dîsa dibêje; "*PKK jî wisa ye.* " Ji bo min jî digot; "destpêk heye, lê dawî nîne û xebatên Ehmedê Xanî biser dixe. " Di kêliyê de tesbît dike û raste jî.**

**Kesî dewama Ehmedê Xanî neanî.**

**Li ser navê Kurdeyatiyê gelek serhildan jî hatin kirin. Me axayên wan jî, begên wan jî, heta yên dawî jî me naskirin. Digotin; "*ger dijmin bixwaze, dê we ji bo xwe bike dewlet.***

***Li Başûr jî li ser navê vê-wê kirin. "***
**Amûreke wisaye ku, li ser navê Kurdeyatiyê di bin xizmeta dijmin de ye. Sêsed sale yên weke serok tên nasîn ger wisa kiribin, ma yên din çi bikin? Axa, beg, şêx, ji ber berjewendiyên xwe tişteke ku di vî welatî de nefirotibin nehiştine. Rihê wan nemaye. Wê li kî derê Ehmedê Xanî nasbikin. Bi riya Ehmedê Xanî nikarin heskirinê bikin. Ji wê direvin û ev pir zêdene jî. Ez jî bi tenê mam. Lê di vî şerî de tişta hat xwestin ku bê kirin, tiştên beriya sêsed salan dihat xwestin ku bên serxistinin.**

**Di derbarê giraniya sêsed salan de divê hinek tişt bên girtin. Çi xwest, rewşa Kurdistanê, axatî, begtî û dîsa hukmê Ereban, Tirkan, Eceman çibû, bandora wan çibû? Axatî û begtî ji bo kî bû? Eşirtî çibû, xizmeta kî dikir? Kurd kiye? Rihê gel hebû nebû? Divê ev bên nivîsandin, li dîrokê binivîsin, li wêjeyê binivîsin. Gelek nivîskarên**

**Kurd li ser van nasekinin. Bi vê rojê ve nehatine girêdan. Bê hedefin, xebateke wan ya cidî nîne. Weke bêxwedîne. Lê divê xwedî li wan bê derketin. Him jî bi rêzdarî û wêrekî xwedî li wan bê derketin.**

**Ev ji bo yên xwe wêjevan qebûl dikin xebateke başe. Divê hinek tiştan bikin. Divê nirx bidin dîroka mirov û wêjeyê. Divê hinek tişt ji xebatan jî bên girtin. Ji ber di nav de şer heye, şûr heye. Pêwîste ev bê xwestin. Divê ev li ser navê wêjeyê, li ser navê dîrokê bê xwestin. Ev di sêsed salan de bûne, heqê şûr eve. Divê wêje cîh ji vê re bide. Ev di wêjeya Ereban de heye. Şûr ji bo vê tê avêtin, hinek tişt bê şûr nabin. Şûrê dijmin eve. Pêwîste li hember vê jî şûrê gel hebe.**

**Şûrê gel çiye, kiye?**

**Ma hûn şûrê gel nas dikin? Şûrê gel wê çi bike, çawa ava dibe, çawa**

**tûj dibe û wê çawa bibire? Gelo di derbarê vê de pirtûkek tenê jî heye?**

**M. Emin Bozarslan dibêje; "*em li ser bîranîna Ehmedê Xanî ya sêsed salan bisekinin.* " Hinek tecrûbeyên wî jî hene û pir baş jî xwe bi vê ve dide girêdan. Heke hinek durist be wê van pirsan ji xwe bike. Ji bo Ehmedê Xanî, divê evîna xwe, heskirina netewa xwe, dilê xwe yê li hember welat û ji pirsa ji bo welat çi bike ji xwe bike. Me şoreşeke wisa pêş xist.**

**Bixwe ji Sîlwanê ye. Sîlwan niha dişewite gotineke tenê jî nanivîse.**

**Ev minafiqtiye. Berê miftî bû, lê niha ji minafiqtiyê zêdetir tişteke din nîne. Divê xwe ji minafiqtiyê derxîne. Sîlwan dişewite, çima tiştina nabêje? Şûrê dijmin heye, her roj mirovên welat di nava xwînê de dihêle, gotineke tenê jî nanivîse. Û ji Ehmedê Xanî dibêje bi Mem Zîn re bû. Ev xwe xapandine.**

**Wêjeya Rus, Franse û İngilîzan bixwînin; dema welatê wan dagir dikin çawa şer dikin. Tolstoy, dema gelê Rus radibe ser xwe û xwe birêxistin dike vê di pirtûkên xwe de ecêb dinivîse. Li hember Napolyon derketine û serî rakirine. Romaneke mezine. Di cîhanê de klasîkek binavûdenge. Li Fransayê temaşe bikin, wisa dinivîsin. Ji derveyî vê jî di hemû netewan de heye.**

**Wêjevanên me, ka temaşe bikin tiştek wisa nivîsandine? Nikarin bêjin; "*tişteke ku em binivîsin nîne.*" Heke tiştek nebe wê demê ji bo hinek tişt bibin divê binivîsin. Edep exlaqe, edep rihe û armance.**

**Pênûs û şûr çiqas bi hev ve girêdayîne? Lênûs û şûr heman karî dikin. Yek bi şûr serî jê dike, yê din bi pênûsê serî jê dike.**

**Heke pênûs fikir nede, wê şûr nikaribe sitû jê bike.**

**Ji bo azadiyê tiştek nehatiye nivîsandin. Ma nikarin binivîsin? Pirsgirêkên Kurdan jî yên edebî hene. Ma dijminê Kurdan yê her tiştî bi şûr têxin nîne? Heye, him jî ev dijmin dibêje; "*me wan xist gorê, me Kurdistan xist gorê û Kurd nîne.* " Nivîskarên me çawa dibe ku vê tesbît nakin?**

**Hewceye nivîskarê Kurd, wêjevanên Kurd durist bin. Li ser navê dîroka Kurd tê axaftin. Dîrok heye û ji bo vegotina çend çîrokan nîne.**

**Dîrok ji bo ronîkirina vê rojê ye.**

**Nûnerên dîrokê yên ku dîrokê xirab dikin, dîrokê dixin û me ber bi tinebûnê ve dibin kîne? Ataturk kiye? Paşayê Osmaniyan bû, li ser navê Osmaniyan li Kurdistanê çawa qetlîam çêkir? Ji derveyî vê dijminê Kurdan, kîjan dîrok ji bo xwe esas girtine? Xayînên me kîne? Yên xizmetê ji wan re dikirin kîbûn?**

**Dijmin naskirin dîroke.**

**Yên ji dijmin re xizmetê dikin naskirin dîroke.**

**Yên ketî jî dîroke.**

**Di derbarê van de tiştek nenivîse, rastî bike şaşî, şaşî bike rastî, dawiya van nayê. Pêwîste her tişt arasteyî dijmin be. Dijmin dîrokê pir baş nasdike. Dîroka wî dijmine, roj bi roj disepîne. Heke îro negihiyê, "*tu nikarî bêjî ez li ser dîrokê disekinim.*" Derewe.**

**Wêje afirandina rihe.**

**Yê ku rihê Kurd xeniqandine kîne? Rihê Kurd her xeniqiye kî xeniqandiye kî xistiye gorê?**

**Mem û Zîn çawa xistin gorê?**

**Ma di dest de tiştek ma? Ger hûn van venekin, hûn çawa dikarin bêjin em wêjevanin. Hûn nikarin bêjin em xwedî edebin û wêjeyê ne. Kurdeyatiya niha her reve, hemû îxanetê jiyan dikin, tenezil nakin li welat temaşe bikin. Wexta ku**

**Kurdeyatî di vê rewşê de be "*hûn çawa dikarin bêjin ez wêjevanê Kurdim, bi rihê Kurd re me.*"**

**Edep, afirandina rihe. Rihê me dixeniqînin, em naxeniqin. Wisa binivîsin! Ez nabêjim şoreşan zêde wêjeyî bikin. Her kes nikare wêjeyî bike. Hêz dixwaze, dil dixwaze, fikrê mezin dixwaze.**

**Yên bêdil û xwedî dileke reş nikarin vî şerî ronî bikin, cesaret bidinê û bidin şerkirin. Şer ji bo ronîbûnê ye. Lê hemû di tarîtiyê de ne. Li Ewrûpayê keçeke Kurd xwe şewitandin ji bo Kurdistanê piştrastkirineke herî mezine. Ma ji bo vê bûyerê her çi nivîskareke Kurd tiştek nivîsand? Ez bawerim ger Fransiyek, yan jî Almanek bûya wê li ser çend pirtûk nivîsandiban. Lê yê me, di nava nivîskarên me yên wêrek de yan yekê bihîstiye, yan jî nebihîstiye. Şermeke mezine. Him jî şermeke mezine.**

**Divê hinek cidî bibin. Keçek ciwan 18 salî ji bo welat xwe şewitand. Ger van nebînin û bi wêrek nêz nebin hûn ê çawa bibin wêjevan? Têrê nake! Yek jî divê hûn vê hin zêdetir mezin bikin. Ji bo rihê gelekê, tiştên ku kesekê kirine, divê hûn bikin malê gelekî. Bi vî rengî hûn wan netewî dikin û wan azad dikin. Hûn xwedî zimanin, xwedî dilin û divê hûn feryadê bikin. Wêje eve. Behreyên ji derveyî vê jî dibin. Ger dixwazin awaz çêkin bikin, divê hûn awazên xwe di çarçoveya van rastiyan de bikin. Ger hunermendê deng bin, di vê mijarê de behreyên we yên bihêz hebin, di derbarê riheke mezin de bêjin. Lê hunermendên me, behrevanên me ji vê dûrin. Divê beriya ez bêjim, şoreş bêje hûn bixwe hinek tiştan bixwazin.**

**Di dîroka netewan de hinek hunermend dibêjin; "*çareserî ne çareseriye, jiyan ne jiyane. Dijmin gelek xirabe, ketîbûn heye.* " Piştre**

**hinek tiştên di cî de bilêv dikin dibêjin; "*rabûnek wisa pêwîst dike, mirina me eve, mirina me wisa tê dermankirin.* " Nabêjim ez ê wisa bikim bila nivîskarên me nirx bidinê. Lê beriya vê hûn biçin, bejin; "*ey ciwan wisa rabe, hêzek wisa heye, gel hîn bihêztir bibe, bi mehan hewl bide gel azad bike, Kurdeyatiyê wisa rake, heke wisa biwêrek bî tu yê rabî, tu yê wisa bibî xwedî dil*" û wan bêxin bin xizmeta welat.**

**Di min de hinek hêz hene, bixwazin. Min hinek tiştan di xwe de kom kir. destilatî heye, pere jî heye, hinek jî wêrekim; teşe bidinê. Werin, min bixin riya rast. Divê hûn bêjin;"*Apo divê tu wisa xweşik bibî, baş bibî, wisa agahî bidî gel, wisa bigihî siyaseta baş û divê tu riya rast wisa ji me re vekî.* " Di vê çarçoveyê de her tiştî bixwazin. Lê ji bo netew, ji bo serhildanên gel, ji bo desthilatdariya gel û ji bo yêkîtiya gel**

**bixwazin. Ne ji bo xwe. Lê nebêjin, "*hikum jî di destê te de ye, pere jî li gel te ye, hinekê ji bo me bide.*" Ev, daxwazeke biçûke.**

**Ez welatekê didim we.**

**Mileteki azad dikim.**

**Hûnê mezinbûna wan bixwazin. Tiştên biçûk berdin, tiştên mezin, tiştên pir binirx bixwazin. Pere, milk-mal netişteke. Ez çima van dibêjim? Ji ber nivîskar, wêjevan vê dikin. Di wêjeyê de pere nîne, tiştên wisa biçûk nîne, malbatên biçûk nîne. Di wêjeyên mezin de gel heye, rih heye û şer heye.**

**Hûnê ji min welat bixwazin.**

**Ji xwe dema wisa bibe wê malbat baş bibe, wê mal baş bibe, mal-milk baş bibe, yanî wê ji bo her kesî jiyan ava bibe. Exlak û wêje vê ji me dixwaze.**

**Ez li hunermendên me temaşe dikim, weke ku hemû hewl didin min ji rê derbixin. Hewl didin bi jiyanên**

**xwe yên erzan û biçûk min ji rê derxin.**

**Bangî we hemûyan dikim; werin riya wijdan û yêkîtiyê. Dijmin, "*ji derveyî xwe nirx nade keseke din, weke ku dibêjin wisa terorîstin*" li ser min disekinin. Ev rûreşin. Me ji wan re welat qezenc kir, jiyan qezenc kir, lê ew mîna koran temaşe dikin.**

**Ger ku rojekê li ser navê wêjeyê, li ser navê hunerê bên beramberî min wê nikaribin baxivin. Carna polîs derdikevin beramberî min, li ser disekinim, direcifin û dikevin. Wê ew jî wisa bibin. Dijmin çawa li beramberî me ye, ev jî wisa li beramberî min in. Heyfe, şerme. Heke min şerê Kurdan bihêz nekiribe û li hember dijminê Kurdan şerê şoreşgerî pêşnexistibe, hûn çi dibêjin bêjin.**

**Rexneyên mezin bikin.**

**Heke me jiyana mezin, heskirina mezin li pêşiya we nedanîbe, li ser riheke serbixwe û azad nesekinîbim**

**hûn dikarin her tiştî ji min re bêjin. Li ser navê Kurdeyatiyê erzan nayê axiftin. Ger ez jî nekim, bênamûsê herî mezinim. Her kes çi dixwaze, çawa dixwaze bila hema bixwaze. Ji hevalan re jî her roj dibêjim, ji serokatiyekê çi tê xwestin? Şûr bixwazin, şer bixwazin, pevçûnên mezin û uslubê serkeftî bixwazin. Heke bersiva hevaltiyê nedim, hûn çi ji min dikin bikin. Hevaltî bixwazin, ger ji hevaltiyê re bersiv nedim, çi ji min dikin bikin. Ji min heskirinê bixwazin; ger ji hemû mirovên cîhanê zêdetir heskirinê nedim, dîsa hûn çi ji min dikin bikin. Ez amade me. Lê hûn perîşanin. Di we de tiştek nîne, ma ez çi bikim? Ez tiştên mezin didim we, lê hûn fêm nakin. Hûn tiştên biçûk û kevin dixwazin; yên ku dibêjin "*em bi hev bilîzîn, hinek fesadî bikin. Em ê li ser heskirinê çi ji hev bikin, bi çend qurûşan çi ji hev bikin?*" Ez ê vê kesayetê beriya dijmin bikujim. Ez**

**dijminê vê me û ji bo şerkirina wê amademe.**

**Yan hûnê mezin hes bikin, an hûnê mezin bibînin bikin, yan jî bimirin.**

**Apo eve, ne tişteke dine.**

**Ez jî li gel dîrokê me. Li gel Ehmedê Xanî me, li gel dildariyên mezinim. Kî-kê jibîr dike, kî-kê nabîne, hûn ê vê bizanibin. Pirsgirêka me ya herî mezin eve. Ger hûn nebin xwedî pirsgirêkên mezin, dilan fetih nekin, xwe mezin nekin hûn ê nikaribin tiştekê çareser bikin.**

**Ez ji hemû heval û şervanan dipirsim!**

**Ev riheke çawa ye? Ev kesayeteke çawa ye? Hûn şûr çawa bikar tînin? Hûn bi şûr çawa dileyîzin? Niha hemû kar diberdim, li ser van pirsan disekinim. Di rewşa heyî de karê min yê herî girîng eve. Heta ku ez van pirsan çareser nekim, ez jiyanê li xwe heram dikim.**

**Yan ez ê li vir pirsgirêkên jiyanê hemûyê çareser bikim, yan jî bimirim.**

**Ez şêwazeke din yê jiyanê ji xwe re qebûl nakim. Jiyana ku hûn dimeşînin jî qebûl nakim. Divê em li hember rastiya xwe durist bin. Divê em durist nêzî jiyan û pirsgirêkên xwe bibin. Hûn weke nexweşeke li ber mirinê ne, lê dibêjin "*başim.*" Hûn mirîne, ti vexuyanên jiyanê nemaye, hûn bê rêxistinin, bê pêşengin, lê hîn jî dibêjin; "*başim, xweşikim, bitendûristim, bihêzim û mezinim.*" Tu mezinê kî û çiyî? Ji jineke ketî zêdetir di rewşeke xirab de ye, lê dibêje "*ez zilam im.*" Tu ketiyî û heta mafê te yê ku tu pêl xakê bikî jî nîne. Ez ancex wisa te dibînim û dinirxînim.**

**Ez şer dibînim, dikim û heya niha jî ji kirina van gotinan jî qet netirsiyame. Mezinbûna min van pirsgirêkan dîtin û çareserkirine. Ji ber vê xwe diparêzim û hemû şêwayên xizmetê dikim. Ji bo**

**pirsgirêkên mezin çareser bikim van amadekariyan dikim. Bi kirina van re gelek tiştên mezin hat afirandin. Ger ku pirsgirêka we ne pirsgirêka gel, pirsgirêka yêkitiyê be bêjin. Ma hûn ê bi revê, li hevdanê, hevdu parçekirinê re pirsgirêkên xwe çareser bikin? Ma li hember dijmin ti hebûneke xwe nedayina nîşandanê re hûn ê pirsgirêkên xwe çareser bikin?**

**Bi ti awayî!**

**Xizmetên ku me kirine bila ji we re bin. Tiştên me dane we qebûl bikin. Ji xwe re bikin bingehê jiyanê. Ma ji we re gotina ku bi welatê xwe re bibin yek, di welatê xwe de bibin xwedî hêz, li hember dijmin xwe biparêzin em kêmasî dikin? Ma hûn ji welatê xwe revîn, çûn welatê xelkê we çikir? Hûn rezîl bûn. Ji vê rewşê re tenê girî dibe. Çima bê welatim, çima bê xwedîme, çima bê xakim? Ji ber vê pirsgirêkê min xwe teqand. Hemû keda min ji pirsgirêkan re bûna**

**bersive. Vê ji we xwestinê re we naxim bin bareke giran. Berevajî dixwazim we bikin xwedî şeref û we bînim rewşa kesayetên nirx jê re bên dayîn. Ger ku rast nakim bêjin. Ma tiştên dibêjim û dikim nerastin? Mêrxasbin, durist bin. Nebêjin, "*em wisa dizanin, wisa mêrxazin, wisa navûdengin.*"**

**Zanîn, mêrxas bûyîn, navûdengbûn, girêdayî lêdanên mezine. Û ez xwe îsbat dikim. Ji derveyî vê hûn ji zarokekê xirabtirin. Qîmeta zarok dibe, lê ya we nabe. Ez mezinbûna we bi ti awayî qebûl nakim. Dibe ku hûn li hember pirsgirêkên civakê bêdeng bimînin, bi her tiştî bileyîzin, bifiroşin, lê hûn nikarin doza gel ya mezin bifiroşin û bi pirsgirêkên wan bileyîzin. Ji ber ew pirsgirêkên vî gelî yên mayîn û nemanê ne. Ger hûn wan winda bikin wê her tişt ji destê we biçe. Dema biçe jî hûn ê bibin bênamûsên mezin.**

**Ez ev im!**

**Herî zêde ez xwe li hemberî van amade dikim. Xwe bi xwe lîstine.**

**Kurdê kolê ye, lê jiyan dixwaze, pere dixwaze.**

**Ha wisa? Wê demê ha ji te re jiyan, pere! Tembel, bê kar û nexwedî tiştekê ye. Serê xwe raneka. Ma agahiya te ji te heye? Agahiya te ji jiyanê heye? Piştî ku tu ji welatê xwe çûyî şûnde te ji kî çi xwest û çawa xwest?**

**Wê bersiv ji van pirsan re bê dayîn. Qanûna min wisa ye. Ev qanuna mirovahiyê ye. Qanuna Kurd ancex wisa avabibe. Ketine bin lingê dinyayê, tiştek bi navê şerefê nemaye, heya qirikê ketine nava rezaletê. Yek kes tenê jî narabe nafikire "*ka çawa ji nava vê rewşê derkevim.* " Ev Kurd ji bo hineke din weke keran dixebite, leşkertî dike, lê ji bo xwe jî netişteke.**

**Me tiştin afirand.**

**Lê ji dijminê xwe re leşker, dema dor tê wî dibêje; "*ez nexweşim, li erdême.*" Wê demê em jî jê re dibêjin; "*bikeve bin erdê, perîşan bibe.*"**

**Ji xwe beriya her tiştî Apo eve.**

**Hûn neçarin wisa bin! Çareyekedin ya we nîne.**

**Ez ji nivîskar, dîroknas û wêjevanên me re vekirî dibêjim, ez Kurdeyatiyeke wisa dixwazim. Di nava şer de me û şerê min jî eve. Ya hûn ê xwe biguherin, yan jî beriya dijmin em ê li we bidin. Mafê we nîne bi awayekedin bi jiyanê bilîzin. Tu yê nizanibî şer bikî, nizanibî baxivî, nizanibî pêşengtiyê bikî û tu yê li gel min bi derfetên min xwe bidî jiyîn, ez bi ti awayî vê qebûl nakim. Tu yê ji min eleqedarî bixwazî, heqê jiyanê bixwazî. Ez ê bi ti awayî van derfetan nedim te. Ger tu di rihê xwe de welat nedî jiyîn, di dilê xwe de yêkitiyê neafirînî, li hember jin, xort, zarok tiştên rizî yên di rihê xwe de navêjî, ji**

**dêla wan yên nû ava nekî, tu ancex dibî Kurdeke bênamus û kêrî tişteke nayê. Êdî bila van jî wêjevan binivîsin.**

**Em ê vê kesayetê bikujin.**

**Yek jî ev kesayet xwe xwedî namus dihesibîne. Ji xwe mirovên me ji destpêkê ve wisa jiyan dikin. Ger ku min mirovên me wisa qebûl kiriban, minê nikariba tiştekê ser bixim. Ger min ev malbatê, ev gundîtiyê, ev ketîbûnê, ev xwapînokî qebûl kiriba, ez ê jî mîna van kesayetan bûma. Ev tenê ne pirsgirêka min e. Hûn hemû birîndarin, nexweşin û neçarin birînên xwe derman bikin.**

**Ma bila Kurd jiyan neke?**

**Ma em hemû birevin? Em bi hev bilîzin? Bila yêkitî ava nebe? Bila hêz ava nebe? Ez çi ji we bikim? Ger xwe bifiroşe çend quruşan jî, kes vê kesayetê nakire. Dibêjin; "*her çi be serokatî heye.* " Û dibêjin "*Kurdeyatiyê wisa ji me re bîne.* " Me**

**derdê we fêm kir û çareseriya wê anî. Ji xwe niha jî karê me çareserî anîne.**

**Em dikarin girêdana wêje, siyaset û şer çawa bidin çêkirin? Em dikarin di navbera xwe û Ehmedê Xanî de girêdanek çawa bidin avakirin?**

**Mem û Zîn kîne?**

**Ma di nava me de Mem û Zîn hene?**

**Dibe ku di fikir û ramanên min de hinek kêmanî hebin. Ji ber vê hûn jî dikarin hinek daxwiyaniyan bidin. Hûn dikarin ser min bisekinin, heta gelek tund jî bisekinin. Bi misogerî hinek tişt bêyî ku bitirsin, di cî de bêjin, lê durist bin. Ez çawa li ser we pir hişk disekinim, hûn jî li ser min wisa hişk bisekinin. Bixwazin û bikin. Ez jî mirovekim, pir bihêz jî nînim. Ez gelek bi tenê û bê xwedî me. Kesî tiştek neda min. Her hevaleke min bi serê xwe ji bo min pirsgirêkek cuda bû. Hemû pirsgirêkên xwe didin min. Kesî**

**tişteke ku bê taqdîrkirin, rêz jê re bê dayîn neda min. Ez xizmetkarê gel im. Tişta ji destê min tê dikim. Tenê dixwazim bi awayeke durist xwe ava bikim, ewqas. Pêwîst nake hûn min zêde pirole bikin.**

**Hîn di destpêkê de, dema 9-10 salî bûm min xwe li hember nêzîkatiyên dayîk û bavê xwe parast. Heya niha jî min karî xwe li hember cîhanê jî biparêzim. Divê hinek biaqil bin. Min nekin aligirê ketîbûn û kêmaniyên xwe. Di vê mijarê de ez xwe ji we hesab nakim. Ez ê tiştek din bêjim. Tişta ji we dixwazim di riya rast-baş de bûyîn û ji pirsgirêkên me re bûna çareye. Niha yekî ku ji bo salvegera 300. ya Ehmedê Xanî ku bixwazibe baxive heye? Di vê mijarê de yekî ku serwext be dikare baxibe.**

**Divê Ehmedê Xanî bê mezinkirin.**

**Ehmedê Xanî xwedî evîneke mezine.**

**Îsmet Şerîf Vanli: Tenê ne di serdema ku tê de jiyan kirî, ji bo her serdemê şoreşgerek mezine.**

**Abdulah Ocalan: Şoreşgere, ronahiye, dildare û zanyare.**

**Cabar Qadir: Dema ku Ehmedê Xanî qala Kurdan dike her tim yekîtî û yekbûnê dixwaze. Di helbestên xwe de qala Kurdan dike û dibêje; Kurd çiqas qehremanin, lê ji ber van qehremantiyan hevdu tehemûl nekirine û nefret ji hev kirine. Ev, dîtina Ehmedê Xanî bi xwe ye. Fikrê wî fikrên beriya 300 sale. Wexta ku li ser vî fikrê wî tê lîkolînkirin, feodalbûna civaka Kurd tê dîtin. Lê qehremantiya niha bi du awayane. Aliyekî wê fikir, aliyê din jî leşkertiye. Herdu jî di şer de derbasdare. Qehremantiya ku Ehmedê Xanî qal kirî, îro em dikarin bi awayeke modern bimeşînin. Zanist gelek girînge. Divê di destê me Kurdan de jî teknolojiyek mezin hebe. Dîsa**

**îdeolojiyeke mezin û mêzandinek jî pêwîste. Weke we jî gotî ev dîrokin, wêjene û hunere. Divê em van jî komî serhev bikin bixin destê şervanekê. Bi vê ve girêdayî Ehmedê Xanî dibêje; "*ger ku di navbera me de yêkîtî hebûya, wê rêbereke me jî hebûya.*"**

**Bi misogerî yekbûna me pêwîste. Ev yekbûn divê bibe yekbûneke îdeolojîk û civakî. Ji bo wê jî ji bo me rêberek pêwîste. Ev rêbertî divê ne ji bo parçeyeke welat tenê be, divê bibe rêberê herçar parçeyan.**

**Em li hember mamosteyê xwe Ehmedê Xanî ku beriya 300 sal berê tiştên ku pêwîste em bikin ji me re gotiye deyndarin.**

**Felsefeya Ehmedê Xanî felsefeyek mezine. Lê divê em felsefeya cîhanê ya din jî jibîr nekin. Divê em berhemên Ehmedê Xanî lêkolîn bikin, wan bixin bin siya felsefeya îro. Axiftinên we rastiye û netewî ye. Di heman demê de we**

**nexweşiyên Kurdan yên din derxistine holê, derman kirine û wan azad kirine. Ev ji bo pêşerojê bername û rehbereke. Di heman demê de ev ji bo huner û hemû qadên xebatê rastiyên derbasdarin.**

**Abdulah Ocalan: Ev bernameyek nû ye. Ya rastî hunera me gelek kevne. Ger li ser baş bê sekinandin û lêkolîn bê kirin gelek tiştên nû dikare derbikeve holê. Tenê ne Ehmedê Xanî, di cîhanê de yên din jî hene. Wan jî bixwînin. Me xwend, lê me zêde tiştek fêm nekir. Me Tolstoy xwend, lê me Kurdistan neda berçav. Me Çernişevskî xwend, lê me li gorî mercên Kurdistanê negirt dest. Me hineke din jî xwendin, Pûşkîn jî yekî mezine, me wî jî xwend. Tiştên wî gotî, ger li gorî tiştên niha em dikin bikin dikarin hêzeke mezin jê bigirin. Wêjeya Fransa bixînin, wêjeya Îngilîz bixînin, heta divê wêjeya Ereban**

**carekedin bê xwendin û Îslamiyet jî carekedin bê xwendin.**

**Em ancex piştî derketina PKK'ê şûnde pêşketin. Yekî ku li gorî meyzandina PKK'ê li cîhanê temaşe dike, heke berê yek fêm dikir, wê niha hezar fêm bike. Ger beriya niha yek dinivîsand, wê niha hezar binivîse. Ger ku we beriya niha pirtûkek nenivîsandibe, dikarin niha hezar pirtûkî binivîsin. Vaye, mezinbûna PKK'ê. Ji bo hûn karên mezin bikin bangawazî dikim.**

**Cabar Qadir: Beriya Ehmedê Xanî zanyar hebûn. Beriya hingê dibêjin; "*ey Kurd, girêdayî Kurdeyatiyê tu tiştekê nizanî*. "**

**Abdulah Ocalan: Mûmkûne. Dixwaze bêje "*Ey mirovê min, tu kiyî, çawa derketiyî holê*?" Dixwaze di Kurdistanê de hinek tiştan bike. Mirovatiyeke ketî hebû. Mirovahî careke din li kîderê hat afirandin? Li ser van pir baş disekine. Ez li we**

**ecêp dimînim, dema we, fersenda we heye, hûn çawa li ser van nasekinin. Tevî ku em di nava agir de ne jî dîsa li ser van pirsgirêkan disekinin. Jiyana we ya rihet ji vê re derfet dide û hûn dîsa jî li ser nasekinin. Ev ne duristbûne. Divê em ji mirovbûn û Kurdeyatiya xwe re nirx bidin.**

**Cabbar Qadir: Ez vê qebûl dikim. Dixwazim li ser uslub, yanî bernameya we baxivim. Marks dibêje; "*heya niha zanyarên di cîhanê de li ser cîhanê felsefe dikirin.*" Ya girîng ne vegotina Kurdeyatiyê ye, guhertin û veguhertina wê ye.**

**Abdulah Ocalan: Di me de ev rêbaz pir bi hêze. Nivîskareke dost ji bo min dibêje; "*teorî û pratîk pir baş bi hev re dimeşîne.*" Ez ramanên xwe kêlî bi kêlî dixim pratîkê.**

**Cabar Qadir: Weke hûn dibêjine.**

**Abdulah Ocalan: Fikirandin başe, lê wê seriyê Kurd jî bê guhertin, rihê wê nû bibe û ji xirabiyan xilas bibe.**

**Mîrhem Yîgît: Ehmedê Xanî nû digihê nasnameya xwe ya rasteqîn. Beriya niha 300 salî Ehmedeke Xanî hebû û niha jî Ehmedê Xaniyeke ku em li ser disekinin û nîqaş dikin heye. Ehmedê Xanî ancex îro rêzdariya xwe ya rasteqîn qezenc kiriye. Kesayeta Ehmedê Xanî yekî ji wêje û dîroka Kurd re xizmeteke mezin kiriye û kesayeteke rêzdare. Kesayeta Ehmedê Xanî rastiyek wisa li bîra min tîne ku weke keseke bi tena serê xwe li cihekê qîr dike alîkarî dixwaze, lê dengê wî naçe kesî qut bibe û di bîreke kûr de winda bibe biçe tîne. Îro ew kes nû nû ji binê bîrê derdikeve.**

**Abdulah Ocalan: Ji bîrê, yan jî ji gorê?**

**Mîrhem Yîgît: Belê, ji gorê.**

**Abdulah Ocalan: Nû nû ji gorê derdixînin.**

**Mîrhem Yîgît: Ji hêla din ve jî pirsgirêka Kurd dibîne. Lê bêçareye, bêhêze, ji destê wî tiştek nayê, ji**

**tiştek re hêz nayîne û dilê wî şikestiye.**

**Abdulah Ocalan: Bêguman; lê di navbera min û Ehmedê Xanî de ferqeke mezin heye. Ger dilê min jî weke yê wî şikestiba, girîbama, min nedikarî rojek tenê jî xwe bidim jiyîn. Min ev rewş ji roja destpêkê ve dît û li gorî wê amadekariyek mezin kir. Feryad figan çiye? Çare çiye? Wiha, tam di vir de girêdana di navbera min û Ehmedê Xanî de çiye? Mamoste Îsmaîl Beşikçî hinek tiştan fêm kiriye û têkiliya di navberê de girtiye. Ez xwe wisa bêçare nabînim. Dibe ku hûn min nû nû nas dikin. Lê li beramberî hinek tiştan amadekariyên min hene. Weke berê nebin, pêşeroja xwe amade bikin. Min pêşeroja xwe, heta hezar sal piştre jî amade kiriye. Ger wisa nebim ezê rojek tenê jî xwe nedim jiyîn. Ez ê nikaribim tiştek bikim. Ger biaqilbin, hûn ê di riya me dayî nîşan de bimeşin.**

**Ehmedê Xanî çi dikir? Digirî!**

**Her tim dibêjim yêkî ku şer neke ezê wê/î perîşan bikim. Tolê digirim ne wisa?**

**Mîrhem Yîgît: Di şexsê we de, di şexsê serokê netewî de, di rastiya pêşengtiya PKK'ê de, di şexsê mîlîtan û şervanên wê de û di şexsê şehîdên ku heya niha PKK'ê dayî û ji niha şûnde bide de Ehmedê Xanî zindî dibe. Cara yek felsefeya Ehmedê Xanî wate qezenc dike û ji gotinê xilas dibe, derfeta xwe gihandina bingeheke daringî dibîne. Êdî bi şûr tê nixumandin û cara yek ev felsefe bi rêxistin dibe. Yanî ev 300 sale pêşengek ku ji dil û can bersiveke bide vê felsefeyê derneketiye. Cara yek ev rêber, ev pêşeng, dest davêje vî karî. Û mezinbûna Rêbertiyê jî ji vir tê.**

**PKK tenê bi xwedî derketina vê felsefê re namîne, wî di gelek qadên jiyanê de; çi di hundir, çi jî di derve de**

**dide peytandin. Li Ewrûpa derbazî jiyana rewşenbîr, xwendekar, kedkar û gundiyan dike. Di hemû parçeyên Kurdistanê de derbazî jiyanê dike û dide sepandin. Wî ji felsefeyeke li ser qaxezê derdixe û derbazî nav jiyana Kurd dike. Em dikarin di hemû Kurdan de vê bibînin. Di vê wateyê de Ehmedê Xanî ji nû ve tê afirandin û Ehmedê Xanî di wateya rasteqîn de dibe Ehmedê Xanî.**

**Abdulah Ocalan: Beriya xala we dayî diyarkirin vekim, min mirina Ehmedê Xanî çawa nirxandiye, di şexsê Mem û Zîn de mirina wî çawa nirxandiye bidim diyarkirin.**

**Milîtanên partiyê di nava şer de nikarin mehekê xwe bidin jiyîn. Jin jî, zilam jî wisa ne. Ez ji wan re dibêjim evîndarên çavreş.**

**Weke Mem û Zîn evîndarên çavreşin.**

**Nizanin jiyan bikin. Dixwazin min jî bi xwe re weke Ehmedê Xanî**

**bikujin. Nikarin jiyanê bigirin. Min vê xeteriyê di serî de dît. Pêwîst bû min vê xeteriyê ji holê rakiriba. Ji ber van dixwest bi xwe re min jî bikujin. Wiha bi hezaran jin, bi hezaran xort, hemû pirsgirêk jî ji van derdikeve.**

**Di Kurdistanê de jin jî, zilam jî hevdu zû dibînin. Di dîtinekê de, di axiftinekê de hevdu dixin. Her yek ji van jî Mem û Zîn'ekin. Di nava partiyê de gelek Mem û Zîn'ên bi vî rengî hene. Heta rojekê jî nikarin şer bikin. Ehmedê Xanî jî li ser vê mijarê sekiniye. Lê di mijara jiyan qezenckirinê de nebûye hêza çareseriyê. Ji xwe di dawiya çîrokê de weke tê dîtin tam di dema bên gel hev dikevin dimirin. Di nava me de jî yên bi vî rengî pirin. Bi hezaran yên bi vî rengî hene û min jî bi xwe re mehf dikin. Mem û Zîn yek tenêbûn û mirine. Lê ev bihezaranin û dixwazin te jî bikin weke xwe. Lê di vir de ferqeke min ji Ehmedê Xanî heye.**

**Dibe di mijara pirsgirêkên serdemê fêmkirinê de û di kesayetê de aliyên me yên dişibin hev hebin. Tu yê bêjî, feryad-figan bikî û piştre jî birevî biçî.**

**Bi misogerî mirina wisa qebûl nakim.**

**Di felsefeya min de, di xebata min û şêwazê min yê lêdanê de ji mirinê re cî nîne. Destpêkê pir baş fikirîm, ji bo wê min partiyek afirand, yêkîne ava kirin, sazîbûn ava kir. Yekê tenê jî nakujim, ti Mem û Zîn'ekê nakujim.**

**Ev, çareseriyeke mezine. Yanî bihezaran bi vî rengî ne, xwestin me jî bikin mîna xwe. Serokatiya ku me afirandî xwestin tine bikin. Di qada îdeolojîk de, di qada şer de, di qada pevçûnê de ez bi ti awayî nekitim vê rewşê. Heya bêjî ev xaleke hesase. Ti kes nikare ji bêhn negirtina xwe min bixeniqîne, di ketîbûna xwe de min bixe. Di serî de ji bo şer di vî karî de**

**me. Ez van dibînim û didomînim wan tînim.**

**Lê domdariya Ehmedê Xanî nîne.**

**Ketin û çûn.**

**Ketin bîrê, ketin gorê. Ez ji tişteke herî biçûk, tiştên pir mezin diafirînim. Ger yek bi xetê bilîze ez ê bi hezar rastiyan ve ser de biçim. Kurdeyatiya me Kurdeyatiyeke wisa ye.**

**Mîrhem Yîgît: Ger ku yek ji Ehmedê Xanî re rêz-heskirin bide nîşan û ev bibe rêzdarî-heskirinek rastî nikare bêje PKK'ê hes nakim û li dijî derbikeve. Ger bi hiş be ev wisa ye. Ger bê hiş, ne duristbe û direwkerbe, ew tişteke cuda ye. Ger ji dil û can dixwaze Ehmedê Xanî nas bike, dixwaze wî hesbike, ew neçare ji PKK'ê re û serokatiya wê re xizmetê bike. Ji ber xizmeta ku Ehmedê Xanî kirî, li hember xizmeta serokatiya PKK dike gelek lewaz**

**dimîne. Tenê wê weke fikirek biçûk bimîne.**

**Abdulah Ocalan: Em ti şertan jî nadin pêş.**

**Mîrhem Yîgît: Ger ji vê dozê re girêdan nebe, di vê heskirinê de jî sextekarî heye. Em ne hewceyî kesên bi vî rengî ne. Bi ti awayî ez tenezil nakim ku yek bê ji min re bêje, "*tu başî, tu wisayî.*"**

**Abdulah Ocalan: Tiştên ez ji bo van kesayetan dixwazim, nebiçûkbûna wan e.**

**Ez di ferqa mezinbûna xwe de me û dinasim jî. Mezinbûna min tiştên heya niha min kirine dide nîşan. Kes nikare li hember karên min yên mezin ku min kirine bisekine, ancex dikarin biçûk bibin. Ji bo biçûk nebin bila li hember karên min yên mezin nesekinin.**

**Ez dizanim xwe çawa mezin bikim. Baweriya min bi min heye. Min bingehê hezar salî avêtiye. Ev dijmin**

**jî û her kes jî dibîne. Ji bo hîn zêdetir biçûk nebin, bila ji rastiyan re rêz bigirin. Ger dibêjin, "*rêzdariyeke me jî heye*" bila bi pele van rastiyan qebûl bikin. Ji xwe hemû cîhan ji bo min gelek tiştan dibêje. Ma li beramberî van qet biçûk bûm? Di nava partiyê de jî bi hezaran komplo çêbûn, ma ez ketim? Li pêşiya min, li pişt min gelek tişt pêşxistin, lê dîsa li ser lingan disekinim. Hemû cîhan li beramberî min bisekine jî dizanim bimeşim.**

**Hûn nikarin Mem û Zîn dahûrînin.**

**Pêwîste ji hêla sosyolojîk û siyasî ve li ser bê sekinandin. Ji xwe em ê di warê wêjeyî de jî li ser bisekinin. Çima dawiya wan wisa bû? Di destpêkê de çawa bûn?**

**Mem kiye?**

**Zîn kiye?**

**Kîjan kesayetê temsîl dikin? Zîn kîjan kesayetê temsîl dike? Hêza Zîn çiye? Çima nagihin hev? Çima digihin-nagihin hev dikevin dimirin? Gelek**

**lewazin, gelek bêhêzin. Lê dîsa jî azwariyên wan yên mezin hene. Mirov dikare di warê sosyolojîk, wêjeyî û mijara xweşikbûnê de gelek tiştan derbixe. Di warê siyasî de jî naveroka wê dewlemende. Divê ev hemû yek bi yek bên vekirin.**

**Ew sitirî çibû?**

**Beko kiye?**

**Di warê civakî de çi temsîl dike? Beko hêza xwe ji kî û ji ku derê digire? Di nava dîrokê de cihê Beko ku dere?**

**Mîr kiye? Çi temsîl dike?**

**Yek jî Tajdîn heye, kiye? Çi temsîl dike?**

**Mem çima sernexist?**

**Ya rastî xwest gelek tiştan bike, alîkarî xwest, lê dîsa biser neket. Mem ewqas lewaze, di rewşeke ku nikaribe ji cihê xwe rabe de ye. Dişibin, şoreşgerên me yên ku riya xwe şaş kirine nizanin çi bikin. Weke şoreşgerek gelek lewaz û bê taqet.**

**Zîn jî yeke nexweş, yeke ku tiştek ji destê wê nayê, heta nikare li mirovan binêre, bê ziman û bêçare ye. Divê ev hemû di warê sosyolojîk de bên lêkolînkirin. Lê rewşenbîrên me bi awayeke tê xwestin li ser nasekinin. Min wêje, sosyolojî zêde nexwend, lê dîsa li ser dixebitim gelek encaman derdixim.**

**Belkî di wê demê de sosyalîzm nebû, felsefe jî zêde bihêz nebû û her tişt di bin bandora dîn de ye. Heta dibe ku Ehmedê Xanî ev berhema xwe di bin bandora dîn de jî nivîsandibe. Lê dema baş tê lîkolînkirin, heya dawî welatparêzî, felsefe û sosyalîzm heye.**

**Sosyalîzma Ehmedê Xanî, felsefeya Ehmedê Xanî.**

**Di nav de wêje jî heye. Wêjeya wî çiqas netewî ye, çiqas azadîxwaze? Heskirin çiye? Ev heskirin tenê heskirina di navbera Mem û Zîn de ye?**

**Ya rastî heskirina Botanê heye.**

**Botan Kurdistane. Ev heskirin çi şîn dike? Heya niha kesî pêwîstî bi vekirina van nedîtiye. Yên li ser Mem û Zîn disekinin, ev pirs qet nekirine.**

**Heskirina ji Botanê re çi temsîl dike?**

**Kes qala çiyayê Cudî, ava Dîcle, ava Botanê çawa ji livegotinên Ehmedê Xanî vediguhere helbestê nake. Ger hûn bandora ku Gabarê, xwezaya Besta ya li ser Ehmedê Xanî kirî nezanin, hûn ê çawa îda bikin ku wêjevanin!**

**Dema li Rusyayê temaşe bikin hûn ê bibînin, Pûşkîn, Tolstoy, Dostoyevskî çi kirine û hewirdora di nav de çawa lêkolîn kirine veguherandine berhemên wêjeyî. Lê heke hûn ne xwedî hêz, xwedî rêbaz bin, hûn nikarin tiştekê bikin. Lewra em nikarin bi berhemên yekî din wêjeyeke netewî derxînin! Lê em dikarin niha biafirînin. Berê, beriya şoreşê, li ser bingehê netewî**

**daxwaza afirandina wêjeyekê hebû, lê dijmin destûr neda. Bi sedan rewşenbîr wexta di vê mijarê de gav tavêtin bi mirinê re rû bi rû dihatin. Nedikarîn. Ji ber dengê wan dixeniqandin. Lê bi şerê me re û di encama xebatên me de heya dawî riya wêje û hunerê vebûye.**

**Em Ehmedê Xanî weke bingehê huner û wêjeya Kurd dihesibînin. Ne şaşe û nirxa em didinê jî di cî de ye. Ez zêde li ser kesayeta Ehmedê Xanî nasekinim, ewqas jî negirînge. Ya girîng Kurdeyatî, dilê Kurd û têkiliyên Kurd vekirine û girêka wê çareserkirine.**

**Mezinkirina karên netewî û înşakirina zaferê ez her tim deyndarê çareserkirina van têkiliyanim. Ez mirovan dikim xwedî kar û bar. Dema di nav têkiliyan de be ji nû de diafirînim. Hinek têkiliyan dikujim, hinekan jî ji nû ve diafirînim. Digihim mejî û dilê mirovan. Û hemûyan dikim**

**yek. Ez şev û roj dikim. A rastî ev karê Ehmedê Xaniye jî, lê ez hin cewaztir, siyasî, leşkerî yan jî bi her şêweyî dikim. Dema tiştek nakim teng dibim.**

**Li ber xwe didim û bi ti awayî narevim.**

**Heta têkiliyên ku kes nikaribe rojekê îdare bike, bi salane li ber xwe didim. Jiyan di destê we de ye. Ez girîngiya huner înkar nakim. Jiyaneke bê huner nafikirim. A rastî tişta ez dikim; xebatên huner û siyasetê ye.**

**Ehmedê Xanî li ser xweşikbûn û heskirinê disekine. Ez jî li ser disekinim. Mem û Zîn yan jî di na va PKK'ê de, di nava Kurdan de jin û zilamên me afirandine çawanin? Têkiliya min afirandiye çawa ye? Ehmedê Xanî, Zînê li gorî xeyalên xwe dirûv dayê, lê ez milîtanên jin yên di nava me de bi şerkirinê re dirûv didimê. Min ne yek, bi hezaran da şerkirin û afirand.**

**Ehmedê Xanî, bi xeyalê xwe afirand; ez jî bi şûr diafirînim.**

**Memê hatî xistin, bêrih mayî û bi hezarên din bi vî rengî zindî dikim.**

**Mem kiye, Zîn kiye, evîn çiye?**

**Xweşikbûna welat çiye, xweşikbûna jinê çiye, xweşikbûna zilam çiye?**

**Ji wexta min xwe naskirî ve li ser van mijaran pir cidî disekinim.**

**Zilam li hember vê jinê wê çawa bibe zilamek baş?**

**Jin li hember zilamekê wê çawa bibe jinek xweşik?**

**Ez hewl didim vê çareser bikim. Û ev, karek mezine. Rewşa ku heya niha tê dîtin; wexta zilamek hat ba jinekê, dixeniqin diçin. Ji Mem û Zîn zêdetir dikevin. Dawiya wan her tim bi ketîbûnê xilas dibe. Lê hûn min dibînin, li ser linganim, jiyan dikim û ne ketî me.**

**Kurdistan Mukrayanî: Min li vir gelek meteryal kom kirin. Meteryalên**

**ku min ji vir girtine ji îro pê ve heta dawiya jiyana xwe ez ê weke ronahiyekê li cîhanê belav bikim.**

**Tiştên min afirandine divê deng bide cîhanê. hevpeyvînên min li vir bi jina Kurd, keça wê re, dayîka şehîd û keça wê re kir dît ku; her yek ji bo Kurd û Kurdistanê Zîn'eke.**

**Abdulah Ocalan: Ne yek min bihezaran afirandin.**

**Kurdistan Mukrayanî: Û divê Zîna Ehmedê Xanî û Zîn'ên niha bi hev re bên muqayesekirin.**

**Abdulah Ocalan: Zîn'ên niha Zîn'ên welatin, Zîn'ên hemdemin.**

**Kurdistan Mukrayanî: Zîn'ên îro wê nekevin.**

**Abdulah Ocalan: Çep rast temaşe dikin, ji derveyî şer tiştеke din nîne. Ev karê afirandineke mezine. Her jineke milîtan Zîn'eke. Di warê sosyolojîk de, di warê wêjeyî de dikare li ser bê sekinandin. Mamoste**

**Îsmail Beşîkçî li ser vê mijarê berfireh disekine û lêkolînên wî jî hene.**

**Kurdistan Mukrayanî: Mînak doh ez bi R. re axivîm. Jiyana R. romaneke.**

**Abdulah Ocalan: Yên weke R. . . çawa dimeşin? Me çiqas karî wê xilas bikin? Me çiqas karî wê ji binê bîrê derbixîn? Em dikarin ji mirinê jiyanê biafirînin? Niha pirsgirêkên min yên herî mezin ev in. Yên mîna R...bi hezaranin, bi sedan jî şehîd bûne. Hinek jî jiyan dikin, hinek serê xwe ji gorê radikin, hinek parçe parçe bûne, rizîne, kirêt bûne. Ma Zîn jî wisa nebû? Ew jî nexweş bibû, kirêt bibû û bê çare maye. Piştre tê ser xwe. Jinên me yên milîtan jî bi vî rengî bûn. Dema nû dihatin gel min hemû perişan bûn û belengazbûn. Lê ez wan vediguherînim.**

**Kurdistan Mukrayanî: Ez Kurdim, di malbatek Kurd de, li Kurdistanê mezin bûme, navê min Kurdistan bû,**

**lê wê demê ez bi tenê bûm. Lê ez niha şervanên jinên li vir her yekê weke Kurdistanekê dibînim.**

**Abdulah Ocalan: Mezin jî ciwan jî wisanin. Malbata te başe, bavê te welatparêz bû, gelek xizmet kir, lê bi zorê karî te hinekî biafirîne. Divê hûn vê pir ecêb bibînin. Tişta dixwazim bêjim, ev ne kareke wisa biçûk bê dîtine. Heya bêjî mezine, erkeke netewî ye, xebateke siyasî ye. Kes nas nake, ev heval jî nas nakin. Ji wan ve her tişt ji xweber çêdibe. Ne mûmkûne xwe bi xwe çêbibe. Aqilek mezin û dilek mezin dixwaze.**

**Mîrhem Yîgît: Civaka beriya niha 300 sal pir zelale û her tişt pir zelale. Cihê Zîn, Mem, Tajdin, Mîr û Beko pir zelale. Bêyî ku zede ked, hewldanekê bidin, em dikarin di warê sosyolojîk û wêjeyî de cihê wê dênin holê û bi civaka niha re muqayese bikin. Ya din jî em dikarin van hemûyan bi awayek tenduristî tesbît bikin ku îro kî Zîne kî**

**Meme, kî Bekoye, kî Mire, kî îro kîjan rolî dilîze û di warê wêjeyî de jî dênin holê.**

**Abdulah Ocalan: Li gorî we mûmkûne, lê afirandina salan girînge. Çawa hatin afirandin? Çîrok çawa bû? Me çîrok bi şerê xwe re guhert. Dahûrandinan bixwînin. Min li vir çawa xwe anî rewşa tolgirtinê, anî rewşa têkiliyê, anî rewşa pembo, anî rewşa hesin dîsa min xwe çawa anî rewşa mirinê, anî rewşa rih, anî rewşa mejî ger hûn van baş tesbît nekin; hûn nikarin Serokatiyê rast fêm bikin. Şerê min li hember yên li virin û heya bêjî mezine. Xwe mirî hîs dikin. Dibêjin; "*em mirîne.* " Mirinê ewqas hez dikin ku, qala jiyanê nakin.**

**Di rastiya Kurdistanê de yan jî di şerê wê de êdî mirina erzan nîne. Divê em li hember mirina erzan bibin çare. Bi hezaran mirin ji xwe re kirine weke huner. Ger di mijara wêje, hunerê de derfetên min hebûya, pispor bûma,**

**min dixwest di van mijaran de hinek tiştan bêjim. Di nava me de kî temsîla ketîbûnê dike? Rengê we, rihê we, yekî mirî li bîr tîne. Keçên şervan hewl didin jiyan bikin. Divê ji şer qut nebin lê ew, heta çavên xwe jî navekin; bê rihin, bêheskirinin. Hîn ji van taybetmendiyan rizgar nebûne.**

**Ya rastî dema Ehmedê Xanî di vê berhemê de hinek tiştan dibêje bêçareye, dilê wî birîndare û dilê wî şikestiye. Bi vî ve dijmin bi mirovê Kurd lîstiye. Rihê dijmin jiyan dikin. Gelek bênamûs bûne. Ji bo Kurdan bikin xwedî namûs çawa xebitîme û divê hûn bizanibin namûsa Kurd çiye. Ji bo ez vê namûsê xilas bikim li hember her tiştî şer didim. Şerê şeran didim. Zilamê Kurd şerê li ser jin û malbatê dide meşandin wisa dizanin ku li ser navê namusê didin. bênamûsiya esasî eve. Hevdu reş dikin û hevdu têxin rewşeke xirab. Agahiya gelekan ji vê heta ji karê em**

**didin meşandin agahiya wan nîne. Ji bo em armancên xwe yên pîroz bênin cî, em çi ji mirovên xwe yên ji derveyî mirinê ne xwedî ti fikrekê ne bikin?**

**Tabî, ev aliyeke kare. Aliyên kar yên din jî hene. Li têkiliyan temaşe bikin; çiqas têkilî pêş xistine di hemûyan de ketîbûn heye. Dema derbazî têkiliyan nabin jî dikevin. Lê em şev û roj li ser têkiliya rast, heskirina rast disekinin. Ger hûn devjê berdin, destûrê nadin ku hûn rojekê tenê jî van derbixin holê. Hemû şerê min, hemû berxwedana min li hember vê ye. Çiqas bi namûs û evîndarên çavreşin? Çiqas mirî û sarin? Çiqas zilamê dozê ne? Li ser van hemûyan deqe bi deqe disekinim. Lê xwe weke Ehmedê Xanî bêçare jî nabînim.**

**Tenê bi serê xwe weke partiyekê me.**

**Rewşa min ya tolgirtinek wisa mezin bigirim heye.**

**Heke jina Kurd xwe nedin guhertin ji wan re mafê jiyanê nîne. Bi hezaran li gel Rêbertî hewl didin jiyanê bibînin. Başe ez ji vê re tiştekê nabêjim. Bê tirs tên, yên xwe şewitandine jî tên, lê ya esasî ku bên pirskirin evin: Divê hûn çawa hesbikin? Dilê we dixwaze biçe kîderê? Heke hûn durist hes nekin hûn ê bimirin. Me ji aliyekê ve jiyan, ji hêla din ve jî jiyana rast da we.**

**Ji bo zilamê Kurd jî wisa ye. Keç dixwaze, lê çawa dixwaze? Weke ku dayîkên wan keç ji wan re xwestî keç dixwazin. Êdî ew dem xilas bû. Ev kar wisa bi xwestinê çênabe. Tu yê çi ji keçê bikî? Keç çiye, ne çiye? Ji keçê jî dipirsim; xort çiye, ne çiye? Li gorî we xort çiye? Çi dide we? Çi ji we re radigihîne?**

**Tu yê xort biafirînî.**

**Mezinbûna Mem û Zîn ji kî derê tê? Hinek tiştên di Mem û Zîn de, di civaka Kurd de, heta di nava refên me**

**de heye. Ji bo hev dişewitin û dixwazin bigihin hev. Dema vê sernaxin jî dihelin, dişewitin û dimirin.**

**Ehmedê Xanî, dît ku bê welat jiyan nabe, di bin serdestiya kesî de jiyan nayê jiyîn û her ku çû Mem heliya, mir, Zîn şewitî û mir. Wiha mezinbûna Ehmedê Xanî di vir de ye. Lê em ne mirina Mem, ne mirina Zîn û ne jî mirina hinekedin dixwazin. Ji bo wan welat rizgar dikin. Pêşengtî, partî û her tişt ji bo vê ye. Ger zilam neafirînî, nikarî xwedî li jinê derbikevî. Tu li kîderê yî, keç li kîderêye? Tu bi xwe ji jinê xiraptirî, tu yê çawa xwedî lê derbikevî? Ne mûmkûne, tu nikarî bibî xwediyê wê.**

**Ji keçê re jî heman tiştî dibêjim: Tu mirî yî. Beriya her tiştî xwe xilas bike. Tu çi, çawa dixwazî, çi naxwazî? Ji bo Kurdan pirsên herî bingehîn divê ev bin. Dema dayîka min li min temaşe dikir digot; "*nemûmkûne tu keçekê bibînî*. " Min**

**nedixwest ji bo min qala keçan bê kirin. Ji bo min rabûn li keçekê bigerin, ez revîm. Ji min re digotin; "*tirsonek, dîno.* " Balkêşe, ez sê-çar caran ji mal revîm. Ne ji keçan, ji şêwazê têkiliyên kevin revîm. Ji ber di nav têkiliyên bi vî rengî de mirin heye, di nav de jiyan nîne. Ger min jinek girtiba wê li serê min bûba bela, ez ê jî li serê wê bûma bela. Heke jin zilam hevdu îdare nekin, nebin xwedî têkiliyeke rast belengaztiyek mezine.**

**Ez her tim dibêjim; heke hûn têkiliyeke rast ava bikin, hevdu bihêz bikin, heke hûn pêş bixin ez ê ji we re li çepkan bixim. Lê hema di roja duwem de şerê hev dikin û hevdu didin revandin. Ev nabe! Wexta ku di welat de jiyan nehêlabin, yên direvin mesela yên li Ewrûpa tu yê kîjan jiyanê jiyan bikî? Hûn ê di bin kontrola dijmin de evîna xwe çawa bidin meşandin? Hûn nikarin evîna xwe bidin meşandin. Heta hûn nikarin**

**rêz jî ji hev re bidin û gotinek ji hev re bikin. Kar nîne, tişteke ku bê kirin jî nîne, wê demê ev kesayet çawa xwe ji bo evînê amade hîs dikin?**

**Kurdistan Mukrayanî: Pêşî serxwebûna welat tê.**

**Abdulah Ocalan: Gelo wê ev bikarin ji heskirin û evînê re xizmetê bikin? Nikarin bikin. Hêza wan ji vê re nîne, di destê wan de tiştek nîne. Ez naxwazim evîn wisa be. Rêzdariya me hemûyan ji evînê re heye. Rêzeke mezin ya Ehmedê Xanî ji evînê re heye, heta pîroz dibîne. Divê evîn biçûk neyê xistin. Divê evîna welat jî biçûk neyê dîtin. Lê têmaşe dikin li ser navê evînê, li ser navê têkiliyê zilam-jina Kurd di kêliyê de hevdu têxin û hevdu mefh dikin. Wiha li vir mirin, him jî mirineke xirab heye. . . Dijmin nikare bi fizikî bikuje, lê bi vê rêbazê pir rihet dikare bikuje. Bi têkiliyên jin-zilam û malbatê dikuje. Dema Mem û Zîn dikevin, a rastî li**

**hember tîpê malbata feodal jî mirina wan heye. Ehmedê Xanî ev vale nenivîsandine. Di têkiliyên malbata feodal de çawa diçin mirinê dinivîse. Lê tiştek ji destê wî nayê. Tajdîn xwest tiştina bike, lê ew jî li hember komployan nebû hêz û xeniqî çû. Vaye avaniya malbata feodal bi vî rengî ye. Hûn nikarin li vir tiştekê nîqaş bikin.**

**Di navberê de 300 sal derbas bû û me her tişt xirab kir. Divê li ser vê rastiyê pir baş bê sekinandin. Ji ber pirsgirêk, pirsgirêka we ye. Heke bi nêzîkatiyeke weke têkilî, xwarin xwarinê, av vexwarinê bê temaşekirin û li ser bingeha nêzîkatiyên cinsîltî yên çors bê nirxandin ev wê neyê qebûlkirin. Her roj di sînemayan de, televizyonan de cinseltiyê weke avê erzan didin bikaranîn. Dijmin jî her roj bi cinseltiyê dilîze. Lê yên di nava şoreşê de nikarin bi cinseltiyê bilîzin! Cinseltî rastiyeke ku neyê înkarkirine.**

**Lê bi cinseltiyê têgiha civak, siyaset û welat nayê gel hev, pirsgirêka cinseltiyê nayê çareserkirin.**

**Pirsgirêka cinseltiyê, pirsgirêkeke siyasî ye, pirsgirêkeke şere û pirsgirêka partiyê ye. Ev nêzîkatiyeke nû ye. Mêtingeriya Tirk cinseltiyê û jinê pir xirab bikar tîne. Ger ku kes pirsgirêka cinseltiyê derbas neke, wê di nava van têkiliyan de ber bi lawirbûnê ve biçe. Li Amed'ê kerxaneyek heye. Min li Kurdan temaşe dikir, şev û roj diçin wir xwe li wir têr dikirin. Li Amedê ev afirandibûn. Bi vî rengî têrbûn ne pirsgirêkeke biçûke. Dibêjin; "*ez dixwazim jinê bibînim.*" Lê dema jinê dibîne wê têxe. Ev pirsgirêk bi avakirina malbatê jî nayê çareserkirin. Em bêjin ku malbat hat avakirin, lê ne kar heye, ne hêz heye, rezîl dibin.**

**Wiha, di vir de divê Ehmedê Xanî di warê civakî û sosyolojîk de bê**

**vekirin. Pêwîste girêdana Mem û Zîn bi malbat, Mem û Zîn bi kerxane, Mem û Zîn bi têkiliyan bê vekirin.**

**Ne yekî bêçareme. Ez ne ji bo xwe, yekî ku her roj ji bo geleki çare diafirînim. Van nedîtin bênamûsiye. Divê keç û xortên Kurdan li ser vî bingehî mezin bibin. Heke bi vî şêwazî mezinbûn çênebe em ê qebûl nekin, şer bikin. Ez mirin û belengaziya mîna ya Ehmedê Xanî, Mem û Zîn qebûl nakim. Yên bi vîşêwazê me re jiyan nekin wê bimirin. Vaye qanûna Apo eve. Aliyeke me ku li ser bigirîn nîne û nagirîm jî. Min pêşiya feryad-fîxanê girt.**

**Tişta ku Ehmedê Xanî nekir min kir. Min girî ji holê rakir. Divê hûn xwe biguherînin û bi misogerî xwe biguherînin. Min her cure rê û rêbaz fêrî kadroyên me kir. Niha naxwazin ji jiyanê birevin, dibêjin "*jiyan heye.* " Bêguman wê hebe. Ji ber yê xwediyê rasteqîn ê jiyanê bi awayeke giştî li**

**ser pirsgirêkê sekinî. Tabî wê nerevin. Ji ber vê di şerê mêtingeriya dewleta Tirk de heya mermiyên xwe yên dawî bi mêrxwazî şer dikin. Vaye, ev wêrekiya mezin hatiye afirandin.**

**Armanca me ew e yên weke we jî dikarin hinek tiştan bikin danin holê ye. Ez dikarim ji we re bi hezaran nav jî bibînim, bi hezaran têkilî jî bibînim. Hûn beriya me jî, beriya hevalan jî tên. Tenê durist bin.**

**Zilamê Kurd xira bûye, hûn ê wî çawa biguherînin? Mem ketiye, Zîn ketiye, hûn çima nikarin ji wan re bêjin "*rabin*?" Heke dibêjin; "*ez Kurdê kevnim*" wê demê ez ê vî Kurdî beriya dijmin bikujim. Her çibe jî ev tîp li ber minin, çek jî di destê min de ye, heke bixwazim ez ê hemûyan bikujim. Rastî eve.**

**Ya ez dikim, ji nû ve afirandina jiyanê ye. Heke mirovê Kurd hinek bi xwe bawer bûya, hêza wî hebûya dibû bê vê jiyanê. Lê ne hêza wê û ne jî**

**baweriya wê bi wê heye. Mîna sîxûreke nezane. Ez dîsa jiyaneke nû diafirînim, ew jî bi wê dilîze. Ez jiyanê; bi rih, bawerî û wêrekiyeke mezin diafirînim. Yê ku bivê jiyanê bilîze ez ê biperciqînim. Bi navê jinbûn, bi navê zilamtî nikarin bimin bilîzin. Ma mumkûne jinek, zilamek bi min bilîze? Heke dixwazin bilîzin ez amade me. Ne dikarin di pişt de, ne jî di pêş de li min bixin. Bi hezaran keç, xort ceribandin li min bixin, lê sernexistin.**

**Ne yek bi hezaran Beko heye. Yên ji Bekoyan xirabtir hene.**

**Li dîroka PKK'ê temaşekin û lêkolîn bikin; Ehmedê Xanî Bekoyek dîtiye, lê min bi hezaran Bekoyan dît. Min ji bilî vê pir tiştên din dîtin.**

**Û yek jî pergala emperyalîst-kapitalîst, Bekoyên nû û gerdûnî afirandin.**

**Sîxûrên dewletê zêde bûn. Minafiq zede ne. Lê dîsa min xwe amade kiriye, tedbîrên xwe girtiye, ji**

**ber karê min eve. Dîsa bangî wan dikim. Heke durist bin bila bên. Heke bi jiyana Kurd ya nû bilîzîn ez ê li hemberî wan şer bikim. Ma dihesibînin ku min bixapînin? Hûn dikarin hatina xapandin û nexapandina min ji dijmin bipirsin. Yên dihesibînin min bi girî bixapînin pirin. Nikarin bi yekî xwedî jiyanê, deresayî dixebite, diafirîne û van li ser navê Kurdeyatiyê dike henekên xwe bikin. Ji xwe hêza wan jî ji vê re nîne. Heke hewl bidin van bikin, her yek ji wan Ebû cahileke, minafiqin û zindiqin. Û ez ê li hember wan şer bikim. Ez ê bikevim mejî û rihê wan, wan bidim guhertin. Şûreke Ehmedê Xanî hebû, lê bi hezaran şûrên min hene. Min bi hezaran şûr kom kiriye. Şûrê min yê herî mezin îdeolojî ye. Hêzeke ku şehîd û berxwedanê daye me heye. Ez bi mînet û rica bangî we vir nakim. Heke hûnê ji bo mirovahiyê, ji bo Kurdeyatiyê bên vir**

**werin. Ger hûn ji bo azwerî û ronahiyên mezin bên werin. Heke hûn li ser vê bingehê bên ez ê heya dawiyê xizmetê ji we re bikim.**

**Mîrhem Yîgît: Raste. Ez tiştên we gotî hemûyan di cî de dibînim. Mem û Zîn daxwazên gelê Kurd sembolîze dikin. Daxwazeke lewaz, bêhêz sembolîze dikin. Di şexsê wan de daxwazek heye, xweşikbûnek heye, hestên paqij hene, li hemberî welat evîn heye, sewdayeke mezin heye. Li hember jiyana kevin, koletiyê û serî tewandinê hêrsek heye. Mem jî yekî başe. Xêrxwaze, dixwaze hinek tiştan bike. Lê îdeolojiyeke vê daxwazê nîne. Ji xwe hêza Ehmedê Xanî jî têra vê nake.**

**Abdulah Ocalan: Diçe ji Mîr dixwaze. Tabî Mîr jî nake.**

**Mîrhem Yîgît: Mîr wî dixapîne. Ji xwe Mîr bi xwe serkêşê wî karî ye.**

**Abdulah Ocalan: Birayê Zîn çi dike? Wî têxe girtîgehê ne wisa? Li hember azadiyê ye.**

**Mîrhem Yîgît: Raste li hember azadiyê ye.**

**Abdulah Ocalan: Feodale. Mem diçe ji Mîr Zînê dixwaze. Li gorî Ehmedê Xanî Mîr dikare bide, lê Mîr nade. Yek jî Tajdîn heye. Tajdîn dixwaze hinek tiştên baş bike, lê ser naxe. Tajdîn pozîtîvîzmê temsîl dike. Yêkîtiyê temsîl dike, serkeftinê temsîl dike, gelek hewl dide, lê biser nakeve. Ya rastî mirov dikare di warê sosyolojîk de gelek tiştan derbixe. Divê Mîr çi be? Ez li ser vê jî disekinim.**

**Mîr hikumdareke zalime.**

**Mîrhem Yîgît: Makyavellî ye.**

**Abdulah Ocalan: Makyavellî ji bo Îtalya destaneke. Dibêje; "*ji bo yekîtiya Îtalya her tişt helale.* " Makyavellî rexne dike, lê ji min re wisa tê ku welatparêzeke mezine.**

**Ramanên ku temsîl dike nexirabin. Uslup û xîtabê wî pir xweş nîne, lê armanceke wî ya bingehîn heye. Dema mirov Makyavellî dixwîne mûmkûne ku mirov gelek encaman derxîne. Tişta ji hevalan dixwazim; bibin Mîreke durist. Mîrê ku Ehmedê Xanî xwestî û çênebûyî.**

**Milîtan çiye, taybetmendiyên milîtanan çiye, milîtan wê çawa bên afirandin û gelek tiştên milîtan wê çawa bibin pêşeng dibêjim.**

**Milîtan otorite ye.**

**Otorîte û yêkîtiya gele. Ez van dikim. Dixwazim milîtan ji serî heya binî têr bibin. Ev şereke mezine.**

**Şerê minê herî mezin yê di nava PKK'ê de, milîtan yanî afirandina Mîr e.**

**Em milîtanan bikin Egît û Mîr.**

**Em Egîdê Kurd biafirînin.**

**Ev dewlemendiyên gelane. Heman tişt di Ereban de jî heye. Ereb jî ji van re dibêjin mîr. Ji bo mîrên**

**xwe her tim pesnan didin. Li ser mîran helbest, sitran, felsefe û bi hezaran tiştên din derdixin holê. Nizam-ul Mulk di "*Siyasetnamê*"de çawa prensan çêkirine bi awayeke balkêş vedibêje. Min ev berhem xwend û min heya bêjî ecêp dît. Ji sultanên Îranê mînakan dide û ev gelek balkêşin. Hêjî ne gihiştine sînorên ku Nizam-ul Mulk destnîşan kiriye. Zanyariya vê berhemê li ser edalet, uslup û her tiştî heye. Ji şer bigirin heya parastinê, heya îstixbaratê wê çawa bê îdarekirin û tiştên mîna wê edalet çawa bê bidestxistin sazûman dike. Pergala me danî û pergala ku Nizam-ul Mulk afirandî gelek nêzî heve. Tiştên ku me niha afirandine gelek li pêşiya pergala kevne. Pergala me nînbû, me pergal afirand. Heke pergal nebe em nikarin Mîr biafirînin. Mîr bê pergal nabe.**

**Mîrhem Yîgît: Prenstî, Makyavellî jî li ser bingehên pir girîng rûniştiye.**

**Li ser yêkîtî çawa ava bibe disekine. Rêber Apo jî di Kurdistanê de yêkîtî çawa ava bibe, wê kî pêşengî ji yêkîtiya bê avakirin re bike û li ser taybetmendiyên ku yê pêşengiyê ji wê yêkîtiyê re bike divê çawa be, pir baş û hûrbijêr sekiniye. Di encamê de jî pergal heye. Pergal, dîsîplîn û rêbaz; ji bo avabûna yêkîtiyê pêwîste û ev hatine afirandin. Madem armanc û hedef pîrozin, hedef û armanc yêkîtiya welate, bihêzkirina welate, şeref, namûs û onura welate; wê demê di vê oxirê de bikaranîna hemû metodan helale.**

**Ethem Xemgîn: Li Emarîkayê eleqedarî ji çanda Kurd re heye. Ya rastî serxwebûna çanda Kurd dixwazin.**

**Abdulah Ocalan: Di warê dîrokî de divê li ser Mem û Zîn bê sekinandin.**

**Ethem Xamgin: Di konferansa Emarîkayê de peyamên ku min anîne ziman pir nû û girîngin.**

**Abdulah Ocalan: Yanî di rizgariya têkoşîna me ya netewî de asoyeke nû ye û pêşgotineke.**

**Ethem Xemgîn: Cewherê felsefeyeke nû ye.**

**Abdulah Ocalan: Tê dîtin, nû ye. Lê aliyê wê yê netewî û demokratîk jî heye. Girînge, em bi demokrasiyê re dimeşin.**

**Ethem Xemgîn: Di wê demê de meseleya ûmmetparêzî heye, Îslamiyet heye. Di felsefeya Emerîkayê de jî xwendin heye û felsefeyeke nû ye. Di Xanî de jî Îslamiyet hebû, lê li wir dixwaze Îslamiyet û Kurdeyatî bike yek.**

**Abdulah Ocalan: Dixwaze Îslamiyet û Kurdeyatî bike yek. Dixwaze Îslamiyetê bixe bin xizmeta gelê Kurd. Dixwaze Îslamiyetê ne li beramberî Kurd, di nava gelê Kurd de**

**nirxeke wê çêbibe. Lê di vir de ne aliyê wî yê îslamî, herî zêde çawaniya netewa demokratîk li pêşe. Îslamiyet heye, lê bingeh, felsefe û îdeolojiya wê netewî ye, demokratîke, ne olî ye.**

**Cabar Qadir: Rojhilatnaseke Ermenî, dibêje li Rojhilat sê helbestvanên gerdunî hene; Rûstabîlî-Gûrcû, Firdewsî-Fars, Ehmedê Xanî-Kurde. Ev hersê dibin helbestvanên ku Rojhilat dane mirovahiyê.**

**Abdulah Ocalan: Helbestvanê mirovahiyê.**

**Cabar Qadir: Em xwedî helbestvanên wisa mezinin, lê heya niha cara yek PKK'ê û Rêber Apo rihê Ehmedê Xanî vejandine. Di weşanên Kurd yên derdikevin de qala Ehmedê Xanî tê kirin, lê bi ti awayî qala rihê wî nehatiye kirin. Mirovên rewşenbîr ji me zêdetir Ehmedê Xanî fêmkirine. Di pirtûkekî de taybetmendiyên Ehmedê Xanî wisa hatiye bilêvkirin; "*Ehmedê Xanî helbestvaneke başe,***

***hizirmendek başe û xwedî meyzandineke felsefike. Xwedî welatparêziyeke kûr û girêdayî rihê rastiya netewbûnê ye*. "**

**Bi qasî ez dizanim heya niha rewşenbîrên Kurd li ser Ehmedê Xanî gelek pirtûk nivîsandine. Ehmedê Xanî gelek tişt kirine. Û ya herî girîng jî Ehmedê Xanî Kurdî nivîsandiye û wisa dibêje; "*min bi zimanekê nivîsandiye, tevî ku ew ziman jî di nava zimanên din de ye jî nirxeke wê nîne. Min bi Erebî, Farisî û zimanên din nenivîsand, bi kurdî nivîsand, ji ber kurdî feqîrtiya gelê Kurd îfade dike.* " Ew tenê ronesansa rewşenbîrên Kurde. Ehmedê Xanî dibêje; "*ji bo ez li hember mêtingeriyê bûm, min bi zimanê tali nivîsand, bi zimanê latînî nenivîsand*. " Û dîroka mêtingeriyê jî dinivîse. Dîsa Ehmedê Xanî dibêje; "*ez bi zimanekê dinivîsim, ji bo mîna genim zigê gelê Kurd dagire. Min bi latînî nenivîsand,***

***ji ber mîna nanê genim mirovan têr dike.*** **" Ehmedê Xanî ti carî xwe biçûk nedîtiye. Ev taybetmendiyeke wî ya girînge. Di heman demê de mirovê Kurd, kesayeta Kurd biçûk nedîtiye. Di wê demê de teşegirtineke nû yê mirovê Kurd hebû, lê rola Ehmedê Xanî nînbû. Weke ku bilêv kiriye Mem û Zîn sembolekin, derketineke li hember civaka Kurd a feodale.**

**Divê hinek jî mirov li ser Makyavellî bisekine. Di sedsala 16. de li ser Îtalya nivîsandiye. Dibêjin di wê demê de her bajarek dewleteke. Ji bo di destê wî de ti hêzeke siyasî, leşkerî namîne, diçe li gundeke biçûk bicî dibe dinivîse. Hinek kes tecrûbeyên wî yên siyasî û fikrên wî şaş girtine dest. Makyavellî mîna keseke ku her dixwaze "*raze, rabe, rehet jiyan bike*" dinirxînin. Mûssolînî di 1922'ê de li ser Makyavelli teza xwe ya doktora xilas kiriye û gelek nivîsên ku wî didin nasîn nivîsandiye.**

**Abdulah Ocalan: Nivîs ser çi nivîsandiye?**

**Cabar Qadir: Dema ku Mûssolini teza xwe amade dike Makyavelli weke yekî xirap dide nasîn.**

**Ahmet Tîgrîs: Ez ji saya axiftinên Rêbertiya partî gelek tişt fêr bûm, fêm kir û asoyên min vebûn. Li gorî pedagojiyê ji afirandina mirov zehmetir tişteke din nîne. Ev hezar sale netewbûna Kurd ketiye û ji xwe biyanîbûye, hemû tiştên mêtingeriyê, yên ku di mejiyê wan de bicî bûyî sererastkirin, vesazkirin karê cîhanê yê herî zehmete. Hunera herî mezin; afirandina vî mirovê Kurdê herî ketiye. Rêxistinek mîna PKK'ê mirovê Kurd ku ketî vê rewşê ji nû ve diafirîne. Berê di navbera Kurdan de yêkîtî, bihevrebûn û baweriya bi xwe nînbû. Bi derketina PKK'ê re ev raman di nava Kurdan de belav bû. Serokatiya PKK'ê ji çepgir, yanî Marksîzmê bandor bûye. Ev di**

**teşegirtina wê de tenê bi serê xwe ne xalek sereke ye. Em ji Kurdeyatiya Ehmedê Xanî bigirin, heta têkoşîna Ho Chi Minhin, ji îdeolojiya Marks, Engels û Lenîn bigirin heta felsefeya Zerduşt, mirov dikare van hemûyan di şexsê Rêbertiyê de bibîne. Bi qasî min fêm kiriye heya niha hêjmara herî zêde hatine ziyareta we, ya ji çepê Tirkin, yan jî Tirkên ji fikrên dine. Pirsên ji we pirsîne jî hemû pirsên wan eleqedar dikine. Li ser Kurd û Kurdeyatiyê zêde nesekinîne. Van mijaran neanîne ziman. Lê ez îro gihiştim vê armanca xwe. Ji bo mirov vê felsefê û destgirtinê fêm bike bi qasî zimanê Tirkî divê zimanê Kurdî jî bê bikaranîn. Heya niha gelek ramanên Rêbertiya Partiyê bi zimanê Tirkî hatine nivîsandin, lê bi Kurdî pir kêm hatine nivîsandin. Rojnameyek, kovareke me hebû lê wê jî heya niha rola xwe nelîstiye. Bi qasî fikir û yêkîtiya têkoşîna hemû Kurdên ji**

**derveyî welat û Kurdên li her çar parçeyên Kurdistanê, ji bo pêşveçûna fikir û ramanên partiyê divê di zimanê Kurdî de jî yêkîtî bê avakirin û bi giranî li ser wê bê sekinandin. Bi vî rengî hemû Kurdên ku destê wan pênûsê digire, wê Rêbertiya Partiyê hîn ji nêzîk ve binasin, gerîla binivîsin û wê ev fikrê nûjen di nava hemû Kurdan de belav bibe.**

**Abdulah Ocalan: Beriya azadiya ziman tiştên bên kirin hene: min ji bo huner gotibû "*heya şoreş pêşnekeve, wê pêşiya hunerê venebe*." Ji bo azadiya ziman jî heman tişt dibêjim. Lê ji niha şûnde wê pirsgirêka ziman hîn zêdetir bê rojevê. Heta hûn pirsgirêkên jiyanî çareser nekin, hûn nikarin ji pirsgirêka ziman re çareserî bênin. Şoreş zextê radike, bi vê ve girêdayî ziman jî hêdî hêdî pêşdikeve. Ya niha tê kirin gaveke, wê ya hîn mezintir jî bê avêtin û heya bêjî wê pêş bikeve. Lê ziman xwe bi xwe**

**pêşnakeve. Zimanê bê şoreş û huner pêş nakeve. Heke bingehahuner neyê avakirin, pêşiya wê neyê vekirin, jiyan xilas bûbe, Kurdeyatî ketibe ma ziman bi serê xwe dikare çi bike?**

**Hûn li ser zimanê "*akademîk*" disekinin. Hûn min bikujin jî ez wisa li ser nasekinim. Kurdeyatiya ez fêr bibim divê di nava jiyanê de be. Heke Kurdeyatiyeke ku jiyan bikim nebe, wê wateyeke ya ziman jî nemîne. Lê heke Kurdeyatî bê afirandin (ji xwe tê afirandin) wê ziman jî zindî bibe. Bê ziman nabe, lê divê neyê gotin ku "*zimanê ez pê baxivim bila beriya şoreş û beriya jiyanê bê.*" Şoreş rê li pêş ziman vedike. Îro pêşiya ziman xetimiye. Zincîr li ziman dane. Divê ev zincîr bê şikandin. Heke hûn neşkênin, hûn ê ziman çawa xilas bikin? Dîsa kilît li civaka Kurd jî xistine. Zîn zer dibe, dihele û dernakeve. Divê em vî dilî vekin. Wê demê wê ziman jî bê vekirin, wê**

**axiftin çêbibe û Kurdeyatî ancex bi vî rengî dikare bigihe serkeftinê.**

**Rexneyeke mamosteyê hêja Îsmail Beşikçi heye dibêje; “*li ser Kurdeyatiyê nasekine.* ” Başe di Kurdeyatiya ku mamoste Îsmaîl dibînê de hinek tişt hene, lê ji bo min divê destpêkê zincîr bên şikandin. Bila zimanê we vebe, dilê we vebe ku hûn bikaribin tiştina bêjin. Ya ez dikim eve û divê ev bi awayeke din neyê fêmkirin. Nebêjin “*zimanê me heye*” ya dibînim kilît li zimanê we hatiye xistin. Ez we kor, bê ziman û ker dibînim.**

**Yêkî weke min bi şoreş û hemû karên zehmet re eleqedar dibe nemûmkûne pirsgirêka ziman nebîne û li bîr neyê. Lê hinek pirsgirêk hene ku, heke tu hesp nexî pêşiya maşînê naçe. Hûn jî tevlîhev dikin. Wisa nabe! Heke bi ziman pirsgirêk çareser bûba, minê di serî de xwe kiriba zimanzanek mezin.**

**Di xaka Kurdistanê ya ku em li ser şer didin meşandin, ji niha şûnde wê zimanê Kurdî pêşketineke girîng bide nîşan.**

**Girêdana ziman û şoreş ya bi hev re çawa ye? Şoreş, şûr û serweriya dijmin ji holê rakirine. Beriya niha hinekan digot; "*em bi ziman û çandê*" Kurdeyatiyê ava bikin. Ev nemûmkûne, bi ziman û çand Kurdeyatî ava nabe. Beriya her tiştî serdestiyek dijmin heye, him jî serdestiyek pir xirabe. Ev pirsgirêk bi ziman yan jî çand nayê çareserkirin! Divê em rêbaza şaş nedin sepandin. Yanî divê cihê hesp û maşînê neyê guhertin. Divê her yek li cihê xwe be.**

**Mîrhem Yîgît: Ez jî di navbera Ehmedê Xanî û Rêbertî de nêzîkbûneke mezin dibînim. Lê cudahiya herî mezin ya di navbera wan de, Ehmedê Xanî ji asta gel anîna vê astê û ser dijmin de çûyînê dûre. Lê we van ser xist, yekîtiya ku**

**Ehmedê Xanî daxwaz kirî we afirand. Bi qasî ku min dîtî gerîlayên PKK'ê ji hemû aliyên Kurdistanê pêk tên. Ji her çar hêlên Kurdistanê ve hatine, wiha ev rastî yêkbûneke. Hêlaye ku cîhana me şoreşa Kurdistanê cidî bigire. Bi rastî jî Ehmedê Xanî girîngiya yêkîtiyeke wisa dîtiye û nivîsandiye. Daxwaza min ya ji niha şûnde jî, şerê Kurd bi Ehmedê Xanî re kirina yeke. Ehmedê Xanî di helbesteke xwe de dibêje Kurd, di navbera şerên di navbera Tirk, Ereb û Farsan de derdikeve weke sîlehekê tê bikaranîn. Îro jî, ev helbesta beriya 300 sal berê hatiye nivîsîn, ji bo Başûrê Kurdistanê derbasdare.**

**Abdulah Ocalan: Belê, helbestek gerdûnî ye. Ji bo îro jî derbasdare. Tam jî di vê xalê de dixwazim li ser ziman bisekinim. Ji bo Kurdan sê hezar sal, sêsed sal çi îfade dike, PKK jî ewqas guhertin îfade dike. Helbesta Ehmedê Xanî îsbateke vê**

**ye. Ev pirsgirêk pirsgirêka me ye. Ehmedê Xanî ji bo vê pirsgirêka me çi gotibe, niha jî heman tiştî em dibêjin. Em bûn çare! Cudahiya me eve. Lê ew bêçare man, nebûn çare. Ez nabêjim wisa nirx bidin min, wisa pesnên min bidin. Pêwîstiya min bi vê nîne. Lê min hinek tişt kirin ku, yên beriya niha sê hezar sal, sêsed sal berê jiyan kirine bi ti awayî nedikarîn bikin.**

**Yêkitî; min vê pir baş pêk anî.**

**Gerîlla; min ji mêrxasiya Kurd gerîlayê mezin afirand.**

**Me di Kurdistanê de mêrxasî afirand.**

**Mêrxasî, çareserî ye, berxwedane, serxwebûne, parastin û dile. Mêrxasî li hember dijmin bûyîne. Mêrxasî heye, wiha hûn vê çima nabînin? Min îsbata vê jî kir, li beramberî we disekine. Min bûyîna mêrxasî îsbat kir. Wiha ew prens jî ev îsbat dikir. Nizam-ul Mulk jî, gelek**

**kesên di dîrokê de û Ehmedê Xanî jî ev dixwest. Min jî xwest û kir.**

**Pirsgirêka ku berê heyî, îro jî ji bo me pirsgirêke. Lê îro em dikarin ji pirsgirêkên xwe re bibin çare. Çare di destê me de ye. Nirx bidin vê. Lê hûn revîne Avrupa, Ewrûpa nirx nade. Hûn bi hemû tiştên xwe ve revîne, lê ew bi we dilîzin. Ez dikarim vê ji bo Başûr jî bêjim. Tişta em ji Kurdên Başûr dixwazin, bila bibin hêz û fersendên me afirandine bikar bînin.**

**Êdî em bi rihê Kurd yê bilind dibe ve nelîzin! Ji bo Kurdan ev pîroze.**

**Îsmet Şerîf Vanli: Min pir baş we fêm kir. Heval jî baş axivî. Ehmedê Xanî yekî ku rewşa Kurdistan û perçiqandina wê baş didît bû. Dibêje gel ji hêla Mîr ve ber bi zilmê ve hatiye berdan. Şerefa gelê Kurd û hemû gelan di bin destê Mîr de bû. Û weke min ji destê helbestvanên Kurd yên belengaz tiştek nedihat. Heke Kurd bûban yek û mejiyê Mîr tine**

**kiriban, wê demê dê azad bûban û di heman demê de wê ji destê Tirk, Ereb û Eceman jî xilas bûban. Bêguman ev ne xeyaleke, ji ber îro PKK jî li hember Ereb, Ecem û Tirkan vî şerî dide meşandin. Û di heman demê de baweriya me heye ku, wê di vê xetê de têkoşîn bê meşandin.**

**Abdulah Ocalan: Çîroka Ehmedê Xanî bi şerê PKK dide meşandin re dibe yek. Hevdu temam dikin. Daxwaza Ehmedê Xanî dikeve meriyetê.**

**Heke niha Ehmedê Xanî jiyan kiriba, bi misogerî wê gotiba tiştên em dikin xweşikin. Wê gotiba "daxwazên min bicî tên. "**

**Wê gotiba destana Mem û Zîn bi PKK'ê re diçe. Weke ku ez her carê dibêjim; min dikarî bibûma gundiyek xwedî bostek erd jî, karmendek xwedî mûçeyek kêm jî û dibe ku bûbam karmendek mezin jî, lê min van ne ji bo xwe û ne jî ji bo gelê xwe hêja**

**nedît. Ez yekî bêçare, bêkes, belengaz û ji Ehmedê Xanî û Mem hezar qetî lewaztirbûm, lê dîsa jî min dest bi vî karî kir. Lê min biser xist. Bûm dilê Kurd. Tişta me kirî di dîroka Kurdistanê de berxwedaneke girîng bû. Min ev ji bo hemû mirovahiyê xwest. Û hîn jî dixwazim. Lê ji bo vê mêrxasî û xweşikbûn dixwaze. Ez nikarim kirêtiyê qebûl bikim. Ez ê hezar carî vê jiyanêbinpê bikim, lê dîsa jî kirêtiyê qebûl nakim. Ev tiştên girîng û xweşikin. Tiştên Ehmedê Xanî jî dixwest evin. Fikrê wî ye, îdeolojiya wî ye û hunera wî ye.**

**Weke hemû hevalan divê em ji niha şûnde xebata xwe baş binasin. Divê em girêdana xebata xwe ya bi dîrok, wêje û hunerê re baş dênin.**

**Hinek dibêjin "*PKK ji derveyî şerkirinê tişteke din nake*" ya rastî ez qet bi şer re eleqedar nabim.**

**Yên şer dikin hûnin. Ez herî zêde hewl didim mirovê nû biafirînim. Ez li**

**ser tiştên ne di cîh de disekinim. Hinek naxwazin me bibînin. Yên me jî naxwazin min bibînin. Vaye ez li vir im. Çîrok û dîroka min eve. Hûn çima yekî ku bi afirandina mirovan re eleqedar dibe, yekî bi mêrxaziya xwe û dileke mezin ji bo mirovahiyê têkoşîn dide ji nedîtî ve tên? Lewra her roj jî dibêjin "*serok*. " Niha em ne evîndarin jî, em Rêberekin. Heke hinek be jî rêzdariya we ji Rêbertî re hebe, pêwîst dike ku hûn li jiyana dimeşîne temaşe bikin. Vê hinekê bifikirin, bila di dilê we de jî tiştên mezin hebin.**

**Ma hûn nabînin min çawa evqas tiştên mezin afirandiye? Kêlî bi kêlî Kurdistan helandine, Kurd ji holê rakirine. Ma hûn nabînin kêliya bi qasî serê derziyê fersend dibînim çawa serde diçim? Ma hûn nabînin ji bo quruşek pere û mermiyekê bêxim xizmetê çiqas dixebitim? Ji bo têkiliyekê ava bikim, ji bo dostekê**

**çiqas hewl didim nabînin? Him dibêjin Rêbertî, him jî nizanin çawa dixebite. Ev dûrûtî ye, xapandine, derewkerî ye.**

**Tiştên ji we dixwazim dîrokîne û gerdûnî ne. Ji bo me ev pêwîstin. Bê van jiyan nabe. Dijmin wêraye we û we xistiye bin xizmeta xwe. Êdî ji vê re dibêjim bese. Heke jiyaneke me azad çêbe, em ê dîsa ji hemû gelên cîhanê û gelên Rojhilata Navîn re xizmet bikin, heke pergalên baş hebin em ê ji wan re jî xizmetê bikin. Lê heke jiyaneke azad ji me re nebe em ê çi ji vê dinyayê vê felsefê û siyasetê bikin? Bila durûtî neyê kirin. Ji bo xwe cihekê çêkin. Heke wêrekiya we hebe ji bo xwe, ji bo fedekarî û şerefa xwe vê bikin. Ji bo di nava gelên din de ciheke we ya rêzdar hebe, bibin xwedî navekêû divê dengê we derbikeve.**

**Ji bo gelekî rakin ser piyan, pêwîste li ser van rastiyan tevbigerin.**

**Dema hinek din li ser navê Kurdeyatiyê têkoşîn dikin ez wan înkar nakim. Lê ez xwe jî naxapînim. Heke tiştek nebe ji wê re nabêjim "*heye*." Ji kirêtiyê re nabêjim "*xweşike*", ji ketîbûn û mirinê re jî nabêjim "*jiyane*. Ji vê re mafê min nîne. Di destpêkê de dema tiştek di holê de nebû jî ez wisa bûm, niha dema gelekî radikim ser lingan jî wisa me.**

**Hûn jî dikarin li ser vê bingehê bimeşin.**

**Bila dilê we bi me re be. Heke hûn dest, ling û mejiyê xwe bişixûlînin her yek ji we dikare bibe rêberek mezin. Ji niha şûnde, mezinbûna we mûmkûne. Ji bo vê me bingehek ava kir. Vê bingehê înkar nekin, nirx bidinê. Piştre bila her tişt bibe ya we. Bi ti awayî ez tiştekê ji bo xwe naxwazim, ez tenezilê vê jî nakim. Rewşeke min ku tişteke zêde ji kesekê bixwazim nîne. Baweriya**

**min bi min heye û dikarim xwe bidim meşandin. Lê hûn bêçarene. Ji ber hûn ji gelek tiştan re tenezil dikin. Kêmaniyên hinekedin û fikrê dijmin di serê we de hatiye rûniştin. Heke tiştên ez dibêjim hûn bikin, ez ê hezar carî sipasî li we bikim. Bi misogerî Hûn ê serfirazî û serxwebûnê bidest bixin.**

**27 Tebax 1994**

***"Jiyan bixwe, ji hemû tiştên jiyan dikin kevintire. "***

**Xalit Cîbran**

# DÎROK Dİ ROJA ME DE VEŞARTİYE Û EM Dİ DESTPÊKA DÎROKÊ DE VEŞARTİNE

**Berê dema destpê dikirin digotin "*Bismillah*. "**

**Gotineke binirxe.**

**Her tim bi têgehên pîroz û biwêjên pîroz re dest bikar kirin başe. Em ne helbestvanin, ne katibên mezinin jî, lê hewdana me heye.**

**Ji bo em ya hîn baştir bibînin, asta jiyana herî ketî ku hêjayî me dîtine derbas bikin, tişta herî guncav a ji bo şeref û heysiyeta mirov bidest bixin, xwe bigihînin hêz û şêwaza wê hewldanin me ya mezin heye.**

**Zehmetî dikişînim, ji ber di jiyanê de xetayên mezin hene.**

**Pirsgirêkeke min ku "*ne-ecibênim*" nîne, lê asta mirovên me yên paşketî daqurtandin û qebûlkirin jî nemûmkûne. Pêwîste li bendê nemînin ku ji meşa mirovan ya mexsûs sernaxin, ya mexsûs xweşik nabin re silav bidim. Divê li bendê nemînin ji kirêtî, lewazî û bêcaretiyê re bi feraset nêz bibim. Ev, ji derveyî cewherê mirove û em dixwazin vê derbas bikin.**

**Silava min ya ji jiyanê re kêlî bi kêlî wisa ye.**

**Kesayeta Kurd bi xetayên mezin ve li beramberî jiyanê disekine. Bi kêmaniyên mezin re diçe wê kom dike. Herhal sedema serkeftina mezin jî; nêzîkatiya li hember vê jiyanê tê raberkirin.**

**Em tenê siyasetê nakin, hewl didin pirsgirêka jiyanê ya herî bingehîn çareser bikin.**

**Mirovên me çima bi xwe re mijûl nabin, guhertin, veguhertin di xwe de**

**çênakin û nayên rewşa mirovên xwe ava dikin. Bêguman, ev hinek jî bi serkeftin, dost, rastiya dijmin şirovekirin û bi qasî hêza kevirekê bavêje bide diyarkirin ve girêdayî ye. Ev jî bi qasî tê zanîn hêsan çênabe. Bi hemû hêza xwe ve hêjî hewl didim şêwazek xwe digihîne ya hêjayî jiyana xweser (dema dibêjim xweser, di wateya hinek ji dijmin qut) bidim rûniştandin. Pirsên mîna hêza min çiqas têr dike, çiqas dikarim bi serkeftî bikim ji xwe kirin girînge. Lê serê xwe natewînin.**

**Di min de îtîraz pir zede ye, lêpirsîn û îradeya karkirinê jî pir bihêze.**

**Kesayetên mezin her tim mezin û pîroz dest bi gotinê dikin.**

**Fermandar, siyasetvanên mezin û katpb her tim hewl didin jidil û bandorker bin. Şêwaza didin sepandin jî şêlo, ji bo çi, ji kî re xizmet dike, ji kî dere re, dixwaze çawa nêz bibe,**

**kîderê, çawa kiriye dost, ji kîderê re bûye dijmin nediyare. Her tişt ketiye nava hev. Dil û mejiyê jiyanê yê herî hesas bi dijûnan dagirtiye. Heta Kemalîzma em naecibênin jî deng derdixe dibêje ku; "*heke dijmin hatibe li ber dilê welat, xençera xwe lê dabe, wê hinek werin qedera wê xilas bikin.*"**

**Niha em van mijaran çiqas digirin dest? Demogojî û zimandirêjiya gundîtî pir bi bandore. Ya herî xeternak ku pirsa rast ji xwe nake, yek jî ji bersivê re nêzîkatiya rast çênabe. Heta dawî karên weke sextekarî, rebentî, tevlîhevkirina kar û mirina erzan didome. Vaye, em jî dixwazin pêşî li vê bigirin.**

**Ji kêliya min xwe nas kirî heya niha, wiha helbestvanek dibêje; "*Ey rêwî deka raweste*" em jî hinekê hewl didin wisa bidin sekinandin.**

**Ey şans deka raweste, çawa û çima, diçî kîderê?**

Em her tim wisa dipirsin û diçin. Bele yên zehmetî dijîn hene, ji ber zêde merîfeta wan nîne. Em çiqas mirov esas bigirin, bawerî pê bênin jî, ev kesayet leşkerê kîne, ji kê re leşkerî kirine û kîjan îdeolojî, polîtîk, çand-exlaq xwe di mejiyê wan de bicî kiriye, tine kirine û ji nava xirabiyê derdikevin? Min hewl da vê bidim nîşan. Heke her kes ji bo hawirdora xwe bibe dibistanek, bawerî pê bêne ma wê çi dernekeve holê! Lê kî nêzîvê dibe!

Ferdperestî xwe çiqas di kesayeta wan de bicî kiriye. Yek jî tişteke ku ferdperestî dayî qezenckirin nîne. Tenê rewşeke xefletê heye, em hewl didin wê bişkînin.

Ji bo jiyanê çeperên girîng hatin afirandin. Lê yekî bikeve hundir mezin şer bike nîne. Me di raman, rih, leşkertî, siyasî, çand û hemû qad, anî rewşa çepera şerkirinê. Lê yekî ber bi

**van çeperan ve biçe nîne. Bêguman welatek heye, azadiyek û pirsgirêkeke jiyanê heye.**

**Ji rastiya dibêjin dîroke divê çi encam bê derxistin?**

**Dema me hewl da girêdana jiyan-dîrok bidin nîşan ev derket holê: Bi sedanî sale yê mirine emin, niha jî tê fêmkirin ku heman mirin di meriyetê de ye. Hat ziman ku zêde ji jiyanê re hêz neanîne. Tê fêmkirin me hinekê ji xewa xefletê şiyar kiriye. Tiştên dikim hinekê hêza dilê xwe xistina tevgerêye. Ji ber di nava jirêderketineke mezin de mane. Xafil jiyan dikin. Ji bo mirovekî bi vî rengî jiyîn hekareteke mezine. Difikirim ku gelo wê di mirovên me de hinek dil çêbe yan jî hinek vexuyanên mirovê azad pêşbikevin? A rastî, nîqaşkirina tiştên ez dixwazim bikim jî girînge.**

**Çiye ya dikim?**

**Qîr û bang dikim; evqas lêhûrbûn dikim, bi her karî ve radibim, ser peyvande diçim.**

**Dixwazim çi bikim?**

**Divê em fêm bikin.**

**Tiştên di dil û ramanên we de dibin pêwîstiyên xetê ne. Ne weke nêzîkbûna "*divê girêdana bi Rêbertî re wisa be*", çi fêm dibe divê wisa bê nirxandin. Rêza min ji cewherê mirovên azad re heye. Çi tê fêmkirin divê bê gotin; heke hêrs û dijûn hebin divê mirov ji qêrîna wê xwe nede paş. Evez jî bim, bes bila rastî xwe bidê der.**

**Ji ber bi dijwar pêwîstî bi rastî û zimanê rastiyê heye.**

**Yanî em mirîbin jî divê ev bê fêmkirin. Hemû vexuyan didin nîşan em ê jiyan nekin. Ma ji ber ku "*fêm bûye*" wê nexweş bimire, em ê jî mohra xwe lê bidin? Heke îhtîmala jiyanê heye bila ji vê re jî rê be, ev**

**heye. Em hewl bidin vê jî bidin fêmkirin.**

**Em mirîne, yan jî jiyan dikin, zêde nehatiye fêmkirin. Ne zelale ku eleqedarî kujeriye, yan jî jîndare, ji hev nehatiye cudakirin. Ji bo neteweke ev bê siûdiyek mezine. Wiha divê ev misogerî bê cudakirin, bi awayeke din em ê rêzdariyeke ji rêzê jî nebînin.**

**Bangî rêzdariyê dikim; li hember xwe, rastiya xwe û rastiyên jiyanê rêzdar bin!**

**Dest tavêjim gelek mijaran; hûn dikarin bejin "*ev Ehmedê Xanî ji kîderê derket.* " Dema her kesî tiştek got me jî got ka em jî bêjin, rewşên pir cuda derketin holê.**

**Di mirovekî de mirovahî tehlîlkirin, hemû mirovahî di mirovekî de girtina dest mûmkûne.**

**Ez ji bo vê dibêjim: Heke bi israr li cihekê biçûktî, cûcetî serwer be; dijûn yan jî xeflet tê jiyankirin û bi**

**mexsûs windakirin weke rêbazekê pêşketibe; divê baş li ser wê bê sekinandin. Heta mirovên destpêkê jî wê vî şêwazê me yê eleqedariyê fêm neke yan jî qebûl nekin. Dijmin her tim mezine, lii erdê dirêj dike, li çep û rastê xwe dide, di çav û devê wî de xwîn dirijîne û wisa tavê quncigekî. Lê gelo ev kes di radeya mirinê de ye? Em dixwazin fêm bikin. Ma hêza wî nemaye? Dema dimire nêzîkbûna "*em bi derewkî jiyan dikin*" raberkirin xirabiya herî mezine ku mirov li xwe bike. Qet nebe divê ev bêrêzî bê derbaskirin.**

**Abbas. : Serokê min tenê pirsgirêkên aliyê siyasî, leşkerî esas girtin, nîqaşkirin û di wê çarçoveyê de pêşketin esas girtin têrê nake. Zanebûna dîrokî, birêxistinkirina jiyana nû, girêdana wê ya bi dîrokê re him siyasî, him jî ji bo pêşketinên leşkerî wê feydeya xwe hebe. Ev diyardeyên ku li Kurdistanê nehatine**

**derxistinin. Şiroveyeke dîrokî nîne, dîsa şiroveya siyasî, dîrokî û jiyana leşkerî ya bi jiyana sosyal re bike yek nîne yan jî pir kême. Yên heyî jî zêde hêvî nadin. Divê wateyê de ziwabûn û bêsûdiyek heye. Nirxandinên di vê derbarê de, him ji hêla fêmkirina rewşa dîrokî, him jî ji bo amadekirina têkoşîna leşkerî, siyasî û rêxistinî feydê dide.**

**Abdulah Ocalan: Rastiyên herî bingehîn ên nû û hatine derxistin çine?**

**Abbas: Jiyan, girêdanên jiyanê, civakên mirovan û şêweya jiyana rast hat ronîkirin, raveya vê ya dîrokî, hinek aliyên wê û diyardeyên dîrokî derketin holê.**

**Abdulah Ocalan: Me diyardeyeke pir balkêş girt dest. Rewşenbîrên me nirxandinên cuda kirin. Divê mirov ji şêwaza helbestvanî derbikeve û di derbarê rastiyê de be. Dikare bê gotin ku me hewl daye van zindî bikin. Bi**

**çalakiyên xwe yên bi vî rengî re me van şênber kir.**

**Beriya niha sêsed sal evîn û heskirineke nehatî biserxistin hebû. Ev mir! Em ji nû ve vê sax dikin, ji gorê derdixînin. Helbestvanê me yê mezin Ehmedê Xanî berhemên tijî hest derdixe, ew berhem îfadeya hestan dike, lê encam dibe mirin. A rastî ev mirineke di asta netew û civakî de ye. Heskirin nîne, her çiqas lewaz jî be evîna ku şiyar dibe jî esîrê mirineke pir xirabe. Ya ku tê xwestin bê şiyarkirin mezinahî, bidilxwaziyacivakî û netewiye. Lê di wê demê de bi ser naxin, me xwest di pratîka xwe de zindî bikin. Tenê ne pratîk, me hemû hêza axiftinê ya serdemê bikar anî bêyî ku zanistiyê jî ji dest berdin serde çûn.**

**Kî dimire?**

**Çawa dimirin?**

**Ev, pir dijwar tê fêmkirin. Heta feraseta rihê wê demê jî zêde pêşneketiye.**

**Rihê Kurd yê çi û kiye?**

**Hewl didim vî rihî fêm bikim. A rastî rihek û riheke Kurd heye? Ji pirsên weke ji taybetmendiyên bingehîn yên rihê Kurd tiştek maye digerim.**

**Ya ez dibînim, bi temamî rastiyeke ku neyê jiyankirin û her tim reva ji wê ye.**

**Ehmedê Xanî bi helbestvanî ser pirsgirêkê de çû, lê ez mîna hesasiyeta operetorake mezin ku meqesê bavêje birînê emeliyat dikim. Gelo ez ê bibim operatoreke ku qeza nake yan jî şaşiya heyî nexim nav rewşek kembaxtir? Ez hewl didim ji hinek pirsgirêkan û mercên jiyana giran re ronahî û yekbûnekê bidim afirandin.**

**Me xwest bi awayeke bibandor ji wêje, huner, beşên wêjeya hunerê re**

**derbasbûnekê bikin. Dibe bi îsabet be. Dibe ev, di Kurdistanê de di girtina şêwaza wêjeyê de bandorker be. Tenê ne di wêjeyê de, biqasî wêjeyê girêdana bi jiyana şoreşgerî, xwe gihandina hişê dîrokek baş û hişek civakî heya bêjî pêşketin bidest bixe. Heke xefleteke mezin nebe, dibe ku di mejiyan de fikir pêş bikevin û dil hinek bihelin. Divê ewqas birik, qerisokî nemîne.**

**Hêsan nîne, mileteke sêsed sal mirî û ji destaneke aliyên wê yên yêkîtiya netewî heyî kesayeta Kurd zindî bikin û tevlî şoreşê kirin kareke pir zehmete. Mezinbûn jiyankirin tenê karê min nîne. Yê ku her tim dibêje "*ez mêrxasim jî*" bi misogerî divê gavekê ber bi pêş ve bavêje.**

**Em bûyeran yekalî nedin dest. Bi rastî jî aliyê wê yê dîrokî, civakî pir kûre û kêm-zêde her kesî bandor dike. Divê ti kes ji derveyî vê xwe bê têkilî nehêle. Nexweşiyeke mezin ya Kurd jî**

**fikir pêşnexistin û girêdan vê çêkirine. Bêguman dema wisa jî bû, mijarên leşkerî, siyasî hikum nake, serkeftî nabe. Em hewl didin Kurd bikişînin fikir û rastiyan. Tiştên tên gotin girîngin. Bersivên wan jî hîn girîngtirin.**

**Heke dibêjin em di gelek çeperên şer de "*xetimîn, me çareser nekir, tedbîran negirt, wisa li me hat xistin*" li wir diyar dibe ku kesayeteke xwe li gorî şoreşê amade nekiriye. Yanî ji bo têkiliyên herî hêsan ên jin û mêrê berê qiyametê radikirin, wê demê divê em jî qiyametê rakin. Bi misogerî qiyameta em radikin civakî û dîrokiye.**

**Dibe ku sirên wan, yan jî têkiliyên wan yên veşartî mayîn û rihê wan ronîkirin sûdmend be. Naxwazim van mijaran vala bihêlim. Ji ber xwediyeke din yê wê nîne; mesela, dîroknasên me, wêjevanên me û milîtanên me zêde tiştekê nabêjin. Ji bo xwedî lênehatiye derketin ez her**

**tiştî dadigirim. Heke li ser navê netewekê hunermendên mezin derneketibin, milîtanên mezin derneketibin ez valetiyê dadigirim. A rastî divê mirov van bêne asteke girîng û misoger. Pêwîste somda min sondek misogerbe. Em ê dawî li xapandinê bênin. Em ê dawî li bêrêzî, neheskirin û kirêtiyê re bênin. Em dixwazin qonaxeke wisa bidest bixin. Cewherê me li gorî vê ye yan jî qet nebe di vê mijarê de dixwazim sade bimînim.**

**Mîna hemû Kurdên din, Ehmedê Xanî jî destana xwe bi mirineke xirap bidawî kir. Lê bal bidinê, rewşa min tam berevajî ye; bi hêzeke mezin li hember hemû mirinên ferz dikin disekinim.**

**Mem û Zîn çawa mirin?**

**Her kes li gorî destana Ehmedê Xanî jiyan dike, lê destana min cuda ye. Ez bersiva pirsên Ehmedê Xanî didim. Ez ji derdê vî mirovê me yê**

**xwedî hestewariyek mezin re dibim derman.**

**Bi kişandina şûreke mezin ve ketime nava pirsgirêkê.**

**Her roj li çep û rast didim.**

**Li giyan û cinên wan didim.**

**Min ev kiriye hunereke baş. Wê Memû Zîn çiqas bikaribin li ber xwe bidin?**

**Dimirin.**

**Başe, di rêya bi vî şêwayî li jiyanê vedigerînê de kuştin jî, ya herî başe. Di me de nehatina taxtîk û jiyanê heye. Gotineke pir balkêş heye dibêje; "*nehat jiyanê mir, gerîlatî pêk ne anî mir, qural pêk ne anî mir, rast nêz nebû belav kir, da revandin, bû tolaz*" vê pir vekirî datîne holê. Pir kêm tên jiyanê. Em ne bêhêvîne, lê hêza mirovê Kurd jî zêde pêş neketiye. Tiştên ku dizanin pê jiyan dikin, tiştên ku pêwîste ji bo me bên kuştinin.**

**Dema ez xwe weke şervanekî didim meşandin, herî kêm şêwazek, tempoyek, şîrove û biqasî vî karî bimeşînim xwedî qadim.**

**Her tim dîrok tê bîra min.**

**Dibe ku we dîroka gelek fermandarên mezin lêkolîn kiribe. Di destê min de ne şûrên fermandarên mezin heye, ne jî leşkerên wisa hene. Lê ya li gel min şervantiyek cudaye û şûrên di destê kesî de neyî di destê min de heye.**

**Dibêjim şereke cuda, şerê serdemê.**

**Şerê vê serdemê ya herî mezin min da. Dibe ku îdeologên din jî bêjin me daye, lê kesî weke min destpêkirineke wisa pêş nexist û negihandin heya vê rojê.**

**Cabar Qadir: Serokê min, Ehmedê Xanî azwariya jiyana gelê Kurd a hezarî salan tanî ziman. Lê Ehmedê Xanî helbestvanek bû û di helbestên xwe de qala yêkîtî û**

**serokatiyê dike. Lê ji bo vê di kesayeta xwe de şênber nekir, di encam de ew efsane bi mirinê re bidawî bû. Di şêwaza Serokatiya PKK'ê pêşxîstî de, ji efsane û rastiyek dûr zêdetir, vê gav bi gav pêş têxe, hîn di destpêkê de bi şêwaza serokatî ve pêşve dibe û her ku diçe vê vediguherîne yêkitiyê. Her wiha êdî li vir ne mirin, azwariya tevgerek yan jî gel'ek gihandina serkeftinê heye. Lê ev jî rastiyeke ku, hîn jî yên di vî şêwazî de xwe ferz dikin, şêwaza mirinê ferz dikin hene. Serokatî li ser şêwazên ku rê ji wê mirinê re vedike diçe, ji xwe ew jî aliyên ku xizmet ji dijmin re dikine.**

**Ay.: Serokê min, berhemên wêjeyî û roman peytandinên rastiyên civakîne. Ehmedê Xanî bi berhema xwe ve di wê demê de pêvajoya ku gelê Kurd negihandiye serkeftinê dide peytandin. Yanî di wê demê de mirinê jiyan dikir. Gelê Kurd niha di**

**pêvajoyeke vejînê de ye û ji niha şûnde jî di berhemên me de em dikevin pêvajoyek ku destanbi qezancên mezin ve encam bibin. Di dîroka civakên din de jî ev tê dîtin. Mesela, di romanên beriya pêvajoyên ronakbiriyê hatine nivîsandin de, her tim şerê baş û nebaşan hebûye. Romanên ku bi encamên xirap ser dikevinû yên baş jî bin dikevin ve bidawî dibin hene. Lê piştî pêvajoya ronakbîriyê şûnde romanên ku baş serdikevin, serî radikin û berxwedaniya nivîsandine hene. Ez bawerim êdî gelê Kurd jî vejinek jiyan kir. Wê êdî ev di berhemên wêjeyî de bên peytandin û çîroka Mem û Zîn, bi awayeke vejîn û serkeftî bi encam bibe û ji nû ve bê nivîsandin. Ev di jiyanê de jî tê nivîsandin, di encamê de wê veguhere wêjeya nivîskî jî.**

**Abdulah Ocalan: Me xwest em çîrokê zindî bikin. Wê xebatên min çawa bên fêmkirin?**

**Ay. : Serokê min, li wir balkêşbûnek heye: Hêzeke ku veguherîna civakê çêdike heye. Di civakên din de hinek guhertinên çandî yên di binyata sosyo-ekonomîk de tên peytandin di civakê de guhertinek afirand. Di rastiya PKK'ê û gelê Kurd de cudahiyek bi vî rengî heye; destpêkê mirov diafirîne, hewl tê dayîn xeleqa veguherîna civakî ji vir bê girtin û bi vî rengî hewl tê dayîn civak bê veguhertin. Di vê wateyê de hinekê balkêşbûna wê heye.**

**Abdulah Ocalan: Ez bawerim hûn zêde qonaxên serdehatinên giştî nahesin. Hinekê dişibe destana Kawa jî. Li hember mirina li wê derê ji hêla me ve ferzkirina bûyara vejînê gelek girînge û herî kêm divê çend roman bên nivîsandin. Mesela, di vê mijarê de gelek dahûrandinên min û pratîkirina wan heye. Divê tiştên dikim bê fêmkirin. Hûn encamên wê tînin ziman û encamên derketine holê**

**bilêv dikin. Lewra hîn baştir dikare şêwaza me bê girtin. Ji ber hûn hinekê jî şervanin, dibe ku hinek ji we jî wisa bê xistin. Ew cihên herî baş yên hevalên me yên din jî dîtine kîdere? We bi vejîn dike?**

**Mesela, di nava we de berendamek Memê berê derbas bike, bibe Memê nû yê şoreşger heye?**

**Wê Memê nû çawa çêbe?**

**Egîd kiye?**

**Navê hevalê me Egîd hîn di aqilê min de ye. Hevaleke me yê başbû. Ez gelekî jî li ser disekinîm. Hinek nûnerên xirabiyê mirina wî dixwestin, min hîn di wê demê de dizanî. Ji pêşveçûna Egîd tengav bibûn. Mesela wî, dikarî nûbûnê temsîl bike. Lê li gel wî xayînek hebû. Bi îhtîmaleke mezin ji hêla Bekoyê wir ve hat kuştin. Tabî min ji bo êşa wî, bîranîna wî weke Ehmedê Xanî nekir helbest, min girêdana xwe yabi bîranîna wî re bi şêweya, qet nebê ez ê di nava salekê**

**de herî kêm yêkîneyên gerîla yên pêncî kesî biafirînim û wisa bersiv bidim rave kir. Ev jî yek ji nêzîkatiyên me yên bingehîn bû. Heke me wisa bi serê xwe hiştiba, wê em jî bibûna çîroka ku dawiya wê nîne. Ya girîng jî me firsend neda vê.**

**Milîtaneke me keç jî hebû; Rehîme, keçeke qehreman bû. Li gel me bû; ew jî bi mirineke balkêş çû şehadetê. Ji şehîdên destpêkê ye. Efsaneyeke ku nemiriye heta jiyan dike hatiye afirandin, vegotineke gel a wisa hebû. Hemû di aqlê min de ye.**

**Bêrîvana me şandî Cizîrê jî wisa ye. Keçeke Êzidiyan bû, dema hat gel me xwendevaneke dibistana seretayî bû û xwîşka wê ji bo xizmetê ji zarokên wê re bike biribû Ewrûpa. Me jî ew kişand qada xwe heya bêjî bandor kir. A rastî me xwest heskirinê jî pê bidin fêrkirin û me hewl da jiyanê jî hinekê bi wê re şiyar bikin. Dema digehe Cudî di nameyeke**

**xwe de behsa wurşedariya çiyan dike û destnîşan dike ku gel dikare bi dildariyek mezin bê destgirtin û wisa ket nav.**

**Bi çiyan re lihevhatî bû, bi silehê re lihevhatî bû û dîsa bi gel re jî lihevhatî bû. Û xwe pir bi gelê Cizîrê da heskirin. Di şiyarbûna gelê Cizîrê de mirov dikare bandora wê hevalê bêne ziman.**

**Ev bûyerên bi vî rengî zêde nayên nirxandin. Ev kesayet çi îfade dikin, dikarin nirxandinekê li ser bikin û tiştên van kesayetan heq kirine bidinê. Tabî ew jî weke naveke lewaz tê dîtin, heta dijmin nahêle nefes bigire bide, him jî bi şêweya herî xirab. Kuştina wan hinekê bi qehremanî ye, ji ber mirina Zîn a li wir tê zanin. Mem dibîne û dimire. Ji xwe Mem lê temaşe dike û dimire. Lewra di destê hevalên me de şûr heye û şer dikin û wisa dimirin. Ev jî gaveke bi pêşveçûyî ye. Pêkanîna me ya bi vî**

**rengî gelek girînge. Hêzeke Ehmedê Xanî a bi vî rengî nîne. Mirin lê dîsa Zîn heye, Mem heye; ya tê jiyîn mirinin, tişta hûn jiyan dikin mirinin. Yê li hember wê li berxwe dide ez im. Li hember wê bi hezaran zilam, bi sedan jinên li ber xwe didin hene. Tabî di heman demê de ev ji bo kesayetiyên nû, Mem û Zîn'ên nû derxistina holê ye. Di vê mijarê de em bi îdane. Nêrîna Kurd a li jiyanê gelek lewaze, bê îdaye, weke Mem û Zîn'ên bere ye. Dibe ku hîn xiraptire. Beko jî pirin. Lê di navbera Bekoyên serdema feodal û Bekoyên serdema mêtingeriya-kapîtalîst de di warê çendanî û çawanî de gelek cudahî heye. Bêguman, divê em van jî bidin nîşan. Ne raste ku dîrok çors bê teqlîtkirin. Mêtingerên-kapîtalîst, heta kemalîst û yek jî li ser bingeha îxanetkariya Kurd axayên hevkarên nûjen, gelek fesadên wan û cehş hene.**

**Heke hinek dewlemend mabûna, dikarî gelek tiştan bikin. Hêjî weke berê dimirin, dixwazin me jî bikujin. Ev hemû di bin berpirsyariya me ya dîrokî de çêdibin. Ev heskirinê jî nizanin, heskirina wan weke geza mare. Ji xwe mirina tê jiyankirin jî ew fêm dibe.**

**Ethem Xemgîn: Serokê min, Ehmedê Xanî di ferqa rastiyek û pêwîstiyekê de ye.**

**Abdulah Ocalan: Ez qala çîrokeke zindî dikim. Min Ehmedê Xanî girt û anî vê rojê.**

**Hemû Mem û Zin sax bûn yan jî dubare danîn beramberî hev.**

**Ethem Xemgîn: Jiyan heye, di nava jiyanê de Mem û Zîn hene. Cudahiyek ji Mem û Zîn'ên ku Ehmedê Xanî xwest di berhema xwe de bide nîşan heye û ev li ber çave.**

**Abdulah Ocalan: Di vê mijarê de bila kes şaş fêm neke, hema macareyeke evînê pêşxistin û me**

**karîkaturîze kirin nebe. Evîna me jî, rewşên me jî heya bêjî cuda ye. Dibe ku Mem fanatîk bin û weke Memên evîndarên çavreş derbikevin. Hûn dizanin hema dibe ew jî bimirin, ji xwe Zîn jî tineye. Yanî yan çav li jiyanê digerîne yan jî nikare lê bigerîne, yan di dilê xwe de tiştekê derbas dike yan şiyar nabe. Heke sewdayeke Zîn a wisa pêş bikeve pir xirabe, yên bi vî rengî wê hema bimirin. Divê em zîndikirina van piralî bigirin dest.**

**Mesela, Memê nû yan jî zindîkirina Zîn gelek girînge û min hewl da hinek rehendên vê bidim. Divê bêyî ji rê derxin bikaribin vebêjin.**

**Ethem Xemgîn: Serokê min, herî kêm evîna rast çiye û çawa tê jiyîn; di vê mijarê de hinek jî be pêşketinek heye.**

**Abdulah Ocalan: Me heskirina rast çiye danî holê.**

**Ethem Xemgîn: Di nava kesayetên ku bibin Mem û Zîn'ên nû de eleqeyeke namzetan heye. Rewşa cehaleta berê nîne, di vê mijarê de ronahiyek heye. Û wê ev ji bo derketina Mem û Zîn'ên nû bibe alîkar û tevkariyê bike.**

**Abdulah Ocalan: Bêguman, ez zemînê wê pir baş difikirim. Ji xwe vê pirsê her roj dipirsim; gelo wê wêrekiya wan ji evînê re hebe? Ma we qet evîn di xwe de pêk anî? Zehmete, dibe ku we ji zû ve evîn winda kiriye.**

**Ethem Xemgîn: Herî kêm di derbarê evînê de bûna xwedî raman û dikarim bêjim ji bo bibim xwedî fikir hinekê mijûl bûm.**

**Abdulah Ocalan: Dibe ku we asta rastiya xwe ya netewî ji hinek aliyan ve yan jî bi temamî tine nekiribe. Ji xwe sedema negihandina we ya asta netewî jî eve.**

**Ji bo bibe fermandarê mezin, divê asta evîna mezin bê girtin.**

**Ji bo bibe xwedî pratîkek balkêş ya rêxistinî, divê asta evînê pêş ketibe.**

**Heta jineke Alman ket ferqa vê û gotibû: "*Tu vî karî bi eşq dimeşînî*. " Niha di we de nebûna eşqê xirabe. Di nava refên me de jî ya heyî belayên eşqê yên mezinin. Dema em dibêjin belaya eşqê, weke ku zindîbûn nîne, gelo bêjim çanda kolanan ya Kemalîzmê ye yan jî pir tûnd û tûje, yanî qala xirabûna wan ya wekî dupişkê dikim. Teqez wê cihekê gez bikin. Bêgûman nekarîn bikujin, lê dixwazin pir bi bandor bin. Di nava me de ev pir zêde ne.**

**Ya rastî dema ez hewl didim şerek mezin a meydanekê bidim, ew difikirin dibêjin; "*gelo em dikarin bi ciheke wê bigirin û bêxin.* " Hinek bêhestî, hinek kirêtiyê, hinek vê mirinê, hinek wê mirinê, hinek paşdemayîn û hoveberiyê ferz dikin. Bal bidinê, rewşa min pir girînge.**

**Başiya herî mezin ku ez li xwe, li vî gelî, li vê netewê bikim xwe bisînor nekirine.**

**Yanî xwe ji raman û dilan re vekirî dihêlim.**

**Mesela, we asta netewî; asta civakî, leşkerî û siyasî girkiriye. Halbûkî ez her roj hewl didim xwe vekirî bihêlim. Ev ji bo afirandina asta netewî heya bêjî girînge. Dîtina vê bihîstina vê bandorbûna ya her kesî girînge. Ji xwe serokatî eve. Divê neyê gotin ku "*ez biçewsînim, bigirim*" divê bê gotin ku "*bidim vekirin, bi bandor bikim û bi coş bikim.* " Dikarin bêjin "*em hinekan ji hêrsa xwe bixeniqînin, hinekan bê heskirin bihêlim*. " Kesê ku asta baş derdixe holê dikare bi bandor be, bibe wêjevaneke baş, zanyarek baş, dîroknaseke baş, leşkereke baş, zilamê çandeke baş. Heke kes asta netewî kêm-zêde nezane nikare dest bi gava mezinbûnê bike.**

**Mirov dikare hîn baştir çawa bixebite, ji min re vê bêjin. Ji ber ez niha fenomenikim û bûyerekim. Min xwe çawa anî vê rewşê? Ma têrê dikim? Ez dikarim biqasî artîsteke bandor bikim? Her yêkî derdikeve ser dikê, kêm zêde artîsteke.**

**Art hunere, artîst jî tê wateya hunermend.**

**Li gorî ku şoreş jî hunereke, divê mirov bibe hunermendeke baş.**

**Ay. : Hûn dikarin hemû ziraviyan bînin gel hev. Ji ecibandinê wêdetir, hûn dikarin di gelek mirovan de çavkanî derxin holê.**

**Abdulah Ocalan: Heta me hinek tişt di dijmin de jî da şiyarkirin. Ez her roj hinek li rojnameyên dijmin temaşeyî dikim; miriyê duh îro zindî bûye. Mista xwe li mase dide û teqlîdê me dike. Yanî heta di eniya dijmin de jî yê hember di derbarê hunera lêdanê de talîmat pêş têxe. Min teqlît dikin. Dema textîk pêş têxe**

**diyar dibe ku bandor bûye. Şerê generalê kontirgerîla yê ku di Kurdistanê de dimeşîne hesasiyetên me anîne rewşa taqtîk, disepîne û li me dixe.**

**Ay. : Ji bo neperciqin neçare bike.**

**Abdulah Ocalan: Dijmin pir baş fêr dibe.**

**Ethem Xemgîn: Serokê min, em jî hinek mezin dibin. Ez bawerim weke gel, weke kes, weke mirovê rewşenbîr, weke gundî-karker, weke milîtanên şer dikin pir kêm jî be para xwe digirin. Muheqeq aliyeke me bandor dike, dînamizmeke me diguhere heye. Em jî di cihê xwe de najimêrin, bi misogerî ev berhemeke mezine.**

**Abdulah Ocalan: Ehdeke min ku ez derewan li xwe nekim heye. Dema jiyan dikim yan di aliyê dost yan jî di aliyê dijmin de pêşketin çêdibe. Bi misogerî hûn ê mezin bibin, heke**

**mezin nebin hûn ê di bin de bimînin. Di vê wateyê de meşa me heya bêjî bandorkere, berfirehe û nahêle dost-dijmin di cihê xwe de bisekine. Divê hûn di destpêkê de vê bizanibin. Meş bi vî rengiye. Nexasim niha wê hîn bibandor û misogertir be. Milîtanê vê fêm neke nikare baş leşkertiyê bike. Derûnnasê vê fêm neke, nikare rastiya giyannasiyê fêm bike û mezinbûna wê çêke; nivîskar û xêzker erka xwe nakin. Vekiriye ez derewan li xwe nakim. Yanî şêwaza min ji cewherek ku naxapîne û nade xapandine. Wisa hema di rewşa gotin de jî nahêle, divê hûn para xwe bigirin.**

**Ethem Xemgîn: Piştî hinekê şûnde encama xwe dide. Ez bawerim êdî em nêzî wê sînorê dibin. Em tên rewşa hêdî hêdî fêkî bigirin.**

**Abdulah Ocalan: Ev şerê mezin, bi misogerî wê we bîne şêmûgekê. Ger pêwîst bike wê hinek giyan tine**

**bibin, hinek bên şiyarkirin, lê muhaqeq wê şêmûg vebe. Bêguman, ev ji ber xwe de çênabe. Di bûyera Kurd de kesîmeke bi wêjeyê re eleqedar dibe nîne. Yekî ezmûnên gerîla pêş bixe nîne, wêjevanê wê, giyannasê wê, nivîskar-xêzkerê wê û siyasetvaneke wê bi îda nîne. Li ser karê me rewşeke me pir xweser ya serdeçûnê heye. Vê bigirin, ji ber ev çîroka we ye jî. Ji ber ku ji bo we xirap bi encam nebe, bi misogerî wisa bigirin. Em naxwazin hûn erzan winda bikin, xemgîn bibin û di nava refên xirap de cî bigirin. Em ê bi temamî şer bikin, mezin şer bikin.**

**Ethem Xemgîn: Di asteke girîng de serokek, partiyek û mirovên ku vê partiyê pêşxistine ji xwe re mînak bigirin hene.**

**Abdulah Ocalan: Niha ev îdayeke mezin dixwaze. Bandor bibin, bihêz bibin, hêz bigirin, lê yek jî divê rola we jî hebe. Heke hûn rola xwe nelîzin**

**hûn ê bibin fitne-fesat, hûn ê weke xeşîmekî bixirikin biçin, ev jî li mirov nayê. Mezinbûna wê jênereve, xwe ji vê re vekirî bihêlin. Ez xwedî taybetmendiya bihêzkirina mirovim. Vê pir teqlît dikin û pir xirabe. Ev ne meseleyek bi teqlîtkirinê bê helkirine, lê şêwaza wê hînkere. Ji ber min di xwe de çalekiya mezin afirand.**

**Min ji we re got, dema min rêxistinbûn di temeneke biçûk de, bi xwestek girt dest min ti carî rihê xwe nefirot. Ji bo ez hevalê xwe yê zarokatiyê bibim, min hemû hêza xwe bikar tanî û min heya roja îro tarz û tempoyaxwe kêm nekir. Niha rêxistinbûnek mezin derket holê. Min eleqe, azweriya xwe kêm nekir û niha gihişt asta netewî. Ez îda dikim ku, heke xwe eyarkirina min nebûya wê Kurd yan jî rihê wê nebûya. Dibe ku we jiyan bikiriba, lê weke xalis-muxliseke Tirk yan jî yekî bi temamî xwe ji dîrokê qutkirî û heke hebe**

**riheke wê dê wî jî bi temamî terk-kirî jiyan bikiriba.**

**Ethem Xemgîn: Serokê min, weke we jî diyar kirî, Ehmedê Xanî jî di dema xwe de xeletiyên li Kurdistanê dibîne û Mem û Zîn dinivîse.**

**Berevajiyê vê nedikariya vê destnîşan bike. Niha, bi gava we avêtî re ev pir vekirî derdikeve holê. Aliyê meselê yê herî girîng, hûn bi rêbaza xwe vê şaşiyê roj bi roj diguherînin, bi rastiya xwe ve girêdayî dimînin û nirxeke mezin didin rastiyê. Bi rêbaza neguhertina rastiya heyî û pêşveçûna rastiya we gihiştina armanca ku Ehmedê Xanî daxwaz kiriye.**

**Rêbaza we dişibe rêbaza Zerdûşt.**

**Şibandina bingehîn girêdana bi rastiya heyî re; ji derewan û durûtiyê nefret kirine... Mesela li gorî felsefeya Zerdûşt, her ku zanyarî pêş bikeve nefs û îtiraz kêm dibe. Nirxeke mezin**

**ji zanyariyê re tê dayîn. Rêbaza xwe terbiyekirina mirov a nefsê li pêş dibîne. Ji wexta em hatine vir heya niha yek ji tişta herî girîng me li vir dîtî, ferq kirî, di mirov de pêşxistina behreyên baş û derbaskirina fêrbûnên zerarê didin mirovane. Tabî ev li gorî mercên roja me ya îro, di ciheke de tiştên weke ne asayî bên dîtine. Lê di guhertina bingehîn de yek ji rewşên herî bi bandor eve. Min şiband rêbaza ji guhertina jiyana civakî ya herî bi bandor û ji felsefeyên roja me ya îro cewaziyek mezintirîn diyar dikin. Mesela, şibandineke din jî bi eşqeke mezin, heskirina welat û gele...**

**Abdulah Ocalan: Heskirina xak û gel, heskirina welat û mirov.**

**Ethem Xemgîn: Heskirina mirov, sefiraziya mirovahiyê, yanî tenê ne ji bo mirovên xwe, ji bo şerefa nirxê mirovahiyê. . .**

**Abdulah Ocalan: Di vê mijarê de mirovahî esas girtin û mirovatî îfadekirine. . .**

**Ethem Xemgîn: Heskirinek mezin tê dîtin. Heskirina ji xak, heskirina ji welat û nirxeke mezin dayîna mirovahiyê heye. Li hember diyardeyên ku mirovahiyê dixapîne û zerarê dide mirovahiyê dijmintiyeke mezin tê dîtin. Ya herî bingehîn ku bala min kişandiye jî, pêkane di roja me ya îro de ev nirxê ku ji mirovahiyê re tê dayîn bibe xeteke elternatîf.**

**Abdulah Ocalan: Ji xwe israr; di bingeha felsefê de heye. Di mercên roja me ya îro de rêbaza qanih dibe ku roleke girîng bilîze û bi taybet ji hêla mirovahiyê ve dibe ji bo jiyankirina mirov bibe pergaleke eltarnatîf yan jî weke şêwazeke elternatîf ya jiyanê pêşketin bidest bixe.**

**Mirovên me yên ji dîn, felsefê, zanist qut bûyîn, ji bo xilaskirina cewherê dîn, felsefe, her ku biçe**

**zanist, siyasetê ji bo xwe, ji bo hemû mirovahiyê, ji bo vegera pêwîst îdayeke me yapir mezin, înadeke me û hewldaneke me heye. Tabî ev ji bo me jî, ji bo mirovahiyê jî gelek pêwîste. Ji bo gelê Kurd hîn zêdetir pêwîste. Ya rastî ji kategoriyên bingehîn qut bûne. Hostatiya wan girê bide heye. Pir jidil nêzî wê dibim. Heke hûn bal bidinê, dîrokeke mezin, tenê ne dîroka siyasî, dîroka leşkerî, şereke rih yê mezin jî heye. Him jî di mijara giyanên ketî de ji bo carekedin bên bilindkirinîdîayek mezin heye.**

**Ethem Xemgîn: Ji şêwazek siyasî yan jî leşkerî zêdetir, divê felsefe weke şêwazek jiyanê, şêwazeke sepandina di jiyanê de bê destgirtin. Ji ber vê yekê jîndarkirina vêji şêwaza jiyana îro ya kevnar pir cewaztir esas girtinê de, dema vê di şêwaza jiyanê de disepîne, nirxek mezin dide mirovahî, ji beşên ku şêwaza jiyana mirovahî ya roja me**

**neraziye, an jî ne razî re mirovahiyek nû bide pejirandin. Di vir de jî diyar dike ku pêşketinek li ser bingeha ti cewaziya mirovahî ji hev tine û mirov bi pêşnûmeya li hember hev hezkirin û rêzgirtinê girêdana xwe bi jiyanê saz dike.**

**Abdulah Ocalan: Bi mirovê rojaneyî re cudahiyeke mezin xêz dikin.**

**Ethem Xemgîn: Di bingeha felsefê de cudahî heye. Yanî di roja me ya îro de li hember şêwaza jiyana emperyalîst û kaptalîst, dîsa di demeke ku rihê netewî xilas bûye, xilas dibe de çêbûna rihê miroveke nû ye.**

**Abdulah Ocalan: Girêdayî mirov mayîn heye. Ger pêwîst bike mirov kirina yê herî esasî, dana pêş û ji bo wê jî hêza kirina her tiştî heye. Mirov dikare bi vî rengî girêdana li gel dîrokê bide çêkirin. Hûn heya Zerduşt çûn, a rastî deverên navber jî hene,**

**mirov dikare bi van re jî girêdan bide çêkirin. Belê mirov dikare Îslamiyet, dîsa girêdana kapitalîzmê ya bi suç re, hovîtiya Tirk, li hember dijberbûna mêtingeriya îslamê û di roja me ya îro de çi tiştê êrîşê mirov dike, girêdanek pir bihêz dane.**

**Ethem Xemgîn: Mînak, dema Îslamiyet avaniya xwe ya netewî pêşdixe, bi rêxistinkirina gelên din re ji avaniya xwe re sûdweriyê çêdike, di vê mijarê de ji gelên din re pir zêde sûdweriyek saz nekiriye. Nirxên gelên din ji bo pêşvebirina nirxên xwe bikar aniye. Bi vê pergalê re di navbera felsefeya we pêşxistî û ya heyî de aliyên cuda hene. Her gel'ek, kesayetek û avaniyek di xweserbûna xwe de bi rêbaza xwe nirxên xwe li ser bingehê mirovbûn pêşdixe. Li hember hev rêbaza rêz-heskirinê heye. Li qadên din di pêşveçûna mirov de, di şêwaza pêşveçûnê de li hember kapitalîzmê, yanî rêbaza**

**kapîtal yan jî kedxwarî dişopîne, di Îslamiyetê de li hember malhebûna kapîtalê bêriyek heye.**

**Abdulah Ocalan: Heta Îslamiyet jî dixwaze bi milkiyet û mêtingeriyê xwe belav bike. Her çiqas mezhebên wê yên cuda hebin jî, hinek hîn zêdetir nêzî heq û edaletê ne. Her çiqas hinek li hember hevbin jî, şêweya serdestbûna wan ya li hember nirxên gelên din yên neteweyî, sosyal, madî û hebûnên giyanî êrîşeke pir bê rehme. Nabêjim bi her tiştê xwe ve êrîş bike, lê xwestin nasnameya gel, nirxên madî-manevî ku qezenc kiriye (bi taybet jî dema serdest, îslama fermî pêşket şûnde), xwestin xirap bikar bînin. Li gorî min di wê demê de wateyek nêzîkbûna Hz. Muhammed a li hember kesîmê ku jê re dijûn kirî û gotî ketiye heye. Ji ber Hz. Muhammed dixwaze pêngavek hîn baştir bike. Lê piştre ev anîn çi rewşê. Dikarim bêjim xwestin**

**gelek xirap bikar bînin. Yek jî dikarim bêjim ku Îslamiyetê bi deste Muavî, Emevî, Abbasî û ya herî xeter jî bi destê hovîtiya Tirkan pir xirap li gelan xistin. Divê vir pir baş bê fêmkirin. Di vê mijarê de ez bawerim pêşiya nirxandinan nû nû vedibe. Îslamiyet û rizgarîxwaziya netewî, wateya ji bo rastiya her gelekî îfade kirî, ji nîqaşên rojaneyî û têgihên Îslamiyetê re vekiriye.**

**Li gel vê em dikarin girêdana wê li gel kapitalîst heta berzbûna emperyalîzmê bidin çêkirin. Ev berzbûn bi mêtingeriyek pir cudatir re pêk hat. Di rêka rizgariyê de tevî kuştina gelan bi her cure rêbazan ve bi êrîşeke mezin re rû bi rû dimîne. Tenê bila berjewendiyên kapital mijara gotinê bin, hemû rêbaz rewşa ne. Yanî dema berjewendiyên kapitalê pêwîst kir, jenosîd jî di nav de her tişt di kapitalîzmê de tê pêkanîn. Tişta vê afirandiye**

**xeniqandina kesayeta netewî ye. Hîn jî bandorên li ser me pir zêde ne. Li gel Kemalîzmê sultantiya Osmaniyan, heta Yavuzê ku pir xedar tê zanîn jî ne evqase. Dîsa Sultan Mahmut jî ne evqese. Abdulhamit li gel Kemalîzmê hîn kerîm dimîne. Lê Kemalîzmê heya dawî êrîş kir. Jenosîd dibe ku bi şêweyên qet nehatî dîtinve hat sepandin. Ev, di encama yekbûna hovîtiya Tirkan û kapitalîzmê de derketiye holê. Û hêjî bandora xwe bi awayeke pir xedar dide jiyîn. Girêdana wê yek jî divê ji vê hêlê ve bê danîn.**

**Zerduştî bi esil rastiya civakî îfade dike. Ya herî girîng jî weke îdeolojiya xakê û ji bo çêbûna taybetmendiyên mirov esas girtiye; dibe weke fêrkerek ku mêtingeriyê nasnake, bi awayeke bêmafî nirxê kesî desteser nake xwe derxistibe holê. Yan jî di vê wateyê de dibe ku dixwaze rastiya gelê me, rastiya**

**girêdayî xakê, çandinî û taybetmendiyên mirov yên bingehîn îfade bike.**

**Ji ber şêwaza me jî hinekê dişibe gelêrî, pêngava civakî; çi li hember desteserkirinê, çi li hember feodalîteya wê, koletiya wê û çi jî li hember mêtingeriya kaptalîzmê pir girînge ku me pêngaveke wisa pejirandiye. Yanî di cihekê de me xwe ji girêka pêşketina diyalektîka dîrokê weke şûreke mezin ya çareseriyê derxistiye holê.**

**Ethem Xemgîn: Yek jî divê mirov di warê nirxên mirovî de jî bigire dest. Mînak, dema em li pêşveçûna kaptalîzmê yan jî teknîk temaşeyî dikin, heke bi awayeke giştî teknîk ji mirov re xizmet bike, wê demê mirov dikare weke pêşketinekê bibîne. Heke teknîk mirov bêxe bin xizmeta xwe, mirov di bin xizmeta teknîkê de tê bikaranîn (qonaxa ku kapitalîz hatiyê ev wisaye) mirov dikare bêje**

**her ku diçe nirxên mirov tine dibe û diqede. Tinekirina nirxên mirovî jî tinekirina rihê mirov bi xwe re tîne.**

**Abdulah Ocalan: Ez mirina mirovahî, ne bi şêweya kevireke ji gerdunê bê yan jî nexweşiyek wê tine bike û biçe dibînim, yeqîn dikim li ser bingeha ku nikarin teknîka cenawir bixin bin kontrola xwe pêş dikeve. Yanî hîn ji niha ve teknîka cenawira pêş xistine xwezayê dadiqurtîne, mirov têne rewşeke nenas. Îro weke xeteriyeke mezin derdikeve pêşberî me. Ev jî di rewşek wisa de ye weke teknîka şûr di destê feodalîzmê de û bivirê di destê koledariya Romayê de ye û vê teknîkê li gelek mirovan xistiye. Niha di destê mirovan de bombeya atomê heye, dibe hîn ji wê zêdetir jî pêşbikevin û ev xeteriyek mezine. Li hember vê Îsayek derket. Lê pirştre kirin malê koledariyê. Muhammed derket, sultanan navê wî pir bikar anîn. Kapitalîzm jî bi qêrînên**

**azadiyê derket holê. Niha çawa bûye cenawirek, teknîk jî wisa bû. Pir vekiriye divê bi parazvaniyeke mirov ya bikok ve bersiv bê dayîn. Di felsefeya me de azweriya hebandina teknîkênîne, dilketinek me ya pêşketina teknîkek wisa û welê nîne.**

**Dema mirovahî bi çandîniyê ser xwezayê de çû, teknîk pêş dixe, divê pêş jî bixe. Niha yê ku pêş dixin, heta nedîtina pêşxistina yên herî xeter, nedijberbûna vê dibe ku mirovahiyê ber bi tinebûnê ve bibe. Em ê bersiveke azad bidin vê. Di feraseta me de bi misogerî rojevkirina hemû aliyên xeter yên teknîkê; kîjan teknîka ku mirovahî, xwezayê, dîsa rewşa civakî, manewiyatê û rih texrîb dike hebe û çi serdestî têkîlî û planên xwe dispêrin vê hebin, li hember wê êrîşek pêwîst dike. Di şêwazê min bi xwe de aliyên bi vî rengî hene. Dema ez di felsefeya xwe de, li gorî vê jiyanê sazdikim, nêzîkatiyên bi vî**

**rengî herî kêm di rihê xwe de mehkûm dikim. Teknîka ku wisa qebûl nakim û encama bûyeran, tahrîbatên wê, encamên wê derxistine holê, mehkûm dikim. Pêşketinek bi awayeke din û civakeke li ser vê bingehê naxwazim. Ez pêşketineke xwe dispêre teknîkê qebûl nakim. Ev jî feraseteke felsefî ye. Ev girînge û bi misogerî nêzîkatiyeke hêz qezenc bikê ye. Berevajî mirovahî nikare xilas bibe wê tine bibe.**

**Di vê wateyê de felsefeya me felsefeyeke jiyanê ye.**

**Felsefeya me ne şêweya ewqasî bixwim, vexwim, evqasî jiyan bikim digire dest, jiyaneke hîn cudatir digire nava xwe. Ji bo min pirsgirêk pir cewaztire. Feraseta min jî ya xwarin-vexwarin û heskirinê cuda ye. Ez xwe weke kes ji we nagirim dest. Tiştek pir ecêbe. Mesela, feraseta mal-milk, feraseta malbat di min de pir cuda ye,**

**lê nizanim çiqas dişibe Zerduşt. Vekiriye feraseta min ya sosyal naşibiyê.**

**Ethem Xemgîn: Ji gelek hêlan ve dişibiyê. Lê cudahiya qonaxê pir mezine. Cudahiya qonaxêdide diyarkirin ku gelek tişt naşibin hev.**

**Abdulah Ocalan: Lê dişibin hev.**

**Ethem Xemgîn: Bi awayeke bingeh dişibin hev.**

**Abdulah Ocalan: Yanî di cihekê de em vedigerin ola herî kevin, an jî ev zindî dibe.**

**Ethem Xemgîn: Li gorî min ne eve. Belê, di jiyana mirovahî, ya rastî di jiyana mirov de radeya girîngiya mirov cuda ye. Di kijan serdemê de bi çi şêweyî derketiye holê, bi çi şêweyî tê îmhakirin yan jî ji nû ve şêwaza vegera mirovahiyê çawa çêdibe? Li Ewrûpa niha cin tên nîqaşkirin. Him teknîkên nû çêdikin hem jî çanda dînazoran. . . Yanî berê dînazoran çawa bi texrîbkirina cîhanê re nifşên**

**xwe jî tinekirine, di roja me ya îro de jî bi teknîka ku mirovan çêkirî re careke din çawa dibe sedema tinekirina hemû mirovahî yan jî di carekê de mirovahî tine bibe tê nîqaşkirin.**

**Abdulah Ocalan: Çanda cinawir, çanda dînazor raste.**

**Ethem Xemgîn: Ya herî bingehîn divê niha çanda li ser esasê bingeha mirovî bê kirin. Ji bo jiyankirina mirovahî û pêşxistina wê, çanda ku pêwîst dike bê pêşxistin divê feraseteke beramber, ji nirxên mirovî re rêz, di her qadê de nirxên mirovî esas bigire û bibe nirxeke tê afirandin. Ev di paşerojê de û di roja me ya îro de jî hebû. Mesela, îro alternatîf jî tên pêşkêşkirin.**

**Abdulah Ocalan: Misoger hûn dikarin di van aliyan de hîn kûrtir lêkolîn bikin. Ev ne çalekiyeke min ya kesî ye, têkoşîneke milîtanan ya**

**bingeha wê ya felsefîk bihêze û mirov digire berfirehiya xwe ye.**

**Ya me, jiyaneke aliyê wê yê şer giranî ye.**

**Ji ber, di vê qonaxê de em nikarin bi rêgezên ziwa û axlaqê salekê rizgar bikin.**

**Asta xeteriyan me teşvîqî milîtantiyê dike.**

**Ya rastî ez, yê herî kêm bê çalekîme. Dibe ku ji bo çanda bav û kalan, weke yekî exlaqnaseke ji rêzê mabûma. Lê mezinbûna xeteriyan, di asta mirovan bi xwe de dîtin, hişt ku bigihim vê astê.**

**Ya min anî vir, ne xebatên min bi xwe bûn, mezinbûna xeteriyane.**

**Heke mezinbûna xeteriyan nebûya, min nedikarî pêşdebirina vê îdeolojî, polîtîka û taybetmendiya rojevkirina vê şêwaza şerker bidim nîşan. Pêwîste hûn vê bigirîngî bizanibin. Dibe ev ji bo dahûrandina dîrokê rê nîşander yan jî dahûrîner be.**

**Dîrokê, carek jî bi şêwaza min bigirin dest. Min pêwîst dît ku weke neşterekê li girêka dîrokê bixim. Çima? Ev, ji dawî ve carekedin çuyîna serî û ji bo hîn bi watedartir bidestgirtina dîrokê de tevkariyekê dike. Ji ber, dema hewl tê dayîn dîrok bê fêmkirin rêbaz jî hêjayî sepandinê ye. Di nava dawiyê de destpêk heye. Yan jî taybetmendiyên di destpêkê de, di dawî de jî xwe dide nîşan. Ez bawerim sozeke Marks bû dibêje; "*nirxên ji Roma di roja me de carekedin zindî dibin, bi taybet di şoreşê de zindî dibe.*"**

**Her şoreş bi rastî jî zindîbûna yên kevnin. Zerdûşt hema ji xweber neket nav peyvê. Şoreş çêbû çû. Şoreş rakirina nirxên gel'ekî ya herî bingehîne. Heke bikaribe jiyan bike wê jiyan bike, heke bimire wê bimire. Bi vî rengî dikare xwe derxe holê. Amerîka yan jî dewletên mêtinger evqas eleqedar dibin, ji ber serdestiya**

**wan ya xwe dispêre sêsed salan heye.**

**Roja me fêmkirin dîrok fêmkirine.**

**Dîrok di roja me de veşartiye û em jî di destpêka dîrokê de veşartîne.**

**Ev meyzandineke û heya bêjî rê dide nîşan. Ji xwe tevkariyek heye, yanî rewşa dîrokê ya xirab yan jî çûyîna wê ya serberjêrkî dana sekinandin heye.**

**Bûyera berzkirinê pir balkêşe û ev di heman demê de wê îzaha neserxistinên berê hemûyan bide.**

**Şêwaza me ya serkeftinê, bi misogerî wê bersiva neserxistinên berê bide.**

**Ez bawerim ev ji bo gelek dîroknasan girînge. Tabî, rasterast nêz nebin. Serkeftina niha tenê bi tiştên çors ve nedin girêdan. Nebêjin "wisa pêşketina kapîtalîstî çêbû, wisa bingeha objektif pêş ket. " Ev nêzîkatiyên metaryalîst yên çorsin. Li gorî min destgirtina rêbaza mirov ya**

**xwe diyarkere. Ez jî pir zêde heq nadim vê. Mêtingeriya-kaptalîst, serdestiya kemalîst û hwd. Suce, nayê înkarkirin û misoger bibandore. Lê têrê nake, hema her kes vê dide jiyîn, kes li hember vê berteka xwe raber nake. Yê min hinek din cudatire: Şêwazeke min a çêbûnê heye, di nava xwe de dîrok nûkirin heye. Eleqeya min a li hember dîroka yekem a mirovahî û hevesa min a li hember meşa mirovê yekem baş dizanim. Aliyên min yên dişibin komên klanan hene. Ez her kêlî weke klanek ji rêzê dikarim jiyanê saz bikim. Ez dikarim sazûmaniya civateke komînîst ya herî îdeal bifikirim. Ez evqas cî ji nerimbûnê re dihêlim. Ez dem bi dem asta feodal ya hişk tengav dikim. Careke din têm ser demokrasiya burjuwa çawa dibe. Ev kin û cewherî hemû hene û ev pir girîngin.**

**Heke mirovek nikaribe xwe li gorî dîrokê çêke, weke ku bêje “*dîrok ezim*” xwe ji nû ve ava neke, wê zêde şansê wê yê serkeftinê çênebe.**

**Ya rastî heke pir zêde hûrûkûrbûnek min nebe jî, ji xwe dîrok ji bingeh ve heye û ez van xalên bingehîn di xwe de didim helandin. Kêm-zêde agahiya min ji fermandarê serdema navîn, fermana wê, sultanê wê, ji hinek taybetmendiyên asilzadeyên dema Romayê û ji meşa Îskender heye. ji sultaneke Osmaniyan yan jî Kemal Ataturk çiye, kar çawa saz dikin, kêm-zêde agahdarim.**

**Ya ku pêwîste bê girtin wê bê girtin, ya divê bê redkirin wê bê redkirin. Niha dema yekem çalekiya dîrokî difikirin, di vê wateyê de dîrokeke nû zindî dibe û bi qasî destpêka wê dîrok di nav de heye. Yê dixwaze serbikeve divê vê bibîne. Yên vê ferq dikin dê bikaribin serbikevin û**

**berhemdarî bidest bixin. Yên ferq nekin serensertî û olîgarşîya xwe esas digirin nikarin tiştekê fêm bikin. Ji bo wan jiyan weke vexwarina avê ye, dibe ku jî şahiyeke hêsane. Kûrbûna wê, coşa wê û agirê wê zêde ne bihêze. Evên seransere wê winda bikin, nikarin bibin fermandareke bi bandor, nikarin bibin katîbeke bi bandor yan jî xwedî bilêvkirineke bi bandor. Ji bo guh nedane dîrokê û dîrok di kesayeta xwe de zîndî nekirine wisanin.**

**Di vê şêwaza min de bi şêwaza pêwendiya mirovê destpêkê, weke şêwaza împaratoreke herî bi şeml di nav hev de ye. Împarator carna dimeşe, carna mirovê klan yê destpêkê holikê çêdike tê de jiyan dike.**

**Ethem Xemgîn: Pêwîste mirov xwe bi xwe nexapîne, weke we jî dayî diyarkirin xwe bi xwe nexapandin,**

**weke mirov ber bi domandina şêwaza jiyanekê ve dibe.**

**Abdulah Ocalan: Tabî ji bo mirovê naxapîne derxistina holê ev nêzîkatî jiyanî ne û rastin. Divê îdîa û pêwîstiya ku mirov evqas ji bingeh ve bigire dest, gihiştina mirov, rapêçandina wê û wateya wê dayînê. Heke girîng be û wê dîrok bê zanîn divê ji bo vê bê zanîn. Pêwîstî bi zanyariyeke ziwa nîne. Dîrok ne zanyariyeke ziwaye û divê wisa jî nebe.**

**Dîrok zanyariya jiyanekê ye, hişmendiya wê ye.**

**Bi zanebûnê re tê jiyîn. Ji dîrokê qutbûn, di wateyekê de ji jiyanê qutbûne. Ev jî, ji mirovahiyê qutbûne. Dîrok, ne çîrokek derbasbûyî ye. Zerdûşt jî ne bûyereke derbasbûyî ye, bûyereke niha li beramberî me ye. Belkî şûrê wî hatiye guhertin, libasên wî hatiye guhertin.**

**Ethem Xemgîn: Dîrok ezmûneke. Ezmûna serpêhatiyên derbasbûyî ye.**

**Abdulah Ocalan: Dîrok ne ezmûne jî. Dîrok temenê jiyan û mirovahiyê ye. Dîroka mirovahiyê, temenê mirove. Em nikarin pêşbîniya wê temenê mirovahî di çend milyon sal de be bikin. Ji xwe dîroka mirovahiyê wisa bi salan nayê pîvan.**

**Li gorî min dîrok, hîn jî di temeneke ku pêwîste bê jiyankirin de ye.**

**Yanî em nikarin hikum bidin bejin ku dîrok bave, dîrok pîre, gelo di bistûpênc saliya xwe de ye, di pêncî salî deye.**

**Lê dîsanî di temeneke bê jiyankirin de ye.**

**Dîrok nemiriye.**

**Nivîskarek derketibû, yek ji îdeologên emperyalîzmê yê dawî bû; (Fukuyama W. S. ) digot dawiya dîrokê. Ne dawiya dîrokê ye. Ya rastî ev dawî tinebûna emperyalîzmê ye, lê**

**ji wê re dibêje dawiya dîrokê. Mirovahî jiyan dike. Tabî dema ew dibêje dawiya dîrokê, dixwaze bê dîrok bike, dîrokê tine bike. Ev gotinên pergala serdest, bizaveke ku dawiya wê hatiye yan jî gotinên çînek, tebeqeyeke mirovahî ji bo xwe bikar anîne.**

**Dîrok beşên temen ên jiyana ku di paşerojê de mayîne. Ma ez bi înkarkirina salên jiyana xwe yên derbasbûyî ve dikarim bêjim jiyan dikim? Kombûna salên min jiyan kirine, min îfade dikin. Di nava mirovahî de çiqas salên tên jiyankirin hebe, ev jî temenê mirovahî îfade dike. Bêyî temenê dîrokê bê sekinandin, "*gotina ku dîrok îro destpêkir*" derewe, xwe xapandine. Berevajî kombûna hemû temenan mirovahiya îro esas digire. Wiha, em dixwazin hinekê vê bidest bixin, ev jî bidestxisteneke raste. Yên ku vê rebazê bi vî rengî digirin dest, bi**

**misogerî wê li gorî hewcedariyên mirovahî jiyan bikin.**

**Zilim çiye? Ya li beramber bê derketin çiye? Ya miroviye çiye? Divê ev baş bên tesbîtkirin. Û ev jî bi têkoşîneke rast, ferasetên şer û partî, heta ji bo rastiyê serwerkirin jî çi bê xwestin wê hêza wê bê dîtin. Felsefeya dîrokê bi temamî eve. Heke nêzîkatiyeke ji derveyî dîrokê hebe, li hember temenê dîrokê êrîşek hebe, li hember wê hêza bê derketin, kesayeta wê, rêxistina wê, hêza wê ya lêdanê, şêwaz û tempoya wê ye. Me hewlda hinekê wisa bin.**

**Dîrok perspektîfe.**

**Hûn dikarin vê li gorî gelek demên cuda bisepînin. Lê encama bê derxistin; "*me dîrok wisa îfade kiriye, me dîrok wisa jiyan kiriye, me hewl daye dîrokê wisa ava bikin, yanî ji dîroka hatiye înkarkirin re eleqeyek wisa, ji ya dixwazin tine bikin re hebûnek wisa û ji dîroka wisa serûbin***

***dibe re pêngavek pê dana kirin, bi vê dîrokê re careke din çûyîna raboriya mirovahiyê û ew anîna roja me*" heye. Bûyîna miroveke baş, ev mirovahî parastin heye û ya rast jî, ya tê kirin jî eve.**

**Ethem Xemgîn: Yêkane rêbaza rast jî eve. Di Kurdistanê de guhertineke dîrokê ya wisa berbiçav dayîna nîşan jî vê îfade dike. Di Kurdistanê de hûn dikarin bi rêbazeke rast ve bi felsefeyeke rast ve ji nû ve dest bi berzkirina dîrokê bikin.**

**Di Kurdistanê de dîrok pêvajoyeke şoreşê ye. Di dema seretayî de û heta dema beriya Îslamiyetê şoreşeke bilind ya çandê hat jiyîn. Piştre bi pêşveçûna Îslamiyetê re, di Kurdistanê de çand ber bi xirabûnê ve çû û di Kurdistanê de dîrok paşket. Çi di warê civakî, çi di warê çandî, çi jî di qada dînî de paşkeftinek çêbû. Bi taybet bilêvkirina vê girînge: Piştî Îslamiyetê**

**di nava Kurdistanê de destpêkirina şereke hundurin tê dîtin. Bi taybet di navbera qedên ku misilmantî qebûl kirine û yên din de şereke hundurin hatiye jiyîn û ev heya roja me ya îro hatiye. Ev jî, bûye sedema xilasbûna dînamîzm û hêzên di Kurdistanê de. Di herêmê de dabeşkirina li ser bingeha olî û parçebûna wê ji hêzên dijmin re derfeteke baş daye. Ji bo gelê Kurd li ser bingeha berjewendiya xwe bikar bînin derfeteke mezin daye wan. Û yêkîtiya Kurd ya di herêmê de asteng kiriye.**

**Hêzên dijmin ji van rewşan gelek feyde girtine, her tim gelê Kurd texrîp kirine, ji xaka wan derxistine, qetlîam çêkirine û bûye sedem ku hemû lîstok li ser wan bê lîstin. Ev rewş heya roja me ya îro hatiye. Lê di bilêvkirina vê de feydeyek mezin heye: Di warê dîrokî de diyardeyên olî, yek ji diyardeyên herî girîng yê dîrokê bandor dikeye. Mesela di deverên ku**

**ol tê de bihêze siyasetê digire bin xizmeta xwe. Di devera ol tê de bêhêz, lewaze jî dikeve bin xizmeta siyasetên din. Ev diyardeyeke ji berê ve heye. Di civakên îlkel de kral kirina xwedê, qaşo bûyîna kurê xwedê girtina dest, di demên diyar de, heta di civakên sedsala 20. de heman bandor tên dîtin. Rêveberiyên olî yên herî karbidest, yan jî xwe sipartine ol rêveberiyên ku hêza ol bikar anîne. Di roja me ya îro de ev rewş dîsa mijara gotinê ye. Çi di warê deverên bandorên kaptalîstlê heyî, çi jî di deverên siyasî de ev dîtin mûmkûne. Di her demê de ol zaniye xwe bigihîne diyardeyên dîrokî yan jî di asteke mezin de bi diyardeyên dîrokî re bûye diyardeyek karbidest. Dema dîrok tê lîkolînkirin pêwîst dike ku ev diyarde liberçav bê girtin.**

**Abdulah Ocalan: Ol ji xwe siyasî ye. Oleke ji siyaset yan jî ji tevgereke civakî qut nîne. Heke niha ji navê wê**

**re felsefe, îdeolojî, sosyalîzm-neteweperest tê gotin, li gorî dema xwe kargeriya ol jî heman tişte. Hemû li gorî dema xwe mezinbûn, mezinkirineke îdeolojîkin. Û sepandinên wê yên pratîkî hene, lê ev li ser navê ol yan jî mezhep kirine. Di roja me ya îro de heman bûyer bi awayeke cudatir tên kirin. Yanî çawa ku ol siyasetê bikar tîne, yan jî siyaset ol bikar tîne zêdetir, dikare di şêwaza ol de siyaset, yanî şêweyên ol'î yên siyasetê yan jî şêweyên siyasî yên ol bên diyarkirin. Ev pêwendiyên diyar dibin di dîrokê de bihêzin.**

**Di Kurdistanê de dabeşbûna mezheban xwe dispêre mêtingeriyê, heya bêjî metingerî vê bikar aniye, heya roja me ya îro jî meşandine û di heman demê de ev hatiye wateya şer. Di dîtinê de ol; aşitiye, selamete, lê ya tê sepandin şereke hundurîne. Ji vê hêlê ve jî me girîngî daye ku rastiya ol bê fêmkirin. Di navbera ol û**

**rizgariya netewe de, di navbera ol û siyasetê de pêwendî heye, dîroka ol di heman demê de dîrokeke berxwedan û mêtîngehkirinê ye. Di roja me ya îro de jî ger em ê qala Îslamiyetekê bikin, em dikarin pirsa ma bi qasî girêdana wê ya bi paşverûtiyê, emperyalîzmê re heyî ewqas jî girêdana xwe bi gel re jî heye ronî bikin. Ev her tim rêbazên nêzîkatiyên rastin. Hêjayî li ser sekinandinê ye.**

**Tevî ku Elewî yên herî nêzî Zerduştiyê ne, her çiqasî Kemalîzm herî zêde wir texrîp kiribe xistibe bin xizmeta Tirkbûnê jî, ya rastî her çendî Elewîtî heya demên dawî paşketî jiyan dikir, paşketî jî be Kurdayetî ye. Deverên bandora Sûnnitiyê lê heyî Kurdeyatiya hinekdin biyanî bûye. Ger di vê wateyê de mezheba Sûnnî rolek paşketîtir dilîze, evencamek xwezayî ye. Seltanat îslamiye, îslamî xwe dispêre Sûnnîtî, Naxşîbendiyê û ew jî**

**di roja me de bûye sedema cerdevanî pir bihêz pêş bikeve. Ev çi îsbat dike? Di dîrokê de rola xwe ya paşketî ku dilîst di roja me ya îro de jî dilîze. Ji destpêka dîrokê heya niha îslama serdest ji bo gelekî çi îfade kiriye, em bi awayeke pir balkêş dibînin ku şereke navxweyî ye. Li ser Elewîtiyê jî arasteyeke dijmin, bi taybet jî yên Kemalîzmê çêbûye. Ji ber şerê navxweyî derxist. Hîn bi avabûna komarê re li Elewîtiyê xistin, piştre teslîm girtin. Di navbera komar û Elewîtiyê de heta salên 1970'î bi rastî jî rewşeke şerê navxweyî hebû.**

**Van mijaran hemû bi awayeke zindî girtina dest mûmkûne û bi wateye jî. Dîroknas vê wisa nadin nîşan. Ev dîroknas û îdeologên fermî zanist berevajî kirine. Şoreş di vê wateyê de tevgereke sererastkirina dîroknasane jî. Divê mirov hêza şoreşê baş bibîne. Dîrok ji nû ve di destgirtinê de roleke sererastkirinê**

**dilîze û ez bawerim, ger hûn van pêşketinên şoreşê derxistine holê esas bigirin, gengaze ku hûn bikarin dîrokek hîn rasteqînî binivîsin. Çi dîroka siyasî dibe, çi dîroka leşkerî dibe, dîroka olî dibe, çi çanda li ser wê dibe, heta nirxandina bandora jiyana aborî dibe, hûn ê bigihin dîrokeke heya dawî girêdana xwe bi jiyanê re bihêz, sotîner û bandorker.**

**Em bê dîrok nikarin bixebitin. Bêyî bingehê dîrokê hebe, bêyî kareke dîrokî bikin ne bawerim ku şoreşgertî çêbe. Bandorkirina min ya li ser dîrokê, ji bandorkirina min ya rojaneyî hîn zêdetire. Bêrîkirina ji dîrokê re, tiştên dîrokê winda kirine dîtin, di dîrokê de tiştên nehatine kirin pêkanîn bandora xwe li çalekiya me daye. Gelê me yê ji dîrokê ve tê di roja îro de berxwedaniya wê dîtin, bi temamî bi saya vê girêdanêye. Bi heman şêwayî tiştên di dîrokê de**

**nehatine kirin niha pêkanîn, ji dîrokê re tevkariyek kirin azweriyeke.**

**Ger ku her kes vê hinekê esas bigire, gelek karên dîrokî dikare bê kirin. Dîroka xwe hinek ji bingeh ve fêmkirin, xwesteka dîrokî, di dîrokê de tiştên nehatine kirin pêkanîn, li ser sedemên wê sekinandin, rojaneyî ji neserketinên wê û ji faktorên wê yên neserkeftî rizgarkirin mûmkûne. Di me de her milîtanek, bi vê rewşê re dikare bibe fermandareke mezin, disa dikare bibe siyasetmedar. Pêwîstî bi vê heye. Min got, pêwîst dike hûn ji bo xatirê vê têkoşîneke mezin bidin. Fermana dîrok jî, edeb jî heye, divê em bizanibin bidin. Û vala nayê sekinandin. Bi misogerî divê hûn mezin bibin, mezin bikin, mezin bêjin û mezin bandor bikin. Ji ber xeterî ji bo her kesî ye. Li gorî xeterî di asta herî jor de ye, divê li hember wê rabûn jî di asta herî jorîn de be. Yêku vê wisa fêm neke, fêm bike lê li gorî**

**wê nenivîse, nebêje, neke; bi zimanê wêjeyî, bi zimanê leşkerî, bi zimanê rêxistinî, bi zimanê şerker neke, tê wateya ku dîrok winda kiriye. Girêdana wî bi dîrokê re nîne, di nava rojaneyî de yekî tineye. Mîroyeke. Weke zîro bi jiyanê ve dizeliqe û jiyan dike. Ti bandoreke wî nîne û nikare temsîla ti kesayetekê jî bike.**

**Me nirxandineke kurt li ser dîrokê kir. Me bûyera hûnara wêjeyê, li dora diyardeyeke, li dora mînakeke dîrokî çawa bê destgirtin da nîşan.**

**Bilêvkirina vê jî girîngiya xwe heye: Bi giştî huner, bi taybet jî wêje; çalekiya afirandina mirov û bi edeb kirine. Edeb, huner gelek pêwîste, ji ber em hemû xira bûne. Em gelek bê edep hatine hiştin. Yek pêwîstî pir zêde bi wêjeyê heye. Em gelek bi serê xwe hatine hiştin; lewra pêwîstiya me bi huner, li dora gelek şaxên hunerê hatina gel hev heye.**

**Yanî jiyankirina we dikarim bişibênim vê; weke kombûna kavilan, xîzek bêdirûv, rewşeke kaosê ye. Ev tenê ne hunera şerekî ye (şerê herî mezin, niha şerê hunere ye), her kes jî dibêje leşkertî jî hunereke. Ji bo me hunera şer niha hunera herî lêdan û encamgire. Em wê digirin serî. Di serê hemû çalekiyên me de ev heye. Lê heke çalekiyên hunerê nekevin dewrê, wê hunereke siyasî û leşkerî pêş nekeve. Wê çalekiya îdeolojîk û têkoşîna îdeolojîk nemeşe, ji ber aliyê wê jî yê hunerî heye.**

**Hunera wêjeyî çiye, rihê wê diyarkirin û tarîfkirine. Yan jî rih çiye, heye, nîne derxistina holê û xwediyê rih kiye, ji me re rihek çawa pêwîste, hestek çawa, kombûna karektereke çawa ji bo me pêwîste? Ger hûn van baş nezanin, ev kesayet dîsa alozî û dîsa koma xirbeyane. Bivê kesayetê hûn nikarin bibin siyasetmedareke baş, fermandareke baş. Bêguman**

**bêdirûviya mezin ya di nava me de, kirêtî, sedema xwe ji nepêkanîna huner û nefêmkirina wê ye.**

**Huner ne zaniste, ne dîroke jî. Dîrok û zanist, ya di derbasbûyî de heyî bi awayeke rastîbin dinirxîne. Huner bi temamî pêşnûmeyeke, xiyalekê çêdike û li gorî wê hewl dide pêk bîne. Bêguman, girêdana huner bi dîrok û zanistê re heye.**

**Çalekiya afirandinê ye.**

**Karektereke mirov diafirîne. Ev çalekiyên mirovin. Îradeya mirov dana axaftine. Zanist, bi qasî dîrokê; huner jî gelek ji me re pêwîste. Bi taybet jî wêje pêwîste.**

**Wexta em dibêjin divê em çalekiya wêjeyê bêxin meriyetê, rihê me yê nayê naskirin û ji bo xwe divê em ji nû ve biafirînin. Di pêwendiyên mirovê Kurd de pergal nîne. Têkiliyên wan, li hember kirêtiyê ji bo wate dayîna jiyanê digirin dest. Weke leşkerekê, weke yekî xwedî edep,**

**xwedî her çi çalekiyê pirsa hûn çine ji xwe bikin, hûn ê bibînin ku rewşên we dil diêşîne. Ji ber vê huner û wêje girînge.**

**Yên li ser navê Rêbertiyê hewl didin milîtantiyê bikin, ger leşkerên me ne, milîtanên me ne; wê demê Rêbertî çawa difikire, çawa jiyan-şer vesaz dike, wê baldar nêzî van bibin. Yan na wê weke artêşa cahîlan, weke artêşa bêrihan bên bibîranin, ev jî di encamê de ji leşkerê peredar hîn xiraptire. Bêguman di hinekan de ev jî derdikeve holê. Lê di şêwaza me diyar kirî de heke leşkerbûnek, siyasîbûnek û edep bê qezenckirin wê pir baş bibe. Nêzîkatiyên Rêbertiyê evqas sotînerin. Ji ber wê fêrbûn pir pêwîste, edep pir pêwîste.**

**Di me de bi misogerî girêdana dîrok, huner heye, bê wê ev kar nayên meşandin. Em ê milîtanên xwe bi van re pêş bixin. Artêşbûn bi awayeke cuda nikare hêjayî dîrokê kar bike.**

**Pêwîstiya milîtanên me jî pir zêde bivê heye. Yek jî bi awayeke bê rih ev kar qet nayên kirin. Bi kesayetên kirêt re rasterast du gotin nayên kirin, rasterast xitabeke wê, sazûmaniyek rêxistinî û dîsîplîneke mirovî nîne. Ev kesayet wê kîjan şerî bimeşîne? Bi kaosê; nehatina jiyanê, dîsîplîn, leşkertiyê, edebê û xîtabê wê kes vê kesayetê qebûl neke, nekare kar bike. Wê nirxê wê yê pênc qurûşan nebe. Ji ber wê neçare xwe pir dijwar perwerde bike û pêwîste xwe bigihîne asta sûdmendiyê. Bêyî ku ev hebe kes nikare çavê xwe li jiyanê veke. Heke bi sextekarî, dirûtî li ser nirxan bê lîstin, wê weke dizekêbersivê bibîne. Di nava refên me de yêkî newêrek nikare rabe xwe bêar ferz bike. Heke karek ji destê we nayê, erka xwe baş fêm nake dê ji we kesayetê re bê gotin ku "*tu çima hatî.*"**

**Jiyan qezenckirin ne bêderfete, mûmkûne. Heke naxwaze di rewşeke pir rezîl de bimêne, divê bê fêmkirin ku jiyan bi çi mûmkûne. Pêwîste şerê jiyanê li pêşiya her tiştî bê girtin. Ji ber ji derveyî vê em tiştekin. Bi salane dixwazim vê bêjim. Heke di nefêmkirinê de, di pêwîstiyên wê neanîna çî de israr bê kirin, wê bê fêmkirin ku çiqas bê nirxe û bi hêsanî dimire.**

**Hûn milîtanên me nikarin bi wê şêwazê bijîn, nikarin bijîn, nikarin bijîn!**

**Dîqat bikin di dîrokê de her tim mirîne, wisa weke pêşnûmeyên mirov jiyankirinê, ji jiyanê nehesibînin. Heta hozanê me yê herî mezin jî derxistiye holê ku ne hatiye jiyîn. Dijmin jî ji bo me jiyan tine hesibandiye. Em niha şerê jiyanê didin. Beriya her tiştî pêwîste bi cidiyeta vê bê bawerkirin. Dibe ku em weke ku xwe bi dubarebûnek mezin ferz bikin. Me**

**sedemên vê jî hinek danî holê. Bila kar baş bimeşe, dibe ez di carekê de ji holê winda bibim. Lê heke kar bi awayeke rêk û pêk neçe, di riya xwe de nemeşe, weke min her carê gotî, ez wisa bawer dikim ku, heta mirina min, wê ji saxbûna min zêdetir kar bike. Yanî rêyeke din ya vî karî nîne. Yan jî wê mirovahî xilas bibe. Heke xilas bibe, wê demê gotineke bêjim nîne.**

**Lê heke wê bê jiyankirin wê ev jiyan wisa bibe.**

**29 Tebax 1994**

# RAMANÊN JI AGIR

**Em hewl didin ya herî zêde ji bo me pêwîst fêm bikin.**

**Heke qabîliyeta fikirandin û afirandinê pêşnekeve, rewşa kaosê û hemû tiştên ku me qebûl nekirîyên li ser vê derdikevin holê, lê wê ew jiyana bi lenet ku me weke qederekê serê xwe li ber tevandiye bidome. Em hewl didin rê li pêşiya vê bigirin. Pêwîstiya him pir zêde fikirandin, him jî nûbûn afirandinê heye. Gumanên we di asta netewî de, heta di esasên mirovî de zêde negihiştî ne, ger hebe jî we nikariye bibin çareserî. Dîsa di vê wateyê de ferdperestî hûn anîne asta kêr neyên. Di mijarên îdeal de tîpeke ku xwe rake ser piyan pir kême. Ger ji hinekan re bimîne wê her tişt di hewayê cejin û seyranê de bidome. Bi her tiştî razî ne. Ji xwe ji yê tê re dibê "*axayê min, ji yê diçe re dibê paşayê min*" yan jî biwêjên weke "*Xwedê hezar carî ji te razîbe, her tim başim*" heya bêjî rewşa wan baş dide**

**nîşan. Heke em bi temamî berevajî vê bidin raberkirin, kesayeta hema ji her tiştî re dibêje "*belê*" ji zû ve teslîm bûye, serê xwe li hember her tiştî daniye. Kesayetek bê zanebûn her cure serî tewandin pê dane qebûlkirin. Rewşa zêde tê jiyîn eve.**

**Bertek zêde ne bi wate ne. Dikare ev di her tiştî de bê dîtin. Cidiyeta pêwendiyan zêde nîne. Îda, hirs zêde encamgir nîne. Ev hemû me didin fikirandin. Him ji gelek tiştan re razî kirine, him jî bertekên wan heya dawî berevajî kirine. Em ê çi ji van bikin? Wê çi ji xwe bikin? Kesayeta ne serwerê kar, nizanibe çi bike, xwe beşdar neke gelo nirxê wê yê çend qurûşan heye?**

**Her ku ez van vedikim ez xwe li hember rewşên nayên efûkirin re rû bi rû dibînim. Ev jî heya bêjî me tengav dike. Tevî ku nizanin jiyan bikin, weke ku jiyan dikin didin nîşan. Tevî ku nikarin bifikirin, bi şorkirinê dizanin**

**ku difikirin. Vale jiyan dikin, lê weke yê herî tijî jiyan dikin dihesibînin.**

**Ev hemû me hêrs dikin û rewşên nayên efûkirine. Ji pêşketinê re rê venekirin, nebûna hêza komandayê pêşketinan suce; ev di her astê de wisa ye. Ev xususên min bal kişandine ser, ji pirsên siyasî, leşkerî, rêxistinî wêdetir, bi temamî wejeya şoreşgerî û rastiya hunerî ya herî kûr û aliyê wê yê herî zêde ji bo me pêwîst derdixe holê. Divê hinek wisa li vê bê temaşekirin.**

**Niha dema hûn dibêjin em bi "*wêje û hunerê re mijûl dibin*" hin jî hewl didim bifikirim: Ev bi çi re mijûl dibin; gelo di derbarê tişta pê re mijûl dibin wê ji rewşa cahîltiyê xilas bibin? Wê bikaribin cewhera mijarê bigirin? Ji bo gelekê wê cewhera hunera pêwîst, cewhera wêjeyê ferq bikin? Li ser navê wêjeyê, li ser navê hunerê bêteşeyî û kirêtiya herî mezin dikin, di cihê pir pêwîst de yê**

**nepêwîst kirin yan jî li cihê hewcedariya pêwîst, wê bizanibin ji derveyî wê li hember rewşekê bisekinin? Seyre; ji ber em neçarin cidî nêzî her mijarê bibin. Ji xwe jiyan anîne rewşeke neyê naskirin. Heta ne karîkatorê jiyana nû ye jî.**

**İsyaneke mezin li hember qebûlkirina vê jiyanê heye. Yek jî li ser navê çareseriyê feraset zêde nîne. Her kes xwe bi tiştekê ve berdaye diçe. Ya ji me re pêwîst fikir, helwest, rêxistin û rêveberî ye ew jî xwe zêde nade nîşan. Her kes dibêje, "*ez û ez*" lê yêkî tiştekê jî bike nîne. Ev nêzîkatî pir zêdeye.**

**"*Xwebûn, xweperestî*" jî rê li ber ti pêşketinan naveke. Heta pêşketinên heyî jî paş tixe. Ez tevî hemû hewldanên xwe, nikarim xwe jî efû bikim. Lê bifikirin, heta hinek ne xirbene jî; kaoseke, teşqeleyeke.**

**Heta nizanin xwe bênin rewşa kevireke ku li kî derê daynin. Gelekan**

**xwe ji rewşa sitiriyê ku mîdê re diçe, laş re diçe xilas nekiriye. Di vê wateyê de wijdana wan nîne. Di derbarê cewherê mirov de wijdan û pêşketina wijdan li kî derê ye?**

**Kesayetên herî zêde îxanet li xwe kirine. . .**

**Bireve, xwe bixapîne, heya dawî xwe bêxe!**

**Ji bo van sînor nîne. Li hember vê rewşê tevgereke bêje bisekine û tevgereke pêşketinê nîne. Daxwazkarê vê kême. Hirs û hêrs pir kême. Ya rastî ev pirsgirêkên wêjeyîne. Yê dibêje, "*ez di wêje û hunerê de heme*" ev ji xususên ku pêwîste mezin li ser bê bifikirînin. Xweziya nifşeke edebê hebûya; xweziya kesayetên pirsgirêkan dibînin û li gorî wê dibin çareya herî mezin derketiban. Li kî derê!**

**Keseke ku nikare xwe du gavan pêşde bibe û hêz nayîne, ma dikare çi bike?**

**Hûnê bibin milîtanê edebê?**

**Hêza we ji vê re heye? Hemû herî zêde xweperestiya xwe pêş dixin. Xwe têxin nava maskeyeke bi vî rengî û li ser navê gelekî, neteweki tevgerîn ya herî xirabe. Yên bi vî rengî li her derê tijîne. Ya hatî serê we çiye? Yanî, him di nava dîrokê de, him jî di roja me de evqas kemaniyên ku dilê mirov reş dike hene, lê yê xwe li hember wê lêpirsîn dike nîne. Ev tîpê pir bêwijdan û bêberpirsyarî ye. Ev dikarin wêjeya çi bikin; dikarin bi çi edebê re mijûl bibin? Ma ji ev kesayeta evqas xwe dixapînê wê sûd jê çêbibe?**

**Beriya her tiştî di jiyanê de him civakî, him jî weke kesayet ya pêwîst çiye?**

**Çawa bikin?**

**Yêku çend pirsan ji xwe kirî heye? Yê ku bersiva rast ji van pirsan re dayî heye? Na! Hunermendên xwedî edep kîne, li kî derê ne, çi**

**dikin? Yê xwe serok dihesibîne çiqas sextekarî hebe, çiqas xapandin hebe; ev di qadên din de jî (siyasî, leşkerî) pir zêdeye. Li ser navê netewî yên dibêjin; "*min ji xwe re cihek dît, xwedî berpirsyarî û zanyarî me, daxwaza min ya di xetê de meşîn û pêşengtî kirinê heye*", her carê xwe mezin bikin bejin; "*ez û her tişt ji bo min*", li wir ji wan zêdetir pirsgirêkek ku hîn mezintirîn bê çareserkirin nîne. Ez bawerim,ji bilî pirsgirêka van kesayetan bixwe ti pirsgirêkek din nîne. Behreyên xwe li ser navê netew, li ser navê civakê bikar nayînin. Bi awayeke zanistî li ser Kurdeyatiyê nasekinin. Civakbûn, gelparêzî ji mirov çi dixwaze, yê li ser vê disekine, difikire jî nîne. Demagog derewkerin. Encam çiye? Karek rast heye, nîne, kesayetên ji xwe re nakin pirsgirêkin. Ev kesayet li ser navê edepê bêedebên herî mezinin.**

**Li vir jî heya bêjî xebatên dijmin zêdene. Me xwest çend tiştan bêjin û bikin. Me evqas rastî anin ziman, lê ez ji kî re dibêjim? Tu çi dikî? Ma kes dikare ev barê evqas giran rake? Kesên bibin hêz, bikarin bar rakin hene? Bixwe hene, lê dema temaşeyî dikî weke "*giyanên mirî*" tên aqilê mirovan.**

**Di hemû qadên civakî û netewî de ji mirov milîtantî dixwaze, mêrxasî dixwaze.**

**Heke mêrxasî nebe hêza te ya tu pirsekê tenê jî bikî çênabe. Qala mêrxaziyê dikî, hemû dikevin, hemû ji vê direvin. Nabe bi derewan li ser meseleyên mezin bê sekinandin.**

**Nabe em li ser navê gel, li ser navê netew û li ser navê siyasetê hevdu bixapînin. Dema qala xususên bingehîn tê kirin temaşeyî dikî ku, mejiyê wê sekiniye û tine bûye. Hêz jê re nayîne. Kesayetên hatine lîstikê û hatine xapandin ji bo me nebaşin.**

**Rast yan jî cewaztir dixwazin hinek tiştan bikin. Ev jî hêz û fikrê mezin dixwaze. Di vê eniyê de mirov mezin difikire, ma dibe fedakareke mezin? Ma kesên bikaribe pêngavên wisa bikin hene?**

**Di nêvengek wisa her kes her timêrîşî hev dike, hev biçûk dixe, dijminê hev, ji bo serkeftineke mezin ji yekbûnê direve, lê her kes bi serê xwe tiştekê dike de, li ser navê gel tevnegerîn helwesteke nayê qebûlkirine.**

**Edeba Kurd di çi rewşê de ye?**

**Kesayeta pirsgirêka wê giran di çi halî de ye?**

**Wê alîkarî pê re çawa bê kirin? Di vê qadê de em dikarin ji bo wê çi bikin?**

**Gelek kar heye; em li ser vê sekinîn, me hinek tişt got. We ji van axaftinan çi encam derxist?**

**Ji xwe riheke we xwe gihandiyê nîne. Beriya her tiştî, em di çi rewşê de ne?**

**Ji bo me tişta pêwîst çiye?**

**Em ê xwe çawa nasbikin?**

**Em ê bikaribin ji bo xwe bixebitin?**

**Em dikarin ser gotineke diyar bisekinin?**

**Em dikarin biryareke diyar bigirin?**

**Em dikarin li ser civak, qada netewî, heta huner, wêje bigihin hinek biryaran?**

**Pirsgirêka bingehîn çiye?**

**Pirsgirêka wêjeyê ya bingehîn çiye?**

**Rista huner ya di şoreşê de çiye?**

**Xwediyê wê kiye?**

**Tu yên li vî alî kar dikin temaşe dikî, gelek ji wan mîna kontragerîla ne. Yanî heke di nav gerîla de ji dijmin zêdetir kontratiyekê dike, li ser navê siyaset û dîplomasiyê jî vê dike, di**

**qada huner û wêjeyê de jî ev wisa ye. Huner û wêjeya dijmin didin meşandin.**

**Dîrokê naxin xizmeta şoreşê. Ji ber wê ne di hêza wêjeyê bikin de ne. Ji bo azadiya netew, berjewendiyên wê neçare ev xizmet bê kirin. Heke ev xizmet nebe, mirov nikare nêzî wêjeyê bibe. Kurdeyatiya li pêşiya me, bi vê rewşa xwe ve me pir tengav dike. Di serî de, ji zarok bigire heya mezinê wê, ji jin heya gundiyan û heya şivanan li ser kê bi çi şêweyî bisekinî kî çawa bikişînî sazûmanî? Heya îro kî hatiye pehînek lê daye; weke lê daye belav jî kiriye. Em ê hemûyan çawa kom bikin?**

**Mejiyê wê/î parçe parçe bûye, dilê wî/ê parçe parçe bûye, di hûndir de tiştek nemaye, ziman nemaye û ji dînan xiraptir kiriye. Ji xwe dibêjin; "*yên miletên dîn*. "**

**Nizanin hev guhdar bikin, dilên xwe nakin yek û nikarin çend**

**pirsgirêkan ji hev re bêjin. Tu yê Kurdeyatiyeke wisa li ser çi biteşe bikî? Kurdeyatiyeke wisa, bela serîne. Tu yê wisa çawa edep bigirî, çawa bibî siyasetmedar? Piştî te derdê xwe nasnekir, tu yê çawa tedawî bikî? Ma ez tena bi serê xwe dikarim çi bikim? Hezar carî meseleyê vedikim, lê yekî bizanibe li ser bisekine nîne. Hezar carî soz dide, lê ser pirsgirêkekî de naçe.**

**Wiha, Kurdeyatiyek evqas hatiye xistin, di warê siyasî-leşkerî de pir, di warê wêjeyî de dikarî pêşbikeve. Lê hûn ji heqê vê jî nayên der. Em pirsgirêkan dernaxin, herî zêde ji bo hinek rastiya çareser bikin hinek tiştan dibêjin. Ji bo hinek rastiyan bibînin dibêjin. Wisa yeknesan û bi awayeke ji rêzê li ser pirsgirêkên giran û mezin nayê sekinandin. Em xwe nexapînin.**

**Yên li ser navê gel diaxivin, mezin û di cî de diaxivin.**

**Êdî ji revokî û xapandinê re bese! Bila mirov pirsekê bike ku, bibe bedelê temenekê. Li ser vê dikare çi bê kirin? Divê mirov kesayeta xwe ji bo vê amade bike.**

**Bila kesayeteke mirov hebe ku, bikaribe tiştnan ser bixe.**

**Yekî ku di kesayetê de evqas hatiye xistin, xwe birêxistin neke, îdare neke, neyê dîsîplînê, ma dikare li ser navê gelan çi bêje? Ji bo qedera gelan û berjewendiyên mirovan ma dikare li kî derê çi bêje? Bixwe weke miriyane û di saha wêjeyê de bûye bela. Ev nebaşin, heyf û şerme. Em ji pirsgirêkan narevin; bi temamî di xizmeta mirovahiyê de ne. Li ser navê hevaltiyê, li ser navê şer, li ser navê çi xebatê dibe bila bibe, em jî herî kêm li hemberî xwe yekî pirsgirêkekê çareser bike dixwazin. Hûn di bin tesîra dijmin de hatine vê rewşê. Yanî yê herî zêde ketine bin xizmeta dijmin emin, ji niha şûnde vê xizmetê**

**bisekinînin. Heya vê demê ev wisa dimeşiya, lê êdî bes e! Me ji bo dijmin çi kiribe, êdî bese! Çima em şaşiyê weke ku raste erê bikin? Heke nabe çawa dikarin bêjin dibe?**

**Divê di mirov de wijdan hebe. Heke ev nebe wêje nayê kirin. Yê ku wijdana wê nebe, baldar nêzî hesasiyetê nebe nikare hunerê bike û bimeşîne. Ji xwe siyaset û leşkertiyê qet nikare bimeşîne.**

**Yê ku pêwîstiya wê heye bila bên alîkarî bixwazin. Ez di xizmeta hemûyan de me. Yekî wisa bi aqil ku bê alîkarî jî bixwaze nîne. Ne di hêza kirina vê de ne. Dibêjin; "*em Kurdê kevnin, em mirîne*. " Ya ji min dixwazin eve. Şermeke mezine, heyf. Mirov li hember kirêtiyên wisa nikare xwe hîn xirabtir bike.**

**Mêrxasî çiye?**

**Mêrxasî bi rastiyê re bûyîne, bûna xwedî rastiyê ye. Di cihek de pênûs, di cihekê de gotin, di cihekêde**

**bi şûr ve sekînin û meşandine. Ev ji bo me hemûyan pêwîste.**

**Hûn jiyaneke pir erzan û bê armanc jiyan dikin. Yê vê ji xwe re neke xem û bê berpirsyariyek mezin jiyîna we ji destê we diçe, heyfe. Heke derfetên min hebûya minê ji we hemûyan re jiyan daba. Ez bi mezinbûna mirov re eleqedar dibim; ji bo mirovahî mezin bikim dixebitim. Her wiha bila kes ji me jiyana wisa sexte û erzan nexwaze; mûmkûn nîne wisa bikim. Divê mirovek mezinbûna xwe bizane û bikaribe bigihe biryarên mezin. Bi awayeke din em hevdu efû nakin. Yanî di vî alî de yê min bi temamî kareke hunerî ye.**

**Ma heke hûn gihabûna riheke mezin, bûban xwedî gavên mezin, pirsên mezin ji xwe kiriba, nebûna xwedî şermî, lewazî û bibûna xwedî xweşikiyan, wê çi bûba? Ev di kî ji we re heye! Rewşa ku hûn di nav de bênin ber çavê xwe. Ez ji hemû**

**hevalan re dibêjim: Yanî rewşa hûn tê de jiyan dikin çiye? Hûn weke miriyanin. Hûn di rewşeke ku ji hemû aliyan ve dijmin li ser we hesaban bikin de ne. Di we de kesayet û zirûfê hûn dijmin bitirsînin heye?**

**Ma xweşikbûna çend mirov bipejirînin heye ku mirov nirx bide we?**

**Hûn xwe li ber çav digirin? Hûn xwe nas dikin?**

**Ma dengeke we ku wijdana we bandor dike heye?**

**Di jiyanê de hinek bi qasî ji cixareyekî bandor dibe, bi qasî têr dibe ji tiştek din bandor nabin.**

**Yanî hene, nîne, nediyare.**

**Jiyan ji bo çiye, ne ji bo çiye? Ma vê difikirin? Ew jî nîne. Ya rastî wêje, xwe afirandine.**

**Kes nabêje "*ka hinekê rakim, hinekê li ser navê heskirinê derkevim holê tiştnan bikim.* " Ev Kurdeyatiya kevne, ger em bihêlin, wê bi tinebûnê**

**re rû bi rû bimînin. Gotina "*em hevdu ber bi tinebûnê ve bibin, hevdu rezîl bikin ve*" nayê qebûlkirin.**

**Jiyan bi erzanî nayê meşandin.**

**Ez tiştên ne di cî de erê nakim. Mirîne, xwe didin xeniqandin; dixwazin min jî bixeniqînin. Xwe anîne rewşa bêhêz û bêçare. Bi ser min de tên bi min jî didin peytandin. Heke tu xwedî şûr bî, xwedî şer bî û vê bi xwe re bikî yek, tu yê veguherî jiyanê.**

**Yê ku nezane xwe biguherîne, nikare siyasetê jî ser bixe û nikare malavaniyê ji hunerê re bike. Yê ne hunermend be, nikare bibe xwedî hêza meşandina hunera leşkerî û siyasî.**

**Huner çiye?**

**Edep çiye?**

**Hevalek van pirsan ji xwe nake. Heke tiştek nebûbe, nikarî bêjî "*bûye*. " Bêyî tiştek vebe, nikarî bêjî "*min vekir*. " Ji ya ber bi tinebûnê ve diçe**

**re, nikarî bêjî "*hebûna xwe dimeşîne.*" Di min de ezmûna bingehîn eve. Çima ev berevajiyê her tiştî dibêjin?**

**Nînin, dibêjin "*em hene*."**

**Nekirine dibêjin, "*me kiriye.*"**

**Ketine, dibêjin "*me zafer qezenc kiriye.*"**

**Mirîne dibêjin, "*em jiyan dikin.*"**

**Ev kes bi vî rengîne. Vê meyzandinê vê felsefê û îdeolojiya mirinê biterikînin. Hevdu nadin guhertin; ji ber di warê civakî de pir ketîne. Ji xwe siyasetê têkil vê nakim; ji ber ji siyasetê gelek dûrin.**

**Ev meseleyên mezinin. Divê li ser van bê sekinandin. Divê hunermend, wêjevan, siyasî-leşkerî li ser vê bisekine.**

**Ji bo gelan li jiyan û axiftinên ustayên mezin temaşe bikin: Hinek alî feryad-fixanin. Bangawaziyên pir mezinin, hêzeke dareseyîne û heskirinên mezinin. Tu li yên me temaşe dikî, mirîne. Heta bi tiştên**

**dikin re dawiya gelekê tê. Rondikek tenê jî naherike, dilê wan naşewite. Nabin bangekek. Di ser de jî dibêje, "*ez wêjevanim, niza çime.* " Ya rastî mirovahî xilas dibe, dîrok xilas dibe; lê ew xwe dixapîne.**

**Mêrxasî çiye?**

**Gotinek di cî de, xwedî erkek û bûna şûrekê ye.**

**Gelek tişt hene ku, we bibe îflasê; van ji ser xwe bavêjin. Gelek tişt hene ku, pêşketinan gelekî neçar dike. We hê hevnasnekiriye. Bi lezgînî bigihin vê.**

**Min xwest çend tiştên bi vî rengî bikim. Hemû pêşketin girêdayî hevin. Heke li gel we hêz, derfet hebe başe. Min xwe bi we da nasîn: Em çine, ne çi ne? Li ser navê Kurdeyatiyê tiştên nerast negotin, şarteke min ya misogere. Bi misogerî mirovan naxapînim û fersenda yek min bixapîne jî nadim. Ev, ji roja jiyana**

**min ya destpêkê heya niha xeta min esas girtiye.**

**Mirovê mezin û yên biçûk yekin, li gorî min cudahiya wan nîne.**

**Li gorî min hemû kesê ku mirove duriste. Hemû mirov dikarin di riya rast de xebat bimeşîne. Beriya her tiştî meyzandineke rast û şêwazeke rast pêwîste. Kî xwe wisa amade bike wê ew bigihe serkeftinê.**

**Ez miroveke azadim.**

**Gel jî, navê "*serokatî* "li me kiriye. Dibe ku tiştên bê sînor jî dibêjim, lê dîsa hûn dikarin li ser bisekinin. Em li ser navê gel mezin diaxivin. Divê hûn jî baxivin, bêyî ku mirov baxive nabe. Ji we hemûyan zêdetir di ciheke teng de me. Lê gelek kar ji destê min tê. Dibêjim heke bê xwestin ez ê li ser navê hevaltî û dostaniyê heya dawî alîkarî bikim. Ji bo me "*nasnakin*" gelek tiştgotin. Ji xwe erê nakim; hinek cilên sexte li xwe dikin. Dibêjin; "*em***

***bûn zilamên wisa mezin.* " Yên bi vî rengî bibin paşa jî, nirxê wan yê pênc qurûşan jî nîne. Li hember dirûtiyê gelek hesasim, tawîz nadim. Ez guh nadim gotinên weke "*tu mezinî, tu biçûkî, tu wisayî, welêyî.* " Lê ji bo rastiyan zarokek jî be rêza min ji wê re heye.**

**Ez lîstikan nas nakim, hêza kesî tine ye min bi nêzîkatiyên erzan bixapîne.**

**Heke hatibam xapandin, wê dijminê min ê mezin ez xapandibam.**

**Kes nikare li ser min bandor bike. Di warê şaşî û kerêtiyê de kes nikare tiştekê bike. Dibe ku li ser navê wêje û hunerê zêde tiştekê nebêjim, lê ez dikarim cewherê wê bipeytînim, temsîl bikim. Vê jî baş dizanim; ji bo we sûdmende.**

**Bi misogerî ez kerêtiyê, sextekartiyê qebûl nakim.**

**Ji berê ve wisanim.**

**Di hêza bersivên bihêz bidim de me. Heya ji destê min jî hat ez ê xizmetê bikim. Ev tiştên me kirine hûn jî fêm bikin.**

**Heya dawiyê rastî ferz bikin. Li ser ew pirtûkên hûn dixwînin lêhûrbûn nekin, ji ber ew pirtûk ji sedî not derewin, wan hemûyan biqetînin.**

**Xwe binasin.**

**Pirtûka herî mezin jî hûnin, mirovên we ne.**

**Hûn dikarin kesayet û rastiya me bixwînin. Ev bi serê xwe berdêla hezar pirtûka ye. Kesayeta yekî ku xwe li hember dijmin mezin dike dibe pirtûkek. Dîsa lewaziyên xwe binasin, ev jî yek pirtûke. Cahîltiya xwe binasin, ev jî yek pirtûke. Ev pirtûk ji bo we pêwîstin.**

**Te xwendiye, tu bitenê hatî hiştin; te xwendiye, tu kirine zimandirêj; te xwendiye tu ji hêz hatî xistin.**

**Diyare ev pirtûkên te xwendine dijminê te ne.**

**Kî te daye xwendin?**

**Tabî dijmin.**

**Ev tiştên me gotine rastin. Heke hûn di xususên mingehîn de lêhûrbûn çênekin, wê her tişt bibe xapînokî û hûn ê ferq nekin ku derewe. Wêje jî eve, dîrok jî eve. Heya dawî bi van xebatan re bin. Ev xebat karê mêrxazane. Karên netewî tenê neyên zarok û ciwanane, peywireke we ya bingehîne jî.**

**Karê nivîskar ji silehê biçûktir, hêsantir nîne. Heke di cî de bê nirxandin, di vir de jî rêbertî ne biçûke.**

**Ma tiştek hûn di vê gotibêjê de ji me bixwazin yan jî bêjin heye? Heya henaseyên xwe yên dawî tiştên di cî de bêjin. We çawa nas dikin, rastiya we çiye? Heke derfeta we hebe, hûn dikarin ji hinek tiştan re hêz bênin û bikin. Heke hûn tenê di zanebûna vê**

**de bin bese. Heta hûn dijminahî jî bikin di cih de bikin. Bi derewan nabe. Heke hûn dostaniyê jî bikin di cî de bikin. Tiştên hûn dikin hûn ê disa li xwe bikin.**

**Ez ji mirovê nexweş, yê ketî û yê bi pirsên erzan re mijûl dibe nefret dikim. Hevalê min, çavê min jî be, nefret dikim.**

**Dijmin jî be, bila rast li min bide, ne xema mine. Yek li ser navê dijmin bike tişt nabe, lê heke li ser navê dostaniyê zerarê bide, yê herî xirap ew e. Hîn zêdetir em dikarin çawa bi we re bibin alîkar?**

**Îsmet Şerîf Vanli: Ev tişteke nû ye, fikreke raste. Ez di wê baweriyê de me ku em nêzî qonaxa serkeftinêne û em ê bigihin armanca xwe. Divê em weke hizirmend û zanyarên Kurd ji bo dîrokê rastiyan vekin. Ji ber dîroka me ji dîroka Tirk û Ereban hîn kevintir û mezintire. Em dikarin di derbarê dîroka xwe de**

rastiyan deynin holê û ev pêwîste. Çêbûna gelê Kurd, di dema destpêka medeniyet û şaristanî pêşkeftî de teqebûl dike. Ya rastî peywira me mezine. Divê ji niha şûnde li Ewrûpa pêşketinên mezin li ser rastiya Kurdistanê derbixin holê. Ji hêla din ve edeb û jidilbûn, yanî fikir, raman û kevneşopiya gelê Kurd hatiye talankirin. Ji Tirk, Ereb û Eceman re xizmet kiriye.

**Abdulah Ocalan:** Niha ew bêedebiya herî mezine, ew ne edebe. Me li vir got; ev xwe mehf kirine.

**Îsmet Şerîf Vanli:** Niha divê nivîskarên Kurd bi Kurdî binivîsînin. Divê di xizmeta gelê Kurd de wêje û çand pêş bixin. Ev tişteke nû ye.

**Abdulah Ocalan:** Di vê civînê de me çi bidest xist? Ji bo wêjeyê çi derdikeve holê, ya hat îsbatkirin çibû?

**Îsmet Şerîf Vanli:** Ji bo wêjeyê bawer dikim ku kesayeteke nû ya

**Kurd ava dibe. Mirovê nû yê Kurd tê afirandin.**

**Abdulah Ocalan: Wiha, divê hûn li ser vê bisekinin. Erê, mirovê nû tê afirandin.**

**Îsmet Şerîf Vanli: Divê nivîskarên Kurd li ser têkoşîna Kurdistanê û şerê wê binivîsin. Mînak heya niha romana wê derneketiye, gelek qehremanên Kurdistanê hene. Jiyana xwe ji dest dan. Gelek dayîk, du-sê zarokên xwe winda kirine; ji bo rizgariya Kurdistanê. Yanî hinek kêmanî hene, lê niha jiyaneke nû û hilperînek heye. Bangî hemû nivîskaran dikim ku têbikoşin...**

**Abdulah Ocalan: We ji vir gelek tişt girt? Di vê civînê de tişta herî bingehîn we girtî çibû?**

**Îsmet Şerîf Vanli: Weke tiştên bingehîn, heke tu rewşenbîr bî, tu di riya gel de bibî yek û ez riya gel dibînim.**

**Abdulah Ocalan: Anîna bahev; we pêwîstiya vê dît, ne wisa? Beriya niha hûn ji gel gelekî dûr bûn. Niha hûn pêwîstiya gihiştina gel dibînin. Hûn ketin riya gel. Riya PKK'ê riya gel e. Riya renşenbîran jî, riya gel e.**

**Îsmet Şerîf Vanli: Ev raste; bingehîn û di cî de ye.**

**Abdulah Ocalan: Divê hûn jî biçin gel. Xwe ji kariyera xwe ya şexsî bidin paş. Tenezilê gel bikin. Mezinbûn jî di gel de ye. Vê xweperest û fertperestiya xwe berdin. Tu rewşenbîran dizanî; di wan de ferdperestî û xweperestî bihêze. Yanî heke nekevin riya gel...**

**Îsmet Şerîf Vanli: Raste, PKK rêxistineke rewşenbîrane. Di têkiliyên xwe de her tim rê dide nîşan, ji ber wê divê rê şanî rewşenbîran bike.**

**Abdulah Ocalan: Raste, ji bo kesîma rewşenbîr riya gel pêwîste. We van tiştan dît.**

**İsmet Şerîf Vanli: Divê rewşenbîr serbest bên berdan.**

**Abdulah Ocalan: Heya dawî serbest bin. Lê bê xet, bê dîrok nemînin.**

**İsmet Şerîf Vanli: Kesayeteke mezin PKK'ê temsîl dike. Fikrên we pir fereh û nûjenin. Ne doxmatîk û hêsanin.**

**Abdulah Ocalan: Hinek ji bo me dibêjin ortadoks û doxmatîk. Derewe, hemû tiştê me vekiriye. Her tişt bixwe hatiye afirandin û ked hatiye dayîn. Bila rewşenbîr vê rastiyê bizanin. Ew doxmatîkin û wisa dizanin ku em di bin bandora her çi îdeolojiyê de ne. Wisa difikirin ku em di rewşeke wisa de ne nikarin henase bigirin. Hemû derewin. Herî zêde yên di bin doxmatîzma hineke din de ne, ew rewşenbîr bixwe ne.**

**İsmet Şerîf Vanli: Ji bo me ya herî baş divê em îdeolojiyekê qebûl bikin.**

**Abdulah Ocalan: Me îdeolojiya dijmin ya li ser me bi bandore qetand. Dema îdeolojî û hêza dijmin diqete, ji we re jî fersend çêdibe.**

**Îsmet Şerîf Vanli: Tabî, ez kesayeta gelê Kurd baş dizanim.**

**Abdulah Ocalan: Divê kesayeta we hemûyan gelparêz be. Hûn jî xwe ji cîhanê bihesibînin; ji xwe pêwîstî bi gotinê nîne. Biçin ba gel. Bibin dostê gel. Ez çima van dibêjim? Ji bo hûn tiştekê bidin gel. Heke yek gel nasneke, nebîne; ne mûmkûne netew, dîrok û wêjeyê bibîne. Yanî yê bingehê netew, dîrok û wêjeyê avêtiye gel bixwe ye.**

**Di nav de bijîn. Ji nêz ve êşên wê bibînin, derdê wan guhdar bikin. Wexta min destpêkê dest bi siyasetê kir ez du-sê roj li mal, gel malbata xwe dimam dibeecîm. Min ketîbûna gundiyan didît û ez bi pêwîstiya pêşxistina şer bawer bûm.  Ji bo we jî wisa ye.**

**Heke hûn dûrî gel bimînin, hûn nikarin wêjeyê bikin.**

**Heke hûn xwe ji pirsgirêkên gel dûr bihêlin, nikarin bibin xwedî riheke mezin. Di vê mijarê de rewşenbîran xwe xistine rewşeke nebaş. Xwe ji vê rewşê derxînin.**

**Îsmet Şerîf Vanli: Raste, min dît. . .**

**Abdulah Ocalan: Me we bi gel re anî ba hev; me rewşa gel şanî da.**

**Îsmet Şerîf Vanli: Ya rastî ev car, ji bo me pir baş bû.**

**Abdulah Ocalan: Sefereke dîrokiye; hûn çend kes meşiyan, lê ev meş meşa hemû rewşenbîra tê hesibandin.**

**Îsmet Şerîf Vanli: Belê bandora wê gelek çêbû. Encama yekem; ev zanistî bi xwe ye. Ya duwem; xebata me ji bo mezinbûn û bilindbûna gelê me ye. Ya sêyem; xebatên li Almanya, Fransa û gelek welatên din yên Ewrûpa xistine bin bandora xwe.**

**Abdulah Ocalan: Bangawaziyekê bikin; bila dengê we jî derbikeve.**

**Îsmet ŞerÎf Vanli: belê.**

**Abdulah Ocalan: Hûn ewqas pê re mijûl bûn, ewqas xwend, bila ev tiştên we kirî bikeve bin xizmeta gel ku, nirxeke wê çêbe.**

**Îsmet Şerîf Vanli: Tişta we gotî pir raste.**

**Abdulah Ocalan: Na, çima bi tenê bimînin? Çima ji gel cuda bisekinin, çi feyda wê heye? Çima em li qunçikekê weke miriyekê bisekinin?**

**Îsmet Şerîf Vanli: Yê xwedî zanebûn be lê ne di xizmeta gelê xwe de be, bêşerefe.**

**Abdulah Ocalan: Tabî bêşerefe. Biqasî te xizmet ji gelê xwe re kirî wê nirx ji te re bê dayîn. Xilasiya te ya şexsî di xilasiya gel de ye.**

**Îsmet Şerîf Vanli: Yê ku dewlet û hêza wê nebe ti nirxeke wê nabe. Ji ber heya niha dewleta Kurdan**

**nebûye, li cihek din jî ti nirxeke wê nebûye.**

**Abdulah Ocalan: Raste. Çima heya niha ti nirxeke rewşenbîran nîne? Ji ber deng û hêza gel nîne. Ji bo niha gel heye nirxê we jî heye.**

**Îsmet Şerîf Vanli: 45 sale li Îsviçre jiyan dikim. Hemwelatiyê Îsviçre me û nasnameya wir radikim, lê rihê min Kurde.**

**Abdulah Ocalan: Tu li wir winda bûyî.**

**Îsmet Şerîf Vanli: Rihê min Kurde. Dilê min dişewite. Heke dewleteke Kurd hebûya, wê serê min bilind bûya. Divê armanca me hemûyan di vê hêlê de be.**

**Abdulah Ocalan: Dereng jî be bikevin riya gel. Yanî li aliyekê mirî nebin. Xwe bigihînin giyana gel. Yek jî dilnizm bin. Hûn ji bo gel çiqas zêde bikin hûn ê ewqas mezin bibin. Vê ji bo xwe weke giraniyekê bide hîskirin. Hûn vê giraniyê çiqas rakin hûn ê**

**ewqas mezin bibin. Ez ê jî xizmet ji we re bikim. Bila gel bibîne ku hûn di xizmeta wan de ne; wê demê hûn ê mezin bibin. Bi qasî te gelê xwe mezin kir, tu yê xwe jî mezin bikî. Ancex wê demê dikarî hinek tiştan îsbat bikî. Mezinbûna min çawa dibe? Bi rakirina gel re çêdibe. Heke me partiyê hinekê nemeşandiba, me gel nerakiriba ser piyan, ma derketina me mûmkûn bû? Ev ji bo we jî pîvaneke. Heke bi xizmeta te kirî re tu xwe di nav gel de bidî qebûlkirin, tê wateya tu meziní. Ji derveyî vê pîvaneke din yê mirov nîne, nabe jî. Ez vê dizanim.**

**Ez tiştek ji te bipirsim: Te heya niha çend kesan bandor kiriye? Di nav partî de jî vê dipirsim. Yên dibêjin "*em wisa bihêzin, welê bihêzim*" gelo karîne kesî biafirînin?**

**Îsmet Şerîf Vanli: Rewşenbîrên li Ewrûpa niha hinek xebatên berbiçav dikin û ber bi rêxistineke ber bi çav ve diçin. 45 sale ez dixebitim, yanî**

**kevnim, lê min heya niha serdemeke wisa nedîtiye.**

**Abdulah Ocalan: Niha em di serdemeke nû de ne. Nûbûneke mezin tê jiyîn. Tu bi xwe jî weke ciwaneke 15 salî ji nû ve zindî bûyî. Te di dawiya temenê xwe de dest bi jiyaneke nû kiriye.**

**Îsmet Şerîf Vanli: Ez ê heya temenê xwe yê dawî bixebitim.**

**Abdulah Ocalan: Tabî tabî. Tu dikarî mîna ciwanekê bixebitî.**

**Îsmet Şerîf Vanli: Ez di çi temenî de bim bila bibim, nikarim li hember pirsgirêka Kurdistanê bêeleqe bimînim.**

**Abdulah Ocalan: Piştî temenê 45 sal şûnde, divê mirov vale nemîne. Bi taybet vê pêngavê di xwe de destpê bike. Ji bo gavên bi vî rengî bi ezmûnên xwe yên mezin ve ber bi pêş ve pêngavekê bike. Bi vî rengî tu yê bigihî armanca xwe. Weke min di destpêkê de jî gotî ji gel cuda**

**nemînin. Mirov dikare bi vî rengî xebatên dîplomasiyê jî bike. Tu dikarî bi hemû rewşenbîran re eleqedar bibî, berpirsyar be, pêşengtî bike. Em di xizmeta we de ne, lê hevgirtî bibin. Bila pirsgirêkên te û gavên te ne vale bin.**

**İsmet Şerîf Vanli: Ez ê bikim.**

**Abdulah Ocalan: Cuda dikarin çi baxwazin? Hûn jiyana şexsî dixwazin? Na. Pere dixwazin? Na. Nirxê tiştên bi vî rengî nîne.**

**İsmet Şerîf Vanli: Ev ji bo me feraseteke girînge.**

**Abdulah Ocalan: Divê rihê te, di serkeftina gel de be, divê li wir têr bibe. Heke darbeyek li dijmin bidî, gavek başde bixî, wê demê dikarî bêjî "*min mêrxasiyek kir*. " Jiyaneke din jî qebûl nekin. Her tim bibin şopdar. Temaşe kin, heke kêmaniyek hebe derbas bikin. Te nêrî rast nameşe, bi rêbazeke din li ser bisekine. Bi misogerî her roja jiyan dikî bila ji**

**dijmin re bibe darbe. Bi tirsandinê darbe lêde, bi pêşengtî darbe lêxe. Heke hûn jiyana xwe wisa bi rêk û pêk bikin, hûn ê li hember dijmin bibin sîleheke mezin. Hêvî dikim ku hûn ê bikin.**

**İsmet Şerîf Vanli: Em ê bi hev re bikin.**

**Abdulah Ocalan: Xwe bi biryar bikin. Giyan nû bû, gelek tişt ronî bûn, gelek tişt asanbûye, wê ji niha şûnde baş bibe, ne wisa?**

**İsmet Şerîf Vanli: Belê, wê pir baş bibe.**

**Abdulah Ocalan: Di derbarê hevalan de dixwazî tiştekê bêjî?**

**İsmet Şerîf Vanli: Di derbarê hevalan de?**

**Abdulah Ocalan: Tu dikarî ji bo hevalan soz bidî. Soza dawî dikare baş bê dayîn.**

**İsmet Şerîf Vanli: Ez gelek şanazî raber dikim; ev, ji bo Kurdan jiyaneke nû ye. Keç û xort bi hev re, bi**

**awayeke wekhev digihin û mezin dibin. Em di riya birayê serok Abdulah Ocalan de şer dikin. Ji ber wê şanaziya xwe raber dikim. Ev fikreke nû ye, dîsîplîne û di şopa rêyeke nû de ye. Em bi hev re di têkoşîna rizgarî û serxwebûna Kurdistanê de şer dikin, pêşve diçin. Ev ji bo min bûyereke nû ye.**

**Min tişteke nû dît: Hûn tenê ji bo serxwebûna Kurdistanê şer nakin. Herî zêde serfiraziya gelê Kurdistanê parastin, edaleta civaka Kurdistanê derxistina holê, çanda Kurdan pêşxistin, yanî bi hemû aliyên wêje, huner, siyasî-leşkerî û aborî ve têkoşînê didin meşandin. Hemû girêdayî hevin. Em rewşenbîr her çiqas ne endamê siyasî, leşkerî yan jî partiye bin, riya me yeke. Yên dibêjin em serxwebûna xwe ya siyasî, leşkerî, çandî û aborî dixwazin, dîsa yên rê didin nîşan jî di nav de riya hemûyan yeke. Em temen mezin yan**

**jî ciwan, karker yan jî rewşenbîr jî bin riya me yeke. Divê em berxwedaniyeke wisa raber bikin ku, hemû hêza dewleta Tirk nikaribe vê tevgerê biçewsîne. Zemîneke wisa fireh wê tu hêz pê nikaribe. Ez bi vê bawerim. Hûn hemû ji me re dibin binheha hêza moraleke mezin.**

**Abdulah Ocalan: Ez nabêjim ev serdan, di dawiya temênê te de, ji ber ji bo te bû destpêkirina jiyaneke nû.**

**Îsmet Şerîf Vanli: Qonaxeke nû ye.**

**Abdulah Ocalan: Tu gelek bi moralî.**

**Îsmet Şerîf Vanli: Bawer dikim, weke birayê min Serok jî gotî, ev di jiyana me de qonaxeke nû ye; ji bo rizgariya me qonaxeke nû ye.**

**Abdulah Ocalan: Min jî navê we ji berê ve bihîstibû. Wê demê ez xwendevaneke Kurd bûm. Me nû dest avêtibû pirsgirêka Kurd, me we bihîstibû. Me jî pir tişt kir û niha jî li**

**vir gihiştin hev. Ji niha şûn ve jî em ê mezintir bimeşînin. Bi berpirsyariyeke giran re, bi zanebûneke di cî de em li vir gihiştin avabûneke nû, me yekbûn çêkir. Weke yekîtiya netewî, yekîtiya azadiyê.**

**Îsmet Şerîf Vanli: Ez bawerim, êdî em dikarin bandoreke mezin bidin çêkirin. Weke rewşenbîran em dikarin di parçeyên din de jî bandorker bin.**

**Abdulah Ocalan: Tabî xebat bikin. Ev roj ne rojên vale sekinandinê ne. Roj; ji bo tayînkirina çarenûsa xwe rojek ji hezar salî carek bê bidestxistine. Roj; roja berjewendiyên xwe naskirinê ye. Hûn di kesayeta xwe de çiqas tiştên nû biafirînin, hûn ê bibînin ku, gel ewqas li dora we kom dibe. Ji derveyî vê çare nîne.**

**Îsmet Şerîf Vanli: Raste, çareke din nîne. Em dikarin ji we re vê bêjin ku, Kurdên di welatên xerîb de jiyan dikin, çi karkerê wê, çi jî rewşenbîrê wê, em ê bi hemûyan re bibin yek.**

**Yanî hûn ji me re dibin hêviyek mezin. Li gorî qinyata min, em ê bigihin armanca xwe.**

**Abdulah Ocalan: Bi wêrek bin. Tu di xwe de vê wêrekiyê bide nîşan. Xwe bîne rewşa mêrxazekî.**

**Îsmet Şerîf Vanli: Divê cesaret bingeh bê girtin.**

**Abdulah Ocalan: Tu weke kes nikarî zêde rol bilîzî. Tu çiqas bikevî bin xizmeta gel, tu yê kesayeta xwe ewqas mezin bikî. Riya mezinbûnê tenê eve. Te çiqas di xizmeta gel de bî, ji bo netew çiqas gavên mezin avêtibe, tu yê ewqas mezin bibî. Feraset û nêzîkatiyên me bêne gel hev û ya hîn zêdetir me bêne gel hev evin. We me û xebata me ya li vir dît. Di ciheke biçûk de her tişt mezin pêktê.**

**Îsmet Şerîf Vanli: Mezin çêdibe.**

**Abdulah Ocalan: Ji niha şûnde xebatên me kirine weke xebatên xwe bibînin. Ez nabêjim îlahî tu çima nakî.**

**Bi şerefa xwe hinek tişt bikin ku, em ji we re bêjin bijî. Silavên min li hemû rewşenbîran bikin. We me dît û gelek nîqaş jî çêbûn. Bila bi derew, demagojî û şêwazên doxmatîk ser me nesekinin. Heyfe; hûn jî gelek tiştên xwe winda dikin. Ev neraste, ev helwest ji dijmin re xizmetê dike. Hûn jî bibin heyverona sîberekê; hewl bidin bibin. Hûn jî bibin şaxeke şoreşê. Belê, em we weke welatparêzeke kevin (yanî em we mîna heval dibînin) û PKK'yiyekî dibînin. Ma neraste?**

**İsmet Şerîf Vanli: Ez jî ji bûna PKK'yîyekî gelek serbilindim.**

**Abdulah Ocalan: Wisa dibe. Yanî em wisa bihesibînin. Te li vir hevalan dît. Yekbûn jî pêk hatiye. Ji niha şûn ve di jiyana xwe de roj be roj serkeftin û pêngavên nû yên serkeftî bikin. Yên me dipirsin, hûn dikarin li ser navê me baxivin. Dîsa dikarin xwe biparêzin. Dema tengbûn û kêmaniyên**

**we çêbin, bi alîkariya hevalan derbas bikin. Heta ku em rastî û başiyê dibînin em ê heya dawî bi we re bin. Li ser vê bingehê ji we re serkeftinê dixwazin.**

**Cabar Qadir: Birêz Serok, hevalên hêja, ev dema kin ku me li vir derbas kir, ji bo me gelek girîng û heya bêjî pêvajoyek fêrker bû. Ji bo me hinek xalên girîng derketin holê. Lê ji hêla min ve hîn girîngtir bû. Min li vir dît ku teorî û pratik bi hev re dimeşe. Di dîroka mirovahiyê de gelek teorî derketine holê, lê piştî sedan sal şûnde bi zorê derbasî pratîkê bûne. Lê em li vir dibînin ku, îro dema Serok qala mijarekê dike, roja din heval li ser wê mijarê nîqaş dikin û encam digirin. Ya min dîtî mirovê Kurdeke bidîsîplîn û nû ye. Li Ewrûpa gelek rewşenbîr dibêjin PKK partiyek siyasî ye û ji bo serxwebûna Kurdistanê dixebite. Lê ji bo min kêmbûna vî fikrî û seranserbûna wê derket holê; ji ber**

**PKK xwedî felsefeyeke mezine. Fikrê Serok felsefeyek mezine.**

**Li vir tişta ji bo me girîng gotina Rêbertî ya dibêje; "*huner û wêje tenê ne rastiya gele, di heman demê de ji bo veguhertina gel jî pêwîste di van qadan de ked bê dayîn*. " Berê nîqaş li ser "*ji bo wêje wêje, ji bo jiyanê wêje*"dihat kirin. Lê li gorî felsefeya Rêbertî, wêje tenê ne ji bo xêzkirina wêneya jiyanê ye; di heman demê de gel ber bi pêş ve birin û xizmet ji gel re kirine. Heke wêje û dîrok ne ji bo pêşxistina civaka Kurd û mirovê wê be, ne di xizmeta gel de ye. Me, siyaset weke derew û bi pêşxistina lîstikan fêm kir. Lê felsefeya Rêbertî dibêje divê siyaseteke rast bê kirin û li ser rastiyan bê sekinandin.**

**Abdulah Ocalan: Divê bi temamî li ser rastiyan be. Bibe şûrê rastiyan.**

**Cabar Qadir: Ev, bûyereke mezine. Ez di wê baweriyê de me ku wê felsefeya Apoîzmê di nava çend**

**salan de mîna felsefeyên din, di hemû zaningehan de weke waneyeke cuda bê dayîn. Agahiyên min li ser felsefeya PKK'ê kêmin. Lê ez soz didim ku ez ê hîn kûrtir li ser vê felsefê bisekinim.**

**Abdulah Ocalan: Min li ser felsefê zêde nexwendiye, lê tenê ne ji bo Kurdeyatiyê, hemû mijarên li ser serwerim ji bo mirovahiyê xizmet dikim. Divê li ser felsefê jî bê sekinandin. Pêwîste li ser dîrok temsîla çi dike jî bê sekinandin. Kar heye, bi mirov bi zimanê xwe dike; kar heye, mirov bi wêjeyê dike. Di van mijaran de pêwîst dike gavên mezin bên avêtin. Divê hûn bibin xwedî nêrînek wêjeyî. Hatina we ya vir, nêrîna we ya gel; divê bibe sedemek destpêkirina wêjeyê. Min çend pirsên bingehîn ji we kir, ev pirsêngirîng in.**

**Li vir felsefeya mirovê Kurd, îdeolojiya wî, siyasî, leşkerî, hunerî û afirandina wê di warê estetîk de**

**çawa tê pêkanîn? Temaşe kin, hûn çend zarok hatin vir; hinek dost jî ji Ewrûpa hatibûn. Dayîk-bav zarokên xwe wisa mezin kiribûn ku, ev eybeke mezine, bêterbiyeke pir mezine. Bixwe jî bêterbiyene. Tiştek nasnekirine, ma dikarin çiqas terbiye bidin zarokan? Li civak, li zarokên di civakê de temaşeke, zarokeke tenê ya xwedî terbiye heye? Zarokeke xweşik ku bidî nîşan heye? Li vir dibêjim bila keç û xortê Kurd bihêz bibin. Li vir em kareke cuda dikin. Ev terbiye ye. Ji derveyî vê li wêjevanên li Îsveçê temaşe dikim, li wir bi tena serê xwe ne. Hene, nînin, nediyare. Ji bo xwe cihekê digirin û kesî nabînin. Ne civînekê çêdikin, ne jî dikarin çend ciwanan li dora xwe kom bikin.**

**Di dîrokê de wêje wisa nîne. Li gelek cihên Ewrûpa ekolên wêjeyê hene. Her yek ji van xwedî zanyarîne û ekol in. Bi vê sedemê li dora wan bi**

**hezaran kes hene. Li dora Kurd temaşe dikî, kes nîne. Hemû ji jin û çend zarokên xwe zêdetir tiştek nîne. Bi giştî çend dostê wî yê fitne-fesadiyê jî heye. Birîma wan nîne, ne xwedî ekol in. Tabî bi vî awayî jî wêje pêşnakeve.**

**Cabar Qadir: Birastî jî rewşenbîrê Kurd rola xwe nalîze. Tenê ji bo derketina feodaleke Kurd a li hember dewletê, min mirovên ku temenê xwe di ber lêkolînkirina pirtûkên dîrokê de dayîn dîtine. Li ser wê nivîs dinivîsin, helbest dinivîsin. Lê bi çaveke korane dikirin û berê jî bi çaveke hovane li şoreşa mezin temaşe dikirin. Tabî, berê tiştek nedidîtin. Lê beriya çend salan axayeke Kurd, ji ber berjewendiyên xwe ji bo li hember dewletê rabûye li ser wê hema dikarîn helbest-pirtûk binivîsin. Bi rastî jî ev jî pirsgirêkek mezine.**

**Abdulah Ocalan: Tabî, hûn ji Başûr tên. A rastî we şoreşgeriyeke**

**30-40 salî kiriye. Di vê şoreşê de gelek şexsiyet derketin. Mesela, divê mirov li ser Barzanî bisekine. Taybetmendiyên Barzanî dibe pirtûkek, heta pirtûkek bi vî rengî heye? Dibêjin; "*sêsed hezar kes bi destê wî mir*. " Ev şexsiyeteke çawa ye? Felsefeya wî, îdeolojiya wî, jiyana wî, siyaseta wî, leşkertiya wî çibû û ji bo çibû? Çi da gel û çawa rê ji gel re vekir? Her çi pirtûkeke wî heye? Na! Dahûrandina wî heye? Na!**

**Cabar Qadir: Hinek tişt hene lê ji derveyî vê...**

**Abdulah Ocalan: Di şêwaza kevin de, ji îfadeyên weke "*axayê me wisa mezin bû, axayê me wisa bihêz bû*" wêdetir tişteke din nîne. Heyf, ev kêmaniyeke mezine. Evqas pirtûk hatine nivîsandin lê di ti pirtûkan de, dahûrandineke rast û tehlîlek nîne. Tevî evqas xwîn hatiye rijandin jî wisa bûyîn bi rastî jî biêşe. Ewqasî rijandina xwînê û jêkirina serê**

**mirovan ji bona çi bû? Wiha, rexneya min a herî mezin li we di vir de ye. Hûn niha ji pere, mere zêdetir tişteke din tenezil nakin. Ez nikarim bêjim niha li Başûr yekî mêrxas heye. Dostek tenê li ser navê Kurdistanê nehat gel me negot; "*em ji bo Kurdistanê vê siyasetê dixwazin vê xebata leşkerî dixwazin.* " Piranî derewker û sextekarin. Bi dijmin re bûne yek, dibêjin; "*em bûn dewlet, em bûn pêşmerge*. " Çima wisa bû? Hûn çima çend pirsên xweşik yên di cî de nakin?**

**Cabar Qadir: Girêdayî pirsgirêka kesayetê ye.**

**Abdulah Ocalan: Tevî ku evqas xwîn hat rijandin, gel evqas perişan bû çima wêjevanek, dîroknasek bi awayeke cidî li ser vê mijarê nesekinî. Wiha hûn li virin, netirsin. Berê tirs hebû, lê niha ew jî nemaye. Wê demê êdî vî barî, vê pirsgirêkê ji holê rakin. Ewqas xwîn hat rijandin,**

**ewqas şehîd hat dayîn, bila li hember vê dengê we bilind bibe. Tabî, dengê xwe bilind bikin, xwe di vê mijarê de bêşînin. Ji vê nerevin. Heke hûn ji vê birevin, nemûmkûne ku hûn mirov bin. Heke hûn li ser evqas êş, zehmetiyên gel kişandine baş nesekinin, heta hûn biçin Ewrûpa jî hûn nikarin xilas bibin. Hûn çiqas ji rastiyan birevin, hûn ê ewqas bikevin. Hûn çiqas li ser vê pirsgirêkê bisekinin, hûn ê ji pirsgirêka xwe re jî ewqas çareserî bênin. Hûn hatin vir we me di nav jiyana PKK'ê de dît, naşibe kesayeta li Başûr ne wisa?**

**Cabar Qadir: Raste Serokê min, cuda ye. Ji bo cudaye pêwîste gelê li Başûr vê felsefeya nû binase. Divê rewşenbîr her tim li pêşiya gel pêşeng bin. Rewşenbîrên Kurd her ku diçe li pişt gel dimînin. Divê rewşenbîr rastiyê bibînin. Tiştên ku ev çend rojin me li vir dîtine, hêjayî mînakdayînê ye. Li vir mirovê nû**

**heye, welat heye, yekitî heye. Û ev pêşketin di riya rast de ye. Bi rastî jî felsefa we pir mezine û nehişke. Dikare her mijarê ji gelek aliyan ve bigire dest. Nerime. Lê li gel me hinek hene gotina xwe ser ya te têxin dibêjin; "*ya min gotî eve û ya rast ya min gotiye.* " Destûr nadin kes fikrê xwe bêje.**

**Mesela dema hûn li ser kesayetê, li ser jinê, li ser civakê dahûrandin dikin, nirxandinên xwe di nav darengiya esasî de, dispêrin mercên heyî. Gelek xalên ku sibehê jî bên guhertin diyar dikin. Ev aliyên felsefeya we ya herî baş û bingehînin. Lê hinek felsefe pir dogmatîk nêzî bûyeran dibin. Nêzîkatiya her tişt teqeze, nayê guhertin û veguhertin. Di olan de jî ev wisaye. Ev felsefeyên bi vî rengî nikarin mirovan biguherin û bidin veguhertin, berevajî wan tine dike. Xaleke din a bingehîn jî, felsefeya we di civakê de pir**

**berfirehe û guhertineke mezin afirandiye.**

**Abdulah Ocalan: Başe, ev felsefe ji bo mirovê me ye û di mejiyê mirovê me de cî girtiye. Gelê me gelek nezane, bê îdeolojî ye û gelek ne xwedî nêrîne. Tabî, pirsgirêk gelek firehin divê bên vekirin. Em ji dogmatîzmê dûr in. Dogmatîzm çiye? Li ser tişteke kevin xwe kor hiştine. Ji derveyî vê şêwaza jiyaneke rojaneyî heye. Jiyanek rojaneyî çiye? Bê hedef, şêwaza jiyaneke li gorî keyfa xwe tevgerine. We zindîbûna jiyana li vir dît. We tiştên me li vir kirine, nêrînên me û şêwazame ya di avakirina mirov we dît û we dît ku ji vê jî hinek derfet çawa derdikevin holê. Ev jî hêzeke. Hûn dikarin li ser vê bisekinin. Hûn dikarin vê di xebatên xwe yên ji niha şûnde weke rêbaz ji xwe re bigirin. Heke hêza we hebe, gel li dora xwe kom bikin, da ku hûn ji bo Başûr tiştek bikin kom bibin.**

**Xwe vale, bê xebat nehêlin. Dema mirov nexebite weke miriyane. Ti nirxeke jiyana bê hedef û guftugo nîne. Heke înada we, hirsa we çêbibe; her roj bi nêrîneke cuda û heke hedefeke vê meyzandinê hebe, wê demê dikarin saxlam gav bavêjin.**

**Xwe ji mirovan, gel dûr nehêlin. Xwe bi gel ve girê bidin û bibin çare. Bi taybet ji bo gelê Başûr dikarin hinek tiştan bikin. Nîqaşkin, kom bibin, xwe bigihînin gel bêjin; "*pirsgirêka me mezine, divê em tiştnan bikin*. " Jiyana nû, riya nû ji bo we jî pêwîste. Netirsin, heya dawî ji xwe bawer bin. Derfetên PKK'ê derfetên we ne jî. Heke hûn di riya rast de bimeşin, fikrê rast bimeşînin û ev ji bo gel bin, hûn ji me çi bixwazin em ê bikin. Belê, tişteke din ku hûn ji me bixwazin heye?**

**Cabar Qadir: Ez dixwazim ji hevalên hêja re vê bêjim: Dema hûn, li her deverê Kurdistanê li ser dijminê**

**mirovahiyê de diçin vê bizanin ku, gelê Kurd hemû bi we re ye. Dilê wan bi we re lê dide. Şerê ku hûn deqe bi deqe didin meşandin, fedekartiya didin nîşan di nava gel de her tim tê axaftin û we di dilê gel de cî girtiye. Riya we riya serkeftin, jiyan, serfirazî û şerefê ye.**

**Abdulah Ocalan: Hevalên me di jiyanên xwe de bi tiştên nû re rû bi rû ne. Şiyarbûna miletekê dîtin bi serê xwe bûyereke. Dîsa avabûna PKK'ê û di vê navberê de rewş û tevgera me şopandin, ji bo xwedî meyzandineke dîrokiye, heta dawî bi wate dibînim. Li vir ji bo dîrokê bûn xwedî belgeyeke baş. Ev, di jiyana mirovekê belgene; we ew jî dît. Dîsa dîroka îro, biqasî dîroka destpêkê girînge, dahûrînere. Dîroka niha tê dahûrandin yan jî di rojaneyî de, hinek heqîqetên dîroka herî kevin jî hatine dîtine. Heta dikarim bêjim ku, dîrok û rojaneyî**

**care yek derfeta tehlîlkirina hevdu bidest xistine.**

**Cara yek roj bû dîrok, dîrok rojaneyî bû.**

**Hûn bûn şahidê vê. Ji bo hûn di vê pîşeyê de xwedî ezmûnin, heya bêjî bi hêcane. Ji bo hûn xwedî meslekin hûn bihêcan dibin. Dibe ev we hîn bi îdîa bike. Him jî gelek ziraviyan derxe holê.**

**Min bi xwe pir rehet lêkolîn-vekolîn nekir. Nayê xwestin ku ez heya dawî fersend û derfetên xwe tengav bikim. Ji bo partî fikreke min weke dîrok nîne.**

**Dîrok di bingeh de rastiye û ji bo hemû demane.**

**Lê partiyeke ku wateya ji bo dîrokê teşkîl dike eve: Mifteya dîrokê, qetandina perdeya tarî a dîrokê dayî û ya hîn wetedartir xebateke ku bêdîrokiyê vediguherîne dîrokê ye. Bêguman ev jî dîroknasekî bi hêcan dike. Ji dîrokbûn, bêdîrokbûnê, hema**

**bêje ji rewşek tine bûyî carek din bûna dîrok, cardin ji bona xwe bûna dîrok û ev derfet dîtin pêşketinek pir mezine. Ez bawerim hûn bi vê re rû bi rû man. Ev jî alîkariya herî mezin ji bo we em bikine. Ji dîroknas re alîkariye û ji dîroknas re tevkariye. Belê çi dibêjin?**

**Ethem Xemgîn: Niha hatina min ya li vir, heya bêjî fêrker bû. Beriya her tiştî tevî ez Kurdekim jî, min dîroka gelê Kurd zêde nas nedikir. Belê hinek tiştên dîrokê yên diyar dizanim, raboriya gelê Kurd weke herêm dizanim, lê di wateya rastî de ez realîteya gelê Kurd nizanim. Di warê sosyolojîk de, di warê psîkolojîk de, tenê di hawirdora xwe de yan jî li dora şexsiyetên nasdikim dizanim. Lê ji wexta ez hatim vir heya niha, di encama lêkolînkirina dîrokê de encamên ez gihiştimê nêrînên min gelek hatin guhertin. Bi taybet di warê gel de pir guhertin çêbû. Berê**

**nexweşiyên min weke nexweşiyên dîroka Kurdistanê destnîşan kiribûn, min dît ku hatine tedawîkirin. Min her tim digot, "*ev nexweşî tedawî nebin, heta ev bûnye neyê başkirin, pêşketin bi rêbazeke tenduristî nayê pêkanîn û encam nayê girtin.* " Pirşte min temaşe kir ku di rewşa heyî de hemû hatine tedawîkirin. Yanî gel bi awayeke giştî hatiye guhertin, realîte hatine guhertin. Bi taybet girêdana Serokê me ya bi rastiyê ve, di ev dema kin de veguherandiye çawaniyek encamgir. Min Serokê me pir mezin dît û ketim ferqa vê. Diyare wê ev di xebatên me de bibe perspektîfeke mezin û wê di xebatên pêşeroja me de jî ezametê bide me.**

**Êdî dîroka Kurdistanê xwe dubare nake û wê guhertinekê bidest bixe. Ev ji salek zêdetire ez di vê qeneetê de me û vê misogeriyê jî dibînim. Ev pêşketin tenê Kurdistaniyan hemêz nake, bi qasî em**

**dibînin ya li herêmê û her ku diçe li cîhanê belav dibe PKK'yek nû ye, li hember hovîtiyê nirxek mirovbûnê ya nû ye.**

**Abdulah Ocalan: Biqasî derketiyê holê ku dîrok ji dubarebûnê pêk nehatiye, gelek nûbûnan jî di nav xwe de dihewîne. Partî, dîrokê rast dike. Em hinek gavên pêwîste pir girîng bên lêkolînkirin tavêjin. Dîroknasek tenê ne raborî, neçare rojaneyî jî lêkolîn bike.**

**Weke min gotî, ji ya em difikirin hîn zêdetir dîrok û rojaneyî hevûdû di nav hev de dihewînin. Û pêşeroj jî niha ve tê amadekirin. Ji bo amadekirina pêşerojeke hezar salî hinek gav tên avêtin. Divê dîroknas bi vê re eleqedar bin, him jî bi awayeke bandorker.**

**Em dixwazin hûn hîn baştir ji bo Kurdistanê binivîsin. Li bendêne bi gelek pêwendiyên wê yên bi wate re bigirin dest. Armanceke dîrokê jî heye**

**(bûyerên dîrokî wisa li dû hev rêzkirin hêsan nîne) bi armanceke diyarker dimeşe. Armanc mirovin, armanc siyasetên pêkhatine. Ji xwe dîrok gotin bixwe eve. Heke bê dîqatkirin, her çiqas bê gotin ku vî kesî ev kiriye, ew zemîna civakî ku wî kesî pişta xwe dayiyê, heta navenda siyasî û rêxistinî ya pitşta xwe dayîyê heye.**

**Rêxistina şexsiyetên dîrokê dimeşînin bi armance.**

**Pîlana wê rêxistinê heye, textîka wê heye. Bawer nakim ku dîrok tenê ji paraznameyên mirovên ji xweber derketine û lêdana şûran be. Heke hûn li şeran temaşe bikin, ya herî siftbûyî hêza pîlanê ye û hêza rêxistinê ya siftbûyî ye. Ji Sumeran heya firavûnên Misrê, ji Hîtîtan heya Persan û em bên Romayê. Ji wir bên Bîzansan, Sasaniyan û bên Îslamiyetê. Li van deveran em dibînin ku zêdebûna siftbûyîneke îdeolojî, bername û rêxistinkirinê dibînin. Bi**

**kinahî divê ji vê hêlê ve jî li dîrokê bê nêrîn.**

**Dîroka bi armanc, dîroka bi pîlan, dîroka ji rêxistinên bizavên pêktê; heya bêjî rastiya me jî ronahî dike. Dibe birêxistinbûna me kêm be. Dibe amûrên me yên siyasî kêmbin. Lê dîsa jî heye û li ser bingeha çînayetî ye. Wateyeke xwe ya siyasî heye. We vê bi awayeke balkêş di ezmûnên PKK'ê de dît. Heke kesê Rêber, kesê milîtan vê di kesayeta xwe de rast temsîl bike, gelê herî paşkeftî jî dikare bi felsefeyeke nû re tevbigere. Niha gelê Kurd di bin hêza felsefeya herî pêşkeftî, ya şoreşger û miletek herî di pêş de dimeşe. Gelên Ewrûpa yên herî pêşkeftî jî, gelên ku di bin îdeolojiyên herî paşketî û qirêjê de tine bûne. Her çiqas di warê madî de gelê me pir li paş jî be; di warê îdeolojî, siyasî de ber bi bûna gelê cîhanê yê herî pêşkeftî ve diçe. Ev tiştên bandorker û pêşketinên**

**dîroknasek bi hêcan bikine. Pêşketinên wêjevanek, senetkarek ber bi coşeke mezin ve bibine. Bingehê huner jî eve. Dîsa bingehê lêkolînên zanistî jî girêdana xwe bi vê coşê re heye.**

**We bi awayeke zindî bingehê vê dît. Weke min her carê gotî jî “*bi qasî dîrokê dikim, fêr dibim, huner yekser di kesayeta min de dijî.*”**

**Nêzîkatiya herî xweşik, nêzîkatiyên siyasî û leşkerîne. Gotinên herî xweşik, bilêvkirinên siyasî û leşkerîne. Em van jî pir balkêş dikin. Di vê wateyê de yên dixwazin ked pêş bixin, divê li me temaşe bikin. Dixwaze bandorker nêzî dîrokê bibe, bila hinek li me temaşe bike. Çalekiyên me yekser ji hêla rastiya Rêbertiya me ve hatine afirandin. Pêwîstî qet bi pesindayîn û rêzkirina pesindayînê jî nake. Lê pêwîstî bi înkarê jî nîne. Karên hatine kirin hene; pêşketinên rêzdariya dost**

**jî dijmin jî qezenc kirî hene. Di asteke herî pêş de têkoşîn tê meşandin; dîroknasê vê nebîne kore. Dibe ku bibe her tişt lê nabe dîroknas. Dîsa jiyaneke pir bicoş heye; hunermend û wêjevanê vê nebîne ne ti tişte. Bila her tişt bike lê bi huner û wêjeyê re mijûl nebe. Di vê wateyê de ev xebat ji bo dîrokê, ji bo hunerê pir diyarkerin û heya bêjî alîkariyên binirx dide. Tenê hûn hewl bidin binirxînin. Gelek tiştên hûn ji vê zemînê bigirin hene. Bêguman dibe ji bo we bibe destpêkirineke nû jî. Belê weke gotina dawî hûn dikarin çi bêjin?**

**Ethem Xemgîn: Xebatên li vir toveke û di wê baweriyê de meku pir zû berfireh bibe. Ev xebat, xebatên herî xweşik û binirx ên li ser navê mirovahiyê tên kirine. Di pêşerojê de bi misogerî wê dîrok di derbarê vê de biryara xwe bide.**

**Abdulah Ocalan: Hûn jî di jiyana xwe ya ji niha şûnde pêwîste weke**

**şahidek pir zindî û dostek pir hêja ya tevgereke ku bi rastî jî dîrokê dike rêyek baş ji xwe re bigirin. Di wê baweriyê de me ku bibin xwedî xebateke serkeftî. Ji fersend û derfetên derketine holê pişgirî bigirin û qada xwe hinekê bi ekol bikin. Di civîn yan jî konferansên rewşenbîran de nîqaşên hîn pêşkeftî pêş bixin. Hewl bidin ev nîqaş hineke din birêxistinkirî derbas bibin. Dibe ev we hîn bi serkeftî bike. Ji xwe lêkolînvaneke binirx ji derveyî van herî zêde kor bibe. Ji bo lêkolîn û xebata xwe ya serkeftî dikarin partiyê weke palpişteke pir bi nirx bibînin. Li ser vê bingehê dikarin hîn serkeftîtir bin û serkeftinê dixwazim.**

**Abdulah Ocalan: Hîkmet hûn dikarin çi bêjin? Te karî tiştek ji vir bigirî?**

**Hîkmet Salih: Hevalên hêja, Serokê birêz. Ez hatim qada herî girîng, qada Rêbertiyê. Bi rastî jî**

**gelek tişt fêr bûm. Bêyî gotinê zêde dirêj bikim, dixwazim çend xalên ku min li qada Rêbertî dîtine bênim ziman: Ya yekem; min PKK bi taybet jî Rêbertiya Partiyê ji nêz ve dît. Dîsa min rastbûna xeta PKK'ê dît. Di wê baweriyê de me, heta di vê riya rast de gav bê avêtin wê bigihe serkeftinê.**

**Xaleke din ku min girîng dîtî, di PKK'ê de afirandina mirovên nû ye. Tevî min du caran di nav têkoşîna li Başûrê Kurdistanê hatî dayîn de cî girtiye jî, min van nedît. Dema min van li vir dît, bi rastî jî hejiyam. Bi vê re em dikarin li hember dijminê bi sedî salene me mêtîngeh kirî biparêzin.**

**Me gelek carî xwest ji şoreşê re xizmetê bikin, lê ji ber dijmin bi kesayeta me lîstiye, her carê em û şoreş dij hev rabûn. Heke şexsiyeta ji hêla dijmin ve ji me re hatiye dayîn em neguherin, em nikarin li hember dijminê dora xwe şer bikin. Bi taybet**

**jî em ê nikaribin li hember KT'yê şer bikin.**

**Ji derveyî van tişta min dîtî eve: Birastî jî Rêbertî rewşenbîrê herî mezine. Dema ez daxuyaniyên Rêbertî yên li ser mijarên girîng tênim ber çavê xwe, min dît ku divê hîn zêdetir rewşenbîrên Kurd bixebitin. Fikrê me rewşenbîran yê weke dibêjin, "*ez û rehetim*" heye. Yek-du pirtûk dinivîsin xwe li ser partiyê re dibînin. Dibêjin, "*partî negirînge*. " Bûna rewşenbîr, tenê ne nivîs nivîsandine. Bûna rewşenbîr, tê wateya ji dil bûna welatparêze. Heke ne welatparêz bî nikarî bibî rewşenbîr. Hinek li ser gelek mijaran dikarin binivîsîn û çend ziman jî dizanin, lê vê ji bo berjewendiyên xwe yên şexsî bikar tînin. Yên ji bo berjewendiyên xwe yên şexsî dixebitin kişandina şoreşê birastî jî zehmete.**

**Di salên derbasbûyî de li Ewrûpa li hember PKK'ê û Rêbertiyê gelek**

**antî-propaxanda hat kirin. Ev propaxande hemû derewin. Min li qada Rêbertî heval dîtin û min Rêbertî jî dît. Bi rastî jî hêjmarek zêde ji gelê me heskî bila rewşenbîr, yan jî nerewşenbîr be, xizmeta dijmin dikin. Propaxandayên di televizyon û radyoyên dijmin de li hember PKK'ê dikin, min li vir baştir dît ku, ji sedî sed derewin. Ji ber vê rewşenbîrên li Ewrûpa jiyan dikin yek ji erka wan ya herî girîng van propaxandeyan vale derxistin û rastî vegotine. Xaleke din jî, yê me vexwendî vê qadê, bûye sedem ku em hîn ji nêz ve gelê Kurd û têkoşîna wê bibînin, li heman navendê bi hevalan re bin ji bo Rêbertiya Partiyê sipas dikim. Min hîn ji nêzîktir ve derfata naskirina we dît. Ez pêşniyaz dikim ku hîn gelek heval ji Ewrûpa bên vê qadê, Rêbertiya Partî û têkoşînê hîn ji nêz ve bibînin.**

**Abdulah Ocalan: Em dixwazin ji bo gelê Başûr tiştnan bikin. Gelek**

**xwîn hat rijandin, lê niha heya bêjî gelek ku hatî xistine. Ji vê hûn jî berpirsyarin. Di destpêkê de çiqas lewaz jî bin, bi tenê bin jî, dîsa gavên yekem bavêjin. Ji xwe bawer bin û bê erk nemînin. Bi alîkariya PKK'ê dikarin gelek xebatên mezin bimeşînin. Kom bibin, xwe birêxistin bikin. Xwe bigihînin dostên Başûr jî. Heya bêjî teknîk pêşketiye. Bikaranîna teknîkê re dikarin xwe bigihînin Başûr. Hûn dikarin xwe bigihînin bi sedan rewşenbîrên Başûr û yên dikarin kar bikin. Tabî hûn ê kesayeta xwe li gorî vê çêkin. Di we de heya bêjî ferdperestî serwere. Vê ji ser xwe bavêjin, yan na hûn nagihin armancê. Di ferdperestiya li Başûr berdewan dike de mirin heye. Hûn çiqas jiyan bixwazin bixwazin, di dawî de hûn ê bi mirinê re rû bi rû bimînin. Ji ber ferdperestî mirov tenê dibe mirinê. Ji bo we jî yekîtî pêwîste. Bi rihê mirovahî, bi rihê netewî bigihin**

**hev. Ji bo bazirganiyek erzan, ji bo berjewendiyek biçûk hûn an hene yan jî nînin. Heke hûn di vê rewşa xwe de israr bikin, ji me dûr bisekinin.**

**Weke min gotî, hûn jî mirovên xwe rast bikin. Riya jiyanê, ne riya niha di nav de ne. Ji derveyî xebata li Başûr, xebatên hîn mezintir hene. Xebatên siyasî û gelek xebatên din hene. Xebatên me yên jiyanê hene. Hûn jî bibin xwedî xebateke girîng.**

**Hatina we ya vir ne bûyereke biçûke. Weke we jî bi çavê xwe dîtî derfet hene, fedekartî heye, wêrekî heye, her tiştê rast heye. Ji tinebûnê pêşketinên mezin tê afirandin. Alîkariya herî mezin em bi we re bikin eve. Li ser bisekinin. Jiyaneke bi şeref, jiyaneke serkeftî, dikare li ser bingeha van xebatan bê afirandin. Heke hûn xwe bixapînin her tim bêjin "*ez û ez*", heta dibe kupaşê deste we bikeve xwîna hevalan. Dîsa xwe jî bifikire, lê tenê bikaribe bi gelê xwe**

**re bibe yek û dest bi xebatan bike. Ji we ev tên xwestin. Ev ji nan û avê zêdetir ji we re pêwîste. Bi alîkariya PKK'ê hinek gavan bavêjin. Em di wê baweriyê de ne ku yêkîtî bê afirandin. Wê li hember dijminên li Başûr yekîtî çêbe. Em naxwazin hûn weke berê bimirin. Xwedî xîret bin, bi bawer bin û wêrek bin. Bi yêkîtî û duristbûnê re gelek tişt dikare bê afirandin. Em vê ji we dixwazin û li ser vê bingehê ji we re serkeftinê dixwazin.**

**Abdulah Ocalan: Belê, hûn çi dibêjin?**

**Cabar Qadir: Ez, dixwazim di derbarê PKK û Rêbertiya PKK'ê de hinek tiştan bidim diyarkirin. Rêgezeke wisa heye; ji bo gihiştina milyonan divê ji yekî bê destpêkirin. Pêşketina di PKK'ê de jî bi yek kesî re destpê kiriye. Agirê welatekî dorpêç kiriye, destpêkê bi çirûskekê destpê dike.**

**Abdulah Ocalan: Hemû bi çirûskekê destpê dike.**

**Cabar Qadir: Ya girîng mirov bikaribe şiqateyekê pê bixe. Kesê ku wê şiqateyê pê xist, di welatê tê de cî digire wê agirê şoreşê pê bixe û şoreşê bike. Di vir de ya herî girîng ew mirov û fikir çiye.**

**Abdulah Ocalan: Fikrên agirdar. Di fikrê wî de agir heye, nîne? Gelek fikir hene, lê ne agirin. Valane.**

**Cabar Qadir: Hinek agir hene, xwe dişewitîne, hinek agir jî hene dijmin dişewitîne. Cudahiya di navbera wan de eve.**

**Abdulah Ocalan: Hinek hene, bi agirê xwe, xwe dişewitînin. Hinek jî hene qet nabin agir. Çi bikin jî nabin agir. Rêxistin heye, rêbertî heye, ancex tu van deynî ser hev dikarî bibî agir.**

**Cabar Qadir: Rastiyên cidî hene.**

**Abdulah Ocalan: Fikrên mîna agir, weke fikrên PKK'ê ne.**

**Cabar Qadir: Di hebûnê de sê tiştên bingehîn hene. Ya yekem xweza, ya duwem civak û ya sêyem jî kese. Ev hersê tişt gelek girîngin. Şexs civak û xweza ji bo xwe sazûman kiriye. Ev jî ji bo pêşveçûnê tevgereke dînamîk derxistiye holê. Hêza li vir, ji bo van hersê jî rola xwe baş bilîzin diyardeyeke pir girînge. Hêza mirovên destpêkê bitenê bû.**

**Abdulah Ocalan: Ji niha şûnde hûn ê jî li ser dîrokê bisekinin. Te netewbûna ji bo dîrokê girtiye. Tiştên te ji vir girtine, berdêla hemû belgeyane. Di derbarê jiyanê de gelek tişt vebûn. Di nava evqas tiştên we xwendine de, dibe we gelek kêmaniyên xwe dîtibe. Îdeolojiya we di PKK'ê de dîtî çiye?**

**Îdeolojiya ji agir, fikrê ji agire.**

**Her çendî dijmin bihêz jî be, hêza li hember wê û hêza ku dijmin bin bixe çiye? Li ser kîjan taybetmendiyan derketiye holê? Hûn**

**rêbertiya wê jî dibînin. Rêbertiya wê çawa ji tinebûnê hebûn ava kir û gihişt milyonan? Wan çawa kişand riya rast? Li hember tirsa berê Rêbertî çawa niha wêrekiyê diafirîne? Ji derveyî vê dîroka Kurdan, dîrokeke binkeftinê ye. Lewra niha baş temaşe bikin ku serkeftin çawa tê afirandin. Xebatên em roj bi roj dikin dîrokîne. Dîroka bi hezarî salane binkeftiye em di nava çend salan de dibin serkeftinê. Dîrok tê çi wateyê? Tê wateya serkeftin û jiyanê. Lê ji bo Kurdan tiştek bi navê dîrokê nehatiye hiştin. Ji bo dîrok nemaye jiyan jî nemaye, Kurdeyatî jî nemaye. Niha dîrok jî Kurdeyatî jî tê afirandin.**

**Di vê mijarê de pêwîste baş li ser dîrokê bê sekinandin. Zanebûna netew ku hatî afirandin divê hêza hûn li ser bûyerên dîrokê bisekinin bide. Li dawiya vê dema dîrok temaşeyî bikin; gelek pêşketinên nû hatin afirandin. Ev guhertinên girîng me li ser dîrok,**

**çand afirandine di cî de binivîsin. Ev derfetên pir mezinin. Dîsa divê rabûna gel hêz bide we. Ev ne tiştên kêmin. Hûn bi salan li ser Kurdan sekinîn, lê hûn ji vê pirsgirêkê re nebûn bersivek. Wiha, we li vir wan bersivan dît.**

**Ji ber wê ji we re dibêjim, "*gavên girîng, gavên serkeftinê ne.* " Kom bibin, ji bo Başûrê Kurdistanê jî hinek tiştên nû bikin, binivîsin. Him bi rewşenbîran re, him jî bi yên dibêjin "*ez kesayeteke girîngim*" re civînên nû lidar bixin. Dîroka kor bûyî û ketî sererastkirin esase. Em dikarin van ji bo şoreşa Başûr diyar bikin. PKK, alîkarî dide şoreşa li wir. Ji xwe ev nirxandin hemû bi serê xwe alîkariyeke mezine. Bi pere alîkarî çênabe. Ji xwe alîkariya pere heye, ne wisa? Ev ne alîkariye. Tu yê jî li ser van esasan li cihê xwe xebat bimeşînî.**

**Cabar Qadir: Mirov bi xwe dîrokê sererast dike. Mirov bingehê dîrokê ye. We dîroka Kurdan sererast kir.**

**Abdulah Ocalan: belê, rast fêmkirina dîrokê girînge. Dîroka niha hûn dibinîn jî girêdayî min pêş dikeve. Dîroka heyî, dîrokeke hezar carî girêk lê hatiye xistine. Li hember dîrokeke wisa dikarî çi bikî! Dîroka dijmin fêrî mirovan kirine. Mirovê li ser vê dîrokê çêbûyî hatiye xistin. Li hember vê ez neçarim xwe di dîrokê de sererast bikim.**

**Cabar Qadir: Dixwazim di derbarê dîroka we afirandî de tiştek pir girîng bêjim: Derketina dîroka nû bi dawîkirina dîroka kevin re çêbûye. Derketina wêje, çand û hunerê jî bi destpêkirina vê dîroka nû re çêbûye.**

**Abdulah Ocalan: Belê, em di dîrokê de şoreş çêdikin. Em di wêje, çand û hunerê de şoreşeke nû çêdikin. Şoreşeke bê dîrok, ne şoreşe. Şoreşên ku dîrokê fêm nekin**

**û şoreşên nû neafirînin wê têk biçin û hundurê wê valeye. Dîsa şoreşeke bê wêjeyî û bê huner nabe. Em pir bi baldarî nêzî van bûn. Ev nirxandin ji bo we jî pir girîngin. Fêrî van bibin û pêk bînin. Hûn gelek mirovan jî dinasin, tiştên me dane we bi wan re nîqaş bikin û pêk bînin. Bila derçûna we mezin be. Bila meşeke we bi tendûristî çêbibe. Gavên hûn davêjin bila serkeftîbin. Alîkariyên hûn ji me dixwazin ji xwe tên kirin. Kom bibin, bibin hêz.**

**Heke fikrek û rastiyek neyê rewşa hêzekê wê tine û winda bibe.**

**Fersend ji vê rewşê re nedin. Bi mirov û rewşenbîrên xwe re bibin, bi hemû gelê Başûr re bibin yek. Van pêk bînin, binivîsin, bikin pirtûk. Rêbertî; tê wateya xizmet û çareyê. Bi rastî jî weke hûn jî dibînin, rêbertî têgeheke pir zehmet tê meşandine. Ji Rêbertiyê sûd werbigirin. Ez ne ji bo xwe, ji bo we dikim. Rêbertî ji we re**

**pêwîste, ne ji bo min. Rêbertî ji bo min giraniyeke. Hûn çiqas xwe bi rêbertiyê ve girê bidin; ji bo min ewqas dibe bar. Lê dîsa jî ez amademe ku vî barî rakim. Bizanin ji Rêbertiyê sûd werbigirin û li ser vê bingehê ji we re serkeftinê dixwazim.**

**Kurdistan, tu çawa yî? Te jî pir tişt dîtin, tu dikarî çi bêjî?**

**Kurdistan Mukrayanî: Belê, min jî gelek tişt dîtin. Beriya her tiştî ji bo we me hewandin ez dilxweşiya xwe raber dikim. Ez dixwazim hinek qala dema kevin bikim û ji wir bên ser rewşa jina Kurd.**

**Abdulah Ocalan: Baş dibe.**

**Kurdistan Mukrayanî: Helbestvanek mezin yê Kurd hebû, navê wê Nalî bû. Ev helbestvan beriya 150'î salî li Başûrê Kurdistanê jiyan dikir. Pirştre çûbû Stenbolê. Dema Nalî qala jinan dikir, bi navê "*habîbe*"binav dikir. Ez şeş mehan li ser helbestên Nalî xebitîm ku**

**bizanibim habîbe kiye. Habîbe kiye? Fikirîm ku divê bizanibim Habîbe kiye. Dema Nalî qala habîbe dike, qala dîtina wê ya derve dike yani şeklê wê vedibêje. Lê ev bê rihe. Piştre min temaşe kir ku, tiştek bi navê habîbe nîne. Ew leşkereke bênave; lê Nalî mezine. Nalî bi rêya habîbe bû Nalî. Heke Habibe nebûya, Nalî, nedibû Nalî. Min pir lêkolîn kir û min nexwest bibim habîbe. Divê ti jineke Kurd nebe habîbe.**

**Abdulah Ocalan: Hûn her tim ji bo zilam bûn. We wan ji paş ve şopand; ev eybeke mezine.**

**Kurdistan Mukrayanî: Belê, şermeke mezine.**

**Abdulah Ocalan: Lê niha hûn bi zilam re perwerdê dibînin, bi hev re şer dikin, çek radikin. Berê habîbe ya yeke din bû, ya hinek din bû, ya axayek bû, ya ciwanekî bû. Di vir de ketîbûn heye. Ez dikarim ji bo habîbe van bêjim. Divê habîbe di nav tevgera**

**serkeftinê de cî bigire, ji bo gel be. Divê habîbe azad bibe û bibe rihek mezin. Lê di rewşa heyî de habîbeya herî mezin, habîbeya ji yeke din re ye. Divê em vê biguherînin. Habîbeyan ji vê rewşê derxistin yek ji armancên me yên herî mezine.**

**Kurdistan Mukrayanî: Bêguman, dikarin bêjin hinek xilas bûne.**

**Abdulah Ocalan: Xilas bûne; ev yek ji armancên min yên herî mezine. Min di jiyana jinan de çi dît? Hîn bêyî xwe nas bike, min nêzîkatiyên "*ev yê mine, wisa yê te ye, wisa yê wî ye*" dît. Wisa nabe! Tu yê bêjî "*evqas yê welate.* " Evqas mal, evqas rih ji bo azadiya we hatiye afirandin. Ev xebateke mezine.**

**Kurdistan Mukrayanî: Beriya 25-30 sal li Başûrê Kurdistanê komek helbestvan derket holê. Van bi çaveke xeyalî li Kurdistanê temaşe kirin, heman mîna habîbe. Min di wê demê de nizanî habîbe kiye. Lê ez îro**

**dizanim habîbe kiye. Ez vê di we de dibînim. Habîbe kesê ku îradeya xwe radestî rêxistinê dike ye. Çima heye; rola wê ya di jiyanê de çiye? Habîbe, di heman demê de yê dizane kesayeta wê çiye.**

**Abdulah Ocalan: Çi di Rojhilata Navîn de, çi jî di Kurdistanê de, bi giştî wêje li dora jinê kom dibe yan jî li ser jinê tê kirin. Li vir wêjeyeke pir ketî pêşxistine. Divê xalek baş bê fêmkirin. Heke di wêjeyê de wê tiştek li ser jinê bê gotin; li ser gelek helbest hatine nivîsandin, destan hatine nivîsîn, heta Mem û Zîn jî wisa hatiye nivîsîn. Di nav de civakbûn û azadî heye, lê pir tenge. Bi rastî jî jin di rewşeke ji xwe zêdetir tişteke din nabînê de ye.**

**Em li rewşa jina Kurd temaşe dikin; ji derveyî zilam, zarokên xwe û heke hebe hinek mal-milk tiştekedin qebûl nake. Ev rih riheke mirî ye. Ne rihê netewî, rihê azadiyê ye. Ez**

**bawerim we ev di xebatên me yên li vir de dîtin. Di mijara jina Kurd û malbata wê de yekem tişta em bikin eşkerekirina vê nexweşiyê û bidestxistina çareseriyeke başe. Çima? Ji ber ev nexweşiyeke mezine. Heke jina Kurd ev nêrîna li ser xwe derbas neke, wê nikaribe avaniya xwe bi serê xwe biguhere. Sedema ketina jinê ya vê rewşê dijmine. Dijmin, sedema hemû ketîbûnane.**

**Belê, weke tu jî dibînî meyzandina jinê tenge. Di rewşeke nikare baxive de ye, bê rihe û bi vê rewşa xwe jî gelek kirête. Ez naxwazim moralê we xirab bikim, lê hinek ji min dipirsin dibêjin"*têkiliya di navbera Rêbertî û jinê de çiye?*" Ez bi xwe jî vê qebûl dikim. Wê bê heskirin nayê heskirin, kirête an ne, kirêteyan ne, xirabe an ne? Pir caran ditirsin. Ji wan re dibêjim "*xwe wisa biparêzin.*" Ji ber hatine xistin, her yek bi serê xwe pirsgirêkeke, ne xwedî jiyaneke**

**rastin. Ev xalên pir girîngin. Dibêjim wêje jî dikare van çekan rake.**

**Jiyaneke xweş çiye?**

**Jin, tê wateya jiyanê.**

**Ji xwe di kurdî de navê li jinê tê kirin “*jiyane.* ” Lê em niha temaşe dikin; di rewşeke mirî û ketî de ye. Tevî vê jî navê weke “*jiyan*”lê anîne. Lê wisa nabe, bi rastî jî divê jin weke navê wê bênin rewşa jiyanê. Bi rastî jî divê jin bibe jin.**

**Bi qasî em li ser jinê disekinin, li ser zilam jî disekinin. Zilamê Kurd, zêdetir bi jinê ve girêdayî ye. Em vê dizanin. Di wê baweriyê de me ku di wateyekê de rewşa jina Kurd ji ya zilam baştire. Divê em vê xalê jî vekin: Di nava jina Kurd de welatparêzî, mêrxasî bihêztir û zûtir derdikeve. Ev, di nav zilaman de zêde dernakeve. Heke min derfeta lêkolînkirina li ser jinan zêdetir kiriba, wê him di warê leşkerî, him jî di warê siyasî de hezar carî ji zilaman zêdetir**

**bihêz bûna. Ji xwe dema min vê fêm kir şûnde min hewlda hîn zêdetir giranî bidim ser jinan. Lê weke hûn jî dibînin, belkî di warê fizîkî de zêde nebe, lê di mijara berxwedanê de heke ji zilaman sed kes revîbin, lê ji jinan yan çend kes revîne yan jî nerevîne. Yên revîne ji sedî yek derbas nake. Zilam zêdetir direvin û pirsgirêkên wan zêdetirin.**

**Di vir de îsbatek heye: Heke tu giranî li ser jinê bisekinî tu yê bikaribî encaman bigirî, dikarî bigihî encamên leşkerî jî. Di warê jiyanê de jî di jinan de fedekartî û wêrektî zêdetir derdikeve holê. bêgûman me jî van dît û li ser sekinîn. Ji niha şûnde hûn jî dikarin li ser bisekinin. Dîsa li ser zilamê Kurd jî baş bisekinin, rexneyên mezin bikin.**

**Mirina we di zilamê Kurd de heye, ji xwe xwe bi xwe kuştine, we jî dikujin.**

**Zilam karê kuştinê dike.**

**Zilamê Kurd ne zilame.**

**Di wateyekê de ji jinê zêdetir jintire.**

**Xwe ji hêla şêwe û zayend ve zilam dihesibîne. Ji ber di dest de ji bilî cinseltî tiştek nemaye. Lê zilamtî ne cilseltî ye. Zilamtiya ku divê bê pejirandin egîdiye, hinek jî mirovbûne, hinek siyasî û civakbûne. Lê mixabin di çêkera zilam de ev nemaye û tine bûye. Lewra li ser çêbûna zilamê Kurd rawestin. Weke her carê min ji we re gotî, zilamê amade nexwazin.**

**Mînak, bi salane ez bi vankaran ve mijûl dibim. Lê ti carî min jina amade nexwestiye. Min hewl da wan rast bikim û wan tevlî riya rast bikim. Û min ser xist. Min di vê mijarê de têkoşîn da û azadî bidest xist. Hûn jî wisa bikin.**

**Wisa biçin bi ser zilam de bêjin "*ey zilam evqas kêmasiyên te hene, di vê mijarê de ketîbûna te heye, tu wisa xirab bûyî, tu welêyî, wisayî*",**

**daku ji zilam jî mirovek bi şeref derbikeve holê. Ger ev nebe dê we jî bikuje. Yek ji pirsgirêka herî girîng ya wêjeyê eve.**

**Bi rastî jî pir cidî li ser vê mijarê rawestin. Min li vir hinekê bingeha vê saz kir. Weke ku me di nava partiyê de rastbînî bi dest xistiye, em ê vê bihêztir bidin meşandin. Ev ne tenê ji bo xebata partiyê ye, ev ji bona xebata gerîla û xebata netewî jî derbasdare. Ev ji bo hemû jinên Kurd, heta ji bo hemû civaka Kurd hewce ye. Li ser xwîna evqas Şehîdan bingehek hat avakirin. Çalekiya xweşewitandina keçên Kurd pir girînge.**

**Hûn bibin ala mirovahî û serkeftinê. Ev, ji we hemû rewşenbîran jî tê xwestin. Bingehek berfireh hatiye danîn. Heke hûn ji vê sûd werbigirin hûn ê nemirin. Bêmirinî têra we dike. Belê tu cuda dikarî çi bêjî?**

**Kurdistan Mukrayanî: Tevî ku em li Ewrûpa jî dijîn, em di fikir û rih de vir dijîn. Em hewceyê alîkariya hevin. Em bi hev re nebin em nikarin bijîn. Û em serkeftinê ji bo we dixwazin.**

**Abdulah Ocalan: Di qonaxek ku jina Kurd tê avakirin de, te dît ku dîroka Kurd, mirovê Kurd û jiyana Kurd ji nû ve tê avakirin. Li ser van xebatên me yên hûr û kûr hene. Me wêjeya Kurd ji nû ve avakir. Bingehek mezin hatiye avakirin.**

**Berê dihat gotin ku "*tu bi xêr hatî, wisa hatî, welê hatî*. " Lê em dibêjin "*tu li ser van serkeftinan bixêr hatî û tu li ser jiyana nû bixêr hatî.*"**

**Nîrxa herî mezin ku em bidin we eve. Ango bidayîna jiyana rehet an jî bi pêşkêşkirina helwestên cuda re ji mirov re rêzdariyek mezin nayê dayîn. Rêzdariya herî mezin dîtina gel'e. Te ev jiyan dît, te jina Kurd dît û te keçên wan dît. Balkêşbûna mirov eve, şeref eve û serkeftin jî eve. Yeqîn**

**dikim ev ji bo te jî çavkaniya hêzek mezin û wêrekbûnêye. Ev jiyana nû ye. Wê tu ji vir şûnde xebatên xwe hîn zêdetir mezin bikî û serkeftinê bidest bixî. Ji te re jî serkeftinê dixwazim.**

**Belê Mîrhem, tu dixwazî çi bibêjî, te çi dît? Te çi fêm kir? Tu ji vir şûnde dikarî çi bikî?**

**Mîrhem Yîgît: Birêz serokê min û şervanên serxwebûn û azadiya welatê me, di van çend rojan de li vir û di vê kêliyê de tiştên ku me dîtine bi temamî cewazin û yêkanene. Ger mirov bi hinek peyvên popîler bêje, her tiştê li vir dîrokî ye. Çima dîrokî ye? Ji ber neku li her cih û demê peyva "*dîrokî*" tê bikaranîn ez dibêjin; ji ber ku tiştên îro li vir dibin heta niha li welatê me nehatine avakirin dîrokîne. Ne dîroknasên welatê me dikarin bêjin ku tiştek wisa di jiyana gelê me ya heya niha û paşeroja wê de hatiye jiyîn û ne jî em dikarin bêjin tiştek wisa hatiye afirandin. Temenê**

**me bû 47 û tevî ku em beşên din jî dizanin em nikarin bêjin tiştеke wisa hatiye afirandin. Heta me tiştek wisa di pirtûkan de jî nexwendiye. Me di zanistî de jî tiştek xwedî van taybetmendiyan nedîtiye.**

**Belê, di vê wateyê de dîrokî û cewaze. Heta tişta ku me li vir dîtî, hevalên ku di riya Rêbertiya Partî de exlaq, dîsîplîn, edep û kesayeteke nû bidest xistine, ji ya dê û bavên wan cewaztire. Li vir mirovên nû tên afirandin.**

**Mirov bi baweriyeke mezin û jidil dikare bêje ku, evder weke labaratuwarê ye. Di vê labaratuwarê de pirsgirêka Kurd, nexweşiya Kurd, birîna Kurd, aloziyên Kurd pir baş tên dahûrandin û zelalkirin. Di heman demê de ne tenê dahûrandin û zelalkirin, tedawî û rêbaza tedawiyê jî tê dîtin. Me di çend rojan de kêm zêde hinek rastî dîtin. Me rastiya Rêbertî ji nêz ve naskir. Me çêkera şervan û**

**gerîlayên partî ji nêz ve naskir. Me li vir ji nêz ve dît ku bingeha civakek nû û civaknasiyek nû tê danîn. Hinek jî em li nav gel geriyan. Me dê û bavê şehîdan dîtin. Em li gund û qeza geriyan. Me dît ku civak çawa bi hêz, berfireh û kûranî hatiye guhertin (ya rastî peyva rewşenbîrî hinek girane) û me rastiya xwe jî dît. Me xeflet û ew bîra kûr di nav de jiyan dikir ji nêz ve dît û naskir. Em ketin wê ferqê ku pirsgirêk û aloziya me rewşenbîran çiye. Me di vir de ez navendî û ferdperestiya her kesî dît.**

**Yanî em ketin ferqa ku ji rastiya şoreşgeriyê dûrin. Mesafeyek mezin di navbera me şoreşê de heye. Heke ev dûrbûn-mesefa ji holê nerabe, di navbera fikrê vê şoreşê û rewşenbîran de girêdanek çênebe, rastiya şoreşê û Rêbertiya şoreşê neyê dîtin, wê xebat û çawaniya rewşenbîran heskî bila dîrok be, heskî jî bila wêje be wê hemû ne di cî de**

**be. Di vê rewşê de barê ku rewşenbîr rakin wê nerakin û rola ku pêwîst dike bilîzin nikaribin bilîzin. Pêwîste her rewşenbîrek nêzî vê şoreşê be. Divê dilê wî bi qelbê şoreşê re lêbide. Divê em xwe ji vê Rêbertiyê dûr nehêlin.**

**Dikarim vê bêjim: Yanî em dikarin bi hêcaneke nû, bi riheke hîn bihêztir, welatparêzî û berpirsyartiyê re hîn bihêztir li nivîskariyê vegerin. Em ê li ser van bingehan bixebitin ku, bikaribin bingehê ekoleke nû bavêjin. Ekoleke wisaye ku, wê ew û şoreş di nav hev de mezin bibin, wê dûrî şoreşê nemîne, wê di bin xizmeta şoreş û parastina wê de be. Di wê baweriyê de me ku, yek ji karên herî girîng ku em li ser bisekinin eve. Ji ber wê em ê hemû derfetên xwe serferber bikin, bêxin pratîk û bi cî bênin.**

**Abdulah Ocalan: Belê, te jî gelek tiştên girîng fêm kiriye. Tiştên te**

**kariye ji rêxistin, gel û Rêbertiyê bigrî girtiye. Hinek taybetmendiyên jiyana em di nav de cî digirin heye. Ji vê re ekola Îsveç tê gotin.**

**Xwezka ekola Îsveçê, xizmeta Kurdistanê kiriba.**

**Hîn gelek rewşenbîr hene. Me dixwest ev bibin rewşenbîrên Kurdistanê. Li wir gelek nivîskar derketin holê. Me dixwest ew nivîskar xizmet ji wêjeya Kurd, hunera Kurd re bikin û bikevin bin xizmeta şoreşa Kurdistanê. Ez di wê baweriyê de me ku tiştên te ji vir girtî tu ji wan re ragihînî, bi wan bidî fêmkirin wê bên şoreşê. Yan wê îflas bikin, yan jî wê durist bin. Rewşenbîrên li Ewrûpa yan wê bigihin rastiyên li vir derketine holê, bigihin rihê ji bo wêje û hunera Kurd derketiye û mezin bibin, yan jî wê bibin sextekar xwe bi xwe bixapînin û îflas bikin. Ji derveyî vê ti rêyekedin ji wan re namîne.**

**Hûn vê dibînin. Divê hûn temsîla wê bikin bimeşin. Di wê baweriyê de me ku, wê ev me bigihîne rastiyên mezin. Yekî ji welat, rastiyan, huner û wêjeyê dûr, li ser navê Kurdeyatiyê ancex dikare xwe bixapîne, lê nikare kesekedin bixapîne. Tu nikarî bêjî jiyaneke erzan, riheke sar û mirî, rihê Kurde. Tu nikarî bikaranîna çend peyvên Kurdî û xêzkirina çend rêzikên Kurdî li ser navê Kurdeyatiyê baxivî. Divê hûn xwe ji vê rewşa derew derxînin.**

**Weke min gotî edep, ji bo afirandina rihê nû yê Kurd'e. Li ser bingeha başî û xweşiyê ji bo hunara gelê me ye. Lê ev kirêtî û ji welat revê mezin dikin. Şoreşeke mezin heye, lê ew li hember vê şoreşê derdikevin. Mirovê nû yê Kurd tê afirandin, jina nû ya Kurd tê afirandin, lê ew ji vê direvin. Heskirina mezin ya Kurd tê afirandin, ji vê jî direvin. Li şûna vê dibezin heskirina jinê ya**

**erzan, heskirina jiyana erzan û heskirina Ewrûpa.**

**Ev, dijminatiya Kurdistan, mirovê Kurd û jina Kurd'e.**

**Yekî ne bi welatê xwe re be, nikare bi cîhanê re jî be; nikare li hember gelên din temsîla jiyaneke bi şeref bike. Pêwîste rewşenbîrên me xwe ji vê eybê xilas bikin. Eybiya herî mezin jî vê li ser navê ronakbîrî û wêjeyê dikin. Ev xetayek pir mezine. Heta ne xetayeke jî, îxaneteke mezine.**

**Di wê baweriyê de me ku, wê durist bin. Em nabêjin îla li gel PKK'ê bixebitin. Ka bila ji Kurdeyatiyê re xizmet bikin, heskî jî bila li hember PKK'ê be. Ev pir zêde ne girînge. Lê dijminê Kurdan kiye? Niha derket holê. Dostê Kurdan kiye? Ev jî diyar bû. Diyar bû dostê me jî kiye. Bila ev "*rewşenbîrên*" Kurd jî xwe zelal bikin. Ji bo çi, li ser kîjan bingehî hene? Çi dikin? Xwe, malbata xwe û çend**

**qurûş pere dîtine. Li dora van mîna dolabekê dizivirin. Kurdeyatiya ew dikin jî ji bo jiyaneke biçûk û mirovên biçûke.**

**Xwe ji vê rewşê rizgar bikin! Heke ji vê rewşê rizgar nebin, hûn ê nikaribin bigihin hişmendî û ramanên mezin. Nikarin derbasî jiyaneke welatparêziyê bibin.**

**Me pêşketinên mezin afirand. Tiştên hatine afirandin dikare bên nirxandin û mezinkirin. Li ser bifikirin, binivîsin û kom bibin. Hêza rewşenbîran ava bikin. Tenê nemînin. Heke hûn bi tenê bimînin hûn ê lewaz bikevin. Werin rewşa hêzek ku dengê we derbikeve, bila bandora pênûsa we hebe. Ji bo wê hûn di warê madî û teknîk de lewazin. Em dikarin alîkarî jî bi we re bikin. Lê hûn jî bibin xwedî tiştekê. Bibin xwedî hêz. Heke pirsgirêkên we hebe, divê hûn rakin. Xwe bi gel bidin qebûlkirin. Heke hûn xwe bi gel nedin qebûlkirin, hûn ê**

**nikarin di nav gel de bibin xwedî bandorekê. Tabî di vê rewşê de kes nirx nade we.**

**Rewşenbîr ji bo gel û ji bo dîrokê heye. Erka rewşênbîr ronîkirine.**

**Ma rewşenbîr kor dike? Na!**

**Ronî dike û pêşiya jiyanê vedike. Lê yên me li ser navê ronîkirinê bi jiyanê dilîzin. Yanî ji gel dûr ketine û heya dawî xistine nav tarîtiyê. Divê ev xapandin û lîstik bên guhertin. Heyfe, bi tiştên dikin re jiyana em diafirînin jî dixetimînin. Divê destûra vê neyê dayîn. Weke min her çarê dayî diyarkirin jî, heya dawî me rexne bikin. Heke kêmaniyên me hebin bêjin. Heta dawî xwe bi rastiya Kurd û Kurdistanê ve bidin girêdan. Bi rastiya gel ve werin girêdan. Heke hûn ji partiyên cuda bin, heta bê partî jî bin, dîsa jî bibin yek. Di cî de bigel û serkeftinê ve werin girêdan.**

**Mirov nikare bê serkeftin û binkeftî bimîne.**

**Binkeftin bênamûsiye.**

**Jiyanek bê gel nemûmkûne. Di vê cîhanê de ji derveyî me yê ku netewbûna xwe neyî heye? Ji ber vê dibêjim, bi gel re bibin yek ku di vê cihanê de derfeta we ya jiyanê hebe. Dema wisa dibêjim, dibêjin "*wisa dîktarore, wisa heskesî diçewsîne dike.*"**

**Na!**

**Mirov nikare bê gel, bê civak û bê xak bimîne.**

**Bêcivakbûn û bêxakbûn, bê mirovbûne.**

**Mîna lawirek bûyîne. Ji derveyî xwe kesî nasnake.**

**Her yek ji we xwe bînin rewşa pêşengekî. Hewl bidin xwe bigihînin gel. Evqas gel heye, we bi wan re qet civîn çênekiriye. Civîn çêkin. Ez du roj tenê bê civîn nasekinim. Ma mirov dikare bi rojan, bi mehan bi tenê bimîne?**

**Gel bernedin.**

**Ji bo we jî gel çavkaniya hêzê ye. Hûn çiqas gel bibînin, ewqas bibin hevbeşê pirsgirêk û birînên wan. Dîsa hûn çiqas xwe bidin nasîn, hûn ê bikaribin ewqas pirsgirêkan çareser bikin û bibin xwedî hişmendî. Bi vî rengî dikarin hinek pirsgirêkan çareser bikin. Yanî ji bo we pêşnûme, şêwaza xebatê û gavên pratîkî pêwîste.**

**Ji hina şûnde jî di wê baweriyê de me ku, di dawî de hûn ê jî bibin hêzek. Bi rastî jî şoreşa mezin ya di encama tevgera rizgariya netewe de avabûye, cihê we jî tê de çêbûye. Xwe layîqê vê bibînin. Tiştên we li vir dîtine ji bo we hêzek mezine. Divê hêcan bide we. Ev, riheke nû û mezin dide we. Layîqê vê bin û bizanibin heya dawî jê sûd werbigirin. Xuliqkar bin û vê derbasî welat bikin. Derfetên we jî hene. Heke derfetên we nînbe ji me bixwazin. Tenê bikaribin bimeşin. Belê, hûn cuda dikarin çi bêjin?**

**Mîrhem Yîgît: Gelê me erkên xwe tîne cî; şervanên me di bin mercên pir zehmet de erkên xwe dikin. Rêbertiya me bi şêwazeke pir cuda û afirîner, bi awayeke li ti cihê cîhanê çênebûye xebat û erka xwe dimeşîne û perspektîfên girîng û pêwîst dide. Em nêrîn û daxwazên Rêbertî ji bo xwe weke fermanekê digirin. Em fermanên şoreşê, weke fermanên heq-hûquqê dibînin. Em ê li ser vê bingehê û bi vî rihî vegerin.**

**Abdulah Ocalan: Rêbertî ji we re xizmete. Li vir nekevin şaşitiyan. Rêbertî ji bo we çare ye, hêze, xizmete. Rêbertî li ser we xwe mezin nake; tenezilê vê nake.**

**Rêbertiyê rast nas bikin. Kurdeyatiyê rast binasin.**

**Gelek kes dibêjin; "*em Kurdê baş û xweşikin.* " Lê di rastiyê de jî xwe rezîl kirine. Kurdê xweşik tişteke dine. Heke Kurdê nû yê hatî afirandin, jiyana nû ya hatî afirandin nebînin wê**

**ev weke pirsgirêk derkeve pêşiya wan. Heta nikarin henase jî bigirin, wê rezîl bibin. Hema bigihin wan û wan bikişînin jiyana nû. Bila bên feraseta mêrxasiya nû hatî afirandin. Pêwîstî bi fêrbûna navê min jî nake. Hebûn û tinebûna min zêde girîng nîne. Dev ji Apo berdin. Ji hezar salî vir ve cara yek Rêbertiyeke piştî hezar salî tê afirandin.**

**Belê, Ehmed te jî pir tişt girt, dît û ji niha şûnde jî tu yê bikaribî hêz bênî.**

**Ehmed Tîgrîs: Ji wexta ez hatime qada Rêbertiyê heya niha, min gelek wêneyên mirovan yê hundur û derve kişand. Min cîhana civaka Kurd ya hundir û derve dît. Min cîhana Rêbertî ya hundir û derve dît. Min xwest him wêneyên derve bikişînim, him jî cîhana hundir û wêneyên rih bikişînim. Ji ber wê jî min çanteyê xwe tijî kiriye. Hundirê çanteyê min bi wêne, nîşe, hevpeyvîn û kasetên**

**dengan tijiye. Ji derveyî vê jî gelek tiştên di serê min de zelal bûne hene.**

**Hevalan ev bi berfirehî vekirin. Bi rastî jî, di nav gel de mayîn û ji şoreşê dûr jiyankirin qebûl nabe. Lê ez li ser navê xwe, her çiqas berê zêde nebûbe jî, ez her tim di navbera gel de mam. Tabî ev têr nake, kêmbûneke. Kêmaniyên min yên şexsî jî hene. Ji derveyî vê jî tiştên min ji vir girtine, him wêne, him deng û him jî weke hevpeyvin ez ê hemû derfetên xwe bikar bînim û belav bikim. Wê tenê bi vê re jî nemîne, ne di gotin de, wê heval me di nava pratîkeke çalek de bibînin.**

**Tiştekedin min dîtî heye: Min di nava PKK'ê de têgiha rexne û rexnedanê baş fêmkir. Rexne-rexnedan çiye? Dîsa Rêbertî mirovan çawa weke xetekê ber bi şoreşê ve dibe, gemarî û bîna bi salan a li ser me paqij dike dît. Wiha Rêbertî dixwaze mirovan çawa biafirîne, bi**

**sabûn û her tiştî dişo, wê çawa bi enerjî û baweriyeke mezin ve têr dike û li hember dijmin dide şerkirin dît. Encameke din ku ez him di nav gel de him jî li vir gihiştimê mesafeyên mezin ku hatîn girtine. Gel hemû heta gundiyên xwendin û nivîsandina wan nînin jî ev felsefe ji bo xwe girtine û fêm kirine. Dîsa ji gundan bigire, hemû kesên bi temen û zayendan, yên xwendin û nivîsandina wan hebe nebe hemû kes gihiştiye vê astê. Ji bo min ev bûyereke mezine. Bi kinahî dikarim van bêjim.**

**Abdulah Ocalan: Belê, Ehmed weke tu jî dibînî karên pir girîng û mezin tên kirin. Ji bo tu jî bi Kurdeyatî û pedegojiya Kurdeyatiyê re mijûl dibî her yek ji van ji bo te jî mîna mifteyekê ne. Ji niha şûnde gelek diyardeyan ji hevdu cuda bikin. Yekî bi aqil be, yekî dizane ji me bigire, di wê baweriyê de me ku bikaribe her tiştî çareser bike; her**

**wiha dikare gelek tiştên mezin bike. Di jiyana Kurdan de her tim têkçûnê dibînim. Weke min di destpêka civîna îro de jî gotî jiyana niha tê meşandin heta bêjî riziyayî û hundirê wê vale ye. Xwe dixapînin; heyfe. Lê wê Rêbertî naxwaze jiyaneke riziyayî ji bo xwe bike şêwayeke jiyanê. Divê tişta ji Rêbertî bê hêvîkirin jî ev be. Li hember vê me afirandina jiyaneke serkeftî çawa be li ber çavê we hemûyan îsbat kir. Tabî, raste; te jî hundir û derveyî vê dît. Gelek tişt li ber çavê te zelal bû. Te afirandina mirovê Kurd, terbiyeya wê, ji gelek aliyan ve paqijkirina qerêjiya wê ya hezar salî dît. Dîsa te erzantî, ketîbûna ji her alî ve dît. Û dîsa çawa vejîn dibe, li vir neşter, şûr û pirsen Rêbertiyê çine û çawa vejîn dibe dît. Te ev di nav gel de çawa tên meşandin dît. Heke hûn bi aqil bin, ev ne pêşketinên ji rêzêne.**

**Em van hemûyan ji bo we dixwazin. Bi awayeke giştî xwe bidinê. Jiyana we ji dest diçe, li hember vê xwe nexapînin. Ez van ji bo hemû mirovan û gelê Kurd dibêjim: Xwe bînin asta hêzeke mezin û gavên wisa mezin bavêjin ku, dengê we bê bihîstin. Bibin xwedî biryar û hêz. Hûn çima bêdeng tên û bêdeng diçin; feqîr tên û feqîr diçin; vale tên vale diçin; bêyî jiyanê nasbikin hatine, bêyî jiyanê nas bikin diçin? Heyfa we. Ez bi vî halê xweve, xwe tiştek nahesibînim. Tevî me evqas tişt ditiye û afirandiye hîn jî ji min re wisa tê ku min tiştek nekiriye.**

**Dibêjim hîn mezintir dikare çawa bê afirandin.**

**Hinek ji min re dibêjin, "*ma tu hîn têr nebûyî? Evqas xebat kirin, li hember wan derfetan ma nebese*?" Bi misogerî têr nebûme. Heke têr bibim, wê hilberîn bisekine. Heke bêjim "*bese, min barê xwe rakir, min xwe***

***mezin kir*" tu yê mezin nebî û tiştek bidest nexî. Lê ez ji Rêbertiya xwe ne razî me. Ez wisa dikim. Hûn hîn bilind nebûne, serwer nebûne û ne afirînerin. Derfet hene vê binirxînin. Tişta mirov mezin dike şêwaza xebatêye, "*Ji bo ramanên xwe bigihînî çihek din, hîn zêdetir bixebite, hîn zêdetir derfet biafirîne û hîn zêdetir bilind bike.*" Ji bo we jî ev şêwaz hewce ye û pêşnûmeyek bingehîne.**

**Hûn hinek karên biçûk dikin dibêjin; "*ji bo me bese*. " Hinek xwarin dikeve devê we dibêjin "*ji bo me bese*. " Fersendeke biçûk yê jiyanê dikeve destê we dibêjin "*ji bo me bese.* " Hûn rehet dibin. Ev rehetbûn berhemdariya we, fikirandina we asteng dike. Ji ber vê têrbûna wene mezine. Yanî hûn riya mezinbûnê, rêbaza wê, pêşnûmeya wê ji xwe dûr digirin. Hûn gelek zû têr dibin. Tî dibin dibêjin "*ne tî me*;" birsîne dibêjin "*ne***

***birsî me*;" nizanin dibêjin "*dizanim*" nakin dibêjin "*dikim*" dengê we dernakeve dibêjin "*dengê me derdikeve.* " Hûn xwe dixapînin. Heke hûn bejin; "*me evqas kiriye*" ne raste. Ji ber ez ê bêjim we tiştek nehilberandiye, we her tişt tine kiriye. Ev xwe xapandine. Heke hûn dixwazin li ser navê mirovahiyê hinek tiştên girîng biafirînin, divê hûn li ser van mijaran baş bisekinin. Heke hûn li ser vê bingehê tevnegerin, wê ti nirxeke nivîsandina we û tiştên hûn dikin nebe. Heyfe. Madem we li ser van mijaran evqas sal ked daye, wê demê bila ev keda we vale neçe.**

**Li dîrokê temaşe bikin:**

**Gelek kesan bi serê xwe dest bi karên mezin kirine, li ser rastiyên mezin û mirovahiya mezin sekinîne. Di dawiyê de ev bûne mirovên azad.**

**Bi pere her tişt nayê kirin.**

**Yê pere afirandî mirove.**

**Yê ku siyaset û şer afirandî jî mirove.**

**Di destpêkê de ne siyaseta min, ne şerê min, ne pereyê min û ne jî mal û mulkê min hebû. Ti tişteke min nînbû. Destpêk mirov girînge. Heke hûn bibin mirovek bi vî rengî, ev berdelaher tiştî ye. Yanî di destpêkê de miroveke dilnimz hebû, kesayeteke xwe mirov dihesiband hebû. Kesayeteke xwe bîne asta miroveke baş hebû. Qurûşek tenê pereyê min nînbû. Her tim deyndar bûm. Lê min pirsa "*ez ê xwe çawa bênim rewşa mirovekî?*" ji xwe kir. Diviyabû min xwe banîba asta miroveke wisa ku, destpêkê ez ji xwe razî bûma. Pêwîst bû min karîba gotiba "*ez bûme mirov*. " Piştî min van mirovan afirand şûnde, min temaşe kir ku, ev kesayet hemû hatine rewşa miroveke rast, leşkerek rast û şer. Ev îsbateke mezine. Ger xwe biafirînî, xwe bênî rewşa yekî durist, piştre wê**

**her tişt ji ber xwe de çêdibe. Pêwîste ev, ji bo we jî bibe hêzeke mezin. Me ev hêz da we. Bawerim hûn ê ji vê sûd werbigirin. Hûn ê bikaribin bikin? Li ser vê mijarê çend pirtûk binivîsin, çend gavan bavêjin û serkeftî bin. Di vê mijarê de hatin û serdana we girînge. Heke hûn di çarçoveya min danî de tevbigerin, hûn ê bikaribin pêngavekê bikin. Li ser vê bingehê ji te re jî serkeftin dixwazim.**

**Ev civîna me ji bo rewşenbîran lidarxistî, di cî de û bi serkeftî encam dibe. Bi rastî jî bingeh û çarçove baş hatiye danîn. Ji niha şûnde baş li ser bisekinin. Hûn dikarin çend pirtûkan binivîsin. Hûn dikarin vê hîn zêdetir bikin hêz û rê nîşandanê. Bizanibin jê encamên baş derxînin. Ji xwe ev jî karê we ye. Ev kar cihê hûn biçinê û li Ewrûpa baş dimeşe. Li Ewrûpa nêzî milyonek mirovên me hene. Li Ewrûpa hêza me heye. Li Ewrûpa teknîk heye; di rojekê de hûn dikarin xwe bigihînin**

**welat. Ne mîna bere ye. Heke bixwazin, hûn di rojekê de li welat in. Heke hûn bi awayeke durist li ser van rawestin, hûn ê bikaribin di huner û wêjeya Kurd de pêngavekê bikin. Ji niha şûnde dikarin hinek gavan bavêjin.**

**We di konferansa çandî ya Kurd de hinek pirs pirsîbûn, we bi berfirehî bersiva wan pirsan li vir girt. Em dixwazin çi bikin, bangawaziya me çiye we baş dît. Ji niha şûnde vê bigihînin hemû rewşenbîran. Xwe ji takekesiya di hundirê we de mezin bûyî, dîsa şaşî û xeletiyên ketine nav rizgar bibin. Ji xwe re hinek qadên xebatê biafirînin. Di vê mijarê de hûn jî amadekariyên xwe bikin. Komîteyeke amadekariyan ava bikin. Bi dostan re hinek têkilî deynin. Di xebatên dîplomasiyê de jî dikarin li ser van mijaran rawestin. Li Ewrûpa "*Zaningeha Kurdistanê*" dikare bê avakirin. Wê ev bibe gaveke mezin.**

**Akademî jî heye. Hûn dikarin hezeke mezin ya rewşenbîran ava bikin. Heval jî dikarin bibin alîkar. Lê hûn jî hinek xwe bigirin dest: Rastiya we çiye, jiyana we çiye? Beriya niha çawa bû, wê ji niha şûnde çawa be? Li ser jiyanê bi awayeke dilnizm bisekinin. Û bila baweriya we bi we hebe. Wêrek bin. Hîn her tişt ji dest neçûye.**

**Xebatên netewî û xebatên azadiyê tenê ne kareke ciwan û Rêberti bi tena xwe bimeşînine. Karê hemû gele, karê we hemûyane, karê mirovahiyê ye.**

**Şoreşa Kurdistanê di Rojhilata Navîn de ronesanseke; ji nû ve vejîne.**

**PKK dixwaze li hember esareta mezin, li hember medeniyeta biçûk û mezin xwe bîne asta jiyanê. Ev îdia gelek bihêze. Derfetên wan jî heye. Divê hûn li ser vê jî pir bihêz bisekinin. Ji bo mirovahiyê Şoreşa Kurdistanê ji çi hêlê ve şaristanî ye?**

**Dikare çi bide şaristaniya kevin? Li ser vê hûn dikarin gelek tişt bikin. Gelên din yên cihanê jî dixwazin di derbarê me de gelek tişt bibihîsin. Hûn dikarin vê ji wan re ragihînin. Bixebitin û bê çare nemînin. Dibe ku destpêk lewaz be, bê îmkan be, lê heke hûn bi înag, bi sebir û bi biryar bimeşin, dê dawiya wê mezin bê. Ev şêwaza xebata me ya heya niha bû. Kesî bi qasî min bê derfet, bê çare û bê hêz dest bi vî karî nekiriye. Lê weke hûn jî dibînin hinek derfet derdikevin holê. Bi israr li ser tinebûnê sekinandin, wê dewlemendiyê derxe holê. Heke bi israr li ser jiyanê bisekinî, heta dikarî ji mirî jî jiyanê biafirînî. We dît ku ev çawa hatine afirandin, hemû li ber çavê we ye.**

**Bêdîrokî veguherî dîrokê, bê edebî hat rewşa edebê.**

**Mirovê ketî, ji her alî ve gihand serkeftinê.**

**Jiyana ketî, li her qadê veguherand jiyanê.**

**Hêza herî binirx ku me dayî we eve. Ev, diyariyeke binirxe. Ji derveyî vê jî tişteke din binirx nehesibînin. Daxwaza we ya herî bingehîn û ya her timî ev bû. Ji vê re jî nirx bidin. Hûn hatin, em carekedin silav dikin. Hatineke di cî de ye û di asteke mezin de gihiştiye armanca xwe. Bi awayeke durist, bi biryar û israr li ser bisekinin. Û her tim van bilêv bikin. Bi vî rengî wê edebeke netewî çêbibe, edeba rewşenbîrî çêbibe. Hûn dikarin di hunera Kurd de gelek pêşketinan çêbikin. Herî zêde jî di wêjeya Kurd de gelek pêşketinan derxin. Em ê dîsa bi we re bin. Em ê bi her awayî alîkarî bikin. Heke hûn bixwazin em dikarin hîn zêdetir xizmetê ji we re bikin. Ji we hemûyan re, ji hemû rewşenbîrên Kurdistanê re, çi Bakur, çi jî Başûr ji niha şûnde ji we re jiyaneke serkeftî dixwazin.**

**30 Tebax 1994**

***"Û REBÊ Xwedê camêr ji axa erdê çêkiriye û bi devê xwe henasa jiyanê daye bêvla wî û camêr bû rihek jiyayî. Her wiha REBÊ Xwedê ber bi Rojhilat ve li Adenê bexçeyek çêkir û camêrê çêkirî jî danî wir. REBÊ Xwedê her dara ku bedewe, xwarina wê xweşe, dara jiyanê ya ku di nîvê baxçe de ye û dara qencî û xirabiyê dizane ji erdê xilas kir. Vê carê ji bo avdana baxçe robarek ji Adenê derket, ji wir bû beş û bû çar şeq. Navê yêkî Pîşone; hemû warê Havîla ya ku tije zêre dorpêç dike û zêrê vî***

***warî başin; li wir kevirê spî û heqîq hene. Navê robarê duwem jî Gîhone; yê ku hemû bajarê çûkan dorpêç kirî ew e. Navê robarê sêyem jî Dîcle ye; ya ku li pêş Aşûr diherike ew e. Û robara çaremîn jî Firat'e. REBÊ Xwedê camêr girt, ji bo lê binêre û biparêze danî baxçeyê Adem. "***

**Tewrat**

**KOK Û ŞERÊ HEVGİHÎNÊ**

**Cara yek kesayeteke ji dîrokê tê, yekî ji gelê dîroka pir kevin tê û dîsa berpirsyarê saziyeke ku ez pir nirx didimê bi kêfxweşî pêşwazî dikim.**

**Rûpeleke nû vedibe.**

**Min, derketina PKK'ê her tim, weke derketina tevgera pêxemberan**

**nirxandiye. Em, domdariya kevneşopiya wan pêxemberane. Dema ez wan û Îsa tînim bîra xwe; bi rêzdarî û heskirin nirx didimê.**

**We hîn duh li bîr anî; we got ku, "*jiyana we hinek dişibe ya Îsa.* " Dibe! Ez her tim hevalan dişibînim hewariyên Îsa, dibêjim pêwîste mîna wan bin. Temenê hevalên me yên kevin hema hema nêzî 40'î ye. Mal û milkê wan nîne. Dîsa rewşeke wan bibin xwedî tiştekê jî nîne.**

**Bawer dikin ku ji bo mirovahiyê jiyan dikin.**

**Ji ber wê PKK'ê weke rêxistineke neteweperest, heta komînîst nirxandin, xetayeke mezine.**

**Tevgereke pir girêdayî mirovahiyê, ne neteweperest, dîsa nakeve fenatîzma ti olî, mezhebî û tevgereke xweşbîniyê ye. Dîsa cudahiya zayend, neteweyî û mezhebê nake. Şerê têkoşîna min ya**

**di ber oxira vê xetê de tam 20 saliya xwe temam dike.**

**Min ji Anqerê destpêkir, niha jî li vir im.**

**Dikarim bêjim jiyanek mîna ya hewariya ye.**

**Bi vî rengî wan pêşwazî dikim û wan silav dikim. Dixwazim ji rastiyên xwe agahdarbin û di wê baweriyê de me ku em ê gelek hêz bidin û hêz bigirin.**

**Barbartiya Tirk, gelên Rojhilata Navîn, bi awayeke cihê wê di ti olan de nebe çewsend û sotand. Gelê Asur û Sûryanî jî li gel çand, dewlemendiya wan ku di dîrokê de geleke pir mezine û temsîla çandeke mezin dike, lê di van rojan de dixwazin bermahiyên wan yên herî dawî jî tine bikin. Berhem û dêrên wan yên mayîn hene. Vemirîna wan, min gelek xemgîn dike.**

**Hîn beriya li gel we peywendî deynim û hevdîtin çekim min**

**digot;“*divê ev çand wisa venemire û neçe.* ” Min bang kir û got, “*werin xwedî li çanda xwe derkevin.* ” Yek jî ev çûyîna Ewrûpa, welatê xwe terikandin jî weke lîstokekî dinirxînim. Ji ber ev çûyîn bi temamî tê wateya helandin û tinebûnê. Ji vê hêlê ve jî gelek xemgînim. Her wiha li welat û xaka xwe vegerîn ya herî biwate ye. Xakên heyî, biqasî yê Kurdane, di heman demê de yê gelê Sûryanî-Asurî û Ermeniyane jî. Her çiqas li hember xak û çanda xwe bê hêvî bin jî, pêwîste carekedin wêrekiya vegera welat raber bikin.**

**M. Yohanna: Birêz Serok hûn gelek ciwanin!**

**Abdulah Ocalan: Na! 45 salî me. Têkoşîn min ciwan dike. Rewşa min cuda ye û her kes meraq dike.**

**M. Yohanna: Hûn çawa wisa ciwan man? Hûn çawa vê coşê, vê evînê jiyan dikin?**

**Abdulah Ocalan: Pêwendiya min gelek bi dîrokê re heye. Gelê Kurd jî geleke pir kevnare. Ji bo azweriya min pir mezine ku dîrok tine nebe û nece, ez neçarbûm xwe ciwan bihêlim.**

**M. Yohanna: Em di heman temenî de ne.**

**Abdulah Ocalan: Belê, xweşe.**

**M. Yohanna: Min, tenê qala ciwaniya temen nekir. Di fikir de jî nû û her tişt nip û nû ye. Rêbertiya we gelek pîroz û wisa tê zanin. Ez û hevalên xwe, layengirên xwe, Rêbertiya birêz Abdulah Ocalan dizanin û her tim libîr tînin. Ev rêbertiya pîroz dayîna jiyandin girînge û biwate ye.**

**Zanebûna min jî ya dîrokî heye. Min hinekê PKK'ê nasî û dema min Rêbertiya vê hêza diafirîne dît, dikarim bêjim ku şaş nemam.**

**Dema Îskenderê Mezin yê Makedonya digihe Babîlê 30 salî**

**bûye. Dema Hz. Musa, gelê Yahudî dibe xaka Sîna 30 salî bûye. Hz. Îsa di 33 saliya xwe de tê kuştin û dibin çarmixê. Napolyon beriya 40 saliya xwe dibe împarator. Di dîrokê de çend Rêberên mezin hene. Tişta dixwazim bêjim dîrok dikare bigihîne.**

**Rêbertiya we tenê naşibe van, ji bo min hîn cudatir, pîroz û biwate ye. Ez ji hatina xwe ya li vir û bi we re hevdîtin kirin gelek şanazim. Ev ji bo min serfiraziyek mezine. Ev du-sê salin difikim, difikirîm û me digot; "*em çawa dikarin bi Ocelan re hevdîtinê çêkin, careke din têkiliyên Sûryanî û Kurdan xurt bikin.*"**

**Di destpêkê de mîna alimê dîn'î li gel baweriya xwe ya bi Xwedê re, bi gelê xwe ve jî girêdayîme. Li gel pir tişt bi Xwedê ve dana girêdan, pratîk jî şerte. Ez di wê baweriyê de ku ev Rêbertiya pîroz jî hinekê girêdayî Xwedê ye. Her tiştê ziyanê dide gelê we, ziyanê dide gelê me jî. Dijmin,**

**nakokiyên di navbera van herdu gelan de kûr dike û hewl dide ji hevdu qut bike. Lê heke ev têkilî carekedin bên bihêzkirin, dikare di navbera herdu gelan de têkiliyeke baş bê danîn. Û bi van hevdîtinan, dikarin lîstikên dijmin vale derxînin. Li Tur Abdînê, li herêma Mêrdinê kuştina pênc Sûryaniyan, ji bo me bûyereke mezin bû. Em gelek li ser vê fikirîn û got; "*gelo kî dikare vê bike?*" Gelê me yê li Ewrûpa, li hember vê bûyerê rabû ser xwe û di qada Surî de jî hinek tevger çêbûn. Hinek hêzan bi niyetên xwe yên xirab ev bûyer pêk anîn. Di bin venêrîna we de serdana Patrîka me hat kirin. Em bi vê gelek kêfxweş bûn. Çend hevalan silavên we ragihand û tevlîbûna wan ya ji teziya gelê Sûryanî re gelek biwate bû.**

**Birêz hezretî Patrîk ev got:**

**"*Ev, di dîrokê de rûpeleke nû ye. Di dîrokê de rûpeleke nû vedibe. Ji bo me her tişt ji nû ve destpê dike*."**

**Birêz Patrîk ji gelê Sûryanî re jî ev ragihand; "*Kurd êdî ne Kurdê bere ne, her tişt ji nû ve tê destpêkirin.*"**

**Heke di dema pêş de wextê we çêbe, daxwaz dikim ku hûn birêz hezretî Patrîk re hevdîtinê çêbikin. Ev daxwaza me ye. Hûn dikarin ji hezretî Patrîk tiştên hîn xweşiktir bibihîsin û peywendî hîn baştir bên kûrkirin. Ez bi xwe tenê Metropolîtê Helebê me. Berpirsyarê dêrê yên têkiliyên derve me. Di salê de herî kêm 7-8 caran diçim Ewrûpa, Emerîka û Avusturalya. Beriya niha du mehan kilîseyên Viyana bangî min kiribûn. Ez weke vexwendê wan çûbûm. Ewrûpa, bi taybet di demên dawî de dixwaze di derbarê Sûryanî û Hirîstiyanan de hinek tiştan bibihîse. Em heya niha giştî axivîn.**

**Bi taybet vê dipirsin: "*Helwesta Gelê Kurd ya li hember we çiye, li ser we zext heye, an ne?*"**

**Hinek dêrên li Ewrûpa, di demên dawî de ji bo Kurdan pere kom kirin. Min heya niha, li dijberê gelê Kurd gotineke xirap bikar neaniye. Beriya her tiştî di dîrokê de kevneşopiyên bihêz û pir kevin ku me tîne gel hev hene. Herêma em lê jiyan dikin Mezapotamyeye (Bethnahtin-Beynennahreyn). Û ji destpêka dîrokê ve li xakên Surî yên kevin, piştre Filîstin, Erden û Lubnan jî di nav de me û Kurdan bi hev re jiyan kiriye. Li Bedlîs û Sêrtê gelek Sûryanî hebûn. Ev beriya Hz. Muhemed bû. Piştî ku Kurdan Îslamiyet qebûl kirin şûnde, serweriya wan ya di herêmê de li hember Suryaniyan zêde bû. Û dîsa di dîrokê de li Riha, Nisêbîn, Şengal, Amed û di gelek qadên cuda de piştevaniya hev kirin û nêzîkbûnek Kurd û Suryaniyan heye.**

**Beriya Îslamiyetê di ti demên dîrokê de nayê dîtin ku Kurdan zerar daye Sûryaniyan. Û em dizanin ku**

**gelek Kurd bi zimanê Suryanî, beşek mezin yê Sûryaniyan jî bi zimanê Kurdî diaxivîn û hîn jî li Qamişlo Kurdên bi zimanê Sûryanî diaxivin hene. Hemû Sûryaniyên li Beşirî û Xerzanê bi zimanê Kurdî diaxivin. Li Tur-Abdinê gelek gundên Sûryaniyan yên bi zimanê Kurdî diaxivin hene. Gundê ez jê hatime gundê Erde, Kefra, Tojda, Haxe û Kerboran; hîn bi zimanê Kurdî diaxivin. Ji ber zimanê Kurdan yê niviskî nebûye, çanda wan zêde kûr jiyan nekiriye. Lê me gelek tiştên dîrokî ku ji Kurdan girtine birine bi tîpên Sûryanî nivîsandî gelek hene. Li gelek deran hîn jî Încîl bi Kurdî tê xwendin. Bi taybet ji bo Sûryaniyên bi Kurdî diaxivin, heta wergera Încil a bi zimanê Kurdî heye.**

**Lê piştî 1914'an şûnde her tişt di carekê de hat guhertin. Kurdên dijminê nasnameya xwe ne jî, li gelek Sûryaniyan jî dan. Ev jî bû sedema koçberiya Sûryaniyan. Xakên ku 6000**

sal me li ser jiyan kirin, bi taybet me piştî vê dîrokê şûnde berda. Li Surî hîn hêjmareke zêde Sûryanî hene. Sûryaniyên li Humusê, niştecihê vê dere ne. Hemû Sûryaniyên li Helebê ji Mezapotamyayê nehatine. Bûyerên 1914'an gelê Sûryanî yê li Riha, Mêrdîn, Nisebîn û herêmên din pir kûr bandor kiriye. Di nava me de yekî sedema vê ya rastî dizane nînbû.

Çima Kurdan li me dan?

Piştre em têgihiştin ku dijminên me yên rastîn ne Kurdin, hêzên dinin û Kurdên ji van hêzan re bûne amûr li me xistine. Birêz birayê min Abdulah jî sedema vê ya rasteqîn pir baş dizane. Ji bo ku dijmin Kurd û Sûryaniyan bike dijminê hev û dostaniya wan ya dîrokî xirab bike ev seneryo amade kirine û Kurd weke qatîlê rastîn dane diyarkirin. Di van bûyerên hatine jiyîn de diyar dibe ku, ji bo Kurd jî negihin armancên xwe yên rastîn her tim wisa bikar anîne.

**Di nav Kurdan de jî nivîskarên durist derneketine ku, rastiyan binivîsin. Em van rastiyan niha hîn baştir dibînin, dizanin. Dema em arşîvên dîrokî vedikin vê dibînin; dijminê Kurd û Sûryaniyan yeke. Niha her tişt ji bingeh ve hatiye guhertin. Karkirina me ya bi hev re û alîkariya me ya dayîna hev biwate ye.**

**Dêr û manastirên li Tur Abdînê tenê ne yê me ne, di heman demê de yê we ne jî. Dîrok û çanda me bi qasî yê me ye, yê we ye jî. Heke hûn van neparêzin, hûn ê xirabî li xwe bikin. Lewra ev dewlemendî û xweşikbûnên Kurdistanê (Mezapotamya) ne.**

**Bi kinahî dixwazim vê ji birêz birayê xwe Abdulah Ocalan re bêjim: Heta ev jiyan bikin wê Kurdistan xweşik be û wê xweşik bimîne. Belkî ji bo min ev tê gotin û tê pirsîn dibêjin, "*ev metropolît çi dixwaze?*" Daxwaza min, ev tiştên hatine gotin nivîsandin û her kes vê bizane ku;**

**Kurd û Sûryanî ne dijminê hevin, birane.**

**Alîgirê dîrok ji nû ve bê nivîsandinim.**

**Heta Sûryaniyên bixwazibin koç bikin hebin jî, divê em bi hev re wan bidin sekinandin. Hêzên derve, koçberiyê zêde dikin. Bi sedî salane em bi hev re jiyan dikin û em ê dubare jiyan bikin. Em hevdu jî nas dikin û qebûl dikin.**

**Abdulah Ocalan.: Şêwaza çêbûna min, li ser bingeha çandeke pir pêşkeftî çênebû. Tevî zanebûna dîrokî zêde li gel min nebû jî, ez niha baştir dibînim ku karê min kirî, ji bo berjewendiyê gelan guncave. Min xwe pir azad gihand. Min li hember hemû zextên olî, zextên mezhebî, zextên netewî û zextên cînseltî helwestên pir bi biryar pêşxist. Hîn beriya hevdîtinê çêbikim û rastiya gelan bibînim jî, rojek tenê jî eleqeya min ji bo fikreke bawerhişk çênebû. Li gel**

**gundê min lê jiyan dikir gundeke Ermeniyan hebû. Ev gundê Ermeniyan Tirkan hemûyan tine kirin, xişikandin û kilîse jî kirin mizgeft. Ez vê mizgeftê baş dizanim. Ez pênc salan bi meş çûm dibistanê. Dibistan li gundê Cibinê bû. Ez bawerim hîn li wir Ermenî hene. Li wî gundî wexta min ew kilise didît, min ji xwe re digot tiştek wisa xweşik çima anîn vê rewşê. Wekî ku dareke bingehîn, lewaz hatibe tamandin. Ev bîranîneke zarokatiya min e. Bavê min dostê Ermeniyan bû, misilmaneke baş bû, pir girêdayî nimêja xwe bû jî. Lê weke dosteke baş yê Ermeniyan jî ma.**

**Niha her çiqas dîroka Asuriyan qala ew împaratoriya mezin ya wehşî-kole bike jî, weke gel bi rastî jî li Mezapotamya geleke esas bû. Nêzî 4 hezar sale, Ermenî û gelê Kurd di nav hev de jiyan dikin. Mileteke bi Kurdan re pêş ketine. Heya bêjî di nav hev de ne. Hîn jî gundên Asuriyan li**

**Colemêrgê hene, li Sêrtê, Mêrdînê û Amedê hene. Li Başûr Kurdan bi Sûryaniyan re, li Bakur jî bi Ermeniyan re jiyan kirin. Tabî ji nêz ve eleqeya min li hember lêkolînkirina dîrokê heye. Heke heya niha hatibin, teqez ji ber pêwendiyên baş hatine.**

**Kêmaniya 1914'an bingeha xwe ji polîtîkayên kemalîst, Îttîhak-Terakkî, Alayên Abdulhamît ên Hamîdiye û polîtîkayên cerdevaniya gundan digire. Ev sedema felaketên herî mezin yên di sedsalên dawî de tê serê Ermenî, Kurd û Sûryaniya (Asurî) ye. Him jî yek ji nûnerê wê yê herî bihêze. Alayên Hamîdiyê ku ji Kurdan ava kirine him Ermeniyan, him Sûryaniyan û him jî Kurdan qetil kirin, şikandin. Bi rastî jî polîtîkayek pir xirabe û Îttîhad Terakî çewsand û tine kir. Mistefa Kemal ev sîleh bi awayeke hîn xiraptir bikar anî.**

**Herî dawî raperîna li Colemêrgê ku Patrîk Şemûn jê re rêbertî kirî**

**heye. Di vê raperînê de bi hovane hat perçiqandin. Dîsa Kurd xirap hatin bikaranîn. Ji xwe di vê dîrokê de Ermeniyan tine kirin. Piştî wê, Kurd berdan hev û qetil kirin.**

**Derketina min a li hember vê dîrokê pir girînge.**

**Û cara yek ez li hember derketina wê de biser ketim.**

**Birêz Yalçin Kuçuk di vê mijarê de ev digot: "*Cara yeke tu vê dewletê wisa dihejînî û ev hejandin, hejandineke bi temamî ji nû ve dîtina dewlemendiya çanda gelan a dîroka gelane. Ev derketina te ne li ser navê olekê ye, ne li ser navê mezhebekê ye û ne jî li ser navê netewekê ye jî. Berteka hemû mirovahiyê ya li hember vê zilma mezin îfade dike.* " Ez girêdayî formula tişta herî baş ya ji bo mirovan, ya herî rast û ya herî xweşikim.**

**Rêgezên min ev in.**

**Kîjan ol girêdayî vê rêgezê be, rêza min a mezin jê re heye. Dîsa kîjan îdeolojî, kîjan çand nirx bide van têgihan, ez ê xwe ji wê bihesibînim.**

**Biyanîbûna olî, gel ji hev dur xistiye. Di roja me ya îro de jî yên vê bikar tînin hene. Ji olên cuda bûyîn, gelan nake dijminê hev, divê neke dijminê hev. Em dizanin ku hîn niha hêjmareke zêde Sûryaniyên li Mêrdînê bi Kurdî diaxivin.**

**Heta hinek dostên me yên hêja jî, ji vir derketine. Bawerim Mixayel ji vir bû. Yakup yê li Îdilê şehîd ketî û yên li Qoserê şehîd ketine jî dostên binirx bûn. Ji bo me ev mirovên binirxin. Heval dibêjin hîn jî gundên Sûryaniyan li gel gelê Kurd gelek dostin. Di destpêka têkoşîna me de, dikarim bêjim ku di nav dijminahiyeke taybet de nebûn. Tabî divê veguherînin dostaniyeke hîn bi pîlan û zanebûn. Ez ji rewşa gelê Kurd baş dizanim ku, her çiqas beşeke pir kêm di şûnde**

**hatibe hiştin jî, divê gel biçûk neyên dîtin. A rastî yek ji netewên herî paşkeftî û hatî jibîrkirin bû. Di wateyekê de careke din bi me re derdikevin ser dika dîrokê. Dema ez derketim yek kesî tenê jî nedigot "*ez Kurd im.* " Min bi serê xwe bi salan têkoşîn kir; ne weke Kurdek, weke mirovek, weke mirovek hinek bi namûs. Bûna Kurd, ji mirinê zêdetir tiştekedin bi xwe re netanî, lê hinek şeref û hesasiyeta mirov, înkareke wisa, şûnde hiştineke wisa mezin qebûl nedikir. Bawer dikim, ew bi xwe jî van nirxan tevan parve dikin.**

**Dem bi dem tiştên ku min kirine bi tiştên ku pêxember kirine ve beramberî hev tînim.**

**Û dibêjim mîna qonaxên destpêkê ye. Misilmantî, misilmantiya zayîna destpêkê ye, ya piştre zêde cidî nagirim.**

**Dema ez we dibînim Îsa difikirim û dibêjim, "*çiqas dikariya bibe hevalê***

***min.* ” Û di wê baweriyê de me ku, şibandinên gelek nêz hene. Heke bêjim ji we hîn nêztirim, dibe bi we xweş neyê.**

**M. Yohanna: Bi vê bawerim! Dikarin tişteke wisa destpê bikin; dikarin rêxistineke li ser bingeha Hiristiyantî û misilmantiyê pêk bênin. Yanî em dikarin li ser bingeha ol jî hevpeyvîn pêş bixin. Tişta dixwazim bêjim olên me cuda bin jî, ev cudabûnê îfade nake. Yek jî ol ne cudabûnê, yekîtiyê îfade dikin. Têkiliyên me yên jiyanî hene, em dikarin cejnên hev jî pîroz bikin, cejnên me jî yek bin. Di vê rojiya remezanê de hinekan ji bo fitarê ez vexwendibûm. Min jî ji bo fitarê hinek vexwendibûn. Em dikarin li ser bingeha ol jî pêwendiyan pêş bixin, ol ne dijberî hevin.**

**Em tenê ne heval, birane jî.**

**Zarokê heman xakêne, li ser heman xakê mezin bûne.**

**Ev îfadeya biratiyê ye.**

**Ol piştre tê. Beriya wê mirov û gel heye. Ev hîn girîngtire.**

**Du tiştên ez dixwazim heye: Daxwaza min ya yekem, di herêmê de (bi taybet li ser Kurdan) bandoreke we pir mezin heye. Bi awayeke nivîskî û devkî ji Kurdan re bê gotin ku Sûryanî geleke birane û divê em xwedî li wan derbikevin. Niha li Cizîrê bûyerên mezin diqewimin. Her roj li yekî tê xistin, herî dawî Sûryaniyeke ku Hasoyan lê xistî heye. Gel sedema vê zêde nizane, lê ez pir baş dizanim. PKK li hember bûyerên bi vî rengî ye û pêwîstî bi îzahkirineke vê ya berfireh dibînim. Pêwîste êdî gel hemû rastiyan bizanin. Ya duwem, di hemû herêmê de divê em ji bo biratî û aşitiyê bixebitin. Bi taybet em dikarin li derveyî welat xweşikbûna PKK'ê rave bikin. Û her çiqas ev şer dikin jî, mirovên alîgirê aşitiyê ne.**

**Dewlemendî, çand û xaka gel'ekî diparêzin û heke ji bo van şer dikin, ev mirovahiye û edalet bi xwe ye.**

**Em dizanin li Ewrûpa hinek berdevkên PKK'ê hene. Lê li Ewrûpa parastina me ya dozê hinekê cudatire. Belkî hinek hêz, bixwazibin em li hember PKK'ê baxivin. Yên vê him niviskî û him jî devkî dixwazin hene. Bi ti awayî em ê nikaribin vê bikin! Heke hûn li ser bingeha ev herdu xalên min destnîşan kirine, bi awayeke hîn bandorker, ber bi pêşve gav bavêjin, em ji bo her tiştî amadene. Em amadene li vir, li Ewrûpa û li her qadê rastiyan vebêjin.**

**Rêz û heskirineke zêde ya gelê me ji we re heye. Pêwîste ev rêz û heskirin veguhere çalekiyê û hîn zêdetir bawerî bide gelan. Û ev bawerî, hûn bi xwe ne. Saziya herî jor hûn in. Tenê ne bi PKK'ê re, dixwazin bi hemû Kurdan re dostaniyê pêş bixin. Heta hemû Asurî û Sûryaniyên li**

**herêmê alîgirê pêşxistina vê têkiliyê ne.**

**Abdulah Ocalan: Ji xwe armanca min jî tiştên hatine gotinin. Ev pir baş derket holê ku, Kurdê tine bûyî, di heman demê de, tê wateya Sûryanî û Ermeniyên tinebûyî. Kurdeyatiya bilind dibe wê ji bo Ermeniyan, Sûryaniyan û gelên din jî bilindbûnê rave bike.**

**Ez dem bi dem vê nirxandinê dikim: Gelek çiqas hatibe xistin, dê bilindbûna wê hemû mirovahiyê temsîl bike. Yên ku Kurdan di rewşeke nebaş de digirin, tenê ne li hember Kurdan, yên dixwazin li hember hemû gelê herêmê rewşeke bidin afirandine. Bi taybet ev hovîtiya Tirka ye!**

**Ji bo destpêkirina gelan a dîrokê esaseke mezin avêtin!**

**Min ev kir! Pêwîste ev gav baş bê fêmkirin. Bêyî ev gav hebûya ne Ermenî û ne jî Sûryanî diman. Di vê**

**wateyê de ez hinekê pratîkî me. Rêza min ji dîrok, vê fikra dîrokî re heye, lê pratîk hîn dijwartire. Ji ber heke pratîk nebe wê dîrok winda bibe biçe. Dîroka wan bi xwe jî temsîl dikirin dihele diçe.**

**Dêra Sûryaniyan, zanebûna dîrokeke mezine. Niha hema hema tê jibîrkirin. Divê em wê arşîva dîrokê ya mezin bikin malê gelan. Wiha, çalekiya me rê ji vê re vedike. Di wateyekê de ez tevgera me, weke tevgera serî rakirina gelan dinirxînim. Dema zilma Tirk, zilma diçewisîne-tine dike hat derbaskirin, wê demê gel dikarin li ser koka xwe jiyan bikin. Ev çalekiyeke pir girînge.**

**20 sale bi kedeke mezin gihiştin vê astê.**

**Ez li hember jiyana pêxemberan rêzdarim. Kêm-zêde jiyana we hinekê fêm dikim. Min xwe hinekê jî neçarî jiyankirina jiyaneke dişibe wê hîs kir û neçarbûm wisa bim. Ew jiyan,**

**jiyanên li hember zilmên mezinin. Zilma Îsa li hember derketî, zilma mezin ya Romayê ye. Û bi serê xwe, bi hêzeke pir kêm li hember derdikeve. Ez vî rihî fêm dikim, bi zehmetiyeke çawan re rû bi rû maye. Li vir ya girîng, mirov xwe zêde naspêre miletekê, çînekê. Ya rastî kesekî wî nebû. Rewşa min gelek dişibe wî.**

**Pergaleke zilmê ya mezin heye.**

**Weke ku ez ji kevneşopiya ew temsîl dikin pir ne xirîbim jî, li ser cewhera wê dozekê dimeşînim. Tişta ji destê min tê dikim. Li ser vê bingehê ji gelê Asurî-Sûryanî re, silavên xwe yên ji dil, rêz û heskirinên xwe raber dikim û dixwazim silavên min ji wan re bên ragihandin. Dixwazim tiştên min kirî baş bên fêmkirin. Heke hinek girêdayî dîroka xwe bin, pê re eleqedar dibin, girîng dibînim. Heke di roja me ya îro de hatibin asta tinebûnê jî, dîsanî**

**dixwazim devjê neberdin. Bi taybet bi jiyana madî ya ku Ewrûpa dayî wan neyên xapandin û xiyanet li dîroka xwe ya dewlemend nekin. Divê biqasî min eleqe ji welat û xakeke bi vî rengî re hebe. Dikarim bêjim ku di van xakan de, di têkiliyên mirov de, qonaxeke nû ya zindîbûnê destpê kiriye.**

**Dîrok xwe nû dike.**

**Kesî bawerî bi derketina min neanî, şansê min yê serkeftinê nedîtin. Lê niha mirov heya mirinê girêdayîne. Ancex girêdana bi dîn ve evqas dibe. Ev ne girêdaneke asayî, siyasî û neteweyî ye. Ev, ji bo hemû gelan wisa ye, divê em wisa bi hev ve girêdayî bin. Bi pele helwest girtin û pirên dostaniyê avakirin mûmkûne. Disa dikarim bêjim ku divê li Ewrûpa derbasî parastineke hevpar bibin. Ji bo min heke mijar xizmetkirin be, heya bêjî ezê ji vê zewq bigirim. Ji xwe tişta dixwazim bikim zindîbûna**

**gelan, pêşxistina têkiliyane, hatina rewşa hêz û kesayetekê ye. Bi taybet bi vê re eleqedar dibim û weke erkeke devjê nayê berdan dinirxînim.**

**M. Yohanna: Dîrok her tim kesayetên wisa pêş naxe. Kurd bi sedsalan sekinîn, ji bo Rêbereke wisa bibînin.**

**Abdulah Ocalan: Li bendê mayîn zêdetir jî zehmete. Lê birastî jî aciz nabim.**

**M. Yohanna: Ev bûyereke mirovahiyê ya ji rêzê nîne. Hinek serok teng-razber mane; tenê welatek û miletek hedef girtine. Hûn miroveke ku dikarin Xwedê û pêxemberan bibînine. Ev mezinbûneke berze. Tiştê dixwazî bi misogerî tu yê bi ser bixî vê dibînim.**

**Min hinek nivîsên we xwend. Dibe ku weke nivîs hinek wisa binivîsin. Lê encama min ji nivîsên we derxistî: Jiyan û bawerî di asta jor de ye. Ji bo mirovek jiyan bike, divê**

**xwedî riheke mezin be. Ev bûyereke pir mezine. Rêbertî bi xwe li hember kuştin û mirinê ye. Ew ne mirin, miroveke ku mirovan dide jiyankirine. Û tişta dike bi temamî xizmeteke miroviye.**

**Abdulah Ocalan: Şînkahiyek jî perciqandin êşeke mezin dide min. Dîsa dema kêzikek dipercigę, ji bo xwe dikim bûyerek mezin. Lê heke min niha serî li tundiyê dabe, birastî jî ji bo xatirê rastiyên dişewitînin û diperciqan nine. Ji derveyî vê çareyeke din nîne.**

**M. Yohanna: Hûn gelek girêdayî rêgezanin. Ji bo jiyankirina miletekî dibe hinek kesayet bimirin. Ev tişteke pir xwezayî ye. Û tişta bê kirin jî eve. Ji bo miletekî û gelan bidî jiyankirin, bi awayeke neçarîhûn ber bi riya dibêjin tundiyê ve birin. Xizmeta we pêşkêş kirî ne xizmeteke deh yan jî bist salane, xizmetek ji nifşê bê û qirna bê re jî xizmeteke.**

**Abdulah Ocalan: Ez bi xwe, bi sînoreke milî re nikarim bimeşim. Ji bo min di şexsê mirovekî de hemû mirovahî dîtin, çareserkirin; di rizgariya kesekî de jî rizgariya mirov dîtin esase. Yanî hemû mirovahî di kesekî de, di hemû mirovahiyê de jî kesekî tehlîl dikim. Niyeta min eve.**

**Nûman Serokê min, bûyereke gerdûnî ye, bi temamî tevgereke mirovahî dinirxîne. Kesayeteke Rêbertî sînor nasnake dide agahdarkirin.**

**Abdulah Ocalan: Misoger wisa me, ji xwe wekedin nikarim bikim. Pirsgirêka min hemû mirovê bêhempa afirandine. Di vê mijarê de gelek bi biryarim. Dibe ku hûn zêde rewşa min a rihî yan jî fikrê min zêde nizanin lê, bi misogerî ez ev im.**

**M. Yohanna: Min li gorî xwe hinek fêm kiriye, hewl didim fêm bikim û min hinek jî xwend. Nivîsên we niha hîn baştir fêm dikim. Birêz**

**Serok, li gel van hemûyan heke hûn di derbarê têkiliyên dîrokî yên gelê Sûryanî-Ermenî û Kurd de hinek nivîsan binivîsin wê pir baş be. Ji ber di vê mijarê de hinek kêmanî hene. Heke hûn hinek giranî bidin vê mijarê, wê xizmeteke mezin be. Tiştên tên nivîsîn mayînde dibin. Her tim dîroknas û mamosteyên me yên mezin ev digotin; divê dîrok bê nivîsîn.**

**Abdulah Ocalan: Bawerim ev nirxandin destpêke. Aliyê min yê din, ji nivîsandinê zêdetir pêkanîne. Ez pir mezin xwedî lêderdikevim, nirx didimê.**

**Tiştên gelek xweşik gotin û nekirin, ji min re mîna suçeke. Niha tişta herî zêde min mijûl dike, gotina hinek rastiyan yan jî em ê pratîzekirina wê ya destpêkê çawa pêş bixin. Di van mijaran de her çiqas ji rêzê jî be, di wê baweriyê de me ku wê hinek kar pêşbikevin. Yanî**

**nakevim nava nêzîkatiyeke ji ber ku têkiliyên mezin û pêşketinên mezin nîne û bê hêvî nabim. Ji ber min her tim hêsan destpêkir. Ez naxwazim vê têkiliyê mîna dîplomatiyek ji rêzê yan jî têkiliyeke xweş-bêş bibînim. Ev dibe bêrêzî. Gelê Asurî-Sûryanî gelên pir êş kişandine. Bi misogerî divê çareyek bê dîtin. Ez ji bo xwe xemgîn nabim, teng jî nabim. Hûn di rewşeke zehmet de ne, divê em vê çareser bikin.**

**Dibe ku di wateya madî de zêde zehmetî nebin lê ji xak, dîrok dûr mayîn, rewşeke pir zehmete. Ditirsim ji min zêdetir hûn bêhêvî bin. Ez xwe bi hêvî dibînim, baweriya min heye têkilî jî pêş bikevin, lê em çiqas dikarin heman hêviyê parve bikin? Lê tene ne di asta kesayet de. Hinek zarokên Ermenî û Sûryaniyan dihatin gel min. Min di şexsê wan de hinek zehmetî û bêhêvîbûn didît. Min dixwest zindî jî bikim û hîn jî**

**dixwazim. Pêwîste li ser van xakan, ciwanên hemû gelan bipijiqin.**

**Alîkariya herî mezin ku bikim, ev destê mîna bivir ketî nav dîrokê bibirim. Ji ber vê girînge hûn di eniya xwe de derketinek bihêz bikin. Hûn ji min çi bixwazin ez ê pêk bênim, tenê daxwaz bikin. Di pratîkê de çi tişta bikaribim bikim ez ê bênim cî. Di vê mijarê de şertê min nîne, xizmete. Divê çawa xizmeteke baş bikim, daxwazkirina vê tenê bese.**

**Nûman Serokê min, li gorî min di vê mijarê de, heya dawî hemû xizmet tên dayîn.**

**Abdulah Ocalan: Hûn ê bikaribin bikar bînin? Pirsgirêk eve! Rê hatiye vekirin, hûn ê bikaribin bimeşin?**

**Nûman Serokê min ji xwe hemû mesele di vir de ye.**

**Abdulah Ocalan: Min bi salan bangî gelê Kurd kir. Qet şiyar nebûn, bi tene bûm. Niha ew rewş dîsa tê bîra min.**

**Bangawaziya xwe ji gelê Asuri-Sûryanî re dikim!**

**Pêwîste bêhêvî nemînin. Bi misogerî divê derketina me, mîna derketina xwe ya cewherî binirxînin. Bi xirabî bikaranîna Kurdan ya berê ne di bin berpirsyartiya min de bû. Ez jî li hember wan im, him jî herî kêm biqasî we. Bi têkoşîna xwe ya mezin hewl didim vê xirabiyê ji holê rakim. Ji bo Ermeniyan jî bi vî rengî ye. Ya rastî ji komkujiya Ermeniyan Kurd ne berpirsyarin. Yên berpirsyarin diyarin û herî zêde em, niha li hember wan şer dikin. Yên li wan xistin, niha herî zêde ew dijminên min in. Cerdevaniya gundan niha ew dimeşînin.**

**Pir dixwazim carekedin serî rakin û di van têkiliyan de hemleyeke baş bikin. Ji bo hûn gel û çandeke wisa bi hêsanî ji van xakan neyên qutkirinin dibêjim.**

**Kurdistan, welatê hevpar yê gelê Ermenî, gelê Asurî, Erebên li vir jiyan**

**dikin û heta mirovên me yên din jiyan dikine. Em nabêjin li Kurdistanê wê tenê Kurd jiyan bikin. Bila Ermenî ji vir re bêjin Ermenîstan, Asurî bêjin Asurîstan, Ereb bêjin Erebîstan. Kurd jî bêjin Kurdistan.**

**Em vê weke dewlemendiyek, ji wê jî zêdetir dewlemendiya dîrokê û dewlemendiya milî dinirxînin. Em vê mîna yek ji demarên jiyanê dibînin. Yek ji daxwazên min dîtina azadî û serxwebûyîna Ermenî û Asuriya ne. Dîsa dîtina hînek bi ser xwe ve hatina Erebane. Berdin em ji bo van gelan hêmanên zextan bin, bila weke gulekê vebûyan. Min ev weke nêrînek cîhanê girtiye dest.**

**Li devera min lê jiyan kirî gundên Ermenî, Tirk û Ereban hebûn. Û min ev her tim mîna dewlemendiyekê nirxand. Eleqeya min kişandiye û min hewl daye bi wan re hevpar jiyan bikim. Bi ti awayî hestên milî û bi nêzîkatiyên şovenîzmê biçûk dîtina**

**wan di aqilê min re derbas nebûye. Ji bo şênberbûna Kurdistanê jî heman xal derbasdarin. Weke dîroka Kurdistanê mozaîka gel ya herî zêde gel têkilî hev bûne û ji hev bandor bûne ye. Heta di nasnameya Kurdan ya netewî de jî gelek çandên curbecur û bandora yekbûna gelan dîtin mûmkûne. Dikare bê gotin ku, nasnameya netewa Kurd hema hema ji destpêka dîrokê ve taybetmendiyên gelên hatine vê qadê girtine. Taybetmendiyên Erep, Fars, Tirk, Ermenî, Asurî û gelên ji kûrahiya dîrokî hatine girtine, taybetmendiyên wan ecibandine û kesayeta Kurd derketiye holê.**

**Di vê wateyê de tevî hemû rexneyên min kesayeta Kurd, weke kesayeta mirov yê herî cewherî dinirxînim. Ji ber yê herî esilzade, pêşkeftî û hêjmareke zêde taybetmendiya gel di kesayeta Kurd de hatiye pejirandin.**

**Pejirandinek xweşike.**

**Dikare bê gotin; Kurd, di vê wateyê de xwedî rastiyek bûna gelê nêzî bandora yekbûna gelane, yanî nêzî taybetmendiya wê ya mirovî ye. Ji xwe kamilbûna wê, hêza wê ya sebrê, nêzbûna wê ya ji mirovan re, girêdayî van rastiyên dîrokî ye. Bi rihetî dikare Kurd bişibîne Ereb, Ecem, Tirk û Asuriyan. Şovenîst vê berevajî kirine, bi înkarkirina Kurdan dixwazin kedxwariya vê bikin. Lê divê girêdana wê ya bi rastiyê re jî neyê piştçav kirin. Ev ne tişteke xirabe. Qebûlkirineke xwezayî di gelan de nexirabe. Danûsitandina çandî, dan û wergirtina ziman, di her astê de bandorkirin û bandorbûn bûyereke xweşike. Di Kurdistanê de ev pir pêş ketiye.**

**Wiha, di rastiya vê zanebûnê de, rastiyên netewî û çandî, em weke rastiyên xwe yên cewherî dinirxînin. Helwesteke me pir bi biryar li hember**

**Kemalîzm û îmhaya Îslamiyeta Tirk ferz dike heye. Herî dawî jî PKK li hember pêvajoyên îmhayê yên li hember gelê Ermenî, Sûryanî, Elewî û kesîmên olî yên wek Êzîdiyan derketiye. Kurdistan weke qadeke hevpar ya van çandan hatiye fikirîn. Û taybetmendiyên wê yên baş di nav xwe de qebûl kiriye. Heya dawî bi nêzîkatiyeke demokratîk eleqe nîşan daye û hewl daye alîkarî bigire. Em dizanin ku senteza Tirk-îslam bi Hizbulaha roja me ya îro re berê jî Naxşîbendî û bi hemû awayên tarîqatên dijberî cewhera Îslamiyetê weke amûrê êrîşekê dane bikaranîn. Û em êrîşên hevkarên Kurd jî yên li ser Êzidî û Sûryaniyan dizanin.**

**Ji destpêka dîrokê ve ev hevkar heya bêjî ziyan dane gelan. Û ev hevkar, nûnerê wan yê roja me ya îro cerdevan, Hizbulah, sîxurên curbecur û Kurdistan herî zêde li gelê Kurd kirine zîndan. Dîsa yê herî zêde li**

**hember PKK'ê şer kirine ev in. Li hember Elewîtiyê, Yêzidiyê, Sûryanîtiyê û Ermeniyan jî şer dikin. Mal û hebûna wan desteser dikin û çanda wan tine dikin. Em bi tundî li hember vê wehşiyetêne û di wê baweriyê de ne ku, têkoşîna me di heman demê de şerê gelan ya gihiştina azadî û nasnameya xwe ye.**

**Bi misogerî ne şerê rizgariya netewa Kurde, şerê netewa Kurdistanê ye.**

**Şerê demokrasî û rizgariya mirovahiyê ye.**

**Em bi îdîane, dikarin bêjîn ku; Em ê Kurdistanê bênin rewşa welatê herî kêm têkil netewperestiyê bûye. Di roja me ya îro de Ewrûpaya di îdîaya pêşketinê de ye, em ê rûyê wê yê rast yê Bosna-Hersek derxînin holê, dîsa dema em bi singkirinên millî yên Yekîtiya Sovyetê ku herî zêde sosyalîzma pêkhatî pêşxistî tênin ber çavê xwe, sosyalîzma ku em temsîl**

**dikin wê bi ti awayî rê ji vê re nede û dîsa welatparêziya em temsîl dikin wê bi ti awayî nebe netewperestiyeke wisa teng.**

**Sosyalîzim û welatparêziya di PKK'ê de ji bo miletekî pir lewaz bi misogerî tê wateya ewleya jiyanê. Welatparêziyeke bi biryar, tê wateya demokrasiyê. Bi ti awayî wê li gorî hêjmar û hêzê di ser polîtîkayê de naçe. Ev ji dervî cewherê PKK'ê ye. Heman tişt ji bo têkiliyên zayendî jî derbasdare. Di têkiliyên jin û zilam de azadiyek tam esas digire. Demokrasiyeke berfireh esas digire. Li şûna piranîparêziya sexte ya Rojava, piranîparêziyeke rast esas digire. Piranîparêziyeke girêdayî azadiya xwe, girêdayî welatê xwe û girêdayî mirovê xwe esas digire. Di vê mijarê de fedekariyeke nebe nasîbê ti rêxistinan PKK'ê daye nîşan û tevgereke ev daye îsbatkirin. Her wiha em şerê xwe weke şerê**

**mirovahî carekedin nirxên xwe bidest bixe dibînin. Li ser vê bingehê em li hember gelên di Kurdistanê de jiyan dikin jî peywirdarin.**

**Dixwazim ji şerê didim meşandin piştrastbin ev şer şerê wane jî û heke mumkûn be bendewariya min ew e ku ji bo vegera war û welatê xwe destpêkê di fikir de û heya bigihije berxwedaniyê xwe amade bikin.**

**M. Yohanna: Rewşa me, yanî rewşa Sûryanî yan jî Kurdistanê dibe ku piştî 5-10 saldin çawa be? Dibe guhertinên çawa bên jiyîn?**

**Abdulah Ocalan: Ev hinek girêdayî rêxistinbûna we ye. Ev him di fikir de him jî di pratîkê de afirînerî dixwaze.**

**Di demên derbasbûyî de li Bêşebabê sê gundên Sûryaniyan yên hatî valekirin hebû. Ji bo carekedin ji Stenbolê vegerin, hevalan ji bo wan merasîma ezimandinê çêkirine. Nêzîkatiyeke pir başe. Ti talîmateke**

**min nebû. Bixwe wan şandina wir û ev dide nîşan ku rewş di asteke baş de ye. Xakên Kurdistanê hatiye rewşa xirbe, her kes direve. Çi di rih de, çi jî di fîzîkî be, divê vegera wan çêbikin. Rejîma 12'ê Îlonê, birastî jî mirineke mezin bû û hindek mabû gelê me tine bike. Li hember vê zilmê berxwedaniya herî mezin me da raberkirin.**

**Tenê ne li hember faşîzma Tirk, min li hember hemû cîhanê liber xwe da. Hêzên cîhanê hemû li pişt wan bû, Emerîka, Rusya jî... Di vê derbarê de niha ji bo vegerê derfet heye. Heke hûn xwe baş birêxistin bikin, veger, eleqedarbûn û dilxweşiya di nav hev de bi hev re bimeşînin, dibe tiştên baş derbikevin holê.**

**Mînak heke hûn derketina xwe ya rêxistinî, heta derketina xwe ya takekesî, veguherînin derketineke gelêrî, wê pêvajoya me bide**

**diyarkirin. Lê ya herî xirap bê eleqe mayîne, tiştek nekirine.**

**M. Yohanna: Ji bo hûn dîrokê baş dizanin, dixwazim hinek mijarên din vekim. Em berî Îslamiyetê jî hebûn, piştre jî hene. Me beriya Ereban jî jiyan kiriye, piştre jî jiyan dikin. Ji destpêka dîrokê ve li ser van xaka ne. Lê dîrok, piştî 1900 sal şûnde bi lezeke mezin hat guhertin. Piştî 1900 şûnde me hemû gelê xwe yê ji Xarpêt, Amed, Mêrdîn ên koçî Emerîkayê kirî winda kir. Ev heliyane.**

**Hema hema nêzî bist caran li cîhanê hemû geriyam. Hema bêje hemû gelê me heliya ye.**

**Piştî salên 1960'î şûnde ji bo koçberî carekedin bixin meriyetê pîlanên veşartî çêkirin. Niyeteke me welat biterikînin nînbû. Kî me derxist? Tabî, hinek sedemên vê hene. Mirovên me yên li Îsveçê û welatên din bi hesreta welat jiyan dikin. Hewl didim vê îfade bikim. Yek**

**tişta ji we dixwazim; pêwîstiya me bi pere nîne, pêwîstiya me bi dibistan û tiştên biçûk yên mîna tiştên çandî jî nîne, her tiştê me heye. Lê heya niha ji bo em li welatê xwe bimînin ti ewleyeke me nînbû û cara yek ewleyek wisa bi PKK'ê re çêdibe. Hûn dikarin vê pêk bênin. Bandora we ya di herêmê de tê zanin. Bangawaziya hûn li Kurd û Sûryaniyan bikin; "*em birane û divê ev biratî bê jiyîn, pêwîste di bin rêbertiya me de ti nêzîkatiyên nîjadperest neyê jiyîn.* " Dibe hinek Kurd Sûryaniyan biperciqînin.**

**Abdulah Ocalan: Ev her roj hewl didin min parçe parçe bikin. Ne hinek!**

**M. Yohanna: Heke ev di pratîkê de bê jiyîn, em ê hîn zêdetir bawerî bigirin. Ya duwem, Sûryaniyên koçî Ewrûpa û parçeyên din bûne, ji bo hatina wan ya welat em dikarin wan çawa amade bikin û çi bikin? Min beriya 15 rojan Abdulxademî dît. Li**

**ser vê mijarê axivî. Serokê vê dere (Hafiz Esat) her tiştî dizane. Dîsa hevdîtina me sê demjimêran bi hezretî Patrîk re çêbû. Esat û hawirdora wî ne alîgirê vegera Sûryaniyane. Yanî çûyîna Sûryaniyan ya ji xakên Surî, ji bo dewleta Surî jî windahiyeke. Çand bendên herî mezin, hêjmareke zêde rewşenbîr û karsaz çûn. Çûyîna van rê li ber lewazbûna herêmê vedike. Ji bo me avahîsaz pêwîstin, yanî ji bo avahîsaziyên welat mirovên rol bilîzin pêwîstin.**

**Heke em dewlemendên xwe yên li Ewrûpa yan jî mirovên xwe, dubare bênin welat, dikarin carekedin welat veguherînin bihuştê. Ev ji bo berjewendiya herdu gelane. Ji bo rabûna welat û xebatên xizmeta ji welat re bikin emê bi hev re çawa bikin?**

**Abdulah Ocalan: Xalên we diyar kirine ji kûranî jiyan dikim. Û ji bo vir**

**veguherînin bihuştê divê em bangawazî gel bikin yan jî ji bo vir veguherînin bihuştê hemû behremendiyên xwe bikar bênin û hewldanên xwe seferber bikin. Bawerî ne pirsgirêke, heya ku ez berpirsyarim, dikarin heya dawî bawer bin; heke tevgera me ji rê dernekeve bê min jî dikarin bawerî pê bênin.**

**Li gorî min şûna li ser van xakan mirovên evqas xayîn, bi rastî jî ku em nikarin ji wan re bêjin Kurdin û bi her tiştê xwe ve heramin bimînin, hatina mirovên bi behre deh qetî baştire.**

**Karê baweriyê ye!**

**Ya rastî ne kareke bi dolar û madiyetê çêbê ye. Mînak weke kes, cihanê hemû li ser min tapu bikin ez ê qebûl nekim, nikarim bikim! Ji bo min hinek deverên pîroz hene. Hinek deverên Asurî-Sûryaniyan yên binavûdeng hene.**

**Deyrûl-Zahferana li Mêrdînê. Ji bo min di hewşa wê de razan, rabûn, hinek gerîn, hezar carî ji Ewrûpa binirxtire. Ew avakirin, ji bo xirab nebe kar kirin, ji bo min çalekiya herî mezine. Ji bo wê çalekî, bawerî pêwîste, divê kesayeta xwe hinek nezîrê vê bikin. Ji bo biçûkxistina we vê nabêjim. Bila yek ji Sûryaniyê herî bijare bê, heke biqasî min bikaribe ji van nirxên dîrokî re xizmet bike, ez ê jê re bêjim bijî. Ez amademe û parastina wê şev roj di fikrê min de ye.**

**Dem bi dem dipirsim, "*ka çend ciwan ma wan deran?*", dema dibêjin her ku diçe kêm dibin xemgîn dibim. Ya rastî dixwazim bi coş, bi kêfxweşî, bê rewşa parçeyeke bûheştê. Tişta dixwazim bêjim, bawerî dixwaze, kesayet dixwaze. Kurd gelek alîkarî dikin, di warê madî de wê zêde pirsgirêk çênebe, qet pê re eleqedar nabim. Naxwazim rihê xwe bi van**

**tiştên biçûk ve biyanî bikim. Heta mijara malbatê jî wisa ye. Ez îro ji têkiliyên mirovê niha û têkiliyên malbatê bifikarim. Ez ne li hember malbatê me, lê bifikarim. Ev ji min re gemar tên, hewl didim xwe hinekê pak bigirim û jidil nêz dibim.**

**Em carekedin bangî van dikin!**

**Bila hinekê bibin xwedî bawerî û ji nirxên xwe yên pîroz dûr nekevin. Pêwîste hemû gelê Kurd jî, li hember van nirxan rêzdarbin. Divê dest li mirovên lewaz neyê rakirin. Di bin berpirsyariya min de ne mumkûne zext li mirovê mazlum bê rakirin û nirxên wê yên dîrokî bê binpêkirin. Heya dawî bi yên nirxên pîroz yên Mezopotamya fêm nakin re şer dikim û şerê xwe hîn zêdetir bidim meşandin.**

**Şerê min dijware.**

**Fêmkirin û yên dixwazin li hember me rêzdarbin divê her tim wisa bimînin. Tişta ji dest hatiye**

**hinek hatiye kirin. Fêmkirina we û heke mumkûn be fikirandineke hîn baştir, nîqaşkirin û dixwazim hûn hinek pêngavan bikin.**

**M. Yohanna: Em ê xwedî li van derbikevin, em ê hewl bidin rêzdar jî bin. Dibe pirseke taybet jî be, lê dibe piştî deh sal din li herêmê çi çêbe? Dibînim ku wê hinek tişt çêbin. Bûyerên piştî deh salan rû bidin ji bo mirovahî û aşitiyê mîna bûyerên binirx dibînim. Keseyeta we serwere, kadire. Xwedî hêza hukumkirina bûyerên rû bide ye. Ji roja xwe weke mirov naskirî heya roja îro, ji mirovahî re xizmetkirin, bûyereke mezine.**

**Îsa wiha dibêje; "*ji bo ez xizmet ji mirovahiyê re bikim hatime, ne ku ji min re xizmet bikin.*"**

**Îsa gelek mezine.**

**Mezinbûna Îsa, di heman demê de, gotina wî ya dibêje "*ez xizmetkarekim*" weteyeke mezin îfade dike. Beriya mirina xwe çend**

**rojan, lingê şagirtên xwe şûştibû. Ev tenê ne di cewher de, di pratîkê de jî daye nîşan. Îfadeya dilnimiziyeke mezine. Yê ku nedilnimz be mezin nabe.**

**Hz. Fitrus, yek ji yên Îsa fêmdikir bû. Dema dibîne Îsa lingê şagirtên xwe dişo şaş dibe. Û Îsa ji Fitrus re vê dibêje: "*Were ez lingê te jî bişom!*" Fitrus şaş dimîne. Dîsa Îsa bi domdarî vê dibêje; "*heke lingê te neşom, tu nikarî bibî şagirtê min!*" Fitrus piştre qebûl dike dibêje; "*tenê ne lingê min, heta dikarî serê min jî bişo.* " Piştre Îsa vê jî dibê; "*yê paqij her paqije, sedema min a şûştina lingê we, ji bo ez dilnimziyê fêrî we bikim û hûn xizmet ji mirovehiyê re bikin. Û divê hûn jî mîna min bin, heke dixwazin mezin bin, hûn ê xizmet ji mirovahiyê re bikin!*" Duhezar sale ev kevneşopî di dêrê de didome û em bixwe jî lingê şemasan dişon. Ji bo bi wan bidin nîşan ku xizmetkarê gelin.**

**Rica û daxwaza min a ji we eve: Ji bo carekedin gelê me vegere welatê xwe, derfetên hene bidin bikaranin. Piştî maweyekedin em ê van di pratîkê de bibînin. Di wê baweriyê de me ku, dema gelê me vegere em ê bi hev re xweşikbûna wê bibînin.**

**Heke xizmeta dike ji wê re ji %20 be, ji %80'î wê ji bo gelê Kurd û Kurdistanê be. Wê di rabûn û avakirina welat de roleke girîng bilîze. Ji bo li Ewrûpa nehelin pêwîste em hîn ji niha ve tedbîr pêş bixin û ji bo carekedin li welatê xwe jiyan bikin, derfetên heyî seferber bikin. Em hîn ji niha ve daxwaz dikin ku gelê vegerin welatê xwe û germ nêzî vê pirsgirêkê bibin. Ji bo ev gel nehele neçe bawerim xebateke we pir mezin heye. Di vê mijarê de baweriya min temame. Axaftina we ya evqas bi bawerî min bicoş dike.**

**Abdulah Ocalan: Ev mijar tişteke pir xweşe! Di asta rêgez de girêdayî me.**

**M. Yohanna: Dema bawerî hebe her tişt ser dikeve. Dema Ereb hatibûn Mezapotamya, çekên wan nînbû. Hebûna Erebên beriya Îslamiyetê nediyar bû. Piştî Îslamiyetê li hember Bîzans û Persan şereke mezin dan meşandin. Piştî bûn xwedî bawerî du hêzên mezin binxistin. Çeka wan ya herî mezin baweriya wan bû. Bi baweriyê wêran Bizans û Persan. Baweriyeke min jî wisa heye. Heke em û hûn dest bidin hev, em ê bikaribin di demeke pir kin de hêjmareke zêde Sûryaniyan vegerînin welat. Di warê ruhî de hêjmareke zêde gelê me amadeye vegere. Di dema pêşiya me de em dikarin bi awayeke pratîkî jî vegera li welat pêşbixin. Di vê mijarê de kesayeta we xwedî roleke girînge.**

**Baweriya min a li hember we hîn zêdetir bûye.**

**Di wê baweriyê de me ku, li ser bingeha tiştên hatine gotin hinek gav bên avêtin. Bi taybet li Cizîrê dil dixwaze ku herdu gel bi awayeke aşitiyane bi hev re jiyan bikin. Min beriya niha we bihîstibû. Lê min niha bi çavê xwe dît û hîn baştir fêm dikim.**

**Abdulah Ocalan: Dema ez hîn zarok bûm, li bin darekê rûniştibûm. Wê demê bavê min hat gel min, ji bo min ev gotibû; "*Ew fetih dike. Tu biçê kî derê fetih bikî.* " Yên ji min hez dikin, yên hez nakin jî ji bo min ev gotine; "*ew, tiştê nayê kirin dide kirine.* " Dibe gelê we vegere, lê divê baweriya wan hebe, ji ber ev kar bi baweriyê dibe. Nexweşiya serdema me ya ecêp, ketîbûna li hember nirxên madiye. Û hema maye ev dawiya mirovahiyê bîne. Di vê wateyê de li ser bingeha maneviyatê gelek**

**nirx didin jiyana xwe. Bawerim mirovahî jî li ser vê bingehê ser lingan dimîne. Madiyeta bêpîvan mirovahiya bi her awayî biduv madiyetê ketî, di xeteriyeke mezin de ye.**

**Îro dibêjin; "*xweza wêran dibe, hawirdor tê rewşa neyê jiyîn.* " Xwediyên vê fikre di heman demê de berpirsên atoma ku li serê mirovahiyê teqandine. Heke em îro Îsayekî bifikirin, mumkûne gelo ev tişt di ramanên wî de jî hebin? Mumkûn bû ev xirabî hatiban serê mirov?**

**Çalekiya xwe, herî kêm biqasî jiyana Îsayekî binirx dibînim.**

**Mîna parçeyeke wî dibînim. Hevalên me jî, di sitargehên binerd yên niha li her çiyayî çêkirin de, weke manastirên wê demê, hema wê perwerdê dibînin. Bi wê baweriyê dijîn. Dema dijmin dibîne vê dibêje; "*di çanteyê van de nanê mehekê yê kufkoyî heye.* " Dema şehîd dikevin dibînin. Ecêp dimînin dibêjin; "*ev***

***çawa jiyan dikin.*** **” Vî cewherî pir girîng dibînim. Ji derveyî vê jî rêgez nasnakim. Bawerim ez bixwe, heya dawî pê ve girêdayî bimînim. Pirsgirêka vê ji mirovên xwe re ragihandin û bi mirovên lewaz dana fêmkirine. Dikarim bêjim min vê baş bi gelê Kurd daya fêmkirin. Berê mirîşkek jî nedidan, niha her tiştê xwe, weke gelê cihanê yê herî li pêş pêşkêşî vî welatî dikin.**

**Bangawaziya min ne ji bo mileteke, ji bo hemû mirovahiyê ye.**

**Hûn jî dikarin bibin navbenykar, em wan jî beşdarî vî karê mezin bikin, em van xakan mezin avabikin! Tişta dibêjin bûheşt li vir derketiye holê.**

**Bang dikim em carekedin bihuştê avabikin û di van xakan de bigerin!**

**Werin ev welatê me yê bihuştê! Hêjmarek zêde mirovê xwedî bawerî, hêjmarek zêde yên xwediyê ket hene. Bangî wan dikim bila di vê mijarê de**

**hinek bifikirin û hinek tiştan bikin! Yeqîn dikim ku pêwîste ji min zêdetir hinek karan bikin. Mercên min pir zehmetin, dijmin pir ser min disekine. Dibe ku ji her tiştî re derfeta min çênebe. Ji ber wê bila ser tiştên başde biçin. Heke min hinekê nasdikin, pirsgirêka ewlebûnê nîne. Bila tirsa sedsalî xilas bibe. Dijminê heyî jî hewl didin bi têkoşînê tine bikin û baweriya min bi min heye. Ji bo dehsal din jî, ez tim sond jî didim, heke jiyan bikim ez ê ser bikevim.**

**Dema min dest pê kir tişteke min nebû, deyndar bûm. Şivek, bizmarek û heta çaqoyek min jî nebû. Hemû malbat zarokên xwe ji ber min vedişartin. Niha hêzek mezin li dora min kom dibe û ber bi hêzeke mezin ve diçim. Heke bêşansiyeke çênebe, wê di salên 2000'î de rûpeleke nû vebe. Wê her tişt nû bibe.**

**Bawerim di dîrokê de, B. Z. 2000 destpêkirineke we pir bi semyan**

**hebû. Bawerim qonaxên Naramsîn û Sargon bû. Ez her tim bi wurşedarbûneke Rojhilata Navîn bawer dikim. Di van xakan de wurşedarbûn her tim çêbûye. Dergûşa mirovahî û derketina olan li vir pêk hatiye. Dihizirim ku gelo careke din dibe ku bibe dergûşa mirovahiyê? Çawa ku dema mirovî çêdibe vir weke derguşa mirovahiyê nirxandiye, niha jî ji her alî ve dirize. Xilasbûna wê dîsa di van xakan de ye, em ji vê bawerin, evqas nirx didinê û dubare weke wan rojên destpêkê xwe bihêcan dibînim.**

**Dibêjin; "*Emerîka wisa ye, Ewrûpa wisa ye.* " Qet bala min nakişîne. Li vir mirovê nû çêkirin, karê herî pîroze. Em baş dizanin li vir dîroka mirovahiyê çawa gav bi gav pêşketiye. Em tevgerek ji nû ve vegera li ser van kokan û bingehane. Amademe her tiştî bikim. Hêza min têra çi bike, hûn dikarin ji min bixwazin. Ev, bi baweriyeke mezin re**

**dibe. Heke bi pere, çek çêbûya, minê wan jî daba we.**

**M.Yohanna: Ev tiştên hatine gotin, bi awayeke nivîskî dikarin bigihînin gelê me yê Ewrûpa û yê qadên din jî.**

**Abdulah Ocalan: Daxuyaniyên hîn berfirehtir jî dikarim bikin. Hîn hewl didim li ser gelê Ermenî, Sûryanî lêhûrbûn bikim. Li gorî min pêwîste ev gel, ji nû ve roja me ya îro binirxînin û pirsa li hember "*gelo li hember bahoza hovane niha dikare çi bê kirin?*" bersivekê bigerin. Heke hebe kêmaniyên me, divê em bi nîqaşkirinê bi hev re derbas bikin, bawer bikin û li şûnên lê ne hevdu bihêz bikin. Ev kar bi rica, "*ez ê evqas bigirim, evqas bidim*" ve nameşe.**

**Heke piştî rizgarkirina vê xakê hatiban, minê wan bi merasîm û şahiyeke mezin pêşwazî kiriba. Û ez ê kêfxweş bûma ji ber minê gotiba, "*nûnerên geleke pir kevin, carekedin***

***tên van xakan.*** **” Ez ê bi vê ve girêdayî bimînim, heke hûn nekin jî heya jiyan bikim, serbikevim ez ê hewl bidim vê bikim.**

**M. Yohanna: Em jî ji bo kirinê amadene û emê bikin jî. Niha baweriya me hîn zêdetir re û wê hêz bide xebatên me. Ji bo min birayê xwe Apo dîtiye ez gelek kêfxweşim. Heta difikirim hemû nivîsên we bişopînim. Tenê yên min bihîstîn têr nake. Dibe hinek bi şêweyên cuda we di serê xwe de bisewirênin. Li gorî min kesayeta we bûyereke pir cuda ye û baweriyeke mezine. Heke rojekê derfeta we çêbe em we vedixwînin Metropolîteyê. Ev di demeke hûn dixwazin de dibe. Heke hûn bixwazin bi hezretî Patrîk re hevdîtin çêbikin, em dikarin hîn ji niha ve sazûman bikin û wê pir sûdmen be.**

**Hezretî Patrîk lîderê hemû Sûryaniyane. Sûryaniyên hemû cîhanê li hember wî rêzdarin û girêdayîne.**

**Wê ji vê nerînên we gelek kêfxweş be û bawerî bide. Hevdîtina we ya bi Partîk re, wê ji bo herdu gelan jî bibe xizmeteke mezin, ji bo yekitî û biratiyê bibe gaveke mezin. Di sala 1980'î de Patrîk serdana herêma Cizîrê kiribû. Bûyera Kurd ya wê demê pir cudabû. Niha hemû cihê diçînê dibînin ku Kurd pir hatine guhertin û kesayeteke nû qezenc kirine; heta wexta Patrîk qala biratiyê kiribû hinek hêz şaş mabûn. Em bi sedsalan li benda biratiyê bûn. Hevdîtina bi Patrîk re, wê ev nirxandinên me yên li vir hîn xurtir û bihêztir bike. Ji bo vê hevdîtinê hûn kengê bixwazin, em amadene.**

**Abdulah Ocalan: Ez ê bi dilxweşî di demeke nêz de vê serdanê pêk bênim. Ez her tim li vir im. hûn cihê min dizanin, heke hûn wextekê diyar bikin, ez ê hewl bidim pêk bênim.**

**Di meseleya pirtûkan de, dixwazim di vê mijarê de bal bê dayîn.**

**Ez pirtûkan, tiştên ez di dibistanên roja îro de fêr bûme tênim ber çav wisa dinivîsim. Pirtûk hîn cudatirin, dibe hinek di teşeyê de bimîne. Cewher girînge. Tiştên serdema me afirandiye, sînorê wê, nemûmkûne hemû di van pirtûkan de bê dayîn. Ji xwe ewqas girîng jî nabînim; ji bo min rêgezeke tenê pir girînge. Wisa fêmkirin girîngtire. Hinek jî min hewlda rewşê vebêjim. Dibe pirtûk hinek feyda xwe çêbe. Wê hinek me îzah bike, lê ne her tişte. Hebûna min a li vir dikarin hîn baştir fêm bikin.**

**M. Yohanna: Belê raste. Bi vî rengî we baştir fêm dikim.**

**Abdulah Ocalan: Hîn jî KT'yê ji bo min dibêje, "*me ev zilam nas nekir, netewpereste, komînîste, misilmane, yan jî xiristiyane nediyare.* " Ya rastî ev ne ku min xwe nedaye nasîn, ev cîhana mirovên derve dide nîşan. Tişteke ku bi mirovan re parve nekim nîne. Di vê mijarê de birihetî dikarim**

**bêjim; xizmeta Hz. Îsa bi misogerî feraseta xizmeteke serwere. Dixwazim wisa bê zanîn. Dibe tiştên li ser navê min tên gotin, tên nivîsandin gelek tiştan berevajî bike, dîsa nikaribim gelek tiştan bigotin bilêv bikim. Jiyan bixwe, xizmet bixwe pir girîngtire.**

**Hevdîtina piştî niha heke em bi rêzdar Patrîk re bikin wê hîn biwate be. Di cihekê de jî, ev tê wateya bangawaziya li hemû gelê Sûryaniyan. A rastî dema derfet çêbe mirov dikare bi hinek şandeyan re jî hevdîtin bikin. Heta derfeta min çêbe dikarim bi gel re jî hevpeyvîn çêbikim. Bawerim ji niha şûnde gavên baş bên avêtin. Heke bikarin ji gel re ragihînin, wê di nava gel de rê li ber baweriyeke mezin veke. Em ê hewl bidin biser bixin.**

**Ez ê di nirxandinên xwe yên ji niha şûnde zêdetir qal bikim: "*Li her deverê bi gelê Asurî-Sûryanî re***

***peywendî deynin, dostanî û biratiyek baş pêşbixin.* " Dixwazim carekedin destnîşan bikim ku, ev hevdîtin heya bêjî ji bo min biwate ye. Çend roje li ser wê difikirim. Heke hûn bal bidinê, me bi we re jî li vir ev nîqaş kir. Ya rastirîn min we teşfikê nîqaşê kir. Tenê ne bi hevdîtinekê, bi salane min xwe amade kiriye, ji bo meşa ji niha şûnde. Ez ji bo xizmetkirina vê amademe. Her tim dibêjim; di Rojhilata Navîn de ez xwe weke şerkerê xilasiya gelan û xizmetkarê wan dibînim. Ev hevdîtin, ne hevdîtineke dîplomatîke, ez weke gihiştina birayên ji mêj ve hevdu nedîtine dinirxînim.**

**Û dîsa, ev ne hevdîtineke ji rêzê ye, hevdîtina birayên ji kevin ve ji hev dûr mane, piştî gelek sal şûnde hatine gel hev û hev dîtîna birayane. Salên dirêj li çiyayeke biçûk yê Lûbnanê mam. Û manastirên me yên destpêkê li wir avabûn. Akademiya Mahsum**

**Korkmaz jî mîna manastirekê dihat hesibandin. Me di wan zinaran de cihên biçûk vekirîn.**

**Li ser vê bingehê ji hemû gelan re silav û rêzên xwe pêşkêş dikim.**

***"Îskenderê mezin ê ji Makedonya dema digihije Babîlê hêj di 30 saliya xwe de bû.***

***Hz. Musa gelê Cihû digihîne ser axên Sîna di 30 saliya xwe de bû.***

***Hz. di 33 saliya xwe de hatibû kuştin û li çarmixê dabûn.***

***Napolyon beriya 40 saliya xwe bûye împarator.***

***Di dîrokê de weke rêbertiya we wisa çend rêbertiyên mînak ên din jî hene.***

***Her wiha rêbertiya we ne tenê dişibe van, ji bona min hîn cewaztir, berz û watedartire.***

***Jiyana we heman hinekê dişibe ya Îsa. "***

***Metrepolîtê Helebê M. Yohanna***

**1993**

## KURDİSTAN WELATÊ MİROVAHİYÊ YE

**Hûn yek ji gelê Kurdistanê yê herî kevinin. Dîsa têkiliya Asuriyan ya bi Kurdan re, di dîrokê de têkiliya herî kevne. Ermenî jî hinek wisane. Lê Kurd herî zêde bi Asuriyan re di nav hevde bûn. Dema em tên roja me ya îro, mirov ji vê şaş dibe: Çawa bû ku**

**ev gel evqas ji hev dur ketin, biyanî bûn. Bêguman di vir de ol hêmanek sereke ye. Lê hêmana herî girîng hinek jî serdestiya Osmaniya Tirk -çi sultantî û çi jî serdema komarê ye- e. Van gelan him pir perçiqandin û him jî pir li hember hev rakirin. Pir gel jî ji holê rakirin. Dibe ku Kurd nemiribin, lê ketin rewşeke ji mirinê xirabtir. Wisa diyare ku Asurî bêdeng çareser kirine. Bêgûman şêx û begên Kurdan pir birin ser wan. Heman hêzên xayîn yên Kurd û Kurdistanê tasfiye kirine, heman hêzên xayîn, him Ermeniyan him jî yên we anîn vê rewşêne. Kesîmeke wisa xayîn heye, hîn jî yê zerera herî mezin didine me ew in.**

**Em bi van re pir şer dikin. Şerê Başûrê Kurdistanê yê herî dawî jî dewama vê bû. Yanî hinek ji derveyî dîrokê hiştin girêdayî vê bû. Heke gelek azad nebe, gelên wê yên cîran jî dê azad nebe. Wisa tê dîtin ku, gelek çiqas kolê be, derdikeve**

**derveyî dîrokê, cîranê wê jî wisa dibe. Yanî ev rewşa Kurdan ya xirab, li gorî min rewşa xirab ya gelên cîran jî baş rave dike. Dîsa ev rewşa niha hûn tê de, rewşa me ya xirab rave dike. Heta gel azad nebin, bi taybet gelên di nav hev de jiyan kirine xwedî li pirsgirêkên xwe dernekevin, nikarin xwe bidin qebûlkirin.**

**Tevgera PKK'ê li hember dîroka hatî înkarkirin, ji cewherê xwe hatî biyanîkirin li dijî derketineke. Di wê baweriyê de me ku PKK tenê ne tevgereke Kurde. Divê di wateya meseleya xilasiya hemû Kurdan û hemû gelên Mezopotamyayê de li hev bikin. Tevgera me bilind kirî, tê wateya xilasiya hemû çandên heyî û xwediyê wan.**

**Di dîrokê de ciheke we ya çalak heye. Hûn pir zêde bi rastiya Kurd re ketine nav hev. Li gorî min Ermeniyan di dîrokê de kêmasiyek kirin, netewperestiya teng esas girtin.**

**Rêveberiya Osmaniyan ev pir xirab bikar anî; bi Alayên Hamîdiyan re anîn beremberî hev û winda kirin. Stratejiyeke şaşe. Hinek jî pişta xwe dan Rojava xwestin bikin. Lê ji bo Rojava berjewendî her tişte. Heke pêwîst bike gelan fede dikin. Ya rastî heke Ermeniyan pevretiya li gel Kurdan û armancên rizgariyê yên hevpar fikirîban, misoger wê rewş ne wisa ba. Tevgera Asurî-Sûryanî jî hinek wisa pêş ket. Ket riya Rojava, bi gelê Kurd re jî zêde pêywendî nedanî, ava nekir. Heya cihekê, tevgereke wisa kêm, hat tasfiyekirin.**

**Tiştên pêwîst dike niha bikin, dikarin ji dîrokê derxînin. Ez rewşa we ya niha mîna penaberbûnê dibînim. Heta ez welatê we mîna yê Ermeniyan hatî terikandî dibînim. Hebûna wan ya di welat de, tenê di asta dîrok û çand de nemaye. Bawerim li Başûrê Kurdistanê 5-10 hezar mirov maye, yan jî nemaye. Yên**

**berê mane, piştî 12'ê Îlonê şûnde dan koçkirin. Me, di demên dawî de bang kir ku bên gundên xwe. Li Colemêrgê çend gund vale kiribûn, me carekedin wan vegerand. Cerdevan ser gundên li Midyatê de çûn, hinek kuştin çêbûn, em li hember derketin. A rastî hêjmareke pir kêm ji we maye. Hûn li virin, tabî hûn rewşa xwe ji min baştir dizanin. Di dema nêz de yên li Surî û Lubnanê hinek tevgerên xwe avakirine, lê li gorî min tevgerên wan zêde pêngav pêş nexistine. Meylên nêzbûyînê tê dîtin. Gelo mirov dikare bi hev re çi bike? Sekinandina li ser vê girînge.**

**Ji destpêkê ve tecrûbeyên min hene. Her çiqas merc lewaz jî bin, heta hêvî jî pir lewaz bin, pêwîst dike ji tiştên bi vî rengî re cesaret bê kirin. Tevgera me mînaka vê ye. Bi salan tena bi serê xwe tevgerim, lê niha PKK hatiye rewşa tevgereke têk naçe. Em dixwazin, baskek ji we jî**

**beşdarî vê bibe. Wê ev rastiya we diyar bike. Em ji vê re vekirîne û dixwazin bibînin. Em ê ji bo vegera gundên we jî bibin alîkar. Li gorî mercên îro tişta ji destê me bê em ê bikin.**

**Belê, bi temamî nizanim; bi rastî jî daxwaz çiye, rewşa rêxistinbûnê çiye, ez ê hewl bidim vê ji we guhdar bikim.**

**Rêxistina Demokrat ya Asur: Ji bo ev peyvên we yên xweş, kêfxweşiya xwe raber dikin. Bendewariya me vekirina bûyerên hîn kûrtire. Daxuyaniyên di derbarê bûyara PKK'ê de jî, hîn berfirehtir dixwazin guhdar bikin.**

**Niha em dixwazin hinekê qala xwe bikin. Rêxistina me, sala avabûna Rêxistina Demokrat ya Asurî, 1957'î ye. Li xakên welatê me yê Mezapotamya avabûye. Armanc û hedefên avabûna rêxistina me, di serî**

**de dîroka gelê me derxistina zanebûnê û rêxistinkirina wê ye.**

**Dîroka gelê me ya li Mezapotamya, ji B.Z. 4000 ve destpê dike. Gelê me, di çar navendên bingehîn yên cîwarbûnê de jiyan dikirin. Ev; Akad, Sûmer, Babîl û Asur e.**

**Abdulah Ocalan: Hemû dibin heman gel?**

**Rêxistina Demokrat ya Asur: Belê, hemû heman gelin. Asurîne, li gorî meyzandina me rewş wisa ye. Hinek dîroknas vê dibêjin; "*Sumerî ne niştecihên Mezopotamyane, ji ciheke din hatine*. " Em li bûyerê wisa temaşe nakin. Yek ji gelên herî kevin Sumerî ne. Saltanata yekem li xakên Sûmeran destpê kiriye. Dema saltanat li navenda bajarê Sumeran bû, hemû Beynilnehreyn ango xakên Mezapotamya hukim dikirin. Bajarên Akad, Babîl û Asur jî di nav de ne.**

**Meyzandina me ya ji dîrokê re wisaye: Piştî bajarê Sûmer şûnde Akad, piştî Akad Babil û piştî Babîl jî herî dawî li bajarê Asurî hukmê xwe domandiye. Ev hevdu temam dikin. Nayê wateya gelên cuda jî. Heman çand û şaristanî parve kirine. Gelê herçar bajaran jî zarokên Mezapotamya Asurîne. Saltanata Asur ji yên berê zêdetir dirêj kiriye. Şaristaniya Asur, bi awayeke giştî van çandan digire nav xwe û wan temsîl dike. Hukim meşandina saltanatê ya li bajarên cuda, ji bo me zêde negirînge. Li gorî me heman gele.**

**Ketina Babîl, B. Z. 539'an bi êrîşa Persan re pêkhatiye. Piştre, her çendî dem bi dem serhildanên gel çêbûne jî, biser neketine. Her tim bi têkçûyînê re rû bi rû mane. Wiha, ji wê rojê heya roja me ya îro ev gel, weke Asuriyan tê zanîn. Cîhan wisa nasdike û li gorî me jî wisa ye.**

**P. Z. 333 dema Îskenderê Mezin yê Makedonya tê herêmê, ev gel mîna "*Aşûriyan*" dihat zanîn. Ji ber di Yunanî de tîpa "ş" nebûye ji Aşûriyan re gotine "*Asûrî*" û bi demê re ev peyv destpêkê bûye "*Asiryan*" piştre jî veguheriye peyva "*Sûryaniyan*. "**

**Abdulah Ocalan: Ya wisaye? Yunaniyan wisa gotine û bi esil "Aşûrî"ne, fêm bû.**

**Rêxistina Demokrat ya Asur: Peyva Sûryanî jî ji vir tê.**

**Abdulah Ocalan: Li gorî peyva Sûryanî ji vir tê, peyva "*Suriye*" jî ji vir tê.**

**Rêxistina Demokrat ya Asur: Em di zimanê Sûryaniyan de hêjî ji Sûryaniyan re dibêjin "*Esoryoye*. " B. Z. 1500 salan me weke Esoryoye dinivîsand, piştre her ku çû ev bû "*Soryoye*", yanî Sûryanî. Ereban jî ji me re gotine "*Asiryan.* " Ev gel, bi çand û zimanê xwe weke Sûryaniyan hat nasîn. Ev guhertin mileteke din**

**nade îfadekirin. Navê berê Aşûrî ye, piştre bûye Sûryanî.**

**Abdulah Ocalan: Yanî peyv hatiye guhertin.**

**Rêxistina Demokrat ya Asur: Bi derketina Îsa re em dikarin bêjîn ku, hema hema hemû gelê me Xiristiyanî qebûl kiriye. Dêra me jî navê Dêra Sûryaniyan girtiye. Hemû Sûryaniyên li Mezapotamya hema hema hemû girêdayî heman dêrê bûn. Yekitiya gelê me bala Romayê kişandiye û wan xistiye nava fikaran. Li gorî wan di dema pêş de, heke di bin navê dêrê de be jî, ji bo Sûryaniyan hêzek ava dibû. Ev jî dihişt ku Sûryanî ji Împaratoriya Romayê veqetin.**

**Abdulah Ocalan: Wê ev bi dêrê çêbûya ne wisa?**

**Rêxistina Demokrat ya Asur: Belê bi dêrê çêbûya.**

**Abdulah Ocalan: Yanî ev dêr hinek jî li hember Romayê pêşdikeve?**

**Rêxistina Demokrat ya Asur: Wisa fêm dibe. Bi dêrê re ji Bîzansan cuda rêxistinek ava dikin.**

**Abdulah Ocalan: Bawerim di ew dema qedexe de dêrên Sûryaniyan pir pêş dikevin. Hîn beriya ola Romayê ya fermî hebe, bûyera dêrê Sûryanî pêşdixin. Wisa dibe?**

**Rêxistina Demokrat ya Asur: Wisa. Yek jî, ji xwe bûyera herî zêde me tine kirî, qebûlkirina Romayan yan jî Bîzansan ya ola Hirîstiyantiyê ye. Kedxwariyê, di bin navê Xirîstiyantiyê de hîn kûrtir kirin.**

**Abdulah Ocalan: Ya rastî li cihekêdêra Sûryaniyan, li hember Romayiyan tevgereke azadiyê bû. Wexta ola fermî qebûl kirin, ol jî xirap kirin.**

**Rêxistina Demokrat ya Asur: Ji xwe sedema herî bingehîn jî ev bû. Asuriyan weke tevgereke azadiyê didîtin. Piştî hingê jî hewl dan**

**Xirîstiyantiyê weke du mezheban cuda bikin.**

**Abdulah Ocalan: Bixwe cuda kirin.**

**Rêxistina Demokrat ya Asur: Belê. Bi awayê Sûryaniyên Rojhilat (Nasturî) û Sûryaniyên Rojave (Yakûbî) cuda kirin.**

**Abdulah Ocalan: Navenda Nasturiyan niha li kî derê ye?**

**Rêxistina Demokrat ya Asur: Piraniya Nasturiyan li Mezapotamyeya Jorîn jiyan kirine. Li Başûrê Kurdistanê, Colemêrg û derdora wê. Yakubî jî herî zêde li herêmên Nisêbîn, Mêrdîn, Riha û Amedê jiyan kirine.**

**Abdulah Ocalan: Ma Yakubî hîn li pêştir bûn?**

**Rêxistina Demokrat ya Asur: Li vir tişta girîng Bîzansan ev kirine du parçe û yekitiya wan xirap kirine. Yên diketin Rojhilatê Nisêbînê Mezabotamyeya jorîn ketin bin**

**serweriya Persan, herêmên diketin Rojavayê Mezabotamya jî ketin bin bandora Bîzansan.**

**Abdulah Ocalan: Rewşeke Kurdan jî bi heman şêwayî heye, çîrok hemane.**

**Rêxistina Demokrat ya Asur: Sûryaniyan jî dabeşbûna herî mezin P. Z. sedsala 5. De jiyane. Dîsa di pişt derketina Îslamiyet û pêşketina wê di sedsala 7. de çêbûye. Ji bo ji bin zextên Bîzans û Persan rizgar bibin, Sûryanî destê xwe dirêjî Erebên misilman dikin. Hilbijartinên xwe li gel Erebên misilman dikin. Xakên aîdê gelê me yên weke Bexda, Babîl, Serê Kanî (Navçeyeke girêdayî Rihayê, Resuleyn) Tûr Abdîn (hawirdora Midyadê) bi awayeke bê şer, li ser bingeha aşitiyê ji Ereban re vebû. Bi alîkariya Ereban gelê me bêhnek veda. Ereban ev henase bi gelê me dan jiyîn. Ji Persan zêdetir,**

**Erebên misilman şansê jiyanê dan Sûryaniyên Xiristiyan.**

**Abdulah Ocalan: Îslamiyet şans dide, ecêp!**

**Rêxistina Demokrat ya Asur: Di demên destpêkê de wisa bû, piştre rewş hat guhertin. Wê demê Erebên dihatin herêmê, soz dabûn ku ti nêzîkatiyeke şaş li hember Sûryaniyan nekin. Sûryanî herî zêde bi pêşvebirina çand û şaristaniyê ve eleqedar dibûn. Heya astronomiyê di hemû beşên zanistê de dixebitîn. Di wê demê de heta li Nisêbînê (Kennişrin), Riha (Urfa) û Mêrdinê (Deyr-ûl Manastira Zaferan) zanîngeh û akademiyên wan hebûn.**

**Abdulah Ocalan: Li Nisêbînê akademî hebû. Li Rihayê jî zanîngeh.**

**Rêxistina Demokrat ya Asur: Em dibêjin Kennişrin û Urhuy. "*Kennişrin*" bi zimanê Sûryaniyan tê wateya "*hêlîna heloyan.*"**

**Abdulah Ocalan: Em hîn jî ji Urfayê re dibêjin Riha. Bawerim peyva Riha ji Sûryanî tê.**

**Rêxistina Demokrat ya Asur: Li gel van hemûyan, gelê me ji qetlîaman xilas nebû. Lê her ku derfet dîtin, ji pêşvebirina zanist, şaristanî û çand dûr neman. Dîsa bi hemû gelê herêmê re jiyaneke aşitiyane hilbijartin. Berevajîbûna her tiştî di salên 1500'î de bi hêzbûna Osmaniyan re destpê kir. Nakokiyên heyî kûrtir kir, di nav gelan de tovên kînê danî û gelan berî hevda. Hatina Ewrûpiyan ya herêmê jî daxwaza Osmaniyan bû, ji ber her ku diçû di serî de ew lewaz dibûn. Bi armanca pêşxistina hinek mezhebên nû, li herêmê ji bo xebatkirina misyonerên Rojava destûr tê dayîn. Heya wê demê, di serî de Yakubî û Nastûrî, tenê du mezhebên Sûryaniyan hebû. Mîsyonerî, yanî casûsê Rojava, bi hatina keşîş û rahîban re, katolîkbûn û protestantî jî**

**her yek weke mezhebekê bi gelê me dan qebûlkirin. herweha dema destpêkê hatin, wisa îdîa kirin ku Sûryaniyan biparêzin.**

**Abdulah Ocalan: Romayiyan kirin du beş, van jî ev dabeşbûn kirin çar.**

**Rêxistina Demokrat ya Asur: Tabî ji vê dabeşbûnê berjewendiyeke mezin ya Osmaniyan jî hebû. Him ji rojava alîkariya madî digirtin û him jî dabeşbûna Asuriyan serdestiya Osmaniyan rihet dikir. Asurî (Sûryanî) di bin serdestiya Osmaniyan de jiyan dikirin. Li devera ku wan biparêze, bi rojavayiyan dan dabeşkirin û piştre jî ji bo xwe bikar anîn. Tevî ku gelê me nedixwest jî, bi zorî Ewrûpiyên dişandin deverên lê dijîn. Nemaze ev jî li ser navê Xiristiyantî dikirin.**

**Abdulah Ocalan: Çima ev dikirin?**

**Rêxistina Demokrat ya Asur: Berjewendiyên Osmaniyan ev dixwest. Yekîtiya Asuriyan ji bo wan xeteriye, lê dabeşbûn wan rihet dikir.**

**Heke gelê me dabeş nebûba, bi rastî jî hêzeke mezin bû. Ji bo Osmaniyan xeterî diafirand, ji xwe ji bo vê belav kirin. Bi dabeşkirina gelan digihiştin armancên xwe.**

**Abdulah Ocalan: Yanî polîtîkaya dabeş bike-bimeşîne.**

**Rêxistina Demokrat ya Asur: Belê, tevî van hemûyan jî li xakên Ereb û Farsan dêr û medrese ava dikirin. Hewldan heman tiştî li van xakan jî bikin. Di encamê de serdestiya hêzên Tirk, Kurd, Ereb û Farsan; şêx û begên wan, di qetilkirina gelê me de rolên hevpar lîstine. Dîsa gelê me, hewldaye hemû êşên xwe jibîr bike û dostaniyê pêş bixwe. Ji bo carekedin bi van gelan re dostaniyê pêş bixe, Sûryanî her tim dostaniyê ferz dikin.**

**Di sedsala 19. û 20. de, hinek ciwanên me yên netewperest yên bi navê Naim Faik, Aşur Yusuf û Senherib Balê derketin. Kovareke bi**

**navê "Sitêrka Rojhilat" (Stêrka Mezopotamya) derxistin. Yek din jî kovareke bi navê "*Riya Azadiyê*" jî derdixistin. Ev kovar bi sê zimanan dihat weşandin; Sûryanî, Kurdî û Tirkî, lê bi elfabeya Sûryaniyan dihat nivîsîn. Dema Osmanî vê dibihîsin, ferq dikin ku gel careke din zindî dibe û ji vê hêlê ve di nav tevgerekê de ye. Bi rastî jî di wê demê de tevgerên Ermenî, Kurd û Sûryaniyan zindî dibûn. Osmanî carekedin ol hemêz dikin û bi riya ol dest bi lîstikan dikin. Şêx û begên Kurdan digirin gel xwe. Di qetilkirina Ermenî û Sûryaniyan de wan bikar anîn. Ji derveyî Ermeniyan, nêzî niv milyonî Sûryaniyên li Mêrdîn, Riha, Amed, Sêrt, Colemêrg û herêmên din qetil dikin. Ev komkujî di navbera salên 1914-19'an de tê pêkanîn. Civateke nêzî 100 hezarî ji welatê wan didin koçkirin.**

**Abdulah Ocalan: Qetlîameke Ermeniyan ya wê demê tê zanin, lê**

**dîrok qet qala qetlîama Asûriyan ya wê demê nake. Qetlîamek çêbûye û ev raste.**

**Rêxistina Demokrat ya Asur: Ji xwe koça herî mezin jî di vê demê de destpê dike. Koçî; Rusya, Filistîn, Emerîka, Surî û Hindîstanê dibin.**

**Abdulah Ocalan: Çiqas mirov koç dikin?**

**Rêxistina Demokrat ya Asur: Nêzî 100 hezarî texmîn dikin.**

**Abdulah Ocalan: Beriya vê koçkirina derve hebû?**

**Rêxistina Demokrat ya Asur: Li gorî baweriya me berê di vê astê de nebû. Lê di sedsala 7. de ji Riha û Kurdistanê koçeke mezin hebûye. Qabîleyek bi navê Kenaniyan koçî Hindîstanê dikin. Kenanî Sûryaniyên Rihayê ne. Niha şêniyên wan yên li Hindîstanê nêzî nîv milyonî ye.**

**Abdulah Ocalan: Sedemên koçkirinên van çibû?**

**Rêxistina Demokrat ya Asur: Weke bazirgan, bi armancên bazirganiyê koç dikirin. Beriya heft hezar sal Xiristiyantî heya Hindîstanê çûye û li wir jî hinek komên xiristiyan hebûne. Ev bazirgan jî jiyana li wir zêdetir dihilbijêrin. Li wir bandora Îslamiyetê nînbû û ne zextên Osmaniyan û ne jî yê Ereban hebû.**

**Em vegerin sedsala 19. Piştî qetlîamên di navbera salên 1914-1919'an de gelê me pasifikasyonê jiyan dike dikevin nav bêdengiyê, baweriyên xwe yên li hember gelên herêmê bi temamî tine dikin û bi gelên cîran re têkilî pêşxistinê dûr disekinin. Salên piştre jî, zextên li ser kesan bidawî nebû didome. Ji ber wê sedemê yên koç kirine, mirovên xwe yên li welatê xwe mane dibin gel xwe. Bi awayeke domdarî, yên mane dibin xakên lê bicî bûne.**

**Ji hêla din ve jî di sala 1933'ê de, ev car jî li Îraqê qetlîamek mezin tê**

**jiyîn. Ev qetlîama li ser Asuriyan jî bi awayeke hevpar ji hêla axa-begên Kurdan û Ereban ve tê kirin. Heta rejîma İraqê bi firokan gundên wan bomba dikin. Li vir jî koçek tê jiyîn; hinek koçî Yunanîstan û Qibrisê dibin, hinek jî koçî Emerîkayê dibin. Hinek jî hîn li Surî li peravên Xabûrê dijîn.**

**Bikinahî, di encama bê istiqrariyê de gelê me xakên welatê xwe diterikînin, ber bi koçkirin û penabertiyê ve diçin. Tabî di serî de ev, di encama bêbaweriyê de çêbûye. Yanî gelê me bi rewşeke wisa re rû bi rû hat ku, êdî "*welat çi dibe bila bibe, ez giyana xwe xilas bikim bese*" û bi vî rengî ji welatê xwe revîne. Bêguman, ev rewş herî zêde bingeha xwe ji hêzên serdest yên herêmê dimeşandin girtiye. Li gorî tesbîtên me kirine, ji gelê me milyon û nîv kes liderveye; li Rusya, Avustralya, Emerîka û Ewrûpaya Rojava bi awayeke penaber jiyan dikin.**

**Abdulah Ocalan: Li Surî û Lubnanê çiqas Sûryanî hene?**

**Rêxistina Demokrat ya Asur: Nêzî milyonekê ne. Hêjmareke zêde ji van asîmîle bûne. Xwe weke "*Melikî*" yan jî "*Rum-Ortadoks*" binav kirine. Li hember vê hîn jî li herêma Cizîrê girseyek nêzî 300 hezar bi Sûryanî diaxivin.**

**Abdulah Ocalan: Ma Melikî û Rum-Ortodoksî Sûryanî ne?**

**Rêxistina Demokrat ya Asur: Belê. Ev di dema Împaratoriya Romayê de bi Romayan ve tên girêdan. Di Sûryanî de "*Melko*" yanî "*Melikî*" tê wateya qiral. Yên alîgirê Qiral û împaratoriyê ne ev navê Melikî li wan kirine. Hêjmarek zêde ji van mezhebê Katolîk yê Romayan qebûl dikin. Dabeşbûna herî mezin ya di dêra Xirîstiyanan de, di navbera sedsala 4. û 5. de çêdibe. Di wê demê de kongreya dêrê ya 4. pêktê û piştre dabeşbûn tê meydanê kirin.**

**Abdulah Ocalan: Ma yên ji Sûryaniyan qutbûn bi Romayan ve tên girêdan û ji van her ku diçe ji rastiya gel dûr dikevin?**

**Rêxistina Demokrat ya Asur: Wisa dibe. Em Asûrî weke Partiya Demokratîk, gelê me yê ji derveyî welat belav bûyî hemêzkirina wan jî esas digirin. Li Ewrûpa û welatên din, xebatên me yên mîna komale, federasyon û hwd. yên yekitiya gelê me armanc dikin hene. Hêjmareke zêde gel bi komale û federasyonan ve hatine girêdan. Armanca me ya esasî, bi riya van saziyan di nav gelê me yê ji derveyî welat jiyan dike de çanda gelê xwe biparêzin û dengê gelê xwe dana hesandine. Em hewl didin di nav gel de heskirina gel û welat bihêz bikin. Pirsgirêka vegera welat jî di berfirehiya van xebatan de ye. Di demên dawî de li Midyadê 6 Sûryaniyên ji hêla cerdevanên girêdayî dewletê ve hatine qetilkirin,**

**ji wan du endamên li Almanya di nav xebatên vegera welat de cî digirtin jî hene. Di demên derbasbûyî de jî wisa dibû. Di sala 1911'an de Aşûr Yusuf ji hêla Osmaniyan ve hat qetilkirin. Bixwe nivîskarê kovara "*Yêkitiya Sûryaniyan*" bû. Naim Faik jî di sala 1914'an de destpêkê diçe Filistînê piştre jî koçî Emerîkayê dibe. Dema sînorê Surî-Tirkiye hat avakirin, li Surî gelê me carekedin xwe birêxistin kir. Li derdora dêrê hinek rojname û kovar, disa hinek medreseyên ziman pêş dixin hatin vekirin. "*Yêkîtiya Sûryaniyan*" hinek kovarên bi navê Betnehrin (Mezapotamya) û Îdurê derxistin. Dikare bê gotin ku bi dehan kovar hatine derxistin.**

**Rêxistina Demokratîk a Asûriyan jî girêdayî van pêşketinan hatiye avakirin.**

**Li ser bingeha rastiya gel ya dîrokî û pêwîstiya wê ya bi yekîtiyê hatiye avakirin. Armanca saziya me**

**ya esasî, di serî de dawî li dabeşbûna mezhebî anîne, hemû mezheban di nav rewşa gelparêziyê de helandin û yekîtiya netewî pêşxistine. Li ser bingeha li hember mezhebên mîna Katolîk, Nasturî, Ortodoks û Protestanî rêzdarin, yekbûna netewî derdixin pêş û ti nêzîkatiyeke me jî li hember ol nebûye mijara gotinê. Armanca me jî rastiyên millî û olîî ji hevdu cudakirine. Li gel me diyardeya netewî li gorî hemû mezheban bigire nava xwe hatiye destgirtin. Ti têkiliyeke me bi Katolîkên Ewrûpare nîne, lê yên ji gelê me mezhebê Katolîk hilbijartine jî bi misogerî Sûryanî qebûl dikin. Hinek hawirdorên derve û alimên olî, li ser bingeha mezheban li hember me bidin bikaranîn êrîşî me kirin û hîn jî dikin. Heta gelek ji me ji hêla dêrêve nayên vaftîzkirin û li ser miriyên me duayên olî nedihat xwendin. Hema bêjin em di dêrê de hatibûn tecrîtkirin. Yekitiya**

**me ava kirî ji ber dij berjewendiyên hinek hawirdorên olîbûn li hember me ev êrîş pêk anîn. Ji tevgera Asurî re digotin "*Hûn Nasturîne*"bi vî rengî hewl didan me tecrît bikin. Hawirdora dêrê Nasturîtiyê mîna putperestiyê fêm dike û vê li hember Xiristiyanan weke heqaretek qebûl dike. Li hember nûnerê rêxistina Sûriyan a Demokratîk û alîgirên wê Nasturîtî weke heqaretek pê ve zeliqand.**

**Abdulah Ocalan: Çawa ku misilmantî Yêzîdîtiyê xirap dide nîşan, Xiristiyantî jî Nasturîtiyê xirap dide nîşan. Ne wisa?**

**Rêxistina Demokrat ya Asur: Belê, hîn jî hinek hawirdor yên dixwazin rastiya gelê Sûryanî fêm bikin dibêjin "*Asurî cudane, Sûryanî cudane.* " Heta hewl didin Keldaniyan jî weke geleke cuda bidin nîşan, a rastî Keldanîtî, tê wateya Katolîk.**

**Abdulah Ocalan: Weke dibêjin "*Kurmanc cudane, Zaza cudane*..."**

**Rêxistina Demokrat ya Asur: Hema wisa. Tevî van hemû kêmaniyan jî hêjmareke zêde gelê me yê li welat û li derveyî welat jiyan dikin êdî me fêm dikin. Bi kinahî di derbarê rastiya gelê me de dikarin vê bêjin.**

**Ji hêla din ve em di zanebûna di nav gelên din de jî jiyan dikin de ne. Ev rewş jî me pir eleqedar dike. Li xakên em lê jiyan dikin herî zêde Kurd lê dimînin, lê Ereb, Fars û gelên mîna Ermeniyan jî hene.**

**Meyzandina me ya li hember pêwendiyên di nava gelan de bi vî rengî ye: Pêwîste her gelek li gor çanda xwe, zimanê xwe, îrade û kevneşopiya xwe ya di jiyanê de azad be û wekheviyekê jiyan bike. Gelên di nav hev de jiyan dikin, hewceye di nav yêkîtî û piştevaniyê de bin; li hember hev rêz û heskirin bijîn. Her çi alî zext û zilmê pêş bixe, li hember wê helwest bê girtin. Ji bo xakên**

**welat divê hemû gel bi hev re bixebitin. Bi têkoşîna tê dayîn welat rizgar bibe ku, welat jî bikaribe wan biparêze, xwedî li wan derbikeve. Niha, xakên em jî lê jiyan dikin hêjmareke zêde tevgerên siyasî û millî hene. Pêwîste van fikrên xwe baş îfade bikin ku, bikaribin çawa bi hev re jiyan bikin rast tesbît bikin.**

**Divê mijara ol di jiyana her gelekî de azad be. Em nabêjin bila ol bibe amûrê desthilatdariyê, lê dibêjin divê her gelek jî di ola xwe de azad be. Sedema paşdemayîna gelan rola herî mezin alimên olî û feodal lîstine. Ji hêla vesazkirina aboriya gelan û pêşveçûna wan ya zanistî de rola nebaş ku van lîstine û astengên avakirine pir mezine. Ji ber vê dibêjin ku, heskî li zevî heskî jî li kargehê, li kî derê dixebite bila bixebite, divê mirov azad bin. Yanî divê mafê mirov yê aborî-demokratîk bigirin bin ewlehiyê.**

**Niha jî em dixwazin vegerin ser mijara penaberiyê. Me da diyarkirin, sedemên mezin yên ku hiştiye gelê me bibe penaber hene. Li vir sedema herî mezin, gelê me ji rastiya wê qûtkirine; hêzên serdest yên li herêmê jî rastiya gele li herêmê napejirînin. Ne serdestiya Tirk, ne Ereb û ne jî Fars heya roja îro rastiya gelê me qebûl kirine. Yek ji van hêzan heya roja îro negotine ev gel jî xwedî şaristanî û çandekê ye. Di qada nivîsê de jî ev nehatiye ziman. Wiha ev hemû hiştiye ku, gelê me mîna tabloyeke reş li her tiştî temaşe bike. Û ev jî bûye sedema bingehîn ya penaberbûnê.**

**Niha dema em li ser sedemên penaberbûnê disekinin, ev tenê ne ji bo penabertî bê fêmkirine, dibêjin bila ev nîqaş vegera gelê me ya ji welat re jî bide pekan. Hewcedariya vê ya derxistina zanebûnê heye. Di vê wateyê de, ji bo bûyer hîn baştir bê**

**fêmkirin pêwîste hinek li ser Aramiyên di dîrokê de heyî jî bê sekinandin.**

**Abdulah Ocalan: Tabî, dixwazim vê jî guhdar bikim.**

**Rêxistina Demokrat ya Asur: Aramî jî parçeyeke Asuriyane.**

**Abdulah Ocalan: Di kîjan dîrokê de jiyan kirine?**

**Rêxistina Demokrat ya Asur: Ev berê B. Z. 1500 tên dîtin. Li xakên Asuriyan jiyan dikirin, yanî di navbera çemê Dicle û Firatê de dijîn. Her çiqas Aramî weke qebileyên cuda bên dîtin jî, çand û şaristaniya wan bi ya Asuriyan re ketiye nava hev û ji xwe piştre jî di nav de heliyane.**

**Abdulah Ocalan: Başe koka wan çiye?**

**Rêxistina Demokrat ya Asur: Em dikarin bêjin ji koka Asuriyên Mezapotamyayê ne. Bi misogerî ne Ereb in. Wateya "*Oromoye*" (Aram) di Sûryanî de tê wateya "*bilind*",**

**“*mezine.* ” “*Aram*”di heman demê de naveke jî. Wan ev nav li xwe kirîne.**

**Abdulah Ocalan: Navê gundeke cîranê me jî Aram e. Wê demê ev peyv jî ji Sûryanî hatiye. Yanî dibêjin, Aramî ne Ereb in.**

**Rêxistina Demokrat ya Asur: Na bi misogerî ne Ereb in. Ji zimanê wan re jî Aramkî tê gotin. Zimanê em pê daxivîn jî bi Aramîye û îro ji vê re Sûryankî tê gotin. Yan jî wisa bêjîn: Di zimanê wêjeyê de ji Sûryanî re Aramî tê gotin. Hîn jî zimanê dêr bikar tîne Aramî ye.**

**Abdulah Ocalan: Bawerim Aramiyan li Rihayê gelek jiyan kirine, ji ber hîn jî rastî şaristaniya wan tên.**

**Rêxistina Demokrat ya Asur: Belê. Li herêmên Colemêrgê heya Rihayê jiyan kirine. Bi taybet li hawirdora Midyatê jiyan kirine. Sûryaniyan van xakan mîna “*Aram*” yanî “*bilind*” binav kirine, van weke xakên pîroz qebûl kirine. Di vê wateyê**

**de pîrozbûna peyva "*Aram*" jî îfade kirine. Heta B. Z. sedsala 7. qiralê Asuriyan Senherîb Aramî weke zimanê welat yê fermî qebûl kiriye.**

**Abdulah Ocalan: Başe ma Aramî pir nêzî Asûrî ye?**

**Rêxistina Demokrat ya Asur: Hemane, tenê weke zaraveyek cuda ye.**

**Abdulah Ocalan: Ma hûn metnên ji wê demê mane fêm dikin?**

**Rêxistina Demokrat ya Asur: Berê nivîsa mîxî dihat bikaranîn. Aramî, şêweya Asûrî ya nûjene.**

**Abdulah Ocalan: Tişta dixwazim bêjim, hûn peyvên Aramî fêm dikin?**

**Rêxistina Demokrat ya Asur: Belê, zimanê niha em pê diaxivin Aramî ye. Di dema Îskenderê Mezin de, Helenan ji Asûriyan re gotine Sûryanî, Aramî weke zimanê fermî qebûl kirine. Piştre jî gel li dora têgeha Sûryanî kom bûne. Du**

**zaravayên zimanê Aramî yên bingehîn hene: Zaravayên Rojhilat û Rojava.**

**P. Z. 452 li Makedonyayê di bin venêrîna Bîzansan de, (nêzî Bîzansan) kongreke mezin ya dêrê tê çêkirin. Di vê demê de Sûryanî dabeşî sê parça dibin û Nasturî jî di vê dîrokê de derdikevin holê. Sûryaniyên Ortodosî jî weke Yakubiyan tên binavkirin. Ji Sûryaniyên serdestiya Bîzansan dişopandin re jî Melikî gotin. Di Sûryanî de Melikî (Melko) tê wateya "*seltanet*" yan jî "*sultan.*"**

**Abdulah Ocalan: Yanî peyva melîk jî ji wir tê?**

**Rêxistina Demokrat ya Asur: Belê. Ji yên alîgirê qral re dibêjin.**

**Abdulah Ocalan: Di vê rewşê de kîjan dibin hevkar?**

**Rêxistina Demokrat ya Asur: Katolîk, yanî yên Bîzansê qebûl kirine dibin hevkar. Ortadoks yên tawîz nedayîne û hîn jî Sûryanî ne.**

**Abdulah Ocalan: Sûryaniyên otodoks hîn radîkalin. . .**

**Rêxistina Demokrat ya Asur: Belê.**

**Abdulah Ocalan: Yanî niha hevkar kîne?**

**Rêxistina Demokrat ya Asur: Şam, Halep, Lûbnan, Hamma, Humus û Rum-Ortodoksên li Lazqiyê tên dîtine. Ev dewama Melikiyane. Lê hêjmareke ji van Katolîkin. Piştre Melikî jî bi awayeke du dabeş dibin. Niha qismek Rum-Ortodokse, qismek jî Rum-Katolîke. Ev dabeşbûn di sedsala 1500 de çêbû. Herdu qisim jî zimanê Sûryanî bi temamî jibîr kirine û hestên netewî bi temamî tine kirine.**

**Melîkî qadiseya (azîze) bi navê Marûn ya di sadsala 6. an de jiyan kirine bawer dikin. Hîn jî Marûniyên li Lubnanê jiyan dikin dewama vane, yanî Sûryaniyên Marûnî ne. Dêrên wan jî hîn navê Sûryanî-Marûnî bikar tînin. Lê ji aliyê taybetmendiyên xwe**

**yên netewî ve ji Sûryaniyan dûr ketine.**

**Ji hêla din ve di sedsala 14-15 de hêjmareke Asûriyan bi Papa ve tên girêdan. Hêjmareke Nasturiyan dibin Katolîk. Papa naveke din li wan dike. Keldaniyên Babîlê. Ev rewş dibe sedem ku gel carekedin bibin du beş. Katolîkên cuda bûne êdî xwe Asûrî qebûl nakin. Tenê bi nêzîkatiya "*em Katolîkin*" re dimînin. Hestên wan yên netewî bi temamî hatine tinekirin. Bi kinahî dikarin di derbarê rastiya gel, çand û dîroka xwe de vê îfade bikin.**

**Abdulah Ocalan: Asûrî bi eslê xwe ne Erebin, ne wisa?**

**Rêxistina Demokrat ya Asur: Asurî ji Ereban kevintirin. Ereb ji aliyê xakên Mezapotamyeya Başûr ve hatine. Yên ku navê Ereb li "*Ereban*"kirine jî Asurîne. Ji wan re "*Araboyo*" hatiye gotin û wateya vê jî "*Başûrî*" ye. Bi Asûrî wateyeke din ya "*Ereb, Sahra*"ye. Di vê rewşê de Ereb,**

**"*gelê Sahra*" weke "*mirovê sehra*" hatiye binavkirin.**

**Abdulah Ocalan: Yanî ev peyv bi Asurî ye?**

**Rêxistina Demokrat ya Asur: Erê raste. Di zimanê me de du wateyên vê hene; yek "*Başûrî*" yê din jî "*sehra*" ye. Heta Ereb jî ji Erebên li sehrayê jiyan dikin re dibêjin "*Arabay*" (Arabî), yanî "*mirovê çolê*. "**

**Abdulah Ocalan: Babîlî, Akadî, Sûmerî bi misogerî ne Erebin, ne wisa?**

**Rêxistina Demokrat ya Asur: Na ne Erebin. . .**

**Abdulah Ocalan: Lê Ereb van dikin malê xwe. Hebûna dîrokeke wisa îdîa dikin.**

**Rêxistina Demokrat ya Asur: Bi misogerî ne Ereb in.**

**Abdulah Ocalan: Zimanê wan ji Erebî cuda ye?**

**Rêxistina Demokrat ya Asur: Raste. Gelek pirtûkên wan yên bi**

**zimanê Sûryanî hatine nivîsandin hene.**

**Abdulah Ocalan: Ma hemû ji Erebî cudane?**

**Rêxistina Demokrat ya Asur: Erê wisa ye.**

**Abdulah Ocalan: Nivîsa bizmarî heye, Aramî heye; ev ne Erebîne, wê demê Erebî nabe zimanê nivîsê jî, mane wisa?**

**Rêxistina Demokrat ya Asur: Belê. Ya rastî zimanê Erebî ji zimanê Sûryanî bandor bûye.**

**Abdulah Ocalan: Bi rastî jî wisa ye? Erebî ji Sûryanî bandor bûne. Başe ma ev misogere?**

**Rêxistina Demokrat ya Asur: Misogere. Di mijara nivîsê de bi taybet bandor dibin. Ji hêla din ve di navbera van herdu zimanan de şibandinek jî heye, lê ya bandor dibe Erebî ye. Ereban hinek tîp ji Sûryanî girtine.**

**Abdulah Ocalan: Rastî wisa ye? Ev pir ecêbe. Wê demê Încîl jî piranî bi Sûryanî hatiye nivîsîn, mane wisa ye?**

**Rêxistina Demokrat ya Asur: Belê, ji çavkaniya Asuriyan tê. Ji xwe koka Îsa bixwe jî Asûrî ye. Di wan xakan de Asûriyan jî jiyan dikir. Yek jî di wan deman de şerkerên Asûriyan yên navûdeng hebûn. Di Tewratê de tê nivîsîn. Dibêje şerê Asûrî û Yahudiyan kokdare.**

**Bi derketina Îslamiyetê re hêjmareke zêde Sûryanî bi awayeke neçarî Îslamiyetê qebûl dikin. Di heman demê de bi Îslamiyetê re ev dibin Ereb. Sûryaniyên bûne Ereb alîkariyeke pir mezin didin şaristaniya Ereban. Bi awayekî esildarên Sûryaniyan, di huner û gelek qadên cuda de didin bikaranîn.**

**Abdulah Ocalan: Fêm dibe. Ereb, di asteke zêde de zanist ji Sûryaniyên**

**bûne misilman digirin. Başe ev li kîderê dimînin?**

**Rêxistina Demokrat ya Asur:- Humus, Şam, Halep, Baxda, Musil û Lubnan'ê.**

**Abdulah Ocalan: Yanî tişta fêm dibe şaristaniya Ereban di asteke zêde de ji şaristaniya Asûriyan (Sûryanî) bandor dibe. Gelo çawa evqas ketine bin bandora wan? Dixwazim bêjim pir zêde Ereb-bûn heye.**

**Rêxistina Demokrat ya Asur:- Belê raste. Tebeqeya Sûryaniyên dewlemend ji bo malhebûnên xwe biparêzin hêjmareke zêde misilmantiyê qebûl dikin.**

**Abdulah Ocalan: Mîna ya di me de ne wisa? Çiqas şêx û axa Erebûn, misilmanbûnê jiyan kirine, di Sûryaniyan de jî wisa ye. Sûryaniyên bûne misilman jî hene ne wisa?**

**Rêxistina Demokrat ya Asur :- Hene. Bi hezaran heta sed hezaran.**

**Rewşa Sûryaniyên li İraq û Suriyê jiyan dikin, dişibin Qiptên (Kipt-gelê berê yê misre)li Misrê. Her ku serdestiya Misrê pêşkeft hêjmareke zêde ya Qiptiyan jî dibin Ereb.**

**Abdulah Ocalan: Rewşa Sûryaniyan jî hinek dişibe ya wan. Ne Erebin, lê dibin Ereb. Mînak ev rewş li Cezayîrê jî heye ne wisa?**

**Rêxistina Demokrat ya Asur :- Raste, ev rewş li Cezayîrê jî heye. Lê ziman, çand û şaristaniya Sûryaniyan ji ya Ereban cuda ye.**

**Abdulah Ocalan: Wê demê geleke herî zêde bi Kurd re di nav hev de jiyan kirine. Wexta ku Asûrî li deştê şaristaniya xwe pêş dixin, Kurd li çiyan hinek paş dimînin. Di Kurdistanê de divê bûyera Asûriyan weke rastiyekê bê fikirîn. Niha biqasî fêm dikim Rêxistina Demokratîk ya Asûriyan nêzîkatiya wan ya ji rastiya dîroka gelê wan re hinek dişibe me.**

**Em jî li hember hemû mezhebperestî, eşîrperestiyê rabûn û bandora ol jî wisa dinirxînin: Rastiya Millî mehf kiriye. Texrîbata olperestên sexte gelê Sûryaniyan zêdetir bandor kirine. Dibe ku ol, Ortodoksî hinek li ser piyan girtiye, lê rexneyên li hember vê jî baş dibînim.**

**Ol bi temamî înkarkirin rast nîne. Beşdarî nêrînên, "*ol çande, şeklê jiyanêye*" dibim, lê yên olperest, yanî yên ol li ser bingeha berjewendiyên xwe bikar anîne jî zerar dane, dibê em wan jî jibîr nekin. Ji her mezhebî geleke nû yê demokratîk afirandin gaveke girînge. Yanî tevgerên xwe li ser bingeheke wisa nûjen esasgirtin girînge. Li hember penaberbûnê derketin jî başe. Ew jî dişibe me. Pêwîste pir zêde cî û giranî ji vê re bê dayîn. Tenê ne li hember penaberbûna fizîkî, di rih û fikir de jî veger girînge. Di vê mijarê de pêwîste fikir pêş bixin.**

**Li gorî min divê mirov bal bide li ser bûyera çînayetî jî. Berjewendiyên hinekan hene, serê vê penaberbûnê dikişînin, disa ev serê olperestiyê jî dikişînin. Li hember van rexne pêşxistin başe. Dikarin ji van re bêjin hevkar. Bawerim di dîroka we de hevkartî pir bingehîne. Mîna hevkarên Bîzans, Romayê. Mîna dewlemendên misilmanên sexte yên ketine fikara parastina mal û milkê xwe. Ev hemû li hember gel çêbûye. Netewperestiya teng jî nebaşe. Ez hinekê xeteriya netewperestiya teng dibînim. Yên xwe ji rastiya gel û welat razberkirine hene. Bêguman rola qetlîam û zextan diyarkere. Lê divê ev hîn zêdetir rê li ber xwe di hûndir de hepiskirinê neveke.**

**Mînak di nava me de, tevî dewisandin û tengavkirina Tirkan jî, me vekirineke berfireh çêkir. Me li hember gelê Tirk vebûn da çêkirin. Di nav me de hêjmarek zêde Tirk hene.**

**Yanî divê polîtîkaya vebûn û polîtîkaya vekirîbûnê pêş bixin. Pêwîstiya gelê Asûrî-Sûryanî jî bi vekirîbûneke bi vî rengî heye. Bingeheke vê ya çandî jî heye û wê ev ji vê re bingeheke baş bide çêkirin. Bi taybet ji bûyera Kurd re vebûneke mezin pêwîst dike. Di wê baweriyê de me ger em li Bakur li hember Ermeniyan, li Başûr jî li hember Asûriyan vebûn bidin çêkirin em ê bikaribin qedera dîrokê jî bidin guhertin. Ji xwe ji bo ev pêwendî qut bûye dîrok ketiye nava tarîtiyê. Heke ev pêwendî bê danîn li gorî min dîrok wê carekedin ronî bibe. Bi misogerî divê ev pêwendî bê danin.**

**Dibe alîkariya Sûryaniyan ji bo avabûna welat û azadbûna gel bibe xwedî roleke girîng. Divê Kurdistan weke welateke hevbeş bê dîtin. Ez carna dibêjim ku, Kurdistan Ermenîstane, Asûrîstane. Car bi car biwêjên bi vî rengî bikar tînim. Ji ber**

**welateke hevpare. Heke li cihekê pênc-şeş gundê Sûryaniyan hebe, li dora wê jî ewqas gundên Kurdan heye. Wiha li Hesekê, Cizîrê, Sûryanî û Kurd di nav hev de ne. Li parçeyê İraqê jî wisa ye, bi temamî di nav hev de ne. Li Colemêrgê jî di nav hev de ne. Li vir têgeha du welatan şaşe. Di heman welatî de du gelên bi hev re jiyan dike, wê ev bibe nêzîkatiya herî rast.**

**Niha tişta ji me re dikeve, di nav xwe de hûn çawa dibin tevgereke demokratîk, divê di nav Kurdan de jî demokratîkbûneke wisa pêş bixin. Yanî tenê ne di nav xwe de, ji derveyî xwe jî bidin pêşxistin. Tabî wê ev bê zanîn; nêzîkatiyên kevin yên olî, nêzîkatiyên teng û netewperest ji vê re zêde derfet neda. Lê îdeolojî û siyasetên me heya bêjî ji vê re vekirine. Bi taybet Rêxistina Demokratîk ya Asûriyan zemîneke baş ji vê re amade dike. Lê dikarim**

**bêjim tevgera PKK'ê jî heya bêjî di vê berfirehiyê de, lê pir bandorker û tevgereke mezin pêş dikevê ye.**

**Hinek Sûryaniyên welatparêz yên hêja ji aliyê cerdevanên dijminê me ve zirar dîtin. Dijmin bizanebûn ser hinek gundên Sûryaniyan de çû. Lê niha jî Sûryanî di nava me de ne û em cudabûnekê nabînin. Tişta daxwaz dikin PKK hema dide yan jî birêxistin dike. Em eniyekê pêş dixin. Li gorî min divê tevgera Asûriyan jî di nava vê eniyê de cî bigire. Bawerim di dema nêz de wê civînên me yên eniyê pêşbikevin. Dema me bang kir bixwe jî dikarin bên, lê min hîn ji rêxistinên Kurd yên din re negotiye, lê dibe bêjim.**

**Bawerim li İraqê tevgera Asûriyan di eniya Kurdan de ye. Sûryaniyên li Surî yên ji Tirkiyê hatine. Her wiha ew jî dikarin beşdarî eniya Kurdistana li Tirkiyê bibin. Hêjmareke zêde Kurdên Cizîrê û**

**Sûryaniyên wê ji wir hatine; ji Mêrdinê, Midyadê û deverêndin. Heman gund û bajar parve dikin, loma yekser dikarin beşdar bibin. Pêwîste ji niha şûnde li Ewrûpa û Cizîrê jî nêzî hev bin. Dikarin bi hev re çalekiyên çand, folklor û hwd. bikin. Dîsa dikarin meş û xwepêşandanên hevpar pêk bênin. Hinek jî dikare xebata qadro bê kirin. Ger hebe hinek ciwan, dikarin wan bişînin çiya. Ji xwe hinek ciwan ji gundên hawirdora çiyayê Cudî beşdar dibin.**

**Ev hemû tên wateya qonaxeke nû. Civîna me, dikare pêşengtiyeke pir girîng ji vê qonaxê re bike. Eleqeyeke min pir zêde ji dîroka Asûriyan re heye, dîsa ji çand û şaristaniya wê re eleqeyeke zêde raber dikim. Heke me vê fêm kir, bawerim em ê rastiya Kurd jî fêm bikin. Yanî em çiqas rastiya Asûriyan derxînin holê, em ê ewqas jî rastiya**

**Kurd derxînin holê. Zehmet jî be ev nêzîkatiyeke raste.**

**Divê di dîrokê de gavên wisa girîng bên avêtin. Bi misogerî divê veger pêkbê. Em ê heya dawî piştevaniya pêwîst raber bikin, hêsan bikin û ji vî karî re têkoşîn bidin. Niha em li vir in.**

**Li vir serokatiya heyî, dîrokiye.**

**Di vê mijarê de gavên tên avêtin jî binirxin. Tevgera me di vê qadê de hêzek mezin girt. Em bi bawerin li vir tevgera şoreşger û têkoşîna wê pêş bixin. Surî di vê wateyê de, bûye sitargeha gelên ji ber faşizma Tirk direvin. Lê divê êdî gel çavên xwe vekin û carekedin ser xakên jê hatine de biçin. Divê di rih û bîr de vê biafirînin, destpê bikin. Bi desthilatdariya li vir re jî têkiliyên dostane bên meşandin, ji xwe niha ev hinek pêşketiye. Di vê wateyê de bi gelê Ereb re jî pêwendiyên herî baş tên pêşxistin. Divê em vê ji nû ve**

**binirxînin. Di vê qadê de tecrûbeyên min zêde nîne. Hûn zêdetir li virin. Malbatên we berê li vir bûn û li vir mezin bûne. Rewşa we ya li vir hîn baştire.**

**Divê em rastiya vir jî bidin ber çav, lê dibêjim divê em, gaveke din hîn pêşdetir bavêjin.**

**Ez miroveke bihêvî me. Ji bo dizanim ji tinebûnê biafirînim vê pêşketinê jî mumkûn dibînim. Dikare ji rewşên herî nebaş rewşên herî bihêz derxînin holê. Ji bo we jî dikarim wisa bifikirim. Dibêjim tişta ket ser milê me, me kir.**

**Hûn jî dixwazin biceribînin?**

**Karwanê şoreşê dimeşe, hûn ê beşdarî vê rêwîtiyê bibin?**

**Li gorî min divê hûn di nav de cî bigirin. A rastî divê gelê Asûrî-Sûryanî weke guleke vî welatî bê dîtin, her çiqas hatibe perçiqandin û derfeta derketinê jê re neyê dayîn jî. Tevgera me zemînê vê û navenda vê amade**

**dike; divê ji nû ve vebe. Dîsa sozeke min heye wê dubare bikim: Heke em bê we jî serkeftinê bidest bixin û Asûrî bixwazibin bên welat, her tim dibêjim hûn bixêr bên.**

**Rêxistina Demokrat ya Asur: Ji bo tiştên hatine gotin carekedin sipas dikin. Weke me berê jî diyar kirî, gelên cîran ji çînên serdest pir kişandine. Me heya niha ji ti alî yan jî dewletekî tişteke xweş nedît. Me heya niha meyzandina PKK'ê ya li hember me, bi awayeke zelal ji hêla me ve nedihat zanîn. Di derbarê gelê me de dîtineke nivîskî di holê de nedihat dîtin. Ka PKK, rastiya gelê me qebûl dike yan na; difikirim ku heke bi daxuyaniyeke nivîskî gelê me jî weke gelê Tirk, Ereb, Fars û Kurd bê ravekirin, wê gelê me ji vê pir kêfxweş bibe, cesaret bigire û vekirîbûneke baş bide çêkirin.**

**Heya niha meyzandina Asûrî-Sûryaniyan ya li hember Kurdan zêde**

**baş nîne, bilêvkirina vê feyde dibînin. Heya niha Kurdan, bi meyzandina Asûrî jî miletekin temaşe nekiribûn.**

**Abdulah Ocalan: Ew Kurd, Kurdên ku rastiya Kurd jî înkar dikin.**

**Rêxistina Demokrat ya Asur: Difikirin ku PKK jî divê mijarê de kêm maye. Yê rastiya gelê me rewa dike û qebûl dike...**

**Abdulah Ocalan: Cewhera PKK'ê eve, berevajî we nîne. Hevalê Nûman dikare ezmûnên xwe veke.**

**Nûman Serokê min beriya niha jî me vê mijarê bi hevalan re nîqaş kiribû. Kêmaniyên me jî çêbûne, dibe ku me rastiya gelê Asûrî bi awayeke nivîskî baş venekiribe. Lê di cewher de me ji vê re jî xizmet kiriye. PKK, tenê ne yê gelê Kurd û Sûryaniyane, tevgereke berjewendiyên hemû gelan û bi taybet jî gelên herêmê esas digireye.**

**Abdulah Ocalan: Ez bêjim şêwazeke mîna ya tevgera Îsa ye, yanî tevgereke miroviye.**

**Nûman Serokê min, min ev ji hevalan re rave kir.**

**Abdulla Ocalan: Fêmkirin?**

**Nûman Ne ku fêmnekirin, heya niha bûyera PKK'ê nasnedikirin.**

**Abdulah Ocalan: Em bi temamî tevgereke mirovahiyêne.**

**Nûman Cewher nehatiye fêmkirin.**

**Abdulah Ocalan: Ev kêmbûneke.**

**Nûman Raste, ev kêmbûneke. Yek jî mebesta wan madem em dibêjin Asurî hene, çima li rojnameyan nehat nivîsandin.**

**Abdulah Ocalan: Çil caran dibêjim Asûrî hene. PKK'ê ev gotiye.**

**Nûman Bêguman serokê min. Mesele eve. Dibêjin bila bê destgirtin, ji xwe wê bê nivîsandin û heye jî.**

**Abdulah Ocalan: Bêguman. Bila niha biçin li Cizîrê bêjin, min wisa**

**gotiye. Heke gel qebûl neke, kesek tenê jî qebûl neke, bila bên bêjin.**

**Rêxistina Demokrat ya Asur: Bila bê nivîsîn, bi awayeke nivîskî bê nivîsîn. Ev tiştên hatine gotin, bila gelê Kurd jî, gelê Sûryanî jî bizane, van rastiyan bibînin.**

**Abdulah Ocalan: Divê hûn bixwe binivîsin; kovar û rojnameyên me vekirîne. Ji xwe weke tê xwestin tê nivîsîn.**

**Rêxistina Demokrat ya Asur: Em dinivîsin. Weke kes em ê jî binivîsin. Tişta em dixwazin ka meyzandina PKK'ê û birêz Ocelan ya li hemberî me çiye; bila ev bi awayeke nivîskî bê ravekirin. Wê gelê me ji vê pir bandor bibe, cesaret bigire.**

**Abdulah Ocalan: Nûman, tu li ser navê PKK'ê binivîse. Vê bêne rewşa biryara rêxistinê. Bi hev re binivîsin, em jî bênin rewşa biryarê. Di vê mijarê de pirsgirêk nîne, ew tê çareserkirin.**

**Rêxistina Demokrat ya Asur: Em ê jî xwe hîn baştir vekin û di vê wateyê de em ê bi jiyankirina gelê Kurd re bextewarbin. Êdî em ê vê pêş bixin. Ji ber me heya niha ji derdora Kurdan vekirîbûnek nedîtiye em her tim girtî mane.**

**Abdulah Ocalan: Her tişt beramberî hev pêş dikeve.**

**Rêxistina Demokrat ya Asur: Hinek hawirdorên Kurd di nivîsên xwe de dema xîtabê me dikin dibêjin Kurd, Ereb, Misilman yan jî Xiristiyan. Rastiya Asûriyan paşçav dikin.**

**Abdulah Ocalan: Ew kevne, bandor nake. Dîrok ji nû ve tê nivîsîn.**

**Rêxistina Demokrat ya Asur: Têkiliyên berê pir zêde kêfxweş û hêzdar nedikir.**

**Abdulah Ocalan: Ew dîrok herî kêm biqasî we, ji bo me jî wisa xirab bû.**

**Rêxistina Demokrat ya Asur: Tişta em dixwazin êdî ji pêvajoya niha**

**şûnde bila bûyer zelal bibin, bên fêmkirin û gel hevdu fêm bikin. Heke gel li hember hev rêzdar nebin, nikarin bi hev re jiyan bikin. Heke ev gel li hember hev rêz nedin raberkirin, yê lewaz wê dîsa biperçiqe. Daxwaza me eve; bila PKK qebûlkirina gelê me bi awayeke nivîskî jî îfade bike.**

**Abdulah Ocalan: Em qebûl nakin çiye? Di me de tiştek wisa nîne. Heya dawî qebûl dikin. Di nivîsên me de jî hatine weşandin. Weke gel me ti carî Asûriyan înkar nekiriye. Ev di nivîsên me de pir zêde cî girtiye.**

**Nûman Rêberê min, dikarim vê bêjim: Em weke PKK me jî heya niha R. D. S. ' nasnedikir. Bila peyvendî pêş bikevin ku, em jî hevdu rast nasbikin.**

**Rêxistina Demokrat ya Asur: Piştî van daxuyaniyan wê gelê me bawerî bigire. Ji hêla me ve jî wê zêde pirsgirêk nemîne. Li ser vê bingehê jî wê biratiya gelan pêkbê.**

**Abdulah Ocalan: Bêguman wisa ye. Ev karê rêxistin û têkoşînêye. Ji ber xwe ve çênabe. Min, biqasî bi dijmin re têkoşîn kir, ewqas jî li hember paşverûtiya Kurd têkoşîn kir. Têkoşîna min a di vê mijarê de bi navûdenge. Hîn jî ji bo Kurdan amade bikim, şereke mezin pêş dixim. Em tevgereke vê hedef dikin, yên di dîrokê de rastiya gelan înkar dikin, li hember hev didin bikaranîn li hundur û derve çi hebe, hemû tine dikin. Divê hûn bûyera PKK'ê fêm bikin. Em tevgereke nipînûne.**

**Gelek me dişibînin pêxemberan. Mîna "*derketineke pêxemberî jî*" dinirxînin. Ez nirx didim gotinên Metropolîtê Sûryanî birêz Yohanna yê li Helebê. Ji bo min yekî hêja. Digot, "*çalekiya we, dişibe çalekiya Hz. Îsa. Di mijara xizmetkirin û aşitî heskirinê de ev wisaye.* " Piştre di derbarê min de sergotar dan û digotin; "*Apo xwe têxe şûna Îsa*. " Tabî ji bo baweriya**

gel pir bi min heye, diyare tişteke çiqas binirx îfade kiriye.

Wiha, di vê mijarê de pêwîste ti dudilî neyê jiyîn. Herku şoreş pêşve biçe wê pirsgirêkeke herî biçûk jî çênebe. Her ku dem derbas bû wê rastiya gelên din jî bikevin nav vî karî û rola xwe bilîzin.

Lê netewperestiya teng jî xetere. Em li hember rastiya netewî rêzdarin. Divê em heya dawî çanda netewî biparêzin û pêş bixin. Lê divê gel ji vê encamên mîna hevdu biçûk bixe û înkar bike dernexîne. Pêwîste weke li Yugoslavya, Bosna-Hersek hatî dîtin nebe. Bi nêzîkatiyeke nîjadî ku hevdu paqij dikin, bi ti awayî nekevin nav rewşeke pir qirêj. Berevajî divê em weke rastiyên gel yên hevdu dewlemend dike binirxînin, wisa nirx bidin gelan. Di nav hev de jiyankirin, neku bên beramberî hev, bila bibe sedema yekbûnê. Di vê mijarê de PKK tevgerek amadekiriyê ye. Cudahiyeke

**herî biçûk yê netewî û neyeksanî qebûl nake. Ya ku heval bandor dibin ew netewperestiya Kurd ya berê ye û zordestiya begên Kurdan ên berê ne. Em ji we zêdetir li hemberî wan in. Û tenê ne di gotin de, ji her alî ve me li hember wan çalekiya mezin pêk anî. Di vê mijarê de pir bibiryarin. Em di mijara têkoşînkirina yên li hember dîroka gelan rolên xirap lîstine û di mijara tesfiyekirina xayîn û nokeran de pir bibiryarin. Heke têkoşîn hinek jiyan bike, wê ev bê dîtin.**

**Pêwîste ev neyê jibîrkirin; heya ku em biser nekevin, ne rastiya gelê we, ne jî rastiya gelê me dibe. Em rastiya gelan bi têkoşînê qezenc dikin. Ev hatiye îsbatkirin.**

**Dibe bibe destpêkeke baş. Têkiliyên ji niha şûnde dikarin bi şêweyên cuda pêş bixin. Bi misogerî wê her tim pirsgirêk hebe, lê divê rêyên çareseriyê yên em jî ferz bikin hebe. Pirsgirêkên hezar salî em ê**

**nikarin hema di carekî de ji holê rakin. Ev pirsgirêkên hezar salî çiqas rastîbin, rêyên çareseriyê jî ewqas rastîne. Divê em bi îdîa û biryardar bin.**

**Hewceye em têkçûna li hember dîroka tarî qebûl nekin.**

**Pêwîste afirandina dîrokeke ronîdar bibe vebijêrka me ye.**

**Di wê baweriyê de me ku di dîroka me ya derbazbûyî de ji bo vê serbend û rastî hene.**

**Rêxistina Demokrat ya Asur: Di dîrokê de, biqasî kêmaniyan têkiliyên gelê Kurd û Asûrî-Sûryaniyan yên xweşik jî hene. Eşîretên Asûrî-Nastûrî yên Rojhilatê Mezapotamya bi eşîretên Kurdan re di nava kirîvî û têkiliyên wan yên dostaneyî di nav kevneşopiyekê de bû. Ev têkilî ji Colemêrgê heya Cudî, Hewlêr, Urmiye, Tur Abdîn, Amed û Rihayê hebû. Yanî bi şêwazeke kevneşopî, bi Kurdan re girêdanên bi vî awayî**

**hebûn. Li Mezapotamyeya jorîn, li xakên welatê em îro jê re dibêjin Kurdistan. Ev herdu gel heya roja me ya îro, tevî hemû êrîş û xiyanetên li ser wan tên ferzkirin jî karîne bi awayeke biratî bi hev re jiyan bikin. Ev xaleke pir girînge, biratiyê îfade dike. Her çiqas baweriyên van gelan ne heman jî be, ev qûtbûnê îfade nake. Di qetlîamên 1914-19'an de hemû Kurdan rol nelîstin. Alayên Hamidiyê û hinek hevkar serê qetlîamê dikişandin.**

**Bi misogerî, wê demê Kurdên ku li Kurdan didan hebûn. Hêjmarek ji eşîrên welatparêzên Kurd, Sûryaniyan bin serweriya xwe de digirtin. Yanî ev jî rastiyeke û wan parastibûn. Hîn jî di Manastira Deyr-ûl Zahferan de wêneyê şêxeke Kurd hilawistî heye. Tê gotin ku ev şêx di qetlîama 1914'an de alîkariyeke pir mezin daye Sûryaniyan. Di dîrokê de, mirov rastî gelek têkiliyên wisa xweşik tê.**

**Kurdan, bi awayeke îradeya xwe ya azad li hember Sûryaniyan ti qetlîamek pêşnexistine. Berpirsyarê qetlîamên di dîrokê de hatine jiyîn diyarin; yan hêzên serdest yên Erebin, yan hêzên Fars yên serdestin, yan jî hêzên serdest yên Osmaniyan û domdariya wê KT'yê ye. Dîsa hêzên berpirsyar yên derve hene; yên weke Alman û Îngilîzan. Bêguman, hinek şêx, beg û axayên Kurdan jî di destê van hêzên derve de mîna amûrekine. Van him li hember Sûryaniyan û him jî li hember Kurdan bikar anîne. Mînaka vê ya herî berbiçav Alayên Hamidiyê ye.**

**Abdulah Ocalan:Em ji vê kesayerê re dibêjin Îdrîs-î Bidlîsî.**

**Rêxistina Demokrat ya Asur: Rewşenbîrên gelê me van rastiyan dizanin. Lê hêjmareke zêde gelê me van rastiyan nizanin û yên meseleyê nizanin jî, weke ku Kurd qatîlê wan yê rastî be li meseleyê temaşe dikin.**

**Niha tişta herî zêde me kêfxweş dike pêşengên Kurdan, yanî yên serokatiya wê dikin ne şêx û begin, mirovên rewşenbîr û pêşverûne. Li gel rêza me ji hemû pêşengên welatparêzên Kurdistanê re heye, lê dixwazin bêjin ku yê herî zêde bawerî û wêrekî daye me PKK ye. Di derbarê serokatiya PKK'ê de vê bi awayeke vekirî îfade dikin. Em di wê baweriyê de ne ku em ê bi hêza PKK'ê ew dîroka kevna tarî biqetînin û ji holê rakin. Dîsa di wê baweriyê de ne em ê ji bin vî barê dîrokê derkevin û bi ser bikevin.**

**Ev hevdîtina taybet ya me bi pêşengtiya PKK'ê re kiriye, bi rastî jî me pir kêfxweş kiriye, cesareteke pir mezin daye me. Em vê rastiyê jî îfade bikin. Beriya niha agahiyên me yên di derbarê PKK'ê de pir kêmbûn. Bi hatina hevalê Numan ya gel me re, me PKK'ê hinek din ji nêz ve naskir. Yanî pêwendiyên me nûne, çend**

**heyvî ye. Lê tevî vê jî em fêrî gelek rastiyan bûn. Niha me di derbarê PKK'ê de agahiyên gelek xweşik girtin. Bi taybet bi vê hevdîtina me bi serokatiya PKK'ê birêz Abdulah Ocalan re kirî, em di derbarê PKK'ê de bûn xwedî agahiyên hîn bihêztir û em jî binê van rastiyan îmza dikin.**

**Hemû nakokiyên di serê me de zelal bûn. Di wê baweriyê de ne ku wê ev hevdîtin ji bo dema pêş jî gelek sûdmend be. Ev rastiyên xweşik ku em fêr bûne, em ê him ji gelê xwe yê li derve û him jî yê li hundur jiyan dikin re ragihînin. Em ê lez bidin xebatên xwe yên ji bo vegera xakên welat. Em ê ragihînin bêjin ku hêzeke paşverû yê mîna PKK'ê jî di vê mijarê de alîkarî dide, mîna gelê Kurd û mafê wê diparêze, hemû gelê Asûrî-Sûryanî û mafê wê jî diparêze û wê biparêze.**

**Em carekedin sipasiyên xwe raber dikin. Tişta niha îfade bikin ev in.**

**Abdulah Ocalan: Di dema pêş de wê hevdîtinên me yên hîn berfirehtir çêbin. Her ku biçe em ê pêwendiyên xwe pêş bixin. Û weke min gotî, dibe ji bo eniyê jî em bangî we bikin. Ev jî heya bêjî wê gelê we meşrû bike, wê danasîna nasnameya Asûriyan meşrû bike, gel amade bike. Her ku PKK biser ket wê ti pirsgirêk jî dernekeve. Weke min gotî heke bi xwe jî nebin, dema me şoreş çêkir, em gihiştin serkeftinê, em ê bangawazî bikin. Em ê bêjin bila her kes bê gundê xwe, xwedî li manastirên xwe derkevin. Ev di cewhera tevgera me de heye. Di me de hevgirtinek millî ya herî biçûk nîne.**

**Em, tevgera mirovên heya dawî bixwe bawerin. Divê em xwedî li vê derkevin, xizmeta em dikin ji we re jî xizmete. Di dema pêş de wê ev hîn baştir bê fêmkirin.**

**Serkeftina me wê bibe serkeftina we jî. Ji bo serkeftinê jî pir bi îdîane û**

**kedeke me pir mezin heye. Ez jî, ji bo hatina we ya heya vir we sipas dikim. Bi dîtina carekedin ji we re serkeftin dixwazim.**

**Rêxistina Demokrat ya Asur: Înşalah em ê ji bo gelê xwe hinek tiştên baş bikin.**

**Abdulah Ocalan: Bi hêvîme, bi hêvî me! Bi vê mebestê dixwazim silav û heskirinên xwe li hember gelê Asûrî- Sûryanî raber bikim.**

**Heya niha xayînên me ziyana mezin tenê nedane gelê xwe, ziyan dane gelên ku bi hev re jiyan kirine jî. Divê bi ti awayî ew û gelê Kurd di heman kefê de neyên destgirtin. Ev niha jî, ji KT'yê zêdetir ziyanê didin me. Şerê me yê bi van re, di heman demê de ziyana dane gelên cîran jî wê ji holê rake. Divê PKK'ê weke rêxistineke xwe yên bira bibînin û dikarin mîna rêxistineke ewleya hebûna xwe binirxînin. Hemû gelê Kurd yê girêdayî PKK'ê dostê wan e.**

**Ev civîna me lidarxistî jî di heman demê de ji bo wan bangawaziya biratiyê ye.**

**Ji niha şûnde bila herdu gel pêwendiyên xwe bi hev re pêş bixin. Bila têkiliyan hêdî hêdî vekin. Ev gavên destpêkê her çiqas hêdî jî bin, wê encam ronak be.**

**Gelê Asûri-Sûryanî geleke ku ji mêj ve me dixwest xwe bigihînê ne. Ji bo me ev derfet niha hinek bidest xistiye kêfxweşim. Em ê ji bo wan jî bixebitin. Ji bo li şûna dîrokeke tarî dîrokeke ronî bidest bixin, xebatên me yên ji niha şûnde hîn zêdetir bibin.**

**Welatê me welatê we ye!**

**Herî kêm biqasî me, divê hûn jî xwe xwedî vî welatî bibînin. Ev welat welatê me yê hevpare, çand dîsa çanda me ya hevpare.**

**Bi hêvî me û dubare bangawazî dikim!**

**Divê hûn ji niha şûnde hîn zêdetir ser welat de biçin, bi ser rastiya gel**

**de biçin û vê li ser bingeha azadiyê pêk bênin. Ev têkoşîn heya niha me ji bo hemû mirovahiyê daye, ji bo gelê Sûryanî yê di dîrokê de her tim bi nijadkujiyên mezin re rû bi rû maye û zextên zêde jiyan kiriye ji bo wan jî têkoşîneke bi vî rengî dayîn ji bo xwe rûmet dibînim. Keda me ji bo hemû gelan keda azadiyê ye. Ji bo gelê Sûryanî ku herî zêde em pêkve jiyîne jî hewildana azadiyê ye.**

**Carekdin silav, rêz û serkeftinên xwe pêşkêş dikim.**

**1993**